ABDULAH OCALAN

# JI ÎSYANA YEKEM BER BI ŞERÊ GELÊRÎ VE



ABDULAH OCALAN

# JI ÎSYANA YEKEM BER BI ŞERÊ GELÊRÎ VE

***-Çareseriya Girêka Kor a Kurdistanê-***

**Weşanên Komîteya Rêbertî**

**Werger:** Ayten Amed
**Redekte:** Sozdar Serbilind, Ayten Amed

**Cihê çapê:** Çapxana Azadî
**Dîroka çapê:** Nîsan 2019

# NAVEROK

**Mirovê Xwe Birêxistin Dike Hêza Herî Mezine**

**Rêbertî Hunerê Bi Rêbazê Rast Nêzîkî Jiyanê Bûyînê Ye**

**Jiyana Min Tenê Ne Çîroka Netewekî Ye, Bersiva Herî Rast a Ji Azadiya Mirovan Re Ye**

**Em Heta Dawi Mahkûmî Berxwedanî û Jiyankirinê Ne**

**Di Nava Pergala Pêwendiyên Ku Ajo Tê De Rabûne Ser Piyan û Asta Azadiyê Tê De Nîne Em Dikarin Xwe Bigihînin Hezkirinê**

**Hebûna Jinê Divê Bi Serê Xwe Çavknaiya Peroşê û Hêza Jiyanê Be**

**Ji Xwe Bawer û Serbixwe Bin Da KuHûn Bikaribin Bi Min Re Bimeşin**

# Mirovê Xwe Birêxistin Dike

## Hêza Herî Mezine

Arasteya şerê bîrdozî, siyasî leşkerî û di derbarê asta pêkanînê de pêşketinên tên jiyîn gelek berfirehin. Bi taybetî jî ya ku ji bo gel pêdivî pê heye zanîn û ji bo rêxistinê ev tevgerîn her ku biçe dê bandora xwe bidomîne. Êdî ji aliyê şerê taybet ve astenkirina vê negengaze. Jixwe ya ku ji şerê gel jî em dixwazin bê fêmkirin jî ev e. Encax dema ku we xwe gihand rastiya şerê gel, hem pêşketinên gel yên bîrdozî, hem jî siyasî û leşkerî ji gelek aliyan ve xwe gihandina hêz gengaze û ya pêk tê jî ev e.

Lê em vê jî jibîrnakin ku, tevgera netewî bi xwe, hatiye mêtîngerkirin, heta ji wê jî wêdetir, civaka hatiye helandin, ji xwebûyînê hatiye derxistin yan jî rastiya civakî ya ku gelek dijî hem tahlîl kirin, hem jî wê dema ku pêwîst kir bikaribe xwe bide jiyîn weke asteke civakî di derbarê ji nû ve afirandinê de ye. Armanca sereke ev e. Ev hemû xebatên bîrdozî, leşkerî, siyasî, di tehlîla dawî de gel ewqas gihandine asta nejiyînê; hemû curên parçebûnê, belaveyî, malbat, kabîle, asta çandî, huner û xisûsên weke moral, ji zexteke çînî ya tê zanîn wêdetir, bi bijareyê re rûbirû mayîn, ji xwebûyînê derketin, xeteriya teşbîhî dijiminê xwebûyîn em dizanin ku di asteke herî jor de tê jiyîn.

Şer, yanî hemû çekên têkoşîna me di derbarê astengkirina vê û xistina rêya pêşketinên azad de ye. Me çiqas serxist? Rewşa me ya niha heyî ya pêşengtiyê, weke îfadeya herî kûr a peşveçûnan asta me ya leşkerî, dikari çiqasî vê berevajî bike, çiqas dikare vê serberjêr çûyînê rawestîne, em li kîdera van pêşketinane? Vana her roj tên lêpirsînkirin. Ji xwe îfadeya giştî ya şer jî, hem ji eniya dijmin ve, hem ji eniya me ve di vê wateyê de ye û misoger divê heta dawî em rast fêm bikin. Asoya teng a vê fêm nakin, ya ku em gelek qalê dikin, seranseriya ku em dijîn, rewşa we ya ji xwe tahlîlkirinê dûr nayê fêmkirin. Ne îdea, ne jî di asta pratîkî de,

bûyîna xwedî pêngavê em li vir bihêlin, kes nikare xwe ji rewşa astengbûnê jî derxe. Vana xalên girîngin. Bê fêmkirina van hûn nikarin destê xwe bihejînin û bikevin nava vî karî. Ev gelê ku xwedî hêrseke mezin û bi belavbûnê re rû bi rû ye, ger nirxên wan ên civakî nekin armanc di oxira wê rastiya şer û ruhê wê neyê qezenckirin, em devjê berdin pêşxistina wê ya çalakiya şoreşgerî, hûn ê nikaribin xwe ji rewşa çarçûrkirinê û bi van nirxan lîstinê rizgar bikin.

Weke min got, ev mijar me gelek anîn ziman û misogêr em ê fêm bikin. Wekî din xeta vî şerê nayê fêmkirin, nikarin bikevin nav vî şerî bimeşînin, şer bikin. Ji xwe weke ku me ev pir zelal vekirine, di asteke girîng de we jî fêm kir. Dîsa di gelek dewreyan de, bi taybet jî di dewreya beriya vê de, rastiya civakî hinekî din bi kûrahî vegotin û pêdivi bi vê bihîstinê yek ji sedemên wê jî, hinekî din bi kûrahî fêmkrina vê rastiyê ye. Yanî rastiya civakî û ger pêwîst be rastiya aborî hinekî din vegotin, bandorkeriya we ya bîrdozî, siyasî, leşkerî gaveke din pêşve bibin gengaze. Ji vî alî ve jî rastiyeke civakî esase.

Realîteya civakî, rastî heta ku sosyalîte neyê fêmkirin û rastiya me ya civakî, civakîbûna me, cemeeta me, eşîret, kabîle, asta netewî heta ku ji hemû aliyan ve neyê tahlîlkirin ne gengaze ku hûn bikaribin xwe bigihînin formansyoneke bîrdozî, siyasî û leşkerî. Heta hinekî zêde bi aliyê bîrdozî, siyasî dîsa yê çekdarî ve mijûl bûm. Yan jî dema ku ez bi vê re mijûl bûm, diviya bû ku sosyalîte pir zêde li ber çav hatiba girtin. Dibe ku divê mijarê de hinek tengbûn hebin. Eniya civakî ya şer rast fêmkirin, çiqas girîng lêpirsînkirin, pîvana asta pêşeng bi qasî nayê paşxistine, taybetmendiyeke pêşketin yan jî waneyeke devjênegere.

Sosyalite, feqerata laş ya herî sereke hem ya jêr, hem jî ya jore. Yên ku nizanin bibin civat, ango cemaeteke civakî qet nikarin bibin siyasî û leşkerî. Heta ewqas asta zanîn yan jî weke saziya jor a ku em dinirxînin ev Partî, artêşbûn hinekê jî ji bo ji aliyê civakî ve em bikaribin we bînin gel hev û sosyalîta gavekê pêşde bibine. Pir belav, ya ku her tiştî di nav xwe de dihewîne, em ji ziman bigirin heta hem tevgerînên sosyal nayê fêmkirin, hema bêje asta ku nikare xwe îfade bike, gihandina asta xwe îfadekirinê, heta gihandina asta ku hinekî dikare bijî ma ne

girînge? Em jibîrnekin ku, yên civakî nebe heywane. Mirovatiya ku di pêvajoya meymûnan de bû, encax karî bi civakbûnê nasnameya xwe bibîne. Bûyîna grûbeke civakî taybetmendiyek girêdayî mirove.

Vê jibîrnekin ku, hûn ji aliyê cîvakî ve gelek li paşin. Ez pir bi baldarî dipirsim; çima hûn nikarin komîteyeke Partiyê bixebitînin? Heta niha jî pirsgirêka min a herî mezin, di nava komîteyekê de sê-çar kes bi hevbeşî dana xebitandin, dîsa taximek bi morelekî mezin, weke grûbeke di nava ahengekê de dana meşandine. Em nikarin bêjin ku we ev pêk aniye. Çavkaniya xwe ji kî derê digire? Yên ku asta civakbûnê weke tê xwestin fêm nekiriye, ji aliyê dijminê mêtînger ve yên hatine ferzkirin, ferdê ku şibandiye xwe hovtir yên ku xwe negihandine asta klan, kabîleyên deh hezar sal berê, dibe ku ji ber kesayetiya ku ji vê jî wêdetir çavkaniya xwe digire. Rastiya bi êş a ku em dijîn jî ev e. Hûn bi qasî li derveyî bûyîna klan û kabîlê mane, weke kesên ku dijmin hemû derfetên berxwedaniyê ji dest girtiye, ji hemû aliyan ve li ser esasê înkarkirinê, gav bi gav jî weke kesekesekî bi tena serê xwe, ji bo weke xwe lêkirinê hûn di rewşa amûr de ne.

Yên ku dixwazin çalakiya me ya şoreşgerî fêm bikin, berî her tiştî divê vê asta civakbûnê di aqlê xwe de bigire. Çima hûn nayên hezkirin? Çima rêzdarî nîne, çima bi rêkûpêkî kes ji we dernakeve, çima hûn karên xwe hostane nameşînin? Çima ji dervî karên hov, paşverû tiştekî din ji destê we nayê. Bi rastî jî çima di karekî de hem jî di karên bilind ên mîna leşkerî, hûner, siyasî û weke van gelek karan de serkeftineke we ya cidî nabe mijara gotinê? Sedema xwe ev e; jixwe hûn, di bûna yekeya herî biçûk a civakbûnê de ji xwebûnê derketine. Hûn li kîdera rastiya civakî ne, çi îfade dikin? Hûn çi qas ji xwe ne, çiqas ji dijminin? Hûn çiqas dişibin klanên çar pênc hezar sal berê, hûn çiqas civakbûna roja me ya îro dijîn? Ne diyare. Hûn pirsên wisa jî ji xwe nakin û ji xwe ya me dixe zehmetiyan jî ev e. Bifikirin, ev taybetmendî çiqas belavin. We serê xwe girtiye û hûn diçin. Di jiyana we de pergal heye, dîsîplîn heye? Gelo hûn çiqas dixwazin bibin grûbeke civakî? Dixwazin bibin grûbeke çawa? Hûn dikarin bibin taximekî biçûk?

Me heta niha PKK weke komîteyeke biçûk jî nekarî bixebitînin. Ez nabêjim ferdparêzî jî ev asteng kir. Xwezî bizanîban ferdparêziyê jî bikin, ew jî nîne. Ji ber ku ferdiyet hinekî jî civakbûnê pêwîst dike. Ferdiyeta civakbûnê nas neke heywanbûne. Bi êş e, lê ev rastiyeke! Ya herî xeter jî bi qirawata cilên serdema nûjen ve xwe veşartine. Ez niha li vir vê bi awayekî pir bi kurtî vedibêjim ku, di bin cilê hemdem de heywaneke ji klanên pênc-deh hezar sal berê xiraptir digere.

Ev daraza min, daraza min a dîrokî ye û ji nîqaşê re vekiriye. Heta ku hûn wate nedin rastiya xwe ya civakî, ji bo me çima, çawa pêwîste, girêdana rastiya civakî bi axê re, siyasetê re rast destnîşan nekin, di vê mijarê de xwe dîsîplîne nekin, ez ê we weke heywan nirxandinê misoger bidomînim û ya rast jî bi vî rengiye.

Em nebin zarok û xwe nexapînin. Ewqas bandor ji me re bese. Ji ber ku tevî van hewldanên me yên mezin, komîteyeke bi tendurist a rêxistinî, komîteya şer, heta bi hevrebûneke hevrêtiyê jî nîne. Dikare ferdiyet bê kirin, rêxistin jî bê belavkirin, lê ev jî hinek şêwazên xwe hene. Niha di destê me de hinek mînak hene. Hûn van rojan lêkolîn dikin. Niha yên ku bi hukmê îdîamê tên darizandin hene, em ê çi bikin? Ev heywaneke? Ger heywan bûya me yê terbiye kiriba, baniya rewşa ku dikare sûd bide. Ji vê ji xirabtir, nayê ti tiştekî, nayên jiyanê, nayê xizmetkirinê.

Ferdiyet avahiya kapîtalîzmê ye. Kapîtalîzm jî hinek pîvanên xwe hene. Herî kêm xizmetê ji xwe re bi me bide kirin. Kapîtalîstek çawa çîna karker, tevahiya civakê dixe xizmeta xwe, bila ew jî xizmeta xwe bi me bide kirin. Kapîtalîstekî bi aqil, rêwiyê kapîtalîzmê yê di nav me de bila vê bike. Hûn di kêleka vê re jî naçin.

Weke ku min got rêzdariyeke cemaetên klanên hov heye. Ya me ew jî nîne. Bêguman dikare bi wehşîbûna dijmin ve bê ravekirin. Zilam niha lê dide, em nebêjin kapîtalîzm û derbas nebin. Nêzîkatiyên faşîst ên kapîtalîzmê mirovan har dike. Ji xwe herkes matmayî ye yan jî matmayîbûneke mezin derbas dike.

Vaye em vê rave dikin. Ez nabêjim bi zanebûn hûn wisa ne û we tawanbar nakim, dijmin ev kiriye. Şêwaza lêdana dijmin hûn parçe parçe kirine. Çawa ku mirovek di meydanek şer de yan jî di meydana boksê de li ser hev kulman dixwe û dihilkume, ger careke din neyê ser xwe, dibe ku dijmin ji vê xiraptir jî em hejandine. Bi fikirin mirovekî li ser hev kulman bixwe dikare bifikire, dikare xwe kom bike? Dibe ku em hinekî jî rewşeke wiha dijîn.

Nehatina we ya dîsîplînê, nehatina we ya pergalê, em devjê berdin bûna damezrînerên leşkerî, siyasî, ji bûna grûbeke civakî aciziya we, ji bo we bi taybet encax dikare bi darbeyên cur bi cur ên dijmin bên ravekirin. Ev aliyekî kare, yanî ji ber ku dijmin wiha li min dide ez xwe weke we belav nakim. Nagirîm, li xwe nadim. Jixwe egîdî, şerkerî jî di vir de derdikeve pêşberî me. Li beramberî lêdanên wisa hûn dikarin li ber xwe bidin, biparêzin, ger gengaz be hûn dikarin derbasî pêngava dijber bibin? Vaye wê demê hûn şerkerin, gêrîla ne, egîdin. Yê ku vê li ber çav negire, xwe negihîne vê rewşê xwe nezane, herwiha ewqas giran bi ser we de hatina me jî tê fêmkirin.

Li gorî min di asteke metirsîdar de hûn xwe nezaniyê dijîn. Her roj ji ber vê şêt dibim. Dijmin ji aliyê civakî ve çiqas belav kiriye û em ê çawa asteng bikin? Em vê dersê ji bo vê dibînin, divê ku bê dîtin jî. Ji nîqaşê re vedikim. Me pirsgirêk eşkere danî holê yan jî ji nîqaşê em natirsin. Madem dijmin em xistine rewşeke ji ya heywanan jî xiraptir, madem em jî di mirovbûnê de bi biryarin, dibêjin dev ji mirovên xwe bernadin, wê demê em ê nîqaşên xwe yên bê aman herî kêm em dikarin bi derfetên nîqaşên azad fêm bikin. Ne şerme, dijmin kiriye, hemû tişt aniye serê we.

Dijmine, faşîste, her roj dibêje; “*Ez ê xalis muxlîs wan bikim Tirk.*” Turkêş rojane diqîre û di demên dawî de di astek zêde de vê pêk tîne û dibêje; “*Xalis muxlîs ez ê bikim Tirk, hem jî Tirkê faşist.*” Wê çawa me bike Tirkên faşîst? Wê çiqasî bibîne, çiqasî

bigire û bihelîne? Kemalîstan ewqas kir. Turkêş wê bikaribe çiqasî bike? M. Kemal bîst-sî salî lêda, şikand. Ebdûlhemîdê wan heye, Yawûz Sûltan Selîm heye, ji wê jî wêdetir heye, em yên din nahesibînin. Turkêş faşist bû, dixwaze temam bike. Mustefa Kemal şoreşgerek bû, heta hinek bi teretûrên şoreşgerên demokrat ên pêşverû re jî nirxandin. Ewqas lê da. Em baş dizanin ku çiqasî lê da, çiqas bi erdê re kir yek. Ger şoreşger û pêşverûyê wan wisa ne, gelo faşîstên wan dê çawa bin?

Niha rêbazê xebata wan tîmên kujer ên dijwar bînin berçavên xwe, hinek rêbazên ku li beramberî yên direvînin kar tînin wê sibê bi gelemperî bikin. Hûn van mijaran jî sivik digirin dest. Dema faşîzma nû bi 12'ê Îlonê re despê kir û çend serokên wê hene, dewrî hev dikin. Çar Serfermandarên Giştî, pênc-deh heb Serok Wezîr, bi qasî wan jî wezîrên derve û hundir hene. Beriya her tiştî hûn ê dijmin fêm bikin, hûn ê Rêveberiya dijmin fêm bikin. Naşibe Sûltan Ebdûlhemîd. Ebdûlhemîd niyaz baş bû, em bêjin hinekî jî bi rehim bû. Dibe ku Yawûz Sûltan Selîm hinekî din jî ji wî bi rehimtir bû. Ji hinek beg û eşîretên Kurdan re dikarî bû bêje; " *Hûn serbestin, çawa dixwazin dikarin wisa bijîn."* Li gorî serdema M. Kemal qala hinek aliyên wî yên demokrat tê kirin. Lê ji bo me çi bû?

KT, di dema hilweşîna xwe de yan jî dibe ku weke dewleta herî zêde derveyî serdemê maye, niha bi meyla faşîst ya herî zêde rasger û dirizînê ve rasterast bi ser me de tê. Jixwe hemû gund hatine valakirin. Ez ne di wê baweriyê de me ku ew gundî giştibin asta têgîştinê. Tenê ji ber ku bûne sîxûr. Reben nizane sixuriyê jî bike, Kurdek li çiya maye! Despêkê dixwaze wî bihejîne. Ji bo ku bêje dewlet ev e, tirseke mezin berdide dilê wan. Ji xwe birçî dihêle. Mîna kuçikên Pavlov bi dengê zengilekî av bi devê wan dikeve û ji bo sîxûriyê ber bi van ve baz dide. Dixwaze wan bîne vê rewşê.

Ev gund hemû ne PKK'yî ne. Ez ne di wê baweriyê de me ku zêde ji cîhanê jî fêm dikin. Lê pêngava faşizan dixwaze wan daqurtîne, ji bona vê lê dide, birçî dihêle û dixwaze bi dengê çend zengilan ve bi xwe ve bide girêdan. Rewş ev e û pêvajoyeke heywankirina metirsîdîare! Her kes bê çareye û dibêje; "*Ev çiye hat serê me.*" Ya rastî jî tiştek din jî nabêjin. Rewşeke ji çar hezar sal berê xiraptir heye. Camêr li çiyayê xwe, li gundê xwe hinekî din mirov bû, azad bû, ew jî ji dest diçe. Pêngava faşîst vê dike.

Bêguman yek ji sedemên vê ya esasî jî pêngava me ya şoreşgerî ye. Xeteriya pêngava şoreşgerî dizane. Jixwe wî xwe gihandiye gundiyê li serê çiya, em Kurdê çar hezar sal berê digirin, ber bi civaka herî azad a cîhanê ya pêşverû ve dikişînin. Jixwe kapîtalîzm jî ji vê ditirse. Ez li nirxandinên rojane dinêrim; bi van aliyên xwe ve kapîtalîzm dibêje, *"Gelo ev tevgera şoreşger wê mirovan ber bi kuve bibe, mirovê Kurd ber bi kîderê ve bibe, mirovê Rojhilata Navîn ber bi kîderê ve bibe."* Dixwaze paşverûtiya Rojhilata Navîn rake ser piyan. Ew bi xwe gelek baldare. Li gorî gotinên wan dibêjin, sê-pênc sîxûrên xwe şandine û wisa hewl didin fêm bikin. Almanya dibêje; "*Zilamê herî xeternake."* Fransa, Emerîka ji hev xiraptirin û dibêjin; *"Divê demeke zûtir bê fetisandin."* Ji bo ev xeterî di demên pêş de li wan venegere di Rojhilata Navîn de paşverûtî bilind dikin. Bi hev re tevdîran digirin.

Tevgera şoreşgerî, li beramberî heywantiyeke wiha ya mezin, bi tevgereke mirovî ya mezin bersiv dayîne. Jixwe îro ji bo vê dibêjim; "*Îro tevgera PKK'ê tevgereke mirovî ya mezine, li dijberî heywanîkirina emperyalîst û paşverû, talanker, hemû pêkanînên dij mirovî, tevgera xwe parastina mirov û azadkirinê ye"* û ev jî raste.

Ji bo vê çima dijmin me berfirehtir ji civakbûnê derdixe? Jixwe wisa siyasî, leşkerî bûyîn mijara darvekirinê ye. Di rastiya Kurd de siyasî, bîrdozîbûyîn, civakîbûyîn, heta çandîbûyîn mijara

darvekirinê ye, mirine. Destûra bingehîn a Tirkan ji xwe hukmê xwe wisa daye. Ez wê nabêjim, ji xwe me gotibû. Ger tu naxwazî serê xwe radestî yê ji bo xwe ber bi darvekirinê ye bikî, yan jî tu naxwazî ji ferman wisa re sûtyê xwe dirêj bikî û bidî jêkirin, me got hûn ê li ber xwe bidin. Rastiya di eniya siyasî, leşkerî û bîrdozî de ev e.

Niha eniya civakî hinekî cuda ye. Çiye eniya civakî? Li serê çiya gunde, kombûnên bajaran ya ser heve. Nikarin ji van hemûyan bi van zagonên tên zanîn ve darve bikin. Yan jî weke ku di zagonan de tê îfadekirin nikarin hukmê darvekirinê lê bibirin, darvekirinek hîn cudatir pêwîst dike. Ev, di zagon û makezagonan de zêde nayê dîtin. Çiye ev? Ji rastiya civakbûnê derxistin û dibe ku darvekirina herî giran jî ev be. Ger tu kesekî îdîam bikî, berteka wî bi wî re, bi malbata wî re sînordar dimîne. Lê dema ku te ji bo belavkirina van avahiyan fermana belavkirinê derxist, dibe ku ew civak di cîhanê de bibe civaka herî bextreş û ev jî em in.

Ez ne bawerim di dîrokê de ewqas rastiyeke civakî bi pîlanên linavbirinê hatibe pêşxistin. Yên ku Hîtler anîye serê Yahûdiyan sînordare. Dîsa ji aliyê nijada spî ve li ser nijadên reş tên pêkanîn jî sînordarin û di encam de îro ev hatiye derbaskirin. Lê ya ku ji aliyê faşîzma Tirk û Kemalîzmê ve tên pêkanîn, hem pir veşartîne, hem jî li ser esasê mirinê disepînin. Di dîrokê de mînaka vê nîne û yekane ye.

Hûn dixwazin xwe çawa nas bikin, hûn neçarin rastiya pêkanîneke wiha jî fêm bikin. Ger ne raste, em nîqaş bikin. Çima hûn nikarin şerekî berfireh bimeşînin? Ji ber ku hûn di naskirina rastiya xwe de gelek tengin, seranserin, dibe ku îdîaya we nîne, dibe ku hûn ditirsin, dibe ku hûn xwe bi çavên dijmin dinirxînin. Ya rast jî ev e. Bi qasî ku hûn dibînin hûn ê bi çavê dijmin bibînin, lê berçavka din, berçavka kabîle-klanên paşketî ye. Ya li

pişt mayî jî hûn ê bi vê bibînin. Rastiya ku her du berçavk jî nîşanî we bide rastiyên kujerin, rastiyên nayên jiyînin.

Hûn dibêjin em mirovin; ez ê dubare bêjim, taybetmendiyeke min a taybet heye; ji zarokatiya xwe ve min xwe zilam hesab nekir. Hesabnekirina min rast bû û heta niha jî dewam dike. Li gorî ku pergal fêm dike yan jî weke ku kesên din dixwazin bibînin, yan jî weke ku civaka me ya paşketî hêjayî xwe dibîne zilambûna min bi xwe, ne da xwarin û ev jî taybetmendiyeke min a girînge. Kemasiya we û ya hemû civakê çavkaniya xwe ji kîderê digire? Cilê ku dijmin li bejna we tîne, ruhê ku bi we vedike, bi hemû curên ku şayanî we dîtiye ji we re kiriye mal, bi rewşa xwe ya nehatiye ecibandin ve hûn wisa dizanin ma hûn ê bikaribin bi vî halê xwe ve bijîn. Bûyera xefleta mezin ev e. Ev hemû pêşwext fêmkirina min bi dicîh de bû. Xwe nexistina nava xefleteke wisa, başiya herî başe ku ez ê li xwe bikim. Lê hûn hêjî dikarin ji vê xefletê xwe rizgar bikin? Nakokiya we ya sereke jî di vir de ye.

Tevî ku hûn ne zilamin we xwe zilam hesab kir. Bawerim gelek meylên we yên din jî hene. Ev hîn ji heft saliyê ve bi we dane pejirandin. Şansê min; hem asta malbatê, hemû curên serdestiyê hîn ji despêkê ve li ser min bi asanî ferznekirina wan û yên ku ferzkirin hêza min a lêpirsînê, sedema sereke ya derketin û pêşketina min e. Ez bawerim hîn di temenê gelekî biçûk de dema ku we gava yekem avêt nava civakbûnê, di himêza dayikê de, mîna bebekekî hatin avêt û hûn bi wêjeya; “ *Lorî kurê min lorî, wisa xweşik raze, kurê min dê mezin bibe, bibe paşa”* ve hatine mezinkirin. Qezenckirina ecibandina dijmin, li gorî pêwîstiya pîvanên klan-kabîle tevgerîn, qet pirs nekirin, pêwîstiya lêpirsînê nedîtin, her ku diçe ev tîrkirin, weke hestî hişkirin, li ser vî esasî ketina nav PKK’ê û bi rêberekî weke me re xwe qiyaskirin; di encamê de, pevçûn û nakokiyên di navbera me û we de ne. Pergal û hovîtî hûn anîne vê astê.

Ez evqas cuda me. Heta niha jî ev şerekî xedare. Niha ev şer gihiştiye gelek astan, gihiştiye qonaxa netewî. Ez jî bi taybet wî şerî pêşve dibim. Hem di nav PKK'ê de, hem di nav tevgera netewî de, hem jî her ku diçe hîn zêdetir ber bi Tirkiyê ve dibim û hewl didim berfireh bikim. Îdîa ev e; nekarîn min bikin zilamek ku dixwestin, lê ez ê xwe bigihînim rewşa zilamekî çawa? Xwe gihandina asta zilambûna min, bi Partiyê re despê dike, dibe civakek û mirovatiyek. Têkoşînek, pevçûneke wisa ye ev. Ya rast jî ev e. Ji ber ku bi şêweyek din dibe xwe înkarkirin.

Ger derfetên min ên civakî xweser, û pêşketî hebûna, pêşketina asta çînî, pîrozbahiyên çand-huner, yên ku alikarî kiriban hebûna, dibe ku min jî bi vî rêbazî derfetê pêşketina xwe nedîtiba. Ez kîme ku di temenekî biçûk de xwe bi vî rengî pêk tînim. Ji ber ku rastî derfeta vê pêşkêşî min dike. Dema ku tehlîla rêbertiyê tê kirin, bawerim ev jî hinek nîşaneyan dide. Dema ku ez xwe dinirxînim, di vê baweriyê de me ku ev dibe ravekirineke hîn rastir. Bi guman li asta civakî ya heyî nerîn û bi bertek pêşwazîkirin ya raste. Ji ber ku di asteke mezin de xizmet ji dijmin re dike û ya ku xwe bi xwe jiyan nake, asta ku îxanetê li xwe dike ye.

Çima di salên derketina me de min bertek raber kir? Gelek balkêşe, dema ku hîn min hewl dida hevalên xwe yên despêkê bibînim, ez neçar mam ku di serî de malbat û bi hemû civaka wê rojê ya gund re bikevin nava nakokiyê. Niha di heftsaliya xwe de dema ku min dest bi naskirina xwe kir, hilbijartina hevalekî xwe yê zaroktiyê ez bawerim dibe daxwaza herî rewa. Ez bawerim divê de ti xirabî nîne. Pîvanên wê yên li gorî xwe çine? Dibezim, dipekim lîstokên zarokatiyê dilîzim, li ser çiya dilîzîm, li ser çîmenê dilîzim, malbata wî kiye, asta wî ya civakî çiqas pêşketiye, ez ê zêde li vê nenêrim û kî li gorî min xwe rêxistin bike ez ê wî ji xwe re bikim heval. Yê ku zarokatiya min herî baş

bi min re parve bike kîbe, ez ê bi wî re bikevim lêgerina hevaltiyê û ya ku dikim jî ev e.

Ya herî xwezayî û diviya bû bê kirin min kir. Encam; min dît ku bi malbatê re dikevim nav nakokiyan, min îlegalîte hilbijart. Hîn di heft saliya xwe de îlegal tevgerîn, yanî ji malbat û civaka gund bi dizî tevgerîn. Bifikirin, hîn di temenekî ewqas biçûk de pêdivî bi veşartinê dîtin heye. Tê bîra min, pêwendiyên xwe bi tevdîr hilbijartin û domandin, lê li ser esasê nihînibûnê çêdibe.

Ger em bifikirin ev ji bo çî ye? Ji bo azadîya kes bi xwe ye. Ji bo karanîna mafê hilbijartina hevalên xwe û dev ji vê neberdanê ye. Ya rast mafê kesekesî ne mafekî civakî ye jî. Ger bal bê dayîn ev pêşketineke girînge. Ji ber ku qûralên bi cîh bûyî vê qebûl nakin. Di mercên me de malbat çiqas bi bandore em dizanin. Hukmên klan-kabîleyan gelek derbasdarin. Kes jî gelek lewaz bû. Di zarokatiyê de ji heft salî misoger li gorî pêwendiyên malbatê girtin û mezinkirin heye. Bersiva me ji vê re cuda nebe jî, mîna ku “*Ez ya dizanim bikim”* bersiv dibîne û ferqa xwe datîne holê. Piştî wê êdî gav bi gav pêş ket. Hemû qûralên civakî, bawerî, her ku çû bîrdozî, meylên siyasî û Partî wisa bûn. Min hezar cure rêbazê jiyanê wisa lêpirsîn kir. Li gorî min çiqas guncawe, yan ne guncawe? Li safokê dayînê re anîna rewşa meşa jiyanê, rêbaza pêkhatina me ye. Ger hûn bal bidinê ev hêjî didome.

Em bi we re jî dixwazin pêwendiyeke azad înşa bikin, lê astengî hene. Di serî de jî astengiyên ku çavkaniya xwe ji we digirin, astengiyên ku nayên azadiyê ne. Ji jiyana azad re ji zûve kî, dîwarên çawa lêkirine, bendavên ku avakirine hene ku, em nikarin enerjiya we bigirin. Bi enerjiya xwe ya di gola rawestiyayî de jî em nikarin bi we pêngavekê bidin kirin. “*Kê girtiye, çawa girtine*” divê hûn ji xwe pirs bikin. Hûn nikarin hevaltiyeke ji rêzê jî bikin? Ger hûn bikin jî, hûn ê roja dûwem xwe radest bikin. Di hevaltiyê de radestî nîne. Ez herdûkan dibînim, yek nakim, ger bikim jî ez ê radest bibim.

Ez bawerim hûn waneyeke şêrîn dibînin; waneya malbatê! Saziya ku misoger radestî têde tê wajokirine. Di nava me de bi taybet zemînê ku bi salan radestiya dewletê xwe jê xwedî kiriye. Di navê de hemû curên xwe valaderxistinê, dibistana xwe xilaskirinê, dibistana malbatê ye! Tê bîra min ku bi van aliyan ve min guman jê dikir. Min gumana ku ger zû bi ecibînim û li gorî wê tevbigerim ez ê bêm daqurtandin dijiya. Ev jî pirsgirêkek me ya pir girînge ku bi me re dibe alîkare. Ji civakîbûnê xwe paş nadim, malbatê înkar nakim, lê bi vî rengî, bi vê bêhêziyê, bi vê bêçaretiyê ve weke xeteriyeke mezin dibînim. Niha baştir tê fêm kirin ku ev jî nêzîkatiyek û nirxandineke bi îsabete.

Pir ecêbe, dûçariyên me yên nû pêgiştî hene. Dema ku em nû derketin dijmin jî ji malbatan, dê-bavan re bangewaziyeke wisa diweşand, despêke digot; "*Li zarokên xwe xwedî derkevin"*, paşê gotin; "*Xwedî li malbatên xwe xwedî derbikevin*" niha jî dibêjin; "*Li hemû civaka xwe xwedî derkevin."* Dîsa di nava me de hinek tîpên ecêb derdikevin hene, yên herî nêzîkî me jî di nav de dibêjin; *"Min pir bêriya dayika xwe kiriye"* yek jî dibêje; "*xwuşka min a berê li kîderê ma? Jina min li kîderê ma?"* Ev hemû li hember min tên gotin. Ez ji wan re dibêjim; "ev kîne?" Yên ku dest bi hewldanên provakatîf kirine. Demên borî dikevin bîra min, têkîliyên ku kêrî ti pêwendiyê nayêne, ev jî pêşketinek balkêşe! Encama rêbaza min bi van re rê li ber teqîneke wisa vedikê ye. Weke ku vana ne kesên ku berê hev nas dikine. Weke ku ne malbat, kabîle, ahbap-çawîş, xwişk û bira ne, li min dinêrin û hevdû hemêz dikin.

Dijmin jî wisa ye. Tirkîtî niha rêbaza herî mezin a hemêzkirinê çawa pêş dixe? Li dijberî min dibêjin; *"APO, dê wisa me tine bike"* û hemû hevdû hemêz dikin. Ez tenê kesek im, ez ê çawa Tirkîtiyê tine bikim? Turkeş bang dike û dibêje; "*Wê me tine bike"* û dide bawerkirin jî. Niha bi sed hezaran her roj di kolanan de didin meşandin. Bi wan didin gotin û dibêjin; "*APO wisa*

*kujere, wisa bêbexte, ji tirkan zêdetir dostê tirkan nîne, heta ji we tê hevûdû hemêz bikin."* Di nava me de jî hema wisa ye. Ew jî şêwaza wan e.

Dijmin li me dinere û pêwîstiya pêşketinê dibîne. Di rojekê de hezar carî wêjeya; " *Yekîtî, hevgirtinê"* dike. Ew dijmine dê bike. Li min dinêre xulek bi xulek vê dike. Ev polîtîkaya har ditirsîne. Ez ne weke we me, ger ez vî dijminî bigrim ez ê jê re bêjim; "*Tu çima wisa dikî?"* Jixwe ew dizane rêxistinkirina min a jiyanê tevgera tolhildanê ye. Te çawa wisa rêxistin kir û te çima wisa kir? Sûcê xwe dizane, ji bo wê pêdigihîne. Gotina wan ya ku dibêjin; "*Tirk biheje û li xwe vegere"* ji ber vê ye. Tawanbarê mezine û ew jî li aliyê dijber xwe wisa birêxistin dike, kûr dike.

Bi netewperestiyek metirsîdîar, bi faşîzma herî baş re kedkarê xwe jî ewqas xistiye bin serdestiye bîrdozî ku, kiriye meymûn, ji birçîbûn, bêkarî niha li Tirkiyê weke ku di ti derên cîhanê de nayê dîtin rewşeke xirab tê jiyîn. Civakên herî paşverû yên Efrîqa jî ji polîtîkayên zextê yên niha heyî re mîsoger nikarin li ber xwe bidin. Mînak; ji sedî pênc bilindbûna nirxê tiştan dikare Nîjerya rake ser piyan. Li Tirkiyê ne salê carekê her roj, tenê ne bilindbûna nirxê tiştan eşkere talan tê jiyankirin! Her roj mijara gendeliyê heye. Jixwe ew bi xwe her roj dikin.

Çend roj beriya niha min di TV de gohdar dikir, pêşengekî siyasî yê ku digot; "*Ey gelê min"* ji xwe êdî rastgir û çepgirê wan ferq nake hemû jî dibêjin; *"Zedetir werin xapandin, bila hişê we bê serê we."* Bi vî rengî bang li gelê xwe dike. Pir balkêşe. Jêre dibêje; "*Tu gelekî ewqas hatiye xapandinî."* Ez dikarim navê wî jî bidim, zêde mezin nakim. Ji wan re dibêje; "*çima hêjî hişê we nayê serê we."* Raste, lê tiştekî ne rast jî heye; kî ev gel xiste wî halî? Dibe faşîst be, lê zilam mane te ev gel xistiye vê rewşê! Di navbera faşîstan de pevçûna gruban heye, dixwaze ji grubekê derbazî ya din bibe û rastiyê jî di vê xalê de dibêje. Di Rêveberiya

Tirkiyê de gelek grub hene. Dixwazin gel li dijberî hev sor bikin. Lê gel ewqas hatiye xapandin ku êdî hal tê de nemaye.

Di demên borî de bi rêbazên serdema navîn bi zincîran gire didan, bi singan ve diçikandin. Niha gelê Tirkiyê ji serdema navîn zêdetir ji aliyê begên xwe ve bi singan ve hatine girêdan. Ev gotina gelê me ye. Rewşa gelê me weke ku min vegotiye. Çima wisa dike gruba faşîst, gruba rêveber? Vana bi hezaran sale yan jî herî kêm li ser me rejîmeke hezar sale mirovan nas nekiriye li ser me pêk tînin. Niha jî hesabên wan tên xwestin.

Di rojên dawî de dibêje; "*Yan ez ê tine bikim, yan tine bikin.*" Vala vala nabêje; "*Ez ê tine bikim.*" Bidawîkirina hukmê dîrokî yê hezar sala ye, bi hewldaneke dawî ve encam dayîne. Hukmê "*Yan em ê xilas bikin*" lîstoka dawî ya hukmê hezaran sale, encama kulma kujer a lêdanêye. Divê ku wisa bê fêmkirin û heta niha jî rojane dixwaze lêde, ev jî ji aliyê hemû kesî ve tê dîtin. Demeke pir dirêj bê berxwedan tê pêşwazîkirin. Mar digire, dadiqurtîne û dihelîne. Hûn tevgera me dizanin, tevgera ji devê mar kevir girtinê ye. Ger daqurtîne jî tevgerek wisa ye nikare bihelîne. Me wisa despêkir û em ji kevirbûnê derketin. Em niha vediguherin darê li serî dide, an jî bûn pêşî, dikevin difnê, dikevin çav û gêj dikin. Em her roj ji cihekî ve lê didin. Di vê watê de dibe tevgereke berxwedanê.

Şerekî gelek wehşî mijara gotinê ye. Wekî din nirxandina şer nayê kirin. Mêtîngeriyeke Fransiz heye, gelek medenî ye, -di wateya dipejirînim de nabêjim- dîsa ya Îngîlîzan heye, heta mêtîngeriya Emerîka heye –dîsa di wateya dipejirînim de nabêjim- di wateya dijminê ku em pê re rû bi rûne berawirdkirinê de mêtingeriyeke bêje; *" Maç ke û bi de ser serê xwe"* ye. Kemalîzm, niha pîlana ji aliyê faşîzmê ve ji bo linavbirina civakê hatî amadekirine. Ji bo Hîtler dibêjin ku nijadkujî pêk anî. Di dîrokê de hinek sepanên wisa hene, lê ti ji wan naşibin ya ku em niha dijîn.

Piştî ku me ev rastî baş tesbît kir û şûnde em ê bikaribin baş xwe fêm bikin. Tenê di asta bîrdozî, siyasî, leşkerî de pêşketineke me heye. Wê jî tine dike, lê dide, dikuje, darve dike. Pirsgirêk ne ev e. Ev hertim wisa dibe. Lê ji vê jî wêdetir di binê vê de qadeke me ya civakî heye ku, zimanê me, çanda me ye, malbate, hinek fêrbûnên jiyanî ne, linavbirina herî xirabkar li ser van tê pêkanîn. Dibe ku ev di zagonan de nebe, jixwe nabe ku bibe mijara zagonê jî, lê weke sepanekê teoriya faşîzane. Weke linavbirinek faşîst, pîlanek linavbirina civakî metirsîdîare. Ya herî girîng jî mirovê tinebûyî ya ku vê rê jê re vekiriye.

Em Kemalîzm û Osmankarî binirxînin. Osmankarî anî heta kîderê? Kemalîzm dewr girt, anî kîderê? Di salên dawî de, faşîzma herî xeter yan jî faşîzma serdema hilweşîna komarê, faşîzma serdema rizînê dixwaze bigire û ber bi kîderê ve bibe? We çiqas ji bo xwe kir? Ey ciwan no, ez çima ewqas bi we re di nava pevçûnê de me? Ji ber ku ev dibistana faşîzmê xwend. Ji sedî sed gunehkar û gelek tiştên jiyanê we ji xwe re weke taybetmendî pejirand. Ne civakbûn, ger gelê Tirk dike meymûn, ji ber ku em şibandine cureyek heywanekî pir cuda, hûn cuda bûn. Ez dikarim îdîaya xwe ispat bikim.

Ti asteke we ya civakî nîne, hûn ê çawa bikaribin malbatê ava bikin? Ez ne di wê baweriyê de me ku hûn bikaribin di asta civaka seretayî de jî bijîn. Ez ji bo hinek grûban dibêjim grûbên klan-kabîleyan, lê ji vê jî şûndetirin. Ji ber ku em di çarîka dawî ya sedsala 20’an de dijîn, bila kes xwe ne xapîne. Bi giştî emperyalîzmê heywanbûn ferz kiriye. Tenê ez vê nabêjim. Herkes qala texrîbkirina xweza, qirêjiya hawirdor û penceşêra civakî dike. Ji bo vê di sedsala 20’an de mirovatî wisa pêş ketiye divê ku mirov xwe ber bi bayê xapînok ê emparyalîzmê ve bernede. Hema bêje di demeke nêz de di sedsala 20’an de mirovatî ger li derdora van pirsgirêkên ku ez qala wan dikim

çareseriyê pêş nexe, zanyar dibêjin dê xeteriya herî mezin bê jiyîn û dê pirsgirêk derkevin holê.

Ez nirxandina heywantiyek bi vî şêweyî yan jî nirxandina felaketa mirovahiyê pêwîst nabînim. Ev mijrake cuda ye, dikare bê nîqaşkirin jî. Niha ji bo me nesotînere. Ya me heywantiyeke cudatire. Em hewl didin vê bidin nasîn. Di vê heywankirinê de tê li şêwaza dijmin binêre, li teşegirtina xwe wisa binêre û fêm bike. Dîsa di asta herî pêş de li ber xwe nedayîn yanî radestbûnê bi lihevkirina pergalê re negire dest, bi hemû saziyên dijmin ên rasterast û ne rasterast re lihev neke û heta xweziya xwe bi wan neyne.

Jibîrnekin ku, ji bo hûn bikin memûr ti cil û bergê we li ber xwe nekirî û neşibandiyê nemaye. Her tişt li gorî dijmin hatiye eyarkirin; em ji karanîna zimanê xwe bigirin heta lixwekirinê, jiyan, seetên xwe eyarkirinê hemû li gorî dijminin û li ser esasê dijbertiya xwe ye. Hîn dest bi dibistana seretayî dikin nakin, sibê û êvarê tê welatê xwe înkar bike û sond bixwî. Tê sibê, nîvro, êvarê bi vê sondê werî mala xwe, tê heman paşverûtiyê wisa vexwî. Tê derfetê karek herî biçûk jî li ser esasê xiyanetê bibînî? Ber bi kîderê ve, ev dînîti wê we ber bi kîderê ve bibe? Ev faşîzm di vê cîhanê de xwe di kîderê de bi cîh dike, wê we bixe kîderê? Niha ev Tirkîtî, tevî hemû xulamtî, libergerandinê Emerîka û Ewrûpa jî bê nirx dibîne, ranake. “*Senteza tirk-îslam”* Ereb jî bê nirx dibînin. Wê kî vê tirkitiyê bikire? Ev Tirk nikare xwe li ti derê bide firotin.

Ev tirkîtiya di destê faşîzmê de ye! Ya din jî ev Kurditiya di destê vê Tirkîtiyê de wê çi li xwe bike? Kurdîtiya di destê vê Tirkîtiyê de û hûn ê xwe çawa bijîn, çawa bifiroşin? Hêjî tê bîra min; bi hezaran gundî li ber deriyê dewletê, li ber deriyê bajaran, şarewaniyan ji bo dergevaniyê ji serê sibê heta êvarê disekinîn. Ma pasavan çiye, ev jî kare? Ketine vî halî. Dema ku tu bûyî memûrekî biçûk, cîhan dibe ya te, hem jî memûriya xiyanetê.

Niha ev kar ji deh hezaran yek kesî re nabe qismet. Ma karê xiyanetê ewqas rewa ye? Ev ne dînîtiye, çiye?

Divê ku hûn hinekî hişyar bin. Wîjdanê we pêşkeve. Ger heye îdîayeke we ya mirovî, dibê ku êdî hûn xwe hişyar bikin û bînin ziman. Di vê de jî nebêjin; “*Zêde bi ser me de newe.”* Ger heye îdîayeke we hinekî jî tiştên ku we jiyan kirine bînin ziman. Çima hûn pirsgirêkên sosret li ser min ferz dikin. Pêwîst nake hûn bêjin; “ *ez xwîşka xwe dixwazim, ez mêrê xwe û jina xwe dixwazim, min bêriya hemêza dayika xwe kiriye, min bêriya pergalê kiriye.”* Jixwe hewce nake hûn bêjin, ez li tevger û rewşa we dinêrim û dizanim çi dixwazin û hêviyê nabînim. Yanî we terkî hemêzan kirin ji bo min asane. Dibe ku ji we rizgarbûn ji bo min rizgarbûn be jî, lê tiştek di hundirê min de heye? Bi rastî jî dikare rizgariyê bîne? Biçin wê ti kes we hemêz nake. Ji ber ku westiya ye, ji hal ketiye. Hemû ji we xiraptirin. Yên herî saxlem hûn in, hûn ê rastiyan bibînin.

Bi ketina nava hinek xeyalên berê, bêrîkirinan henekê xwe bi rastiyan nekin û ser rastiyên xwe negirin. Ji ber ku dervî rastîbûnê kesayet ji mirinê xiraptir dike. Bila rêzdariya we ji we re li ser esasê wate dayîna rastiyan be. Pêşketin jî wisa despê dike. Ev tiştên ku tên gotin hemû tên çi wateyê? Em çawa bi civakî bin? Tê gotin mirov, mirov heywanekî civakî ye. Anjî şêweya heywanê herî civakbûyî mirove. Ev ji me tê girtin, civakbûna me tê parçekirin yan jî civakbûna heyî tê xwestin ji hemû aliyan ve di nava dijmin de bê helandin, ji hemû aliyan ve jî li beramberî dijminê xwe teşe bigire. Ew dixwazin me bigirin, ji hemû aliyan ve şêwaza jiyan û mezinkirina we wisa ye.

Tevgera berxwedaniya PKK’ê li beramberî vê, li şûna vê dixwaze civakbûna xwe pêş bixe. Civakbûna çi? Civakbûneke li şûna bîrdoziya dijmin a, siyaset, linavbirina leşkerî û hem jî ji li navbirina çandî, siyasî dûr, li beramberî vê yê ku êdî li ber xwe dide, bi vîna xwe ava dike pêş bixe. Ez jî vê zêde venakim yan jî

bi xetên giştî ve em vedikin. Welatekî wisa, gelekî wisa azad, civakeke wisa demogojîk, pêwendiyên wisa azad û hwd bi xetên giştî rave dikim. Ger tam me xwe azad kiriba, me yê gotiba sazbûnek wisa ya aborî, sazibûnek wisa ya civakî, yan jî sazîbûnek me ya wisa ya siyasî. Ji xwe armancên me jî hene.

Ger hûn bal bidinê, di bernameya me ya Partiyê de qala înşayeke wisa ya aborî tê kirin. Ji vêna re tê gotin; ji bo pêşketina kesekes bi şêwaza herî berhemdar ku bikaribe bersiv jê re bide aboriyeke raya giştî yan jî aboriya civakî. Hinek jî dibêjin vesaziyên sosyalîst. Hûn çi jê re bibêjin bêjin, ji bo kesekes ya herî bi berhem, li dijberê yên din nîne, ne zext û mêtîngerî, ya ku keda wî li ber çav derbaz dike, lê saziya civakê jî bi kesekes nade eciqandin û teşegirtina civakî, siyasî ya ku li ser tê înşakirine. Di wateya siyasî de demokrasî, di qada civakî de pêkanîna hemû cure pêwendiyên azad û pêşketineke çandî ya moral pêşbînî tê kirin.

Vana bernameya Partiyê ne. Ya herî girîng jî, em bernamê li aliyekî nehêlin. Ji bo bernamê şerekî mezin pêwîste. Em niha kîjan rêgeza Partiyê kar tînin, kîjan digrin dest? Li gorî min rêgezeke taktîkiye, ew jî bi têkoşînê tê qezenckirin. Bernama Partiyê dibêje ku, ev armanc hemû encax bi şerê gel tên qezenckirin. Di bernamê de rêgezeke pêwîstiya têkoşînê heye. Em tenê ji bo gihiştina armancê têkoşîn dikin. Wekî din ti rêya pêşketinê ya din nîne. Rêya pêşketineke asan em li milekî bihêlin, ji bilî linavbirinê ti rê nînin, nemaze têkoşîn dibe bijareya yekem.

Ev ji bo qada civakî jî derbasdare. Dibe ku hûn bêjin; “*têkoşîna bîrdozî, leşkerî, siyasî temam, ev têkoşîna civakî ji kîderê derket?”* Ji berk u têkoşîna civakî ji ber ku bi darvekirina herî xeter re rû bi rû maye, dibe têkoşîna divê ku herî bi şîdet bê meşandin. Êrîşên dijmin ên pir berfireh hene, ji heft salî destpê dike û heta şel û şehtbûnê dibe. Ya rast ev e û me ev jî derbas kir. Di vê wateyê de azadkirina we, ez bawerim bingeha azadkirina

çêkera herî jore jî. Divê ku mirov we di vê qadê de jî azad bike û di vê qadê de têkoşînê têkoşînê bimeşîne. Heta ku ev têkoşîn neyê dayîn ez ne bawerim hûn ji aliyê siyasî, bîrdozî û leşkerî ve pêşkevin.

Yên ku nizanibin waneya yekem a civakbûnê bibînin, ji bo çi civakbûn, civakbûneke çawa, jiyaneke cemaetî ya çawa, heta jiyaneke grûbî ya çawa ser nexin, ez bawerim dê nikaribin ya ku rêxistineke pir pêşketiye, rêxistinkirina bîrdozî, siyasî û leşkerî ser bixin. Jixwe sernexistina wan jî di holê de ye. Wê demê, waneya civakî waneyeke jiyanî ye. Ev wane hem ji aliyê teorîk ve fêmkirin, hem jî divê pratîka wê bê jiyîn. Bifikirin, nêzîkatiyên we ji min re zêde ne siyasî û leşkerî ne, ev vekiriye.

Ez dibêjim dikare pergala civakî bijî. Çiye pergala civakî? Ez bawerim zêde ne zehmete. Em dikarin weke rêzdarî, xweşbînî, hatina jiyanê ku tabîr dikin qûralên me yên leşkerî hene. Yê ku ji dijmin re xizmet nake, ji paşverûtiyê re nabe amûr, şêwaza jiyaneke nêzîkatiyên xwe yên rojane pêk tîne gengaze. Hûn van pêk nayînin. Di pêwendiyên we de rêzdarî, hezkirin, moral, çoş, feraset, fêmkirin, nirx îfadekirin gelek lewaze. Yanî bil bidinê, piraniya wan mîna zir-zopan xwe li ser jiyanê ferz kirine. Carekê rûdinê dixwaze zikê xwe belav bike û bifetisîne. Qirêjî heye, bûna sitirî heye, nefretbûn heye.

Jixwe ne di ferqê de ye çi, çawa ferz dike. Nêzîkatiyeke şête. Dilê wî/ê hertim dixwaze xira bike, belav bike, bi hêrse. Çima wisa ye? Ji ber ku dijmin dîn kiriye, ji ber ku dijmin wî/ê kiriye heywan. Em ê vê derbas bikin, ger em derbas nekin em devjê berdin asta siyasî, leşkerîbûnê, gêrîlabûnê em ê ji aliyê civakî ve nikaribin pêş bixin. Herweha em ê nikaribin hevdû bidin jiyîn ez ji rêbaza meşandina vê pratîka me ya şer fêm dikim. Ez ji hevalê me yê herî pêşketî yên dibêijin; "*ez nikarim bi vî/ê re bijîm, bi vî/ê re nikarim erk bimeşînim re*" dibêjim, wê demê yê herî baş tu ava bike. Lê vê jî nake. Ez bibêjim; "*temam ev bebekê kevne*",

dixwaze xwe li ser pişta me bide gerandin, ji xwe hatiye çil saliya xwe, dibêje ez ê bihejînim. Bila dev ji qurnaztiya gundîtî, opozbilindiyê berde, ma di welat de bi cîh nabe? Bi sedan mirov li bere, çima jiyanê bi wan re pêş naxe? Şer dixwaze qada herî baş a şer li pêşberî ye. Civakbûnê dixwaze kesayetên ku herî azad dikarin bên rêxistinkirin hene. Hûn çek dixwazin çek, wê vana hemûyan nebîne û bêje; "*ez dixwazim herêm biguherim, bi vî/ê re naxebitim.*" Ji niha û şûnde uslûbê min li beramberî vana wê biguhere.

Êdî bese ku ev hem xwe dixapînin û hem jî min dixapînin! Qet nebe mirov dizane bi hevdû re têkoşîn bike. Ger tu nizanî bi dijmin re têbikoşî, di despêkê de xwe rast bike. Hinekî xwe rast bike, ber bi jiyana civakî ve bikişîne, piştre qala karên mezin bike. Hûn reben-belengaz dimînin. Ez ê di nava we de kê çawa bixim nîzamê? Nizane baxive. Gelo hûn dizanin çi dixwazin? Hûn hejarin! Hûn nikarin pêwendiyeke asayî ya hevrêtiyê, pêwendiyeke asayî ya jiyanê pêş bixin. Di binê ve de kesayeta ku dijmin ji rê derxistiye heye, radestbûna kevneşopiyan heye. Ez nabêjim ezezî, xweziya vana weke kapîlatîstekî min birêve bibiran yan jî ji xwe re bida xizmetkirin, ew jî nîne. Axatiya Kurdan heye. Ger weke axayekî Kurd, weke Barzanî jî bikaribin min rêve bibin ez ê bi wê jî qayil bibin, ew jî nîne. Dînê xwedê ye!

Em ê van hemuyan têk bibin. Ez di vê mijarê de dibêjim êdî bese! Lîstokê dizanim, hûn çine, kîne êdî min fêm kir. Dijmin dibeje; "*yan wê xilas bin yan xilas*", ez jî dibêjim: "*yan dê bibin mirov, yan bibin mirov*" ti rêyeke vê ya din nîne. Ji vê wêdetir dev ji jiyanê berdane. Hemû curên xizmetê hatiye pêşkêşkirin, hûn ê hêjî nebînin. Derfet û mercên we gelekan ji bo hemû cure mirovbûnê têr dike. Damezrîne! Cemaetê damezrîne, grûbê damezrîne, ger tu dixwazî artêşê damezrîne! Çima tu nadamezrînî? Ez ji we hemûyan heman pirsê dikim; pêdiviya we

bi mirovbûnê nîne? Pêdiviya xwe bi xwe gihandina yekeyek civakî nîne? Pêdiviya we di şoreşê de weke hevrêyan a pêşwazîkirina hev nîne? Pêwîstiya we bi bûna grûbeke çekdar nîne? Pêdiviya we bi moral, rêzdarî û miqatebûnê nîne? Ger heye çima tu nagirî dest, çima pêş naxî? Çima tu derewkariyê dikî? Çima tu tehrîkariyê dikî?

Binê vê kesayetê bikolin wê dijmin jê derkeve, xirapkar derkeve,  berdoş derkeve, kesayeta dev ji hemû aliyên jiyanê berdaye, xwe radest kiriye derkeve. Em ê çi ji vê kesayetê bikin? Ka şoreşgerî, milîtanî, tevgera rizgariya civakî, tevgera rizgariya netewî, ka li kîderê man ev gotin? Ev çiqas li gorî kesayeta me li hev dikin? Eşkereye ku rewşa gelek xafîlên di nava me de wisa ye. Tevî ku berê xwe nade jiyaneke civakî ya asayî jî serê kêliyê carekê dibêjin; “*Dixwazim herêmê biguherim, erk bi guherim.”* Tu kiye herêm kiye? Sextekar, xafil, bêhed! Tu dikarî bi du mirovan re li gel hev bimînî? Tu dikarî baş li çekekê binêrî? Tu dikarî ji hevrêyekî re xizmet bikî? Hinek dilên şikestî, yan jî yên te şikandine tu dikarî bicebirînî? Tu wan hevalên xwe yên te ew terkî îmhayê kirine dikarî fêm bikî?

Ev xwe xwedî raye û bibandor dihesibînin. Hewldaneke te ya hevgirtinê heye? Te kêmasî, nebesiyek derbas kiriye? Di vê mijarê de pîlanekî te ya şênber heye? Tu xwe ji harbûnê derdixî? Tu xwe ji xirabkarî, çiye ne diyare, bêhed û ketîbûnê derdixî? Pirsgirêk ewqas sotînerin. Demogojiyek pêşketiye, tu lê dinêrî ji têleke wisa lê dide, yê nebîne jî wê bêka çiye. Axa li têla xwe dide, mêtînger-cendirme wisa li têla xwe dide ku, di tehlîla dawî de derdikeve holê ku ew jî dixwaze wiha be û wisa jî derdikeve. Rêya derketinê li pêşiya te ye, rêya dijmin li vire û dîsa jî ew tipê hov gundiyê bêhiş li têla hemaltiyê dide. Dibêje; “*Ez nikarim, nafikirim, nayêm rêxistinê, paşketîme.”* Bûnewerê di asta herî jêr de! Teşeya herî ketî ya mirovatiyê ye!

Pêwendiya van bi pêşketin û jiyana navxweyî ya rêxistinê re nîne. Di vê mijarê de neçare mirov bizanin xwe pêbigihînin. Ez dibêjim devji rizgarkirina jiyana siyasî, leşkerî berdin, em qala rizgarkirina jiyana civakî bikin. Bese ez ewqas li we gohdar dikim. Ez ji bo yekîtî û hevgirtina me ewqas hewl didim. Hûn jî êdî hinekî be jî li gorî rêgezên jiyanê bijîn. Pêwîst nake bi dijmin bilîzin. Çi pêwîstî heye ku hûn radestî û hemû şêwazên din li ser me ferz dikin? Ma hûn ê bi vê ber bi kîderê ve biçin?

Nirxandinên ku ji aliyê Emerîka ve hatine kirin rastin, dibêje; "*Hemû kes, gelê xwe û heta PKK'ê dîn îlan dike.*" Erê, ez dîn îlan dikim. Ma mirovên wisa ne dînin, çine? Ka li rewşa xwe binêrin ferqa we ji dînekî heye? Dînîtî çiye? Dîn, di nava civaka gund û jiyana civakî de hareke. Sinîrên dînekî belavbûne, hêza xwe ya venerînê ji dest daye û dev ji xwe berdaye. Li gorî vê pênaseyê kî di sînorên dînîtiyê de digere, kî nagere? Yên ku li ser xwe serweriya wî ya zêde heye, hem hêza wî/ê ya fêmkirinê, hem jî ya li gorî wê tevgerînê heye, ji dînbûnê derdikeve û jê re tê gotin; "*Bi aqile.*" Aqilmend; tam jî di vê xalê de kesê ku rêgezên Partiyek şoreşgerî yên ku ji dijmin re xizmet nakin esas girtibe, hêza pêkanîna wê, hêza jiyanê û hêza mantiq raber bike kirî re tê gotin. Ev civaka dînan bi aqilkirin gelek zehmete.

Ji dîsîplînê, hemû diyardeyên jiyana azad qut bûye, hemû curên awaretiyê û derketinên wê yên lumpen dibe ku ji we re asan bê, lê binêrin ev cîhan me çawa dinirxîne. Ji aliyê dijmin ve weke "*kuro*" nirxandinê zêdetir em şayanî çi tên dîtin? Ji dervî gotina; "*Kurd çi fêm dike ji cejnê, tenê dikare fir fir dew vexwe.*" wêdetir çi wateya me heye. Gelek biwêjên bi vî rengî hene, hemû jî li ser esasê henekê xwe kirinê ne. Ji vê wêdetir nirxekî me heye?

Em nebêjin îdîaya şoreşê û derbas nebin. We ji rêzê girt, lê min ji rêzê negirt. Jiyana şoreşgerî hûn xirab dikin, ez xirab nakim. Divê ku ji bo şoreşê sebir û înat, ji bo şoreşê ji hemû tiştên jiyanê re tehamul bê raberkirin. Me ev hêz nîşan da. Ev tenê ne ji bo

xebatek, ji bo pêşketineke leşkerî ya asayî ye, ji bo pêşxistina pergaleke ji vî halê me yê ku ji mirovbûnê hatiye derxstin re me kir. Ger pirsgirêkên we yên bi vî rengî nînin ji min re bêjin; ger hûn grûbeke pir baş a civakî ne vê îspat bikin. Ger hûn diecibînin cemaetekê, malbatê û hûn diecibînin asta xwe ya civakî bila ya we be. Hûn bi dijminê xwe re yekbûnê de jî serbestin. Ger we rehet dike bila ya we be. Lê tevgera me ya hêja red dike; rehetbûna di nava dijmin de, bermahiyên civakî yên radestbûyî, kevneşopan û bi van re jiyankirinê red dike. Dikare jiyana xwe ya azad damezrîne? Îdîa û hewldan xwe ev e. Jixwe şer îfadeya herî kûrbûyî ya vê ye.

Eşkereye ku ez ê jî her tiştî derxînim holê. Tehlîlkirina civakî îro ji tehlîlkirina têgeha atomê jî hîn zehmetire. Qet nebe ez heta asta ku bê jiyankirin hewl didim tehlîl bikim. Ez dikarim bi qasî ku mirov hêvî û azweriyên xwe derbas bike, ji taybetmendiyên xwe yên sereke re xiyanet neke binirxînim. Îhtîmaleke mezin ji vê jî kêmtir nabe, yan jî bê vê qet nabe.

Ji vî alî ve rastiyeke me ya mezin a şoreşê heye. Xwe gihandina civakbûneke wiha, li berçav girtin, ji vê re wateyeke wiha dayîn di asta pênaseyê de jî sotînere. Ji ber vê em nikarin nirxandina qada civakî piştguh bikin. Em ê civaka malbatê, civaka klan-kabîle, eşîretê di çarçoveya vê pênaseyê de bi baldarî bigirin dest. Pêwendiyên kesekes, heta pêwendiyên civakî di çarçoveya vê pênaseyê de misoger destnîşan bikin. Çiqas li gorî dijmine, çiqas bi ser bermahiyên civaka kevnar yên riziye û belêniya jiyanê nakê de diçe, çiqasî li gorî îfadeyeke azade, xisûsên ku divê em bi dijwarî nişan bidine. Bi dijwarî em ê ji vî alî ve jî xwe çêkin. Em ê cesaret û hêza pêkanînê raber bikin. Em nekin, em ê nikaribin bijîn, weke şêta lê bên.

Ger hinekî hêza me ya venerînê lewaz bibe, çend despot, serdest derkevin, wê biryara darvekirina we hemûyan bide, herwiha di yek carê de ger deh hevrê şehîd dikin, ev rewş jî biryara

darvekirinê ye. Ji ber ku hişyarî –aqlê selîm- nîne. Ev hareke! Şerekî nameşîne, şaş dimeşîne. Rewşeke axawarî ferz dike, rêxistinek bi sedan kesî belav dike, çar çûr dike. Rêxistin hinekî dixwaze xwa biparêze, biryara darvekirinê didin van. Ev çi dide diyarkirin? Ger giraniya erkan, cidiyeta wê ne be, ev tiştekî asayî ye?

Dijmin vê dibêje; "*Di derbarê hev de biryara darvekirinê didin, ewqas çewtin ku, sê ciwanên temen bîst salî bi darvekirinê didarizînin.*" Ez bawer nakim ev ajan bin, tenê li gorî jiyanê tevnagerin. Tu rêberî, tê fêrî jiyana vir bikî. Ger leşkertiyê, tu fermandarî, tê wî/ê bikî leşker. Çima tu biryara darvekirinê li ser didî? Ji bo ku tu wî/ê bikî leşker te çi kir? Berevajî, hinek dibêjin; "*Biryar*" yê din dibêjin; "*me erê kir*" û kenê xwe dikin! Ev çiye? Ma di nava PKK'ê de cîh ji van re heye? Bêguman dijminê henekê xwe bi we bike. Ti aliyekî mirovî ya van nêzîkatiyan nîne.

Piraniya we ji nav vê rastiyê tên. Ji xwe şerm bikin! Ma hûn mirovbûnê asan dizanin, kuştina mirovan asan dizanin. Qet jî ne asane, karekî gelek zehmete! Mixabin di nava refên me de kesên ku nirxan çarçur dikin û yên ku bi kêşana cixareyekê ve girêdayî ne kêmin. Veca ev ne dînîtiye çiye gelo? Hevrêyên xwe her roj diçewsîne, weke mengeneyê dihêre. Em neçarin vê fêm bikin, ger ev ne peywirin bêjin. Ji serê kêliyê carekê xwe li ser min ferz kirin ne rêya çareseriyê ye. Eşkereye ku me ev hemû dane pêşkêş kiriye. Em hemû qadên mirovbûn, civakbûn û leşkerbûnê ronahî dikin, daneyên vê pêşkêş dikin.

Êdî min gelê hejar li aliyekî danî, ez wisa difikirim ku min pirsgirêkê wan xist rêya çareseriyê. Gazinceke min zêde nîne. Lê ez li we dinêrim ev çiye? Gel di bin izdiraba jiyanê de arîfe. Piçekî derfetê azadiyê baş dinirxîne û bi asanî dev jê bernade. Ev tê fêm kirin, lê ya we? Ji ber ku kesayeta we ji aliyê dijmin ve hatiye tehrîkirin. Bi ciwanan dilîze, bi ajoyan wan dilîze. Ya din jî di xeta şer de ye, ji xeteriyê re vekiriye, zehmetiyên xwe hene, bi

wan dilîze. Nemaze hûn ê gelek hestyar bin. Ger tu dibêjî; "*Misoger ez duristim, dev ji rêgeza partiyê, rêgeza jiyana azad bernadim"* wê demê wê tevgereke we ya pir durist û rast jî hebe. Wekî din, bi van hal û reftarên xwe, bi kîderê ve, ya ku ne diyare ji kê re xizmet dike, kesayetiya xwe ferz dike ve hûn gelek xeterin.

Ji ber vê ne tenê terbiya siyasî, leşkerî, bîrdozî, ne tenê perwerde, di gel vê terbiyeya civakî jî ji were pir pêwîste. Dema ku em dibêjin terbiya civakî nebêjin; "*ez keçeke malbatê ya herî baş a çawa me, xortekim"* û xwe ne xapînin. Yên bi vî rengî dibe ku yên herî bê terbiye ne.

Terbiya civakî; bi qasî li dijberî hemû cure êrîşên îhtîmal ên dijmine, yên ku li dijberî bermahiyên civakî bûne fosîl radiweste. Dikare bibe hêza çareseriyê û ya herî girîng jî ya ku armanca şoreşê ye, armanca siyasî, armanca civakî, aborî, armanca çandî, pêwistiyên bûna civakeke bi tendurist di kesayetiya xwe de şênber kirine. Terbiya civakî ev e. Bi van aliyên xwe ve hûn ê bibin milîtanên herî nêzîk ên armanca civakî. Bûyîna leşker têrê nake, weke din jî hûn ê bibin milîtanên civakî.

Çiye milîtanên civakî? Di pêwendiyên jiyana rojane de bûna xwedî şêwazekî şoreşgerî ye. Ez dibêjim şêwaza milîtaniyê; nabêjim radestkarê civakî, harê civakî, provakator û texrîbkarê civakî. Beşeke pir mezin a qada civakî bi vî rengî ye. Li ser navê lihevkirinê radestî, lihevkirin; di bin navê têkoşînê de jî ji xirabkariyê re na! Milîtanê civakî; ne radestkare, ne xirabkare; bi hevalên xwe re di nava lihevkirinê de ye, lê pir dînamîke û ji hemû aliyan ve lihevkirineke rêgezan li ber çav digire ye. Dîsa têkoşîn dike, lê ne ji bo xirabkarî, lewazkirina girêdana bi rêxistinê re. Çi tişta ku berevajî girêdan û rêgezên rêxistinê dikeve, ji bo derbaskirina van aliyan, ji bo derbaskirina wan helwestên şaş ên kesekesî û tevgeran, ji bo wî kesî/ê dubare bigihîne hev têkoşîn dike. Ger na ne ji bo giyanê wî/ê bigire, tenê

di qusûrekê de mirov bifetisîne, di kêmasî û lewaziyekê de ne tinekirin. Berevajî, ji bo bi hêzkirinê ye. Rexne yan jî rêgeza têkoşînê di navbera xwe de di jiyana civakî û siyasî de pêk tînin. Dema ku jiyana leşkerî bû mijara gotinê baldar dibin. Heta dadixin asta jiyana aborî jî. Baş dizanin divê jiyana aborî jî li gorî aboriya şer pêş bikeve.

Jiyana milîtanekî ewqas berfirehe û îfadeya xwe ya herî berfireh jî, dê çawa bi jiyana civakî re lihev bikê ye. Uslûbê vê jî heye, naxwazim zêde vekim. Dê zimanekî wî/ê xweşik hebe, dê pêwendiyeke hevrêtiyê hebe, misoger wê nekeve nêzîkatiyên rê ji kirêtiyan, kîn û tengaviyan re vedike. Jixwe ne dikevê, ne jî dihêle bikevê. Ji hemû aliyan ve ev zemînê jiyanê ye. Yekî bi vî rengî milîtanekî civakî ye. Di pêwendiyên malbatê de, diyardeyên ol de, di baskên huner de û di teysîna aboriyê de jî şêwaza milîtanî li ber çav digire.

Nemaze hûn ê bi van aliyan ve misoger xwe perwerde bikin. Em ê pîvanên terbiyekirina civakî bibînin. Misoger em ê xweferzkirinên dijmin bibînin, bê aman li dijberî rawestin, xeteriya kevneşopan bibînin. Em paşerojê ji hemû aliyan ve red nakin, lê xusûsên gelek xeter û xwe ji dijmin xwedî dikin hene. Em ê bibînin, li dijberî derkevin azadiya xwe bigirin dîqatê, kesayetiya azad, pêwendiya azad, şêwaza îfadeya demokratîk, estetîk, çi aliyên pîvanên me yên ronî bûne hebin em ê wan li ber çav bigirin. Bi vî awayî, milîtanekî xwe pêkaniye wê bibe nîvenga şerê mezin. Çavkaniya jiyanê ye, ronahiya jiyanê ye, çeka jiyanê ye û ti kes nikare serî bi milîtanekî wiha bide tewandin, kes nikare wî/ê hilweşîne, ti kes jê zirarê nabîne. Ew çêkere, bi qasî ku dizane hilweşîne, ewqas jî dizane înşa jî bike. Ji çi re, çiqas pêdivî heye dizane bide jî.

Ji bo ku hûn wiha bin we çiqas ser xist yan jî ji bo serxistinê divê hûn çi bikin? Ew jî peywira we ye. Em gelekî vekirî bi qasî azadiyê zehmetiyan jî li pêşiya we datînin. Hûn ê fêm bikin û li

ser xwe pêk bînin. Weke din rê li pêşiya heywanbûnê, harbûn û dînitiyê nayê girtin û ne gengaze ku we wisa bidin jiyankirin. Weke ku hûn texmîn dikin hûn ê nikaribin leşkeriyê jî bikin, siyasetê jî bimeşînin.

Bi giştî ez van xalan ji bo qada civakî diyar dikim. Ji bo hûn sûd jê werbigirin hem gelek teorîk, hem jî bi pratîkên zindî em nêzîkatiyan pêş dixin. Ji ber ku ev gelek girînge. Bi awayekî din jiyan rizgarkirin ne gengaze. Ez pir zêde xwe datînim holê. Ji ber ku niha weke ez dixwazim hêza min têra dijmin neke, hêza min tam têra we neke, wê hêza min têra min jî neke. Ji bo her demê rêbazê min ev e: Bi qasî ku tu dikarî li dijmin bidî lê de, di vê de qusûrê neke, dîsa bi qasî dikarî bi ser Partiyê û gel de biçe, lê dema ku te dît ew zilamana weke kar nakin, wê demê hinekî bi ser xwe de biçe, tu bi xwe her tiştî bike. Ez dizanim wisa xwe bidim bazdan û jixwe wisa me.

Niha hemû bandora min çî ye? Hemû bandora min çavkaniya xwe ji hêza bazdana min digire. Jixwe hem şer, hem jî veguherîna wê ne gengaze ku bi awayekî din bimeşînim. Çiyê we heye? Vê civakê, çi tişta ku ez xwe bispêrimê daku şer bikim pêşkêş kir, dijmin çiqasî navberan dihelê? Ez ê wan binirxînim. Ji xwe min hemû bi awayekî metirsîdîar nirxandine. Li şûn vê qada min bi xwe dimîne, ez bi xwe dimînim. Weke ku hûn dibînin ez xwe jî baş didim karkirin. Hêza min têra min dike û terbiyekirina min girînge.

Ez jî mirovekim, dibe ku aliyên min jî yên ku dişibin yê we, hûn jiyan dikin ên kûrbûn û harbûnê hebin. Lê ez pir dijwar bi ser wan de diçim. Taybetmendiyeke hûn bi salan nikarin mehkûm bikin, ez kêlî bi kêlî mehkûm dikim. Hûn kêmasiyên xwe bi salan derbas nakin, ez di heman kêliyê de derbas dikim. Dîsa kirêtiya ku hûn weke şêwaza jiyanê qebûl dikin ez kêlî bi kêlî derbas dikim. Yanî li ser xwe sekinandina min, xwe perwerdekirina min bi tempoyekî metirsîdîare. Ger ez vî temboyî ewqas bi şîdet

nekim, ez ê hêza we terbiyekirinê ji kur bigirim? Misoger fêmkirin –dibêjin di navbera birû û çav de- xwe bi lezeke ewqas mezin di dema xwe de xwe amadekirin heye. Ger ez wisa nekim, bê amadekariyên we, nebesiyên we wê hezar Rêberan hilweşînin û têk bibin.

Bi van aliyan ve Rêbertî, di waneyên civakî de jî xwedî bandoreke mezine. Niha bi dijmin re jî pevçûneke me pir dijwar heye. Dema ku me dest bi vî karî kir jî, li ser esasê bi dijmin re pêwendiyeke civakî me dest bi kar kir û ev jî pir balkêşe. Ji ber ku ez pir zekî bûm min despê kir, yan jî pergal pir serdest bû, bi pîlan da kirin, zêde nizanim. Dibe ku ev be jî û ya din be jî. Ev şêwaza têkoşîneke ye.

Dema ku ez têkoşînê kûr dikim vê dibînim: Di qada civakî de çi tişta bi dijmin re pêwendîdîare, di nava Partiyê de jî kûr bûye û weke hêzeke di nava êrîşeke mezin de ye. Dîsa çiqas pêşnûmeyên min ên di derbarê qada civakî de hebin, hemû bi min re hûrûkûrbûyî ji bo êrîşê amade ne. Di serî de bi vî rengî bûyîn ji bo ecêb neyê dîtin ez vê dibêjim. Ne tesadufe, ji ber şêwaza têkoşîna me ye. Pir balkêşe! Di vê mijarê de pêwîste şêwaza çêbûna min bê lêkolînkirin. Ger hûn zêde ji pirtûkan, nirxên giştî fêm nakin, weke mînakekî hîn şênber û pratîkî rewşa min lêkolîn bikin, min hinek dane ji we re pêşkêş kirin, rêzdar bin û lêkolîn bikin. Jixwe bi qasî ku ez xwe vebikim, vedikim, ez ti aliyên xwe yên sergirtî nahêlim. Ez vê ji we re bêjim; ev jî derfetekî mezine.

Ti Rêber xwe wisa venakin. Kesayetên weke min hinekî xwe dane qebûlkirin, her çiqas şêwaza wan be jî weke min nabin. Lê di encam de ew jî pir fermî û serkutkerin. Hûn dizanin di nava me de jî çiqas serkutker hene, ji jor de hukumkirinê esas digirin. Qet ji jêr ve nagirin. Ez weke şêwaza xwe vê dijîm. Ez pêkhateyên bi vî rengî weke şêwaza çîna mêtînger û serdest dinirxînim, bi asanî napejirînim. Pejirandina min li aliyekî bimîne, ez ê serî jî li ber netewînim. Em şêwaza gelerî yan jî ya bi kedê ve girêdayî ye

sosyalîst jî dizanin. Bawerim weke ku me çêkiriye dibe. Hêjî bi encam nebûye.

Ez weke zarokên heft salî me û heta ez perwerdê xwe yên weke wê demê didomînim. Min ev pir zêde got; ji bêrîkirin û şêwaza jiyana zarokatiya xwe xiyanet nekirin yek ji taybetmendiyên min ên serekeye. Ev ne gotinek ji rêzê ye. Ev tê çi wateyê? Ji heft saliya xwe ve rêgeza serdestiya civakê, hemû curên ferzkrinên pergalê yên mêtînger, çîna zextkar, wî/ê kesî ditepisîne û çiqas daxwazên saf ên paqij hebe ji holê radike. Ji xwe hîn ji wê demê li dijberî yê ku dixwaze azad bimîne şer hatiye meşandin.

Bi awayekî xwezayî ti mirov ti demê di xirabiyê de israr nake. Zarokek hertim xweşikbûnê dixwaze, hertim alîgirê hezkirinê ye, em dikarin bêjin hertim alîgirê yê bi anûre. Xirabî hertim ji aliyê civakê ve ji temenê biçûk tê ferzkirin. Li pişta wê jî hemû curên mêtîngerî û şopên çîna zextkar hene. Yek ji rêgezên ku ez jî ji xwe re esas digirim; kesayetiya ku tepisînê qebûl nakê ye. Ji wê rojê heta îro ez dikarim bêjim ku min hinekî be jî ev serxist. Jixwe şêwazek pir balkêşe. Çend Rêberan ev çiqas kirin, şayanî lêkolînê ye. Ez nabêjim ez xwe pir diecibînim, lê ez hinekî wisa mam.

Ez pir zêde ji we re jî dibêjim bebek, lê hûn ê hinekî jî li dijberî bebekbûnê şer bikin. Li ser esasê pergalê hûn nayên mezinkirin, di vê wateyê de jî mezinbûneke we nîne. Weke ku ez dixwazim jî hûn mezin nabin. Başe li şûn ve çi dîmine? Li gorî ku ez derfet nadim hûn weke dijmin mezin bibin, ez jî weke ku dixwazin we mezin nakim, hûn ê weke bebekekî bimînin. Jixwe di nava me de zêde bebekên 30-40 salî hene. Ez pir dixwazim bebektiyê derbas bikin. Ev mijara pêşketinê ye. Di şer de hemû taybetmendiyên ku min hejmartin meseleya binxistina dijmin û derbaskirina civakê ne. Ger hêza we têra vê bike hûn ê ji bebekbûnê rizgar bibin, bibin xort. Ger hûn derbas jî nekin hûn ê bejnkurt bimînin û bawerim hûn dimirin. Nexweşiya raşîtîzmê (nexweşiya

pêşneketina hestiyên zarokan ji kêmbûna fosfora di laş de yan jî bê hevsengiyê çêdibe) nexweşiya hestî ku hîn zêde hestîyan dimije, di şer de ev ketinên pêşwext, şer di nava xwe de pêşnexistin, çavkaniya xwe di vê bebekbûnê de asê mayînê digire. Lê şûna li gorî dijmin mezinbûnê, weke bebekan mayîn dibe ku bê vebijêrkek be. Ji ber ku îhtîmaleke hûn mezin bibin.

Şêwaza min hinekî cudatire; ne dişibim bebekekî, ne jî li gorî dijmin mezin bûme. Ger hûn bal bidinê, ez ne di nava jiyaneke weke kes texmîn dike yan jî jiyan dikede me. Wisa bûna min ez bawerim dê xeter bibe. Ev jî ji nîqaşa me re vekiriye. Ez bi we re di nava nîqaşa hevrêtiyê de me. Heta ez dikarim bikevim nava nîqaşên zarokekî heft salî jî. Me çi dixwest em wê demê vê nîqaş bikin. Ger nebû, di 15 salî de, ger hûn hene di 25 salî de û ger hûn bixwazin di heftê saliyê de jî ez jê re heme; ez ji nîqaşê re amade me. Yanî milîtanekî heftê salî çi ji min dixwaze, ez amademe wê jî fêm bikim.

Zarok tên, ez pir baş bi wan re eleqeder dibim. Niha bi qasî ku ez bi zarokan re lihev dikim bi mezinan re lihev nakim, ez ji aliyê hemû kesî ve tê zanîn. Hûn dizanin ku zarok çawa hevalên min ên herî başin. Çima? Ji ber ku xwezaya min gelekî dişibe xwezaya wan. Weke ku ez berevajî bêrîkirinên wan nakevim, yê herî baş wan diparêze, çavdêrî dike di rewşeke wisa de me ji bo wê. Hûn wisa dizanin girêdana zarokan bi min re ji ber xwe ve ye? na! Ya rast zarok ji zekîbûnê fêm dikin. Ev jî girêdaneke li ser vî esasiye. Artêşeke wan jî heye. Li gorî min artêşa ku dijmin qet nikare bitepisînê ye! Niha artêşa pîran jî ya rast di nava pêşketineke bi wate de ne. Di demên dawî de dijmin gelek ji wan qetilkirin. Divê ku baş bê fêmkirin. Vana tev, nûbûn çawa çêdibe destnîşan dikin.

Rewşa zarokatiya we ya bejnkurtî (cuce), pîrbûn, rewşa hestîbûnê, gelekî li şûn pîrê zindîbûyî de ye û ji zarokatiya we jî wêdetire. Ev jî rastîne. Bi me nerîna we, fêmkirina vê zêde ne zehmete. Dîsa em pir ji xwe ne razîne, lê niha em di rewşa kesê

ku tenê dikare kar bike de ne. Hema bêje bi her kesî re, hemû curên pêwendî, hemû curê pirsgirêka re em hene. Em şoreşa gelekî esas digirin, ev şoreşeke mirovetiyê ye. Di derbarê vê de kî çi dixwaze ez jê re amade me. Tenê bila li ser navê mirovatiyê be, ez ji rêxistina hemû cîhanê re heme. Ji rêxistina keskan bigirin, heta yên komînîst, min kêm-zêde xwe ji pîvanên hemûyan re amade kiriye. Ji rêxistina şer bigirin heta rêxistina aştiyê, tenê bila armanca xwe hebe. Kesayetiya min guncawe û ez jê re amade me.

Hûn nikarin vê ji bo xwe bêjin. Ya din jî şêwaz û tempoya wê heye. Di milîtantiyê de ev pir girînge. Şêwaz, tempo, teşe; di van mijara hemûyan de ez ê nebêjim bê qusûrim, lê di rewşa dikarim bijîm û pê şer bikim de me. Ji ber ku ez xwe amade dikim. Şêwaza rêzgirtinê ev e. Dijmin jî nikare bêje ku; "*tu pir xirab şer dikî.*" Min heta niha nebihîstiye. Vana girîngin.

Dibêjin Rêbertî, hinek caran hûn şayanî xwe jî dibînin, lê Rêbertî di van xisûsa tevan de neçare xwedî çavdêrî û pîvanan be. Ne ewqas rexneyên min; bila rexneyeke we ya ji rêzê ji min re hebe ez ê xwe parçe parçe bikim û veguherînim. Sînorê xwezayî yê mirovekî hene. Bila ti kes ji min re nabêje; "*Çima tu ber bi asîmanan ve nafire, çima te ji nişkê ve bihuşt ava nekir?*" Vana hemû têgehên ser xwezayê re ne û ne gengazin.

Lê li ser esasê anûrê çi tişta mirovahî pêş bikeve hebe, em amadene ku vê jî misqal bi misqal nîşan bidin û em nîşan jî didin. Ev jî girînge. Rêzdarî çiye, ji bo vegotina wê dibêjim. Ji mirovekî re gotina tu çawa yî, rêzdayîna jiyanê ye. Ji bo vê kesek çawa xwe di rewşa amadebûnê de digire? Hinekê jî ezmûna salane. Dema ku derdikevim pêşberî dostekî heta hestiyên xwe dihejim, heta derketina pêşberî zarokekî jî wisa ye. Lê di nava refên me de yên xwe ferz dikin pir zêde ne. Hûn wisa dizanin ku, ez pir xwezayî ji ber xwe ve wisa me. Na! Ya rast a bi min re terbiye û dîsîplîneke mezine. Ji ber ku li gorî min beriya her tiştî neçare milîtanek wisa be. Ger na li nava refên me binêrin, herkes xwe ferz dike; hemû

curên dil binpêkirin, bi qûralan lîstin, bi zorî û zehmetiyan pîvanên hevaltiyê ku em pêş dixin bi wan lîstin heye. Çiye, qaşo wê lez xwe bigihîne desthilatdariyê, başe dema te desthilatî bidest xist wê tu çi bikî? Wê xwe têr bike; ev jî bi yek gotinê bêterbiyetî ye!

Dema ku em li rastiya xwe dinerin çawa ji vê bê terbiyetîyê re cesaret dikin em matmayî dimînin. Dema ku xwe didin dest jî çiqas bê şerm û xirabkarin em hemû dizanin. Em dikarin hîn jî vekin, ger hûn ji pirtûkan fêm nakin, ji waneyên leşkerî, siyasî fêm nakin, hinekî li terbiya zarokekî ya civakî, hinekê jî li şêwaza xwe terbiyekirina min binêrin. Rojane di rewşa kobayekî (di lêkolînên zanistî de heywanên ku li ser ceribandinan dikin) de me. Hema bêje ez xwe wisa dixebitînim, xwe dadixim asta amûrekî ceribandinê. Ez tenê ne wisa me, bi qasî pêdiviyên we ez xwe vediguherînim amûrekî ceribandinê. Mînak, dema ku ez her yekî ji we dibînim, ji xwe min xwe kiriye amûrekî ceribandinê, ev taybetmendiya min a fêrkirinê ye. Şêwazekî pêşketî yê hewldanên min ên veguhertinê ye.

Ger hûn tenezul nekin, di nêzîkbûna we ya ji mirovan re ne gengaze ku ber we re jî bê derbasbûn. Lê ez dikarim bi carekê xwe bikim pir, bi carekê bibim xizmetkarê herî mezin, xwe bigihînim rewşa xebatkarekî xwe diteqîne. Ji bo bandorkirinê, veguhertinê bi qasî neyê bawer kirin dikarim xwe nerm bikim. Ez hêza xwe ji vir digirim. Çima ez we bandor dikim. Çawa bandor dikim, we qet lêkolîn kir? Ez vî gelî çawa û ji bo çi dihejînim? We qet karî lêkolîn bikin? Ji ber xwe ve çêdibe? Bi hezaran sale çima yek derneket? Pere, pûlê min nebûn, ti kesî wisa alîkarî jî neda min, di asteke mezin de min behremendiyên xwe derxistin holê û kir. Min da diyarkirin ku ez ne kesekî wisa pir ji xwe razîme. Aliyên min ên ji her kesî serdestir jî nînin. Rastiyeke min a malbatê ya bi avantaj jî nebû. Berevajî, ez di rewşa herî bê bandor, bê îdîa û bi pirsgirêk de bûm. Lê min xwe terbiye kir.

Terbiye pir girînge. Ez biçim gel kê bila biçim wisa me. Min qala yekem car dîtina mamosteyên xwe kir. Dema ku ez cara yekem çûm gel mamosteyê xwe yê dibistana seretayî –dibe ku hêjî dijî, herkes dizane- tevî ku çend gotinên Tirkî jî min nedizanî, ez bûm xwendevanê wî yê pileya yekem. Hezkirina wan jî hebû û berteka dijminên min jî bi vê re pêş diket.

Ez dixwazim vê bêjim; divê ku mirov pir baş bizanibe xwe terbiye bike. Aliyê min ê esasî ku bandor dike ev e. Şêwaza yên din heye, di civakê de şêwaza her yek ji we heye. Niha dikare serwer bibe? Hûn dixwazin gelek bandorker bin, baldar bin. Di nava PKK'ê de serkutbûnek mezin kesî û tevgerîna xwe ferzkirinê heye. Ma ti kesî ji van rêya xwe dîtiye? Nedîtiye. Çima? Ji ber ku di civaka Kurdistanê de, di rastiya me de bi vî rengî nikare bi bandor bin. Xwe sipartina bêterbiyetiyeke mezin ti kes nikare tiştekî bike. Bi ferzkirina bê terbiyetiyeke mezin kes nikare tiştekî bike. Israr heye, ji gelek aliyan ve xwe poşîn, yên ku xwe dixin asta ku neyên naskirin û ferz dikin hene, lê ji dest wan nayê. Ji ber ku civak bi yê weke van dagirtiye. Wê Partî van derbixe holê. Eşkereye ku ev jî têr nake, bi nermbûneke mezin çi tişta ku bikaribe mirovekî bandor bike, pêwîste vê di xwe de bibînin û hemû hêza xwe li gorî vê eyar bike. Dema ku ev nebe mirov hem pir aciz dibe hem jî hêrs dibe.

Gelo çima we wisa nekir? Hûn ewqas pîr û temen mezin jî nînin, hûn pir nexebitîne û ne westiyayî ne jî, lê hûn qet nakin. Hûn agahiya ziman, ya ruhî, hêza aqlê xwe çiqas ji bo xizmetê bikartînin? Îfadeyeke we ya xweşik çiqas heye? We qet zimanê xwe lêkolîn kiriye? Di pêwendiyên mirovan de hûn, çiqasî bertekan-bandor dafirînin, we qet ev ji wîjdanê xwe pirsiye? Ya ji devê we derdikeve agirê sore, yan jî şerbeta şêrîne? We qet ev lêkolîn kir? Hûn rojane derdora xwe çiqas rehet dikin, çiqas tengav dikin? Qet meseleyên we yên bi vî rengî hene? Ev mijarên

herî jiyanî ne. Hevrêyên xwe tenê bi gotinekê tengavkirin êşê dide min û tevgereke wî /ê ya şaş-xelet hişê min ji serê min dibe.

Çîrokeke we ya jiyanê bi vî rengî heye yan jî bi berçavgirtina vê hûn jiyan dikin? Em hewl didin netewekî, heta bi qasî bi me re eleqeder bibe hewl didin mirovatiyê bandor bikin. Hûn ji bo komikeke biçûk girtina dest, karê xwe yên rojane bi girîngî li ser sekinandinê kar dikin? Ez li beramberî vê rewşa we matmayî dimînim. Dinêrim, weke ku qet pêwîstiya we ya ji van pirsgirêkan re nêzîk bibe nîne bê berpirsyar, bê eleqe, bê xem û jiyaneke bê hesap serê xwe girtiye û hûn diçin. Pir xirabe! Misoger ji vê jiyanê kesayeteke saxlem dernakeve. We çawa cesaret ji vê jiyanê re kir; ez hêjî hewl didim vê fêm bikim. Ya rast hûn ewqas xirab jî nînin. Lê hûn li beramberî hewaya jiyanê binketine. Dibe ku ne bi hemû tiştî be lê, di astên girîng de hûn li beramberî dijmin binketine. Gelek aliyên we yên li beramberî paşverûtiyê bin ketine hene.

Sedema sereke ya mijûlbûna me bi we re ev e. Li gorî we ev qeder, li gorî we xwezayî; lê li gorî min felaket, dîsa li gorî min aliyên ku divê bi erdê re bên yekkirinin! Li gorî we kirêtî asayî ye; li gorî min divê di heman xulekê de bi erdê re bê yek kirin. Li gorî we ji rêzgirtin, hezkirinê re divê zêde şans neyê dayîn. Ji xwe çiqas bê hezkirinî û bêrêziya ku dijmin ferz kiriye heye, hemû taybetmendiyê kesayete. Hûn ê bê aman li ser hev pêk bînin.

Ez ê nebêjim dilê we heye. Di heman demê de hûn gelekî hestyarin û pir zêde nîşaneyên we yên hestiyarî hene. Ez vekirî bêjim, ez ketî dibînim. Hest ne ev e. Asta hestyarî misoger pêwîste, lê divê têrker û rast be. Ka li kîderê ye ew hest? Bifikirin xemginiya we heye? Ger heye li beramberî çiye? Bi rastî jî ez xemgîn dibim. Li asta xemginiyê ya dîrokî, xweza, erdnîgarî, welat, di nava gel de ji zarok, pîr, jin, li vî zilamî, li vî tîpî binêre, li vî harî û rebenî binere, welhasil bi lênerîna gelek nirxan gelo

rewşa we ya hestyariyê pêş dikeve? Ya rast divê mirov hestên xwe lêkolîn bike. Çima, li beramberî çi, çi dike armanc?

Di vir de jî nenasîn heye. Ji bûna ajoyên hov wêdetir ez ne bawerim ti wateyeke din îfade bikin, ez li beramberî vê jî hêrs dibim, nefret dikim. Pir baş dizanim, misoger mejiyê mirovan wiha bê hest naşixule, ajo dişixulin. Ji ber ku şixulandina ajoyan, ne nîşaneya pêşketineke cidiye. Hestên bilindbûyî, yên berz bûyî misoger mejî bandor dikin, mejî jî hestan bandor dike. Lê hestên ku hatine tengkirin, her ku çûye daketiye asta ajoyan ber bi heywanbûnê ve dibe. Bi awayekî gelek xeter di nava refên me de bandora xwe didomîne.

Ez ajoyan înkar nakim. Lê ajo, divê ku di pêşketina hest û fikran de xwedî ristekê be. Ger na fikrandina radestî ajoyan bûyin tine dibe. Hesta ku radestî ajoyan bûye tine bûye. Tê bijî, lê tê ajoyan bijî, tenê ji bo xwarinê, tenê ji bo cînseltiyeke çors bijî. Dişibe her roj bi raqiyê serxweşbûnê. Jiyaneke bi dendurist nîne. Ji ber ku vana hemû bi giranî tên jiyîn, bi taybetî jî hûn ji rastiya civakî û malbatî dûrin. Jixwe min jî herî zû ev ferq kir. Ji ber ku ketim nava têkoşîneke mezin, pêdivî bi vegotinê dibînim, hêza vegotinê raber dikim. Pêdiviya we bi vê heye. Pêdiviya vê civakê hemû pê heye.

Niha sedema ku em ewqasî rê ji bandorbûnê re vedikin çiye? Ji ber em kêm-zêde bersiv didin vê pêdiviyê. Niha jî tam ketiye rewşek pirsgirêkek netewî civakî. Çima herkes ez çime, kîme, çawa jiyan dikim, di çi rewşê de me lêkolîn dike? Hema bêje her kes hemû hereketên min lêkolîn dikin. Dinêrim di televîzyonê de her roj çapemenî bi kar tîne. Eniya dijmin jî dema ku kêmasiyeke biçûk dibîne di nava civakê de ji mêşê dike gamêş. Gelê me jî dixwaze fêm bike, lê asta fêmkirina wê girane.

Ev jî pêwîste. Ji ber ku encax ez xwe wiha dikarim bixim rojevê, xwe di rewşeke bûyer de bigirim, biguherim, bifikirim û erka xwe pêk bînim. Ez niha di rewşa parçekirina mejiyê dijmin

de me. Jiyana civakî ya ew ferz dike, terkî rizînê dikim. Ez vana nabêjim, di bunyeya xirabiyan de di binê her kevirekî de herkes dibêje xirabiyek heye. Min ev danî holê, ya rast min ferz kir. Ez niha bi hemû kesî didim gotin. Ger na çima kevir niha tên rakirin, çima xirabûn niha tên dîtin?

Ez vê jî ji we re îspat bikim; di dema borî de dewleta wan a pê hevdû parçe bikin û nemaze pê hevdû bêdeng bikin hebû. Dewlet di rewşa îflasê de ye, ne di rewşa ku bêje: "*ha ji te re ewqas, vaye ji te re ewqas"* de ye. Lê çav berdidin dewletê. Lê dewlet vikî vala ye. Li şûn ve çi dimîne? Rêyên vekirî yên diziyê, yên êrîşkirinê. Dema ku vê jî eşkere bikin jê re tê gotin gendelî. Ya rast demên borî jî hebû lê veşartî dikirin, niha derdikeve holê. Çima? Tiştekî veşartî bê girtin, belavkirin nema. Eşkere êrîş, eşkere dizî, yanî gendelî ev e. Ya di civaka Kurdan de jî, ya di civaka Tirkan de jî bi vî rengî ye.

Ya di rojên dawî de tê jiyîn, hema bêje niha rojeva sereke bûye ev. Ya rast dîsa em in. Ji ber ku dewletê mesrefên mezin kir, heta yedekên xwe jî xilas kirin. Rewşa xezîneya vikî vala, her roj li beramberî deynên xwe bi çapkirina pereyan encax dikare rizgar bike. Ev jî bandoreke neyênî li ser civakê dike. Bi vî rengî qirêj û zenga wan derdikeve holê. Eşkereye ku girêdayî şerê me ye. Encam; niha bi hev ketine. Ew dibêje ew dize, yê din dibêje, yê din dize. Hemû serok-komar, hemû serok wezîr, mudîrên bankaya û herî dawî ji gel re jî dibêje; "*tu jî tawanbare."* Di encam de tişta digihinê ev e. Bi sing ve girêdane û dibêjin; "*pêwîstiya te bi singek din jî heye."* Ji gelê Tirk re û hemû gelan re vê dibêjin. Ji me re şerê taybet, ji gelê Tirk re jî sing! Ev xefkeke çawa ye ez nizanim, lê pêkanînên rojane ev in.

Me ev derxist holê. Ev bi dijmin dana kirin yan jî ji wî derxistina holê qonaxeke pêş îfade dike. Te, civaka xwe xist vî halî, vî şerî ev civak xist vî halî, mirov xistin vê rewşê. Ev jî ger

şoreş pêngaveke din bavêje, dibe ku pergalê ji holê rake. Wê bike, neke ew jî meseleyeke cuda ye.

Ji bo rastiya civaka me jî wisa ye. Niha her kes ji ya berê şerm dike, bi qasî ku min fêm kiriye tenê ne hûn, yên bi temen jî, ji pêwendiyên malbatê ya kevin nefret dikin, ferasetên namûsê yên berê, ferasetên jiyanê hilweşîn, jê şerm dike zilam. Ev jî me pêk anî. Hinek provakator ya kevin hemêz dikin. Îdeologên mêtîngeran bi rêbazên şerê taybet şev û roj ajoyan belav dikin, tevgerînên kevin ên bêhn ketine ferz dikin. Rêxistina ajoyan, tahrîkkirina ajoyan misoger rêbaza şerê taybete. Bi vî rengî ferzkirina wan, ya din jî bangewaziya ji pergala malbatê ya zeng girtî û fêrbûnên kevine. Bi rastî çiqas diz be jî, gelekî bi hev ve girêdayî ne û du tevdirên şerê taybet in. Em girîngiyê didin hilweşîna herdukan jî.

Dijmin ji malbatan re dibêje; "*Baş xwedî li zarokên xwe derkevin, wan baş biparêzin, pir muhafezekar mezin bikin.*" Me jî bi taybet ji bo neketina bin bandorê tevdîrên pir baş girtin. Xirab bikaranîna huner, ya werzişê ya herî girîng jî xirab bikaranîna malbatê, şerê taybet di asteke metirsîdîar bi ser de çû. Vana nêzîkatiyên herî baş ên faşîzmê ne ku tên zanîn. Niha amûrên herî zêde li Tirkiyê tên karanînin. Me jî kêm nekir, yan jî em vala nesekinîn, bi awayekî hostane teysandina meyla azadiyê, taybetmendiyeke sereke ya mirovî ye, me ew pêgihand, daxwaza azadiyê xist pêşiya gel, daxwaza azadiyê xist pêşiya ciwanan. Ez bawerim vê tevdîrên şerê taybet parçe kir.

Min çawa xwe eyar kir? mînak, pergal hejar dike, ez xwe gelek dewlemend dikim, pergal dixe nav çiravê, ez bilind dikim; pergal madiyatparêz, ez awarte manewiyatparêziyê dikim, pergal ajoyan pir zêde radike ser piyan, ez bi awayekî awarte hezkirinê mezin dikim. Bersivên min ên mezin hene. Pergal pir zêde ji rê derdixe, cahîltiyê pêş dize, ez çalakiyan zanînê ecêb ferz dikim. Ev jî min pir dewlemend dike û niha bi aliyekî xwe ve ez bi tena serê xwe

artêşekim. Mirina min jî, zindîbûna min jî dê gelek karan bike. Zindîbûna min her roja derbas bibe wê hîn zêdetir kar bike. Mirovê ku xwe rêxistin dike hêza mezine. Ti kes nikare îdîa bike ku ez ne hêzekî mezinim.

Di nava aqil û mejiyê dijmin de jî bi cîh nabe û dibêje; "*Yekî bi vî rengî çawa vî şerî dimeşîne, cîhan li pişta wî ye.*" Cîhan li pişta min e, yan li pişta we ye? Berevajî, ez li kîdera cîhanê me diyare. Lê mirovê ku xwe baş rêxistin bike li gorî min ji bombeya atomê jî bi bandortire, min jî ev kir. Ez li ser vî esasî ji mirov bawer dikim. Ger baweriya min bi mirov ewqas mezin nebûya, min nedikarî ewqas xwe pêş bixim. Hemû hêza me, bi rastî jî ji wisa destgirtineke rast a mirov û pêşxistina wî/ê tê. Ti kesî çend quriş pere neda me, her qada ku ez çûmê ji sifrê hatiye destgirtin. Ji ber ku me bi bawerî, kedê û zanînê hunand me ev pêşketin wisa derxistin holê. Ev jî di asta pîlansaziyê de ma.

Min çawa wisa xwe gihand asta Rêbertiyê? Ez heta niha jî çawa bandor dikim? Heta niha jî çawa dikarim gelekan bi xwe re biherikînim. Rêgeza wê jî heye, pîlana wê ya pratîkî jî heye, lê taktîkê wê jî heye. Hûn wisa ji ber xwe ve ber bi van karan ve naherikin. Ger ji we re maba hûn ê bi her alîve çûbûna. Me vana hemû çawa asteng kirin? Ev karê pîlanekî mezine, karê taktîke, ez bawerim hûn vî mafî jî didin min. Li şûna ku hûn ê di konê qereçiyan de bijîn, yan jî her cara ku hûn ji mal direvin û ber bi fêlan û bêvan ve biçin, xwe bigihînin hinek rêgezan, xwe bigihînin hinek bilindiyên vebijêrkên jiyanê. Ez van jî dixim pêşiya we. Jixwe ji bo vê hûn narevin yan jî şerekî bê wate li ser min ferz nakin, şerim dikin.

Îdîa, tesbît, rêgez mezinin. Mînak hene li pêşberî we, rêbertiyekî ev ser xistî heye. Hûn ê çawa derbas bikin. Bila yek derbas bike, ez ê jê re hemû cure xizmeta rêbertiyê bikim. Bila mirovan pêş bixe, hêza fikrînê, hêza hestan bilind bike, hêza

qezenckirina mirovan, hêza meşandina şer hîn bi aqiltir be, çima ez ê pê ve neyêm girêdan, çima ez weke rêber pêş nexim?

Ev Rêbertî jî tevî ku ez naxwazim û bi zorê dane ser milê min ez dikim, ji ber ku ji vê baştir hêza ti kesî têrê nake ez dikim. Heke na şêwaza min hîn zêde şêwaza xebatkirinê ye. Ji rêbertiyê zêdetir, rêbazê milîtaniyê ye. Dibe şêwaza avakirina yekbûna milîtanî û rêbertiyê. Hinek aliyên din jî hene. Divê ku hûn bizanin lêkolîn bikin. Ger hûn ji pirtûkan fêm nakin, ji pênaseyên giştî zêde pêş de naçin, ya me heta radeya dawî fêrkere.

Hûn nikarin mirovan bandor bikin, veguherînin. Hinekî weke min bikin, ma pir zehmete? Ma min tiştek fêrî we nekir? Ez her roj li ser serê we me, min hemû tişt qeyd kir, hinekî pêk bînin. Temam, ne gengaze ku bi hemû aliyan ve hûn weke min bin, jixwe hûn bikarin bibin hûn ê bibin rêber. Dibe ku derbaskirina min heta vê qonaxê ne gengaze, lê hûn dikarin weke milîtanên baş bişopînin. Divê ku hêza milîtanekî jî biçûk neyê dîtin. Milîtan fermandareke, fermandar jî rêberekî baş ê pratîkî ye û nirxekî mezin îfade dike. Qet nebe wisa bin.

Çima hûn di mezin bandorkirina mirovan, mezin rêxistinkirina wan û mezin destgirtina wan de xemsarin, çima hûn vê ser naxin? Çima qet îdîaya we nîne? Ev hîseke metirsîdîare bi min re. Ez dixwazim mirovan bikişînim qada bandorkirinê û qezenckirinê. Bi fikirin ez xwe parçe parçe dikim û ev jî çalakiyeke xweşike. Ji qezenckirina mirovan bi nirxtir ti hewldanên din nînin. Bi mirov re elewederbûn, bi mezinbûna mirov, bi bilindbûna wî re eleqederbûne. Ji hewldaneke mirovî ya bi nirxtir nehatiye dîtin. Ji mirov re bi hewldana herî binirx persiv dayîn jî ancax bi şoreşê, şoreşa herî bi wate, xwe gihandina îfadeya wê ya herî berfireh, di nûnertiya wê kirinê re derbas dibe. Em vê dikin, ma bi qasî tê xwestin we fêm nekir?

Hinekê jî mezinbûna we heye yan jî ev mezinbûn mezinbûna PKK’ê ye, hûn hewl didin wê jiyan bikin. Ger we PKK’bûn wisa

fêm kiriba, weke dihat xwestin jiyan kiriba, nûnertiya wê weke tê xwestin kiriba hûn ê bibana mirovê serwer -dema ku dibêjim serdest xelet fêm nekin- di xizmeta mirov de hûn ê bibana rêberê Partiya ku misoger çareseriyê pêş dixe. Ev gengaze jî. Nebêjin rê û rêbazê wê nînin. Rê li pêşiya we vekiriye, ya zehmet jê dûr mayîne. Şêwaza me çiqas balkêşe hûn nabînin? Çiqas mirovan qezenc dike, çiqas bandor dike û hûn çiqasî muhtacî vê ne hûn fêm nakin?

Hûn hezkirinê dixwazin, gel çawa ji min hez dike? Di dilê milyonan de cih girtinê de serketim. Yên ji we hez dikin kêmin. Hûn dikarin pir hez bikin, jixwe ez derfetê vê jî didim we. Hûn xwe mahkûmî bê hezkirinê dikin. Hîn jî hûn qala; rast netevlîbûna Partiyê, jiyanê û xwe ferzkirinê dikin. Gelek aliyên ku em rexne dikin we bê hezkirin dike. Ne yekî ji we hez dike heye, ne jî hezkiriyê we, ne hez dikin, ne tên hezkirin. Hûn ferdperest û egoîstin. Hûn di rewşa ku derfet destê we keve hevalên xwe bi ecîqînin de ne. Vaye hûn dibêjin evîna sewdaserî, hûn ê bi ser de biçin û bifetisînin.

Di rastiya Kurdan de evîn dijminê heft bavên heve. Evîn dikare bibe dijminê heft bavan? Lê di nava me de dijmin aniye vê astê. Dijmin me wahşî kiriye, wê ev çawa bê derbaskirin, min bi şoreşeke mezin a hezkirinê ev pêk anî. Zêde pêdiviya min a xwe dana hezkirinê nîne. Jixwe ez ji evîna mirovên paşverû hez nakim. Lê ji ber ku ez dizanim mirov bi hezkirinê mezin dibe ez dibêjim; "*Bihêle bila gel hez bike.*" Min hîn pêşnexistiye, ger hinekî din pêş bixim, weke min got ti hestên ku ez pêş nexim nîne. Ev hinekî bi kesayet dibe, hinekî bi fêmkirin û pejirandina me dibe. Bêguman zehmet dibe. Ya din jî bi awayekî herî xirab bi teqlîtkirina me, heta hêza me, bandora me bi şêwazekî herî xirab hûn xwe li ser mirovan ferz dikin. Hûn xirabiya herî mezin li xwe dikin, dema borî ji vê re digotin gunehe. Bi teqlîtkirina me, bi vî rengî bi ser mirovan de çûyîn, hêza bandora me xirab bikaranîn

minafiqtî ye, nekin. Ji me mînak bigirin, nûnertiya me bikin, heta ji me baştir bikin. Bila hemû başî yên we bin, lê bi rastî jî girêdana vê bi kedê re heye, divê ku bi şêwaz û uslûbekî bê ziman. Ger na bi tîpê Kurd ê kevin, xayîn, tîpên xafil yan jî dîn û har, tîpên ku xwe nizanin re hezkirineke we, nabe rêzdarî û nêzîkbûnek we ya mirovî.

Di vê mijarê de ji ber ku hûn dibêjin em bi we ve girêdayîne vana diyar dikim. Ma min bandorkirin weke we kiriye? Mantiq çiqase ma hûn nabînin? Karê dil, nermbûn, ji aliyê din ve bi rêgez ve girêdan çawa di nava hev de ye? Dibe ku nebesiyên min hebin, lê şopandin çiqas bê amane? Divê ku hertim li ser kar bê mayîn. Di nava kar de bin. Ez naxwazim çirkeyekê jî xafîl bimînim. Temam, dibe ku hêza min têra her tiştî neke, lê li gorî derfetan ya ji dest tê raber dikim. Ev pir vekirîne, ger hinekê jî hûn jê re rêz digirin, taybetmendiyên milîtanî yên ku divê hûn bi xwe bidin xwarin ev in.

Ez dikarim ji gelek aliyan ve vekim. Nizanim, hûn çawa bandor dibin? Divê mirov ji kîjan alî ve we bandor bike? Hinek çavdêriyên min hene, hinekê jî ji ber vê ez ewqas xwe vekirî dihêlim. Lê ji we pirsîn jî dibe ku sûdmend be. Madem ji ber hûn ewqas tengin, madem ji aliyê civakî ve jî hûn paşketîne, ji me çareseriyê dixwazin, eşkere bixwazin. Ez hîn ji bo we çi bikim? Ji bo mezînbûnê, girtina pîvanan ez hîn çi bikim? Ger ez têrê nakim jî bêjin. Ne kesek wisa me ku ti gotin li ser min neye kirin û nedest dayî me. Tenê daxwaza min ji we; azadiya nîqaşê ya ku min ji we re nas kiriye, di çarçoveya xwebexşiyê de hûn jî ji min re nas bikin. Li pişt min fesadiyê nekin, ne ji piştê ve li min bidin, ne jî henekê xwe bi min bikin. Ez ji bo pêşwazîkirina hemû tiştê we heme.

Dema qala we dikim, behsa dijmin jî dikim. Bila dost bi dest, bi dar lê ne de, henekê xwe pê neke. Bila hinekî bi uslûbê mirovî derkeve pêşberî min, ez ji hemû tiştî re heme. Misoger ez

nabêjim; "*Rêberekî wisa me, tiştên ku ez dibêjim qanûnin, ayetin",* ez li holê me. Ji bo mirovan çi raste, bila bi wê min ber bi xwe ve bikişînin. Çima li pişt min daxivin, çima li dijberî min ewqas pirtûk dinivîsînin? Ez li virim, nerevîme, ti kesî jî tengav nakim. Dema ku tu li pêşberî min bû te digot, "*ji te meztir kes nîne"* çima li pişt min tu hemû cure xirabiyê dikî, zilamê durû!

Eleqeya kesî ji we ji malbatê, ji hev nedîtiye, rêzdarî û hezkirinê em nîşanî we didin. Çima hûn ê li pişt me berkaşî bikin? Herkes dizane, li gel me we tenduristî û şadî qezenc kir. Çima hûn ê vê înkar bikin? Di gel vê em bi xwe nakin, me hinekî bandor kir, rê nîşan da, me wisa afirand her tişt. Ez ne di vê îdîayê de me ku her tiştî bi me dest pê kir, lê hinekî me hewl da em çaloxwariyên we, rêşaşiyên we sererast bikin, di jiyanê de me ev ferz kir û ger hûn zilamin, bi îdîa ne wisa bikin. Nêzîkatî ev e û ev jî karê her kesê perwerdekare. Madem hûn hatine perwerdê, bikin.

Dîsa jî yê bê hêz ne ez im. Yê kehir dibe dijmine û pir tengav dibe, acize jî hûn in min çi jê ye! Ez her roj bangewaziya fetihkirina jiyanê dikim. Ji heft salî heta heftê salî her kes pir zindî ye, şêwaza fetihker kêlî bi kêlî ji bo pêkanîn û jiyankirinê amade dikim. Piraniya we weke miriyane. Hûn rast jiyan nakin. Azwerî, çoşa we çiqas lewaze, mantiqê we çiqas kêm dişixule, dilê we çiqas ji hişyarî, hestyarî û berpirsyariyê dûre, nabihîze, bi eleqeyeke mezin berê xwe nade ya pêwîst.

Em ne wisa ne. Hûn dibînin, hezar û yek karê me heye. Binêrin em bi perwerdeya we re jî mijûl dibin, lê dîsa jî em çiqas li ser karin? Yê ku jê re tê gotin mirov hinek wisa dibe. Ez dikarim zêdetir jî xwe vekim. Ji xwe me pir vekiriye. Em dikarin her roj weke bûyerekê bikin, em dikarin hêjî bilind bikin. Ez ne bêxîretim, lê her tişt bi min jî nabe. Pirsgirêk hûn jî gihandina vê astê ye. Gengaze û divê hûn pê bawer bin.

Mînakên me cesaret dide we û divê bide. Ne bi teqlîtkirinê, divê ku bi ketina ser rêyên pêşketinê hûn bikin. Misoger pêdiviya we bi teqlîdê nîne û encam jî nade. Rêyên gelek giran û fêrker hene. Aliyên bandorker pir vekirîne. Ji bo xwe xwedî lê derkevin. Ji ber ku hestên mezin, fikrên mezin çalakî divê li bejna we bên, yê we bin. Ya min têra min dike. Pêdiviya we pê heye, ji bo xwe, xwe negihandina mezinbûneke wisa çima hûn ê înkar bikin, çima di xwe re nebînin? Hûn pir hejarin. Ji hemû alî ve hejarin, hejariya fikrî, hestî, xweşikî, pîvanan, hîs, berpirsyarî û hejariya aliyên siyasî, leşkerî, uslûb, şêwaz, tempo hemû bi we re heta li çogê ye. Wan fetif bikin û ya herî giringî jî hejariya pîvan û terbiyê ye. Ev di asta herî jor de ye û bi lez derbas bikin.

Waneya ku di derbarê vê civakbûnê de me dît çibû û min ji çi re bersiv da? Hûn çi nîqaş dikin? Nîqaşkirina we bi wate ye, hûn tiştê şaş nedin yan jî bila pir kêm nebe, pêwîste, hûn piştî waneya artêşê derbasî waneya civakbûnê bibin. Bi qasî ku ez dikim hûn ê nekin, lê bi şêwazekî ku bikaribe van nebesiyan derbas bike de ye, di vî tempoyî de ye yan jî kûrahiya wê heye? Weke din hûn dikarin çi ji min bixwazin? Ez kîderê vekim, çawa vekim û ji bo ku ez we bandor bikim aliyê min ku divê herî zêde raber bikim çiye? Ev alî çine?

Misoger divê em vê çêkerê û we biguherin. Ma hûn ê qet nehejin, terbiye nebin? Mezin nelîzin? Wê demê we çima ewqas westand, çima we ezab bi me da kişandin? Bi salane ger em ê hîn mezin nelîzin, di vê bebektiyê de israr wê fêda xwe ji çi re hebe? Yan jî ger em pir xeletin bêjin em tasfiye bikin. Lê di vê bebektiyê de israrkirin we biçûk dixe.

Hûn bi van hemûyan re rojane di nava hev de jiyan dikin. Ez di kesayeta yekî de we hemûyan tînim ziman. Ez yek bi yek nikarim bi herkesî re baxivim, ya rast bi giştî re hatiye axaftin. Divê êdî hûn bên ziman, li gorî van rastiyan tevgerînê pêk bînin. Ma hûn gelek bê behremendin? Hûn di rewşa ku mirov qet ji we hêvî

neke de ne? Hûn ê neyên jiyana civakî yan jî hûn ê fetihkirinê di kesayetiya xwe de kengî pêk bînin? Kesayetiya fetihkar bê derfete? Çima azwerî ne di derbarê vê de be. Di vê mijarê de hûn li kîdera pêşketinê de ne?

Belê, tê rapor bide. Rastiyê bêje, madem tu xwe pir bi aqil dibînî, bêje! Heval zana ye, ji bo biçûkdîtinê nabêjim:

***Ab.:*** Serokê min, pêşketineke diyar heye di civata hevalan de. Me jî nû dest bi waneyê kir. Hîn hevalên ku wane amadekirine vedibêjin, di dema pêşiya me de em ê derbasî beşa nîqaşan bibin. Waneya xwe ya îro jî me cuda, bi aliyên cur bi cur ve nirxand, hîn zêde me xalên girîng destnîşan kir. Pêdivî, wê di destnîşankirina pêşketin divê di kî derê de be bê dest girtin. Bi van aliyan ve wê ji waneya me re jî sûdamend be, ez di vê baweriyê de me ku dê ji aliyê hevalan ve jî berhemdar be.

***---.:*** Eşkereye ku ez ê perspektîfeke sereke bidim. Em neçarin vê kesayetiya we, rewşa we bizanibin. Ev sererest dibin? Dikarin jiyanê tehlîl bikin? Ferzkirinên rojane li ser min bawerim heta niha jî hilnaweşîne. Lê ji wan re bimîne bi qasî ku min hilweşîne giranin, mafê we ji vê re heye?

***Ab.:*** Pêşketineke berçav heye Serokê min. Bi hevalan re lêhûrbûn heye. Ev ji bo hemû çêkerê jî derbasdare. Dikare bê gotin hîn di pêvajoya dahûrandinê de ne. Ya kêm, di asta ku Partî dixwazê de pêşketineke pir li pêş û xala fêmkirinê ye. Yanî ber bi pêşveçûyîn, gavavêtin û di xala asta jor de peywir û berpirsyarî girtinê de nebesî hene. Ev çêker ji hemû aliyan ve xwe nagihîne pêşketineke wiha. Lê bi gîştî di çêkerê de pêşketinek heye. Hem di asta terbiyê, hem jî di asta agahî girtinê de heval…..

***---.:*** Ez qala terbiya herî mezin dikim. Ev ne terbiyeke ji rêzê û biçûke. Di van xalên sereke yên te gotîn de terbiye pir girînge.

***Ab.:***Pêşketineke berbiçav hat jiyankirin Serokê min.

***---.:***Min nexapînin yan jî xwe nexapînin.

***Ab.:*** Na Serokê min.

**---.:** Misoger terbiyê dibînin? Me hewl da ji gelek aliyan ve em terbiya artêşê bidin ne wisa? Me aliyê bîrdozî, siyasî pir zêde vegot. Terbiya civakî, nebêjin cewhera vî karî ye û derbas nebin, heta ku ew nebe terbiya çêkera jorê çênabe. Di pirtûkên olî de derbas dibe û qala "*jiyana bi êş a çil salan*" tê kirin; waneya terbiya civakî jî wisa ye. Êşeke mezin jê re pêwîste. Misoger em ê terbiya civakê pêk bînin. Ev pir girînge! Te ev tiştên ku min gotin fêm kir? Li gorî te aliyên herî balkêş çi bûn?

***Ab.:*** Pêşketina civakî, pêwendiya civakbûnê bi qadên jiyana civakî yan din re, rewşa bandorbûn û bandorkirinê min baş fêm kir.

**---.:** Yanî axaftineke kilîte.

***Ab.:***Ji aliyê hemû nêzîkatiyan ve dibe kilît.

**---.:** Bele, ez hertim dibêjim, ez ji rêzê naxivin. Her axaftineke min di akademiyên dijmin de weke waneyêkê tê destgirtin. Lê hûn bi xwe re nabînin li ser jî bisekinin. Qet nebe bi qasî dijmin pê re eleqeder bibin. Ew dijmine, dixwaze ji bo xwe bikar bîne.

Li gorî te ez kîderê zêde vekim? Ya din jî rastiyên ku ev darêz bi xwe re derdixe holê heye. Ez bawerim hinek îdîayên van provakatoran hene. Heta niha jî hinek xafîl û xayînên ku ji nava me derdikevin hene. Hema bêje bê aman ji hemûyan re bersiv hat dayîn. Lê ev bi çi re mijûl dibin? Bawerim, dixwazin li ser Rêbertî hinek gumanan pêş bixin. Dema ku dibêjim Rêbertî, ez qala xwe nakim, bertekeke pir mezin li beramberî pêşketinên derketine holê dijîn. Li gorî te pêşketina ku herî zêde jê bertek digirin çiye?

***Ab.:*** Di nava têkoşînê de qada civakî pir zêde derdikeve pêş Serokê min.

**---.:** Şoreşa me her ku diçe ji hêmana bîrdozî, siyasî, leşkerî ber bi hêmana balkêş ya civakî ve diçe? Ev jî jiyana gelekan serûbin dike, nemaze rê ji bandor û bertekên pir mezin re vedike.

***Ab.:*** Çêkera civakî ya ku pergalê xwe li ser damezrandiye û çêkera ku dikeve nav parçe dike. Hilweşina wan jî ji wir tê. Jixwe berteka wan heye li beramberî vê yan jî dixwazin ji vir ve pêşketina şoreşgerî bisekinînin, hilweşînin.

***---.:*** Bawerim di nava çêkera me de we mînaka ku derket dît. Rastiya ku li pratîka Mêrdînê hat darizandin û di derbarê wê de biryara darvekirinê hatî dayîn, dîsa di pirtûka provakatorên dawî de rastiya ku derketiye çiqas bi rêxistinê re girêdayî ye û di bingeh de encamê çiye?

***Ab.:*** Min beriya niha jî diyar kir, şoreş, çêkera civakî ya kevin tengav dike; dixe zehmetiyê, pergalê jî dixe zehmetiyê û parçe dike…

***---.:*** Ew çawa bersivê didin vê?

***Ab.:*** Xwedî li ya kevin derdikevin, bi çar destan himêz dikin û bi awayekî ji rêzê vê dikin, hem jî gelek paşketî, bi himbêzkirina pêwendiyên paşverû bi wê xwe îfade dikin.

***---.:*** Bê ku bikeve ferqê heta xala kontrabûna dijmin bilindbûne…

***Ab.:*** Ew jixwe dibin rêgezên pergalê, dibe pergal bi xwe.

***---.:*** Bê ku bibe sîxûrê bi zanebûn, kontrayeke-kontra, ji xwe milîtanê şoreşa dijbere rewşek derdikeve holê. Yanî pêwîst nake bi sîcîl be. Ez bawerim ev rabûna ser piyan a pergala civaka kevne. Civakbûnek ku dijmin avakirî heye, cîhana ajo û hestan heye. Ez hewl didim van parçe bikim. Ev jî bi şêweyek pir cuda ya valaderxistinê ve bersivê didin. Min berê ev digot; nehatina arasteya bîrdozî, siyasî, leşkerî, niha jî dibêjim arasteya nehatina jiyana civakî. Tê gotin; "*Ger em werin jî em ê wisa werin*", ev jî pêşketineke pir balkêşe, dixwazim vê bêjim. Di nava me de jiyan civakî çawa vediguherînîn jinayeke kontra? Ev mînak bawerim dibe îfadeya vê ya herî balkêş.

***Ab.:*** Ji aliyekî ve li ber xwe didin, ya rast tengav jî bûn, parçe dibin. Jiyana şoreşê tengav dike, parçe dike. Li wir ber xwe didin,

ew bi xwe jî hewl didin wê jiyanê biparêzin. Ji aliyekî ve dema vê dikin jî divê pêşketina şoreşgerî rawestînin.

**---.:** Rewşên hestyarî yên balkêş ku ev dikevin nav hene. Hem di zilambûnê, hem jî di pîrekbûnê de bawerim gelek balkêşe, hem jî rewşeke pir nizm mijara gotinê ye. Çima? Li pêwendî û jiyana van binêre û bersiv bide.

***Ab.:*** Ewqas himêzkirina tiştên ji rêzê rewşeke lewaz îfade dike.

**---.:** Ger hûn bi baldarî lê binêrin, jin jî, zilam jî, dema ku ji nû ve derdikevin holê, li gorî pîvanên me yên Partiyê, milîtaniyê, yanî bi hemû taybetmendiyên xwe, ger hûn bal bidinê bi hemû taybetmendiyên xwe ve me pêşketinên pir vekîrî derxistin holê. Lê vana bi şêwazî pir balkêş êrîşî vê dikin. Di pêwendiyan de şêwaza êrîşê û kontra heye! Ez bawerim KT'yê jî hinekî pispor pêgihandin. Hinek jin û zilamên pispor ên ku dikarin xwe vedizin nava refên me pêgihandin. Lê vana di nava yê me de, yanî yên ku ji ber xwe ve derdikevin dibe ku ji aliyê çepê ve di bin sifirê de dimînin. Yanî ji şêwaza derketina yên ji ber xwe ve di nava me de xetertir nîne yan jî asta xeteriya yên me di asta ku neyê bawerkirin de ye.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Yanî dijmin bi zanebûn rêxistin bike nikare ewqasî rêxistin bike yan jî pêbigîhîne.

**---.:** Bi taybet dijmin di eniyê de lê dide, xwe vedize nav, vê demkurt digire dest, şekil û şemal diyare. Lê kontrayê di nava me de, kontrayê hezar sal ê paşverûtiyê, radestbûn û xefletê ye. Nemaze xeteriya wî/ê tê fêmkirin. Ya herî xirab jî vana kontrayên objektîfin, yanî di pêwendiyan de konrta ne. Herî zêde wisa derdikevin ne wisa? Hinekî pêwendiyên azadker hene, bi vê çawa lê didin? Ev di gelek endamên provakator de bi vî rengî ye. Di endamê dawî de jî ya derketî ev e. Qaşo hewl didin hevdû jiyan bikin? Çiye ev?

Baldar bin, helwesta azadiyê pir pêşketiye. Derfetê pêwendiya azad di pêwendiya jin û zilam de derdikeve holê. Di demên borî

de ger hûn jin û mêrê hevbûna jî, ji bo hev ewqas vekirî, li ser esasekî azad we yê navengek dest nexista, heta ez ne bawerim ku hûn ê rêzdar û bayexdar nêzîkî hev bibana. Hûn pir baş dizanin mêrê we yê çil salî hebûya, jineke we hebûya, yeqîn nakim ku dê we samîmiyeta ku niha me pêş xistiye, bidest xistiba. Tevî vê jî êrîşeke pir mezin li ser pêwendiyê heye. Ji bo ku ez vebijêrka şoreşgerî, azadiyê bînim bîra xwe vana dipirsim.

Ez dixwazim xayîn, xafîl û kontrayê dijberî evîna azadiyê ye bi hemû aliyan ve bi we bidim nasîn. Ev, karê romanekê ye, karê hunere. Lê dîsa jî divê em hinek nîşaneyên wê derxin holê. Niha hinek yekser, hinek jî ne yekser dixwazin asta min bixin bin êrîşeke mezin. Çekera kole jî hinekî ji vê re zemîn pêşkêş dike yan jî li ser esasê baweriya bi wan dixwazin wisa li vê çêkerê bikin ne wisa?

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Em neçarin vê bi gîrîngî fêm bikin. Ev xala herî girîng a waneya civakî ye. Êrîşkirina ser min; tê wateya êrîşkirina ser pêwendiya azadiyê.

***Ab.:*** Jixwe didin diyarkirin Serokê min. Xalên ku êrîş dikinê, xalên azadkirina civakê ne, êrîşek li ser van hewldan ne.

***---.:*** Çend roj berê min di televîzyonê de dît. Kasetek ketiye destê wan, bawerim di derbarê malbatê de ye ku me di waneya civakî de vegotibû. Bi mûçinkê hinek peyv jê derxistine, qaşo ji bo ku min li beramberî civakî tengav bikin dê bikar bînin. Bawerim di civakê de di derbarê min de rewşek erênî ya baş daye diyarkirin.

Di pratîka Mêrdînê de me xwest em jina azad derxînin holê, wan jina azad di sixinaqan de nizanim çi ji hev kirin û hewldan hevdû tine bikin. Ya rast yekîtiya azad pêş diket li wir, bi taybet di wan qadan de jin jî di nava daxwaza pêşketinê de bû. Lê pêşengê li wir, bi hêza ku ji me girtî bi şêwazekî xeter bikar anî û arasteyî tepisînê kir. Piştre çi bû? Tasfîye bû, pratîka xiyanetê

jiyan kir, yek ji wan bû kontrayê dijmin, mir û çû. Yê din cezayê mezin girt. Li wir pêşketineke azad hebû; welatparêzî, azadiya jinê, azadiya civakê bû…Di pratîka Mêrdînê de çav berdan vê ne wisa?

***Ab.:*** Serokê min ger bi hev neketibana pêşketinên li wir, wê veguherîna pêşketinên careke din vegera wan nîne. Piştî ku li Mêrdînê pêşketineke wisa hat destxistin û şûnde, dê êdî nekarin civaka Kurd bigirin.

***---.:*** Di civaka Mêrdînê de meşeke azadiyê û serkeftinê ya mezin hebû. Ji wê re paşverûtiya di nava me de, ew kesayetiya biçûk, weke ku min got kesayetiya li beramberî dijmin parçe parçe bûye bi xwe sipartina nirxên me yên azadiyê pêngava dijber rêxistin kir û tiştekî jê nebawer derket holê. Ez ne bawerim sîxûrên fermî bin. Azadiya ku bilind dibû cîhana wan hilweşand, bi berteka ji vê re bihîstin bi hêza ku ji me girtin pêşketin serûbin kirin mijara gotinê ye. Divê ku ev derûnî, kesayet baş bê naskirin.

Heta niha jî kesayetiya Mêrdînê teysîna wê li nava Partiyê me negirtiye bin kontrolê. Em hinek mînakan hîn didarizînin. Hûn ê vana darizînin. Çiye ev? Çima zûwa dikin pêşketinên azadiyê? Mirov dixwazin bixebitin, rêxistin bikin, ev çima ewqas belav dikin, tînin rewşa ku henase neyê girtinê. Ev ruh, ruhê kiye? Misoger divê hûn taybetmendiya çînî, ya netewî fêm bikin. Tiştekî neyê bawerkirine, em çiqas dixwazin ber bi şer ve bidin bazdan, ewqas qut dike, em çiqas dixwazin rêxistin bikin, ewqas qut dike. Mîna çalareş, hemû wize û ronahiyê tine dike. Divê ku mirov ji wan re bêje: "*Çalereşa civakî.*" Mînaka vê ya din çiye yan jî ya ku ew êrîş dike û qut bike çiye? Kontrayekî balkêşe û ne di ferqa rewşa har a tê de ye. Li gorî xwe ya jê hez dike, ji sedî sed ya ku Partî jê re bûye wesîle û pêşketineke me jê re pêşengtî kiriye.

***Ab.:*** Partî nebûna, jixwe wan ne dikariya wisa xwe derbixin holê.

**---.:** Ji sedî sed kesayet me çêkiriye, çarçoveya bîrdozî, siyasî û di wateye girtina van a wê çarçoveyê de bi vî rengiye. Lê ew ji bo vê bûye kontrayekî çawa? Hêza Partiyê ya erênî heta dawî kar anî. Lê çiqas paşverûtiyên wî hebûn; çiqas paşverûtiyên malbatî, fantaziyên civakê, dogmatîzm hebû, bi zirxê Partiyê xwe pêça û hem jî li dijberî Partiyê bi şêwazê herî ketî tevgereke dijber ava kiriye. Ewqas windabûna rastiyane û înkargerê nirxa ye. Her çiqas vana weke mînak bên destgirtin jî, rewşeke zêde tê jiyîne.

***Ab.:*** Dema ev dibêje; "*rêxistin*" herî zêde xwe dispêre malbatê Serokê min. Vaye, em hertim bûne ev. Yanî, weke tevgerîna gundiyê ku cîhan nedîtiye; "*Wey dayê, wey bavo.*"

**---.:** Misoger wisa ye! "*Li kîderê ma hevjîna min-pîreka min*"

**.:** Bi zimanê wan qaşo *"Di bin navê hevjîna min ewqas êş kişandiye"* wan dide axaftin.

**---.:** Belê, ya ku jê re dibêje malbat, pîrek, mêr, di destê me de bi qasî qirşikekî nirxê wê nîne. Ez zilamtiya vî jî nas dikim, pîrektiyê jî dinasim. Li gel me mîna pûtan li wan dihat. Aliyê ecêb yê vî karî jî ev e. Heta niha jî wisa ye. Dixwazim vê bêjim, ew jiyana civakî bi rastî jî ji penceşêrê xirabtire. Qaşo di derbarê min de pirtûk dinivîsîne. Qaşo wê xwe bigihîne min. Wî ji bavê û axayên-emperyalîstan bipirsin, dikarin bigrin bin venerînê? Bila ji hemû cure pêkanînên şerê taybet û dîktatoriya hezar salan ya KT'yê bipirsin. Pir ecêbe? Lê di tehlîla dawî de hemû hev digirin. Çawa hev girtin, hem jî di asta herî jor de.

Vana ji bo vê girîngin; ger hûn dixwazin xwe bigihînin zanînên mezin mînakên di nava we de, zemînê ku xwe dispêrinê divê ku hûn bibînin û ez tenê qala derbazkirina van nakim, di kesayetiya wan de çiqas dijmin heye, hûn ê kîna xwe arasteyî wan bikin û pêş de biçin. Di heman demê de ev, di jiyana civakî de derfetên pêwendiyekê dafirînin. Jixwe min ji bo vê got; me bi xerckirina kedeke mezin ve xizmeta herî mezin ku ji mirov re bê kirin raber kir. Ya herî bi wate jî ev e, hewldana herî bi nirx jî ya azadiyê ye.

Bi taybet ji bo ji holê rakirina rewşa xetimandî û rizî di pêwendiyan de hewldana ku hatiye raberkirin, êrîş jî hinekî li ser vir pêş dikeve, ya ku ez dikim hinekî azad bimînin, dijminê xwe bibînin.

Wisa dizanin ku hez dikin ne wisa? Hemû tiştê vê jî bi min dide kirin, ya ku jê re digot; “*jina min”* ya ketî me sê-çar sala li ser milê xwe kir. Ew zilamê din jî, keçik jî sê-çar sale li vir li ser pişta xwe digerînim. Çiye, ez li pêşiya wan astengim! Hinekî mirov bi rû dibe, birêz dibe. Çima ewqas înkargerî, çima ewqas dervî rastiyê heye? Ez xwe di qata xwedê de nagirim dest. Lê ev bibe mijara gotinê, ji sedî sed min afirandiye. Hêjî hemû di destê min de ne, ji xwe “*mijara ku dibêjin ayetên xwedê”* ez bawerim bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Hema bêje dixwazin bêjim em ji bo wan xweda ne ne wisa?

***Ab.:*** Raste, Serokê min.

***---.:*** Hem pirtûk nivîsandiye, yên din jî daxwaznameya efûkirinê nivîsî ye. Xwedê efû dike, zêde taybetmendiya mirov ya efûkirinê nîne. Ji ber ku me dixin şûna xwedê wisa dinivîsînin, wîsa dizanin. Ev jî çiqas kevin bûne wê dide diyarkirin. Zirara wan bi van ve sînordar bimaya, me zêde pêwîst nedidît ku em li ser rawestin. Pir hene di nava me de û ger em lêkolîn nekin wê azadî zirarê bibîne. Em dijmin tenê di eniyê de, bi rewşa wî ya çors ku çek di dest de nebînin, xwe bi vê sînordar nekin. Dijminatiya herî xeter, yê hundirîn bi rûpoş, bi hezar û yek rû, sînsî yê bi vegotinên ku hêjayî devokan tê dîtine. Ev yê herî xetere.

Hûn çiqas me fêm dikin? Ez bawerim hûn waneya malbatê dibînin. Ya min tenê ne waneyeke malbatê ye, ez di nava hewldana malbateke şanaz de me. Ji heft saliyê heta roja îro pêwendiya malbatê, nakokiya wê vediguhere malbata herî mezin a mirovatiyê. Em girîngî didin avakirina parçeyeke bijare ya

malbata mirovatiyê. Bêguman ez sedemên vê, çawatiya wê çiqasî diyar bikim jî ji hemû aliyan ve nayê ravekirin. Dikare bibe karê romanên mezin. Di demên pêş de bi romankirineke mezin dibe ku hinekî van hewldanan di asta hunerî de biteyisîne. Niha pir zêde bi aliyê wê yê bîrdozî, rêxistinî û leşkerî ve ez mijûl dibim. Bêguman bi zimanekî wêjeyî vegotina wê girînge, xwe gihandina asta wêjeyî girînge.

Me qala asta civakî kir. Weke ku em dibînin, em ne di rewşa yên ku fêm nakin, tênagihêjin de ne, xayîn jî di nav de yên ku wan dimeşîne em in. Ger em nebin xayîn jî nikarin bijîn, ew xayînên me ne. Ji ber me dijîn, xe,afîl jî wisa, dijminê me jî, niha her kes dibêje; şebekeya berjewendiyan çêkirine û naxwazin dev ji vî şerî berdin. Dijmin xwe jî em dafirînin. Mezinbûn di yekparebûnê de ye. Lê ji ber ku me ev afirandine jî em ê devji têkoşînê bernedin, divê ku em bizanibin wan weke dijminê dîrokî bifetisînin.

Eşkerekirina dijmin gaveke pir mezine. Ew xayînên kevnin, xafîlê kevnin. Ev dijmin dijminê hezar saliye, lê xwe veşartiye, derneketiye holê, xwe mîna gurekê postê berxikê li xwe kiriye dide nîşandan. Ji heywanan jî xirabtire, bi pîvanên hemdem xwe weke mirov nîşan dide. Me despêkê derxist holê, di vê de serkeftî bûn. Karê derxistina holê dikare zêdetir bê pêşxistin, lê ji bo yên ku dixwazin şer bikin bese. Dîsa jî ev têrê nake. Ya din jî dîtina ya ku derketî holê dîtine. Niha hûn dizanin, di tarîtiyê de bi kulm weşandinê tu nikarî li dijmin bidî, tê despêkê derxe holê, piştî ku te derxist holê, ya din jî tê çors xwe navêje serwî. Dijmin dijmine. Te derxist holê, teşîs kir, tê bi îdîa ser de biçe.

Tenê min dijminê çors nîşan neda, ez difikirim hemû tiştên ku di nava me de divê bên derbaskirin jî bigirim dest, pêwîste em wisa nêzîk bibin. Ya rast paşverûtî jî dijmineke. Jiyan rast nejiyîn, dibe ku ji dijmin zêdetir rist bilîze. Vaye me derxist holê, çine ev? Xayîn û xafîl çiye? Taybetmendiyên van ên ketî hene, kirêtiyên

van hene, xirabkarî, taybetmendiyên ji fesadiyê jî xirabtir hene. Rast nepêkanîna rêxistinê, terbîyekirinê û pîvanan derdikeve holê. Vaye yê ku derdikeve holê, dijmine, dê çawa bi serdeçûyîn çêbe? Bi hêza fikrandinê, hêza hestan, çeka rêxistinê, çeka perwerdê, ger pêwîst bike ketina nava şerê germ, bi hêza propaganda pê re têkoşînkirin; lê bi sebirkirin, pîvan dîtin vana hemû çekên kujerin. Bizane kîjanê li kîderê çawa bikaranîn jî dibe peywira milîtanan. Çeka hezkirinê, çeka rêzgirtinê çekên divê di cîh de bên bikaranînin. Ger na em nikarin li van dijminan bidin.

Cidî bigirin, vana dijminên bi bandorin. Dijminên ku we matmayî dihêlin, azameta me û pêngavên têkoşîna me bê wate dihêline. We çima heta niha teşîs nekir? Mînak we çima rêzdarî, hezkirin, aheng, hevbeşî, pîvan û terviye teşhîs nekir? Vana çiqas ji bo me pêwîstin, bi vana çiqas mirov dikare li dijmin bide, dijminê hundur û derve çiqas bi vana hatiye tinekirine. Divê ku em çiqas biafirînin? Ya din weke çekek mezin divê em çawa li dijberî dijmin bikar bînin? Hûn vê nakin. Şerkeriya we ji şerkeriyeke wiha çors wêdetir naçe, lê ya min ne wisa ye.

Dubare dikim, ez van çekan baş bikar tînim. Mînak, ez mirovan hestiyar dikim, hêza hestan a gelekî niha dijmin kehir dike. Li derdora min hestyarbûn, hertim ez bibîranîm li dijmin dayîne. Ji min heskirin li dijmin dayîne. Herkes vê dizane, min hezkirin û hestyarî anî vê rewşê. Min çiqas girîngî da vê, ji bo avakirina vê min salên xwe çawa dan? We waneya hestan qet nedîtiye. Ev çil sale vê waneya hest dibînim. Ma ji ber xwe ve rê li ber vê bandorê vedike. Emperyalîstan, mêtîngeran, trîlyon, katrîlyon xerc kirine, nikarin vî gelî bi xwe ve gire bidin. Min çawa ser xist? Ji bo we jî dijberî me derxe keda ku raber nekirin nema. Tevî vê jî, tevî hemû van rexneyan hûn mirina xwe digirin ber çav û tên şer dikin. Em her roj we wisa gire didin yan jî dubarekirina hinek rêgezên mezin mijara gotinê ye.

Hewldana jinê şerkeriyeke mezine. Di demên borî de jê re digotin şervantiya ji dil, ewliya bi êşkişandinê derdiketin holê, ya rast ji wan re digotin mirovên jidil. Ya me jî hinekî di wê wayetê de ye, lê bi şêwazekî cuda, aloztire. Jixwe ji bilî vê milîtaniyê jî hemû taybetmendiyên dîrokî di kesayetiya xwe de temsîlkirin û ji hed zêdetir tevlîkirin jî bi zanebûn em jiyanî dikin.

Hinek ji we vê qet fêm nakin, hûn tenê aliyê bandora leşkerî ya vî karî bikar tînin, aliyê zehmet ya kar bikar tînin. Ez ne wisa me. Ev hemû çek me derxistin holê. Hemû pêşketinên bîrdozî me kir. Me da we jî, lê ez bi van kar nakim, bi çekên cudatir kar dikim, nêzîkatiyên min ên cudatir hene. Bifikirin ger we hemûyan wisa bikira, me yê zûde dijmin tine kiriba. Heyfe bêku hûn van çekan bikar bînin şer dikin. Ev dijminên me, ji ber ku hûn ne xwedî van çekanin dê werin. Çekên ku ez dixwazim bi we bidim karanîn di cîh de û dema wê ger we baş eyar kiriba û bikar baniya, ne gengaze ku we bin bixin. Bi vê cesaret û fedakariyê hûn dikarin ji min jî zêdetir bi serkeftî bin. Bê mubalexe van dibêjim, hûn şêwaz nagirin.

Li kîderê çi pêwîste, li kîderê çawa bê lêdan, li kîderê çawa pêngav tên avêtin, mixabin hûn pir lewazin. Misoger hûn wisa ne. Binêrin, pêngav pêşxistin û ketina sengeran dema ku dijmin derdikeve pêşberî we hûn dikin. Ez vê qet ji çalakiyê hesab nakim. Sengergirtina min cudaye, di kemînê de namînim, çekan bikar nayînim. Li gorî min ger mezinbûneke şerker a bi vî rengî nebe nikare wate bide wî şerê çors jî. Di dilê wî/ê de jî wisa ye. Yên ne xwedî tolgirtina mezinin, hestên wan ên mezin nebin, beriya kîlometrekê bêhna dijmin nagire. Dibêjin ku her tiştî fikaran dike, ez jî tam wisa me. Kesayetiya ku hemû pêşketinan wisa nagire dest, di şerde nikare bibe fermadarekî bijare.

Li gorî we dema ku dijmin diyar bû hûn ê bibînin û hema lêdin. Hinek êrîşên me ku li ser qereqolan çêbûyî hebûn, diçûn guhê wan jêdikirin, ev feraseta dijmine. Pêwîst nake tu destê xwe

bide miriyê wî, heta pêwîst nake tu biçe lêbinerî bêka miriye yan na. Darbeyên kujertir dikare bê lêdan. Em li vir her roj derbayên kujer lê didin, jiyana me bi xwe darbeya herî mezina kujere. Heta mirina me jî her dem bi qasî zindibûna me wê bide kuştin. Hûn ê xwe bigihînin vê.

Bi şêwaza kevin a paşverû em li xwe didin. Pir vekiriye! Madem hûn perwerdê dibînin, çima hûn ewqas dibin mînaka bê zekabûnê û vê raber dikin? Hûn ciwanên duristin, heta dawî jî hûn îdîalîstin. Ne bawerim tovên xirabiyê ewqas di dilê we de şîn hatibe. Ya we berfireh nêzîkî perwerdê nebûne. Seranser girtina dest, lewaziyên dijmin ferz dike, zemînê lewaz derbas nekirine. Ew we bê hêz hiştine. Ger na tiştên ku min detnîşankirin hûn bipejirînin kes nikare li pêşiya we raweste. Lê fikir kûrbûn li kîderê ye? Hûn kêmasiyên mezin dikin, nebesiyên despêkê hûn dikarin bi asanî bijîn. Mirov heta dawî ji vê ditirse. Ez dibêjim, divê milîtantiya me ne wisa be.

Dibe ku kontra êrîş bikin, xayînên veşartî di nava me de dibe ku pîlan bikin û êrîş bikin. Minafiq dê her dem derkevin, wê bixemîlînin, weke gurên di postê berxikê de werin, dê rû firîşte bin. Hene, gelek kesên wisa ji aliyê teşeyî ve jî ji rê derketine. Dibe ku em saf bin, her dem nebînin jî, lê şêwazek me jî heye. Heta niha me hemû sextekarî bê bersiv nehiştin. Yê ku qezenc dike çiye, kîye? Azadiye û em in.

Yên ku xwe sipartin min û gotin: "*tu ewqasî ji me re lazimî*" xaniyên herî mezin, yên ku minafiqtî pêşxistin niha li beramberî dîrokê çawa ne? Yê ku herî zêde xwe qurnaz dihesiband, hemû peywir, raye, ji ferasetên raye û berpirsyariyê re bi nêzîkatiyên herî ketî, bê wîjdan ên ku nirx ji dest didin kîne û rewşa wan çawa ye? Yên ku heta niha qurnaztiya xwe ya gundîtî bi hezar û yek kilifî vedişêre û ferz dike, bi nêzîkatiyên bê wîjdan nirxê xwe dirizînin kî ne û rewşa wan çiye? Divê ku em wan jî bibînin. Ma ez dibêjim bila wisa tevbigerin? Na! Bi israr dibêjin; "*Dilê me*

*wisa dixwaze, em wisa bi azwerin, heta dibêjin ji bo paşatiya rojekê çi dibe bila bibe em ê wisa bijîn”* piştî wê dilê xwe bi xwe ne êşîne, efûyê nexwaze, min nexe şûna dîrokekê, tu şervanî jibîr neke û li beramberî min negirî. Hem di nava me de cîh negire û hem jî rehmê nexwaze.

Em rêxistineke şerin, bi qûralê wê ve girêdayî bimîne, dîsa bila bilindbûn, dewlemendî ya te be. Çima neyê fêmkirin. Di nava Partiyê de weke ku di nava pergalê de heye em ê jî dizekî di nava xwe de bihewînin, talangerekî, berjewendgerekî, despotekî bihewînin? Qetiyen na! Tevgera me jî malbateke mezine. Malbateke bi rêzdarî û hezkirinê hatiye mezinkirin. Tu nikarî vê ji bo xirabiyan bikar bînî. Yanî weke zarokê malbatê yê tolaz yan jî weke hinekî xwe vedizîne nikarî xirabûnê bikî. Misoger divê tu vê fêm bikî.

Waneya malbatê, waneyek me ya civakî ye. Ya din jî waneyeke mezin a malbatê ye. Bi misogerî PKK malbateke mezine û cîhana wê jî cîhaneke mezine. Ger serkeve em dikarin bêjin dê ji mirovatiyê re bibe mînak. Em li ser disekinin. Rêxistin û malbateke şere. Em ê bi azweriyeke mezin bi bandorbûnê xwe bidomînin. Hûn dibînin, mirov ji bo nirxên mezin nawestin. Li tiştên dijmin dike dinêrin û xwe eyar dikin, dîsa li paşverûtiyan dinêrin û xwe eyar dikin. Ya din ger mirov bixwaze dikare ji bombeya atomê jî xwe bi bandortir bike, xwe bikar tînin û misoger encam digirin.

Tiştên ku hêjî em vebêjin hene. Ger em daxin asta hunerî jî hema bêje pêşketinên ku me dest xistine bi zimanê romanêke vegotina wan gengaze. Jixwe yek ji nîqaşên din jî ev e. Romankirina Şoreşa Kurdistanê, hem ji bo xwedîkirina huner, hem jî bi huner hinekî din şoreş xwedîkirin bi vê nîqaşê re bi pêşxistina çareseriyê re xwe bi nêvengê dide hîskirin. Û jixwe cewhera huner jî ev tiştên em dikine. Yên ku me derxistine holê dikarin bibin mijarê hezaran pirtûkan, stran û ji wêneyan re bibe

çavkanî. Ger hinek ji xwe bawer bin di asta nav-netewî de dikare xwe bigihîne asewarên bandorker. Ev cîhana huner eleqeder dike. Divê ku em di kêliyê de derxînin holê. Lê çavkaniya vê saxlem diyarkirin pir giringe û me girîngiyeke taybet da vê.

Azadiya ku me derxistiye holê, bi taybetî jî navenga pêwendiya azad bi qasî ku di ti şoreşên din de nayê dîtin dewlemende. Me şoreşên din jî hinekî lêkolîn kir, hunera ku rê ji van re vekiriye û hunerên ku derxistine holê kêm-zêde bi mînakan me hewl da em fêm bikin. Lê di yek ji wan de bi qasî ya me bi zanebûn bingeha wê nehatiye sazkirin. Yeqîn nakim ti şoreş pêwendiya mirov û pêwendiya mirov a azad evqasî kûranî bigire dest. Jixwe tirsa emperyalîstan jî ev e.

Çend mirov dihatin gel hev, digotin bûn klan. Yanî çîroka despêkirina mirov heye. Em ji çîroka Adem-Hawa bigirin heta cemaeta Robînson, Cruîse bi modelên cur bi cur çawa pêşketiye vedibeje. Yek jî modela ku me pêş xistî heye. Hem pir zanistî, hem jî bi vîne. Ya ku di PKK’ê de hatiye înşakirin ne tevgereke netewî, siyasî ya jixwebere. Heta ne tevgereke mirovî jî ya tê zanîne. Pir radîkal, weke ku mirovekî ji hemû aliyan ve lêpirsîn dike, vîna azadiyê, ger hebe hêzê, azweriyên xwe yên herî mezin, nêzîkatiyên xwe yên herî mezin ên mirovî ya ku dixwaze bê înşakirin modelekî mirovî mijara gotinê ye.

Hûn çima wisa ne? Ji ber ku me ev got; em bi pêkanînên herî xeter ên heywankirinê re rû bi rû ne. Yanî li cihekî dijmin, gelê xwe bi xwe jî dike meymûn û ger tu jî kirî rewşek ji xirab jî xirabtir, li beramberî vê ketîbûna mirov ya bê kirin; damezrandinek mirovî ya radîkale. Ya rast ez li gorî zextê digirim dest û ya rast jî ev e. Bi qasî dijminatiyê li ber xwe dayîn, bi qasî hilweşînê kirin ji ber vê sedemê ye. Ji ber ku bê hezkirineke mezin ferz dike.

Binemalê mirov, qet ewqasî ji gelekî re dijminatiyê dike? Dike. Wê demê li beramberî ewqas dijminatiyê ewqas hezkirin pêwîste!

Li beramberî xwe, li beramberî mirovatiyê hezkirin! Berevajî em ê heywantiyê bipejirînin; ev jî binketine, xwesteka dijmine. Ji bo vê ger heye hestên we yên mezin, fikrên we yên mezin, tevgerînên we yên mezin nînin, ez jî ji were dibêjim, misoger hûn dîlê dijminin û amûrê wî ne. Vana fikrên mezinin, misoger divê hûn fêm bikin.

PKK ne damezrînek siyasî ya ji rêzê ye. Misoger divê ku hûn hewl bidin kûrahiya wê fêm bikin. Hêza vîna xwe, weke yekî çil sal çîlekêş xwe terbiye bikin. Bi mehan rojî digirin, heta ku hûn digihêjin encamê rojî bigirin. Nimêj dikin, weke ku hûn nimêj dikin rojê pênc wext xwe dîsîplîn bikin. Zikir dikin, ger pêwîst bike ji êvarê heta sibehê weke ku hûn zikir dikin bikevin zikra şoreşê. Hûn ji çi re, çawa pêwîstî dibînin ev kar hinekî bi vî rengî ye. Ez nabêjim bi awayekî klasîk xwe terbîye bikin, ji bo bibîr bînim diyar dikim.

Terbîyeke me ya mezin heye. Wê demê ti kes divê cîh nede hewesên xwe yên zarokatî û keyfî. Hûn ê baldar nêz bibin ku hûn nirxê tevgerek we ji her hêlê ve dorpêç dike ne. Ger duristiya we misogere, divê ku rêzgirtina we ji hemû aliyan ve rastiyan îfade bike. Tevgereke xweşik niha bi hêz dibe. Dijminên wê, di nav de jî xirabkarên wê pir zêde ne. Weke ku min gotî ji ber ku tevgereke mirovî ye, di wateya xirabiyê de çi heye her roj tê ferzkirin. Tenê ne faşîzma Tirkan, hemû grûbên paşverû, dixwazin di asta nav-netewî de arasteyî me bikin. Bêguman em ê jî hem xwe biparêzin, hem kûr bikin û qet dev ji mirovbûna xwe bernedin. Ew heta dawî dibêjin heywanbûn, em jî dibêjin heta dawî mirovbûn.

Min hinekî di mînaka xwe de ev teyîsand. Hûn dikarin bi esasgirtina vî zemînî, hem di asta fikrî, hem jî di asta hestî de, hem xwe ji nû ve ji qusûran, nebesiyan, xeletiyan pak bikin û pêk bînin. Nemaze bêku hûn zêde ji hal bikevin, ji ber ku hûn dizanin mîsoger pêdivî bi serkeftinan heye, dikarin hîn xurtir înşa bikin. Ji

bona hîn zêdetir jiyan bê hîskirin, tiştên ku jiyanê emir kirine bên dîtin, fêmkirina karê jiyan bi şer fetihkirinê pêk were, heta astengî ji holê rakirinê hûn dikarin pêdivî pêkanînê de serkeftî bin.

Li gorî min ev şanseke. Min hinekî nirxand. Ji welatekî re jî, ji gel û mirovekî re jî rêzgirtin di çarçoveya xwe gihandina vî şansî de min nirxand, hûn dikarin zêdetir binirxînin. Ji ber ku hûn ji ezmûneke mezin û ji têrkariyên rojane sûd werdigirin. Ne nirxandina vê çarçûrkirin, ev ji rê derxistin dê hem we ji serkeftinê dûr bixe, hem jî hûn israr bikin wê we lanet bike. Divê qet hûn ji vê re tenezul nekin. Berevajî, bêrîkirinên we di arasteya azadiyê de ne. Hûn dixwazin li pê başiyê bazdin û misoger dixwazin bi şer tiştên ku we windakirine qezenc bikin.

Hûn ê bi keda herî mezin tevlî bibin. Ji vê guman nîne. Ya ku nîne karê perwerdê ye. Bi sebrê, her ku bi berhemdarkirina kedê, şêwaza kûrkirina kedê bi hinekî din xwe gihandinê dikare bê despêkirin. Ev derfet jî hertim tê dayîn. We heta niha weke pêwîst ev nenirxand. Ez dibêjim misoger divê hûn binirxînin. Vê hejariya xwe ya mezin, mahkûmiyeta jiyana herî ketî û linavbirinên ku lê tên ferzkirin ancax bi berxwedaniyeke bi vî rengî hûn dikarin vala derxin û ya herî giring jî jiyana ku hûn şayanin qezenc bikin.

**3 Cotmeh 1994**

# Rêbertî Hunera Bi Rêbaza Rast Nêzîkî Jiyanê Bûyîne

Me pirseke *“ Çawa bijîn”* derxist pêş holê û em li pê rast bersivdayîna vê ne. Lê em bi kurtî di derbarê pirsa *“Çawa bijîn”* de rêbaz bibîrbînin. Di pîvanên milîtantiya PKK’ê de dem û siyaset misoger divê rast bê fêmkirin û li gorî wê ji bo îspatkirina kesayetê tenê serkeftin esas bê girtin. Dem di heman demê de tempo îfade dike. Yanî xebatên siyasî, xebatên leşkerî û hemû pîrozbahiyên din wê bi lezek çawa bê avakirin tîne ziman. Ger di vê xalê de lezek pêş nekeve, qezenc neke hûn çiqas bêjin em bi rastiyê ve girêdayîne jî, hûn çiqas cidî dibin bibin, hûn hinek kar û çalakiyan jî bikin, derfetê serkeftinê nade. Teşeya milîtan, misoger teşeyek pêşveçûnê qezenc dike. Ji vî alî ve jî di jiyana rojane de bi lez xwe fikirandin, bi uslûbekî lez, helwestekî lez, bertekeke lez û ji bo xwe gihandina rewşeke bandoreke lez dafirîne hûn ê heta dawî ser de biçin. Pîvanê serkeftin û qezenckirinê ev e. Pêwîste, ev baş bê fêmkirin. Hûn dibêjin dibistana leşkerî, dibêjin em ji gêrîlatiyê re xwe amade dikin; ev jî weke xaleke sereke ji mirov lezginiyê dixwaze.

Bêguman tenê bi serê xwe lez têrê nake, naverok jî hewce dike. Jiyanê, pêşketinan hûn çiqas berfireh difikirin û di dilê xwe de jiyan dikin? Ev çiqas li gorî pêdiviyên me ye û gelek nirxên wê çiqas di nava hev de ne, di çi kûrahiyê de dijîn? Dê hem bi lez be,

hem berfireh be, hem pir hûrûkûr be; perçe perçe, pir hêdî hatina gel hev, ne hevdû bandorkirin, ger di sê xalan de di kesekî de îfada xwe bibîne ti kes nikare wî/ê kesî bisekinîne. Divê di pêkanîna armancan de pir lezî û mijarên armancan bi qasî tê xwestin berfireh û hemû ketine nav hev, hûrûkûr bin, divê bê navber be; di heman demê de ne weke tam di rawestgehên navberê de, pêwîste bi şêwaza berdewamkirina van hersê xalan be. Ya rast ev dikeve nav mijara tempo. Yanî em dikarin bêjin bê navber, bi tempoyeke bilind û hertim lezê dide qezenckirin. Divê ku hertim jiyaneke we ya bê navber hebe. Ger hûn kesayetiya xwe sentez bikin, binkeftina kesayet nepekane. Yek ji armancên perwerdê yên sereke jî hûn nêzîkî vê kirine. Tevî ku ev pir girînge jî, em ji yê herî bin nakeve bigirin, heta yê herî kevin, heta niha xisûsên ku nayên fêmkirin û xwe nagihînin ê ye.

Ez bawerim nefêmkirina demê hîn zêde diyarkere. Mijareke şayanî vekirinê ye. Têgihiştina demê; wisa bi nêzîkatiyeke ” *Wê îro çawa derbas be, sibê çawa bê pêşwazîkirin, roj çawa bû”* nabe. Têgihiştina me ji demê bi hemû nirxên xwe ve çiqas di nava hev de ye, em li ser esasê serkeftina di rojê de bi cîh dikin, li sibê belav dikin yan jî sibê fetih dikine. Li gorî vê pêwîste, dem bê nirxandin. Dem baş bê nirxandin serkeftina sibê jî di vê xalê de veşartiye. Hûn ê bibin xwedî têgihiştineke demê ya wisa, amadekariyên îro misoger pêwîste sibê qezenc bike. Wê çawa qezenc bike? Wê bêje; *“armancên min ên siyasî hene, nirxên ku ez nûnertiya wan dikim, di rewşa fêmkirina wan de me hene; pirsgirêkên şêweyên siyasî, rêxistinî, çalaki ya van hemûyan heye”* û ya herî girîng jî hûn ê hukmî van bikin. Pêwîste di vê de pir hevgirtî hebe, hewldan misoger têrker be, uslûb, biryar û vînê de û di hêza rêxistinî de têrker be. Jixwe rêxistinkirin jî ji bo vê pêwîste. Dema kes xwe tevlî vesaziyeke baş tê karanîn kir û di şêwaza Partî-artêşê de xwe eyar kir û bi ser de çû, tê wê wateya ku meşeke milîtanî ya serkeftî jî daye despêkirin û girtiye.

Di vê mijarê de ne ku “Şêwaza *herkesî ya mast xwarinê heye”* divê ku mirov wisa nebêje û xwe nexapîne. Belê, şêwazekî mast xwarinê heye û ew jî divê xwarineke mast a şampîyontiyê bidest bixe. Em ê vê esas bigirin. Bi şêwaza serkeftinê xwarina mast, weke tê xwestin baş nirxandina dem û jiyanê ye. Heta ku ev nebe, hemû jiyana we dê vala derbas bibe. Hûn ê kemasiyeke jiyanî û rêbaz bikin. Rêbaza rast, rêbaza ku nêzîkatiyeke wisa ji jiyanê re raber dike ye. Hemû rêbazên din xeletin. Misoger nagihine hedefê. Herweha gelê me kêmasiyeke mezin a jiyanê dike û ji aliyê rêbaz ve sifire û vala ye; ji windahiyê zêdetir ti encameke vê ya din jî nîne.

Rêbertî di heman demê de hunera bi rêbaza rast nêzîkatiya li jiyanê raberkirinê ye. Di encam de ji ber ku rast û têrker nêzîkî jiyanê dibe serkeftiye. Bêguman amadekirin, pêkanîna vê bi rastiya dijmin re pir zêde bi hev ve girêdayî ye; yê ku hemû xwe ferzkirin, polîtîkayên wî dibîne û li gorî vê bi biryara xwe ya rizgariyê dibersivîne nêzîkatiyeke wisa ya di nava hev de ye. Divê ku rêbaz çavkaniya xwe di rastiya şênber a tehlîla zanistî de bibîne, ji fêmkirin, pêşwazîkirinê re xizmet bike û ji vê şûnde ya bê kirin ev li ser demê û jiyanê ferzkirine.

Hûn durist û niyazbaşin; ev misogere. Eşkereye ku hûn dixwazin hinek tiştan qezenc jî bikin. Lê dema ku rêbaz neyê girtin tenê ev taybetmendî jî serkeftinê naynin. Yê ku milîtanekî rast a PKK’ê be û berendamê vê ye, divê ku baş bizanibe di vê mijarê de xwe amade bike. Ger bi şêwazekî din be, hemû hewldanên kujer dê vala biçin. Li beramberî vê rastiyê pêwîstî bi serhişkî, rewşeke mîna kevir lê hatiye ferzkirinê nake. Neçare ev bê fêmkirin. Ev der dibistaneke şoreşê ye û di vê dibistana şoreşê de ji jiyanê re nêzîkatiyên zexel, weke xwendekarên dibistana seretayî ku bi zor û zehmetiyê dibistanê derbas dikin nêzîkatî nayê kirin. Di dibistana şoreşê de mirov nikare bibe xwendekarên wisa. Ger hûn cidîne, hûn dixwazin bibin xwendekarên şoreşê ên

hevgirtî, misoger divê hûn vî rêbazî esas bigirin. Weke xwendekarên bi girtina kopya dixwazin rewşê rizgar bikin, jiyan bi zorî û zehmetiyan derbas kirin di encamê de jî dema ku tiştekî rizgar nakin divê ku hûn dev ji matmayîbûnê berdin. Dem dem me di vê mijarê de rexneyên berfireh kirin.

Ez di van xalan de pênaseyan dikim, vebûnên nû pêş dixim, ji bo ku misoger xwe bigihîne şêwaza serkeftinê. Lê di jiyanê û rêbaz de weke ku hûn mahkûmin ya heyî didin jiyîn. Şoreşa me li beramberî zora vê mahkûmiyetê pêş dikeve. Bi zordariya wan a giran ve, bi xwîn dayînê giyan bexşînê pêş dikeve. Ger em nebûna ev xwîn dayîn ji zûve laş xerabe kiribû û bi erdê re kiribû yek. Divê ku hinekî rasteqîn tevbêgerîn û dev ji nêzîkatiyên durû, xwe xapandî, yên li ber digere, hestyar û kesayetiya sexte bê berdan.

Ez ji vê re dibêjim; "*Kêmasiya herî mezin a jiyanê.*" Meşeke zimandirêj, misoger di çalakiyê de nikare tiştekî rizgar bike, xwe ji hemû aliyan ve bi mirînê ve gire daye, dê wisa çend pere bike? Pêwîst nake ev bi demogojiyê bê sergirtin. Dilekî rast raber bikin, ma hûn dikarin rewşê rizgar bikin? Di serî de vê ji wîjdana xwe bipirsin; hesabpirsîna xwe ya hundirîn bikin û wisa derkevin ser dikê. Bi hemû nexweşiyên xwe di nava refên me de xwe ferz nekin. Hûn xwendekarin, roj bi roj vebin, pêşkevin.

Wesfên dibistana me tên zanîn, li ser vê bi hezar û yek nexweşiyan xwe ferzkirin ne karê aqile. Dibistana şoreşê ger her roj vekirinên mezin di nava xwe de pêk neyîne, nexweşiyên serdeman dê di rojekê de bifetisîne. Kesayetên we heta pileya dawî bi taybetmendiyên mirov difetisînê ve dagirtîne. Heyfa kesayetên ku nikarin xwe li ser piyan bigrin. Bi hêzbûn tiştekî pir başe. Birêzbûn tiştekî başe û ev jî bi şêwazê ku min gotî bi nêzîkatiyên ji jiyanê re bi wate dibe. Ne zehmete, zehmet be jî ya ku me bide jiyankirin ev e. Divê ku hûn wisa bi rexnekirinê bikaribin li jiyanê binêrin. Ew pêşdarêzên ku we xwe bi xwe li

xwe kirine, fêrbûnên pir rizî û zik têr nakin û kirêtin; ti nirxekî wan ê jiyanî jî nîne. Weke din pir xeter nêzîkî nirxan dibin. Hinek ji wan derdikevin; uslûbê filan û bêvan çînê bi hêrs ferz dikin, hinek ji wan jî mîna koleyekî ne di ferqê de ne, ev ne şayanî me ne.

Tevgera mezin a azadiyê bi van taybetmendiyan re hev nagire. Bêguman, weke rêbaz hertim hewl didim xwe bidim jiyankirin. Azad dayîna jiyankirinê esas digirim û ya ku li ser min serwere kêlî bi kêlî wisa tînim ziman. Rêbaz, feraset û nêzîkatiya esasî ya ku li ser min serwer ev e. Dibe ku têra qezenckirina her tiştî nake, lê di qezenckirinê de jî bi îdîaye. Heta niha pir kêm windakiriye, rêbaza herî zêde qezenckirin pêş xistiye.

Ez ne girêdanên wisa sexte, yên wisa bi xwedî rêbazên rast pir bi nirx dibînim. Ji me re rêzdarîbûn, bi zanîna bûna xwedî rêbazekî jiyanek wisa cewherî ve gengaze; ya rast jî ev e, ya ji we re pêwîste jî ev e. Ji rastiya jiyanê û demê re wisa wate tê dayîn. Vaye divê em vê rêbazê li ser hemû mirovên xwe serwer bikin. Qet koletî, yan jî şêwazê filan ango bêvan çîna serdest nabe mijara gotinê. Bingeha azadiyê wisa bê destxistin bi asanî kes nikare ji dest bigire. Di jiyanê de bi qasî misoger fêmkirina rêbazê rast, divê ku bi demogojiyê jî xwe nexapîne. Nabe mirov jiyan radestî çarenûsiyê bike. Ya jiyanî ye, mirov bizane dem kêlî bi kêlî bi hedefa serweriya jiyanek dide qezenckirin ve pêş bixe û wê ev jî we bigihîne ew milîtantiya ku hûn awat dikin.

Ez di vê baweriyê de me ku me mijarên jiyanî destnîşankirine. Yên ku em dixwazin bikin girîngin û tenê ne ji bo kesekî em didin pêşiya xwe, di berfirehiya şoreşa gel û her ku diçe xebatên hemû mirovatiyê eleqeder dike de. Dahûrandina vê ne bûyereke ji rêzê ye; lê heyfe ku nêzîk ji rêzê ne. Ewqas mahkûmî jiyanê, ewqas di jiyanê de azadiya xwe nedîtin, rast nefikirîn, bertekek xwe li beramberî vê weke tê xwestin rêxistin nekirin, bêguman bertekê dafirîne. Bi nêzîkatiyên seqet, koleger, xirabkar, serseri ve, di

kesayetiya xwe û jiyana xwe de mafê kî heye binkeftinê ferz bike? Em ji hevdû rast gohdarnekirinê bigirin, heta wate nedayîna civînekê, hevrêyekî xwe jî nerastkirin, di asta herî jêr ya jiyanê de xwe fetisandine.

Ez di gotin, tevgerên xwe de çawa hewl didim ya herî rast biteyîsînim? Vaye rêzgirtin ev e. Yên ku hîn nizanin baş-rast rûnin, ne xwedî wê mafê ne ku bêjin em PKK'yî ne, leşker û milîtanin, nabin jî. Dibe ku heta niha weke tê xwestin min xwe îfade nekiribe, nedabe fêmkirin, lê min di nava vî şerê mezin de bi qasî serê derziyê tawîz nedaye.

Yên xwedî vê ferasetê ne hûn, ne dijmin û kontra ne. Hûn kesên ku li ser vî esasî soz dane jiyanê ne. Wê demê hinekî bi sozê ve girêdan, bi armanc û îdîayê, şoreşa ku me pêşxistiye û jiyanê re rêzdarbûn, xwe li gorî pêdiviyên wê sererast bikin û bi biryar bin. Di derbarê pêşketina me de, vekiriye ku em ê bikaribin xwe bikin mirov, bi asanî dev jê bernedin, berevajî em ê hîn zêdetir wê pêş bixin de, ez bi biryarim. Misoger wê ne demogojîk be û em ê bi sextekariyan jî xwe veneşêrin. Em heta dawî xwe ji azadiyê re xwe vekirî dihêlin.

Temam, hûn ji nava civakeke tolaz û xiyanetê lê hatiye kirin tên. Û em li ser bandorên tolaziyê pir zêde nîqaş dikin. Lê di encam de hûn mirovin. Û mirov bûnewerê ku xwe diguherê ye. Hêza we têra vê dike; lê pirsgirêk jî kes bikare wê hêza bi xwe re veşartî dihêle derbixe holê, bi bandor û rast bikar bînê ye. Heta niha jî me persiveke rast nedaye pirsa; "*Çawa bijîn.*" Hêjî em ji aliyê aborî, civakî, çandî û leşkerî, siyasî, rêxistinî, rûhî û ji hemû aliyan ve dûrî bersivdana "*Çawa bijin*" e. Lê çawa jiyîn, li beramberî jiyanê rêzdariyeke çawa mijarên jiyanî ne û ji bo vê ez hertim destnîşan dikim.

Weke miriyê li ser piyan û jiyana serserî ya ku dijmin ferz dike, weke jiyan nayê nirxandin. Lê yên bi vî rengî jî qet kêm nînin. Yên ku wisa dizanin şoreşgeriyê dikin û her roj tên kuştin û

yên dikevin kêm nînin. Yeqîn dikim ji vê re jiyaneke şoreşgerî jî nayê gotin. Yên ku hîn nizanin bimeşin, nadin meşandin, xwe nagihînin hêza çalakî û biryarê, hêza di cihekî de dayîna rûnişkandinê, ne xwedî behremendiyeke wisa ne mirov dikare di jiyanê de serkeftinekê ji wan hêvî bike? Di despêkê de nebes mayîn şerm nebû, min berê jî diyar kir, jiyana bi pêşveçûyî, ya ku pêşveçûn û berfirehî qezenc kiriye, ya ku di demeke diyar de qezenc kiriye û asteke dide qezenckirin ji bo serketinê dibe zemînek. Ev 20 sale di nava me de yên ku di vê xetê de hene, herî kêm çend sale di nava refande ne. Ev jî dide diyarkirin ku we dem baş ne nirxandiye. Xisûsekî girîng ku hûn ê ji min fêr bibin jî, vaye nirxandina vî demî ye. Weke din ez weke we nakevim civînan jî, nêzîkatiya min ji mirovekî herî ji rêzê re jî ne weke nêzîkatiya we ye. Misoger ez ji civînên wisa bi wate re weke çalakiya herî mezin nêzîk dibim. Em bi dilekî serhildêr, teqîna fikrekî mezin tevlî pêwendî, civîn û pêvajoyên bi vî rengî dibin. Nirxandina demê, ji bo hertim pêşketinê ancex bi têrkirina hêza ji vê re gengaz dibe.

Peywirên we yên mezin hene. Wê demê ez difikirim, yên ku ewqas xwedî dijminin, ewqas ji nêz ve tên şopandin, weke mirovên ewqas peywir û hedefên mezin danîne pêşiya xwe, çawa binketinên wisa dijîn? Ya ku despêkê tê bîra mirov berxê Qurbanê ye û mirov bi vê jî xemgîn dibe. Misoger divê bê derbaskirin. Emperyalîzm di nava êrîşeke mezin de ye. Jixwe mêtîngerî ji ber me di çi rewşê de ye diyare. Îro tevî hemû demogojiya hemû curên mafê mirovan ya emperyalîzma cîhanê, bi şêwazê şerekî qet nayên fikrandin û ji hemû aliyan ve ya ku çavê xwe jê re digire bi dûv me de ye. Bersiva ku ji vê re jî bê dayîn divê şêwazê de milîtaniya ku kes texmîn nake û şerê wê ye. Em li pê vê dibezin. Jixwe vebijirkeke me ya din jî nîne. Pêwîstî bi hişsivikiya gundîtî, xwe sipartina uslûbekî demogojîk ê nîv bi nîv û paşçavkirina vê nîne, bê wateye. Bi sedemên wê re

hewldana min ya vekirina van û ronîkirina hinek xisûsan re divê hûn rêz bigirin.

Qala xalên balkêş bike Ab..? Me ev pênase jî kir, hêvîdîarim ku hûn sûd jê bigirin. Ez çi bêjim ji van re? Xisûsên ku di xwe de awat, xwestek şiyar dike çine? Qet nebe hinek aqil, hinek wîjdan pêk tê ne wiha?

***Ab.:*** Raste, Serokê min.

**---.:** Ji me re jî heyfe, divê demê me vala derbas nebe, dibe ku li gorî hinekan û dîrokê şêwaza me bi aqil nebe, lê dîsa jî di rastiya me de dibe jiyana herî zêde nêzîkî rastiyê ye. Ev jiyana ku me pêş xistiye, di heman demê de şêwaza çalakiya bi bandor a ku çareseriyê bi xwe re tînê ye. Ol xwest bandor bike, dijmin bi amûrên herî bi bandor xwest bandorgeriyeke bîrdozî pêş bixe; lê me mezintir bandor kir û em hêjî bandor dikin. Mesele tenê ne ew e ku tu bêjî; "*ez çepgirim, şoreşgerim*" û tenê ne we ku tu bêji, "*Ez leşkerim*" bi vê jî çareser nabe û tiştekî pê bê çareserkirin jî nîne. Ez şoreşgeriyek jiyan û mirovê azad pêş nexistiye qebûl nakim, nikarim bikim û bê nirx, binketî dibînim.

Heta ku hatina vê nebe serkeftinên misoger û mayînde nabin. Ji jiyana azad tirs heye?

***Ab.:*** Bi qasî tê xwestin fêmnekirin û nezanîn heye Serokê min. Pir zêde serweriya taybetmendiyên jiyana kevin hene.

**---.:** Ma ji jiyanê hez nakin, yan jî ev hezkirineke çawa ye?

***Ab.:*** Ji jiyanê hez dikin Serokê min.

**---.:** Bi qasî cixareyekê?

***Ab.:*** Lê li gorî ku ketiye nava tevgereke wisa, dibe beşa herî bi xwestek ya civakbûnê.

**---.:** Ma civakbûnê dixwazin? Lê dîsa jî bi xwe gihandina komîteyekê de, bûyîna taximekî gêrîla de ewqas tengav dibin?

***Ab.:*** Pê re gelek bandorên xirab hene, tengav dike.

**---.:** Gelo bêrîkirinên wan li gorî çine? Pîvanên me yên sereke diyarin, hedef û pêdivî diyarin; bêrîkirin li gorî vê guncawin?

***Ab.:*** Mirov nikare tiştekî zelal bêje Serokê min.

**---.:** Wê demê çiye?

***Ab.:*** Hemû cuda ne.

**---.:** Wê demê di dubarekirinê de feyde heye. Ez çi dixwazim? Di her derfetê de gelê me jî ewqas rexne dike ku, bifikirin ez çiqas dixwazim hûn mezin bibin û li beramberî bê derfetiyan, li beramberî zehmetiyan, li beramberî zehmetiyan ez çiqas hewl didim xwe vekim. Çiqas dijwar êrîşî ser xwe vekirinên me, xwe ji bo civakê kirina me ya amûrekî ceribandinê dikin. Difikirim, gelo kesek din ê ku xwe weke min kiriye mirovekî ceribandinê heye? Di asteke mezin de xwe kirina amûrê ceribandinên civakî, di asta ceribandinan de mayîn, jiyîn hunerekî gelek zehmete. Lê me ev ser xist. Ez pir baş dizanim hûn ji çiqas bi qalibên xwe ve girêdayî ne. Lê ez xwe di vê wateyê de her roj di çend ceribandinên şêweyî re derbas dikim. Tempoya jiyanê, leza wê ancax bi vî rengî dikare asteke veguherîner bi xwe bide qezenckirin. Hinek artîst hene dibêjin; " *Di sê salan de me sêsed fîlm kişandin"* û bi rastî jî di her filîmekî de rolekî dilîzin. Bêguman, a me ne wisa artîstiya fîlima ye. Artîstiya civakî gelek zehmete. Îca dema ku ev civaka em dixwazin biguherînin dibe mijara gotinê zehmetiyên awarte di nava xwe de dihewîne. Dema ku em ji pirsên; "*Ez çawa dibim leşker, çawa siyasî dibim?"* re bersiv pêş dixin, niha jî em pirsa; "*Çawa civakî dibim?"* derdixin pêş.

Em dikarin li ser vê çawa aborîbûn, çawa artîstbûnê jî zêde bikin. Me partîbûn li ser esasê van çawane, her ku çû di kesayetiya wê de gel, netew, kes dema ku xwest ji nû ve ava bikin, ji bo pêkanîna vê jî di despêkê de yê pêşengtî dike divê vê di kesayeta xwe de ser bixe jî dizanin. Asta ku yên xitabî wan tê kirin, hêz ewqas lewaz be, ji bilî bi awayekî metirsîdîar xwe bi hêz kirina wî/ê kesê çareyeke din namîne. Wê milîtanek pirsa çawa ji xwe bike û bibersivîne. Dil dixwest ku hinek ji we ji vê

çawa re bibin bersiv. Lê ez dinêrim ev kar gelek zehmete; hûn zehmetiyan dijîn û em neçar dimînin bi xwe bidin kirin.

Rewş çawa ye û ez di nava vê rewşê de çawa diyar dibim? Ez xwe çawa di ceribandinên metirsîdîar re derbas dikim û bikartînim min vegot; ez çawa bilîzim? Lîstoka ku ez dilîzim, qet naşibe lîstokên ku hûn dilîzin. Heta dawî lîstokeke taybete. Jixwe ne gengaze ez lîstokên ku hûn dilîzin bilîzim. Dibe ku zarokek jî di nîv demjimêrî de fêr bibe, lê di salekê de fêrbûna min a wê lîstokê pir zehmete. Bi min re ewqas li ber xwe dayîn heye. Çima? Weke hûn dilîzin nelîstin, yeqîn dikim xwe dayîna lîstokeke din, bi awayekî metirsîdîar leza wê, tempoya wê derfeta lîstina her tiştî dide min. Bêguman em ê ser bixin. Bi qasî zarokekî fêrnebûn ma karê aqile? Me çi ser xist di vê navberê de, ji aliyê civakî ve me çi îspat kir? Ji xwe ji aliyê leşkerî û siyasî ve hemû bi hev ve girêdayîne. Me di lîstokê de pêşengtî girt dest?

***Ab.:*** Raste Serokê min. Axeke reş, netewek….

***---.:*** Misoger min pêşengtî girt, yanî serkêşî kir û heta dawî li pêy xwe dikişînim. Despêkê ji qelebalixiyê derbasî lîstokê kirin, piştre hêdî hêdî destê hev dana girtin û piştî wê jî bi lez hemû tevlîkirina lîstokê heye. Hinekê me gihandiye vê qonaxê.

***Ab.:*** Asta civakî….

***---.:*** Ji aliyê lîstok kirina malê civakê ve. Vaye ez wisa dilîzim. Ez berhevkar û herikbarim. Dem gelekî girînge. Armanc; encam dîtine, quralên lîstoka xwe anîne. Çiqasî bi aqilane ye, çiqas dînîti ye, çiqas bi dile, çiqas tirsonekiye; gelo hûn dizanin? Divê hûn bişopînin. Di derbarê me de ewqas tê nivîsandin. Ya rast ez lê dinêrim yên dinivîsînin jî matmayî ne; A. Cem Ersever jî nivîsand, li hev ket û çû. Şopdarê me yê pileya yek bû. Lê yê herî dawî nivîsiye binerin dibêje ku; “*derketina me ya pêşberî civakî bê derfet dibe.”* Belê, yên wisa bi qasî ku dinivîsînin, neçari dimînin hertim bikevin bin erdê û xwe neçar hîs dikin ku di bin zirxê emperyalîzmê de jiyan bikin. Şansê xwe di himêzkirina jiyana di xwediyê wan kesên ku jiyana em ji holê radikin û hertim dixin binê erdê de dibînin. Bi qasî ku hemêz dikin xerq dibin, ji

ber vê jî nikarin derkevin nava civakê, pêşberî civakê. Min lîstokeke wisa ava kir û pêş xist. Nikarin vê xirab bikin, xirab nakin.

***Ab.:*** Pêşketineke giştî nîne Serokê min. Pêşketinek ji aliyê civakî û siyasî ve bû. Herî dawî jî pêkhatina damezrandinekê bû.

***---.:*** Em niha ne bi uslûbê leşkerî-siyasî, bi uslûbê hunerî dinirxînin. Me hûn girtin nava lîstokeke bi vî rengî û şêwaza ku hûn dixwazin, tempo û helwestî tevî ku em ferz dikin jî, bi asanî hûn nikarin lîstokê xirab bikin. Dema ku hûn dixwazin li gorî qûralan bilîzin jî tê fêmkirin ku hûn tengav dibin. Bele pir balkêşe. Min çawa dest bi lîstokê kir. Bi rastî jî divê bê lêkolînkirin. Dostên me jî lêkolîn dikin, em wan spas dikin. Hûn jî dişopînin. Ji roja ku heme ez dildarê lîstoka me. Ji bon amin jiyan û lîstok têkildarî hevin. Hêjî lîstokên min ên zaroktî tên bîra min. Belê bi lez lîstok ji qonaxa zarokatiyê derxistin, îro me veguherand şerê herî zêde yên wan kezebreş dike. Lê heman tişt lîstoke. Ger bi azweriyeke mezin nekeve navê, lîstok nayên lîstin.

Hûn dizanin, lîstok karê azwerî û karê jidile. Wisa tê lîstin. Lîstikeke bi zorê nabe. Ger tu bixwazî kesekî bi zorê bide lîstin, dê lîstoka herî xirab bilîze. Ma lîstoka bê moral qet dibe?

***Ab.:*** Wê xirab bike Serokê min.

***---.:*** Wê xirab bike. Ji ber vê nayên vê lîstokê. Şer jî lîstokeke. Hem jî lîstoka lîstokan û şahê lîstoka ye. Tê kesayetiya xwe ji lîstokê re amade bike. Futbol jî lîstokeke û pêwîstiyên wê hene. Ji bo qezenckirinê divê ku hûn pêdiviyên wê pêk bînin. Em di nava rastiya xwe de, di nava lîstokên dijmin de lîstokê pêş dixin. Yan jî li beramberî lîstoka ku dijmin li ser me ferz dike em jî hewl didin lîstoka gelê xwe bilîzin; ango lîstoka azadiyê. Hûn dikarin ji nêzîkatiyên dijmin jî fêm bikin; bawerim dîsa hemû bal li ser min e, hema her roj nirxandinekê dikin, heta teqlît jî dikin. Niha jî ez bawerim beşa serdest a Tirkan yê fermî, leşkerî, xeta bîrdozî, hêza rêveberiyê hem me dişopîne, hem jî dixwaze lîstoka me xirab bike û bi lîstokeke dijber ji bo ku me vala derxin misoger kêlî bi kêlî dinirxînin.

***Ab.:*** Lêkolîn dikin Serokê min.

***---.:*** Ji bo vê kêlî bi kêlî dişopînin û lêkolîn dikin. Hem dişopînin, hem jî yên ku ji vê lîstokê bigirin digirin û li ser vî esasî dixwazin lîstokê tine bikin. Bi hemû hêza xwe ve li ser me ne. Li kîderê lê dixin, ji vî alî ve cihê ku lewaz dibînin kîdere? Ya rast lîstoka ku ez dilîzim, li kîderê lîstoka dijmin xirab kir?

***Ab.:*** Bi pêşketina civakbûnê xirab kir, pergal li beramberî vê ajoyan ferz dike, dixwaze berevajî bike. Di dema borî de hertim di asteke sînordar de digire û li ser civakê venerîn pêk tîne, rêveberî rêxistin dike û dema ku dît parçe dibe, li beramberî vê dejenerasyonê di asta pêş de ferz dike. Bi vê jî dixwazin pêşketina civakî berevajî bikin, pêşketina civakî xirab bike.

***---.:*** Dîsa divê hûn div ê xalê de min lêkolîn bikin. Dewlet vê lîstokê ferz dike û li ser civakê pêk tîne, ser dixe. Hema bêje li ser hemû pêwendiyan, çepgir jî di nava vê de dema ku pêk tîne encam digire.

Ya li ser M. Sûphiyan ku hat ferzkirin lîstokeke tîpîk bû. M. Kemal hem jî bi xapandineke mezin jê re got; "*Tu dikarî werî.*" M. Sûphî jî wê demê hemû germahiya dema Lenîn dijiya û qaşo Bolşevîzm ji dibistanê fêr bûye. Hat, li bin guhê lîstoka M. Kemal qulipî û ket. Bi şêwazeke tirsnak û trajîk di avên dîn û har ên Bahra Reş de fetisî. Çawa fetisî jî kesî fêm nekir. Şêx Sehît jî wisa ye; bi lêsorkirineke biçûk tahrîk kirin, hîn sê meh derbas nebûn bi awayekî hezîn hat fetisandin. Lîstokeke Kemalîst bû û eşkereye ku M. Kemal bi xwe jî lîstokvanekî mezine.

***Ab.:*** Lîstokvanekî pir baş hatiye pêgihandin Serokê min.

***---.:*** Ji rêzê nayê girtin. Mixabin lîstoka ku hem li ser gelê Tirk, hem kêm-netewan, cudahiyan û bi taybetî jî lîstoka ku li ser gelê Kurd dilîze heta dawî hişke û bi hemû dehşeta xwe ve encam girtibû. Ev lîstok min li ser navê çep, ji aliyê gel û Kurdîniyê ve hewl da xirab bikim. Hema bêje di hemû qadên civakî ya ku ez li dijberî derketim, hewl da xirab bikim, qonaxa ku em giştinê baştir

tê fêmkirin. Yanî ne tenê dema avakirina PKK'ê, her ku çû dema me gavên yekem ber bi pêlekanên jiyanê ve avêtin di dema faşîzmê de jî bi qasî ku em bi ser pêlekanan serketin, li beramberî lîstoka ku hat ferzkirin lîstok û bi vî rengî helwesta rêbaza xirabkirinê min raber kir.

***Ab.:*** Li her qadê pêşketinên niha wê didin diyarkirin…

***---.:*** Hîn ji heft saliya xwe ve binpêkirina qûralan girtina min a berçav, îşaretên xirabkirina vê lîstokê diyar dike. Li gorî min di vir de bi ruhekî çawa nêzîkatî tê raberkirin girînge û divê mirov sedemên wê baş fêm bike. Hîn dema di nava civata gund de bûm li şûna weke herkesî bim, pêwîstiya cudabûnê dîtin û berê xwe dayîna vê çawa bû? Divê ku ew bê fêmkirin. Min ev ferq çawa girt û her ku derbas bû çawa vekir? Heta niha jî ji fêmkirinê ditirsim. Tevî ezmûneke cuda jî gav bi gav vekirin, bi qasî uslûbekî guncaw ê polîtîk, tevî kedeke mezin jî, sînordar dikarim raber bikim. Heta niha jî ez lîstokvanekî mezinim. Di beşa xwe de di rewşa ezmûn û behremendî qezenckirî de me. Niha hûn ketine nava çil lîstokên pergalê, hûn ji aliye hemûyan ve hatine xapandin û binketine. Divê hinekî mirov bi zimanê roman vebêje, lê çawa? Em li niha binêrin; ez çawa dijîm? Ez reqîbê xwe hertim matmayî dihêlim û li gorî min xalên ku hûn tê de matmayî dimînin jî di asteke girîng de ne. Bêguman bandor jî dike. Nexwe we ne dikariya derbikevin holê. Ev rastiya me bala nivîskarekî jî kişandiye, qaşo dê pirtûk binivîse. Heta nivîsandiye jî, lê ditirse biweşîne. Ji hevalên me zarokatiyê girtiye, nizanim.

Ji malbatê û wî gundî re îsyan kirin pir balkêşe, li gorî nerîna min îsyaneke wateya wê pir girîng bû. Hêjî tê bîra min, min ji bo xwe weke dibistanekê bikar anî. Li pişta gund parçeyek rezê me hebû. Min hinek pirtûk li wir kom kiribûn. Di bin terhên tirî, darên fistik û behîvan de çend cihên min hebûn. Min sererast dikir, lê radizam, dixwend, heta dawî min xwe tengav dikir. Ne xwendineke bi rêbaz jî bû. Hinek ji wan yên bîrkarî, hinek yên

dîrok, di asta eleqederbûneke giştî de bû. Di wê demê de hêzeke me ya ku bikaribe nirxandinên zanistî bike nebû. Meraqa xwendinê ye, me hewl dida derbas bikin. Di vê navberê de em bi rez re jî mijûl dibûn. Birayekî navîn hebû; hat, bi sedemekê, -sedem jî ewqas girîng nîne- me şer kir. Îhtîmaleke mezin sedema şer bi karê rez re weke pêwîst mijûlnebûn bû. Bi vî rengî serserî yan jî zêde ji kedê re rêza wî nebû, yê ku ji peywîra xwe re bi wate nêzîk nedibû ez bawerim helwesteke wî ya wisa hebû. Min xwest ez wî ji rez biqewitînim. Bêguman piştî ku hinekî ez mijûl kirim min ew arasteyî revê kir û di encamê de jî revî. Dema ku revî ez ketim pê wî, min şopand. Bi lez û hêrseke mezin min kevir davêtinê hîn jî di bîramin de ye. Malbata me, dayik û bavê min hemû, li ser zinaran savar dikelandin. Çû xwe avêt wir. Bêguman, stargeha wî malbat bû. Li beramberî êrîşa min a dijwar ancax karî xwe wisa biparêze. Îhtîmaleke mezin ger min ew girtibana, minê bi kevirên hîn hişktir lê daba. Hinek darbeyê keviran jî xwar. Ger hinekî din girtibana diviya bû min hinek cihên wî xwîn bikira û heta bişkanda jî. Kîneke wisa bû.

Dema ku xwe sipart malbatê yê ku cara yekem xwedî lê derkeve wê bav be û hîn jî tê bîra min, bav xwedî lê derket û bi ser min de hat. Ji ber ku yê li beramberî min bav bû diviya bû ku ez hinekî xwe başve bikişêm. Me ber bi gund ve başvekêşanek kir. Di vê navberê de hemû gund rabibû ser piyan; ji ber ku şerekî pir dijwar ê bav û kur dihat jiyankirin. Bêguman dema başvekêşan çêdibû ne paşvekêşaneke pasîf û bê şer bû. Heta dawî bi îdîa û keviravêtineke bê navber bû paşvekêşana dihat jiyîn. Ew jî êrîş dike, hinekî bi hêztir, lê di nava gund de kolan hene; di wê mijarê de hinekî ezmûna min heye, ez dikarim bikevim nava kolanan, nemaze zêde derfetê serkeftina wî jî nîne. Jixwe dema ku ez ketim nava kolanan neketimê, ji ber westana min e yan jî ji ber ku min pêwîst nedît nizanim paşve kişiyam û bi vî rengî em di hevsengiyê de man. Lê ez bi vê ve sînordar nemam. Kîneke min a

wisa hebû ku, bi wê kînê ve ez bi ketinekê ketim nava malê, çixinekî wî yê pera hebû, çixinekî li paçekî pêçayîbû û pir baş jî vedişart. Dîtina wî jî pir zehmet bû, lê ez jî lêkolînvanekî pir baş bûm. Piştî çend lêkolînan ketim nava kevir û dîrekan û min çixinê pera li wir dît. Pir baş tê bîra min, min deh quruş jê girt, li gorî perê wê demê pereyekî mezine. Piştî ku min deh quruş girt, min pîlanê dev ji gund berdanê kir. Ew kîna min ez gihandibûm xala ku tê wî gundî bi cîh bihêlî. Çima dev ji gûnd berdan? Ez bawerim berteka min a mezin li beramberî malbatê rê ji vê re vekiribû; bêguman piştî bertekeke bi vî rengî li gund mayîn, ez nikaribûm zêde li malbatê bimînim. Ger tu li gel malbatê namîne çi karê te li gund heye? Ev ji hev cudakirin ne gengaze. Herî kêm li beramberî gund û malbatê dibe çalakiya berxwedaniyê. Ez bawerim zêde watedar nedîtina gund min ber bi fikra “*ber bi bajêr ve bibe*” ve bir.

Wê demê bajarê ku me hinekî nas dikir Nîzîp bû. Bêrecuk jî hebû, piştî wê Nîzîp dihat. Tevgera arasteya xwe ber bi bajar ve birinê, ji hemû aliyan ve di nava rojê de, hewa pir germ bû ji gund derketin û di wê demjimêrê de çûyîna bajêr ne tiştekî bi asanî bê aqilê mirove. Min ceriband. Bi lez bi wî pereyî min berê xwe da jêr. Çemek hebû, min ew derbas kir bi lez derketim serê gir. Beriya ku gund ji asoyê min winda bibe bi hêrseke mezin, di nava romdikên çavan de bi kîn bi şêwazê “*Ez cuda dibim*” bi xatirxwestineke wisa ez cuda bûm. Gundek cîran hebû, derbaskirina wî gundî jî mesele bû, kuçikên wan hebûn. Ez zarokekî pir şermok bûm, heta pileya dawî jî tirsonek bûm. Lê li gel vê jî di xala ku wê çi bê serê min, çi neyê heta dawî min biryara xwe serkeftî kirinê girtibû. Ez bawerim ev bi hestan ve jî girêdayî ye; bi girîngiyeke mezin min hewl dida xwe ji kûçika biparêzim, ji aliyê din ve jî xwe ji çavên xirab parastin hebû. Wisa bê ku haya min ji min hebe, lê heta dawî di nava helwesteke bi biryar de bûm. Min gundê yekem derbas kir, ber bi gundê

duwem ve bi lez ketim ser rê. Bi îhtîmala ku wê ji Xelfetî dibe ku erebe bê sekinîm. Îhtîmaleke mezin jî wê ereba postayê bê, ne ereba rêwiya ya asayî. Bi lezeke mezin, bi hêz û leza ku ew kîna ku dabû min dimeşîm. Ez gihiştim gundê Mezra Reş.

Dareke gund hebû. Ez li binê wê rûniştim û erebe hat, lê siwar bûm. Du û nîv quruşê min çû, nizanim. Em gihiştin Bêrecukê. Dîsa di germahiyeke mezin de min bere xwe da pirê. Min ew jî ser xist. Di temenê biçûk de tevî ku nediyarbû ez diçûm dibistanê yan na, li erebê siwarbûn pir zehmet bû. Dibe ku min dibistana seretayî xilas jî kiribû. Bi wê lezê em gihiştin Nîzîpê. Û vaye piştî wê di deşta Barak'ê de me dest bi nefel çinînê kir. Deşta Barak'ê deşteke gelek bi berheme. Genim tê de şîn dibe. Ji bo çinîna genim hêzeke mezin dixwaze. Yanî koka wan pir zehmet tê kişandin. Em bi çend grûbên dost re çûn. Nas bûn. Yewmiya du rojan pênc quruş bû. Ya herî girîng jî sibê, nîvro, êvarê dew hebû. Me ev roj bi dewê gerim derbas dikirin. Min dît êdî nabe yan jî min zêde li ber xwe neda, yan jî genimê ku bê çinîn nemabû, di encam de min amadekariyên vegerê kir; lê me deh quruş ji bav girtibû, min deh quruş jî qezenc kiribû. Hîn jî tê bîra min. Hatineke wisa watedar bû ew. Me deh quruş ji bav girt, deh quruş jî ji wir qezenc kir. Bi vî rengî me xala dawî danî.

Ev ji bo vê girînge; kîneke îsyanê kar ji kîderê dibe kîderê û yek ji îsyanên min ên bê hejmare ev. Hestên xwe bi vî rengî rêxistinkirin û ber bi encam ve birin pir girînge. Hemû jiyan hinekî di nava hestên wisa de, li beramberî lehiya kînan rêxistinkirin û birin girînge. Ez ne bawerim îsyanên we wisa mezin û pêşketî bin. Hûn tehlîla malbatê nakin, vaye ev jî tehlîleke malbatê ye; hem jî li kîderê, kengî, çawa, di kîjan dem û mercan de, me tehlîlek kiriye. Ger hûn bûna misoger we yê rista bebekê malbatê yê nazdar bilîsta. Bavê min kesekî pir xirab nebû. Ew jî ji min pir bi hêvî bû û baweriya xwe jî bi min tanî. Dilê wî jî dîsa herî zêde min şad kiribû, lê tevî vê jî min ewqas zêde îsyan

rêxistin dikirin. Min mînaka zarokê malbatê yê xirab jî raber nekir. Wisa yê ku axaftinê fêm nake, hertim xirab dilîze, hema ji ber xwe ve îsyan dike ne kesekî wiha bûm û berevajî ew jî li beramberî min bi hêvî bû.

Ev jî baş tê bîra min; li binê darekê rûniştibû rojekê û êdî çi îlham dabû wî, ez bawerim dîsa li berhema me ya ji jiyanê û hinek xebatên me yên ji berhemê îlham girtibû gotinek kirî hebû. Min zêde kar ne dikir, lê dema ku min dest bi karekî dikir jî, mine w kar paqij dikir. Dibe ku ev ew bandor kiribe û ji min re gotibû: "*Tu biçî kîderê biçe wê tu fetih bikî, li ser eniya te îşareta fethê heye."* Hêjî ev gotina wî di bîra min de ye. Çima got ez nizanim. Me li hev jî nedikir. Ya ku dixwazim bêjim em di nava pêvajoyeke bertekê ya wisa de bûn. Pêwendiya min bi dayikê re cuda pêş diket, min ew jî berê ji we re vegotibû. Ya ku min ji dayikê hêvî dikir pir cuda bû, lê ya ku min nedidît, lê dîsa ya ku dayikê hêvî dikir lê tiştên ku nedidîtin jî gelek bûn. Jiyanake me bi hev re ya demdirêj mayînê nebe jî, bi şîdet bû. Li gorî xwe wê ez nas nedikirim. Li gorî xwe min jî hewl dida wate bidim wê.

Bi xwîşk û birayê xwe re jî wisa bûm, nêzîkatiyeke min a weke "*Xwîşk û birayên min in, di hemû tiştên wan de qirêjî xeletiyên wan jî hebin tê xweş bibîne, yan jî pê re li hev bike"* nebû. Berevajî hêj wê demê hîn serwertir bûm. Min wekheviyek ferz dikir. Ji wan re digot: "*Hûn ê kar bikin."* Xwîşkek min hebû, bawerim ya ku min li ser ferz dikir karek bû, dibe ku tengav jî dibû, gelo min dixwest serdestiyê ava bikim? Dibe ku min di xebatê de bandorbûna wê li ser ferz kiribe, lê wê jî digot; "*Hêza te tenê têra min dike*." Min diceriband ku di nava malbatê de bihêz bim, lê li ser bingehekî rast bû. Dîsa bi birayên xwe re jî wisa bûm. Camêr gelek pasîf bû. Di malbatê de bûna xeteriyeke mîrasxwarekî hebû. Herwiha weke mirasxwarekî jî ma. Hîn ji wê demê ve serdeçûyîn çiqas rast bû tê fêmkirin. Camêr nikarî bi başî suwarî kerê jî bibe. Wê du kesan lingê wî rakira û li kerê siwar

kiriba, min ew wisa dibir navçeyê. Birayekî bi asanî nexweş diket û xwe radestî alemê dikir. Min jî ev bi asanî qebûl nedikir. Vaye min ev şer jî li beramberî wî kir. Jiyaneke malbatê ya bi vî rengî derbasbûye. Gelek bûyerên din ên mîna vê hene. Ez ê dirêj nekim, hûn tehlîla malbatê dibînin. Divê ku hûn bizanibin ji nû ve xwe li berçav derbas bikin.

Îhtîmaleke mezin we wê demê bandoreke ji rê derketî, ya koletiyeke giran a kevneşopiyan pir jiyan kir. Dibe ku şansê min di taybetmendiyên malbatê de be. Bavekî xwe zêde bi sazî nekiriye, qûralên xwe pêk ne aniye, dîsa dayikeke ji hemû aliyan ve xwe serwer nake. Dîsa di navenga birayên ku nikarin zêde pêşketî bin ez derfetê derketinê dibînim. Min şerê xwe yê pêşengtiyê di despêkê de bi malbatê re ewqas yeman meşand. Di navê de bê hejmar bûyer û şer hene. Dibe ku beşekî şerê ez niha bi KT'ê re dimeşînim me wê demê meşandibe. Wê demê ya ku min got, heta gotineke gelek navbang ya ku dayika min di derbarê min de digot hebû. Şêwaza xebata min didît.

Hêjî tê bîra min, li şêwaza xebata min dinerî û got: "*ehmeq, kes weke te dixebite?*" Grûbeke me ya biçûk a xwendevanan hebû. Min ew dibirin dibistanê û min hewl dida dibistanê bi wan bidim fêm kirin. Bê ku ez li benda tiştekî bim ev keda ku min raber dikir ez bawerim wê jî weke ehmeqiyê dinirxand. Wisa difikirî: "*Bê bersiv tu çima 10-15 zarokên gund bi vî rengî perwerde dikî*" û wate nedidayê. Min wan dikir xwedî dibistan û her ku diçû dikir mirov. Nirxandineke; "*Ma kes weke te dike?*" dikir û rast bû jî. Ti kesî weke min nedikir. Yek ji taybetmendiya min a wê demê xwe derdixe holê, bê bersiv hewldana perwerdekirinê ye. Ji aliyê din ve jî ez zarokekî ne li gorî wê pêdigihiştim, herî zêde ber bi xortaniyê ve diçûm. Ev bi dijwarî ferq kirin; ev zarok wê weke zarokekî malbateke ji rêzê nebe. Hîn wê demê ji min re digot tê malbatekê ava nekî. Bi şêwazê; "*Tu kes wê keça xwe nedê te, tu kes kar nedê te*" rexne dikir. Dibe ew jî rast be; ji ber ku îşaretên

jiyanê yên ku çavkaniya xwe ji min digirt dida diyarkirin ku ez ê li gorî pîvanên wê nebim, weke ku ew difikirî ez nebûma tîpekî bi tendurist. Bêguman gelek bûyerên dişibin vê yên cuda hebûn.

Min wê demê bala xwe dabû ser ol. Min nimêj jî dikir. Demekê lêhûrbûn kir. Di xala meletiya gund de min cîh girt û dikarim bêjim eleqeya min di asteke pêş de bû. Camêr di nirxandineke ya wê demê de digot: "*Ger tu bi vê lezê dewam bikî, tê bifirî.*" Li gorî ku min ev axaftin bi melê gund dabû kirin, misoger tempo derfetê "*firînê*" dida. Ez dikarim gelek nirxandinên bi vî rengî bînim bîra xwe. Di dibistana navîn de mamosteyên min hebûn, min yê dibistana seretayî berê vegotibûn. Ez xwendekarê herî balkêş û yê li berçavê wan bûm. Dîsa gundên derdorê hebûn û heta niha jî ew malbat me bi xêr bîrtînin. Ji bo ku tenê rojekê me vexwînin mala xwe ango li mala xwe bikin mêvan eleqeyeke wan a mezin hebû. Wisa nêzîkatiyeke bi rêzdarî raber dikirin. Em niha di nava tevgereke mezin a êrîşê de ne. Em hilweşîneke mezin rêxistin dikin, lê dîsa jî di rêzdariyê de qusûr nedihat kirin. Di amadeyî, dibistana navîn de gelek tevgerên wisa balkêş, gelek pevçûn û hemû jî henase bi henase bûyîn hebûn. Mînak, bi lîstoka navê lîstin jî ewqas ji min re zehmet dihat ku, bi mehan ez diketim nava kelacena wê. Pê difikîrim gelo ez ê çawa bikaribim bikim. Di her lîstokê de diketim nava kelecanên bi vî rengî. Ji ber ku ser nexim, jixwe binketin qet nabe. Ev herdu hest wisa li min dikir ku ji karekî re baş xwe amade bikim, yanî di derbarê yê ku hêza min têrê nake de taybetmendiya baş hilanîn û danînê ye. Ya rast ez ne kesekî ku dikarî pir baş bi navê bilîzime. Lê ketina nav û hema binketin jî ji min re pir lihevkirî nedihat. Niha bi vê re pêwendiya we çiye? Pêwendiya we ev e; hûn bi lez dikevin nava karekî û lîstokê, lê hûn qezenc dikin, an jî winda dikin, ne di xema we de ye. Ji bo min hîn jî ev şer amadekariyeke.

Bifikirin tevî amadekariyeke mezin jî tam bin neketime, lê ji bo serketinê jî kedeke çawa didim di holê de ye. Ev rastiyeke. Di

hemû lîstokan de wisa me. Hûn tempoya min dibînin, dîsa mezinbûna keda min dibînin, lê tevî vê jî weke we xwe rehet nabînim, ez bêhesabiyê nakim û tempoyê naxim. Di vê mijarê de hinek durist bin û bila bi we re hinek pîvan pêşkevin. Ev taybetmendiyeke pêwîste. Karekî ku hûn ê nikaribin tê de serkeftîbin weke kulî xwe navêjin ser. Dê çi bibe, çi bîne hinekî li ser bifikirin. Herî kêm ji bo ku hûn neyên xapandin bi navê nelîzin. Hinek lîstokên min demek berê qala wan kirî hebûn. Yên ku min dikarî qezenc bikim jixwe min qezenc dikir, yên din jî wekhev diman. Ez bawerim pir kêm min winda dikir. Ev derûniyek, asteke kesayatiyê ye. Tê ji wir terbiya xwe bigire. Weke pehlîwanên ji binketinê têr nabe fikrandin, hêz, amadekarî nîne, lê dikeve nava hemû lîstokên bi navê lîstinê xirabe. Di derbarê hemû qadên jiyanê de çiqas nîşaneyên jiyanê hene, li beramberî hemûyan bi şêwazek wisa min xwe rû bi rû kiriye. Li beramerî Partiyê û gel jî heta niha wisa ye. Heta dawî bi pile, bi pîvan, lê ne pejirandinek bi şêwazê ji aliyê wan ve tê ferzkirine.

Dîqat bikin, ez li beramberî we hemûyan çawa li ber xwe didim? Hinekî li berxwedaniya di nav wê malbatê de û berxwedaniya min a di nava malbata PKK'ê de binêrin. Ew jî malbata min e. PKK jî malbateke me ye. Gelê Kurdistanê jî niha malbateke mezine. Lê di nav de berxwedanî heye. Xizmeteke min a mezin ji malbatê re heye. Ev jî di pir baş kirinê re derbas dibe. Nêzîkatiya min ji hevalên min re ev e û xebatkirina min di nava PKK'ê de diyare. Lê tevî vê jî, rexneyên di derbarê yên karê xwe baş nakin de tên kirin, binerin li dijî wan hewldanek çawa raber dikim.

Ev vegotinek û şêwaza destnîşankirina diyardeyekê ye. Dibe derfetê qiyaskirina xeta jiyanê ya bi vî rengî ji we hemûyan re dide. Xeteke cuda ye. Divê ku em vê ji bo arasteya xeta siyasî bikin, yan jî arasteya civakî û ya siyasî ketine nava hev bikin. Ew der îhtîmaleke mezin pir giyanbire. Di pêşxistina xeta civakî de

min serî li ber gund netewand, li ber malbatê netewand, heta em dikarin bêjin ji pergala cîhana Tirk re serî netewand. Li şûna civaka gund derbasbûnek ji sînorên burjuvaziya biçûk re hat kirin û wê jî heta pileya dawî westand. Cara yekem derbasbûna civaka bajêr ji bo min derbasbûneke heta dawî bi zehmetiyan ve dagirtî bû. Çi barajên biçûk be, çi jî Enqere be, derbasbûna min gelekî zehmet bû. Ev jî pir girînge. Ketim nav, lê min xwe winda nekir. Yanî tevî ku ez pir muhafazakar bûm, min rewşeke di nav de helandinê jiyan nekir. Bi mehan, salan ez sekinîm. Ez di kêleka fêmkirin û jiyankirina bajêr de derbas nebûm. Hevalên me di sê mehan de dikevin navê û didin jiyankirin. Min nekarî bikim. Heta dawî henekê xwe bi min dikirin. Zarokên bajêr di asteke mezin de xwedî nêzîkatiyeke henekê xwe bi min dikirin.

Eleqeya mamosteyan hîn cudatir bû, hêviya wan a ku dibe ez pêş bikevim hebû. Lê li gorî mirovên me, yên li ber serê min jî ez tenê kesê divê henekê xwe pê bê kirin bûm. Îhtîmaleke mezin ez li gorî pergala wan li cihekî cuda dimam û ev jî weke xeterî didîtin. Yan jî civakbûna burjuva kêm an jî zêde difikirîn ku dê xeter be. Li beramberî jiyana wan a civakî bertekek min hebû û ne diketim nav. Wizeya xwe wisa xerc nedikir. Li beramberî vê jî bi şêwaza tokoşînek henekê xwe bi min dikin û bertekekê re rû bi rû dimam. Derketineke civakî ya wisa pêk hat. Di van mijaran de hûn jêhatîne. Derbazbûna nava jiyana civakî, ajoyên jiyana burjuvazî bi we re pir bi hêzin, dibe ku ketina nav jiyana burjuvazî û ber bi bandorên wê ketin, pir tişt bi we dabe windakirin. Hûn ji vê re jî dibêjin bandora Kemalîzmê. Ji ya din re jî dibêjin bandora feodalîzmê. Herdukan jî pir tişt birin.

Ez ji despêkê ve li beramberî herdukan jî hinekî bi tevdirim. Di asta ku hertim cudabûna xwe diparêze û serserkî nakeva nav. Min got, di avakirina grûba hevalan de kedeke mezin raber kir. Di mijarên sereke de dem bi dem min serlêdan dikir. Lê ji yekê ber bê ya din ve bazdan, yanî ceribandinên min ên wisa jî hertim

hebûn. Serîlêdanên min ên ol, ên felsefê bi zor û zehmetî pêş diketin. Nikare bê gotin ku di hemûyan de jî serkeftî bûm. Lê şêwazekî min ê ceribandinê heye ku, pir balkêşe. Hinek ji wan dikevin nav û dawiya jiyanê tînin; lê ez despêkê tenê venerîn dikim. Mînak min ji hemû aliyan ve xwe da vê xetê, lê ez ne kesekî dogmatîkim. Beşek we ya mezin di rewşeke dogmatîk de ne, hinek ji we jî hîn neketine nav kar. Ketina me ya nava vê xetê pir cuda ye. Dîsa heta vir anîna me jî wisa ye. Her roj nûbûnekê di nava xwe de dihewîne. Hinekê jî veguherandina dibistana jiyanê ya mezin ji ber vê sedemê ye. Bifikirin, ez pir diceribînim, ezmûn dikim, ya rast gav bi gav ji bingehkirina despêka avakirina civaka nû heta bi vî rengî pêşxistinê ji dema ku xwe nas dikim heta niha ez vê weke xetekê pêş dixim.

Em ji bêrîkirinên zarokatî bigirin heta ya herî nêzîkî îro û hema bêje ya ku dikare mantiqê hemû mirov di dest xwe de bigire ya ku li ser emperyalîzmê jî serwere dibîne, yê bindest dibîne, hemû mirovatiyê fêm dike kapasiteyek mantiqê û hêza nêzîkbûnê nişan dike. Wisa gav bi gav xwe pêşxistin heye, bi vê re girêdayî ji nû ve watedayîna mirov heye. Di serî de jî dema min pirsgirêka rêbaz diyar kir, divê ku em rast nêzîkî demê bibin. Dema me deqe bi deqe hûrûkûr derbas dibe. Hinekî jî girêdana bi jiyanê ve ev e. Ji bo vê jî weke min got, xetên stûrtir hene û ez bawerim ya herî xeter, destpêkirina şoreşê û li dijberî dewletê derketine. Beriya wê jî pêwîste rû bi rûbûna bi dewleta Tirk re baş bê fêmkirin.

Mantiqê Kemalîst hinekî jî mantiqê dibistanên şevbînî ye.

Kemal bi xwe jî xwendekarê dibistana şevînî ye. Kêm-zêde ketina nava dewletê ya her rewşenbîrî bi vî şêwazî despê dike. Em jî wisa bûn. Li gorî pîvanên asayî te Tirkî, bîrkarî, dîrok û çend waneyên din serkeftî bida tu dikarî derbasî dibistana şevînî bibûya. Me ev bi asanî serxist. Ji ber ku ez xwendekarekî dibistana şevînî bûm hîn di dibistana navîn de pîvanên min xirab nebûn. Di navenda Enqerê de em bûn xwendekarê kedestro. Ez

bawerim rê li ber vê pêşketinê vekir; hem xwe sipartina derfetên dîtina rastiyên dewletê çêdibûn, jixwe ev jî pir girînge, hem jî di navenda Enqerê de derfetê çavdêrîkirina civaka burjuva dida. Ger gavavêtina wir me ser nexistiba, wê ev derfeta çavdêrîkirinê derneketa holê. Li ser esasê xwe sipartina dewletê dikevim nav civaka burjuva. Dibistaneke min bêriya ne dikir, lê dema ku karê çûyîna Enqerê dibe mijara gotinê şayanî nirxandinê dibînim. Piştî wê jî weke memûrekî tapu qadastro ber bi Amedê ve firîm. Li Amedê çavdêrîkirina Kurdistanê dibe ku hinekî aso vekiriba. Weke memûrekî dewletê li wir rastiya civakî û rastiya dewletê li wir derfetên berhevdanê pêşkêş dike. Ji ber ku beriya wê di nav zeviyên pembo û genim de me zêde çavê xwe venedikir. Lê hinekî pere ketiye berîkê me, bi qasî tê xwestin derfetê çavdêriyê daye, wisa di nava jiyaneke otêlan de ev berhevdan kirin, ji cîhana rastiyan re hinekî din çavê xwe vekirin gengaz dibû. Bi burjuvaziyên biçûk re rabûn û rûniştin tena bi serê xwe mirov hinekî dikarî bi cesaret bike. Dîsa komên zimandirêjên ku berê me ne dikariya kêlake wan re derbas bibin burjuvaziyên biçûk re tu her roj rû bi rû hev dibî. Axa jî li vir nêzîkatiya xwe ya yekem raber dikin. Vana dibin derfetên hêza çavdêriya mirov mezin dikin.

Me xwe bi vê ve jî têr nedît. Ji bo ku hinekî din tempoya wê demê vebêjim bîranîneke xwe bêjim. Niha hûn bi xwe re nabînin xwe biherikînin. Dema ku memûr bûn hîn zêde di nava tevgerê de bûm. Ez memûr bûm û hemûyan bi "*Begê Ebdûllah*" xîtabî min dikirin. Gundiyên çiyayî, gundê axa, tevî ku ez memûrek bûm jî dema ku em derdiketin nav erd û zeviyan digotin; "*Xwîn ji difna me tê*" bi rastî jî wisa bû. Me di jiyana xwe ya mermûrtiyê de jî xwîn di difna gundiyan tanî, bêguman ev jî tempoyê dide diyarkirin.

Hatina min ya Stenbolê heye. Çiya ev? Divê ku hatina min ya Stenbolê bê pênasekirin û em bigihînin wateyekê. Di hatina

Enqerê ya yekem de tenê min bîrokrasî dît. Min burjuvazî nedît. Li Stenbolê hinekî din civaka burjuva hebû. Li Bakirkoyê salekê memûrtî kirin, hinekî din bi jiyan, civak, pêwendî û pîvanên wê ve burjuvazî bi min dide naskirin. Jixwe zêde hêza min a tevlîbûnê nîne. Eşkereye ku ez ê pir bê bandor bimînim. Lê çavdêrîkirina Stenbolê pir girînge, ji ber ku mirov gav bi gav pêşve dibe. Hûn dizanin 12'Adarê tê, li Engerê Dev-Genç (Devrîmcî gençlik- Ciwanên Şoreşger) û tevgerên weke DDKO (Doğu Devrimci Kültür Ocakları- Ocaxên Komînîst ên Şoreşgerên Rojhilat) ez tenê dengê lingê wan dibihîzim. Êdî em li Stenbolê rû bi rû hatin û me di dilê xwe de hîs kir. Di vê demê de êdî rasterast me jî pirsen weke "*Em jî çepgirin, Kurdparêzin*" û dest bi pirsên bi vî rengî kir. Min "*alfabeya Sosyalîzmê*" li Enqerê xwend. Dema ku min xwend tê bîra min di ber xwe de min ev got: "*me bîrdoziya metafîzîk winda kir*" me hîn wê demê nirxandineke wiha kir. Êdî li Stenbolê jî min sermîner di nava DDKO de dida û heta dawî semînereke bi îdîa bû. Ya rast destpêkirinek pir balkêş bû. Li wir îsyanek hebû. Ez bi pirseke "*Herkes dewletekê dadimezrîne, çima dewleteke Kurdan jî nebe*" despê dikim. Herkes li beramberî fikreke wisa biguman pêşwazî dike.

Pir balkêşe ya rast, ji ber ku di wê demê de diviyabû gotinên wisa neyên kirin. Ji bo wê demê gotineke heta dawî bi îdia ye. Ez diçim kongrê û vê dibêjim; "*Hema bêje 12'ê Adarê dibêje ez têm*" jixwe dê kongra dawî wê pişt re belav bibe. Ez heta dawî axaftineke bi îdîa dikim. Axaftina herî bi îdîa ya dema belavbûnê dikim û pêşwazîkirina 12'ê Adarê pêş dikeve. Dema ku şûr lê didin çend tayê porê me jêdike, lê li cihekî me yê din nakeve. Dev-Genç 12'ê Adarê pêşwazî dike. Weke ku em dizanin pêşengên wê li ber xwe didin û şehîd dikevin. Dilê me dişwite, lê em hîn nebûne milîtanên wan. Mîrasa ku li şûn xwe hiştine pir girînge. Em ê bibin hevalên wan, em ê xwe ji wan hesab bikin.

Egîdên me jî di nava xwînê de çûn. Madem me biryar daye em ê bibin hevalên wan, ev egîdiyeke, wê demê tê çeka wan li erdê nehêlî.

Weke tê zanîn êdî em li Enqereya 1970'yê ne. Yên ku bi 12'ê Adarê li hev didin, şer dikin û şehîd dikevin. Yên li şûn mane ji destê sêyem weke sempatîzanekî û bi lez di nava wan de pêşengtiyê dest dixim. Sal 1971-72 û hemû merc li Enqerê vê ji me re dibêjin: "*Tu dikarî li vê şoreşê bawer bikî, ezmûnên ku te jiyîne dikarin te bidin meşandin. Herî kêm di nava sempatizanên çîna sêyem de tu dikarî risteke misoger bilîzî"* û di encam de hema û bi awayekî durist tevlî vê dibim. Girînge. Ez xwe ji tevgerê dihesibînim. Heta amademe bibim endam jî. Ez çawa xwe tevlî dikim? Weke hinek ji we hema tê û dibêjin; "*Ez ji berendamtiya PKK'ê re amade me"* nabe. Min wê demê jî digot; " *Ez amademe bibim berendamê tevgera şoreşger."* Hîn Partî nîne, navê THKP-C, THKO-C heye, lê dîtina deriyê wan jî pir zehmete. Jixwe pir zêde kesên ku di wir de bahatana rêxistinkirin jî nebûn. Lê ez amademe bibim berendam. Bi niyeteke baş û weke sempatîzanekî baş hewl dida xwedî lê derkevim. Ev xwedî derketineke pir girîng bû. Hewldana min heye. Grûpbûnê bi hemû niyeta xwe ya baş, bi tevgerînên xwe yên baş, şayanî, baldarî û bi awayekî balkêş min dimeşand. Serokê komîsyona parastina TBMM'ê (Meclîsa Mezîn a Miletê Tirkiyê) yê niha Bakî TUG serdozgerê rewşa awarte bû û ez bawerim raporên ku ji MÎT'ê jê re hatibûn di dest de bûn û bi van xebatên me dihesiya. Pergal di bihara sala 1972'an de dixwaze bi cezayekî mezin û misoger me pêşwazî bike, naxwaze me bê bersiv jî bihêle.

Faşîzma 12'ê Adarê, ji hemû aliyan ve çalakiya dewletê ye, lê çalakiya min jî gîştiye xaleke girîng. Em weke îsyangerane. Jixwe em ê li dijberî dewletê îsyan bikin. Me îsyana li beramberî civata gund, ya malbatê, ya burjuvaziya biçûk vegot. Niha jî ji bo li dijberî dewletê derketinê xwe ji îsyanê re amade dikim. Demeke

wisa tê jiyankirin û hatiye hilbijartin, milîtanên destê yekem çûne, yên mayî heta dawî hatine pasîfîzekirin, valatî derketiye û di vê xalê de em ketine nav. Dewlet bi yê serkêş re mijûl dibe, yên weke me zêde xeter nabîne. Ez jî vê pêvajoyê baş dinirxînim. Di fakulteya zanistê ya siyasî de nirxandina vê girînge. Her ku diçe ferqekê dixim navbera xwe û zarokên burjuva de. Vê carê nikarin henekê xwe bi min bikin, berevajî ez bawerî didim wan. Beşa siyasî jî ewqas ne ji rêzê ye, yek ji qaleyên ciwanên şoreşgere. Hêvî girê didin. Bawerim vê carê dibêjin; " *Ev nûnertiya hevaltiyê dike"* û pir zêde ji min re çepika lê didin.

Dema ku min li beramberî profesorê destûra bingehîn mijara Kurd vekir hemûyan çepika dan, di despêkê de pir balkêşe û em girtin, em çûn Mamakê. Me girtîgeh dît. Bêguman ji bo me waneyeke bi dijwar bû. Encama herî baş ku min jê derxist; careke din neketina hundir bû. Me pêdiviyeke bê navber a rêxistînê ava kir. Em erzan jê filitîn. Weke tê zanîn piştî ku em ji vir derketin li derdora vê xetê gaveke din avêtin heye. Jixwe di despêka 1973'an de bihara wê sala ku nû ez peyvên vê xetê tînim ziman û fermî ji devê min derdikevê ye. Ez ji bo vê dibêjim; em diçin ji dewletê hesab dipirsin. Niha hûn jî diçin ji dewletê hesab bixwazin. Şerê herî germ heye, şerê taybet heye. Bêguman hûn di nava refên Partiyê de tên perwerdekirin, tên arastekirin. Partiya me, em tenê bi xwe ne. Ji bilî min ti endamên din ên rêxistinê nînin. Ez ê despêkê bi xwe bidim bawerkirin; bi zor û zehmet piştî ku min bi xwe da bawerkirin ez ê bi derdorê bidim bawerkirin; ger bibînim ez ê ji çend hevalên din rê bêjim. Pirsgirêkeke mezine. Bi mehan li derdora xwe dizîvirim. Yek kesî ku jê re baxivim nabînim.

Bi fikirin hûn niha nikarin hêza rêxistinê ya rêxistinkirî jî kar bînin û hûn nikarin gelê ku ji şoreşê re jî amadeye binirxînin. Lê ez bi findê lê digeriyam, bi nenûkê dikoliya, ji bo ku ez yek kesî bibînim. Çiqas bi gotinên şîr û şekir vebêjim jî camêr zêde gohdar nake. Ji min re dibêjin; "*Na derkeve serê çiya"* ez jî dibêjim; "*bi*

*hev re dibe"* tiştekî nabêjin. Hêza wan nîne, jixwe bingeha wan a çînî ji vê re dest nade. Yên ku tên wir nîvî feodal û nokerî di asta wan a jiyanê de heta dawî bi hêze. Şoreşgeriya wan bi gumane. Dîsa yên tên di asteke girîng de bi çanda komarê re derbas bûne. Nokerî heta hestiyên xwe jiyan kirine yan jî bi azweriyên burjuvaziya biçûk dagirtî û heta kesayetiyên xwe di ser de diçine. Tevî vê jî li Enqerê ceribandina grûbê heye. Jixwe mîraseke Dev-Gencê jî nîne. Mîrasa wan bûye dûman. Ne gengaze ku tu tiştekî ji wan bigîrî. Tê bi xwe ava bikî. Weke ku min got, ev bandor û valatî me baş bikar anî û xwe da vê xetê. Ez ê nebêjim salên 1973-74'an baş hatine derbaskirin. Tam di vê xalê de li beramberî lîstoka dewletê min dest bi lîstokeke çawa kir? Ji bo fêmkirina van ez vana wisa kurt tînim ziman.

Tu sala 1975'an 76'an tevlîbûyî.

***Ab.:*** 75'an Serokê min.

***---.:*** Ez wê demê çawa têm bîra te? Tu şahidê hinek tiştan bûyî? Tu dikarî çawa min taswîr bikî? Ber bi 1975'an ve em derbasî lîstokê dibûn, grûba me dihat damezrandin?

***Ab.:*** Di bihara 1974'an de komele hebû Serokê min.

***---.:*** Bêguman ew lîstokek bû li beramberî rastiya KT'yê lîstoka ADYOD'ê (Ankara Devrimci Yüksek Öğrenim Derneği) bû.

***Ab.:*** Piştî 1974'an belav bû, linav çû.

***---.:*** ADYOD pir zindî bû, min serokatiya ADYOD'ê kir. (Komela Xwendekarên Bilind ên Demokratîk a Enqerê) Ev Stenbol jî bandor dike û heta dawa min bi navbang dike. Derketineke Rêbertiyê ye, lê hîn weke yekî ji Tirkiyê me. Misoger polîs nikare tesbît bike, ez bi Kurdîtiyê, bi Tirkitiyê, Dev-Gencê, yan jî DDKO dilîzim. Di vir de xapandin mijara gotinê ye û xapandin heye. Ferzkirina dewletê bû. Ya ku li ser çepgiran serwere jî şovenîzma civakî ye. Li beramberî wê heta dawî em şiyar bûn.

***Ab.:*** Dixwazin bifetisînin. Ji bilî xwe naxwazin derfetê pêşketina şoreşgerî bidin.

**---.*:*** Bi awayekî ne sererast dibe TKP (Türkiye Kominist Partisi) yan jî çepa Mûstafa Kemal. Yanî çepgirên Kemalîst.

***Ab.:*** Xeta Dogu Perînçek jî wisa bû, domdarên wan îhtîlalgerên din jî wisa bûn. Dev-Yol jî wisa bû.

**---.*:*** Jixwe piştî rêberê wan hat qetilkirin û şûnde dibe ku eşkere ketibin bin bandora dewletê. Bi taybet jî Dev-Yol.

***Ab.:*** Weke xetekê binketibûn û ji aliyê rûhî ve linav çûbûn.

**---.*:*** Di demên piştre jî bi awayekî vekîrî hat dîtin; Dev-Yol nêzîkatiya rewşa rûhî ya binketinê ye. Piştî sala 1976'an û şûnde yê ku herî zêde xwestin pêşketinan asteng bikin ev taxima ku weke Dev-Yol dihat nasîn bûn. Hem jî bi lîstokên xapandinê ve.

**Ab**.: Di sala 1974'an de jî kirin, bi ADYOD'ê jî kirin.

---.: Hema bêje di nava meyldariyeke baskek ji yên burjuvaziya pêşeng di nava helwest û êrîşê de bûn. Ne dixwestin derketinê bi min bidin kirin. Em bi Kemal Pîr û Heqî'yan re çûn. Bi rastî jî hevalên ku hem li dijberî wan, hem jî li dijberî şovenîzma civakî hevalên ku al hilgiriya têkoşînê dikirin bûn. Ji bo Kemal Pîr û Heqî digotin; "*Ev bûne Apoger.*" Endamên rizgariya gel û Dev-Yol'îyan mina xiyanet li wan kirine dineriyan. Çiqas dişibin awirên mêtîngeriya niha! Lê em bêzar nebûn, bi van helwest û ferasetan, bi astengiyên ku derxistin pêşiya me re heta dawî me têkoşîn kir. Bawerim me ew asteng kirin û di encamê de ber bi binketinê ve bir, pêşengtî neda wan.

**Ab**.: Ew li şûn de man. Di asta komeleyan de man, her ku çû ji şoreşgeriyê jî dûrketin.

---.: Me îhtîlalgerî ji destê wan rizgar kir.

**Ab**.:Raste Serokê min. Me tam rê li ber ji hev cudabûna xetê, zelaliyê û refbûnê vekir.

---.: Temam ew bandora çepgirên binketî yên girêdayî dewletê bûn. Çawa ku di 1920'an de Mûstafa Sûphî linav birin û TKP'ya

sexte mohra xwe li Enqerê daye, grûba Mahîran linav biribûn. Dîsa grûba THKO (Türkiye Halk Kurtuluş Ordusu) bi vî rengî bû û ya li şûn ve ma çepgiriya sexte ya dewletê bû. Bandora dewletê û rewşa ruhî ya binketinê pir şênber bû. Bi wê ve mîrasa şoreşger dorpêçkirin heye. Em li beramberî vê dorpêçiyê, bi awayekî rast şerê meşandina parastina vê mîrasê didin. Jixwe derketina me dibe xwedîderketina li mîrasa şoreşgerî. Ez bawerim heta niha jî Dev-Yol parêz ji bo min dibêjin; "*Berxwedanî ji me dizî.*" Me ne dizî, lê me mîrasa şoreşgerî ji xwediyê van nêzîkatiyan parast.

Niha kîna mezin a Dev-Yol'ê li beramberî min ji ber vê sedemê ye û tê fêmkirin. Ji Perînçek bigirin heta yên tên zanînnaskirin beşeke mezin ji wan wisa ne. Pir kêm rewşenbîr hene ku bi me serbilindin. Yên ku bi me ve girêdayî jî hene, lê beşeke pir mezin dibêjin; "*Çima faşîzmê ew linav nebirin, çima 12'ê Îlonê PKK linav nebir*" hema bêje heyfa wan pê tê.

**Ab**.: Ji ber ku rûyê wan ê rast derketiye holê Serokê min.

---.:Bêguman, hatin li ser helwest û asteke wisa rûniştin. Em dikarin bêjin ev dewleteke neyekserin. Bandora Kemalîzma çepgir, weke ya beriya salên 1920'an dikuje, mîrasa li şûn ve dimîne jî bi dewletê ve gire dide. Ez ji vê bertek digirim. Di bûyera Kurdîtiyê de jî rewşeke wisa heye. Hinek milîtanên li ser navê Dev-Gencê tevdigerin tên eciqandin. Ji aliyê Denîzan ve dixwazin xwedî li Kurdiniyê derkevin, tên îdîamkirin. Paşê KDP ya ku bi dewletê re di nava nokeriyê de ye dixwaze li ser wê mîrasê rûnê. Ez li beramberî vê jî derketinekê dikim. Nêzîkatiyeke navdêr a nûnerekî KDP'ê heye û dibêje; "*Tu şûrê demoklesî.*" Me li beramberî KDP'ê derketinek kir. Dema ku em ber bi sala 1975'an ve tên bi dubendiyeke têkoşîneke xeter re em rû bi rû man û me hewl da ber bi pêşve biçin. Di navenda dewletê de û heta sala 1975'an bi vî rengî hatina me pir girînge. Ez bawerim xwestin di sala 1977'an de darbeyekê li me bidin.

Ji ber ku em hîn mezin û berfireh nebûn, bi gotina wan; “*Mar bohisteke”* heta li gorî min hîn ne bibû bihustek jî, nû ji hêkê derketiye û pêwîst nabînin lê jî binêrin. Ew bi xwe marin, em ne marin. Wê demê rewş ewqas aloz û tevlîhev bûye ku yên ku Kurdîtiya sexte dikin çil caran gotinên ji me mestir davêjin ortê, yên çepgiriyê jî dikin wisa ne. Lê em jî di bin re amadekariyên pir mezin dikin, bi rêgezan girêdayî, heta dawî me grûbeke durist û xebatkar pêk aniye. Tenê ev ne di rastiya Enqerê de, bi wê grûbê re ji Enqerê derketin, hema bêje 10-15 salan dibîne. Bifikirin yanî bi civata gund re û bi civata bajêr re hevgirtiye, lê piştî 10-15 salan li Enqerê jiyan kir û şûn de ez ê derketineke mezin bikim. Em ji burjuvaziyan fêrî pir tiştan dibin, em fêrî têkoşînê dibin. Me gelek çekên têkoşînê bi dest xistine. Em ê derkevin. Ya din jî di navenda Kemalîzmê de hema di binê Anitkabîrê (Cihêku qebra Ataturk) de me biryargeh ava kiriye. Tê bîra min, maleke min jî tam di binê Anitkabîrê de bû. Dema ku me ev xet çêkir diyardeyên despêkê di derbarê xetê de jî me li vir kir. Aliyê ecêb ê vî karî, pir zêde diçûm serdana qebristanê dikir. Ziyaretkirina qebra Ataturk, temaşe û xwepêşandaneke mezine.

Ez bawerim weke ku ev lêhûrbûnan rê li ber ji nêz ve dîtina nakokiyan jî vedike.

**Ab**.: Ew der mala me bû.

---.: Ev maleke ji wê malê cuda bû. Ji wê mala we cudatir maleke din hebû. Axaftina dawî jî mala hevalekî min bû, çawa ji girtîgehê derketim li wê malê mam. Pir balkêşe bavê wî astsûbay bû. Dayika wî jî ji mûşê û feqîrek bû. Navê wî tê bîra min, ez bawerim Atîlla bû. Li gorî ku navê wî Atîlla bû eşkereye ku bavê wî astsûbayekî Kemalîst bû. Hinek jin ketin nav malê. Gelo ew amûrekî venêrinê bûn, ez wê difikirim. Ev çend meh beriya dest bi avakirina xetê bû. Dibe ku jinên wê demê dixwestin bi xwendekaran re pêwendî daynin, macera jiyan bikin bin jî. Sê-çar jin bûn, zêde dewlemend jî nebûn, lê ecêb bûn. Dihatin gel Atîlla.

Ez jî li wir bûm. Me çawa hevdu dît, min hîn jî fêm nekiriye. Venerîna polîs jî îhtîmaleke mezine, lê ez misoger neketim navê. Piştre maleke din a ku em tê de diman hebû. Bi taybetî maleke Pîlot zêde dikete dewrê, hinek jin hatibûn wir jî. Bawerim 1975, dibe ku 1976 be jî. Wê demê jî qet bala min nekişand. Hûn waneya jin-malbatê dibînin, min nedixwest fêm bikim. Di wan salan de pêwendiyên jina burjuva çiye min nedizanî. Di serî de jî got, ger hêza te têrê nake, tê nekeve têkoşîn û pêwendiyeke bin kevî. Yên min jî hêza naskirina min a jina burjuva nîne. Di dibistanê de keçek hebû, min nedikarî pê re jî baxivim. Yanî ji min re pir zehmet dihat.

Di salên zanîngehê de jî wisa bû. Salên di mijara jin de min pir bi zehmet pêşwazî kirine. Heta radeya dawî ez bi baldarî tevdigeriyam, rewşa min a bandorkirinê jî hêdî hêdî derdiket holê. Lê berê xwe dayîna min a pêwendiya burjuva bi qasî em bêjin nabe de bû. Ev jî hêjaye ku weke bîranînekê bê gotin. Hîn dema ku nû nû grûbê teşe digirt tevlîbûna vê jinê pir girîng bû. Polît jî eleqeder dibû û Evdirehmanê ji Agirî jî bi wê jinê re bû.

**Ab.**: Jixwe di dema komelê de hev nas dikin.

**---.**: Ma hev nas dikirin? Dîsa Alaattîn Kapan hebû, pişt re provakator derket. Postal xistibûn lingên xwe heta siyasalê dihat; dibe ku ew jî bûyereke dewletê be. Ji ber ku piştre gotin provakatore. Li ser navê THKO (Türkiye Halk Kurtuluş Ordusu) tevdigeriya.

Dewlet jî êdî wê demê hêdî hêdî dihat ser me, rêyên bandorkirinê yên cûda diceriband. Vana rêyên bi zanebûn bandorkirinê bûn. Li gorî min hêdî hêdî ji dijberî dewletê derketina me re bersiv didan. Lê ez pir ji rêzê, bê bandor û heta weke kesekî qet xeterî ava nake tevdigeriyam û min dîmenekî wisa dida dibe ku gotibin; "*Ma ji vî jî wê zilam derkeve*" Çibû ya ku wê demê min raber dikir? Ji bo di vê xalê de vebêjim di vekirina mijarekê de fêde heye. Ev jî waneyeke civakî ye. Ez di

ketina derdorên burjuva-sosyalîst de tengav dibûm. Ne dikarim bikevim nav, ne jî bala min dikişîne. Lê dikevim derdorê grûbên sosyalîst ên şoreşger. Ev jî şêwaza ketineke pir balkêş bû, têkoşerî bû. Lê di encamê de ez li Enqerê me. Di navengeke xeter de feodalîzm û malbata feodalîzmê misoger bi ruhê xwe nadim xwarin. Civaka gund, civaka bajêr jî bi heman rengî ye. Hema bêje ez mîna rûpelekî spî yê nû di salên 1970'yê de tevlî grûba şoreşger û têkoşeran dibim. Dibe despêkeke nipûnû.

**Ab**.: Ras e Serokê min, çêkerên rêxistinî û mirovên van hebûn. Yên ku hîn nû nû eleqa wan li beramberî şoreşgerî û têkoşeriyê pêş diket, herî zêde yên ku rewşa wan a sempatizaniyê hebû jî di nava rêxistinê de, bi şêwaza rêxistinên mezin, zilamên rêxistinê yên mezin diketin nava hewayekê. Dewlet jî bi ser wan de diçû.

**---**.:Fêmkirina min a bêka ez jî kîjan rêxistinê me, ji kîjan bîrdoziyê me mesele bû.

**Ab.**: Pêşketinên bîrdozî hene, nîqaşên pir zêde hene, xet pêş dikeve, lê rêxistineke di holê de bê dîtin nîne.

**---.:** Dibe ku taybetmendiyeke berçav be. Şop nehiştin, yan jî ji bo ber bi nirxandina "*ev e"* çûyîn çênebe, rewşeke aloz didim diyarkirin. Tê nîqaşkirin; " *Ev ji çêpê Tirka ye, ji çepên Kurda ye, THKO'ye, THKP*-C' ye? Lê nizanin. Misoger polîs du-sê salan di nava aloziyeke wisa de bû.

***Ab.:*** Ji bo polîs ya girîng dibe rêxistin, pêwendiya rêxistinî ye.

**---.:** Hişmendiya ji rêzê ya polîse. Li gorî min heta niha jî fêm nekirine. Dibe ku niha li beramberî me hewl didin derbas bikin, lê vê carê jî kêmasiyeke cuda kirin. Hemû kes ji rêxistinê hesab kirin û bêguman ev jî bû sedemê kêmasiyeke mestir ji bo wan. Vê carê jî herkes weke PKK'yî ditîn.

***Ab.:*** Hema bêje hemû civak wisa dîtin.

**---.:** Erê hemû civak. Qaşo hewl didin nebesiyên xwe yên berê derbas bikin. Lê bi vê hişmendiyê tevgerîna wan bi wan da windakirin. Ger bê dîqatkirin, ev pêwendiya vê demê xwedî

risteke kilîdê ye. Îhtîmaleke pir mezin dewlet di sala 1974-75'an de bi hemû amadekariyên xwe ve hat me dorpêç bike. Ji nava rêxistinên din dihat. Kontrola Dev-Yolê, kontroleke ne yekser a dewletê bû. Grûbên din jî kêm an zêde di heman taybetmendiyên de bûn. Kurdînî, KDP'ê dixwest bike, ew jî di bin venêrîna dewletê de bû. Jixwe wê demê pir vekirî bû. KDP ji hemû aliyan ve weke hêza yedek a MÎT'ê bû. Lê em li beramberî van hemû polîtîkayên dorpêçiyê rengê xwe diyar nakin, rêxistineke çawa ye, nedizanîn, navê wê jî nebû. Yanî zarok heta heft saliya xwe hatiye, lê navê wî nîne. Heta taybetmendiyên sereke jî ne diyarin. Çawa dikare pêşkeve? Hema bêje min şibandiye xwe. Jixwe em ê çawa bibin zilam jî heta demeke dirêj jî kesî wate nedidayê. Di gundên me de û di malbatê de jî bi vî rengî bû. Gundiyan digotin; "*xwedê kesî weke wî neke*" û henekê xwe bi min dikirin. Ji ber ku zarokên wan ne weke min bûn, bi zarokên xwe serbilind bûn. Hûn jî kurê wan bav'anin. Min ew bav dîtibana û hesabê we ji wan pirsîba. Belê, digotin; "*Ew ji rê derketiye.*" Min ji bo hevalê xwe yê dibistana seretayî çend roj berê tiştek got, ez ê rojekê wî bigirim, hîn jî ditirse. Bila ji hatina gel min, silavek ji min re şandinê, merheba dayîna min netirse. Bavê wî bi taybet digot; "*Kurê min çiqas bi aqile.*" Niha mudîreke. Ji bo ku ez wî bînim min gelek ked da, lê ser neketim. Niha mudîrekî baş ê dewletê ye. Lê ev jî ne girînge. Temam, nikarin teşîs bikin.

Heta sala 1975'an dewletê jî bawer ne dikir em bibin zilam.

***Ab.:*** Jixwe bawer nedikirin.

***---.:*** Ji vê jî wêdetir, ez bawerim cidî negirt. Dewletê dixwest vê nîşanî min bide; "*Di vî de jiyan nîne*" yan jî "*Nikare tiştekî bike?*"

***Ab.:*** Tiştekî li ber çav nîne.

***---.:*** Yan jî tevgereke mezin a veşîrtî bû. Ez pir vekirî bûm, lê di heman demê de ti demê vekirî nebûm.

***Ab.:*** Di sala 1975’an de herkesî kovar derdixist, kovarên pir mezin û bi îdîa diyar derdixistin.

**---.:** Ji bo rengê xwe diyar bikin hemû tişt dikirin. Ne ji aliyê madî ve, ne jî ji aliyê niyet ve derfetê me yê derxistina kovarê nebû. Lê ger hebe jî şêwazekî me heye. Divê ku tu rengê xwe diyar neke. Ji bo vegotina vî şêwazî divê ku ez mijara tempo ji nû ve ji we re vekim. Ev lêguncandineke. Min kêliyeke berê pirsî, min ji we re got hûn dikarin nabzê pêvajoyê di destên xwe de bigirin? Nabzê vir çiye? Wê demê hîsên ku li ser min serwer hene. Min çima pêdiviya ewqas ne zelalbûnê dît? Ger pir bi zanebûn nebe jî, ji ber xwe be jî, ger bê dîqat kirin, li wê derê şêwazek heye. Ji we re maba, ji vê yan jî wê rêxistinê ye, yan jî remza wê rêxistinê we yê li eniya xwe daba û roja duwem bihatana xistin. Ya min hem weke şêwaz, hem jî weke naverok ber bi navlêkirineke bi vî rengî neçûyîna min heye. Lê tenê ne ji bo veşartîbûnê, di şêwazê pêşketinê de derfetê xwe zêde derxistina holê nîne. Rastî tam derneketiye holê, lê serî derdixe. Nîşaneyên vê xetê hene. Dewlet bêhna wê digire, lê wê bi çi darizîne? Ti aliyekî me yê weke rêxistin bigire dest, aliyekî me yê wisa nîne, heta sala 1977’an jî bi vî rengiye. Hem rêxistin heye, hem nîne. Ev pir girînge. Ev şêwazekî xebatê ye û heta niha jî didomînim. Niha hîn zêdetir pêş ketiye. Ji aliyê ti kesî ve jî fêm nekirina me ji ber vê ye. Li mirovê yek alî tê xistin. Pirsgirêk ev e.

Mînak hene; vaye Rizgarî jî pir bi tecrûbe bû. Tecrûba zindanê ya zilamê wê demê jî hebû. Sosyalîteyeke wî ya dewlemend jî hebû. Derdikeve, dadikeve û misoger îdiaya wî ya rêbertiyê jî heye, lê bi qasî bejna ceh jî pêşve naçe. Nikare ti çalakiyan jî derxîne holê. Çepên Tirk jî bi vî rengî ne. Tevî miraseke mezin jî, bi hezaran, heta deh hezaran girseya wan heye, lê şansê pêşketinê nabînin. Hinde em bi kantînan ve hatibûn girêdan kesî yeqîn nedikir ku em pêngavekê bavêjin. Dewletê jî

bawer nake. Em ji nîşaneyan zêdetir tiştekî din nîşan nadin. Avakirina vê cemaetê tenê ne grûbeke siyasi ye, daxwaza avakirina derdoreke civakî ye jî. Dema ketina nava malbata PKK'ê, em bi salan pê re mijûl dibim. Em li derdora xwe dizivirin, pêşketinên pir kêm dest dixin.

Di vir de dîsa ya ku girînge dewlete. Divê ku ji Enqerê derketinek çêbibe û helwesta dewletê li beramberî vê heye. Min ji sala 1966'an ve ji aliyê madî ve xwe sipartiye dewletê, êdî dema ku em ber bi salên 1977'an ve tên ber bi qutbûnê, derbasî qutbûnê ji navenga civakî dibin. Tam dibe 12 sale Bi derfetên wan ên madî, bi navenga ku hatiye afirandin ve ber bi pêş ve diçin. Dema ku em hewl didin derketinekê bikin, li derdora me zivirandin heye. Ya ku em weke çêpê Tirkan bi nav dikin, çepgirên binketî, çepgirên Kemalîst hewl dide bandor bike. Li Enqerê KDP'ya ku dixwaze kurdîtiyê bike nûnertiya wan heye, wan jî ne yekser dixwazin bigirin bin konrtolê. Em qebûl nakin, lê em nikarin bêjin grûba me di rewşeke wisa de bû ku xwe ji vê rewşê rizgar bike. Dewlet bi aqile, êdî şiyar tevdigere û ji xwe piştî 77'an êdî bi armanca linavbirinê bi ser me de tê.

***Ab.:*** Tê fêmkirin ku ji sala 1975'an û şûn ve dest bi nirxandinê kirine.

***---.:*** Bi qasî ku tê bîra min axaftinên weke; " *Artêşa Rizgariya Gelê Kurd"* hatiye damezrandin di derdorê de digeriyan. Tê gotin; "*Bila li xwe miqate be"* yê ku ev agahî dida me jî berpirsyarên DDKO yê bû û dirok 1975'e. Li emniyeta Enqerê; "*Artêşa Kurd tê avakirin"* nîqaşeke wisa tê kirin.

***Ab.:*** Wê demê vegera Kurdistanê di rojevê de bû.

***---.:*** 'Me dest bi nîqaşên "*Manîfesto"* kiribû, di zivistana 1975'an de me û Xeyrî bi hev re amade kiribû. Şêst û heşt rûpelbû?

***Ab.:*** Heftê rûpel.

***---.:*** Manîfesto jî amade ye. Ev dawiya 1975 û despêka 1976'a ye. Demeke nêzîkî vê ye. Bi qasî ku em gav davêjin şiyariya dewletê, fêmkirina me, naskirin û bêguman daxwaza xistina bin venerînê zêde dibe.

Vaye di demeke wisa de, -sal dibe 1976- Pîlot di dewrê de ye û di pozîsyoneke tam a venerînê de ye.

***Ab.:*** Di sala 1976'an de.

***---.:*** Tam di rewşa venêrîner de ye. Di dîmenê de weke ku ez ji hemû aliyan ve di himêza wan de me yan jî ez ketime pozîsyona ku dewlet dixwaze. Piştî ADYOD'ê ye, em hewl didin grûbê cuda bikin.

***Ab.:*** Ber bi dawiya sala 1976'an ve ye.

***---.:*** Mudaxeleya dewletê pêş dikeve, nokerên Kurd dikevin dewrê, yan jî dewlet bixwe?

***Ab.:*** Derdorên cuda dixin dewrê, bêşên weke sîxûr û nokerên Kurdan.

***---.:*** Lê balkêşe, ji ya vana re ya rast nikare bê gotin; "*vedizîn*" jî, hema bêje ez digirim û dibêjim; "*Werin em bi hev re bimeşin.*" Şêwaz û uslûb wisa ye. Uslûbê ku bi asanî dibêje tu dikarî peywira xwe bibînî heye, şêwazek heye.

***Ab.:*** Xebateke wisa heye, lê ji bo van ti şansê pêşketin û bingeha wê nîne.

***---.:*** Ji ber ku di şêwaza rêxistinê de modelekî cuda heye. Nêzîkatî ji pêwendiyan re, nêzîkatiyeke siyasî ya pir girînge. Di cewher de li dijberî dewletê ye, li dijberî pergala serdest tovê tevgereke mezin tê avakirin, bingeha têkoşîneke mezin ava dikim. Lê li beramberî van sîxûr û vedizan jî wê bide fikirandin ku em ewqas ne xeterin, ew ê wan û nemaze dewletê ber bi xapandinê ve biherikîne, şêwazekî wisa ji dest bernadim.

***Ab.:*** Ew bi xwe jî bi vê îdiayê derdikevin holê. Jixwe weke civakeke nû dibe pêvajoya guherîna hevsengiyên siyasî ya rast.

***---.:*** Bi taybet rewşa min çawa ye? Van zilaman hîn ji sala 1976'an bi wateye rast min digirtin dest. Rêyên ne yekser ên berê têrê nekir, jixwe her ku diçe em êdî xeter dibin. Pereyên Pîlot pir in, digot; "*Bira tu emir bikî ji min re, avahiya çar qat heye, ez ji wir bi teqleyan xwe bavêjim.*" Rojekê tê dibêje; "*Bi rê de min 2-3 polîs kuştin, li wan da.*" Hewldaneke wî ya weke kesekî xwe bi bandor bide diyar kirin hebû. Ez bawerim dixwest rê li ber fikreke, *"tam milîtanekî ez dixwazim, hemû tiştên ez dixwazim dikare bike"* re rê vekira bi min re. Jixwe hertim pêşniyar dikirin; hewl dida ji bo dizî û pîlansaziya çalakiyan ji min talîmat bigire, hewl dida Kemal Pîr wan jî bikişîne gel xwe, lê min digot; "*Na, niha ne dema çalakiya ye.*"

Bifikirin min sal, sal û nîvekê bi vî re jiyan kir. Nêvê sala 1978'an bû?

***Ab.:*** Dawiya sala 1977'an bû.

***---.:*** Sal, sal û nîvek bi rastî jî heta dawiyê şayanî nirxandinê ye. Wî dixwest bi çalakiyeke pêşwext me ber bi provakasyonê ve bibe. Me jî hem îdîarekirina wî û hem jî ji bo neyên provakasyonê, grûbê bimeşînin, derketinê bikin hewl dida. Ger em jî weke çepên Tirk ên ku roja xwe bi ser dibirin tevgerîbana, meyê nikariya jiyan bikira û em ê li nav biçûna. Ev misogere. Li gel wî jî yuzbaşî Îlyas hebû. Yûzbaşiyê Alayê bû. Ez bawerim ev yuzbaşiyên Alayan piraniya xwe zilamên kujerane weke endamên şerên taybet tên bijartin û pêgihandin.

***Ab.:*** Wisa tê fêmkirin, ew hinekî perwerde dikin.

***---.:*** Ez bawerim vana Mahîr wan jî pêşwext û bê amadekarî kişandin nav çalakiyê. Tahrîk, kişandina nava çalakiyên wisa yên provakatîf û di îmhakirinê de ristekî girîng dilîze. Tê fêmkirin ku heman rêbaz xwestin li beramberî me jî kar bînin. Rojane pîlanên çalakiyan amade dikin.

***Ab.:*** Pir zîrek bû Serokê min.

**---.:** Hêjî baş tê bîra min, misoger wisa bû. Lê cudabûna şêwazê min heye û li ser wî esasî hat fêmkirin ku em dê neyên tasfîyekirin, hat dîtin.

Wê demê jinek di nava grûba me de cîh digirt hebû. Ya rast îhtîmalê wê yê ferzkirineke dewletê jî pir mezine. Ferzkirina dewletê bû?

***Ab.:*** Bi dewletê re cîh cihan arasteya pêwendiyan bi hêz bû. Ev ji malbatê….

**---.:** Dibe ku yekser yan jî ne yekser ji malbatê be. Bi tenduristî ji Enqerê derketina me ya sereke jî dibe ew. Du serdehatinên dewletên ên bi hêz, bi xwe ferzkirinê wê re rû bi rû me; yan tê çalakiyan bikî û bifetisî; yan jî tu çalakî nekî jî tê di wê pêwendiyê de bifetisî. Herdu jî Kurd in. Dewlet ji du baskan ve em tam girtine nava pencê xwe. Yek ji wan çavkaniya hestî, yê din çavkaniya madî. Pir balkêşe, ev 15 sale me xwe sipartiye dewletê û em pêşketine, êdî em dixwazin derketinekê bikin û dewlet jî bi du rêyên bandorkirinê li pêşberî min radiweste dixwaze pêşiya min bigire.

***Ab.:*** Di sala 1976'an de dike.

**---.:** Her du jî di sala 1976'an de bûn.

***Ab.:*** Hemwext bû Serokê min.

**---.:** Hemwext bû û misoger ji dewletê bû. Ji vê ti gumana min nîne. Zilam jî li gorî mercên wê demê, li gorî derfetan kulm bi kulm pere belav dikir, tenê ne ji bo min, ji bo hemû grûbê. Tenê ne min, mînak hemû grûb dibir xwaringehê. Kî tê birçîbûnê tîne ziman; rewşa me ev e û bi xêra serê me zikê herkesî têr dibe. Ev şêwazê pêwendiyekê ye. Uxur Mûmcî jî ez bawerim ji ber vê pirs dike û dibêje; "*MÎT Apo xwedî kir?*" Vaye çîroka xwedîkirinê jî ev e.

Ger em eniya Pîlot weke despêkeke leşkerî binirxînin, eniya jinê jî dibe despêkirineke civakî û siyasî.

***Ab.:*** Dixwaze bi pergalê ve girêde, derketina şoreşgerî asteng bike.

**---.:** Ew girînge. Ger di derbarê jin û pere de qelsiya min hebe dê bixwaze heta dawî kar bîne. Dema digot; "*Bira tenê tu bixwazî?* Ew jin jî heta dawî ferz dike. Bêguman meyla me ferq kir.

***Ab.:*** Demeke dirêj şopand.

**---.:** Misoger şopandiye.

***Ab.:*** Ji sala 1974'an, heta 1976'an şopand.

**---.:** Du salan şopand, heta xwest fêm bike ku bêka em çepgirên çawa ne; çepê Tirkan, çêpê Kurdan yan jî çi, çepgiriyeke çawa? Dema ku pişt re jî bijardeya xwe ji aliyê grûba me ve kir, dixwest ji hemû aliyan ve grûbê bixe destê xwe. Ev bê nîqaş bû.

***Ab.:*** Di asta pêwendiyê de jî ev hebû Serokê min.

**---.:** Kesek hatibû amadekirin bû.

***Ab.:*** Amadekariyên wê bi xwe hebûn Serokê min.

**---.:**Ji aliyê bîrdozî-siyasî ve amadekarî hebû, amadekariya kesayet hebû û hêza xwe ya pere jî hebû. Jixwe Pîlot jî digot; "*Bira tê li kîjan malê bimînî?* Li ser navê min malên ku qet min nedîtiye kirê dike û dibêje; "*Min kelûpel jî birine."* Di salên 1977-78'an de ji xwe ez jî vê îmajê didim û di wê demê de em hinekî din vê tesbît dikin. Di 1977'an bi provakasyona 3'ê Hezîranê di dema darbeya N. Kemal Ersûn de ye. Fermana mirina me hîn wê demê hatiye dayîn. Ez bawerim ji bo pêşketina wê darbeyê (Ev darbeyeke Turkêşe û heta niha jî bê aman li pê me ye) hevsengiyên çîna karker a Tirkiyê derfet neda. Wê sibehê Karasû hatibû girtin. Kemal Pîr jî hatibû girtin. Çûyîna min û negirtina min a wê malê tesadufî çêbû. Dîrokî ye. Karasû dizane, 3'ê Hezîranê bû, di 5'ê hezîranê de dê hilbijardin pêk bihata. Dê hilbijartin nedin kirin, Li ser Ecewît sûîkast pêkanîbûn. Piştî wê bi temamî xistin bin emrê şerê taybet û ez bawerim bi şêwazekî ew ê me li nav bibirana. Jixwe çekên qirêj wî dabû gel me. Me ew

tesbît kiribû. Cezayê wê herî kêm 30 sal bû. Di wê eniyê de bûyerek pêş dikeve. Ger em îhtîlalgeriyê bikin zilam wê me li nav bibin. Peyam ji hemû aliyan ve ev e.

Di nêviyê sala 1977'an de, ger ez li Enqerê bimînim neçarim dibistanê temam bikim. Ya ku li ser min tê ferzkirin ev e; "*Hema weke çepên din çepgiriyê bike, kovara xwe derxe, lê li Enqerê bimîne"* û tê gotin ku; "*Serseriyê xwedê tu çi dixwazî? Tu dibê jin jin heye, dibê pere pere heye, avahî dibêjî avahî heye ha ji te re bixwe, di navê de razê."* Ez jî di vê navberê de mîna paşa tevdigerim. Hîn zêde pere, hîn zêdetir xwe bidin xebitîn. Pir balkêşe. Eyarkirin pir girînge, ez burjuvazî çawa didim karkirin. Niha yên ku serê wî Uxur Mumcî jî birin, ya ku dixwaze veke ev şêwaza pêwendiyê ye. Di demên salên 1976-1977'an de ez wan di xebitînim, yanî dewletê dixebitînim.

***Ab.:*** Lê wan xwest berevajî bikin.

**---.:** Hema bêje şêwaza sihiyetiyê divê ku hinekî rêzdar nêzîk bibe. Çiye rastiya siyasî, ya civakî? Ez vana hemûyan weke hîlebaz, lîstokvanekî nakim, heta dawî duristim. Ya rast ji vana bawerim. Lê ji pirsa; " *gelo"* jî şûn de namînim. Dê sîxûr derkevin, îhtîmaleke û li gorî wê jî me xwe ji mudaxeleyê re amade dikir.

Em li Enqerê ne, ger em salên 1976-'77-'78'an nespêrin van, gelo em ê bikaribin derketineke saxlem bikin? Ev dikare bê şibandina pîlanê me ya xilaskirina SHP'ê jî. Niha cenazeyê wê ma. Ya ku me li beramberî kurê Înûnû kir darbeyek siyasî bû. Darbeyek li hemberî SHP'ê bû. Dîsa di rastiyê de ya ku me li hember CHP'ê jî kir darbeyek siyasî bû. Di rastiyê de me ew li dijî eniyê lîst. Ev di sala 1976 û 77'an de endamên CHP'ê ne, hem ronakbîr, hem kemalîstin. Ango taktîkeke. Hevgirtina me ya wê demê jî dibe taktîkek. Îhtîmalek mezin yeqîn dikirin min bixin bin kontrole. Jixwe piştî ku Pîlot ez winda kirim, li gorî kesek naskirî ji min re gotî xwe li erdê dixe, diteqe ku dibêje; "*Çawa ji*

*destê me xilas bû.*” Digot heta wê şêt bûya. Çûye heta gundê me û pirsiye; “*Li kure?*” Dibe ku ji bona vê ferman girtibe. Piştre jî kuşt an jî hat kuştin nizanim, lê yeqîn dikim ji ber binket dawî li jiyana wî anîn.

Mijara jinê jî ecêbtir bû. Ji bona vê pêdivî heye ku ev mijar bê vegotin; têkîlî, têkîliya çiye, dikare navê wê çawa bê lêkirin? Girînge. Pir vekiriye ku têkîliyek şere. Di berfirehiya civakî û siyasî de ye. Bi yekbûna herduyan re dorpêçbûnek wisa zirhî ye.

***Ab.:***Bi wî şêwazî pêşket û hat dewamkirin. Lê hemû ne wisa bûn.

**---.:** Na bi pîlane. Ferzkirineke wisa jî çêbû. Di wan salan de divê ku rewşa Tirkiyê û asta wê jî hinekî li ber çav bê girtin. Di meha Çile ya 1978’an de Ecewît tê, Çile girînge, ji ber ku piştî vê ewqas xwedî derketina Tirkan li şerê taybet ne tesadufî ye. Me bi vî alî ve nirxand. Yek ji wateya lîstokê jî ev e; şerê taybet ji hemû aliyan ve dixwaze bixe bin venerîna xwe. Lê ji ber ku navenga çepgira ye, weke ku dixwaze jî tam nakeve navê. Hinekî jî peyvên kontr-gêrîla ji devê xwe derdixe û li beramberî vê bi sûîkastê tê tepisandin. Ya rast, kevneşopa klasîk a tê zanîn heye. Li gorî min şerê taybet piştî sala 1960’an û şûnve ji aliyê Turkêş ve hatiye konrtolkirin. Di nava dewletê de xwedî du meylane. Kevneşopa Turkêş Emerîkanî û Tûraniye. Meyla Emerîka jî ji Tûrantiyê re heye û Turkêş jî yek ji vê meylê ye. Nemaze di nava Daîreya Herba Taybet de bandor ya Turkêşe. Ecewît jî ji ekîba Înûnû ye. Ew CHP’ya klasîk a tê zanîn û ew bi giranî aligirên artêşê ne. Heta niha jî ev dewam dike.

***Ab.:*** Mîna ya Ewrûpa.

**---.:** Temam Ewrûpa. Ecewît hinekî jî beşa artêşê ya ku ji derveyî Daîreya Şerê Taybet kar tîne. Pîlot girêdayî şerê taybet bû. Malbata Fatma jî girêdayî CHP’ê bû. Şerê taybet hema dixwest darbê lê bide. CHP jî hema bêje weke bikaranîna CHP’ê ya Partiyên demokrasiyê dixwest min bikar bîne û di nava

bandorgeriya xwe de bihelîne. Ji aliyê taktîkî ve hinekî cuda, lê bi heman şêwazî didomand. Ger bê dîqat kirin, me di navbera baskê Kemalîst ê klasik de, piştî salên 1960'î di navbera baskê ku xwe dispart Emerîka û şerê taybet pêş dixist de, îro rewşeke hevsendiyê girtiye. Ya rast her du jî dixwazin me bigrin bin venêrîna xwe û misoger dixwazin me bi xwe ve gire bidin. Jixwe eşkereye ku dewlet dê bi awayekî din qebûl neke. Misoger me hem rewşa deweletê ya sala di 1978'an de, hem jî bi îsabet dîtiye yan jî hîs kiriye. Me wisa xeta rêxistina nakeve nava lîstokên her du aliyan xêz kiriye. Ger na gundiyên weke we hejar ji nava vê rastiyê derxistin hesan nebû.

Em hewl didin ji Enkereyê derbikevin. Ji kesên ku di nava her du baskên dewletê de tevdigerin heta radeya dawî sûd werdigirim. Ma ez tirsonekim. Heta niha jî tê nîqaşkirin. Çend roj beriya niha min bihîst; di rojnameyan de nivasandine dibêjin qaşo; "*MÎT'ê Ocelan şandiye Kurdistanê*" û wisa nûçe nivîsandine. Vana di cewherê xwe de ji aliyê mîhrakên ku di nava dewletê de ji bo tawanbarkirina hev gotinên ku dibêjinin. Ya rast ne şandin, ew wisa difikirîn ku ev pêwendiyeke di nava lepê wan de ye û dîtin ku xapiyane. Niha jî di bûyera Uxur Mûmcî de weke ku tê dîtin hevdû tawanbar dikin. Ji ber ku yek ji wan baskê Kemalîste, yên din jî baskê şerê taybet yê Emerika ye.

Îro ji hemû aliyan ve hev girtine. Qaşo ev DYP-SHP dijberî hevbûn; lê hev girtin. Di emcamê de yên ku dibêjin; "*Dê Apo nikaribe me ji hev parçe bike*" jî heman kesayetin. Yanî Turkêş û Karayalçin, Demîrel û Yilmaz ev jî dibin rûpêşê dewletê yên sivîl û qaşo ji darbeya ku ji min xwarine wane derxistine, heta tenê di nava yek rêxistinê de hev digirin. Ev pir girînge, ya rastî ev têkoşîn pir dijwar berdewam dike. Veqetandina Ozal jî pêvajoyeke girîng bû û dîsa girêdana xwe bi me re hebû. Hatina Ozal, cudabûna wî û heta niha jî bi ser de çûyîneke Ozal heye. Xilasbûna Înûnû heye. Qadroyên herî pêşketî yên şerên taybet,

yên weke Ersever, yên ku bê aman bi me re şer dikine. Bi vê derketinê re ji nêz ve pêwendiya wan heye.

Min hinekî di nava hevdebûna bi beşên civakî, siyasî û leşkerî re nîşan da. Bêguman tirs û dudilî hene. Ez li Enqerê radestî Kemalîzmê nebûm. Her çiqas her roj qebra wî bibînim jî, kî yê gohdar bike ev çiye, çi kiriye. Ji aliyekî ve pêwendiyên ku wî serwer kirî hene, ez qet navbera xwe xirab nakim, lê pir bi fikarim. Pirsa "*gelo*" tevî hemû derfetan jî her roj jixwe dipirsim. Enqere weke sitiriyan di laşê min re diçe. Bifikirin dibêjin; " *Bi qasî tu dixwazî pere heye, tu dikarî çepgiriyê jî bikî, kurdîtiyê jî bikî"* û di dimen de hemû Kurdperwerin, hem çepgir, hem jî pir pere heye û hemû curên jiyanê hene. Di asteke bi wî rengî de binneketin gengaze? Min çawa derbas kir? Ji bo derbaskirinê ez afirîneriya xwe çawa xwedî dikim, çima min pêdivî bi afirîneriyê dît?

Girînge û divê li ser bê fikirandin. Grûbên milîtan ên Tirkiyê hene û ger ez weke grûbên Dev-Gencê tevbigerim dê zilam min bifetisîne. Pîlanê wî amade ye. Milîtan, Mahîran çawa linav birine û dê me jî di heman kêliyê de linav bibin. Jiyana pergalê jî pêşkeş dikin. Jixwe heman kes dibêje; "*Ya tê milîtaniyê bike, yan jî xwe bide jiyankirin."* Pir zelal tê fêmkirin, zêr ji min re dikirîn. Digot; "*Bira bavê min nizanim zeviyê xwe yê çend donim firotiye, weke bîranîna hevalekî ji min bigire ha ji te re ewqas zêr."* Hem jî li nav çavê min dinerî û wisa digot. Min dizanî ku vana bi perê bavê xwe nakire. Lê ji bo bala wî nekişînim min jî digot; "*Temam."* Dîsa digot; "*Bira em çalakî bikin, em biçin şelandineke pêncsed hezar quruşî bikin."* Ji bo wê demê pereyekî mezine, digot; "*Tenê tu ferman bide."* Dibêjim ya zilam di kolanê de hatiye zilamekî bi qasî dêwan li erdê daye û dibêje ji hemû cure çalakiyan re amade me. Ji qatê çaran xwe davêje, perende *–Teqleya ku xwe li jor dizîvirîne û tê avêtin-* dike û li ser piyan dikeve; ma tu dikarî milîtanê wisa bibînî? Ez jî dibêjim; *"Bisekine hîn dema wê heye."*

Ji jinê re jî nêzîkbûnek hestî heye, lê guman jî hene û li beramberî heve.

***Ab.:*** Jixwe ewder bandor dike.

**---.:** Tu dibêjî li vir?

***Ab.:*** Çêkera wê malbatê hertim fikar ava kir.

**---.:** Lê eleqeyeke min a nayê bendewarkirin, ya pir cidî heye. Ger bê dîqatkirin yên li pêşberî me bi israr ji me re bêjin; " *Were"* û dawetnamê bişînin ne di rewşeke wisa de ne. Heta hinekî jî dixwazin birevin, ya rast dixwazin hinekî cuda bigirin dest.

***Ab.:*** Dixwazin bikişînin xeteke din.

**---.:** Mînak tiştekî çawa?

***Ab.:*** Ji aliyê pergalê ve kişandina xeteke nexeter.

**---.:** Li gorî pîlanên xwe?

***Ab.:*** Li gorî ku yên ew dijîn.

**---.:** Li gorî nerîna te dewletê kengî bi ser me de hat? Çiqas dikarî bide bawer kirin bi xwe sipartina jinekê dê bikaribe bixe bin kontrolê?

***Ab.:*** Heta sala 1978 û despêka sala 1979'an jî ev baweriya wan hebû.

**---.:** Min hêza dayîna bawerkirinê raber kiribû?

***Ab.:*** Heta agahî ji Partiyê girtin jî di vî karî de dewlet hebû. 1979'an…

**---.:** Em dikarin bêjin dewletê ji sala 1977'an û despêka 1978'an jî ji vî taktîkî tam bawer bû. Ev jî dibe şaş agahdarkirina dewletê. Niha herkes vê dizane, jixwe ji vê re tê gotin nebesiya herî mezin a dewletê. Raste, yek ji kêmasiya wan a herî mezin a dîrokî ye. Ez wisa dizanim ku min ev kêmasî bi herdukan jî da kirin. Tenê ne ji jinê re, bi yên din jî min dida kirin. Yê din jî bi qasî dewletê zanyarî didan. Jixwe digotin; "*Girt",* yan jî, "*Çûkê di qefesê de."* Ji bo me ev nirxandin dikir. Digotin; "*Kengî em bixwazin em dikarin çûk ji qefesê derxin bibirijînin, em ê xwê jî pê da kin û bixwun."* Min wê demê jî dixwest baxivim, min xwe

bi xwe ji xwe dipirsî û digot; “*Çima van axaftinan dikin.”* Qaşo em di çavê wê de çûkê di qefesê de bûne.

Me civîna 1’ê Çile ya di sala 1977’an de li mala Pîlot çêkir. Civîna me ya herî mezin bû. Xala herî balkêş ya vî karî camêr hemû tişt amade kir û em jî çûn me çêkir. Bêguman belgeya wê nîne. Navê wê nîne; tiştekî xwe nîne. Devê sobê vekiriye, notên ku me nivîsandine hene, ger polîs bi ser malê de bigire em ê bavêjin sobe û bişewitînin. Jin jî heye ger polîs were em ê bêjin; “*Serê salê ye em sersalê pîroz dikin.”* Pir balkêşe! Vaye em herdu aliyên dewletê jî wisa bikar tînin. Ger MÎT vana bibîhîze wê ji kena bifetise, yan jî ji hêrsa xwe re bifetise, nizanim. Hevalê D. Hebû dema di sala 1979’an de hat girtin ji min re digot dibêjin; “ *Ji sedî sed di destê me de bû ev, çawa me ji destê xwe revand? li xwe didan.*”

***Ab.:*** Nêzîkatiyên wan wisa bûn Serokê min.

***---.:*** MÎT wisa dizane ku ez di himêza wan de me, ji ber ku pîlot rapor dide û ji wan re dibêje; “*Çûkê di qefesê de ye, em kenkî bixwazin dikarin serê wî jêkin.”* Jin jî dibe ku bêje; “ *Ji sedî sed di bin kontrola min de ye.”* Di dîmen de ev wisa ye, ger hûn bûna wê we çawa derbas bikira? Vana ne tiştên ji rêzê ne. Ji hemû aliyan ve pêşketin û bûyerên rastin. Hûn min cuda nas dikin. Hûn wisa dizanin ku em gelek asan polîtîka dikin, lê ez xwedana sekranê dirijînim. Tê bîra min, di darbeya 3’yê Hezîranê de di bûyera Karasû de dema Pîlot xwe derxist holê ez lerizîm. Berdaxa çayê ya ku di destê min de bû dema ku min ev bûyer bihîst li ser çoga min ket. Ez ji hemû aliyan ve dilerizîm. Ji ber ku min digot; “*Dawiya me hat.”* Dê camer darbeya xwe li me bide. Dibe darbeya Ersûn û di hedefa yekemîn jî em in. Bi vî rengî bi jiyankirina demên ku me wiha xwêdan dirijand jiyan kir û arasteya pêşketinan diyar kir. Bêguman ne asan bû. Di bûyera jinê de, ya girîng mijara jinê ye; ew tê aqlê mirov despêkê nizanim. Tevî ku ez ewqas şermok bûm jî û ji jina li gorî pîvanên civaka

burjuvaziyê jî dûr bûm, çima min yekcar derbasbûneke wisa kir? Gelo mirov dikare tenê bi sedemên hestî ve şîrove bike, yan jî tenê bi sedemên siyasî, armancên taktîkî ve rave bike? Yan jî bi çepgirekî baş, nîtelîka sosyalîstekî baş ve rave bike?

***Ab.:*** Para hemûyan heye Serokê min.

***---.:*** Heye. Hostatiya min a di pêwendiyan de risteke mezin dilîze. Dîsa di polîtîkayê de pêhesîn, ya rast para hemûyan tê de heye, yek ji wan bi serê xwe girtina dest wê rast nebe. Hostatiya min a di pêwendiyan de risteke wiha mezin dilîze. Dîsa di polîtikayê de pêhesîn dikeve dewrê. Gelo diviya bû me dev ji wê kesayetiyê berda?

***Ab.:*** Hinekî sedêmên nêzîkbûnên polîtîk hebûn.

***---.:*** Dema ku hûn hemû ji vê malbatê revîn berevajî min digirt. Pîlot jî wisa ye. Di dema ku herkesî digot; “*Ev zilam bigumane”* min ew digirt. Ev dibe şêwazekî polîtîka kirinê.

***Ab.:*** Malbat jî dihat naskirin, hizrandineke wê malbat xirabiyê bike serwer bû. Heta herkesê ku navê wê malbatê dibîst biguman li tevgerê jî mêze dikirin, yên ku wate didanê nebûn.

***---.:*** Ez bawerim bi vî şêwaza xwe ve min nêzîkatiya herî zêde dewletê matmayî dihêle raber kir. Yanî hest, nêzîkatiyên siyasî, rêgeza sosyalîzmê hemû hev digirin û encamekî; “*Ya evdê min divê tu wisa bikî”* derdikeve holê. Di heman demê de hişmendiya min a hesab xwestinê jî heye, ez wê jî bidim diyarkirin. Ez wisa difikirîm; “ *Vana Kurdên ecêbin, ka ez van jî bibinim.”*

***Ab.:*** Ev ji despêkê ve hebû. Tenê ne di derbarê wê de, di derbarê hinek mirovên din de jî wisa bû.

***---.:*** Helwestê min di derbarê hemû kesî de ev bû.

***Ab.:*** Mînak wê demê hinek arîstokrat û derdorên Kurd hebûn, belavokên wan çêdibûn.

***---.:*** Belê, me digot; “*Ev kîne”* û em tevlî cemaeta wan dibûn. Ev şêwazê pêwendiyên min bû. Bi aliyên xwe yên baş ango xirab ti kesî red nakim. Ez bawerim weke rêgezeke pir girîng û divê

esas were girtin derdikeve holê. Yek ji rêgezên ku niha îstîxbaratkar jî baş dibînine. Lê di rewşa xwe ya wê demê de min gelek bi ecemîtî ev pêşwazî kir.

Tevî hemû pirsnîşan û fikaran jî, şêwaza me ya ev peywendî bi vî rengî destgirtinê, di dîroka Kurdistanê de bi awayekî tenduristî pêşketina qonaxa ji dayikbûnê, ya herî xeter ya dîrokî girîng re rê vekirin bi rastî jî ezmûneke mezine û hewldana pêkanîna bûyera derketinê ye. Ez bawerim tê fêmkirin. Ev sê sal derbaskirin ne weke ku hûn texmîn dikine; metirsîdîare! Min ji we re behsa zarokatî, îsyana xwe ya gund jî kir. Hemû jî pir metirsîdîar bûn. Bifikirin dewleteke metirsîdîar, hem baskê Kemalîst, hem jî baskê piştî sala 1960'an a ku hêz qezenc kir dest dane hev û li ser me ketine nava ferzkirina; "*Bila erd bi qelişe û bikevin navê"* de ne. Ya ku jê re tê gotin; "*Kurê min ger tu milîtaniyê dixwazî bide kirin, jiyanê dixwazî jiyan, serê me zêde tevlîhev neke"* dibe ku ev be. Ya tê gotin ev e; "*Tu parçeyekî gundîyî yan jî belengazê xwedê yî, çi dixwazî"* û ev jî dibe nêzîkatiya dewletê. Şêwirmendê niha yê çapemeniya Demîrel Cûneyt Arcayûrek nirxandina wî ya ku dibêje; "*gefa herî mezin a dewleta me"* bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Di sala 1978'an de nirxandineke wî ya wisa çêdibe, li şêwaza derbaskirina me ya wê demê dinêre û digihêje vî encamî. "*Dema ku hîn mar bostek bû diviya ku serê wî bihata perçiqandin."*

Misoger ez ne durû me, min dixwest di van pêwendiyan de herdukan jî qezenc bikim. Di despêkê de ez neçar bûm wisa bawer jî bikim. Di nava demê de pirsnîşan pêşketin. Lê hevalê Kemal Pîr û C. di sala 1978'an de nêzîkatiyên wê yên rojekê dibînin û dibêjin; " *Em vê bikujin, nêzîkatiyên çawa raber dike, ev helwestên ku ev ferz dike çine?"* Hevalên me tenê rojekê tehamula nêzîkatiyên wê nakin. Me tam deh salan, hem jî di bin navê pêwendiya taybet de, lê ya rast ew pêwendiya ku dişibiya

hemû tiştî ya metirsîdîar de em mahkûmî pê re jiyankirinê ne. Çima?

Di vê xalê de ez derbasî mijara pêwendiyan dibim, divê ku hinekî din mijar bê kûrkirin. Pêwendiyeke civakî, siyasî heta ya çalakiyê divê çawa be? Ev heta dawî vekirin û bêguman fêmkirin girînge.

Di derbarê Pîlot de biryarekê nadim; ji ber ku ger ez biryareke şaş bidim, dê grûbê jî bibe. Di serî de pêwîstiya min bi vê pêwendiyê heye. Ez nebêjim ji hemû aliyan ve pêdivî, neçarî hene. Di derketina ji Enqerê de qonaxeke girîng û ya din jî hesabxwestin pêwîste; ne wisa weke radestbûnê. Ango têkîliyek pir ecêbe. Deka pêwendiyek ku ez bi we hemûyan re saz dikim binerin, heta ku em bikin mirov, encam bigirin li ser tê sekinandin û heta dawî rastiya we ya mirovbûnê divê ku çawa derkeve holê û veguhertinê esas digirim.

Jin jî wisa hatiye, Kurde, xwe têkilî mirovên sosyalîst û îsyanan kiriye, têkelî dewletê bûye. Ya min jî mereqa min heye ji van kesayetiyan re û nêzîk dibim. Mirovê ku ji xwe bawere dibê pêwendî dane, lê divê radest jî nebe. Gelo hûn bikevin nava pêwendiyeke wisa dê çi bê serê we? Vaye min qala wê kir, hevalan digot; "*Divê em bikujin.*" Biryar derxistine û dê bikujin. Lê di encamê de dibêjin; "*Tiştekî heval dizane heye bila bimîne.*" Di encamê de li gorî pêwendiyên asayî diviya bû ku bi rastî jî min ev şêwaza pêwendiyê bikuşta, lê ez li ber xwe didim; ger hûn bin qet nikarin li ber xwe bidin. Hem jî ne li berxwedaneke wisa durû, ez pêwîstiya pêve girêdanê jî dibihîzim. Gelek sosyalîstî nêzîk dibim û pêdiviya rêxistinkirinê jî dibihîzim. Lê tevî vê jî hema bêje di her kêliyê de mirov kehir dike. Asta wê ya kehirkirinê divê ku em niha zêdetir fêm bikin. Ev dewleteke, bi aqlê xwe yê wê demê min digot; "*Mirovek çawa dikare wisa bike*" û tengav dibûm. Lê tam li beramberî min dewlet bi xwe

heye. Ez heta niha jî li gelek ciyan vê pêwendiyê jiyan dikim. Jêre dibim şahid jî.

Di dîmen de tenê kesek im, bêguman niha ne weke dema berê me, ne safim jî, ez hema fêm dikim. Wê demê jinek, hem jî jineke bi hestan dagirtî. Jine lê ez bawerim dewlete. Hest filan nayê fikirindin. Encax weke amûrekî taktîkî bê fikirandin. Erk girtiye. Kurdên din jî wisa ne. Weke hûn dizanin ne sîxûrên ji rêzê ne. Hem ji aliyê bîrdozî, siyasî hem jî ji aliyê leşkerî ve çar çar dizivirin. Pêwendiyên bê qusûrin. Ez jî bi zor û bela dixwazim bi pêlekanê jiyanê ve serkevim. Çiye perpirsyarî, lêhûrbûn çiye? Ji bo baş fêmkirina mijarê em hinekî din van mijaran vedikin. Em serî li jinê jî didin.

Bi girêdana malbat û dewletê ve, yanî bi dewleta siyasî, civakî yan jî dewleta fermî ve, ji bilî vê jî em hewl didin li dijî vê şêwaza şer derbikevin. Jiyan ne weke ku hûn dizanine. Jiyana piraniya ji we di meseleya dewletê de be, di mijara pêwendiyên civakî de be heta dawî vala û bê wate derbas dibe. Çima kesayetiyeke fermandar a bihêz ji we dernakeve? Çima hûn dewletê û jiyanê weke tê xwestin fêm nakin? Mînak ez li beramberî wê jinê ne xwedî pêşdarêz bûm. Li gorî min ger Kurdeke welatparêz û sosyalîst bûya, behremendiyên wê yên ji yên min pêşketîtir jî hebûn. Ger bikar baniya, heta dikarî serokatiyê jî bike. Lê ev di dîmen de wisa bû; lê di cewher de îhtîmaleke pir mezin bi amadekariya dewletê, weke çepgireke dewletê û Kurdîniyeke dewletê dixwest bû. Hema bêje weke ku M. Kemal bavê wê bikar anîbû, wê jî dixwest me bikar bîne.

Kemalîzmê piştî Mûstafa Sûphî bi pir kesan çepgirî û komînîstiya sexte dan kirin. Ev jî wisa ye. Hem xwest çepgirî, hem jî Kurdîniya saxte bi me bide kirin û di kesayetiya me de hewl dan Kurdistana demên şoreşê bigirin bin venerîna xwe. Hesab bi vî rengî bû. Temam. Jixwe hesabê wan ji bo çepgiran jî heye, ji bo Dev-Yolê jî heye. Sîxûr Dev-Yolê wisa digirin.

Kurtdîniyê jî em temsîl dikin. Yên din, KDP filan jixwe ji zûve hatine girtin. Yên ku negirtine bin venerînê tenê em hene. Karê girtina bin venerînê divê ku mirov wan wisa ji eniyê ve nebîne û biçûk lê nenêre. Dewlet weke ku hûn dizanin û bi asanî, ji rêzê nayê derbaskirin. Hûn nikarin çalakiyêkê bi bandor jî pêş bixin. Hem jî bi ewqas hêza Partiyê ya ronî dike, fêrkere û hûn bi çekkirinê jî nikarin bikin. Di ser rêya amadekirî de jî meşa we nîne. Min di tarîtiya şevê de ne pere heye, ne milîtanek, ne jî weke tê xwestin camêrekî rêxistinê yê ku bi aqil, têrker û saxlem heye. Tenê li derdora grûbê kulmek heval. Yek ji wan milîtan, yek ji wan yê ku pir baş fêm dike, dibîne, yanî rêberekî bîrdozî-siyasî ye. Yê din hema bêje rêberekî leşkeri ye. Ya ji min re dimîne çiye? Vaye di fermanê de mayîn. Dixwazin endamên me yên grûbê jî xerc bikin û xerc jî dikin. Wê di çalakiyekê, ango du çalakiyan de xilas bikin. Em ê çawa derketinê bikin?

Vana qonaxên dîrokî yên pir girîg in; ger ji bo rizgariya netewî û sosyalîzmê armanceke te heye tê pir bifikirî. Ez di nava xwîn û xwêdanê de dimam, hema bêje difetisîm. Ya rast naxwazim careke din wan salan bijîm, nayê jiyîn jî. Salên herî zêde bi jan bûn. Di van salan de li ser navê çepgiriyê çi hebû xilas kirin. Li ser navê Kurdîniyê çi hebû xilas kirin. Vaye em di pêvajoyeke wisa de, ji bo tine nebin, ji holê neyên rakirin ji bo derketinê amadekarî dikin. Bifikirin, ger ev derketin serkeftî nehatiba kirin, ne sosyalîzm, ne jî Kurdistan dê maba. Lê niha em di rojeva cîhanê de ne; ev pêşketin yekser bi vê pêşketinê ve girêdayîne. Ez dixwazim bêm ser vê; bingehê pirsgirêkê, şêwaza bi destgirtina pêwendî û mirovekî ye. Yên ku min çûkê di qefesê de hesab dikirin, tevî ku hatibûm dorpêçkirin min xwe neda fetisandin. Min ew pir zêde bikar anîn, ez bawerim ew jî û jin jî fetisîn. Me jin deh salan îdîare kir. Lê tenê rojeke wê jî ji bo qetilkirinê têr dike. Yan ew ê qetil bike yan tê qetil bike. Di vê wateyê de derbas dibe;

lê tevî vê jî taktîkekî pir mezin ve pevçûn pêş dikevin. Jixwe herî dawî hat gihişt encamê ku mirovekî wisa nabe. Lê min sebir kir.

Dema ku bi hişmendiya îro mirov lê dinêre çi dikare bê gotin? Min çawa wisa li ber xwe da, çima wisa kir?

***Ab.:*** Hûn vê ji bo pêdiviya pêşketinê dikin.

***---.:*** Hem jî bi têkoşîneke siyasî. Di kesatiya şexs de dewlet binxistin pir balkêşe. Jinek hem dewletê, hem feodalîzmê, hem jî nokeriyê temsîl dike. Di şexsê van hêzan de pir xweş temsîl dike, ez jî heta dawî rastiya Kurdê sosyalîst bi bawer û kedkar temsîl dikim. Heta pileya dawî şoreşgerî nêzîk dibim. Şoreşê ferz dikim. Hêza min sifire. Bi tena serê xwe me. Ew jî dewlete. Di nava bê hevsengiyeke mezin a hêz de di rewşeke asayî de zilamek, zilamekî Kurd dê çibike, ger hûn bûna wê yê çikiraba? Divê ku hûn vê pirsê ji xwe bipirsin. Ya rast sîxûrbûn û nebûna wê pir zêde ne girînge. Ger em wisa hesab bikin pêwendiyeke ji rêzêye, pêşketin û encamên wê pir girîngin.

Ev hemû çepgir çawa winda dikin? Hûn dibêjin; “*Em ketin bin bandora Kemalîzmê, ya pergalê.”* Ew jî bi vî şêwazî tevizîne û em nikarin bi ti şêweyî wan ji bin vê bandorê derxînin. Lê di windakirina wan de para vê mijarê pir mezine. Ew çanda ku hûn dijîn çiye? Ger hûn baldar bin, ya li pêşiya wê tê raxistin û we girtiye ne bi qasî ya min e. Hûn ji bo kevçî li binê şorbê bidin hene, lê hûn wê jî nabînin. Tevî vê jî hûn heta hestiyên xwe xeyalên pergalê dijîn. Ger niha wizeya we dernakeve holê, nebûna we ya milîtanên pir alî, rojane neketina we ya şêwazê PKK’ê ya rast çavkaniya xwe ji vê digire ku pergalê hûn ji gelek aliyan ve bi xwe ve girêdane. Ruhê we hatiye girêdan, ez jî dixwazim wî ruhî gire bidim, di encamê de me bi jinekê re ceriband. Lê ev girêdanek bû, şer bû, heta niha jî em çawa bi nav bikin nizanim. Ez bawerim, ger hûn bûna ya we yê kuştiba, yan hatibana kuştin; yan jî hûn ê pê ve bihatana girêdan, yan jî we yê

tiştên wisa biceribanda. Lê şêwaza min cuda ye. Li gorî min misoger divê kesayet li gorî armancê bilîzin.

Ez niha jî pir bi tevdîrim. Vaye li vir pîvan dikevin dewrê. Camêr her roj min dawetî duello dike, her roj mirin heye, pîlanê çalakiyê ferz dike. Mînak, ger Mahîr çayan, Denîz Gezmîş be wê di heman kêliyê de serî li van bide. Jixwe ew jî li ser vî esasî linav birin. Li beramberî afirandina tahrîkên dewletê, navenga çalakiyê afirandin, li beramberî provakasyonê tiştekî din ê ji destê wan bihata nebû û bi lez ketin nava çalakiyê. Bêguman, dewlet pir bi hêze û dê wan di kêliyê de bifetisîne; jixwe wisa jî bû. Li ser min ya ji vê jî bi pîlantir tê ferz kirin. Divê ku neyê gotin eniya jinê û neyê derbas kirin. Nêviyê sîxûran ji wê dewrê û wî derî de dikevin hundir. Jixwe ew jî ne jineke ji rêzê ye. Tîpeke di deh tiliyên wê de deh marifet hene.

Gelo ez ji vê pêwendiyê reviyabûma, wê biba şêwazekî rast? Ez bawerim wê demê ew bûyera ku jê re tê gotin PKK wê pêş neketa, PKK'yeke têkoşer derkeneta holê.

***Ab.:*** Pêşketinê wisa nebûna Serokê min. Bi taybet jî di nava welat de heta sala 1980'ê dê wisa nebûna.

**---.:** Piştî 1980'ê bi vê ve girêdayî ye. Piştî sala 1980'ê ji nû ve ji dayikbûna PKK'ê ye. Di dîmen de yek kese, lê girêka kor ya dîrokê ye; ji aliyê siyasî, civakî, çandî û hestî ve hema bêje girêkeke kore! Pirsgirêk, xwedî çawaniyeke ewqas berfirehe. Li beramberî diyarde û şêwazê ku min pêş xistiye, şêwazekî Serokatî ya ku ew ferz dike heye; rasterast xwedî îdîaya Serokatî kirinê ye. Ger hûn xwedî mantiqin hûn ê vê bibînin.

Dema ku ez ji we re dibêjim bibin lîstokvanên mezin ya ku dixwazim bêjim ev e. Di heman demê de ez kesekî pir hestiyarim. Weke ku min diyar kir, ez wê demê ne di rewşeke wisa de bûm ku vana hemûyan fêm bikim, lê dîsa jî min devjê berneda. Çi bû arasteya min a wê demê, nizanim. Divê ku bê lêkolînkirin. Beriya her tiştî nêzîkatiyeke kûr a eleqeya ji mirov re raberkirinê heye.

Piştî wê pêwendiyeke balkêşe! Bêtir girîngî dayîna wê heye. Ji bo jinekê nirx dayîn û ji ber ku Kurdeke wate dayîn heye. Herweha ji dijmin bin jî, dîsa jî baweriya ku divê vala neyên hiştin heye. Vala hiştin tê wateya serbestberdana dijmin. Bi kurtî şêwaza ketina min hema hemûyan digire nava xwe. Ger baş derkeve ser çavan, xirab derkeve li dijberî derkeve, ger tu bi namûsî tê ya pêwîst bikî. Ev nêzîkatiyeke berfirehe. Weke ku hûn dizanin jî ji ber xwe ve pêş neketiye.

Dibêjim ya, hema bêje difetisîm. Lê bi min re şêwaza dest avêtina pêwendiyekê heye. Ez hem dixwazim kurdîtî, hem çepgirî, hem jî jiyaneke civakî ya baş sererast bikim. Hem jî dibêjim bila vana hevdû xwedî bikin, bi hêz bikin. Lê gengaze; kesayetiyeke pergalê bandor lê kiriye dikare te rehet bike? Encama herî baş ku min derxistiye; dixwaze rasterast, dixwaze ne rasterast pêwendiyeke ji aliyê pergalê ve hatiye xwedîkirin bi asanî nabe malê gel. Heta ku mirov we li ser agir ne birijîne zehmete bikaribe bike malê gel. Jixwe ger ezmûna min nebûya pêgihandina we jî dê bê derfetbûya.

Jina amade weke male. Ev ne jina amade ye jî. Jineke ji aliyê dijmin ve ji heft saliya xwe ve bi taybet hatiye perwerdekirine. Hem jî di asta herî jor û navengeke nokeriyê de. Yekî weke min parçeyekî gundî derdikeve pêşberî wan. Jixwe wisa digotin, ji hinek hevalan re digotin; "*Yên weke we parçeyên gundiyan li ber deriyê mala me mîna kuçikanbûn, me hestiyên xwe davêt ber wan.*" Bêguman ya rast, ew di nezera gel de di rewşeke fikar de bûn.

Di vir de bûyerek heye. Beriya her tiştî ez ji gel'im û wesfên rêbertiyê hêdî hêdî pêş dikevin. Ez li ser navê gel berê xwe didim pêwendiyeke nokeriyê. Ev di heman demê de pêwendiyeke wateya wê ya civakî, çandî jî heye. Cudabûnên wê yên civakî û çandî hene. Ji serî heta binî çanda ku min ava kiriye, derdora civakî ji gel'e, aliyê kedkariyê pir zêde tê jiyîn. Aliyê din heta

dawî di ser gel re ye, heta li dijberî gel'e. Di dema îsyanê de li gel dijmine, Kemalîzmê pê lîstiye, ji aliyê çandî ve cuda ye, aliyê mezhebî cuda ye, aliyê pêşketina civakî cudaye; welhasil bi gelek aliyan ve wisa ye. Lê ya din jî pergaleke nû ya netewî û civakî pêş dixe. Ev hemû cudabûn jî, di nava vê sererastkirinê de dixwazin bigihînin çareseriyê. Di nava wan de binesaziya kar ji eniyeke hîn cudatir hatiye destgirtin. Eşkereye ku ev dawetname ji pevçûneke mezin derxistine. Du rê tên danîn; yan tê radestî milîtan bibî, yan jî tê radestî deriyê din, jiyana Enqerê bibî. Neketina nava herduyan jî pir girînge. Ev camêran jî ne weke ku hûn dizaninin. Wê ewqas mesref li te bikin, ma wê dev ji te berdin? Dewlet min dizane. Ez ji hîn ji dibistana navîn ve dixwînim. Weke gundiyekî ji rêzê rabûme li Enqerê di Fakulteya siyasî de ewqas hewldan raber dikim, dikevim nava meyleke şoreşgerî ya xeter. Ya din jî xwe dispêrim zilamên wan, vê grûbê înşa dikim. Ma wê min sax bihêle? Niha ji aliyê dîrokî ve xeletiya dewletê di kîderê de ye? Ez bawerim dewlet xeletiyeke taktîkî ya bi vî rengî dike; "*Temam em dikarin vî bikin nokerekî baş.*"

***Ab.:*** Ji bo vê pir xebitîn Serokê min.

***---.:*** Ecewît berevajî pêk tîne. Dibe ku niha Turkêş jî bi Kurdan re li hev bike, lê Ecewît hîn dûrtire. Yanî faşîstbûna wî hîn li pêştire. Niha herkes matmayî dimîne, lê ez wî baş dizanim. Ji ber ku meyla despêkê ya li beramberî min; "*Ger bikeve nava li hevkirinê em ê perwerde bikin, jixwe zilam di asta radestiyê de ye; ji hemû aliyan ve bi malbatê ve hatiye girêdan, perê wî jî em didin, apartamanê jî em didin, mûçeyê wî jî em didim*" hema bêje bi vî şêwaziye. Raporên ku diçin jî dibêjin; "*kevokê di çente de, çûkê di qefesê de ye.*" Li beramberî vê rewşê jî bêguman deweletê bêje; "*Başe îdîare bikin.*"

Di dawiya sala 1978'î de meyla azadiyê ya tê zanîn heye. Ez rêgeza tu carî meyla xwe ya azadiyê nexim zincîra ti kesî li ser xwe digerînim. Heta niha jî wisa me. Mînak, li vir jî hinek

dibêjin: "*Venerîneke pir zêde heye.*" Dibe jî, lê çalakiya min a azaadiyê heye. Jixwe hûn jî weke encama vê çalakiya azadiya me derketin holê; hûn di nava azadiyeke mezin de tên mezinkirin. Ewqas derfetê min ên azadiyê nînin. Lê hûn bi qasî ku dixwazin xwe bigihînin wan çiyayên azadiyê. Ez garantiya vê didim we, lê baldar bin, vê nadim xwe. Ev demên berê jî bi vî rengî bûn. Dema ku min bi sedan heval ji Enqerê derxistin ez ji çar aliyan ve hatibûm girêdan. Vaye mezinî di vir de ye. Hem jî min pir baş derdixist. Bifikirin; dema ku yên bi eslê xwe THKP-C, THKO hildiweşîn, min heta dawî hûn xwedî kiribûn. Heta sala 1978'an jî min hûn baş mezin kirin. Lê di heman pêvajoyê de yên din dihatin çinîn. Di encamê de hema bêje kes nema.

Derketinan dispêrim vê peywendiyê û didim kirin. Min xwe daye bexşîn, bi rêxistinê jî gav didim avêtin. Jiyankirina min wisa ye. Eşkereye ku bendewariya van hemûyan heye. Min xwe wisa li ser wan daye ferzkirin û qebûlkirin ku dibêjin; "*Ev rêbere, jixwe em kontrol dikin, ger em vî bigirin em dê Kurdistanê bigirin.*" Pîlan û hesabên wan di bin kontrolê de girtina min Kurdistan di bin kontrola xwe de girtine. Ji aliyê wan ve raste jî, lê ji aliyê din ve şêwaza dij derketina min heye.

Heta sala 1979'an Enqere mijûlkirin taktîkekî mezine. Hem jî grûb hemû sipartina derfetên wan. Lê ev jî wisa ji rêzê pêk nayê; kîna mezin a vê û tengaviyên wê hene. Min got ya, ger hûn bûna şêwaza rêbertiyeke din bûya, misoger dê li ber xwe nedaya hema dest bi çalakiyê bikira. Ji xwe Kemal Pîr wan rica dikirin û digotin; "*Destûr bide em di gel Pîlot vê çalakiyê li dar bixin.*" Lê çavê min wî nedigirt û min digot; " *Bila bimîne, ne dema wê ye.*"

Jin min diceribîne, li gorî nêzîkatiyê dixwaze asta min a hestan jî bipîve. Dibêje; "*Yê ku ji aliyê hestî ve ewqas girêdayî ye divê wisa be.*" Tam ne bawere. Radestiyeke misoger ferz dike. Ez jî dibêjim bila ne misoger be; "*Ji sedî deh vekirî be.*" Ji sedî nod ne asteke kême, lê têrê nake dibêje; "*ji sedî nod û neh têrê nake, heta*

*bila girêdaneke misoger be."* Başe çima misoger? Ji ber ku pêwendiya dewletê ye. Ez kes jî tawanbar nakim. Ferzkirineke dewletê ya yekser ango ne yekser bi awayekî din nikare tevbigere. Ez mirovbûnê hêvî dikim. Gengaze, ocaxeke ji çil dewletan re wisa dixebite, yekî ku çil salan ji dewletê re faşîstî kiriye gelo dikare mirovî tevbigere? Pir zehmete. Hevalên me pir bi gumanin û diteqin, lê ez li ber xwe didim. Ev taktîkekî sebrê ya wisa mezine. Ez hê jî bi wî taktîkê sebrê kar dikim.

Min doh di nûçeyên bêtêlê de tiştek xwend dibêjin; "*Grûba me ket nava serxweşiya serkeftinê, pêşve bazda me heft şehîd dan."* Ev, asta milîtanê me ne. Heft milîtan ne hêzekî ji rêzê ye û hemû jî hêzên ku em pê digihînin. Di yek kêliyê de bê sebir tevdigerin û xwe davêjin pêş. Dev ji wê ber de, li wir dijmin dipişkive, hema bêje direve, nikare vê jî weke tê xwestin bişopîne. Di encam de li wî/ê tê xistin. Rewşa we ev e. Ji sedî nod pîvanên li ser we hemûyan serwere ev in. Niha hinekî jî li min binêrin, ez çawa me? Çoşa serkeftinê ye! Ger hûn weke min rewşa hestên mezin bijîn yan jî pêdiviya weke min bûyînê bibihîzin, di rewşên ku bên jiyîn de binkeftinên wisa wê nebin.

Lê tevî ku li wir jî sebir, coş, hest heta dawî hene jî, hêza min a mantiq çiqas li ser bûyeran serwere? Fikirandin û pirsa "*Gelo"*qet kêmnekirin, ez çi çawa bikim, dê çi bê serê min, divê ku di derbarê van de hesabekî saxlem bê kirin. Ger ev nebin jixwe tê di 24 demjimêran de bê daqurtandin. Jixwe her roj nûçeyên windahiyan tên. Hemû wisa ne. Ez dikarîbûm di sala 1976'n de biçûma, dibe ku hûn di sala 1994'an de linav neçin, lê ez wê demê tenê me û ji dervede ne tiştekim. Li beramberî dozên mezin çima sebir, çima pîvan; ma ne eşkereye ku divê li beramberî bûyerên bi vî rengî mirov bi feraset be? Ma di yek carê de windakirina 7 milîtanan rewa ye? Ma tê qet bi sebir nebî, ma tê qet ji kurahiyê ve dê wijdanê ne netevize, wê qet hêza te ya mantiq û aqil nebe, ma tê qet li ser hestên xwe serwer nebe? Başe,

lê ma ev nebin em ê bi şêwazekî din çawa şer bikin? Ew sebra ez bi tena serê xwe raber dikim, hûn ê çima qet raber nekin? Ma ev bi rêbertiyê re lihev tê?

Em dîsa tînin vir: Yê li beramberî min dixwaze di 24 demjimêran de bibişkuvîne. Dibêje; "*tu parçeyekî gundiyî, tu nikarî wisa bisekinî, ger tu hestyarî encamê hestyariyê dê ev be, tu milîtanî tê çalakiyan wisa bikî, tê wisa biryar bidî.*" Jixwe wê demê têkoşînparêz, kawa'yî, hinek rêxistinên din derketibûn hinek ji wan bi pasîfbûnê min tawanbar dikirin û dixwazin dîmenekî wisa bafirînin, lê ew jî bi guman bûn. Hinek ji wan qala vê qusûrê, hinek jî ya wê qusûrê dikin. Di encam de ew jî îfadeya xwe di vê ferzkirinê de dibînin. Lê dîsa jî sebir, dîsa jî di şêwaza xwe de israr heye. Ya rast niha tê fêmkirin, min ev beicandine. Lê di dîmen de wan ez teqandime, heta qirka min tê, lê niha wisa tê fêmkirin ku me dewlet teqandiye.

Ev taybetmendî pir girîngin. Yê ku xwe bigihîne van taybetmendiyan di asteke girîng de tê wateya ku xwe gihandiye ruhê serkeftinê. Eşkereye ku gelek encamên ku min ji vê derxistine hene. Beriya her tiştî PKK bi vî şêwazî avakirin, ev dahûrandina kesayet ( ev jî yeksane dahûrandina PKK'ê, ya Kurdistanê ye) bi kûrahî destgirtina sosyalîzmê tê zanîn. Wekî din min waneyên pir mezin ji nokerî, xiyanet û jinê jî girtine û kûrahî girtiye dest. Bifikirin ku, şêwaza pêwendiya ku min bi yek kesê re pêş xist, rê ji waneyên herî mezin ên dîrokî wergirtinê re vedike. Lê di şêwaza pêwendiyên we de yan radestî, yan jî bi şêwazê giyanê wê girtin heye. Şêwazê min hêjî di asta afirandina encamên wisa girîng de ye û ez wisa jî didomînim. Ez bawerim ev hinek xalan bi qasî tê xwestin bi we dide fêmkirin. Me xwest ku em bi şêwazekî cuda yê kar, bi pêwendiyeke civakî vê ronî bikin. Bêguman xwe di kesayetiya xwe de tahlîl nekim, hûn hewl nadin tiştekî fêm bikin. Dibe ku ev tiştên ku we jiyan kiriye we bandor bike.

Ya min pêwendiyeke taybet a çawa bû, ew tiştekî pir cuda ye. Ger hûn bûna, hûn ê harbûna. Lê ez zilamekî li gorî xwe me. Bi we re sewdaserî heye û gunditiye. Di pêwendiya civakî de, pêwendiya malbat, jin û zilam de şêwazekî pir paşketî ya gundîtî, şêwaza nû şiyarbûna burjuvaziyên biçûk, dibe şêwaza sewdaseriyê. Ev hemû hene û heta dawî xwe dispêrin înkarkirinê. Hemû jî nehatine tahlîlkirin û bi nexweşiyan dagirtîne, bi xeteriyan re barkirîne. Em ji eniyeke din jêre nêzîkatî dikin, eleqe raber dikin. Min hinekî destê xwe da pêwendiya we ya malbatê. Ya rast pêwendiya jin û zilam hîn ji wê rojê ve di aqlê min de ye. Heta niha jî li ser radiwestim. Beriya her tiştî sebreke we ya wisa heye? Cîhana zilamek çawa, jinek çawa û pêwendiyek çawa? Bifikirin, ez şoreşekê, rizgariya netewî, tevgereke artêşê ewqas pêş dixim. Di heman demê de pêwendiyeke civakî ye, derbasbûna jiyana civakî ye. Ez hatime vî temenê xwe û heta niha jî pir zêde di nava lêgerîna maf de me.

Hûn hîn di heft saliya xwe de winda dikin, yan jî di dema ku hûn derbasî pêvajoya xortanî dibin, ya rast feraseta we ya jinbûnê jî, ya zilamtiyê jî bi encam bûye, tine bûye. Civakê ji bo we qalib amadekirine û tê gotin; "*pêwîste mêr wisa be, pîrektî wisa be*" û hûn jî tên li ser qalibên amade rûdinên. Ez nabêjim vana ji nedîtîve têm, lê li gorî min xefkên mezin mijara gotinê ne. Di vir de jî ez azadiyê esas digirim. Gotina dayika min ket bîra min. Ya rast a ku hatibû gotin ne li ser esasê henekê xwe pê kirinê bû; dibîne ku ez di ferqê de me. Ger ez wisa cuda nebûma dê bihata gotin; "*Vaye ji te re li gorî kurê min keç, li gorî keça min kur" û* her tişt biqewimiya û bi dawî biba. Misoger ne ji ber ku ez ji we bi gumanim ango baweriya xwe bi we nayînim, em feraseta we ya malbatê, heta em feraseta we ya hest û sewdaseriyê bigirin dest; heta niha jî di nava Partiya me de dibe pirsgirêkeke mezin. Teqez ne ji ber ku ez ji we bi gumanim ango baweriya xwe bi we

nayînim, lê di van pêwendiyên jin û zilam de zehmetiyên pir mezin dijîm û didim jiyîn. Sedemên xwe hene.

Li gorî min pêwendiya Kurd hatiye fetisandin, rizandin yan jî hatiye girêdan? Di vê pêwendiyê de tinebûn heye. Tinebûn û girêdan. Ya din jî rewşeke nikare ji nav derkeve heye. Çawa ku ji gewriya teng a mêtîngeriyê derketin ewqas zehmete, we ji vê gewriya teng a civakî jî derxistin herî kêm bi qasî ji gewriya mêtîngeriyê derxistinê zehmete, heta ji wê jî zehmetire. Ji bo vê ez şerekî cuda dimeşînim. Vî şerî di serî de li ser xwe pêk tînim û di serî de jî di nava xwe de tahlîl dikim. Ev pêwîst bû, ma benî adem ewqas xwe dike depê ceribandinê? Belê, ger neyê kirin dê bê windakirin; ewqas girînge. Min pêwendiya din jî vegot; ceribandinên mezin û yên pir xeter bûn. Ger em nekin dê Partî derneketiba holê. Vaye ev pêwendiya civakî jî wisa ye. Bi salane em ewqas perwerde dikin. Lê bi rewşa xwe ya niha, ger hûn pêwendiyeke jin û zilam pêş bixin, ger li beramberî Partiyê û şerê ku em dimeşînin, li beramberî hedefan xiyaneta herî mezin çênebe ez amademe destê we maç bikim û deynim ser serê xwe. Evînê pêş bixin, lê ji piştve li me nedin, em li ser nîqaş bikin. Ev provakatorê dawî dinivîsîne ne wisa? Tê gotin pêwendiya mînak yan jî; "*pêwendiya mezin a mînak"* Te pirtûk xwend?

***Ab.:*** Belê Serokê min

***---.:*** Çi dinivîsîne di wir de? Min jî li çend rêzên wê nerî, qaşo pêwendiya herî dîrokî ya ku ji min rizgar kiriye! Pir balkêşe! Qaşo zewacek kirine. Girêdaneke pir balkêşe. Bingehê nêzîkatiyê li ser vê damezrandine.

***Ab.:*** Nêzîkatiya giştî, dibe nêzîkatiya esasî.

***---.:*** Bifikirin pêwendiyeke wisa bi me despê kir. Yanî em bêjin zazayekî Çewlikê, yan jî em bêjin nizanim çiyê Dêrsimê; ger PKK ne be, gengaze ku mirov yekî ji Çewlikê û yekî ji Dêrsimê bîne gel hev? Ez rastiya wê civakê nas dikim. Hûn dizanin, ew pêwendiya wan a di dibistanê de ji sedî sed bi PKK'ê re despê kir.

***Ab.:*** Ya wî ji yên din zêdetir wisa bû Serokê min.

***---.:*** Belê, dibêje; "*Pêwendiya dîrokî"* diçe rast û çep, pêşkêşî KT'yê jî dike. Xulamtiya ku tê gotin wisa tê kirin, lê qaşo ji me re jî meydanê dixwîne. Dixwazim bînim ser vê; xwe sipartina PKK'ê qaşo pêwendî ava kiriye. Niha jî ji dijmin re dike sernîvîs û pirtûk derdixe. Bêguman ev jî vegeriya pêwendiyeke xiyanetê. Ser de jî ev milê min ê "*Rastê ye!"* Vana wisa min bilind dikin ku, encax ewqas dibe. Qaşo niha jî tahlîl dike; "*Jina min çawa ji aliyê sêhreke manewî ve bandor kiriye û jina min tam bûye durûyek, di mijara girêdana bi min û ya Rêbertiyê de ketiye dubendiyê de."* Bêguman girêdana bi me di wateya di bin dandora Rastiya Rêbertiyê de ye. Piştre jî ji vê bandorê rizgarbûnê, weke rizgariyeke mezin dibîne.

Min ne got bi min ve bên girêdan, ne jî got ji min rizgar bibin. Bûyereke xerîbe; ya rast ketine pêwendiye, qaşo pir zêde bi hev ve girêdayîne, lê nikarin bikin. Xîyaneta herî mezin dibêje; "*Ez ê du pirtûkan binivîsînim."* Xwe kişandina koşeya veşartoka kapîtalîzmê. Qaşo navê wê jî; " *Ji eniyê ve dest bi êrîşê dikim"* ya ku dixwazim bêjim vana ne sîxûrên wisa bi zanebûnin, xala ku şêwaza pêwendiyekê ew ber ve birine. Bêguman rabûye û xwe weke pisporê evînê didin diyarkirin. Qaşo Brezîlî çawa taswîr kirine û PKK'ê nekariye vê rake.

***Ab.:*** Qaşo PKK'yî dijberî gotinên van tişta ye.

***---.:*** Belê, qaşo dema revî, li Lubnanê cihê ku reviya bûye hat girtin keça Lubnanî jî, bi taybetmendiyên çanda Fransayî çawa çanda Ereban a kevn aloz kiriye teswîr dike. Ger hûn bixwînin hûn ê bêjin; "*Way nivîskarekî wisa dibe?"* Ya ku dixwaze îspat bike, ew bi xwe nivîskarekî "*Mezine"* û PKK li beramberî wî çavnebare! Niha divê mirov hinekî xwe rast nas bike. Di nava me de jî derdikeve holê. Zimanê wî hinekî yê dijmine, hinekî jî me lê kiriye. Dem dem zimanê ku me fêr kiriye diaxive, dem dem jî yê ji dijmin fêr bûye. Vana kesayetên eklektîk (yên alîgirên bijareyê

ne, yan jî bijare) in. Kesayetiyên nayên veguhertin, xwe nafirînine. Ez seyr nabînim, dibe ku pir kesên wisa di nava me de derkevin. Em hewl didin cudabûnê pêk bînin. Egîdên mezin jî derdikevin, soytarî û xayînên wisa jî dê derkevin; bi sedan ên bi vî rengî jî derketin. Ji ber ku ya tê ferzkirin û alternatîfên ku bên aqlê mirov hene. Lêgerîna azweriya azadiyê jî mijara gotinê ye. Ya din jî em bêjin sewdaserî, em ketina nav pêwendiyekê û paşê jî xwe firotin heye? Hanî dibêjin ya; "*Ji bo şorbeyekê xwe firotin heye*" weke vê ji bo pêwendiyekê xwe çil caran firotin heye!

Başe ev ruh yê kiye, ev şêwaza pêwendiyê şêwaza kiye? Vaye em neçarin xwe bigîhînin vê. Tahlîla jin, ya malbatê ji bo vê tê kirin. Ger em nekin, ji vê re çare nebînin, yên ku em dibêjin ên herî yamanin ango kêrî xwe tên, dê wisa ji piştê ve li me bidin. Min got ya, sicîla wî ne sîxûre, ruhê vî yê kêye? Bi vana re hinek hest şiyar bûne. Vana hestên kîjan asta civakî, kîjan çandê, yên kîjan siyasetê ne? Ne şerme, ez bi xwe jî ketim nava hestan, lê bifikirin ji bo radest nebim têkoşîna herî mezina dîroka KT'yê yan jî ger hebe, bi qasî tê zanîn di dîroka gelê me bi xwe de me têkoşîna herî mezin da.

Min îro li vir ji xeteriya mezin, rê li ber tevgera mezin a berxwedaniyê derxistina holê re vekir. Jixwe bûyera herî mezin jî ev bû. Vana jî yên ku xwe hostayê herî mezin em bêjin ên hestan dibînin, yan jî sewdaserin, dijmin bi kontrayên xwe yên taybet ve li dijberî me eşkereye ku bi rêyên vî rengî nekarî milîmekê ji me bigire. Dixwazin bi rûpêşê hevrêtiyê lê bidin û qut bikin. Vaye rastiya xiyaneta Kurd. Di pêwendiya Kurdan de girêka kor, taybetmendiya tineker, xiyaneta di hestan de, ji sîxûrên taybet, kontrayan hîn xetertir û kontrayên objektîf! Kontratiya objektîf tu ji kîderê ve lêdinêre binêre, êrîş dikin. Ma di hedefa wan de dijmin heye? Na, tenê û tenê PKK û ez heme, çiye me rê li pêşiya ajoyên wan girtiye. Ajo jî pir bi şîdetin û ev 10-15 sale jî em dixwazin hinekî be jî ajoyan veguherînin.

Me weke; “*Dîktatorê herî mezin”* bi nav dikin. Stalîn yan jî kîjan dîktatorê di dîrokê de dizanin çiqas nav hene hemû rêz kirine û min ji hemûyan zêdetir “*Dîktator”* dibînin.

***Ab.:*** Ji hemû dîktatorên ku di dîrokê de derketine xetertir dibînin.

**---.:** Di dîrokê de çiqas dîktator hene, qaşo ez ji hemûyan xetertirim.

Ya rast ger em rûyê vê yê navxweyî vekin, vana xwestine ajoyên xwe bidin axaftin û jiyaneke wan a sefîl heye. Min hinekî ji vê re astengî ava kiriye. Astengî çiye? Bila dîsa li gorî pîvanên rêxistinê pêwendî hebin. Binêrin li vir ji vê re, ji vî kesî re, di derbarê van pêwendiyan de rexneyên min hene, li gorî xeta rêxistinê, li gorî pêdiviya wê şer dimeşe. Pergala artêşê heye, neçare ku ev bên esasgirtin! Dîsa bila evîna we ya we be. Heta min di vê navengê de vekir, salek du salan sax girt û salekê hertim me li vir xwedî kir.

Derewa dike, dibêje; “*Qet nehişt em hev bibinin.”* Ne ku me nehişt hev bibînin, jixwe navengeke şoreşgerî heta me ji wan re got; “*Weke hevrê hev nas bikin, hev rexne bikin heta nêzîkatiyeke rast ya evînê pêş bixin.”* Lê na, vaye durûtî di vir de ye. Şêwaza ku ew dizanin heye. Weke ku min got, ew şêwaz niha kontraye. Em neçarin pê bifikirin; ev şêwaza kêye, çawa hatin vî şêwazî? Ev ajo çima ev veguherandin vê rastiyê? Em neçarin çareseriya wê bibînin.

Dîroka Kurdan hertim bi mînakên wisa ve dagirtiye û heta ji hemû aliyan ve ji vê pêk tê. Jixwe ji ber ku dijmin jî vê dizane xwest vê pêk bîne. Yek ji aliyê min ê herî baş ev e; ji bo ku nekevim nava vê lîstoka klasîk, berevajî pêre şerkirin û saxlem ji navê derketim. Serxistina vê dibe ku ji çalakiyên ku niha tên lidarxistin hîn zêdetir serkeftîne. Di pêwendiyekê de bi vî rengî welat, welatparêzî, azadî, çavdêrîkirina rêxistinê û çi heye ajo hest xistina bin emrê vê, bi awayekî herî baş ev kirin, çalakiya

min a herî başe. Ez hêza xwe ji vir digirim. Niha ya ku we jî diherikîne ev rêgeze. Ya rast kîn û tengaviyên min jî û yê we jî yên mezin hene. Dibe ku ji ber bandora zehmet ya vê rêgezê be. Ev rêgez binirxin yan ajo û azweriyên min? Niha protestokirina we ya beşekî mezin, weke tê xwestin tevlînebûna we ji xeta rêxistinê re ji ber vê ye. Bêguman ev provakatorên herî dawî ku em qala wan dikin dibin xala herî serî. Fersend dibînin, lê fersendên we yên wisa jî nînin. Her roj agahiyên ku dibêjin; "*Revîn*" tên. Ev, reva jixwe tevlînekirina xetê ye. Reva ji xwe tabî negirtina tahlîlkirinê ye. Hûn vana jî pir zêde dijîn. Dibe ku sibê hinek ji we hev bigirin û birevin yan jî înkar bikin, ew jî reveke. Ev ne tahlîlkirin û xwe veguhertine û yên bi vî rengî eşkereye ku, wize û hêza wan a bi hev re meşînê jî nîne.

Vaye ji nêz ve bi artêşbûna jinê, wekheviya jinê ya siyasî û civakî re û bikaranîna vê rêgezê ve girêdayî ye. Di binê bandora vê de gevizîn, nêzîkatiyeke rast ji rêgezê re û girêdaniyeke rast jî nîne. Xwediyê rêgezê, nûnerê wê û li şûna pêkhîneriya wê, ketina bin bandorê û di vê rewşê de mayîn, dibe çavkaniya tengaviyên we jî. Di asteke mezin de çavkaniya xwe ji vê digire. Nehatina Partiyê, nehatina jiyanê ya rast ji ber vê sedemê ye. Li beramberî rêgeza azadiyê ya ku em ferz dikin, rêgeza we ya koletiyê ku hemû cure koletiyê di nava xwe de dihewîne, rêgeza înkargeriyê yan jî ji aliyê klasîk ve tê çi wateyê, hêjî berdewamkirina bandora wê kevneşopiyê we tîne asta ku nahêle hûn kar bikin. Lê ji ber ku ez hinekî rêgezê ferz dikim hinekê wisa derkevin, hinek jî weke we derkevin û hinek jî egîd derkevin.

Weke min got, ev jî encama şerekî mezine. Afirandina pêwendiyeke azadiyê weke ku hûn texmîn dikin ne asane. Jin û zilamên weke we afirandin, şerekî pir zehmete. Camêr hinekî bandora rêgezê bihîstiye, dikare çend pirtûkên provakasyonê binivîsîne. Kontr-gêrîlatî hêjî hewl didin vê pêwendiyê fêm bikin. Ji ber ku li ser min hat ferzkirin. Misoger dixwestin bi vê çekê li

min bidin. Ji sedî sed bawer kiribûn ku ez ê bi çeka hestan binkevim û ji ber ku ji vê bawer kiribûn ew bi xwe bin ketin. Ger ez yekî weke ku ew difikirîn bûma, bêguman ez ê binketibama. Min rewşa hestên klasîk esas girtiba, ji normên kevneşop re, dixwaze bi şêwazê şer, dixwaze bi şêwazê radestbûnê tevlî bibûma di her du rewşa de jî ez ê linav çûbûma. Lê sebra min û her ku çû hêza min a tahlîlkirinê, ev girêka kor ji hev vekir. Lê paşê hûn dibînin ku PKK'ê asta netewî çareser kir. Encam; niha pêşketina derfeta azadiyê ye. Ev dişibe parçekirina bombeya atomê û derxistina wizeya wê. Yanî ev teqendina girêka kor a civaka me û asta wizaya wê derxistina holê ye. Ev hêman wekî din dê çawa derkeve holê? Dîqat bikin, ya rast ev hêzekî teqînê ye. Ger na ji bo bi dijmin re şerkirinê çîyê me heye? Tanq, top, teyare hemû bi dijmin re ye; hûn jî bi zor û zehmetiyan tên gel hev. Lê tahlîla Kurd, ya malbatê û ya pêwendiyan encam dide. Diteqîne û di encam de çalakî, rêxistin û ruhê asta netewî girtin derdikeve holê.

Dema ku rêgeza azadiyê ya li ser we serwer em vedikin, asta azadiya siyasî çawa tê destgirtin em nîşan didin, ger bê dîqatkirin despêkê ji xwe didim despêkirin, bawerim ya pêwîst û rast jî ev e. Ji ber ku çareseriya Kurd ji we hemûyan re pêwîste. Heta li gorî min ji bo hemû civakê dişibin hev jî derbasdare û tahlîleke bi îdîa ye.

Ma min eyba mezin kir ji ber ku bi vî rengî dijîm? Hûn di vê mijarê de min çawa dinirxînin? Yanî hûn min weke ku dayika min dinirxînin; yanî niha ez li holê mame? Îca kî li holê maye, kî direve, li gorî hişmendiya dayika min (mirov dikare weke bîrdoziya zilamsalarî jî binirxîne) li gorî kurê min, li gorî keça min malbat, jiyan berê hatiye amadekirin û di navê de ji sedî sed koletî, tevizandin heye. Li dijberî vê rêgeza civakî derketina me pir girînge. Ji ber ku weke min got, ev rêgeza civakî zemînê hemû cure koletiyên siyasî ye. Bi anarşîstî dijberî wê derketin û gotina;

“*Dilê min dildariyê dixwaze, sewdaseriyê dixwaze”* dawiya wê ev e, ev jî bê wate ye. Îca di serdema me de hûn dizanin derfeta vê qet nîne. Jixwe gelek zêde xwe tahlîlkirina min jî bi vê sedemê ve girêdayî ye. Weke we min jî pir li law û keçên ciwan nerî û sekinîm û min got; “*Divê ez nakokiya van çawa bigirim û çareser bikim.”* Ez kesekî dîlawerim, weke ku hûn texmîn dikin ji bo xwe najîm, ji bo xwe nafikirim. Ev lawana, ev keçana dê xwe çawa tahlîl bikin? Îca ez bi keçan fikirim; ji hemû aliyan ve çarenûsa wan ji dest wan hatiye girtin. Ya ku jê re dibêjin maf bi hev ve hatiye girêdan, heta dema ku neyên girêdan dibêjin; “*Wîîî; hejarê, di malê de ma.”* Ya rast bi vegotina wêjeyî divê ku pir alî bê dîtin. Çawa keçeke wiha dibînin, ez matmayî dimînim li beramberî wan. Jê re tê gotin; “ *Em ê te bidin kê, çawa bidin?* Ya herî xirab jî keç tenê mîna koleyan li benda xwazgîniyê xwe dimîne. Li gorî pergalê dema ku hinek derfetên wisa çêdibin jî, xwe ya herî bi şans a cîhanê dibîne. Ya rast li gorî min hekareta herî mezin a ku mirov li beramberî xwe bike ye. Xwe bi yê bi pere ve girêdan, xwe bi zordar ve girêdan hem jî ji bo yê herî bi şanse!

Başe ruhê vî/ê kesê li kîderê ye, dilê wî/ê heye, hişmendî heye; divê ku bê pirsîn. Yên ku tenê dixwazin xwe wisa bidin girêdan, kesê ku vê ji jiyanê dihesibîne, çiqas azade? Yê ku ewqasî pere esas digire, zordestiyê ewqas esas digire ji serî ve azadî winda kiriye. Yê herî bi şans û baş wisa be, perîşaniya di rewşa yên din de texmînkirin dê qet zehmet nebe. Keça kedkar û yan jî ya gundî ku zimanê wê nîne, xwedî jiyaneke bêçare û xirabe. Jixwe rewşa lawan jî ji vê pir zêde cuda nîne, heta xirabtire. Niha ji aliyê madî ve jî ji bo pêkanîna zewacekê qet pere nîne. Pergalê ev ji hemû aliyan ve bê derfet kiriye. Ger hebe jî dê kêr çi bê; bi pere darê zorê keç girtin ji vê pêwendiyê tê çi fêm bikî? Li gorî min ger eniya wî ya madî bê pêşwazîkirin jî, pêwendiya ku bê avakirin dê bi qasî serê derziyê qîmeta xwe nebe, rêz û rêzdariya wê nebe. Bi

rastî jî ji roja ku min xwe naskiriye, min qet rêz ji van pêwendiyan re negirt. Min hertim kirêt dît, pêdiviya jê dûrketinê bihîst. Têkîliyên wisa hez nakim. Çima? Ya rastî pêwendiyeke civakî tê pêşxistin, hem jî di qada herî sereke de. Çima ez li dijberî vê me? Nexwe xeter dibînim. Pêhesînên min ên pêşwext hene û wisa dihizirim; "*Yê bikeve nava vê dê bifetise*" û tenê ji bo ku nekevim nava vê fetisînê heta niha jî xwe ciwan digirim. Bi wîzebûna min çavkaniya xwe ji vê digire.

Ez ê cînseltiya çors bi du gotina ji we re vebêjim. Binêrin, bi taybet ên ku ji aliyê civakî û siyasî ve ne pêşketîne di civakên weke Efrîka yên ku wisa paşketî hatine hiştin de cînseltiya çors tam bûye rewşeke felaketê. Hinek şer û nexweşiyên serdema me dema ku bi cînseltiya çors a civakên başverû re hev digirin, teqîna nifûsê, piştî wê ewqas nexweşî û cîhaneke kes nikare ji navê derkeve tê afirandin. Ya rast bi qasî ku emperyalîzm ji vê berpirsyare, jiyana paşverû ya civakî jî jê berpirsyare. Em li vir li dijberî herduyan şerekî dimeşînin, şerek mezin a civakî ye. Dibe ku ev dema pêş baştir bê fêmkirin. PKK di vê wayetê de şerê herî mezin a civakî dide. Û ger di vî şerî de serkeve dibe ku xwe bigihîne sosyalîzmek ji sosyalîzma klasîk, sosyalîzma pêkhatî jî wêdetir. Ev alî ji aliyê pir kêm kesan ve tê dîtin û her ku diçê dê bê dîtin; ya ku bibîne ev e.

Em niha pêwendiyeke civakî ya nû, pêwendiya azadiyê, ya jin û zilam vedikin. Ez bêjim ne şer me; dema ku vana dibêjim nabêjim misoger pêwendî nayê pêşxistin, lê li gorî min weke ku hûn dizanin pêwendî nayê pêşxistin. Ez heta niha pêre mijûl bûm, min ewqas dahûrandin pêşxistin, lê hîn jî nebes dibînim. Weke zilamekî jî tevî ku ez ewqas bandorker û ewqas hezkirinê pêş dixim, ez di vê mijarê de xwe di asteke çawa de digirim li holê ye û girînge. Dahûrînên ku pêş dixim û vekirin dibe ku nebes bin, heta dibe ku hinek şaşitiyan jî di nava xwe de bihewînin. Ji ber vê sedemê di vê baweriyê de me ku divê hîn jî pêre mijûl bibim.

Vaye ewqas keçên ciwan herî kêm di teşe de wekhev tevlî nava refên me dibin, heta me wan girtiye nava artêşê jî; di vê wateyê de wekheviya leşkerî, siyasî heye. Dîsa em di nava pêwendiyên civakî yên pir nêz jî de ne. Lê ev tenê despêkekin, hêjî rêgeza azadiyê çiqas şênber dibe, jin çiqas pêş dikeve? Bifikirin, ji bo ku ji hemû aliyan ve tu wate bide pêwendiyeke azadiyê, di serî de divê di cîhana wan a hundurîn de pêşketineke azadiyê pêk were. Yên ku li şûn vê astêne, dema ku tên gel hev zimanê wan tê girtin. Heta ketina nava hinek pratîkên sûc, nemaze rewşên tên darizandin jî derdikevin holê.

Rewşên gelek hezînin û ne xwezyarin. Hevdû qet nas nakin, li beramberî hev qet hezkirin û rêzdariya wan jî nîne û xwe kontrol nekirin, bi dayîna axaftina ajoyên xwe ve encam hezîn dibe. Ji ber ku di nava refên leşkerî de, di navenga şer de rewşên ku neyên pejirandinin, tasfiye ji artêşê avêtin tê jiyîn. Yên ku rast nêzîkî hezkirin û cînseltiyê bibe eşkereye ku dê nekeve van rewşan. Em bêjin ajoya zayendî tişteke xwezayî ye, lê ev xwezayîbûn di nava pergalê de dixwaze bila klasîk, yan jî fermî be, dixwaze bila civaka kevneşop be û ya herî girîng jî ji aliyê pergala me ya hundirîn ve heta dawî hevsengî li ber çav derbaskirinê ferz dike. Ma mirov dikare vê ji nedîtî ve bê? Dibe ku ez jî bêjim; "*Eman bila tu jin nebûna û me jî artêşeke rehet damezranda.*" Bi rastî jî me dikarî artêşeke rehettir damezranda, lê di vir de wê wate nedayîna rêgeza azadî û wekheviyê biba mijara gotinê. Me ji despêkê ve wekhevî esas girt, şoreş tenê ne li ser esasê serdestiya zilam, me weke şoreşeke jin jî di vê watê de azad û wekhev tevlî dibe dît. Niha jî bikaranîna vê rêgezê gelek zehmet dibe. Em ji ber vê rêgezê ewqas jinan tevlî dikin, ewqas pêwendî pêş dixin, lê em heta niha jî weke tê xwestin ji bin derketine? Pêdivî bi kedên pir mezintir heye. Lê tu li hevalên me dinêre di yek kêliyê de dibêje pêwendî yan jî di kêliyê de înkar û bê rêziyê dike. Ev jî ewqas ne erzane. Şêwaza me jî ya jin girtinadest heye; heta niha jî

em hewl didin jinê bafirînin. Ez misoger dikarim bêjim ku ewqas ne asane.

Ceribandineke min a metirsîdîar ku min jiyan kirî heye. Em bêjin pêwendiyeke agirê difetisîne, dîn û har dike. Lê tevî vê jî, me çawa li ber xwe da? Teqez rêzdariyeke me ji jinê re heye. Azweriyên mezinin. Lê rastî girîngtire. Rastiya civakî, rastiya siyasî, rastiya artêşê; ger em van li berçav negirin em ê bibin Kurdê kole yê berê ku, wê demê em li beramberî dijmin ne tiştekin, ya rast civak jî ne tişteke. Ji ferasetên çors ên pêwendiyê re azadî bê nasîn, bê ku şer bikin hûn ê tine bibin, hûn ê nikaribin ji binî derkevin. Jixwe keç û xortên ku tên ez wan dizanim, dibînim mehf bûne. Niha bi hezar û yek kedê em hewl didin pergalekê bi wan bidin qezenckirin. Ji bo ku keçik di her astî de xwe pêş bixin, di hemû astî de tevgerînên zilaman ên ku bêhna serdestiyê jê tên bên sînordarkirin û azadî bê vegotin tê kirin. Hema bêje di hemû mijaran de şîrove pêş dixim, em ê pêş jî bixin. Li gorî ku em dixwazin şoreşeke zanistî pêş bixin ev, pêwîste. Yanî nikare bê gotin; "*Ez li ber xwe nadim, dilê min dixwaze ez ajoyan wisa rakim ser piyan.*" Temam dibe ku ji bo hinek ji we ne di asta li ber xwe dayînê de be yan jî wî bi xwe, xwe xistiye nava vê fikrê, lê di holê de şoreşek ku vale diçe heye. Niha ev ne çareseriyeke Kurd, çareseriyeke Apo ye, divê ku li vê bê dîqatkirin. Ger me wisa nekiriba min nikarî we ber bi vir ve bînim. Wan egîdên jin ên ku me wan kişandiye dê yek ji wan jî derneketana holê. Derketina holê tê çi wateyê? Dê biba hezar û yek bar. Ez ji ezmûnên xwe dizanim.

Qaşo ji bo ev provakatorê ku navê wî derbas dibe dibêjin; "*Milê rastê yê Apo ye.*" Piştî ku *"milê raste"* wisa bû gelo wê milê din çawa bin? Dibêjin; "*Niha jin tevgerê li pê xwe dixişikîne, wisa rê li zilam vedike.*" Were tu wê ji min pirs bike. Ger sebra min a mezin û ferzkirinên min ên mezin ji bo perwerdekirinê nebûna tenê derxistina yek jinê ya serê çiya dê gengaz bûya? Di

nava civaka Kurdan de jin derxistina serê çiya, jinek di nava şert û mercên azadî û wekheviyê de di gel ewqas zilam de girtin wateya wê mezin û girînge. Heta ku kedeke mezin û nirxê rêgeza vê nebe ev pêk nayê. Em hinekî xwe nas bikin. Bi taybet jî beşa jinê teqez divê xwe nas bike. Di kîjan civakê de ye, li dijberî kîjan civak û pêwendiyê derketin kiriye ger nizanibe, ew qet nikare bibe şoreşger. Yan dê weke koleyekê radestî pêwendiya zilamê serdest bibe, yan dê bibe anarşîstekî qayde û qûralan nas nake û ev jî pir zêde derdikevin holê. Di nava refên me de herî zêde ev pêwendî tengav dike.

Ger em pêwendiya Partiyê li ber çavan negirin, ti helwestên despotîk ên ku zilam li beramberî jinê raber nekirana dê mebana. Bi xulamî radestbûna jinan jî pêş dîtin dê pir zehmet nebe. Kî ji pêwendiyeke bi sewiye re amade ye? Ji şêwaza avakirina pêwendiyeke bi hevsengî çend kes ji we weke tê xwestin dikarin jê re hêz raber bikin? Dubare dibêjim, ne şerme. Şertekî min heye. Ji ber ku min ev zêde anîne ziman dubare nakim. Ji gotinê zêdetir di kesayet de pêk anîn girînge. Rêgeza me ya welatparêziyê çiqas li berçav digirin ku, ev bi serê xwe peywireke, lê hûn nikarin di kêleka van re jî derbas bibin. Dîsa pêwendiya mirovê azad, pêwendiya gel, bi pîvanên Partiyê pêkanîna wê, ya herî girîng jî bi aliyên estetîk, di daxistina asta civakî de hûn li kîdera vê ne? Niha ev nebin em dikarin ji hemû curê pêwendiyan re bêjin "*başe*" û erê bikin?

Temam ez weke zagonekê diyar nakim, lê naxwazim ji nêzîkatiyên wisa yên berevajî azadiyê re jî bibim amûr. Ez ê bi zane bikim, jixwe di encam de ya ku ez dikim jî karê zanekirina jin û zilame. Ez wisa qedexeyan danayînim, lê erêkirinê jî pêş naxim. Ez ê heta dawî jinê bigihînim zanînê û bihêz bikim. Divê ku hêz bê dayîn, ji ber ku yê hêza xwe nebe derfetê pêkanîna daxwazên xwe jî nabe. Ji bo durûtî nekirinê zanîn pêşxistin, rêxistinkirin, heta bi çekkirin û dê karê artêşbûnê pêşkeve da ku

jin bikaribe bibe îfadeya daxwaza xwe. Niha ev rêgez bi kedeke mezin dixwaze artêşa jinê pêk bîne. Pêwendiyeke bi tendurist a hestan beriya her tiştî pêdivî bi pêşketineke siyasî û leşkerî dibîne. Beriya wê jî zanîneke diyarker weke şert pêş dajo. Niha gelek jin û zilam dibêjin; " *Çi pêwîstiya vê heye, em sewdaserin, ma em bi hev ve negirêdayîne, ma em qet xirabiyê bi hev dikin, ser de jî hemû tiştê me yê Partiyê ne."* Ez jî bêjim; "*weke ku xwe xapandina te têr nake, tê min jî bixapîne?"* Sewdaserên wisa, nizanin welat çiye, gel çiye, Partî çiye. Û ez ji roja ku heme li dijberî van sewdasera me, bêmirêz dibînim û biçûk lêdinerim. Ez çiqas mafdarim niha hatiye fêmkirin.

Niha Kurd bi jin û zilamên xwe ve bi van hestan ve girêdan çiqas xweşike. Pêwendiyên bêmirêz, her ku diçe ji zayendgeriya çors dûrxistin pêwendî hinekî din bilindkirin çiqas xweşike. Dîsa bi çavsorî hevdû girêdan, ya din jî çend zarok û malêkên wan çêbûn, li şûna rewşa çavê wan tiştekî nabîne welat, gel, li şûna wê Partî, li şûna wê pêwendiyên hevaltiyê û gihandina asta hestan çiqas bilinde. Bifikirin di demên borî de qet asteke wan wisa ya netewî nebû. Min jî dikariya weke we bi çavsorî bi malbat, jin, zevî, mal û milk ve hatibam girêdan. Lê nehatim girêdan. Û bifikirin ji bo ku bikarim bigîhînim asta welatparêzekî min çi nekir! Dîtina gel, bûyîna partiyî, hevrê, ji bo azadbûnê çiqas hewldan hat xwestin û heta niha jî hewl didim. Rêzdayîn divê ku hinekî jî li derdora van nirxan pêşkeve. Berevajî ji hestên we re rêzdarî nabe.

Di emcam de gelek provakator hene. Bi sedan derketin holê. Me ji van hestan, ji van revan, ji vê evînê çi fêm kir? Ev her roj dimirin. Teqez min jî tawanbar dikin û dibêjin; "*Bi jinê re wisa eleqedare."* Na, ya rast divê eleqeyên min û tiştên ku ez red dikim rast bên fêmkirin. Ger hûn vê fêm nekin hûn ê nikaribin asta civakî û netewî jî fêm bikin. Û ev jî pir girînge. Ji bo min, asta netewî û civakî weke "*Divê ku zilam bi jinê re çawa be"*

fêmkirin girînge. Ger hûn fêm nekin nikarin bibin milîtan jî. Ez vekirî ji we re bêjim. Hûn ê weke van xayînan bin. Hûn ê serî li tawanbariyan bidin û bêjin; “*Apo yê me bikuje.*” Na, di holê de ye, ez kesê ku ewqas jina azad derxistî holê me. Çima ez li pêşiya te û hestên te bibim asteng? Lê ez ê teqez vana bi hinek rêgezan ve gire bidim. Yên ku xwe bispêrin vê û rastiya me ya Serokatiyê welatparêzên bê amanin, milîtanên bê aman û rêxistinparêze.

Yên ku vana esas negirin, pêşî ez ê evîna wan xirab bikim. Provakator dibêje; “*Dê zewaca me xirab kiriba.*” Tenezil nakim. Bêguman ger ez bixwazin ez dikarim jinê hemûyan ji destê wan bigirim. Ez şoreşgerim. Ger nekim şerme. Dibêje; “*Wê bigirta me rizgar kir.*” Ger ez bixwazim niha dikarim yê hemû Kurdan bigirim. Henek bi vê nabe. Wateya vê çiye? Wateya vê; “*Tu di vê pêwendiyê de ketiyî, xayînê welat û azadiyê yî, xayînê evînê yî, xayînê hesta yî.*” Xayîn! Ez îspat dikim ku bi vî rengiye. Ez çima xayîn efû bikim, çima ez serbest berdim ku; dê bê cezakirin.

Ji welatê xwe, rêxistin, hevrêyê xwe mezin hez bike, bila her tişt yê tebe, evîna herî mezin ya te be. Hemû gotinên weke; “*Ez ji vana re nînim, li ser esasê înkarkirina van hestên min hene yan jî ez ê teswîreke keça wisa bikim, ez dixwazim wisa cînseltiyê bidim jiyîn*” hemû ketîne. Em ne zarok in. Di vê mijarê de zilamê herî bi hêz ez im, di vê mijarê de teqez ez henek û mubalaxe jî nakim. Hêza xwe, hêza li beramberî jinê, ewqas hêza fedakarî ya dîsîplîna zilam jî ji vir digirim û bi rastî jî ev dike rizgarvanekî bi hêz. Divê ku mirov vê jî wisa rast destnîşan bike; ger na em dê bikevin rewşa ku nikarin henase jî bigirin. Girêka kor ev e û çareseriya vê girêkê jî ev e. Û di heman demê de ezmûna min a herî mezin a jiyanê ye. Ji ber ku min got ya; pêwendiya ku Kemal Pîrên mezin nekarîn 24 demjimêran jê re tehamul bikin min nêzîkî deh salan jê re tehamul kir. Ev tenê yeke. Bi hezaran yên weke vê mirovan kehr dike. Lê piştî ku me ji hemûyan re jî sebir kir, em digihêjin hêza mezin a hestan.

Dema ku ez digihêjim vê hesta mezin û bilindiya ku bi xwe re afirandiye, li ti kesî bi taybetî jî li jinê min zorî nekir. Ger pêşketineke bi azweriyek mezin, rêz, rêzdarî û ya ku kesayet bi kûrî bandor dike nebe, tenê jinek jî nikare di nava mercên me de bijî. Hûn ê nikaribin yek ji van keçan jî bigirin. Dê serê xwe bigirin û birevin. Lê em bi kesayetiya wan yan jî bi taybet gelek yên jiyanî, mafên jiyanên di asta nebe nabe de eleqe û karîgeriyê didin qezenckirin. Ew jî mafdar li beramberî rastiya Serokatî girêdayîneke mezin dibihîzin. Jixwe ev çalakiya herî mezin tê hesabkirin. Ji hemû aliyan ve di çarçoveya vê rêgezê de ye. Çalakgeriya bi sedan keçên ciwan; egîdiya wan li ser vî esasî derketiye. Di dîroka netewên din de yek an du kes hene, lê di nava me de bi sedan hene; hemû jî di pileya egîdiyê de ne û ya ku tê raberkirin jî ne şerkeriyeke ji rêzê ye.

Niha hûn ê vana nebînin û hûn ê bêjin; "*Feraseteke min a pêwendî û hestan heye.*" Ma qebûlkirina vê gengaze? Ev di pêvajoya têkoşînê de ew nirxên henase bi henase hatine afirandin, şansê azadiyê yê mezin nayê wateya erzan xerckirinê? Şêwaza pêwendiya KT'yê hêviyeke mezin bê ve girêdabû û ya ku dixwest min jî tê de bifetisîne, vegûherî pêwendiyeke wan bi xwe difetisîne. Ger ez Kurdekî kevin bûma dê teqez min jî bifetisandana, lê min hêza xwe veguherînê raber kir. Di van pêwendiyan de min KT'yê fetisand û bi hezaran kesayetiyên Kurdên azad, kesayetiya jinên azad derxist holê. Niha di bûyera Kurd de li gorî min bi taybetî jî jin pir şanaz pêş dikeve. Ger di van hewldanan de hinekî din bê israrkirin, weke ku hûn jî dibînin jina bi hêz pêş dikeve. Minak ji niha ve pir balkêşin. Û bala cîhanê jî dikişîne.

Hîn di despêka kar de di nava qirêj û zenga 4 hezar salan de serî hildide. Îca de bifikirin pêşketineke çar bi çar dê pêşketineke çawa be. Bi rastî jî ger hestên we hene divê çawa bi rêgezê ve girêdanî çêbibe, çawa tevlî jiyanê bibe jî eşkere ye. Girêdanên ku

li derdora nirxên wisa pêş dikevin, bi hêmana civakî, hestan ve bi vîn û azweriya ku dide qezenckirin tenê bi serê xwe bi qasî atomê hêz derdixe û diafirîne. Em li pê vê dibezin. Weke ku ji derve lê tê nerîn ne xebateke ji rêzê ye. Bi taybet di pêşketina jinê de bi nêzîkatiya herî radîkal re rastiya veguhertinê ye. Ez mubalexe nakim û em heta niha jî li serin. Bi kurtî sebrê dixwaze, em wisa bi qalibên kevneşop jî nêzîk nebin. Me di van pêwendiyan de kurahiyek qezenc kiriye. Teqez tê de nêzîkatiya rêzdarî, wekhevî û azadiyê heye; tepisandin, qurnazî û qirêjkirin nîne. Di van pêwendiyan de, bi taybetî jî di nava refên me de bi xwe sipartina hêza rêveberiyê tepisandin nayê fikirîn. Ev mijar, teqez bi rê û rêbazên wisa klasîk ve nayê çareserkirin. Ji hemû aliyan ve tevgereke asteke azadiyê, dîsa zanîstbûn, asta rêxistinbûnê, kapasîteya şer, bi taybetî di kesayetiya jinê de girtîbûnê, dîlgirtîbûn lêkolînkirin û pêşxistinê ye. Hezkirin encax bi vê ve girêdayî pêşkeve. Heta ku ev neyê pêk anîn, tenê bi serê xwe qala pêwendiyan kirin, teqez dê we bixe nava rewşên zehmet.

Ev tevgereke şere. Me di vê mijarê de hinek xalên sereke vekirin. Em ê di jiyana rojane de gav bi gav pêşxistinê de jî baldar tevbigerin. Ger hûn gavên despêkê bi tendurist bavêjin, dibe ku gavên piştî wê jî bi hêz pêşkevin. Divê ku jin ji xwe bawer be. Dîsa ji jinê re di nava mercên wekhev û azad de, ne li gorî nêzîkatiyên di civakê de serwerin, divê ku hêza me têra nêzîkatiyeke xweser bi me bike. Teqez ev ji me re pêwîste; ji ber ku ferasetên we yê jina kevin me riswa dike. Di navê de ti hezkirin û jiyan nîne. Min ezmûna xwe ji we re vegot. Lê gêrîla têkoşînê dixwaze. Wisa bi ferdiyetê, bi karanîna hêza xwe ya siyasî, qurnaziya gundîtî û qurnaztiya jinê mirov nikare dest bixe. Ger hûn bixwazin dest bixin xwedê yê li we bixwe. Sedî caran bên paşvexistin. Ya dimîne bi şerekî egîdîane cîhana ku bê pêşxistine. Û şoreş jî amûrê damezrandina cîhaneke wisa ye.

Şoreşa ku cîhaneke azadiyê ya wisa pêş nabîne yan jî şoreşa ku wisa jinê berfireh nagire dest, dibe tevgera çîneke din an jî şoreşeke serdestiya zilam ku, ev jî ne şoreşa me ye. Şoreşa ku PKK pêşengtiya wê dike ya din jî di vê wateyê de ji hemû aliyan ve azadiya jinê dibe di asta ku di ti şoreşê de nehatiye ditîn tahlîl dike, rêxistin dike û di vê mijarê de her ku diçe dibe xwedî taybetmendiyeke diyarker. Yên ku dixwazin bi îdîa bin, dixwazin ji PKK bûnê re rê vekin gavên xwe bi zanebûn û zexmkirî bavêjin û divê bizanibin pêşketinên bi vî rengî bi baldarî lêkolîn bikin. Bi taybetî jî divê qadro bizanibe xwe divê mijarê de hîn baldar û miqabilî hev binirxînin. Ji niha ve hatiye fêmkirin ku dê ev ked vala neçe. Pêşketina jinê serbilind dike. Jixwe heta ku jin pêşnekeve em ne bawerin ku jiyan pêşkeve; ji ber ku zilamê pir zêde pêşketî ji aliyê siyasî û leşkerî ve zilamê ku hêz qezenc kiriye, weke ku dê her demê zextker be, dê ber bi civaka mêtînger ve jî bibe. Ger em sosyalîstin, divê ku herî kêm jin jî bi qasî ku bikaribe rê li pêşiya xeteriyeke wisa bigire pêşketina wê ya civakî, siyasî û heta ya leşkerî li ber çavan bê girtin. Şoreşa xwe hinekî jî ji vî alî, ji vê eniyê ve weke şoreşeke civakî, weke şoreşeke jinê jî dê pêşbikeve em vê jî pir zêde û vekirî dibêjin. Gavên ku em davêjin li ser vî esasî nirxandin girînge.

Ger bê dîqatkirin, di eniyên cuda de, hinekî bi zimanê hunerwêje rastiya şoreşa me, ya Partî, rastiya me ya şer em hewl didin vebêjin. Bêguman divê ku hêviya her tiştî ji nişkê ve çareserkirin neyê bendewarkirin. Lê aliyê zanistî yê dahurînê û pêşxistina vînê ji niha ve tê fêmkirin. Jiyana civakî bi van aliyan ve ronîkirina me teqez wê qada siyasî û leşkerî jî bi hêz bike. Wê ti xebatên siyasî-leşkerî li ser esasê înkarkirina bijareya me ya jiyana civakî, dengkirina wê û bi şêwazê bejnkurtkirina wê pêş nekeve, nepêşketina wê jî divê vekirî bê zanîn. Di vê astê de hem di dîroka Partiya me de, hem jî hîn di rastiya têkoşîna me ya hûrûkûr de li ser jiyana civakî, hem weke saziya ferzker a sereke li

dahûrandina malbatê, hem jî di asta pêwendiyên jin û zilam de pirsgirêk bi bingehî ve tên destgirtin.

Fêmkirina vê asta ku hîn di qonaxa dahurandinê de ye her ku diçe ber bi sazîbûnê ve birin û ev jî wiha bi pîvan pêşxistin mijara gotinê ye. Weke ku di hemû mijaran de di vê derê de jî sebir, înad û şerê xwe bê navber domandin, dikare ber bi serkeftineke mezin ve bibe. Şêwazê me di jiyana civakî de, divê şêwazekî gav bi gav serkeftinê teqez dike be. Hemû curên înkargerî û nêzîkatiyên erzan ên hestî divê ku bên derbaskirin. Bûyîna xwedî hêza afirandina arasteyê û ev li pêş girtin, ji vê re jî bi bilindkirina hestên xwe tevlîbûn çêkirin, ajo weke ku di hemû sehayan de di vê sehayê de jî li ser esasê hestên bilindkirî terbiye kirin girînge. Dîsa hestên malbatgerî, hestên klan û kabîle gihandina asta netewî, hestên dost-hevjîn, ahbap-çawîşî veguherandina asta hestên netewî yên bilind pêdiviyên sotîner ên vê waneyê ne.

Divê ti pêwendiyên ferdî, ahbab-çawîş, hezkirin yan jî rewşa hestî; derbasî pêşiya îfadeyên hesta vê ya asta civakî nebin. Terbiye tam jî di vê mijarê de pêşketî be, hertim asta netewî û civakî li ber çav bê derbaskirin, li ser vî esasî welatparêzî; girêdana bi nirxên rizgariya netewî, berjewendiyên jiyanî pêwîst dike. Ger dê di ser malbatê re bersivek ji biryar û pêwendiyên şexsî yên bi miqabil re bê dayîn, zêde li ber çav girtina vê şert dike. Divê ti carî xwe ber bi hestên erzan ve nexin, di hestên xwe de bi pîvan û serweriya hişmendiyê jî neyê paşçavxistin. Vana hemû dibin aliyê devjêneger ên perwerda me ya qadro û terbiyekirina me ya Partiyê.

Li ser vî esasî nîqaş dikarin hîn bên pêşxistin. Di vê mijarê de derfet jî hene, em we ji peywirên we yên sereke nagirin. Em tenê despê dikin. Ya şerm sergirtine. Ger na rastiya xwe derxistina holê, ger ez jî xwe wisa derdixim holê, ne şerme. Berevajî, rêya xwe ji şermê derxistinê ye. Tu kes ji we bila nebêje; "*di dema borî de min jî jiyan kir, ez ê wisa eybdar bibim*" û xwe veneşêrin,

bi cesaret vekin, lê dema ku hûn vedikin veguhertinê jî esas bigirin. Bi taybetî dibe ku di despêkê de li ser beşa jinê xwe ferzkirinên pir xeter bibin mijara gotinê. Her keça ciwan hîn ji 7-10 saliya xwe ve rûbirûyî tevgerînên anûr şikandina zilam tên. Ev di nava malbatê de jî wisa ye. Bav jî dibêje; "*zilam serwere*" û ji ber vê bîrdoziyê bi anûr nêzîk nabe. Nemaze encax jin di nava PKK'ê de dikare xwe tabî azadiyê û cesûr tahlîlkirinê bike. Ev mezinbûna PKK'ê li gorî tê xwestin nirxandin, ji aliyê wan ve xwedî derfetekî jiyanî ye. Divê hostatiya nirxandinê raber bikin. Di nava her rêxistinê de dîtina derfetên wisa ne gengaze. Wate û girîngiya vê pir mezine, divê baş bê fêmkirin.

Nîqaşên me bi kûrahiya xwe dê bidomin. Weke ku her demê min gotiye pêwendiyeke asan, desthilatdariyeke asan, rêxistineke asan, pêwendiyeke asan a leşkerî, pêwendiyeke asan a jin û zilam nabe. Tenê bi hestên erzan, ji leşkeriyê fedakirinê leşkerî nayê kirin, tenê dikare bibe qurban. Nizanim bi gotina ku min rêxistin xist destê xwe rêxistin nakeve dest, dibe bela, bi gotina me hev qezenc kir nayê qezenckirin, dibe xayîn. Ez li ser esasê xwe sipartina ezmûnên xwe dibêjim ku; terbiya xwe di mijara jinê de jî, pêwendiya jin û zilam de jî divê ku em saxlem pêk bînin. Ev saxlemî, ji ya tê payîn zêdetir dikare bide qezenckirin. Ez bawerim tê fêmkirin, bi destgirtina asta civakî weke tê dîtin ne basîte; lê ne rewşeke mirov nikare ji binî rabe jî. Tahlîlkirina vê astê dîsa berevajî tê payîn li pêşiya pêşketinên siyasî, leşkerî ne astenge, berevajî xwedî taybetmendiyeke tahrîk dike û pêş dixe ye. Ez ne bawerim ên ku dahûrandina civakî veguhertinê wisa nagirin dest behremendiyeke wan a siyasetmedarî û leşkerî hebe. Ev têkoşîna mezin a ku em di qada civakî de dijîn, me ji aliyê siyasî û leşkerî ve wê ber bi serfkirina kedeke mezin ve bibe. Di nava van dehlîzên pêwendiya malbat, jin û zilam de bi qasî ku min bêçareserî, bêmirêzî, ketîbûn dît pêdiviya siyasetkirinê dît. Û

pêdiviya siyasetkirinê jî em ber bi hewldana mezin a leşkerî kirinê ve birine.

Fêmkirin başe. Fêmkirin, ji bo jiyankirinê despêke. Bûnewerê civakî encax bi fêmkirina rastiya civakî ve dikare bê despêkirin, jiyankirin. Di vê mijarê de hejariyeke mezin û bê zanistî tê jiyankirin. Em hewl didin wê derbas bikin. Dîsa û hertim dibêjim, ya şerm xwe weke ku tiştek nehatiya jiyîn bê perpirsyar hiştin û bê çareserî hiştine. Ya rast, ji hemû şermbûna xwe rizgarkirin, rastiya xwe tahlîlkirin, bi qasî fêmkirinê, ji veguhertina wê re, hem jî bi azweriyeke mezin hêz jê re anîne. Di nava me de ji girêka kor ber bi çareseriyê ve çûyîne. Ber bi jiyana civakî ve pêşketine. Niha jî gelê me bi vî aliyê xwe ve rizgariyê ji aliyê civakî ve pêk tîne. Dîsa jî jin ji gelek aliyan ve rizgariya civakî ya ku pêdiviya xwe pê dibîne hem wate didiyê, hem jî bi eleqeyeke mezin û pir bi egîdî bi xwe tevlîkirinê mafê wê dide. Ev berdêl teqez azadî çiqas bi qîmete jî dide diyarkirin. Bi taybet çar egîdên jin ên ku xwe şewitandine, di mijara jiyana azad de heta dawî fermanberin û xwedî jiyanake pîroz û neyê jibîrkirinin. Nirxandineke din nayê kirin.

Tevgereke Partiyê ya ku dikare vana derxe holê bi nirxe. Divê ku em bizanibin vê nirxê bi kûrahî fêm bikin. Heta bi hêza huner, di serî de jî şehîd û bi vê ve girêdayî jiyana ku em dixwazin pêş bixin nîşan bidin. Huner, tam jî di vê xalê de dema dest bi destgirtina jiyanê kir afirîneriya xwe dide diyarkirin. Û dê berhemên bi nirx li pê hev derxîne holê. Ger bê dîqatkirin, em gihiştin ber deriyê huner. Pêdiviya wisa nêzîkatî ji jiyanê re raberkirinê me digihîne hêza hunerî û dide diyarkirin ku em ê bibin xwedî bandorgeriyeke hunerî. Yanî bûyîna xwedî hunera xwe, eşkereye ku bi vî rengî destgirtina jiyanê re têkildare. Hunerekî rast û hunermendê wê/î wê şerekî pir mezin li ser vî esasî bimeşîne û her ku diçe dê bizanibe vê pêş bixe. Tevgera me ya şoreşgerî hinekî jî weke lîstokeke hunerî pêşketinê raber dike;

aliyê wê yê siyasî û hunerî li kîderê despê dike û li kîderê bi dawî dibe? Di nava hev de ye û wekî din jî nabe. Xwe anîna min a vê asta ku xwedî ewqas riste, hinekî jî bi weke hunermendekî nêzîkbûnê ve çavkaniya xwe ji rewşa pêkanîna me ya vê şoreşê digire. Ger despêk wisa ye, her ku diçe tê wateya ku her ku biçe em ê bibin xwedî çalakiyeke bi şax û çiqil dibe. Û dê şoreşe me nêzîkatiyeke bi hêz a şoreşê û pêwendiyan û dê ber bi îfadeya wê ya sazîbûnê ve jî bibe.

Hûn dibînin ku em pir dewlemend dikarin li jiyanê binêrin. Em dikarin jiyanê ji gelek aliyan ve bir alî û bê binketin bikin. Min di pratîka xwe de, hewlda ku vê biteyisînim. Di pratîka xwe ya jiyanê de hinekî bi tahlîlkirinê, bi lewaziyên xwe rêyên bi hêzbûnê bi sebreke mezin bi destgirtinê, pêşdîtinê, ez di vê baweriyê de me ku başiyên diviya bû hem bi xwe hem jî bi gel bikim min kiriye. Ger hinekî din ne ecibînin jî ez dibêjim hodrî meydan. Bila bifermin ew bi xwe bikin. Vaye jiyana li dijberî dijmin li holê ye. Bila ji min baştir ser bixin, ger dixwazin bila min bieciqînin. Dixwaze bila min weke xizmetkarê herî ji rêzê bikar bînin; ez ji hemûyan re jî heme. Lê yê ku ji van karan re hêz bîne û bibe daxwazkar jî nebû, nîne. Dema ku bi vî rengî bû, min ji gel û daxwaziyên wî yên azadiyê, mafê wî ve gire daye û ji ber ku min nexwest xwe weke ketiyê jiyanê jî bidim nirxandin rev û pêdiviya vê serdeçûna dîrokî ya mezin li şûna di holê de hiştinê xwedî lê derketim. Bi vî rengî min rê li giştina asteke şer a bi vî rengî vekir. Ez hertim bi gel re bûm. Hertim yên ku di rewşa herî zehmet û paşketî de hûn bûn. Min girîngiyeke taybet jî da vê. Encamekî girîng ku divê ji vê bê derxistin, ger hûn weke tê xwestin û rast xwe bidinê, hûn ê bikaribin ji vê zedetir bikin. Niha ji bo afirandina pêşketinên mezintir amûr û derfetên mûazam hene.

Hinekî bizanibin mînaka me bi kûrî lêkolîn bikin. Hûn ê bibînin ku, hêzên dijber ên ku we gire didin hene. We ji gelek

aliyan ve dahûrandina xwe nekiriye. Ji ber vê hûn heba dibin. Ev mînak wê hem we ber bi dahûrandinê, pîvanên teqez pêkanînê ve bibe û hûn bi şîdet hewceyî vê ne. Dev jî jiyanê bernedin. Bi azweriyeke mezin jiyanê himêz bikin.

Em jiyanê di nava nêzîkatiyeke bêzar de nenirxînin. Dibe ku hinek ji we min pir zêde jî bibînin û bêjin; "*ma mirov ewqas ked xerc dike"* û pê bifikire jî. Ger ya min rebentî be wê demê ya we ji wê jî wêdetire. Zemînên min ên despêkirinê nebûn, zêde mirovên ku min fêm bikin jî nebûn. Hemû bi hezar zorî zehmetiyê ve ji vir û wir di encama mijûlbûnên salan de çêbûne. Niha ez vî karî hinekî dimeşînim. Lê hûn xwedî gelek tiştên amadene. Bêguman ger hûn li vir behremendiyên xwe ranekin ser piyan, xwedî li peywira xwe ya afirandinê dernekevin, qîmeta we namîne û dê kes we cîdî jî negire.

Hinekî be jî ji me erêkirin wergirtin, tê wateya afirandina zanînê. Eşkereye ku hem ji vê re pêwîstiya we heye, hem jî ev weke peywirekê fêmkirin û pêdiviya wê pêkanîn, Rastiya Serokatiyê ya ku em ê jî nikaribin devjê berdine. Herî kêm divê ku hûn bizanibin vê arasteyê bişopînin û kûr bikin. Em ê jiyanê ji niha û şûnde dewlemendtir bikin; em dixwazin ji bin vê derkevin û dê bê dîtin. Em hewl didin vê bidin nîşandan; dijmin weke ku salên dirêj qet şans neda me, ji kirina pêkenoka civakê jî qet şûnde nema, hevalê herî nêzîkî min weke ku dihat xwestin neşopand kesayetiyekî wisa xwe çawa tahlîl dike, dike xwedî ked û serkeftî dike? Ev çawa çêbû? Ez dibêjim pêwîste hûn vê fêr bibin. Ez ne sihirbazim. Tenê di asteke metirsîdîar de xwedî kedim. Bi min re eleqeyeke mezin heye, henase bi henase, kêlî bi kêlî lêhûrbûn, mijara gotinê ye. Ev derfeta serkeftinê dayîna armanca ku gelekan ji we hemû tiştê xwe dayî ye. Ez wekî din ji mirovê me re rêzdar nabim; wekî din ev êşên mezin, tengaviyên mezin nayên derbaskirin. Ev cîhana bêşermiyê, cîhana kirêtiyan ji

çarenûsbûnê nayê derxistin. Ez teqez weke gelekan ji we nayêm çarenûsaziyê û çarenûsa xwe weke we girêdanê.

Jidil bi daxwaza azadiyê ve girêdan binirxe; ne ber bi hestên erzan ketin û pê ve girêdan, ji nû xwe pêkanîna kes, xwe rêzdar kirin teqez di vê de derbas dibe. Hîn jî li beramberî xwe rêzdarbûnê, di vê baweriyê de me ku ez ê bi pêşiya xwe ji azadiyê re vekirî hiştinê pêk bînim. Jixwe zêdetir min ev ji bo we pêk aniye divê ku hûn ji vê jî bawer bin. Di şêwazê min de hevalê xwe saxlem dayîna meşandin, ew bi xwe jî hîn bêtir di araziyên asteng û bi şêwazê ji şûnve parastinê, hîn zêdetir xeterî girtina ser milê xwe birin heye. Em hevalên rêyeke wisa ne. Heta niha we bi awayekî bi hêz nenirxand. Ji fedakarî û cesareta we re rêzdariyeke me ya mezin heye. Lê li gorî min şêwazê me hîn serkeftîtire û hûn dikarin zêdetir bibin pêkhînerê vî şêwazî. Qet nebe ji bo bîranîna ewqas şehîdîan ji niha û şûn ve hûn wisa bersiv bidin, hem ji bo xwe, hem ji Partiya me, hem ji gelê me û mirovahiyê re ya şayan hûn ê bikin.

Dibe ku zehmet be û bi rastî jî wisa ye, lê divê ku em baweriya xwe bi mirovê xwe û mirovatiyê bînin. Ji aliyên kesekî weke min jî ev derfet di xwe de afirandin pêwîste heta dawî baweriyê bide we. Lê ev bawerî jî bi tena serê xwe têrê nake; divê ku bi raberkirina keda bê aman re hevbigire. Li pênavî çi dibe bila bibe, li kîderê dibe bila bibe, heta dawî bi pîvan, bi gavên ku hatine pîvan û bi vî hêzî hûn rê bigirin, ez ne bawerim ku ev dijmin xwe li ber me bigire. Hemû siparteyên şerê wî yê taybet jî nikaribe xwe li ber me bigire. Ji xwe me ev îspat kir. Kîna me; li beramberî yên ku weke tê xwestên vê fêm nakin, hema bêje vê weke çarenûs dibînin, biçûk û qezem, tirsonek, qirêj yên difetisinine. Qebûlkirina vê tê wateya hekareta herî mezin şayanî xwe dîtinê. Mirov dikare li beramberî birçîbûnê, tîbûnê, îşkenceyê, her tiştî li ber xwe bide, lê ji şêwazê jiyaneke wisa û hekaretê re qet nikare li ber xwe bide. Ji ber ku min ji vê re

tehamul nekir ez şoreşgerim. Mezin bi hêrsim, mezin bi azwerî me; ji ber ku min ji vê re tehamul nekir mezin şer dikim û bawerim dizanim qezenc jî bikim.

Bila ev şêwaz ya we be û bila destkeftên we jî ewqas mezin, bi hêz û bi nirx bin.

**5 Cotmeh 1994**

# Jiyana Min Tenê Ne Çîroka Netewekî Ye, Ji Bo Azadbûna Mirov Jî Bersiva Herî Rasteqîne

Niha em ê hewl bidin di vî beşî de mijarê zêdetir bidin fêmkirin, vekin encamên ku divê jê bên derxistin û li ser wateya ku jê re bê dayîn bisekinin. Me dest bi dahûrandinên pir berfireh kir; demên borî li gorî ku dihat xwestin bi vî şêwazî pêşneketin yan jî weke tê xwestin xwe negihandina pîvanan, careke din ji bo ku şayanî vê bin me pêdivî dît ku em vekirî destnîşan bikin. Bi xetên stûr be jî hinek beşên jiyanê, girêdaniya şer bi jiyana me re me danî holê. Bêguman armanceke me jî ji xwe despêkirin, pêwîstiya bi cesaret nêzîkî xwe bûyînê bi awayekî şênber nîşandan û pêşî vekirin bû.

Eşkereye ku, kesayetên ku ji gelek aliyan ve xwe bê kar hiştine hene. Ev bê nîqaşe. Em ji bo ku bidin diyarkirin ev ne çarenûseke, ji bo wan aliyên bê bndor mane em bixin tevgerê û bi mînakên şênber bi xwe danîna holê, em hewl didin bîzat rastiyan îspat bikin. Ji jiyana me re nikare bê gotin çarenûsazî jî; di demeke dirêj a dîrokî de û bi taybet di roja me ya îro de pêkanînên bê aman ên ji aliyê şerê taybet ve êrîşî ser hemû derfetên me yên jiyanî dikin mijara gotinê ne. Ev weke çarenûsekê dîtin yan jî îsyaneke we be jî, ev îsyana xwe bi zanebûn, negihandina xeta jiyana rêxistinî, hîn zêdetir bi we dide windakirin. Jiyana we pir bê wate dike, we bê berpirsyarî, bêxem, bê îdîa û ji hemû aliyan ve binketî, heta dawî ji xwebûnê derketî, yê ku xwe ji hemû curê jiyana ketî re layîq dibîne yanî we dixe rewşa gelê ku ji aliyê van

kesayetan ve hatiye avakirin. Ev, li beramberî jiyanê bi serê xwe dibe tawanekî neyê efûkirin.

Ger bê dîqatkirin ya ku şerê me yê bê aman jî dixwaze çareser bike ev e. Li beramberî jiyanê îsyaneke mezin heye û ji bo rêzdariya jiyanê heta niha rêyeke din jî nehatiye dîtin. Hemû serkeftina me, hinekî jî bi vê wateya liberamberî hev ku min ji jiyanê re daye û ber bi roja me ve veguhertina şerekî ye. Binêrin em çawa bi ser her qadekê de çûne, her qad çawa xwestiye bê qezenckirin. Hûn ê vê hinekî fêm bikin, ne bi hişmendiyeke wisa ji rêzê. Ev şêwaz şêwaza şerkerekî ye. Hem jî ya ku ji hemû aliyan ve bersiv dide şerê taybet ê dijmin û dema ku pêwîst kir her ferdek bikare weke artêşekê serkeftî xwe bide şerkirin şêwazek hatî îspatkirine. Ger hûn bizanin hêza xwe ya mantiq û behremendiyên xwe yên mirovî wisa bikar bînin, gengaze ku serkeftî bi vê ezmûnê re jî derbaskirin çêbe, teqez dê hinekî be jî wîjdanê we şiyar bibe, aqlê selîm bikeve dewrê. Encax hûn wisa cidî bên girtin. Ji ber ku avabûna rêbertiyê ya ku ji serkeftinê re rê vedike û tê îspatkirin, ferzkirinên jiyana ferdî, malbatî û civakî ya tê zanîn qebûl nake; bi jiyana azad ya ku em pêş dixin re jî hev nagire. Bûyîn û nebûna min zêde ne girînge. Dema ku gav di jiyana nû û ya azad de tê avêtin, ew şêwazên kevin mahkûmî bê encam mayînê û binketinê ne.

Ger dê ji bo azadiyê gav bê avêtin, wisa diyare ku ezmûna me gelek kar kiriye. Rêzgirtin teqez pêwîste di vir de îfada xwe bibîne. Pêwîstî bi pozbilindiyê nîne; qet pêwîstî bi demogojiyê, nizanim hejandinê, şewişînê ji rêderketinên bîrdozî-polîtîk ên kesayetiyê nîne. Rastî di holê de ne. Rêzdayîneke ji rêzê ya ji jiyanê re jî, hinekî jî vê cidî girtinê pêwîst dike. Mafê ti kesî ji vê bê rêziyê re nîne, ne jî ti kes dikare bêje fêrbûne û hêza bê edebî raber bike. Mirov bi xirabiyeke wisa ji xwe re nêzîk nabe. Encama ku derxe teqez divê wisa be. Heta niha li beramberî rastiya wê derê, tevî derfetên bi qasî deryayan, dahûrandinan jî

nêzîkatiyek; “*Ez nikarim ser bixim, nikarim jiyanê çareser bikim, pir bêhêzim”* raberkirin em eşkere weke ketîbûnê dibînin û her ku diçe nêzîkatiya me jî dê wisa pêşkeve. Rastiya me ya Serokatiyê, pirsgirêk û pêvajo ewqas ronî û zelal kiriye, êdî xwe nerastkirin, terbiye nekirin, ji bingeh ve xwe nû nekirin, li ser vî esasî derketin pêkneanîn, bi rastî jî mirine.

Hêza vê vegotinê heta pileya dawî bi şîdet bûye û ber bi encam girtinê ve diçe. Nemaze qet pêwîstî bi ketîbûnê nîne, ji ber ku mahkumiyeta wê heye, hatiye mahkûmkirin. Rêya derketin û derfetên wê hene tevî vê jî pêwîste di şêwazên ku ber bi mirinê ve dibin de neyê israrkirin. Êdî dema parastina koletiyê, rûpoşkirina gelek rewşên koletiyê derbas bûye. Ya herî girîng jî dema biyaniyên “*ez nikarim ser bixim”* jî derbas bûye. Dema lihevanînên vir jî derbas bûye. Êdî ti kes nikare weke berê bijî. Ya ku li vir pêk tê ev e. Heta ku bi vî rengî be yên di tempoyê baş de dimînin, bi serkeftinên ji rêzê jî ne kes dikare baxive, ne xwe bide jiyankirin ne jî dikare rabe û maf bixwaze. Rastiya serokatiyê hem ev îspatkiriye, hem jî bi dewlemendiyeke awarte rê û rêbazên vê daniye holê, pêşxistiye û nîşan daye. Ma ji vê baştir alîkarî dibe? Ji ber vê sedemê pêwîste heta dawî cidî bê girtin, wane jê bên derxistin, bi hêzekî amadekirî misoger bikeve ser rê. Berevajî divê baş bê zanîn ku ketina rewşên belengaz ên ku jiyanê û rastiya me mahkûm kirine dê jênerev bibe û divê ev jî baş bê zanîn.

Niha me xwe bi hinek xetên stûr û beşê jiyanê ve ji nîqaşê re vekir. Bi qasî ku em bi ser kesayetiyên kevin, nebes û ferasetan de diçin, dema ku pêwîst bike xeta xwe ya jiyanê jî lêpirsîn dikin, ji nîqaşê re vedikin û ev jî di holê de ye. Mirov çawa xwe karîger dike, çawa radike ser piyan; ya min çîroka vê ye û bawerim gelekî jî bal dikişîne. Eleqe çawane, piştî ku me xwe danî holê eleqe zêde bû Ab.?

***Ab.:*** Raste Serokê min. Ji aliyê hevalan ve bêtir bal dikişîne û fêrker dibe. Ders derxistin jî pêş dikeve.

***---.:*** Çavdêrî çawa ne? Kîjan beş ango aliyê jiyana me taybetmendî bandoreke fêrker ava dike? Mînak aliyên ku herî zêde bandor li ser te kir kîjan beş û taybetmendî bû?

***Ab.:*** Serokê min, di demên pir hestyar de rewşa biryardayînê yanî biryarên cuda dayîn bandorkere.

***---.:*** Heta mijarên ku te bi xwe re nedîtine û bi min re dîtine, nemaze aliyên ku tu weke alîkarî ji xwe re bibînî ji bo xwe bi hêzkirinê xalên herî girîng kîjane?

***Ab.:*** Hişyariya zêde li beramberî jiyanê. Bi şiyariyeke wisa bi ser jiyanê de çûyîn heye.

***---.:*** Mînak şiyariya herî bi şîdet a ku bandor kir me çawa raber kir? Û hûn çawa xafîl man?

***Ab.:*** Di her demên pêşketina têkoşînê de, li gorî taybetmendiyên wê demê, xwe ji peywiran re amadekirin, meyla bi ser erkan de çûyînê heye.

***---.:*** Çawa tê fêmkirin?

***Ab.:*** Cudabûnên pir mezin derdikevin holê.

***---.:*** Wê demê we çawa ev ferq nedît?

***Ab.:*** Tenê ne dîtin Serokê min, rewşa min a negirtina ser xwe hebû Serokê min. Ger bê dîtin jî, xwe şayanî wê nedîtinê, amade hîsnekirin, hema bêje dibe rewşa neqebûlkirinê.

***---.:*** Wê demê ev dibe çi? Di wê derê de cudabûneke mezin a kesayetiyê heye?

***Ab.:*** Li beramberî şoreşê, jiyana şoreşgrî yanî li beramberî guhertinê berxwedaniyek heye, li beramberî ketina nava jiyana pergalê berxwedanî heye.

***---.:*** Dema ku em hewl didin qonaxên pir girîng bafirînin muhafazakarî, nebesiya eleqe yan jî nebesiya tevlîbûnê bi awayekî vekirî derketiye holê. Her ku diçe li milê rastê mayîn,

paş de mayîn bi xwe re gelek tişt li paş ve hiştin niha baştir tê dîtin. We ev fêm kir?

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Rêzdariya me ya mezin li beramberî jiyanê, bi azweriyeke mezin a li beramberî jiyanê ew ji aliyêkî ve eciqandin, ji aliyekî din ji azadkirin û dewlemendkirin di nava me de bi kedeke mezin, şêwaz tempo dema ku pêk dihat piraniya kesên ku bi me re tenê bi temaşekirinê re sînordar man yan jî pir lewaz, li kêlekê sekinîn.

***Ab.:*** Raste Serokê min, piraniya xwe em bi temaşekirinên ve sînordar man û yan jî bi awayekî lewaz li kêlekê sekinîn.

***---.:*** Bê rengbûn, her ku diçe şêlo dîtin, lêdana dil sekinîye. Ya rast milîtanî di asta herî kêm de qet nebe bûna şopdarekî mezine. Madem biryarek derketiye holê, wê demê ji bo pêkanîna pêwîstiya vê, nirxên ku pê ve girêdayîye baş temsîlkirin û bûna şopdar dibin berpirsyariyên milîtan. Bi çavdêriyeke ji rêzê jî encamên girîng derxistin gengaze. Bêguman çawa lê tê nerîn girînge, çavdêrîkirin, şopdarî girînge. Di demên herî hestyar de nêzîkatiyên pir balkêş hatine raberkirin; ji bo yê ku baş dişopîne, baş fêm dike çavkaniya hêz û dersên mezine.

***Ab.:*** Ji bo her demê derbasdare. Di wan şertan de weke ku dê neyên fêmkirin dihat dîtin, lê dîsa jî ketina nav biryareke jiyanî û arasteyên jiyanî bûn. Bi ser pirsgirêkan de çûyîn û ji pirsgirêkan rev di vê derê de pir zelal ji hev cuda dibin.

***---.:*** Yek du mînakên şênber bide. Li gorî te biryara herî krîtîk û şêwaza xebata balkêş çawa hat meşandin?

***Ab.:*** Mînak derketina dervî welat dibe biryareke girîng. Dîsa pêwendiyên bi Fatma re biryareke polîtîke.

***---.:*** Wekî din?

***Ab.:*** Biryardariya sala 1982'an biryardariyeke balkêşe. Ji ber ku pêvajoyeke bi nediyariyan ve dagirtî bû. Pêvajoya piştî wê dîsa pir hûrûkûre û dibe pêvajoyeke hertim biryaran dixwaze. Di demên ku şer kûr dibû de, di nava xebatên rêxistinê de biryarên

ku hatine girtin hene. Demeke pir dirêj sebirkirin, bi carekê wisa çalak, xwe gihandina biryardariyeke misoger dibe pêvajoyeke wisa.

Pêvajoyên pêşketinên rêxistinî, gelek caran ji aliyê hinekî din ve dikare neyên fêmkirin jî. Yanî sebir hertim weke rêbazekî bê şopandin hat diyarkirin. Ew rewşa biryardariyê rêbazekî ku dê li ser her tiştî bê pêkanîn dişopîne. Pêvajoya rêxistinî ya sala 1978’an wê demê despê dike, heta sala 1982-83’an û heta roja me ya îro jî tê dewamkirin. Nêzîkatiyek, rêbazek, weke şêwazekî, ya rast têkoşîna li Hîlwanê biryareke cidî ye. Li gorî rewşa wê demê, ketina nava şerekî çekdarî bû. Ew jî dibe biryareke cidî. Bêguman divê ku li gorî mercên wê demê bê nirxandin.

***---.:*** Divê ku tu bikaribî hinek taybetmendiyên esasî bêjî. Yanî ez çawa dikarim wisa bim? Di vê wateyê de pênaseyekê bike. Çima wisa dibe?

***Ab.:*** Hinek sedemên ku dihêle wisa bibe hene; hêza hezkirinê heye, pêşbînî heye, tempoya xebatê heye.

***---.:*** Hîn esasî, yê ku vî şêwazî kartîne çiye?

***Ab.:*** Armancek heye Serokê min.

***---.:*** Di zarokatiyê de mirov nikare bêje armanceke wisa diyarker heye.

***Ab.:*** Azweriya jiyanê…

***---.:*** Di zarokatiyê de çima şêwazekî wisa dicerîbîne gelo?

***Ab.:*** Weke pêwîstiya jiyanê derketiye holê. Bi azwerî nêzîkî jiyanê bûyîn û hewldana watedayînê di astên pir balkêş de ne.

***---.:*** Ji wan deman ve azweriya jiyanê çawa xwe nîşan dide? Dema ku her kes dikeve rêyekê rêya ku ez ketimê taybetmendiya wê ya sereke çiye?

***Ab.:*** Di nava jiyanê de ji hişmendiyê re zêde cîhdayîn heye.

***---.:*** Ezmûna min a yekem hevaltiyê çawa dikare bê ravekirin? Çima min pêdiviya pêşxistina hevaltiyeke wisa hîs kiribe?

***Ab.:*** Hinek pêşdarêzên weke nirx tên dîtin hene, li beramberî wan hişmendî heye, ya din jî aliyê pêşxistina pêwendiyê yanî daxwaza bûna hêz heye.

**---.:** Lê şêwaza ku ez diceribînim girînge. Her kes jî dikare hevalê xwe hilbijêre.

***Ab.:*** Di vî şêwazê hilbijartinê de hemû taybetmendî hene. Rastî diyardeya hevaltiye xweber heye. Gelek caran mirov nikare hilbijêre jî. Yanî di zaroktiyê de di mijara hevaltiyê de pêşketina xweber pir zêde ye.

**---.:** Demekî hîn ji wê demê ve armanc heye, bawerim hinekî jî ew meşên çiya di cewherê xwe de dibin meşên hêz, weke dibin bijareya rêxistinekê.

***Ab.:*** Helwestên astengker hene, dibe derketina li beramberî wan.

**---.:** Sedemê lihevnekirina bi malbatê re ya bi şîdet dibe ku çi be?

***Ab.:*** Di malbatê de lewaziyek heye Serokê min. Ya din jî bi taybetmendiyên kevneşopan ve pir girêdayî ye.

**---.:** Divê ku min rastiya malbatê fêm kiribe. Malbateke çawa û çima aciziyên min li beramberî malbatê pir zû û zêde pêşketin?

***Ab.:*** Nakokiyên nav malbatê û lewaziyên wê pir vekirî dibînin.

**---.:** Çiye taybetmendiya malbata me ya sereke li gorî te? Rastiya civakî ya giştî li ber çav bigire û wisa rave bike? Hevalên din dikarin mafê axaftinê bigirin.

***Ab.:*** Yên ku nakokiyên xwe yên pir zêde hene, lewaziyên xwe hene, lê di nava wan de yên ku ji xwe re di nava pergala jiyaneke wisa de dijîn serwerbûn, rewşên xwe têr dîtinê. Ev nêzîkatî, bawerim pratîk xwe dayîna jiyankirina şexsan jî bi xwe re aniye.

**---.:** Di navbera derketina min û malbatê de pêwendiyeke girîng heye. Vegotina vê girînge, famkirna we ya vê dê rê li ber fêmkirina we veke. Di vê wateyê de kî dikare nirxandineke hîn bi wate bike? Heta pirs jî dikarin bên pirsîn. Di vekirinê de fêde

heye. Hûn dizanin derketina min pir gîrînge. Îro tenê malbateke pê bandor nebûbe nemaye. Madem hemû malbat gelek trajîkin, bi awayekî serûbinî hev jê bandor bûne, wê demê min çawa karî ji nava malbateke wisa derketinê bikim?

***Re.:*** Serokê min,  kesayetiyeke xwe azad kiriye di holê de ye.

**---.:** Li rewşa min a niha nenêre. Ez wê demê yan heft, yan jî di heşt saliya xwe de me.

***Re.:*** Yê ku pêdivî bi azadiyê dibîne, îsyana xwe ji malbatê dide despêkirin derketin, lêgerîn û helwest tê dîtin.

**---.:** Ez çawa dikarim bidim despêkirin? Yanî tevî ku zarokek ji hemû aliyan ve hewceyî malbatê ye, li beramberî malbateke ewqas lewaz ez çawa derketinê ferz dikim? Em hinekî din bi kûrahî fêm bikin.

***Re.:*** Bav bê renge, rewşa li beramberî pirsgirêkan nebûna çareserî heye. .

**---.:** Divê ku di bav de asta îktîdîarê bê fêmkirin?

***Re.:*** Raste Serokê min.

**---.:** Dibe ku rewşeke îktîdîarê ya çawa hatibe jiyîn?

***Re.:*** Di asteke hîn nizm de. Di vê rewşê de di bin serweriya dayikê de mayîn mijara gotinê ye.

**---.:** Min ew hinek vekir. Mirov nikare bêje ji hemû aliyan ve serwer bû. Ji hemû aliyan ve derbaskirina îktîdîara bav û serwerbûna îktîdîara dayikê jî nîne, rewşeke bi nakok tê jiyîn.

***Re.:*** Yek ev rewş heye, yan din jî pêwendiya yekem ya hevaltiyê ku hatiye damezrandin heye. Ya rast ev pêwendiya hevaltiyê di heman demê de li beramberî pergalê, jiyana di nav de pêwendiyeke bertekê ye. Li beramberî malbatên ku di nava pevçûnê de ne pêşxistina pêwendiyên mirovên di temenê zarokatiyê de heye.

**---.:** Di vir de ji destdayîna hêza ber bi xwe ve kişandina malbatê û ji destdayîna wê heye û ev jî risteke girîn dibîne.

***Re.:*** Raste Serokê min. Ya rast ew hêza ber bi xwe ve kişandinê qebûl nekirin mijara gotinê ye.

***---.:*** Hêza ber bi xwe ve kişandina zarokek ji dê û bavê xwe bibîne, asta eleqederbûnê hema bêje ji aliyê zarokekî ve jî di asta ku qet neyê fêmkirin de, gihandina asta nefretê, dibe ku ez ber bi lêgerina hevaltiyê ve biribim.

***Re.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Yanî ji destdana malbatê ya hêza ber bi xwe ve kişandinê sedema herî sereke ya derketina min e? Yan jî dibe ku ya derketina min be.

***Re.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Pêwîste hûn hinek taybetmendiyên din rêz bikin. Belê Ha?

***Ha.:*** Li gorî min bi mantiq tevgerîn heye.

***---.:*** Ez wê demê zarokekî dîn û har bûm, li mantiqekî wisa di min de negere.

***Ha.:*** Yanî nêzîkatiyên bav bi vî mantiqî re derbaskirin, rewşa di çarçoveya mantiq de pirs pirsîn heye. Dema ku bav dinirxîne, lewaziya bav di mantiq re derbaskirin û bersiv dîtin heye.

***---.:*** Bavekî wisa ye ku, bûyera ku jê re tê gotin îktîdîar di kesayetiya xwe de daxistiye binya sifirê. Li gorî pîvanên gund bavekî pir başe!

Bêguman divê ku gundê me jî hinekî bê naskirin. Ne gundekî ku ti axa tê de serwere. Asteke pêwendiyên di navbera malbatan de hevsengî bi giranî hatiye avakirin û pergalek heye. Gundekî hejar, lê ji otoriteya axayan dûr. Gundekî pêwendiyên eşîretî jî tê de ji hev ketine. Malbatên wisa jî baviksalarin. Bavekî ku nikare nûnertiya pergala baviksalarî, zilamsalariyê bike û bê îktîdîariya wî li gorî hişmendiya wê demê berevajî tê û di encam de lêpirsîn tê jiyankirin.

***Ha.:*** Ev di mînaka çêçikê de jî heye. .

***---.:*** Mînaka çêçikê di derbarê dayikê de ye, gotina di derbarê çêçikê de hîn jî di hişê min de ye. Huquqa dayiktiyê li ser min

ferz dike û ez jî pir bi bandor bersivê didim. Ez bawerim di wê mijarê de derketineke cidî li dijberî kevneşop heye.

***Ha.:*** Yanî zarok anîna dinyê, lê pirsgirêkên zarok jiyan nekirin, daxwazên wî yên jiyanê pêk ne anîn û li beramberî vê helwestek tê raberkirin.

***---.:*** Belê, min ew nakokî girtiye. Ev jî dide diyarkirin ku hêza hişmendî û ya mantiq pêşketiye.

Bêwatebûn, bê îktîdîariya di malbatê de min di temenekî biçûk de ber bi fêmkirina cewherê xwe ve birîye. “ *Pêşwext xwe kom bike, mantixê xwe bikar bîne û yên ku xwe bê watekirine esas negire.”* Vaye min ber bi nirxandineke wisa ve dibe.

***Ha.:*** Ya din jî bûyerên derdorê lêkolînkirin, hinekî jî daxwaza fêrbûna wan heye. Lê hîn jî bersiva bûyeran neditiye. Di civakê de, mirovan de ew bûyer, pirsgirêk nedîtin, yanî nebûna çareseriyê, lê tevî vê jî rewşa dîtina çareseriyê heye.

***---.:*** Bê watebûn, hebûna kaosekê di nava malbatê de min ber bi watebûnê ve dahf dide. Lê dema ku bersiva vê di derdora ku tê de me nabînim, îhtîmaleke mezin rewşa bêçareseriyê, rista teşwîqkirina ber bi îsyanekê dilîzin. Di pêşketina kesayetiya îsyanker de dibe bandora vê bê watebûnê û di gund de bersiveke bi wate nedîtinê hebe. Di encam de ber bi ol ve çûyîn jî ez *bawerim* çavkaniya xwe ji vê bê watebûnê rizgarbûnê digire.

Em vegotinê kûr bikin. Belê Ce?

***Ce.:*** Serokê min ya din bûyereke tê dîtin, xisûsa ku em dikarin weke benê xwe qetandinê diyar bikin. Yanî ne malbat ne jî gund qebûlkirin û bi wateya îro ya ku em nikarin bêjin azad jî, lê awata jiyaneke azad heye. Xwe ji bandora wan rizgarkirin, dema ku ev nebe jî hinek mirov li derdora xwe komkirin û rewşa hevalên xwe yên zarokatiyê pêşxistinê heye.

***---.:*** Ev bi taybetî bi vî rengî tê ziman; “*Te benê xwe qutkir”* li gorî ku nirxandineke pêşwexte, îhtîmaleke mezin civata gund wisa dibîne ku ez ji kontrolê derketime, eşkereye ku ev rewş rê li

ber nêzîkatiyên henekên xwe bi min bikin re jî vekiriye. Hemû henekên gund, rexneyên wan li ser xwe kom dikim. Û ev jî her ku diçe dibe sedem ku hêrsa min li beramberî civata gun mezin bibe û di ketina xeteke îsyanger de rist bilîze.

Nemaze dema ku min li beramberî malbatê îsyan kir, di gund de min pêdiviya pênabirina derdorekê, yan jî saziyeke gund nedîtiye, ya rast berteka min tenê ne li beramberî malbatê ye, dide diyarkirin ku li beramberî hemû gunde.

***Ce.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Ya rast em hinekî civakî bûne. Tenê ne îsyana ji bo malbatekê ye, îsyaneke diyar ya civakî ye.

***Ce.:*** Ya din jî nakokiyên din heye. Nakokiya Kurd-Tirkan, nakokiya Ermeniyan.

***---.:*** Na ew zêde ne mijara gotinê ye. Ew bûyer pêvajoyên piştre ne. Yên li gundên din, pergala li Cîbînê li gorî ya gundê me pêşketîtir bû. Çavdêriya wê heye. Îhtîmaleke mezin ez wê demê diçim dibistana seretayî. Dibe ku hêza kêşana wî gundî ango bandor, hinekî din "*Civakeke pêşketî heye"* ji vê bangawaziyê re ji ber ku bersiv ava dikir be. Ev rewş jî ji bo ku ez li beramberî gund, civata gund îsyan bikin dikare weke serdemeke din a îsyanê bê nirxandin.

Em lêkolînkirina tevgerînên min ên wê demê bidomînin. Di wê demê de xaleke ku divê li ser bê rawestandin jî îsyana li beramberî bira heye. Li gorî we ez çima wisa serde çûm?

***Ce.:*** Serokê min, bav ji xwe serdestiyê ava nake. Di nava malbatê de piştî ku li beramberî bav û bira îsyan kir û şûn de, xwezayî li beramberî ferdên din ên malbatê jî îsyan pêş dikeve. Bi vî alîve li beramberî bira jî îsyan pêş dikeve û qebûl nake. Yanî rastiya ku di binê vî şerî de razayî ye; ji ber ku parçeyek ji îsyana ku li beramberî malbatê pêş ketiye.

***---.:*** Min çîroka rez ji we re vegot; çima li nav rez min şerekî wisa da despêkirin? Divê mijarê de yên ku fikra xwe heyî hene?

***Rı.:*** Serokê min, li vir kedek û xwedî derketinek heye; nemaze li dijberî bêrêziya kedê jî derketinek heye.

**---.:** Ev bi asanî dikare bê gotin. Ez heta dawî rez sererast dikim, heta pileya dawî baş û xweşik rêkûpêk dikim; ew jî tenê xwe dispêre taybetmendiya endamekî ji malê ye bi mîratgeriyeke erzan dixwaze xira bike. Nemaze dijderketineke bi vî alîve pêş dikeve; ev helwest, mirov dikare weke mînaka şerê xwedî derketina li kedê jî pêş de bajo.

***Rı.:*** Raste Serokê min.

**---.:** Divê ku mirov hîn bi kûrahî rave bike. Ji ber ku gelek encamên girîng ê ku vê rê jê re vekirine hene. Bi tûndî ez hewl didim wî ji rez bi qewitînim û min qewitand jî; dibe ku ev qewitandinê li ser min bandoreke çawa ava kiribe? Bi vê helwesta qewitandinê min çi pêk aniye ev girînge. Ji ber ku piştî wê jî gelek tevgerînên min ên wisa hene. Beriya her tiştî darbeye li ser mîratxwariyê û ji kedê re rêya bûna îktîdîarê jî vekirî dihêlim. Serbenekî girînge. Ew tenê li ser esasê xwe sipartina malbatê, mîratxwariyê tê derfetê ku min bi kedeke mezin amade kiriye teqez li ser xwedayîna jiyankirinê û serde jî dixwaze xira bike. Ger ev bira jî be mîsoger destura vê ne dayîn û qewitandina wî tê fêmkirin ku ferasetek radîqal û şoreşgeriye.

***Re.:*** Serokê min, ya din li vir nakokiyên heyî bi awayekî radîkal çareserkirin û bûyera madîkirina nakokiyan heye. Vaye serdeçûyîneke wisa ye.

**---.:** Tu dibêje rêbaz radîkale?

***Re.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Bira be, kî dibe bila bibe pêwîste li beramberî kedê rêzdar be. Ger bê dîqatkirin ne şerekî ji ber sedemekê derketiye holê ye. Encamên wê heta dawî berfireh dibin û dibe gaveke di xalekê de ranaweste. Min ji kîderê girt û bir kîderê. Em vê pêvajoya hefteyekê bînin ber çavên xwe. Em îsyana hefteyekê tahlîl bikin.

***Ab.:*** Beriya her tiştî ezmûn û hêza şerkirinê qezenckirin heye. Ger di cihekî de xwe gihandina encam hebe, bi hêza ku ji wir hatiye qezenckirin, lêgera qezenckirina qadên nû, hertim serde çûn û şêwaza guhertinê derdikeve holê.

**---.:** Feraseteke niha jî li ser min serwere. Ceribandineke pir cidî ye. Şer dijwar dikim. Bira di rewşeke ne mafdar de digirim û bi ser de diçim. Ew jî diçe xwe davêje ber lingê malbatê, bav bangî hawara xwe dike û êdî hêzekî îktîdîarê yê wisa li pêşberî wî ye. Çi dewleta Tirk, çi bavê wê demê dikeve dewrê, li beramberî wê serî tewandineke herî biçûk jî nine. Di naverasta gund de li dijberî bav şerekî keviravêtina dijwar heye. Ev ne pevçûneke herkes bigire ber çave. Min şerekî kevir avêtinê ya bav çawa girt berçavan? Vê bi li berçavgirtina rastiya civakî ya wê demê divê ku çawa bê şîrovekirin?

***Ce.:*** Bavê ku dixwaze astengiyê li beramberî daxwaza bûna serdestiyê ava dike dema ku pêk tê ew jî neguhbarkirine. Jixwe piştî ku ew jî nehat gohdarkirin êdî çare li pêketina hinek tiştên din pêk tê, piştî wê dê derketina bajêr çêbibe. Ya din bûyera qezenckirina kedê heye Serokê min.

**---.:** Yekem ez şer qut nakim û navêjim. Xala ku herî zêde bê fêmkirin jî ev e. Ez di xalekê de nadim sekinandin; taybetmendiya min a ber bi hişmendiya xwezayî ve birinê xwe di helwesta min a; "*ez vî şerî li vir bi dawî nakim*" de bi awayekî vekirî xwe dide nîşandan.

***Ab.:*** Li gorî her rewşekê rêbazekî nû girtin, ceribandina şêwaza şerekî nû û li cihekî teqez rewşa karanîna hizayê heye.

**---.:** Şerê ku bi bira despêkir û bi binxistina wî re bavê ku dikeve dewrê û ji min re dibêje; "*xwediyê rez ez im tu kîye?*" derdikeve pêşberî min. Lê ez şêwaza wî jî rast nabînim û jê re dibêjim; "*Tu bê mafiyê diparêzî, pêwîste tu wî neparêzî, ji ber ku tu wî diparêzî ez ê şerê xwe bi te re jî bidomînim.*" Lê pir eşkere şerekî xetere; ji ber ku şerekî kevir ê wisa li beramberî bav, di

naverasta gund de heta radeya dawî ecêbe. Ev hilweşîna kevneşopeke mezin a malbatê û gunde, li beramberî hemû bavan îsyaneke.

***Ab.:*** Ez bawerim qutbûna ji wir xwe gihandina hişmendiyê ye.

***--.:*** Qutbûneke mezin. Li dijberî otoriteya bav dijderketineke wisa û ev hemû jî li pêşberî çavê hemû gundiyan kirin ne bûyereke asan, ji rêzê û hêsane. Di encam de hemû rabûne ser piyan. Bêguman wê demê bandorên pir mezin ên ku di ruhê zarokekî de avakirine mijara gotinê ne. Bawerim otoriteyek wisa hildiweşe. Ji aliyekî ve jî dibe şerekî pir cidî yên çînî ev.

***Ab.:*** Di asta civakî de dibe serdestiyek.

***---.:*** Li baremberî curekî serdestiyê serî rakirineke mezin bi şerekî pêşwext didim despêkirin. Ez bawerim min rewşa bav jî hinekî fêm kiriye, hebûna bav çiye? Wê pirs dikim û hevsengiya hêz jî hesab dikim. Di gund de tenê ye, birayê ku diparêze lewaze, bi dayikê re nakokiyên xwe hene. Mînak dayika min di vî şerî de ne di asta ku fonksyonekî îfade bike de ye. Yanî di asteke lewaz de bi ser min de tê. Di vir de ya girîng, weke min got di nava gund de pêkhatina şerekî wisa û şêwaza ku piştî vê ez digirim, mesele xwe gihandina min a xezîneya wî ya pereyan.

Ger bê dîqatkirin xwe gihandina min a xezîneya pere weke çalakiyeke şoreşgerî ya gelemperî kirinê ye. Em bavê min bixin şûna dewletekê, bi otoriteya wî ve girêdayî ya din jî xezîneya wî heye û ez yekser berê xwe didim xezîneyê. Çima tiştekî din nayê aqlê min tenê xezîne tê aqlê min? Bawerim di vir de îsabetek heye. Bi vî awayî berê xwe didim hêza pere ya otoriteyê.

***Ab.:*** Hem ji aliyê lewazkirina yê beramberî xwe, hem jî ji aliyê hêz bi xwe dayîna qezenckirinê bi vî rengî şer gavekî din ber bi pêşve birin pêk tê.

***---.:*** Hêz bi xwe dayîna qezenckirin û yê beramberî xwe lewazkirine? Di be gaveke din pêşveçûna vî şerî. Dev ji tekoşînê bernadim, şêwazekî din dixim dewrê û pêş de dibim, vê digirim

berçav. Li gorî wê demê pereyekî mezine, deh quruş. Mirov dikare bêje çalakiya gelemperîkirina şelandineke di salên 1970'yan de ya li Tirkiyê ye. Ne gengaze ku di rewşên asayî de ewqas pere bikeve destê zarokekî. Ti bav jî deh quruşî nade destê zarokê xwe. Sal îhtîmaleke mezin 1960 be. Pereyekî cidî ye. Bi wî tu dikarî heta Enqerê biçî. Gaveke encamên wê yên pir cîdî dikare bibe; ji ber ku ev, dibe bilindkirina îsyanê jî. Piştî vê xalê û şûn de êdî derfetê lihevkirinê jî namînin. Ketina şerekî bi keviran û piştî wê destdayîna ser xezîneyê! Ma êdî li malê cihê min heye, heta ez ê bikaribim li gund bimînim?

Di vir de ya din encamê sêyemîne?

***Rı.:*** Serokê min, ya din beriya îsyanê paşvekêşan pir girînge. Dema ku paşve dikişê ev derketin û pîlan tê kirin.

**---.:** Paş ve kêşan heye, lê ne paçvekêşaneke di wateya radestbûnê de ye, heta radeya dawî hostayane ye. Di pêvajoya paşvekişandinê de ji bo gaveke din ber bi pêş ve bê avêtin bi dizî dikevim malê û wî pereyî digirim. Ez tam nikarim bav jî binpê bikim. Ya rast ne ku ji ber hêza min têra binpêkirinê nake, bawerim hinekî rêza min heye, dibe ku bi serdeçûn û ji hemû aliyan ve ew binpêkirin ji min re zêde hatibe. Bi rastî ev jî balkêşe. Ji xwe ew jî zêde bi ser min de nayê, westiya ye. Lê hêrs jî ewqas mezine ku, ez rêya sêyem diceribînim û bi dizî dest davêjim maliya wî. Kes nabihîze, nabîne. Piştî wê gava çarem a berteka li beramberî gund pêk tê. Çima ez li gund ranewestîm û min bêrê xwe da gaveke hemû gund digire dijberî xwe?

***Ab.:*** Edî piştî wê pêvajoyê li gund mayîn ne gengaze. Tevdirê meşandina şer jî hatiye girtin; yanî ew hêza ku bikaribe şerekî bi vî şêwazî bimeşîne, bi derfetê pere hatiye qezenckirin.

**---.:** Bi destxistina derfetê pere bi îsabete. Ya din mezinbûna îsyanê heye, min gaveke pir cidî ya şer avêtiye; nirxandina min a bi îsabet heye. Hinekî pere ji min re pêwîste, min ew jî ditiye û bi vî rengî giştime asta ku bikaribim derketineke girîng bikim. Ya

rast ev di hemû gavavêtinên mezin ên têkoşînê de rêya ku pêk hatiye.

***Ab.:*** Di wê rewşê de jixwe li gund nayê mayîn.

***---.:*** Hemû piran davêjim.

***Ab.:*** Ger hûn navêjin tê wateya radestiyê.

***---.:*** Tabî pir girînge. Li gund mayîna min dihat wateya radestiyê. Ez ê bi lez dûrkevim, ezîm, vîn û ya din jî hêrs ewqas mezine ku, lihevkirinê qebûl nakim. Ev, ez bawerim bi min re li gorî şertên gund taybetmendiya îsyanger di asta pêş de pêşketina wê teqez dike. Bifikirin, di wê demê de bajarê herî pêşketî yê derdorê Nîzîp tê aqlê min û êdî hedefa min xwe gihandina wire. Mirovên me jî hene li wir. Di aso de şoreşgeriyeke bi Nîzîpê re sînordar û xwe davêjim wir. Êdî ev qonaxeke dawî ye, ev tê çi wateyê?

***Ab.:*** Dibe cihê herî dawî tê zanîn, jê wêdetir hîn nayê zanîn.

***---.:*** Qet nizanim ne wisa?

***Ab.:*** Dibe cihê ku herî dawî çûyîn çêbibe û dixwaze xwe bigihîne wir.

***---.:*** Yanî derfet heta dawî nirxandin û dixwazim heta dawî biçim û xala herî dawî ku dizanim ewdere. Jixwe cihekî min ê din jî nîne. Yê ku ez tenê nas dikim gunde yan jî herî zêde çend gundin. Qut dibim. Ji civateke gund qut dibim û berê xwe didim civata bajar û qutbûnê pêk tînim û hêmana gava civakî ku hatiye avêtin xwe di vir de nîşan dide. Ji hemû aliyan ve şerekî civakiye. Tê biçe bajêr çi bike? Tê şansê xwe biceribîne. Tabî bi wê lezê du roja genim dirûna min heye. Li wir çûyîna gel mirovên xwe ji xwe re qebûl nakim. Teqez pêdiviya karkirinê dibînim; ev jî pir girînge. Pir bi asanî dikarim biçim gel mirovan û li ser esasê xwe sipartina wan jî dikarim bijîm.

Di vir de ez encamekî xwezayî yê din derdixim holê. Dibêjim; “*Madem tu li dijberî pergala mirovan derket, dijberî malbatê derket tê erzan xwe nedî jiyankirin”*

***Ab.:*** Jixwe bi wî rengî bûya dê ew bûyerên din pêşneketana.

***---.:*** Du rojan dirûn girtina berçavan pir girînge. Ji ber ku bi qasî tê bîra min cara yekem min ber bi encamê; "*divê ez xwe bidim jiyankirinê"* ve birim.

***Ab.:*** Jixwe despêka şer jî ji vir derdikeve holê. Ev bertek li dijberî xwe sipartina keda hinekî din kirin û dayîna jiyankirinê ye.

***---.:*** Bertek, ev jî li beramberî feraseta mulkparêzî, pêwendiyên mirovan pêş dikeve û encama mezin ku afirand; tê bi keda xwe jiyan bike. Dewê ku me vedixwar nîv bi nîv axa sor bû, hema bêje dewekî kelî bû. Ez bawerim hemû cidiyeta jiyanê jî min wir dît.

Erê di vê xalê de hinek encamên giştî jî dikarin bên derxistin. Encamên vê îsyanê, bi îhtîmal şopên divê li şûn xwe hiştibin çine? Hûn hatine vî temenî hîn hûn fêm nakin. Di binê pergala kevneşop de îro gelek tiştên ku piraniya we nikarin bikin hîn di wî temenî de pêkanîn, min çawa cesaretî vê kir hinekî jî derxistina zanînê û dibê bê fêmkirin.

***Ab.:*** Serokê min, di encam de binketineke bav di malbatê de heye. Ji ber ku serweriya xwe ji dest dide, pergala desthilatiyê diqulipe, parçe dibe.

***---.:*** Sê.

***Ab.:*** Weke tê xwestin ber bi encam ve naçe. Hîn nediyarî hene.

---.. Civak ewqas bi bandore ku, di vir de dişibe îsyana Spartekus?

***Ab.:*** Hîn hişmendî nîne Serokê min.

***---.:*** Zanîn nîne, hêzeke xwe bispêrê nîne û şerekî bi tena serê xwe ketiye navê heye. Wê demê li gund tenê hevalekî min jî nebû û vaye ev rewş piştre min bi dijwarî ber bi xala; "*Pêwîste tu hevalan bibîne"* ve dibe. Dibe ku vê jî teqez rê li ber pêdiviya rêxistinê vekiribe.

***Ab.:*** Afirandina hêzekî bi nirxê ku pê re tevbigere û xwe bispêrê.

***---.:*** Hem jî wê bi dijwarî dahf de.

***Ab.:*** Hevaltî herku diçe dibe siyaset, rêxistin.

***---.:*** Ger bê dîqatkirin me xwe bi xwe civakeke gund hemû kevneşopên wê serûbin kiriye. Vaye zarokatiyeke wisa ecêbe. Rêya ku min dîtiye radîkal û şoreşvane, lê hem mercên min ên objektîf, hem jî mercên civakê bi qasî ku serkeftinê bîne ne bi hêzin. Lê di nava xwe de îsyaneke mezine.

***Ab.:*** Lê encamên girîng derdikevin holê. Pergalek û kevneşopan parçe dike û di nava xwe de ji hemû aliyan ve ber bi encam ve naçe, çareseriyan destnîşan dike, lê ya heyî jî parçe dike.

***---.:***Teqez kesayetiyeke şoreşvan ya pir girînge. Gelo bav çi fikirî? Ez bawerim wisa fikiriye ku bi rewşeke pir xirab re rû bi rû ye. Xemgîn bûye, aciz bûye; li beramberî vê çalakiyê gelo çawa fikiriye divê ku mirov li ser raweste.

***Ab.:*** Eşkereye ku wisa fikiriye hemû tiştê xwe ji dest daye Serokê min.

***---.:*** Erê, gelo pêfikiriye ku neheqî li min kiriye?

***Ab.:*** Dibe ku hewl dabe fêm kiribe, ji ber ku bûyer kûre .

***---.:*** Pir girînge, lê dibe ku jê re ecêb hatibe ev jî gengaze. Ketina min a nava çalakiyeke wisa teqez ew serûbin kiriye. Piştî wê li hev kir, aşîtî kir nayê bîra min. Berfirehiya wê çalakiyê jî encax ewqas bûya. Ji vê zêdetir kirin ji aliyê wan mercan ve derfet nîne. Ne cihekî dibînim, ne jî derfetekî min heye. Lê pir balkêşe, li beramberî deh quruşî, deh quruş qezenc dikim. Yanî didim diyarkirin ku ez ne mîratxurekim, hema bêje bi keda xwe, xwe dayîna jiyankirinê didim îspatkirin.

***Ab.:*** Evder pir girînge Serokê min.

***---.:*** Ev piştre xala ku ez şandim gund ne ji bo lihevkirinê; “ *Min ser xist, bi keda xwe pêk anî”* ve bir rewşeke wisa bû. Ez hîn jî wê dibihîzim.

***Ab.:*** Serdestiyê dide beramber.

**---.:** Tabî, li şûna; "*Te bi perê me ev kir û vaye tu girêdayî ye"* vê dayîna gotinê; "*Na, binêrin min bi xwe jî deh quruş bizat bi keda xwe qezenc kir û ez di vî hêzî de me"* vê dibêjim. Vaye di vir de xwe îspatkirina mezin pêk tê.

***Rı.:*** Serokê min, ya din jî xwe sipartina hêza xwe hîn di wê demê de pêk tê. Mesele li Nizîpê li şûna xwe sipartina mirovên xwe, xwe sipartina hêza xwe û hewldana serkeftinê heye.

**---.:** Dizanim ku min tenezil nekir. Min xwarina wan dixwar, lê germahiya xwe ya berê jî ji dest dabû. Teqez bi pêdiviya xwe sipartina hêza xwe dibînim. Ji ber ku li dijberî rêgeza malbatê derketin çêbûye û ew rê hemû min bi lingên xwe derbas kiriye. Madem cihê wê hatiye ez vê jî diyar bikim; şêwazê meşa min hîn jî di bîra min de ye, çar sahneyên wê hene û heta niha jî hemû di bîra min de ne.

Dema ku gund li ber çavên min winda bû, dema ku cara dawî zivirîm û min lê nerî hêrs û kîneke mezin û ji çavên min mîna baranê hêsir dibarîn. Dema ku ji gund veqetiyan rewşa min a ruhî bi bî rengî bû. Piştre ez ê gundê despêkê derbasbikim, lê -Hûn dikarin bi gêrîlatiya xwe jî re rû bi rû yê hev bikin- ez ewqas ji dengê kuçika ditirsim, ji bo ku deng dernekeve heta dawî hestyar û weke ku ew îsyankar ne ez bûm ji kûr û hêdî tevdigerîm. Dema ku gundî min dibînin qet ferq nakin; "*Ev îstankare, di rewşeke rabûnê ya mezin de ye, em vî zarokî bigirin"* nakevin nava hizrandineke wisa. Ev taybetmendî pir girînge. Wisa weke ku tiştek nebûye tevgerîna min, heta dawî xwe dispêre hesaban û tevgereke bi zanîne. Tevgerên ku ez raber dikim di ziraviyeke neyê bawerkirin de ne.

Di ber dikanekê re derbas bûm, heta tê bîra min bi kurişek-du kurişan tiştin kirîn û xwarin, lê dikan hîn jî di bîra min de ne. Dema ku di berde derbas bûm gundiyan tiştek negot. Ji ber ku min pir zêde xwe xist rengê wî gundî. Li gorî nêvengê reng dayîn yan jî objektîfbûyîn. Ji ber ku ger min tevgerîneke îsyana xwe

dide diyarkirin raber bikira, teqez wê rêya min bigirtana. Herî kêm dikarîn bêjin; "*Ev zarok diçe kîderê"* ne wisa?

***Ab.:*** Li gorî wê dê tevdîr bigirtana.

***---.:*** Vaye ji bo vala derxistina wê tevdîrê bi awayekî neyê bawerkirin hem veşartî, hem jî bi şêwazê rengnedayînê rewşa derbaskirina wî gundî heye. Encam; serkeftineke heta dawî aqilane hatiye destxistine. Di ketina gundê duwem de jî heta dawî aram bûm, ji ber ku min dizanî ez ê li beramberî mirovên asan rû bi rû bêm. Ez nadim diyarkirin ku ez îsyagerekim, ev li gorî rêgezeke veşartîbûnê tevgerîne. Heta pileya dawî rehet bûm. Ger wisa nekim dê min li erebê sixwar nekin, henekê xwe bi min bikin yan jî herî kêm wê dîqat bikin. Hewl didim dimenê; "*Zarokekî bi aqil karê xwe dizane, herhal de diçe karê xwe û dikare ser jî bixe"* didim avakirin. Ez wê pêgiştinê jî li xwe tînim û bi vî rengî bi asanî digihêjim pirê. Tabî piştî giştina pirê ketina nêvenga bajêre û hema bêje xwe winda dikim. Hema bêje weke gêrîla, mîna masiyê ku di nava behrê de avjeniyê dike, ew der jî nêvengeke rehet ji min re pêk tîne. Li şûna nêvenga gund a rût, teng nêvenga bajêr ya ku derfetê çavdêrîkirina xwe ji min re pêşkeş dike hinekî be jî min rehet dike.

Siwarî erebê dibim û wisa digihêjim rawestgeha dawî ya şoreşê. Vaye ya ku li vir girînge şêwaze. Ez bawerim hûn ê pir bitirsiyana. We yê her der bi ser xwe de baniya. Jixwe rewşa min a yekemîn li gund wisa ye. Hemû tiştên îsyaneke tîpîk raber dikim. Jixwe di wan her du gundên din de îsyangeriyê de, li cihekî serbenê veguhertina gêrîla didim. Ev heta pileya dawî vekiriye. Jixwe li wan herdu gundên din ger min îsyangerî dewam kiriba, meşa min saxlem nebûya, ev jî şêwaza gelekan ji we ye îhtîmalê min ê windakirinê hebû.

***Ab.:*** Dikarî bê astengkirin.

***---.:*** Dikarîn min asteng bikin. Îsyangerî jî di vê wayetê de rêkûpêke, rewşa têkoşîneke bi pergal heye, teqez mantiq heye.

Em vê bi şêwazê we re berawird bikin. Hûn dikevin nava hêrseke mezin, aliyêkî hûn hilnaweşînin namîne. Heta niha jî beşeke we ya mezin wisa ne. Lê bi min re hîn ji wê demê de li gorî nêvengê xwe eyarkirin heta dawî diyarkere. Dive ku mirov vê jî lê zêde bike.

Em anotomiya îsyangerekî xêz dikin û encamên din ên ku li ser bên rawestandin jî hene.

***Re.:*** Serokê min ya din jî xwe girtina garantiyê, tevdîr pêşxistin û bûyera pêşketinê heye. Ya rast bûyera qezenckirina deh quruş jî ev e.

**---.:** Heta pileya dawî tevdîr girtin jî heye di vê derketinê de. Tê zanîn îsyangerek hinek caran şiyariya xwe ji dest dide, mesele di nava me de rewşa gelek hevalan wisa ye û rewşeke pir zêde tê jiyîne. Hema bêje her yek ji we dikare bibe îsyangerek, lê hûn ê nikaribin dawiya îsyanê vesaz bikin, ew hêza we ya tevdirê nîne. Ger bê dîqatkirin ez îsyanê tenê bi îsyanê ve sînordar nahêlim. Bi asanî min li dijberî bav îsyan kir û min karî bêjim; "*Bila xwedê bela xwe bide wî û zeviyê wî jî.*" Ez di îsyanê de li bênavberiyê digerim, dawiya wî anîn, li bendê me ku di xala herî giring de li rakîbê xwe bidim. Dema ku vana hemûyan dikim rê û rêbaz diyarkirinê jî baş dizanim. Ji ber ku ez yekser neketim gund. Aliyê rê yên nepen bikar anî û qet negiriyam. Tenê hêsirekî biçûk jî ji çavê min nehat. Dîqat bikin di qûtbûna dawî ya ji gund de hêsirê çavan ên mezin, lê dema dizîvirim gund, çavdêriya zarokekî şad raber dikim. Tê vê watê ku di heman demê de li ser xwe serwerim.

Rêyeke çil-pêncî kîlometre derbas kirin serkeftineke. Heta bi tena serê xwe siwarbûna erebeyeke bi motor, di mercên wê demê de bûyereke mezine. Bê ku bavê te hebe, mezinekî te destê te bigire, du-sê gundan derbas bike biçe, erebeya postayê bigire û rêyeke heftê kîlometre derbas bike. Tiştekî ku aqlê mirov jê bigire nîne. Ez pir wêrekim.

Wekî din yên ku nerîna xwe li ser hebe hene?

***Rı.:*** Serokê min ya din jî bi lez fikirîn û bi lez biryar dayîn pir girînge. Yanî herî kêm berê hesabê; "*Ez ê pere bigirim*" nayê kirin, tiştekî zêde pîlankîrî nîne. Tam di dema paşvekişandinê de bi fikrandineke ji nişkê ve, ev kirina biryar heye; ev jî fikrandineke lez pêwîst dike.

***---.:*** Tabî mantixê ku radibe îsyanê lez kar dike; hem bê navber, hem lez, hem çare heye. Çareserî û çareyên nû yên baş fikirandin pêş dikeve. Hevalên din çi didin diyarkirin?

***Ma.:*** Serokê min, min ê jî heman tişt bigota. Beriya şer pîlanê wê tê kirin. Di dema vegerê de dibîne ku pere li pişt dîreg de ye û digire.

***---.:*** Temam min bi lez dest bi şer kir, lê ez pir bi lez jî difikirim. Di wan mercan de fikra; "*Ez ê pere ji ku bigirim*" ne dihat bîra tu kesan ji we. Lêgerîn heye. Pir zêde fikrandin, di dema îsyanê de jî pir bi lez fikirandin heye. Wekî din xalên ku li ber çav nehatibin girtin hene?

***Ha.:*** Serokê min, wêrekî û bawerî heye. Zarokên gund zêde siwarî erebê nabin, ditirsin.

***---.:*** Biçin mercên gund ên wê demê lêkolîn bikin, ger destê wî/ê ne di destê dê û bav de be tu nikarî zarokekî siwarî erebeya ku tê gund jî bikî. Vana hemû bi qasî ku şayanî vegotinê ne di heman demê de divê di romanê de jî bên destgirtin. Jixwe berê erebeya ku dihat gund jî min nedîkarî lê siwar bim, encax bi alîkarî dikarîm siwar bim. Lê di wê îsyana mezin de min ev berçav girt. Tenê bi serê xwe wêrekiyeke mezine. Hîn jî di bîra min de ye; "*Ez ê çawa siwarî erebê bibim, dê ji Xelfetiyê Cîp were, ez ê çawa destê xwe rakim û bidim sekinandin, dê erebe raweste û dê çawa min cidî bigire? Ya din memûrên dewletê hene, ez ê çawa bikevim nava wan.*" Ez bi vana hemûyan fikirîm. Ji bo zarokekî gund pir girîngin. Hestên pir cuda pêş dixe. Aliyê wêrekiyê tê fêmkirin. Erê wekî din?

***İ.:*** Serokê min, wekî din heta dawî bi pîlan tevgerîn heye. Ji ber vê tevgerîna bi pîlan em ji derketina gund bigirin heta digihêje bajarok şêwazekî rast girtin mijara gotinê ye. Bi vî şiklî tevgerînê pîlangerî derdikeve pêş.

***---.:*** Di pîlan de min despît kiribû ku dê ber bi nîvro erebe were. Pir girînge. Ji wî gundî û şûn de bi meşê çûyîn negengaze. Jixwe rê jî nas nakim. Lê di pilansaziyê de faktorekî din ku li berçavgirtin; erebeyên gund bi gelemperî sibê zû derdikevin. Ereba ku ji Goklî dihat çûye, ereba Ereb pir zû derdikeve rê, ji Cibînê jî wisa. Li Karamezrayê encax erebeya ku ji Xelfetî tê bisekine. Niha îhtîmaleke mezin di pîlansaziyê de îhtîmalek hesabkirin heye û ew jî ser digire. Dîsa ya ku di vir de girîng navber nedayîna îsyanê ye, li gorî kêfa xwe ya paşa tevnegerîne. Tê mantixê xwe bikar bînî û bi wêrekî tevbigerî. Lê di heman demê de tê pir hestyar û bi ziravî tevbigerî. Ya din tişta ku tê qet neke, neyînî bîra xwe jî di pêvajoya îsyanê de raber bikî.

Vana hemû hene. Wekî din hevalên din çi dibêjin?

***Re.:*** Serokê min, ya din di vir de qelebalixî û ziravî di nava hev de dimeşin. Bûyera îsyanê di asteke hunerî de pêşketinê heye.

***---.:*** Tabî, ez nebêjim çors hemû tevgerînên ku îsyanê didin diyarkirin bi nêzîkatiyên pir zirav ve hevgirtin heye. Dema piştî wê jî pîlansazkirin, ne korane, bi şêwazê serekî wê girtinê taybetmendiyeke girînge. Lê ketineke pir xeter ya nava îsyanê dikim. Her gava ku davêjim pir xetere û ger bê dîqatkirin ez weke we tevnagerim. Hinek taybetmendiyên vê îsyanê hene. Dibe ku hûn kuştinê pêk bînin, ez nayînim sînorê kuştinê. Ez dizanim di wan mercan de ez ê nikaribim kuştinê rakim. Di vir de şêwaz, hedef û berfirehiya şer pir girînge.

Ez camêr pir baş dimehînim. Kevirên min vîzevîz diçin û lê dikevin. Li gorî texmîna min, min ê birayê xwe nekuşta, min ê wî ber bi binketineke teqez ve biriba. Bawerim bi bandor min dikarî li bav bidim. Lê şêwazekî wî ber bi rewşeke xirab ve bibe jî pêk

nayînim hinekî ji min re wisa tê. Îsyanê di xeteke pir zirav de dimeşînim. Ji bo vê dibêjim; ya bi min re ne hişmendiya; *"ya hero, ya mero ye."* Ne serî tewandin heye, ne jî pir zêde tengavkirina mercan û ne jî rewşeke ez ê nikaribim ji bin derkevim xwe ber bi vê rewşê ve birin heye. Her du seriyên vê hişmendiyê pir girînge. Bi we re ev nîne. Hûn kengî şer dikin bikin, teqez hûn ê li beramberî hêrsa xwe binkevin. Lê ziraviya ku bi min re hîn ji wê demê de heye. Heta dawî îsyanê bafirîne, lê îsyanê ji hed zêdetir nabe. Nayê fikirindin ku îsyanê ber bi rewşeke nikaribin ji binî derkevin ango tê de bifetisim bibim. Êdî wê zêde weke taybetmendiyekê nafikirim, cuda, di mercên tên guhertin de jî heman şêwazî yan jî şêwazî rojev nakim.

***Ab.:*** Serokê min, ew şêwazeke. Ji vî alî ve pîlansaziyek heye. Ya rast ji pîlansaziyê zêdetir li gorî mercan weke hêzê dijber dê çibike zelalkirin û heta dawî kirin heye.

***---.:*** Kêlî bi kêlî. Di serî de pîlanek nîne, ez wê jî bixim bîra we. Dema ku ez li nav rezim bira tê, fikreke min ya ku ez îsyanê li dijberî wî pêşxim nîne. Wê bê ango neyê jî nizanim. Bi carekê hat û li gorî min hat ne hat şaşîtî kir. Bi yekcarî min biryar da. Bi biryareke yek carî helwestê derbasbûna çalakiyê min nîşan da. Ez li mantixê we, avaniya we dinêrim; fikirandin pir bêmantiqe, çalakî jî hema li gorî wê pêş dikeve. Ya bi min re cuda ye. Bi yek carî biryar dayîn û derbasbûna çalakiyê heye. Di navbera birû û mijank de tu kes nizane. Heta niha jî didome. Ez wisa bi ser wî de çûm, bi ser bav de çûm, bi ser maliya wî de çûm û ji gund veqetiyam. Hema hema ev gav hemû ji şêwaza yek carî fikirandin û pêk anînê hatine. Ev weke taybetmendiyeke girîng xwe dide der. Mijara tempo hîn ji wê demê de heye. Ne bawerim wekî din ji bin derketibama. Jixwe min ê nekariya bidomanda jî.

Mijara şêwaz ango stîl pir girînge, dibe sedema ku herî zêde serkeftî dike. Kesayet jî jixwe wisa derdikeve holê. Hûn xwe bi aqil dihesibînin. Dema ku bêmafiyek dibe mijara gotinê, di wî

temenî de we yê pêwîstiya bersivdanê jî nedita. Ez bawerim we yê gotiba bira ye û ji ber çavan windakiriba, berteka we jî çênedibû. Kemasiyeke piranî ji we çêdibe, xirabiyek tê kirin hûn çavê xwe jê re digirin, ji bo we taybetmendiya serwer ev e. Lê ji bo min neyîniyek, bê mafîyek yan jî ecûlîyek hebe, ez danaqurtînim; ev taybetmendî pir girînge. Bawerim ger hûn bin, hûn ê daqurtandinê hilbijêrin. Ji bo vê ev rêgezkirin girînge; ger çapê şoreşgerekî li kîderê, kendî û çawa dibe bila bibe, ji neyîniyekê re di heman kêliyê de rewşa wî ji bersivdanê re dest nede, nikare bibe xwedî taybetmendiyeke pir cidî. Yan jî di vê mijarê de ger nebe hêza serwer li ser xwe, jê yê tên re bêje axayê min, yên diçe re bêje paşayê min, ew nikare ji pêşketineke cidî re pêşengtiyê bike. Taybetmendiya bi min re jî ev e; despêkê hertim dijber derdikevim. Di dijderketinê de jî bi pîvanim. Bi lezim, bi fikrim û ya din jî di şoreşvantiyê de şênberim. Şênberiyeke min a ku hûn fêm dikin nîne. Ji ber ku pir baş dizanim ev çalakî, vediguhere şêwazekî gundî kenê xwe pê dikin, a ku bav jî ne aniye bîra xwe û kesekî qet pê nefikiriye. Li gorî min rêgezeke mezine. Ji ber ku pergaleke min pêş xistiye bêmaf hewl dide têk bide. Ya ku arasteya çalakiya min diyar dike ev nêzîkatiya min e. Yanî ez di ser de hatina wî birayî û ya we de ti ferqê nabînim; bê navber û bi xwegihandina mîlyonan didome.

***Ab.:*** Niha hîn diyarkere. Ji ber ku şêwaza têkoşîna siyasî hîn zêde diyar bûye, pêş ketiye.

***---.:*** Pir gelemperî û bi asta bû. Ez hîn ji despêkê ve ji we re vedibêjim; ji ber hema hema mercên dişibin hev ên me hemûyan hene û we ev sal pir bê bertek jiyan kirine. Bifikirin; hûn li beramberî hemû neheqî, kirêtiyan bê bertek mane. Di encam de hûn bêreng, bêbandor, ji îsyanê dûrbûna we jî bê dem, nebes, bê rêxistin, bê pîlan kiriye, vaye ew jî kesayetiya Kurd e.

Qutbûna min ji kesayatiya kevneşop a Kurd, rewşa we ya ku li ser bandorên pergalê zêdekirina mêtîngerî, kesayetiya Kurd a

kevneşop heye; ev jî dibe ferqeke bingehîn. Bi we re jî bandora gundê we, malbat û civaka kevneşop pir zêde hebû û we xwe ber bi bandora pergalê jî xist û hûn çûn. Kesayetiya azad, a şerker li aliyekî bihêlin, hûn ji çil cihan ve bi pergalê ve hatin girêdan, ji aliyekî xwe ve hatin lêdan û we her tim serî tewand. Gelo mirov dikare ji vê kesayetiyê xêrê hêvî bike? Ez bawerim di asteke girîng de hûn wisa ne, ev encam derxistin gengaze. Lê min neheqî, neyênî, kirêtî dîtin û dijberî hemûyan jî derketim.

Naxwazim zêde bi mînakan berawird bikim, gelek ezmûnên min ên wisa hene. Li gorî min her bûyer bi vî rengî ye, heta hemû kêliyên jiyana min wiha ne. Dê jiyan dagirtî be, jiyan mafdar û di xeteke xweşik de be. Ev feraseteke û şêwaza kesayetê ye. Ez di her bûyerê de wiha me, lê di gel vê de jî şênberî heye. Dema ku dizanim dê hêza min têrê neke, teqez ez ê binkevim û vê ferq dikim di holê derdikevim. Ya rast di dilê min de ye, kom dikim. Mesele di wê demê de min çi kir, hema bi bîranikeke xwe ve vebêjim:

Li Nîzîpê, hîn di dibistana Navîn de me, hertim henekê xwe bi min dikirin. Bifikirin henekê xwe bi zarokekî îsyaneke wisa kiriye dikin. Dibe ku ez belengazî sereke yê dibistanê bûm. Lê ez bawerim li gorî mamosteyên xwe jî yê herî bi aqilim. Ji ber ku li gorî dema xwe hem mamosteyên jin hem yê zilam gelekî nirx didan min, her ku diçe zanyariyên xwe pêş dixim. Di dibistanê de di rêzên pêş de me. Lê tevî vê jî, ji aliyê zarok û xwendekaran ve kêsê henekê xwe pê dikin, bandorên neyînî yên bajêr hene. Ji bo ku vê paşê veguherînim teqîneke mezin hîn sal pêwîstin. Hîn jî tê bîra min, hinek ji wan zarokên serbazan bûn, hinek zarokên axayên gundan û eşrafan. Ya min jî hinekî taybetmendiya min a Kurdîniyê heye, bawerim tevgerên min jî zêde ne bi hêzin yan jî ew wisa dibînin. Di tevgerînan de jî cudabûn heye. Nikarim weke wan bibim, eşkereye ku li gorî taybetmendiyên wan ên civakî ez ê bihelim û vê jî weke xeteriyê dibînin. Bi henekê xwe pêkirinê,

têhn lê danê, her roj li gorî xwe rewşeke wan a min başde xistinê hebû.

Bersiva ku min jî dida; bi mamosteyên xwe re hinekî din goftûgo pêş dixist û derketin hinekî bi mamosteyên xwe re pêwendî pêşxistinê de didît. Baş li pirtûkên xwe mêze dikim. Hertim ber bi yekemînê dibistanê ve hildikişim jor, ev jî di encam de şereke, hem jî şerekî pir bi wate ye. Piştî ku li ser pêwendiya bi mamoste re serwer bûm û şûn de, ya din bûm yekemê polê, wan zarokên burjuva jî bin dixim. Pir şênbere. Sê refan jî wisa derbas dikim. Teqez di vê pêvajoyê de berteka min li dijberî pêwendiya burjuva pêş dikeve. Ji min re pir xeter dihatin û ez ji şêwaza ku wan ferz dikir dûr dimam. Ji ber ku ez hinekî nêzîk bibama, dê min mahf bikirana. Ne bi şêwazekî wisa ku wan ferz dikir di arasteya ku min got de têkoşîn pêşxistin, bûna yekemînê polê û ketina çavê mamoteyên xwe di vê astê de bûm. Ez dikarim bêjim ku ji hemû aliyan ve min ev her du ser xistin. Bi vê civaka bajêr re pêwendiya min wisa berdewam kir û çû.

Beriya ku derbas bim, di vê îsyangeriyê de xalên din ên ku bên ditin hene, divê ku bi kurtî mirov li ser raweste, bese, hevalên din dixwazin tiştekî bêjin.

***Xe.:*** Serokê min, ji despêka îsyanê heta dawî helwestê ku hatiye raberkirin pir zelale. Dudilî yan jî lihevgêjbûn ne mijara gotinê ye.

***---.:*** Dudiliya min qet nîne, ez heta dawî ji mafdariya xwe bawer dikim û ev zelalî çavkaniya xwe jî dibîne. Di îsyanê de dudilî, likûmîn nabe. Heta dawî bi vê rêgezê ve jî girêdayî me. Min beriya niha jî dabû diyarkirin ku ji hemû aliyan ve bi pêwîste îsyangerek çawa be xisletên wê tev jiyan kirine.

***Xe.:*** Serokê min, şêwaza ku di wê îsyanê de tê raberkirin, hema bêje şêwaza rêbertiyê ava dike.

***---.:*** Di navbera şêwaza min a wê demê û niha de teqez xalên dişibin hev hene û ev jî lihevkirîbûna kes a li beramberî xwe

radixe ber çavan. Yanî rewşa ku jê re tê gotin; “*Kesek di heft saliya xwe de çibe, di heftê saliya xwe de jî ew e”* ye. Ji vî alî ve jî pêwîstî bi durûtiyê, bûyîna bûkalemûn nîne. Gotineke dibêjin; “*Ji zarokî fêrî camêrbûnê bibe”* heye, ez dikarim bêjim ku min heta dawî girîngî da vê gotinê. Bi rastî jî heta niha tevgerînên zarokekî di kûrahiya herî watedar de pêkanîna min mijara gotinê ye. Duristiya zarokî, ji diliya zarokî pêwîste têk neçe, baweriya min heye. Ne ku mezinbûm, pêgîştim û bûm zilam, divê xiyanet li taybetmendiyên zarokatî neyê kirin.

***Az.:*** Serokê min, ji aliyê şibîna hev ve taybetmendiyeke hevbeş heye. Tê dîtin ku di navber ji gund derketinê û ji welat derketinê de xalên dişibin hev hene.

***---.:*** Balkêşe, di navbera ji gund derketinê û ji welat derketinê xalên dişibin hev hene. Me îsyan teqandiye, lê pir bi îsabet dibînim ku ez ê ji bin dernekevim. Û pir bi şêwazekî zirav hîn dema ku dijmin di xew de ye, bi heman xwînsariyê di ber serê qereqolê re derbas bûm. Ji gundên sînor -îhtîmaleke mezin sîxûrê qereqolê bûn- min weke kesekî ketiye nava karê kaçaxçitiyê û bazirganiya çekan dîtine; ez dizanim ku min çavdêriyeke wisa daye. Zilamê li gel min digot; “*Tu çawa yî, tê çi bikirî.”* Dibe ku heta niha jî dijî, navê wî, “*Canî”* bû bawerim.

***Az.:*** Ez wî kesî nas dikim Serokê min.

***---.:*** Jiyan dike? teqez nizanîbûn ez kîme. Ez pir bi tevdîr û îhtîyatim; ji ber ku ez di nava qereqolek weke agir re derbas bûm. Di dilê min de bahoz hebû, dilê min dihat devê min, lê min qet reng nedida. Heta di dema derbasbûnê de, dema ku li ser pîlanê bûm hat got; “*Temam, me leşker hat û eyar kir.”* Hîn jî tê bîra min. Leşker bi xwe hat têl rakir û got; “*hadê hemşeriyê min, zû derbas be, bila fermandar nebine.”* Em bi xwînsariyeke wisa derbasbûn serxist û li pêşiya min M. S ji min re digot; “*Tu pêl şûna lingê min bike.”* Lê hûn di zewiyê mayînan de derbas dibin û her roj mirovan dikin qurban. Tevgerîna min a wê de mê ev e;

M.S. pêl kîderê dike, ez jî pêl şopa wî dikim. Yanî ez rêberim, nav û dengê min hatiye bihîstin, lê rêberê zewiyê mayînan ew e. Û teqez ez ê bost bi bost girêdayî bimînim. Şêwazê leşkerî ev e.

Me îsyanek kiriye li dijberî dewletê, lê tê di dema xwe de derketinê jî bizanibe. Me wêrekiya îsyaneke mezin kiriye, îsyaneke neyê bîr û hişê ti kesî ye ev. Lê bifikirin, derketineke wisa nayê aqlê kesî ji we. Ji civata PKK'ê, ji civata dewletê bê xeber yan jî derketineke neyê aqlê wan e. Ev jî îsyaneke, taktîkekî pir cidî ye. Bi yek carî fikirîm, bawerim di du rojan de. Ger min dirêj kiriba, yan jî nîqaş ji yê me re hiştiba, wê xeterî jî mezin bibûya.

Me çalakî mezin danî. Ez bi piştî çalakiyê difikirim. Min ji xwe re got; "*Dê çawa be?*" Wê demê Nîzîp hat aqlê min, ji wir jî Fîlîstîn. Çûyîna Fîlîstîn çawa ye, li kîderê ye nizanim. Pêwendiyên min jî nîne, tenê dizanim ku şoreşger li wir hene. Yanî nîşaneyên hêviyê pir lewazin. Lê bifikirin çawa têm girêdan, gavên xwe çawa bi ziravî û hestyar davêjim. Ya piştî wê pir girînge. Şeva yekem ku ez mam bifikirin, zilam dikare hemû tiştî bike, dikare îxbara min jî bike. Ji bo vê heta sibê ji bo ku çavdêriyeke baş bihêlim diranê xwe dişidînim, wê şevê derbas dikim. Traktor tê, wê demê jî êdî ji bo rêkûpêkirina tevgerînê mirov li gorî min dibe mînakekî baş û bê ku îtîrazeke biçûk bê derxistin, heta dawî çi tişta ku dikare çavdêriyeke çawa ava bike wê raber dikim. Niha şêwazekî we jî heye; hûn li ser serê mirovan fermanberin, hûn şevê na ecibînin, xwarinê na ecibînin, hûn pir eletewş daxivin. Ez pir vekirî me û vekirî kar dikim, lê di cihê pêwîst de û ji nişkê ve şêwazekî min ê ku nehêle ruhê wan pê bihese heye. Yên ku wê demê Rêbertiya min dikirin çûn ji gel YNK'ê nasname anîn. Nizanîbûn ez kîme. Piştre gotin ger me bizaniya ma gengaz bû ku me te wisa berdaba. Lê me bi asanî pêk anî. Dewlet jî piştî du salan pêhesiya. Vaye tevdîr ev e, divê baş bê fêmkirin.

Îsyana mezin, hişyariya piştî wê, veşartîbûn û saxlemî heye. Piştî ku min cîh ji xwe re çêkir û şûnde, hêdî hêdî derketim holê. Di şeş mehên despêkê de tu kesî bi navê min ez nasnekirim. Ti kesî bertekeke biçûk jî nebihîst û heta wê demê min cihê xwe baş saxlem kir. Piştî wê ketim pêvajoyeke bi îdîatir û min got; "*Zilama bîne, qampê ava bike.*" Min anîn û wargeh jî damezrand.

Ya piştî vê pêvajoyeke pir dijwar û nû ye. Di vê wateyê de şibandin dikare bê avakirin û jixwe pêvajoyên bi min re hevgirtîne. Hevalên din çi dibêjin?

***Pe.:*** Serokê min, ya din di şêwaza Rêbertiyê de sînorên çalakiyê hatine diyarkirin yan jî rewşa ku xwe li gorî pêşveçûnê amadekirin heye. Ya rast sedemên ji hemû aliyan ve xwe jê re amadekiriye, encamên vê neketina nava çalakiyekê heye. Ji dijberderketina malbatê heta li beramberî ew jiyana ku di navê de ye sedema derketinê, sedema serkeftinê jî ev e. Yanî bi tiştên sînordarkirî tevnegerandin, gelek îhtîmal di nava xwe de hewandin heta encamekî hatiye diyarkirin di nava xwe de hewandin û li gorî vê çalakiya xwe eyarkirin heye.

**---.:** Di despêkê de jî dogmatîzm nîne. Jiyana xwe pir xwezayî, tê bêje weke ku herkes jiyan dike dijî, lê kesayetek ku heta dawî şiyar xwe eyar kiriye. Li beramberî bertekeke ji derve bê dikarim di heman kêliyê de bersivê jê re bidim. Ger ji aliyê din ve berxwedaniyek çêbibe, li beramberî vê berxwedanê xwe pir zêde vedike, tahlîl dike, berfireh dike û li gorî têrkarî, ferzkirinên ji derve tên, dîsa di nava pêvajoyê de kêlî bi kêlî, heta li gorî rewşên ku derdikevin holê bilez difikire û bi lez çareseriyan pêşdixim. Ji dogmatîzmê re cîh nîne û fikrên min ên weke; "*Ez bikim, an nekim*" rewşên wisa ber bi dudiliyê ve diherikin nînin û heta niha jî wisa me. Teqez di çalakiyê de berfirehiyeke mezin, armanc, ji fikrandineke afiriner û xwe gihandina pratîkê gengaze.

Ya derdikeve holê ev e: Bi rêgezeke pir xwezayî, pir zêde şênberbûn di nava hev de jiyîn. Heta wê demê qet rêgez bi min re

nebû? Bêguman hebû. Tê rezê xwe bi kedeke pak bikî; ya rast ev rêgeze. Te girîngî daye rez, rêgeza jiyana xweşike. Ev bi ked, xweşikî nêzîkatî ji jayanê re raberkirine û ger tu vê pêş bixî heta ber bi bîrdoziyekê, sosyalîzmê ve birin gengaze. Ya ku bi ked û xweşikiyê tê afirandin, ev rêgez, vaye yek ji nişkê ve hat û ya xweşik, bi vê kedê hatibû qezenckirin têk bir. Tabî ez jî hema bi têkoşînê bersiv didim. Di dîmen de rêgeza wê nîne. Di dîmen de ez xwe naspêrim ti bîrdozî, rêxistinê, lê hîn ji wê demê ve ruhê xwe, zanîn û ya keda min diyar dike zanîna nirxekî wisa heye û bi vî rengî ew bi rez yan jî jiyanê ve şênber kirin mijara gotinê ye. Ketina ne mafdar, ji bo min dibe sedema têkoşînê û hema rêgezê diparêzim. Divê ez rêgeza ked û xweşikiyê biparêzim, ji ber ku rez xirab dike; lê divê xirab neke. Dema ku di vê de israr dike ez dest bi têkoşîneke dijwar dikim; ger wî di wê gava ku avêtiye de israr nekiriba minê jî ewqas bilind nekiriba. Bi qasî ku wî israr kir min jî israr kir û bawerim di vir de rêgeza herî mezin derdikeve holê. Heta niha jî wisa me. Tê ya herî mezin bêjî û ya mezin jî bikî. Wê demê jî min serî li ya mezin pêk anînê da. Dê çi bê fikirandin, çi bê kirin, min hemû û her tişt di nava wê hefteyê de bi cîh kir. Lê hinekî jî li xwe binêrin, serî ne diyare, hûn ji kîderê despê dikin, hûn ê îsyanekê, çalakiyekê di çend rojan de bi cîh bikin; ev ne diyarin.

Jixwe weke kesayet hûn pir hatine belavkirin. Ji bo wê hûn serkeftî nabin. Mesele wê leza pir baş, têgîştina lez, lezkirinê bînin ber çavê xwe, dîsa girêdana rêgezekê bînin ber çavê xwe. Dema ku hûn xwe bi vê re berawird bikin eşkereye ku dê ferqeke mezin derkeve holê. Ji bo wê hûn di jiyanê de serkeftî nabin. Ev ji zarokatiya we ve wisa despê kiriye û wisa dewam dike. Ya min berevajî ye, min gaveke pir radîkal avêtiye û ev gav heta niha jî didome. Di vir de rewşeke; "*Ka ez bisekinim, bila derfet ava bibe, pere were, hêz ava bibe*" û ketina nava bendewariyan nîne. Tabî

ev ne bê rêgez ji hemû tiştî re îsyan kirine; rewşeke wisa jî ne mijara gotinê ye.

Min rez baş û xweşik amade kiriye. Wê demê zarokên din jî yên gund tên nava rez, wan digirim û didim xwendin. Herkesî digot; "*Çima tu bê bersiv dide xwendin*" Wê demê jî min ev tevgerîna xwe dida diyarkirin. Tu zarokî di nava rezê xwe de, hem jî bê bersiv 5-10 zarok fêrî alfebe, bîrkarî nedikir. Jixwe dayika min wê demê digot; "*Ti kes weke te nake, tu vê eleqeyê nîşanî van didî, gelo wê vana te bişopînin?*" Ya ku dixwazim bêjim; ez ne ezezîbûm, bi asanî min dixwest gelek hevalên min werin wir û bi xweşikî bi min re parve bikin. Lê ji aliyê din ve bi serîlêdaneke birayê min a ne rast rû bi rû têm û bi awayekî dijwar serî li beramberî wî radikim. Bi taybetî divê xalê de ye; heta dawî hevbeşbûn û di heman demê de li beramberî nirx nezanînê jî heta dawî bi dijwarî bertek nîşandan, li dijî derketin heye. Tabî ew zarok fêrî alfabeyê kirin, pol bi wan dayîna derbaskirin jî pir girînge. Grûba min a herî cidî ya wê demê bû. Di birina dibistanê de min ji wan re pêşengtî dikir. Di waneyên wan ên mayî de û heta her ku çû di wan gihandina ruhê komê de, di pêşxistina hestên wan ên olî de teqez Rêbertiya min diyarker bû û risteke wisa mijara gotinê bû. Bawerim min ew xwedî jî dikirin.

Di vê navberê de min ew çîroka çûkan jî vegot. Tiştek dayîna wan -ev hemû jî bê bersiv bûn- dibe taybetmendiya pratîka min a hevrêtiyê çiqas bi hêze, niyaza min a hevrêtiyê çiqas pêşketiye. Yê din jî ji hemû aliyan ve dixwaze xwe bispêre miratgeriyê û hemû tiştên min parve bike. Helwesta min li beramberî wî çawa pêş ket di nêzîkatiya rez de bi awayekî vekirî derdikeve holê. Ya rast ger em hinekî din vê demê vekin, hema bêje weke partiyekê karkirina min tê fêmkirin. Teqez rêgeza wê jî heye. Min hîn sosyalîzm nexwendibû, lê wê demê min gelek pirtûk dixwendin. Lê wisa tê fêmkirin ku, tevî vê jî di çarçoveya bîrdozî û feraseta rêxistinekê de hatiye tevgerandin û vê jî di nava jiyanê de bi

tevgerînan re hevparkirin tê fêmkirin. Ez kesekî wisa bi pîlan û rêxistinkirî me. Di her kêliyê de di rewşa ku karim xwe biparêzim de me; di derbarê vê de hêza min û biryardariya min jî heye.

Ez dikarim gelek bîranînên weke vê veguhezînim. Em niha tenê yekê tahlîl dikin. Yek ji xisûsên ku divê bê dîqatkirin jî, ji nişkê ve bahoz rakirin, lê dema ku vê bahozê jî radike. Rêgezeke jiyanê ya sereke li ber çavan girtin, girêdana bi rêgezeke jiyanê ve esas girtin û ew jî di her demê de, li gorî her cihî bi qasî şênber dibe di kêliyê de fikirîn û hema xwe gihandina biryarê heye. Di wê kêliya ku ez fikirîm û min got; " *Perê min nîne, ez çawa li ber xwe bidim"* hema çûm min çavkaniya pere dît. Pêvajoyên piştre jî li ser van esasan û li ser esasê pêşxistina van, bandorkirinê pêş ket.

Dema ku min îsyana mezin da despêkirin ez qet bi pere nefikirîm. Ji ber ku ya li wir divê esas bê girtin ne pere ye, armanca despêkirina îsyanekê bû. Dema ku me gotinên; "*Kurdistan mêtîngere"* li gorî ferhenga me ya zanîna wê demê destpêkirinek herî watedar bû, ma pere qet tê aqlê me? Ya girîng ev gotin dê xwe bispêre çend kesane. Niha li feraseta xwe ya çalakiyê binêrin; bila pere were, rêxistin were, çek were, piştî wê yan hûn ê çalakiyekê bikin yan nekin. Lê rewşeke wisa bi min re nîne. Dema ku vê dibêjim nabêjim qet perê min nebûn. Dizanim min deh hezar quruş li bankayê razandibû, ew perên ku min ji gundiyan, ji wan axayan girtibû dema ku min girt jî ez wisa fikirîm; "*Ev dikarin bibin perê şoreşê"* û çavkaniya vî pereyî jî bûye ev fikir bi xwe ye. Ji aliyekî ve rûşwet bû, lê tê bîra min, min ev tenê bi mercekî qebûl kir. Perê bav çawa ku min ji bo îsyanê karanî, perê ku min ji wan jî girtibû bi fikra; "*Ezê rojekê ji bo îsyana giştî razînim"* digirtin. Dema ku cara yekem rûşwet dan min jî, ji bo qebûlnekirina rûşwetê min ji xwe re got; "*Tê çawa rûşwetê bixwî"* û heta dawî min xwêdan dabû. Fikirîm, li ser ponijîm û herî dawî min wisa bi wijdanê xwe da qebûlkirin; ev

pere ji bo Kurdistanê dikare bê karanîn û rewa ye. Ev pere ji vir tê, lê dikare ji bo başî û xweşikiya Kurdistanê bê karanîn. Girêdaneke min a wisa heye.

Niha di vê xalê de di daneberhevê de fêde heye. Ger hûn bin hûn ê hema bigirin, bixin bêrîka xwe û hûn ê dakevin nava Amed'ê ji cihên vala re xerc bikin, mînak hûn ê ji ser hişê xwe biçin. Wê demê hevalên min jî wisa dikirin. Wan pereyan ji bo hemû karên kirêt serf dikirin. Pir girînge; ji ber ku rûşwet qebûlkirin dikare mirovan pir zêde xirab bike, bê exlaq jî bike. Lê ez difikirim û kêlî bi kêlî çareseriyê dibînim. Hîn jî tê bîra min, ji nişkê ve pereyê ku sê qatî mûçeyê min bû sê-çar hezar quruş di mercê sala 1970'ê de bi carekê de di bêrîka xwe de dibînim û heta dawî balkêşe. Beriya her tiştî xeteriya xirabûnê heye û ji bo ku xirab nebim jî divê ku lez bifikrim û çareyê bibînim. Vaye bifikirin ku, rûşwetê ez bangî Kurdistanê kirim. Fikra Kurdistanê wisa bi rûşwetê ve girêdayî bû. Tu rastî bixwazî ya ku Kurdistanê xilas dike civakê tine dike ev rûşwetgeriye. Di mînaka min de jî, berevajî ev rûşwet bû sedem ku ez li ser Kurdistanê bifikirin. Ji ber ku tu vî perî bigîrî û xerc bikî teqez tê kesayetiya xwe ji dest bidî. Ez hatime memûrtiyê bikim. Dibe ku pereyekî zêde bibînim û xwe dewlemend bikim. Lê ez vî perî bigirim, bikevim vê rêya şaş û nebes, wê demê Kurdistan di serê min de ewqas şênber nîne, kesayetiya min jî dikare bikeve rêyeke cuda. Bi rûşweta yekem ez dikarim xwe winda bikim û biçim; lê ez pêdiviya fikrandina; "*çi li rûşweta yekem bikim*" dibînim. Pir girînge. Heta serê sibê xwêdan didim, xwe lêpirsîn dikim û di encam de çarê dibînim. Weke ku min got wê demê fikreke pir sînordar a Kurdistanê hebû û ez ê çawa berê xwe bidim çi tam ne diyar bû. Ger berê xwe bidim şoreşê jî ez dê cuda bêrê xwe bidimê, ez ê nikaribim bi lez bim. Vaye bûyera rûşwetê tam jî di vê xalê de lez da min. Ew perê ku di bêrîka min de bû hertim digot; "*Bi Kurdistanê bifikire, ji ber ku te ji bo wê ew pere girtiye.*" Bi vî rengî piştî ku min çare pêş xist

min pere hinekî din mezin kir, heta deh hezarî derxist û bi wî min dikarî xwe bigihînim Stenbolê.

Piştî ku min xwe gihand Stenbolê demeke pir cuda despê dike. Derbasî nava DDKO'yê dibim. Waneya yekem jî min di DDKO'yê dayî de dibêjim; "*Çima dewleta Kurdan nebe?*" Di dema salên 1970'î de, dibe 24 sal beriya niha, fikra "*divê dewleta Kurdan hebe*" hîn di semînera yekem de anîna ziman, girînge. Ya ku pir kesan, heta niha Barzanî jî ji aliyê gelek îsyan û îsyangeran ve nikarin bînin ser zimanê xwe tiştekî wisa ez wê demê bi tena serê xwe tînim ziman. Tabî pêvajoyeke ez anîme vê pêvajoyê heye. Min hinek pere dîtiye û ev gava yekeme.

Di mijara rûşwetê de teqez ne weke yên din bûm. Lê weke ku min diyar kir min xwe îkna kir û ev rewş bi fikra Kurdistanê ya ku nû şiyar bibû re têkildar kir. Ji wê rojê û şûn de li Amedê ji aliyekî ve memûrtî dikir, ji aliyê din ve dest bi fikirandina Kurdistanê kir. Ji bo vê li ser vê mijarê disekînim; bûyerek, pêwendiyek, fikrandineke lez û di wê fikrê de ber bi çare dîtinê ve dibe. Dikare bê gotin ku fersendgeriye? Dibe, tabî ez ê fersendger bim, ez ê wateya wê, wê demê bifikirim. Di vir de ev encam dikare bê derxistin; ketina nava karekî, lê fikra wê teqez bi lez ava bike û teqez ber bi encama xwezayî ve bibe. Raye dikeve destê we, perê Partiyê dikevê, lê hûn vana çiqas xirab bikar tînin. Lê min ev hemû bi zorê girtin, ji aliyê tu kesî ve bi erzanî nehat dayîn. Ev hemû gavên yekemin. Hûn di nava Partiyê de yê amade dixwin û xwe xwedî dikin. Ji bo wê fermandarekî cidî kesayetiya milîtan pêş nakeve. Bi mîratxwariyeke wisa ancax hûn her roj dikarin li binguhê dîwar bikevin. Di encamê de her roj xwedê li we dide. Dîqat bikin, hûn dibêjin Serok filan û bêvan, lê vaye Rêbertî kêlî bi kêlî wisa ye û afirînere. Yanî hişmendiya; "*min pere dît, derfet dest xist, êdî rûnim*" bi min re nîne.

Dema ku bi vî rengî çûm Stenbolê, mijara ku yekem min li wir girt dest mijara; "*mafê destnîşankirina çarenûsa xwe ya netewan*"

bû. Di semînera herî dawî de daxivim, ji ber ku bi şêwazekî din ne gengaze ku ez wî pereyî heq bikim, zehmetî dikişînim. Amedê ez tengav kirime. Bi wê xişmê diçim Stenbolê. Di nava salekê de dikevim nava DDKO'yê, bûm endam. Bi Dev-Genc'ê re eleqeder dibim, pêwendî pêre kir û me 12'ê Adarê pêşwazî kir. Dil hinekî din mezin bû, kelecana şoreşgerî zêde bû.

Min nakokî dîtin, sosyeteyên Stenbolê dîtin. Bifikirin yanî, ger hûn bûna ev nêvenga ku hûn pêre rû bi rû mane hema hûn ê biketan navê û biçûna. Wê demê min jî dit, lê min dizanî ku hêza min nîne. Ez dikarim çiyê Stenbeolê ji xwe re bikim mal, dikarim çiyê wî bijîm; encax tenê min dikarî lêbinêrim. Di nêvanga Stenbolê de encama ku hatiye derxistin ev e; şoreşgertî dikele, şoreşgerî pêş dikeve. Û 12'ê Adarê heye, li beramberî vê berxwedana şoreşgeran heye. Ez wê demê li Enqerê ber bi siyasalê ve hildikişîm. Ev jî ji xweber nabe, parçeyekî pîlanê ye. Li beramber rewşa heyî helwestekî şênber girtine. Fakulteya Zanyariyên Siyasî ya Enqerê, navendeke balkêş ya hevgihîna şoreşgera ye, cihê gaveke din pêş ve çûyînê ye.

Ji bo fêmkirina vê em hema mînaka nîşan didin; dema ku me dest bi vî karî kir ez di nava arasteyeke giştî de me, ger xeta giştî heye wê demê pêwîst nake tu çil çarî bifikirî. Yanî weke hemû şoreşger û milîtanan, ger neyêniyek pêşket pêşwazî bike, lê wisa korane jî nehêle; ne di binîde bimîne, ne jî bi wê xwe winda bike. Teqez bifikire û hemû encamên ku jê bên derxistin derxe, gavên nû jî li gorî vê bavêje.

Ev ê min ber bi kîderê ve bibe, ez bi vê biçim kîderê, bi vê çi bikim? Niha hinekî van dibersivînim; pirs û bersiv vekirî û tê fêmkirine. Ger teqez durist nêzîkatî bê raberkirin misoger wê kesayetiyên ku ber bi pêş ve gav bavêjin ji we derkeve. Bi îhtîmaleke mezin hûn jiyanê wisa nanirxînin. Çima? Bûyera ku em jê re dibêjin dahûrandin nîne. Di rastiya Kurd de karê xwe tahlîlkirinê ti awarteyîyê di nava xwe de nahewîne. Ya rast pêwîst

nake mirov dahî be jî, tenê bûyîna xwedî şêwazekî bi vî rengî têrê dike. Nebêjin; "*Ya tê serê te bipejirîne*" ya tê serî qet nayê pejirandin û nayê pejirandin jî. Lê divê ya rast bê qebûlkirin; ger xeteke we hebe –jixwe bi we hemûyan re wisa ye- li gorî wê hukmê xwe dayîn û bê dudilî, pir şiyar, çalak, bi şêwazê teqez biçe serkeftinê pêşxistin û bûna xwediyê vî şêwaziye. Me got ev rêbazeke, ya rast hûn dikarin pêşwazî bikin, asta we hemûyan a qezenckirinê dikare cuda pêş bikeve. Ya ku nîne ev e. Berawird bikin. Derfet hebin, ango nebin hûn mahf dibin, hûn îsyan bikin jî, bi faşîzmê re di nava pevçûnê de bin jî dê serê we hîn zêdetir bikeve belayê, ger hûn vê nekin jixwe di nava belayê de ne. Û di encamê de jiyan ji bo we wisa berdewam dike û diçe.

Wê demê li gorî rewşa şênber, hem tevgerîneke şênber û ev hertim pêşxistin, girêdana wê bi arasteya giştî û yên di nava xelekên giştî de divê bizanibin hertim mezin bikin. Di vir de neketina nava dudiliyan, bi lez dîtin, bûyîna xwedî kedeke lez û têrker, wêrekî, fedekarî, hirs, kîn, aqilgerî; hemû wisa li gorî pêdiviyan eyarkirin û di encamê de serkeftin teqez û jênerevkirin. Wekî din yên ku dixwazin baxivin hene?

***Az.:*** Li beramberî hemû serkeftinên ku hatine qezenckirin neketina nava serxweşiya serkeftinê heye. Yanî aliyê hertim serkeftin bi destxistinê derketiye pêş.

**---.:** Belê, min aso ji we re vekir. Hema bêje hemû bîranînên min wisa ne. Ma mirov dikare bêje; "*Min gava yekem serkeftî û bi tendurist avêt, pêwîst nake piştî wê bifikirim?*" Na! Ez asoya mezin digirim. Dema ku ez asoya ku dibînim, armanc dikim dest dixim teqez nabêjim min ser xist û xwe navêjim erdê. Di jiyana piraniya we de; piştî gaveke diyar avêt û şûnde tê dîtin ku dikeve nava helwestekî pir rehet. Lê bi min re berevajî ye. Dema ku digihêjim asoyekî, dema ku gavekî temam dikim şêwazekî weke ku bêje; "*xilas*" nîne bi min re; hema gavên nû pêşxistinê dikim hedef û çav berdidim xeta asoyekî mezintir. Ji wê bawer dikim ku

serkeftin, hertim weke hedefekê li pêşiya xeta siyasî dayîn û araste bi hevsengî dê pêş bikeve. Teqez hewl didim xwe bigihînim vê û xwe digihînimê jî. Ger wisa nebe, pir zêde nerehet dibim. Teqez xwe naxapînim. Xwe rehetkirin li vir bimîne, hundirê min hev dixwe. Jixwe bê armanc nikarim tevbigerim, bê aso namînim, bi dijwarî lê digerim û misoger dibînim.

Piştî asoya Nîzîp'ê, asoya Enqerê, piştî wê asoyên din li pê hev tên. Ev, ji aliyekî ve jî bi şêwaza ku di hemû qadên jiyanê de ji sînordarkirin û hesta xwe têrkirinê re cîh nedê re fersend nedanê dikare bê nirxandin. Serkeftin heye, lê ketina nava serxweşiya wê teqez nîne. Heta niha jî derûniyeke li ser min serwere jî bêjim: Dema ku ser dixim, ne ketina nava serxweşiyê, lê nerehetiyek pêş dikeve; yanî azwerî, zewq û kedê ji hemû aliyan ve li ser esasê afirandina serkeftinê, di nava pêvajoya qezenckirinê de dibînim. Dema ku min tiştek dest xist û şûn de êdî ew jê ya min bûnê derdikeve. Lê bi we re berevajî dibe. Tiştekî ku we dest xistibe hebe hema hûn xwe bi wê dinepixînin, pesnê xwe didin û têr dibin. Teqez hûn vê hestê derbas nekin, hûn ê nikaribin li pê serkeftinê mezin bibezin. Bawerim ev rewşeke pir zêde li ser we serwere. Binêrin her roj ji eniyê agahî tên û têgotin; "*Piştî serkeftinê dev ji xwe berdan û ketina nava serxweşiya serkeftinê" heye.*

Çend roj beriya niha li Çelê dema ku dijmin paşve dikişiya, hevalekî li wire hema xwe winda dike, dikeve nava serxweşiya serkeftinê. Dijmin vedigere û ser wî de diçe; di encam de 7-8 heval bê wate şehîd dikevin. Tê zanîn ku heta niha pir zêde ji ber serxweşiya serkeftinê me pir şehîd dane. Lê bi min re rewşeke wisa nîne, ez xwe winda nakim, dev ji xwe bernadim û tine nakim. Berevajî hîn bêtir bi kûrî nêzîkbûn û serkeftinên nû û teqez dixwazim gevên serkeftî ber bi pêş ve bavêjim.

Ferqeke ewqas mezin di navbera min û we de heye. Hema bêje hemû pêvajoyên min ên yekem ên îsyanê gava pêş a pêvajoya

dine, pêlekana wê ye û bilindbûneke helezonwarî mijara gotinê ye. Ger na bi min re bi gava ku hatiye avêtin xwe têr dîtin, li ser serkeftinekê razêm nîne. Hem asoya serdeçûn û arastekirinê mezine, hem jî ked mezine, hem jî naveroka wê berfireh tê dagirtin, di encam de jî ev kesayatiya serkeftî derdikeve holê. Wekî din ên ku dixwazin mafê axaftinê bigirin hene?

***Az.:*** Serokê min, ya din di şerê li beramberî bav re tê jiyîn de dikare wateyeke wisa bê derxistin; li vir bi rêgezekê ve girêdan heye, ji kedê re rezgirtin heye. Li beramberî kesên ji kedê re bê rêzî dikin re çi dibe bila bibe dijber derketin heye. Ji ber ku bi bav re ketina nava şer tiştekî mirov bigirin berçavan nîne. Di vir de tahlîlkirina vê, ji bo li dijberî vê bêrêziyê derketin hemû tişt girtina berçav, heta şer kirin jî heye. Niha li vir di jiyana vê malbatê de pirsgirêk hene û ev diteyîse. Li vir dikeve lêkolînekê, serê ben ên ku têne desxistin tên şopandin û bêrê xwe dide çavkaniyê û li gorî wê tevdîr pêşxistin heye. Bi peyvên Kurdistan Mêtîngehe re çavkanî dîtin û li gorî vê tevdîr pêşxistin heye. Piştî wê jî Partî tê damezrandin, ya din jî di navbera ketina xezîneya bav û bikaranîna Pîlot de xalên dişibin hev hene.

**---*.:*** Pêwendiya di navbera rûşwetgirtinê û bi rêgezê ve girêdanê de hatiye avakirin, em ji hemû pêwendiyên mirovên xwe bigirin, heta gelek kevneşopên di wê demê de hene wate dide qezenckirin dixwaze vê bêje, raste. Di temenekî herî biçûk de, bi rêgeza kedê, pergal û xweşikiyê ve hinekî girêdan heye. Ev heta dawî diyarkere û bi bandore, bawerim min jiyan hinekî li gorî rêgeza eyar kiriye; ne li gorî kevneşopên û pîvanên klan-kabîlê yanî. Ya rast rêgezên wan jî hene bi şêwazê; "*Bila ji me be çawa dibe bila bibe.*" Lê ne wisa ye. Berevajî dê li gorî kedê be, dê xweşik be. Bi min re, divê nîzameke wê hebe, serwere. Yên ku li gorî vê tevnegerin hemû tiştên wan bi nakoke û teqez dê li dijî bê rawestan. Dibêjim ku piştî ku rêgez wisa bin, dikare her tişt bê pejirandin. Tenê bila ji bo rêgezê bê karanîn. Dibe ku perê bav be,

ji axayan weke rûşwet dikare pere jî bê girtin. Gelek desteserkirinên dişibin vê hene. Tabî vê jî heta ku em hatin roja îro jî bi hemû heşmeta xwe ve em didomînin. Belê, wekî din?

***Be.:*** Serokê min, di dîroka Kurdan de hertim îsyan bi binketinê encam bûne. Derketina serokatiya Partiyê ne dişibe îsyangeriya Kurd, ne jî îsyangeriya gundiyan. Ya rast bav li beramberî derketine wisa, ne li benda îsyaneke wisa ye û dema ku vê dibîne matmayî dibe. Texmîn nake ku ev bi terkkirinê bi encam bibe. Hêviyek heye û dibêje; *"ez dikarim vî biçewsînim, ez dikarim vî bi xwe ve gire bidim, ne dijderketineke mezine."* Lê ya ku li pêşberî xwe dibîne pir cuda ye. Ya rast li dijberî desthilatdariya başverû dibe îsyangeriya proleter. Tevî ku di temenekî biçûk de me jî, heta pê jî negîştime, lê dîsa jî di encam de binketin nayê qebûlkirin. Li vir mirov dikare bi komînên Parîsê re jî muqarene bike. Li wir jî serî hildaneke pêşwext pêş dikeve, lê bi binketinê encam dibe. Lê di îsyana rêbertiyê de encam tê girtin. Teqez serketina vê îsyanê dibe gava yekemîn a têkoşîna jê û şûn de bê despêkirin jî.

***---.:*** Hûn dixwazin vê bêjin; bav dixwaze rêgeza feodal rizgar bike; dema ku mirov bi kûrahî li wê pêvajoyê dinere, ya ku hatiye jiyîn pevçûna di navbera rêgezan de ye dê baştir bê fêmkirin. Ji ber ku rawestgeha dawî hîn dûre, lê gava yekemîn a Rêbertiya proleterya ya ku her diçe dê siyasî û cîvakî bibe jî tê avêtin.

Ger em dê bi zimanê rêgezê baxivin, rêgeza feodal di nêvenga gund de bi qasî ku dibîne hukmê xwe didomîne, ez jî bi ser de diçim. Tabî ji aliyê min jî rêgezeke kedê mijara gotinê ye. Û ji hemû aliyan ve di naverokeke dij-feodaliyê de ye, heta dawî bi naverokekî xwezayî, weke ku di civata hevalan de tê dîtin di nava tempoyeke dişibe taybetmendiya pêşketina proleterya de ye. Ev rêgezeke girîng ya şer bû û ger dê ez li beramberî rêgeza feodal serî bitewînim, teqeze ku ez ê winda bikim. Bi wateyeke din, meziniya îsyana min a wê demê, hinekê jî ne qebûlkirina min a

serî tewandina ji rêgeza feodal re ye. Yanî ez xwe nexapînim, lê di navbera çalakiya Spartekus a li beramberî Roma û ya min li dijberî bav û nêvenga gund a feodal ya rast gelek tiştên dişibin hev hene. Li wê derê rêgeza koletiyê hebû û rêgezeke dişibe vê tê ferzkirin. Ez jî sedî sed ji vê bawerim ku ez dê serkevim. Dê hêzeke çawa ya zarokekî hebe? Lê tevî vê jî hem ji îsyanê re cesaret kirin, hem jî ji encamdayîna îsyanê re hêz anîn, ya rast heta dawî bi wêrekî û derketineke bi hêz heye. Wisa texmîn dikim ku, min wê demê hem rêgeza feodal binpê kiriye, hem jî bi vê ve girêdayî îsyaneke pir serkeftî rêxistin kiriye.

Binketina min encax dikarî li ser vî esasî derketa holê, ger ez êvarê bihatam min lêborîna xwe ji bavê xwe xwestiba û carek din xwe bispêriya mal û malbatê vaye dikare bê gotin ez ê wê demê binketîme û rêgeza feodal serketiye. Lê weke ku pêşketina bûyerê ne bi vî rengî ye, berevajî min hîn zêdetir kûr kir; bi carekê ketim nava malê, pere girt û pişt re jî ber bi heftê kîlometre ve dûr bezîm. Ev dijderketineke pir mezine. Di heman demê de binpêkirina rêgeza feodale. Piştre li dijberî rêgeza mêtîngeriyê jî bi heman biryardariyê pêşxistina çalakiyêkê heye û encam heta îro dirêj dibe.

Belê ev şazde sale ku ez li vê qadê me. Li beramberî hêzekî pir mezin, heta li dijberî rejîmeke polîtîk a herî mezin, dij derketineke wisa, dema ku bi îsyana li dijberî bav tê berawirdkirin, asta rêgezê, çawaniya wê hîn diyarkertire û dibe şerekî tê fêmkirin jî. Bêguman tenê ne rêgez, heta dawî pratîkeke di nava hev de hatiye rêxistinkirin, çare hatiye pêşxistin. Ji ber ku hemû tiştî eyar dikim û hem jî kêlî bi kêlî. Dadikevim xwarê, ber bi jor ve hildikişim, kîn, hêrs, coş û azwerî wisa mîna lehiyê vala dibe û rê li ber encamên nû, mezin û girîng vedike. Di îsyana yekem de, yek ji aliyên din ê ku divê bê dîqatkirin jî; pir bi ziravî û bê ku reng bide noqîbûyîna min û paşê jî min îspatkir ku ez dikarim bi keda xwe jiyan bikim. Ji kîjan alî ve lê tê nerîn bila bê

nerîn, hema xwe dide diyarkirin ku derketineke pir girînge. Ez jî heta niha ewqas li ser vê ne fikirîbûm. Bi rastî jî ger em baş bifikirin, hemû diyardeyên îsyanê û piştî îsyanê meşandina şerê bi pîlan tê de heye. Hem jî serkeftî bûye, rêgeza feodal ya ku di kesayetiya bav de nûnertiya wê tê kirin hêz û otorite bi erdê re bûye yek. Tê bîra min piştre li bin darê ji min re gotibû; "*li ser eniya te îşareta fethê heye.*" Ez bawerim ji ber ew çalakiya ku min li dijberî wî pêşxistibû wisa gotibe, wisa tê fêmkirin. Ev çavkaniya vê lêkolîn dikim, bavê min çima ji min re ev got?

***Ab.:*** Wî bandor dike Serokê min.

***---.:*** Jiyana min ew mahf kiriye, ne karê zarokekî di wî temenî de bike ye. Ya din jî min serxistiye, binketinê qebûl dike. Qebûlkirina wî wîsa ye; di salên 1970'yê de dema ku navê me hat bihîstin ew kêfxweş dibû. Dema cara yekem navê me hat gotin, Anonsên yekem ku di radyo de wê demê hatin kirin û heta niha jî di aqlê min de ye, dema ku hatim min dît li ber derî rûniştiye. Hem bi fikar hem jî serfiraz bû. Ji min re got; "*Navê te derketiye, herkesî bihîstiye, şiyar be.*" Yanî wisa bi rûyekî tirş na yan jî; "*Te ez jî û xwe jî mahf kir*" tiştekî bi vî şêwazî negot. Ez bawerim giştî bû feraseta ku; "*Tu dikarî fetih bikî.*" Heta ev gotin jî got; "*Tu tenêyî, yê van komînistan jî Ecewîtê wan heye, lê yên ku bi Kurdîniyê re mijûl dibin ti kesî wan nîne, baldar be.*" Ev gotinên wî di heman demê de binketin qebûlkirina wî jî dide diyarkirin. Bîranîneke başe. Bi kurtî bi bav re piştî wê me li hev kir, teqez alîgirê min bû. Heta pileya dawî jî ji min bawer bû. Wekî din?

***Ab.:*** Serokê min, ya din girêdaneke ecêb bi armancê ve heye. Teqez dibe şêwazekî mezin bi ser serkeftinê de çûyînê. Nemaze hemû astengiyên ku di jiyanê de pêre rû bi rû dimîne derbas dike. Mewzî tên girtin, ya rast encama gund mewzî girtineke. Ya li Nîzîpê mewzî qezenckirineke. Di berdewamiya wê de Amed, Stenbol û bûyerên xistina mewziyên Enqerê heye.

**---.:** Teqez dawiya gavên ku weke xelek tên avêtin tê fikirandin. Taybetmendiya li pêşiya pêşveçûnê astengî nenaskirin di şêwazê min de pir vekirîye. Hertim aso girtin, armanc girtin û li cîhekî asê neman, nesekînin heye. Rewşeke min weke masî xwe avêtina navê nîne. Ez pir baş dizanim hûrûkûr bajom. Ji aliyekî ve wateyeke pir mezin didim serdeçûnek çavsorî, lê ev jî heta dawî di nava xwe de bi pîvan di nava hev de rewşeke pêş dikevê ye. Dibêjim; "*aso, ya ku ez dibînim heta kîderê be ez ê bimeşim.*" Biryar heye û biryar pir mezine. Bi vê ve girêdayî gavên ku bên avêtin pir zêde û zû tên avêtin. Bi we re aso heye? Ger hebe jî gav tên pêşxistin û avêtin? Pêwîste hûn vê ji xwe bipirsin. Gelo dîsa şêwaz û serweriya di şêwaz de heye? Bêguman ji bo serweriyê ziravî pêwîste. Binêrin, çawa ji bo ku kuçikê gund min negire ez ziraviyeke hostane raber dikim. Ji bo rêgirtina li ber fikrê gundiyan a ku bêjin vî îsyan kiriye û bi fikirandina ku dê min bigirin ji bo ku bidim diyarkirin ne kesekî wisa me, çawa heta pileya dawî rûken, rehet, aram dimînim. Çawa çavdêriya; "*Zarokekî bi aqile, karê xwe dizane, bila bimeşe û biçe*" didim avakirin. Lê di dilê min de hêrs dikele di heman demê de, hêrs û xwînsariyê di nava hev de dijîm.

Hûn dizanin her roj gelek provakasyon li ser min tên ferzkirin. Lê ez li beramberî van li gorî xwe bersiva herî baş didim. Heta dawî bi hişmendiyeke baş hûnandî, gaveke dikare hem jî di cîh de bê serxistin, rewşeke giyanbir dibînim, gava xwe davêjim û astengiyan derbas dikim û dimeşim, pêşve diçim. Ev ji bo min xeteke sereke ya jiyanê ye.

***Xe.:*** Serokê min, ya ku ez di Rêbertiya Partiyê de dibînim, hêzeke sebrê ya mezin û di heman demê de bi şêwazekî zirav nêzîkî bûyeran bûyîne. Mînak bi wê bûyera ku di dibistanê de hêz û sebra li beramberî Fatma û Pîlot tê raberkirin, heman demê de dikare pêwendî bi şêwazekî zirav jî bê danîn. Ev şêwaz di Enqerê de jî hatiye pêkanîn.

***---.:*** Aliyekî divê ku baş bê dîqatkirine.

***Xe.:*** Hêza sebrê Serokê min.

***---.:*** Teqez. Heta dawî bi rêgeza sebrê ve girêdan heye. Yanî di dîmen de tevî ku wisa ecelekarî, bi teşqele bê dîtin jî, dema ku pêwîst kir heta dawî sebir jî heye. Di dibistana navîn de tiştên li beramberî min tên kirin heta dawî sebir, di amadeyî de dîsa wisa, bi taybetî di derbaskirina Rêbertiya çepên Tirkan de bi înad sebir hebû. Dîsa li beramberî derbaskirina rêberên Kurdan bi înad sebir, pir bi îsabet û di encam de bi şêwaza giştina armancê şêwe hatiye raberkirin. Tê fêmkirin ku heta dawî bi îsabete. Divê ev îro hîn zelaltir û baştir bê dîtin. Girêdana bi rêgeza sebrê û ji hemû aliyan ve mafê wê dayîn di çalakiya me de di asta devjêneger de xwedî girîngiyê ye.

Îsyana yekem bi vî alî ve nirxandin, ez bawerim bi zimanekî wêjeyî dikare bê vegotin. Ez bawerim Ahmet Kahraman ev nivîsiye. Ecêb!. Çawa hatiye aqlê wî. Ez jî bi ewqasî nefikirîbûm. Lê çiqas kariye vebêje nizanim. Kê aniye aqlê wî, vegotiye, wê jî nizamim. Girîngiya wê ji vir tê; çareseriyek di rastiya Kurd de her ku diçe ji bo girtina rêgeza dij-mêtîngerî, dij rêgeza feodal risteke mezin û yê ku xwedî wateye û ji ber vê sedemê dibe pêvajoyeke divê nirx jê re bê dayîne. Ez vê jî li ser zêde bikim; bi asta kevneşop re, yanî bihevketin, bira li bira dide û dikuje, gundî bi gundiyê xwe re dikeve şer û hwd. dema ku bi şêwazê serdest re tê qiyaskirin rewşa min mezine û di bingeh de cudabûnekê di nava xwe de dihewîne.

Min ji we re qala şerê gund kir. Cara yekem tebance hatibû karanîn. Li gorî min her çiqas şerê bi kevin gengaz be jî, di nêvenga gund de hem jî ji ber sedemên ne mafdar bikaranîna demançê dînitiye. Ev jî heta dawî xaleke ecêbe. Hem tê wisa îsyan bike, hem jî aqlê te têra vê demançeyê neke. Hîn jî tê bîra min, dema ku li pişta mizgeftê zilamekî demançe teqand, min gotibû; "*Ev cinawireke, çawa demançeyê kar tîne.*" Min digot di

nêvenga gund de demançe nabe ev jî şêwaza nirxandineke heta dawî raste. Ji ber ku dibînim nakokî bi demançeyê çareser nebin. Dîqat bikin, ez di heman demê de şoreşgertiya herî mezin ferz dikim. Di vî şerî de teqez demançe weke amûrekî xirab tê fikirîn. Heta niha jî ji vê ditirsim. Di nêvenga gund de pêwîste demançe neye bikaranîn.

Ez li vir hema tiştekî din lê zêde bikim; du hevalên min hebûn, her du jî hîn di bîra min de ne. Rojekê min bihîst yekî yê din bi kêra qama lêdaye û kuştiye. Ez heta niha jî di vê bûyerê de mijara kuştinê jibîr nakim. Trajîke. Teqez ew bûyera kuştinê di nêvenga gund de diviya nebûya, ez di vê baweriyê de me. Dîsa karê bikaranîna demançê, bi heman şêwazî heta pileya dawî xeter û rewşeke dehşetwarî dibînim. Her du jî şaşin. Bandora van demeke dirêj li ser min dewam kir. Weke ku min got, heta niha jî min jibîr nekiriye. Jidil girêdayî me ku têkoşînek bi şêweyek ku bê pejirandin bimeşînim. Ger na dê vegeriya şêwazekî ku mirov nikare ji bin derkeve. Ferqa di navbera şerê min û ya şerê Kurdan de pir vekiriye, bingehî û kûre. Ew şer di gund de her kesî dikariya bike, jixwe yek kuştin jî, hevalên min ên hevtemen lihev xistin.

Kuştin karekî awarte yê cesaretê ye. Bikaranîna çek jî awarteye. Lê dîsa jî min ji yê wê rojê re bertek girt. Jixwe ew kes piştre mirin, yanî yê mir mir, lê bikaranîna çek zêde serkeftî nebû. Şerkeriya klasîk û îsyangeriyê, di navbera şerkeriya min a wê demê de şêwaza avabûneke wisa û ji aliyê çûyîna ber bi encam ve amûra ku hat karanîn û ji aliyê rêbazan ve ferqên mezin hene. Divê ku hûn van rewşan bi şêwazê xwe re baş muqarene bikin. Ya we di asteke girîng de bi şêwaza şerkeriya klasîk pêş dikeve. Îhtîmala bi şêwazê klasîk zilam kuştina we pir bilinde. Lê bê dîqatkirin kesayetên pêşeng, hinek şêwazên şer û pratîkên xwe misoger jiyan dikin. Hîn wê demê şêwaza fikirandina bi min re pêş dikeve, her çiqas şer û nakokî bi malbat û gund re pêşkeve jî,

bi şêwaza divê berê xwe nede kuştinê ye. Ji ber ku divê nakokî bi kuştinê bi encam nebin: Di nêvenga gund de pêwîste çek neyê karanîn. Bêguman rewşên ku niha tên jiyîn pir cuda ne, merc hatin guhertin. Cerdevanî heye, nakokî belav bûne, dewletê di nêvengê gundan de rewşên cuda ava kiriye. Ji ber vê sedemê ez ne rewşa vê demê, qala rewşa wê demê dikim. Ez ferqê dixim navbera xwe û şerkeriya klasîk. Di rêgeza me ya jiyanê ya wê demê de, ya ku dijmin ferz dikir li şûna wan şerên kesayetî yan jî kabîle-eşîret ên ku rizî û ji sedên salan mayî, teqez yên ku rêgez, şêwaz û tempoyê xwe heyî û her ku diçe dê rêxistinkirî be ji şerekî wisa re gav avêtin, her ku diçe xwe pêş dixe. Ew bi xwe û şerê xwe re dema ku tine dibûn, ji aliyê min ve şer veguhertina pêşketineke mezin, ji bo Kurdistanê di wan mercan de xaleke cudabûnê ya pir girînge.

Ji şêwaza klan-kabîle, yanî dij derketineke feodal dikim û li şûna vê li ser esasê proleterbûna xwe dixwazim rêxistina xwe pêş bixim. Li beramberî şerên klasîk yên kevin jî bertek heye. Ez şêwaza şerekî nû pêş dixim. Ya rast ev, şêwazekî gêrîla yê ku paşvekêşan jî di nav de heye. Ji ber ku di îsyangeriya klasîk de mantixê; “*Ya hero, ya mero”* heye û fermandarên eşîretan jî bi vî mantixî heta dawî bi hev dikevin. Di îsyanê de pir bi lez çareseriyê pêş dixim, derfetên mezinbûnê dest dixim.

Li gorî min ev dibin encamên herî girîng. Bi vî rengî îsyana me ya biçûk, pir girînge û ji îsyana Kurdistanê re pêşengtî dike. Divê ku mirov nebêje Îsyaneke biçûk bû û derbas neke; encamên vê îsyanê piştre di demên cuda de dubare dubare vekirina min û gelemperî kirina min, heta dij-mêtîngeriyê biriye. Bawerim ji bo ku ev baştir bê fêmkirin ya ku dibe pêwendiya duwem pêwendiya Enqerê bi giştî pêwîste bê tahlîlkirin.

Piştî îsyana yekem û qutbûnê xeta jiyanê ya ku heta Stenbolê dirêj dibe heye. Di her gavê de her tişt, bi wateyê re hîn zêdetir hev digire. Enqere jî xala werçerxanê ye. Hem navendeke,

dewlete, hem jî bi jiyankirina ezmûnênê mezin ve dema ku em tên nîvê salên 1970'î, êdî fikra şoreşekê pêdigihê. Di vê xalê de berê xwe didim pêwendiyeke nakokiyên pir mezin jî di nava xwe de digire. Niha di vê pêwendî û nakokiyê de pir tişt hene.

Me xala herî girîng çavdêrî kir, li gorî te çiye?

***Ab.:*** Pêwendiyên pir alî.

**---.:** Ez belayeke çawa tînim serê xwe? Ecêb! Ew der pêwendiyeke û rewşa serê xwe xistina belayê dijîm.

***Ab.:*** Dema ku bizaveke siyasî, bîrdozî pêş dikeve pêre pêwendî heye. Bi pêkanîna hêmanên wan ên siyasî re pêwendî heye.

**---.:** Temenê min wê demê çend bû? Temenê min hîn nû dihat 25'an. Dema ku ber bi 25'an ve bûm li Enqerê bûm û di nava tevgera şoreşger de êdî rewşa pêşengtiya me jî îspat bibû. Piştî 12'ê Adarê ber bi valatiya rêbertiyê ve hêdî hêdî dimeşim. Jixwe niyeteke me ya bûna grûb jî mijara gotinê ye. Ji her alî ve, bi taybet jî di nava ciwanên şoreşger de berendam tên girtin; ji Bakur, Başûr, ji hemû eşîretê, qebîlê û herêmê tê gotin bila yek bikeve nav. Piştî 12'ê Adarê nêvenga Enqerê ji nû ve tevgerîna civawanên şoreşger re dibe deriyek. Dibistan heta dawî xwedî nêvengeke nîqaşên germin. Niha jî di vê çavçoveya sereke de, pêwendiyeke grûbê ya ku em jî ketine navê heye. Ez bawerim ev astek pir bi wate bû. Me wê demê Heqî û Kemal jî kişandibû nava grûbê. Heta hinek zarokê axayan jî me kişandibûn.

***Ab.:*** Berê jî hebûn Serokê min.

**---.:** Berê jî hebûn. Ji çînê cuda hebûn û me dixwest em çend jinan jî bikişînin. Enqere ye, îhtîmaleke mezin xwendekarên milîtan yên ku dixwazin derketinekê bikin wê bixwazin tevgera wan bixin bin kontrolê. Lê ji bo rastiya Kurd dixwaze pêngaveke nû bê pêkanîn. Jixwe di nirxandinên bîrdozî de rastiya Kurdistanê hatiye ziman, xebateke weke manîfesto hatiye meşandin. Ev xebat di despêka sala 1975'an de hatiye nivîsandin, di despêka sala 1976'an de hatiye redektekirin, derbasî nivîsê bûye û heta

dawî berfireh, bergeh jî baş hatiye destnîşankirin. Grûb hatiye rûnişkandin û tê parastin. Karê damezrandina grûbê, eşkereye ku weke di îsyana me ya yekem de û rewşeke civakî ya ku li derdora wê tê pêşxistin, weke tevgereke dibistanê yan jî ne weke tevgera avakirina derdoreke civakî, ji serî heta binî tevgereke bîrdozî û siyasî ye.

***Ab.:*** Ji dervî kontrolê bi awayekî zêde hêmana zanînê heye.

**---.:** Hêmaneke rast a zanînê.

***Ab.:*** Lê armanc hatibûn diyarkirin, di armancê de bi zelaliyê ve girêdayî li ser vê lêhûrbûneke bêhempa hebû.

**---.:** Welatên sosyalîst hene û teorîyeke giştî ya weke mafê netewan ê diyarkirina çarenûsa xwe heye. Ya rast bi vê rêgezê ve girêdan asoyekî baş xêz dike. Xeyaliye, lê heta pileya dawî bê reng ez bawerim hêza rêxistina ku em ferz dikin ji ya îsyana yekem jî belengaztire.

***Ab.:*** Belê rêxistin nebû Serokê min. Hêzeke din jî nebû. Di vir de îdeal girîngin. Fikir hebû Serokê min.

**---.:** Îdeal, fikir û hêviyên mezin hene. Ji derve de xweber diyare. Her tişt yan jî pêwendî di dîmen de jixweberin. Ne grûbeke wisa hêj têgiştî û xwe pêşxistî bû. Nerm bû û di jiyanê de çawa ye wisa tevgerîn heye. Belê, ez gîştime 25 saliya xwe. Bi milîtantiya xwe ya xwendevaniyê ve xwe îspatkirina min heye. Bûrs digirim û perê min ê berê jî disekine. Nêvenga Enqerê, ji aliyê jiyana civakî ve asta herî pêşketî ya Tirkiyê îfade dike. Siyasal dibistana ku kesên herî dewlemend tê de dixwînin; kurê Koruturk jî di vê dibistanê de dixwîne û dîsa hejmareke zêde zarokên bîrokrat û dewlemendan hene. Di heman demê de tek-tûk be jî ciwanên ji gel hatine jî hene.

Min çalakiya xwe ya yekem di bîranîna berxwedêrên 30'yê Adarê de kiribû. Ez pêwîst nabînim li vir zêde vekim, lê çalakiyeke pir wêrek û teqez li ser rêbertiyê dilîst bû. Însiyatifa tevgera ciwanan min hîn di Adara 1972'yan de bi dest xistibû. Ji

wê rojê heta roja îro ev rewşa min a serokatiyê didome. Ya rast ew jî gaveke ji nişkê ve hatî avêtine. Gaveke her ku diçe bandora 12’ê Adarê paqij dike, li şûnê tiştekî nahêle û pêl bi pêl weke siyaset bandora xwe daîmî dikê ye. Xwedî taybetmendiya ber bi Tirkiyê ve veguhezînê ye. Lê bi gotina Ozal em weke; “*Bermahiyên şûran”* man. Yanî şûrê 12’ê Adarê yên çinî çinîbû. Dema ku nifşê yekem çû, em weke nifşê duwem ketin dewrê. Rejîm hîn ne di wê astê de bû ku me bibîne û dubare şûr li ser me bihejîne. Me bi nirxandina wê valatiyê gaveke bi pîlan avêt.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Nedizanîn, di wê demê de gaveke qet dewletê texmîn nedikir bû.

**---.:** Gaveke hêvî nedikirin.

***Ab.:*** Wê demê di serdehatinên dewletê de li ser esasê gotinê Ecewît; “*Niha kî dikare pêşengtiyê bike, qadroyê pêşeng ê nû kî dikare derkeve?”*despêkê di derbarê tesbîtkirina vê de bû. Di salên 1974-75-76’an de artêş polîs, îstîxbarat hemû li ser vê dixebitîn.

**---.:** Li gorî te xwestin çi tesbît bikin?

***Ab.:*** Wê qadro çawa derkevin holê, kî dikare bibe, ji bo tesbît û bi awayekî zêde hewldanên girtinê dikirin.

**---.:** Lê di sala 1972’yan de yên pêşeng kêm-zêde hemû hatibûn diyarkirin. Hema bêje hemû kêm zêde diyarbûn. Rêberên Dev-Gencê diyarbûn. Li ser navê min tenê rewşeke çendînî tinebû. Jixwe DDKO ji holê hatibû rakirin, ew dosya li Stenbolê mabû, ger navê min di wir de derbas bibe jî li Enqerê qet nîne; bal ji nişkê ve diçe ser hinekî din. Tabî hinekî be jî Rêbertiya siyasî, civakî destxistin weke ku hûn texmîn dikin ne asane. Bi qasî lez tevgerîn û baldariyê, azayî û asta rêgezê tê xwestin. Ya din jî pêwîstiya dem baş eyarkirinê heye. Dîsa sebra bi pîlan a kirina van, çavdêrîkirin heye. Lê gavek hat avêtin û min ji aliyê xwe ve anî cihekî eyarkirinê. Di Mamakê de bi encam bû. Dîsa ji aliyê xwe ve weke cihekî eyarkirinê ya ku min lê kiribû di Mamakê de

min demekî 6-7 mehan derbas kir; di vê pêvajoyê de min zîndan jî baş çavdêrî kir.

Zîndan çiye, dê çi bide, çi bibe; peywîreke pir cidî ya dibistanê dît vê ezmûnê. Derketim û dîsa pir bi xwînsarî, bi şêwazê sebrê, di bin rûpêşa şoreşgerê dibistanê de dozeke polîtîk û pratîkî tê rêvebirin. Di dawiya sala 1972, despêka 1973'yan de rêya ku em ê bikevin navê, teqez xwe diyar dike. Weke ku me got, derketineke di bingehê Kurdistanê de bi qasî hemû pêşdîtinan, di kesayet de ji xwe bawer gavavêtin êdî heta dawî diyarker dibe.

Tê bîra min, dema ku min du-sê derî digirtin û di guhê hevalekî de digot; "*Kurdistan mêtîngerkiriye*" bû. Di navê de tevdîrgirtineke pir mezin û di heman demê de cesaretekî mezin veşartiye. Piştre dema ku ev gotin hat bihîstin yên ku gotin; "*Em ji zû ve pê difikirîn*" derketin. Hemû derewin. Ev gotin cara yekem me di guhan de got. Gav bi gav pêgihîşt. Dema ku em ber bi 1975'an ve hatin li derdora tezên me hem niqaşên pir mezin hebûn, hem jî xebatên me yê bûna grûb didomîn. Tabî hîn dewletê weke tê xwestin em teşîs nekiribûn. Di nava lêkolîna; "*Ev kurdîniyeke çawa ye, şoreşgeriyeke çawa ye*" de bû. Gelek pirsnîşan hebûn û heta wê demê bersiv nehatibûn dayîn. Vaye, ez bawerim di vê çarçoveyê de, hêdî hêdî siya dewletê dikete ser me. Em jî hêdî hêdî tên rewşa berê xwe dana dewletê. Di heman demê de dewlet jî hêdî hêdî ser me de tê û ev jî aliyekî kare. Di vê xalê de em dikarin karê Pîlot hinekî binirxînin, lê dem dem ya ku rista diyarker dilîze ne tenê pêwendiya Pîlote. Pêwendiya Pîlot a ku risteke diyarker dilîze, bi giştî pêwendiya me ya grûbê, bi taybetî jî pêwendiya me ya bi jinê re ye. Lîstokvana jin li pêşberî me ye.

***Ab.:*** Ya din bi şêwazekî din pêş nediket.

***---.:*** Aktora sereke yan jî jine. Pir balkêşe. Dîqat bikin di vê çarçoveyê de kî şayanî kê ye? Çep yan jî dema ku grûba me dibû mijara gotinê yên ku eleqeya wan li beramberî mesala Kurd heye nêzîk dibe. Bifikirin di vê qonaxê de di nava me de asta siyasî ya

kar, asta civakî û tîpeke wisa derdikeve pêşberî me. Eşkereye ku wê ji aliye civakî ve rewşa malbatê û rewşa wan di îsyangeriya Kurdan de neyê paşçavkirin yan jî ji çavan neyê dûrxistin. Li beramberî çepgiriyê eleqeya xwe heye û ber bi kurdiniyê ve jî tê. Eşkereye ku dê kesayeteke wisa ji ber çavê min nereve. Hem jine û hem jî xwe sosyalîst dide diyarkirin, hem jî dijberî îsyanên berê ye. Malbata ku ji nav tê, di îsyana Dêrsimê de neyîniye, lê heta dawî bi bandore, ristekî nokerî-sîxûrî lîstîye. Bi vê rewşa xwe ve jî weke kesayet jî xwedî taybetmendiyên balkêşe.

***Ab.:*** Di nava tevgera şoreşgerî de cihê xwe heye.

***---.:*** Bi taybet Dev- Yol pêre eleqeder dibe. Teqez di rewşa bandorkirina pêvajoya piştî 12'ê Adarê yan jî kesên di asta rêbertiyê de ne û di nava grûbên ku ava dibin de keseke dixwaze bi îdîa bibê ye. Lê ev îdîa çiqasî ji bo dewletê ne, çiqas ji bo şovenîzma sosyal ya faşîzmê ne; mijareke cuda ye. Li ser navê dewletê tê, li ser navê şovenîzma sosyal tê, ew jî ji aliyê me ve wê demê pir zêde ne girînge. Ji bo me ya giringe, dîtin û bi grûbê re pêwendiya wê pêşxistine.

Tê zanîn; di despêkê de demeke dirêj; " *Em bigrin, an negrin?"* Dudiliyeke wisa heye.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Ev pêwendî demeke dirêj dewam kir. Ji despêka bûyera komeleyê ve hebû.

***---.:*** Ne ew tam tevlîbû, ne jî me ew rehet pêşwazî kir.

***Ab.:*** Sê sal derbas bû Serokê min.

***---.:*** Demeke dirêje.

***Ab.:*** 1974-'75-'76'ê de Serokê min.

***---.:*** Ya rast pêvajoya hev ceribandinê bû. Pêvajoya dudilî û hev ceribandinê dirêj bû. Ger ez tevgerîneke xwe ya ji nişkê ve bêjim dê şênbertir bê fêmkirin. Ya rast ez hem di rewşeke dudil, hem jî fediyok de bûm. Lê her ku diçû serê min jî tevlîhev dikir. Mijûlkirin ji vir derket holê: Gelo em ji nedîtîve hatibana dê rastir bûya? Ger ev Kurdeke, ji îsyanê tê, lê ez xwe jî sosyalîst dibînim.

Dev-Yolê ji aliyê me ve çendîniya şovenîzma sosyal baş derxistibû holê. Yekser hevalê Heqî bi xwe di sala 1976'an de dema ku çû tevlî civîna wan a damezrandinê bû tenê ma û ew avêtin. Heqî jî bi tena serê xwe têkoşîn kir.

Dev-Yol bi vî rengî bi aliyê xwe yê şovenîzma sosyal ve di rewşeke xwe diyar dike de ye û dê wî bigirin li dijberî me kar bînin. Ger bal bê dayîn ew li ser ciwanên Kurd ferz dikirin. Ez bawerim heta dawî dixwazin grûba me lewaz bikin. Ji aliyê Dev-Yolê ve bikaranîna vê yan jî li ser esasê hevgirtinê tengavkirina me tê fêmkirin. Yekser an jî ne yekser cardin dikare bibe amûra Kemalîzmê ya êrîşkar.

***Ab.:*** Pewendiyên wê yên bi wî rengî hene Serokê min.

***---.:*** Yanî rista bêyom ya malbatê teqez careke din, bi taybet li beramberî tevgera me ya Kurdistanê dikarin bi zindîkirinê bifikirin. Ev xeterî her ku diçû vekirî xwe dida der.

Ya herî girîng jî Dev-Yol pirsgirêka netewî di wateya ku em qebûl dikin de neke. Ciwanên Şoreşger jî bi şêwaza ku Heqî û Kemal tevlî bibûn û ji aliyê şoreşgerên Tirkiyê ve jî weke ku dê neyê qebûl kirin bû. Ya ku aliyê wê yê şovenîzma sosyal serdeste, ya din jî niyaz xirabiya wan her ku diçû derdikete der dê bibin xwediyê wê êdî misoger bibû. Di demeke wisa de ev kes di nava wan de jî di asta ku ji bo wan pêşengtiyê bike de bû, lê hewldana pêşxistina pêwendiya bi me re dike. Çawa ku bavê wê di îsyana Dêrsimê de risteke xeter lîstiye, heman rist li beramberî tevgera me ya nûjen û netewî ya rizgarî ku nû şiyar bûye jî dikare bilîze.

Ya rast ev tirs her ku diçe zêdetir xwe dide hîskirin. Niha ez çarçoveya giştî ya eleqeya me xêz dikim. Ez di ferqa wê de me ku bavê wê li dijberî îsyanê risteke xirab lîstiye. Niha rabûneke nû heye û vê carê jî keça malbatê li dijberî tevgera me di nava êrîşkariyekê de ye. Tam ne di nav de ye, lê ne ji derveye jî. Dev-Yol her ku diçe bi karakterê xwe yê Kemalîst ve dixwaze pêşiya tevgera me bigire. Ev kes jî dikare bibe amûr, heta em bêjin sîxûr

bû. Pirsnîşanek heye. Gelo min qet pêwendî danenîbana, ev ji aliyê taktik ve dibe ku rast bûya? Ger bê dîqatkirin, keçek, Kurd û sosyalîste. Grûba me jî heye, grûbeke Kurd û sosyalîste û bi awayekî xwezayî divê ku ya bê kirin, hatin û tevlîbûna grûbê ye. Berevajî divê ku em dijmin îlan bikin.

***Ab.:*** Ger na dê gelek rêgezên din winda bibûna Serokê min.

**---.:** Ger min pêwendî danenîbaya dê kîjan rêgez winda bibana?

***Ab.:*** Vekirîbûna tevgerê ji sosyalîzma pêkhatî re hebû. Pêvajoya komkirin û yekirina hemû qadroyên sosyalîst bû. Li ser esasê girêdana bi sosyalîzmê ve…

**---.:** Ya yekem dê ji rêgeza sosyalîzmê tawîz bihata dayîn. Ya duwemîn çibû?

***Ab.:*** Ji Tevgera Rizgariyê.

**---.:** Dê ji vê rêgezê tawîz bihata dayîn. Ji ber ku Kurd e, yan wê li dijberî me cih bigire, yan jî di nava me de. Ger em pêre eleqeder nebûna dê ji wê jî tawîz bida.

***Ab.:*** Di wateya tevlîbûna civakî ji tevgera giştî re, ji beşên cur bi cur…

**---.:** Erê, ji çawaniya eniya tevgera rizgariya netewî tawîzdan dibe ku pêk bihata.

***Ab.:*** Ji bêşên cuda, çîn û hêzên cuda azweriyên azadiyê yên ku dihatin hebûn.

**---.:** Tam rêgeza azadiyê. Ji aliyê azadiya jinê ve ger em qebûl nekin me yê ji rêgeza azadiyê tawîz bida. Ya yekem; Ez bawerim hişmendiye. Ji ber ku keseke bi asanî rêve bibê ye. Ger me ne anîba berçav me yê ji rêgeza têrkariyê jî tawîz bida. Vaye ji mehandineke rêgezê ya wisa re razî bûn, dê nebûna tevgerîneke di nava pîvanên şoreşgeriya ku me dixwest pêş bixin.

Em dikarin rêgezeke din jî lê zêde bikin. Rêgeza hestan û hişyariyê. Ev jî li gorî min diviya bû yekî weke min li berçav bigirta. Em dikarin bêjin rêgeza moral jî. Keçeke Kurd, malbata wê çil salî ji sîxûriyê re lîstiye; lê ev dixwaze bibe rizgarvaneke

netewa Kurd û sosyalîst. Weke keçekê dixwaze ciwaniya xwe wisa raber bike. Tabî li vir nayê fikirandin ku rê li ber pêwendiyeke aliyê wê yê hestî li pêş veke. Tê bibe alîkar. Vaye binêre, malbata wê, bavê wê wisa bûye, lê qebûlnekirina wê, dê rê li ber weke xayînekê nirxandina wê veke. Ev jî, ji aliyê hestî ve wê ji êş û xemgîniyê re bibe sedem û rewşeke wisa derxîne holê. Jixwe ger sîxûr be, xayîn be, divê ku li gorî wê em hesta kînê pêş bixin. Ger na, em dixwazin ji rewşa xiyanet, neyênîya malbatê û bêyomiyê rizgar bikin, divê ku em çi bikin? Pêwîste em hestyar bibin, ev jî ya xwezayî ye. Dê hinek xemgînî pêşkeve û ev xemgînî ne weke redkirina wan, encax ji aliyê qebûlkirinê ve dibe. Yanî malbat wisa ye, lê em dikarin rizgar bikin yan jî di nava rizgariya netewî de perwerde û islah bikin şêwazekî wisa destgirtinê heye. Em dikarin bixin asteke afûkirinê.

***Ab.:*** Hîn zêde nirxdayîn pêwîst dikir Serokê min. Mirov hîn zêde pêwîstiya nirxdayînê didît.

***---.:*** Tabî bi heman rewşê re rû bi rû me. Di îsyana yekem a li dijberî bav, di kesayetiya wî de li dijberî rêgeza feodal derketin heye, li vir jî li dijberî mêtîngerî, nokeriyê derketineke pêş dikeve mijara gotinê ye. Dibe nêzîkatiyeke pir balkêş. Ya rast bi qasî ku em bêjin; "*Ji kîderê derket pêşberî me*" xwe bêşans dibînin; Hem jî rewşeke bi şans ya ku di heman demê de em bêjin; "*temam, kesayetiyeke em hesab jê bixwazine*" *heye*. Yan jî em bêjin pirsnîşan. Ger ez kesayetiya beramberî xwe baş tahlîl nekim, dişibe rewşa negihandina îsyana yekem yan jî rast bi ser de biçim, îsyana yekem, heta tê wateya gaveke ji ya îsyana yekem girîngtir jî.

Min sê salan wisa bir û anî; û got çi bikim? Ger em weke xayînekê bibînin, ev bi gelek rêgezên me re dikeve nava nakokîyan; em hema bixwazin weke welatparêz, sosyalîstekê tevlî bikin, lê bi asanî nayê vê pîvanê. Ew jî li gorî xwe ferzkirineke wê heye. Pir zêde dide fikirandin, hestyarker; hem

sewqî dudiliyê dike, hem jî di asteke ber bi têkoşînê ve dikişîne de ye. Bi şêwaza ku em dixwazin pêşketineke wisa xwe dide hîskirin; biryardariya ku pêş dikeve, hişyarî û li ser vî esasî rewşeke hestiye. Rojekê ji nişkê ve (ez bawerim vana ji ber sedemên bondora ku tevgera me di Kurdistanê de ava kiribû) malbat anîn Enqerê. Heta di taxeke ji aliyê MÎT'ê ve guncaw hatibû ditin de yanî li Etlîk'ê bicîh kirin. Li wir malên MÎT'ê hene. Ez teqez sîxûr ranagihînim, lê di parastina dewletê de, bi taybet jî di parastina CHP'ê û Ecewît de dixwestin bijîn. Di mekanekî wisa de xwe bicîh kirin. Ev heta dawî ez fikirandim. Çima hema ji nişkê ve mala xwe tînin. Em li Kurdistanê tevlî welatparêziyê dikin, me dikarî em vê malbatê jî wisa kar bînin. Lê bi vî şiklî hatina vê malbatê hinekî guman ava dike. Sankî xwe davêjin navendê, weke ku xwe bavêjin biryargeha Kemalîzmê ne. Ji bo me ji her alî ve bi wateye û teqez divê ku mirov le ser raweste. Di van hestan de aliyê ku giran dihat çibû nizanim. Hem ev taybetmendiya malbatê, hem jî ev taybetmendiya jinê bibû girêkeke kor. Meseleyeke û her ku diçe rehetsiz dike, her ku diçe xistina rê ferz dike. Rêgezeke feodal a mezin, rêgeza Kemalîzmê, rêgeza nokeriyê; ya din jî jine, weke zayend jî xwedî girîngiyeke çareseriya xwe ferz dike. Yek jî bi pêşengatiyê dilîze. Rêberekî me yê ku dixwaze derketinê bike heye, li derdora wî pozîsyoneke û astengî ava dike. Bi awayekî ger wê bibe alîkar, çawa? Bi gelek pirsnîşanên bi vî rengî her roj dagirtî derbas dibe.

Ji bo min jî serdeçûneke pir zehmet bû. Tevî ku pir jêrevîna min jî hebû ji nişkê ve min li derî da û ketim nava vê malbatê. Ji aliyê mekan ve xwe pir baş rêxistin kiriye û li gorî pîvanên Kurdistanê heta dawî cihekî ku tu bêjî lukse, weke sosyete dikare nav lê bike xwedî vesaziyeke wisa bû. Yanî avaniya malbata burjuvaziya biçûk a ku heta wê demê min çavdêrî nekiribû heye. Lê wisa pergaleke sadebûyî nîne. Ez bawerim di pêvajoya serdestiya KT'yê ya çil salî asta heri jor hinekî dîtiye, malbateke

ev jî li gorî Kurdistanê eyar kiriye malbatek nokere. Ya din jiyan bi taybetmendiyên nokeriyê re tevlîhev kirine û li gorî xwe stîlek derxistine holê. Jiyaneke pir pêşketî, tevgerînên ku hatine eyarkirin, bi ziravî jiyaneke wan a heta dawî hatibû rûnişkandin hebû.

Ya min jî tam berevajî bû, hema bêje weke kesekî çil salî li çiya mayî û ketina nava malbateke çil salî pêk hatî bû.

***Ab.:*** Hinekî wisa bû Serokê min.

**---.:** Dişibe çi ketina min a vî derî?

Ya rast di dîmen de weke ku ez; " *Li hevala xwe ya rêzdar"* digerim. Gelek nîşane jî vê didin diyarkirin. Jixwe malbat jî wisa pêşwazî dike û ez dibêjim; "*Keça we li kîderê ye, hevala min e"* bi tirs pirs dikim. Pir bi nakok be jî hevaleke û li ser sosyalîzm û Kurdîniyê disekine. Ne di rewşa parastina helwesta xwe çi ya çînî, çi jî ya netewî de ye. Yanî şêwaz hinekî jî dibe şêwaza serwer, malbat bi gumane. Di nava grûba me de nîqaş pir kûrin. Em nêzîk nebin zêdetir, meyla em ê pêre eleqeder bibin û biçewsînin heye. Di wî derî de ketina min a hundir, vaye dişibe wê rûşwetê. Dîsa dişibe girtina wî perê bavê min. Ez bi hestên dagirtî diçim, hem jî endameke grûbê ye. Lê malbateke herî zêde rista nokeriyê lîstiye. Li deriyê vê malbatê dayîn, ji aliyekî ve weke li deriyê dewletê dayînê jî dikare bê dîtin. Ji ber ku avaniya malbatê ev e, teqez rastiya bi Kemalîzmê re, bi CHP'ê re hevgirtî heye. Ew bi xwe çiqas bêje çepgire bile bêje, bi awayekî objektîf cihê vê malbatê di Rizgariya Netewî ya Kurdan de diyare. Em, weke tevgera herî radîkal a sosyalîst derketine holê. Di vê wateyê de ev ketin, di heman demê de ketina nava hesab pirsînekê ye jî.

***Ab.:*** Ji vî alî ve serdegirtineke, lê ji aliyê din ve jî ger rewşeke wisa nebûna rewşeke xwezayî dikarê bê raberkirin.

**---.:** Ketineke pir girîng bû. Disa dilê min tê devê min. Ya rast basîte tê bêje; "*Merheba, çawane"* wê merheba te bigirin. Lê li gorî min rewş pir cûda ye. Bawerim dema ku ketim derî pir bi

zanebûn nebe jî ez dikevim ferqa bi qasî ku belaya min girtiye serê xwe û gava mezin ku min avêtiye. Hewl didim Enqerê tahlîl bikim. Nokeriya Kurd a ku li derdora Enqerê û Kemalîzmê kom bûne tahlîl dikim. Kemalîzm, nokerî û jin; bi van hersê nakokiyên mezin hewl didim di kesayetiya xwe de pêwendiyeke di asta herî jor de pêk bînim. Di navenda Enqereyê de li qadek ku MÎT lê serdeste de, hevgihînek ku hesabên xwe yên wisa heyî pêk tînim. Dikare bê gotin; "*Ji hundir ve fetihkirina qelê*" ya li berçav tê girtin ji wê xetertir û pêştire ya rast; bi qasî wêrekiyê şêwazekî fetihkirinê ye. Ev çareserî, beşa herî hestyar û divê ku serî li ser bê êşandin yên mijara romanê ne. Ez bi xwe jî matmayî dimînim. Tevgerîneke pir cuda û krîtîke, dê ristekî jiyanî bilîze yanî tevgerîneke wisa mijara gotinê ye. Ji bin derketin bê derfet tê dîtin. Lê li gorî min, ji bo çareseriya Kurdan çareseriyeke din nîne. Çawa ku ew îsyana yekem girînge û xwedî taybetmendiyeke mohra xwe li kesayetiya min daye, ev pêwendî çil car jê zêdetir xwedî wate ye. Tenê ne ji bo min, ji bo hemû Kurdistanê heta dawî bi wateyan barkiriye û di heman demê de vediguhere çavkaniya şênber; ji berk u daîreya dewletê, pêwendiya dewletê pir baş hatiye rêxistinkirin û di taybetmendiya malbata herî baş tê parastin de ye.

Malbat û jina ku parçeyekî ji vê bû ji aliyê siyasî, civakî, madî û hestî sve erdestîya wê tame; asta min a rêxistinî jî li beramberî vê ji îsyana yekem leztire, bi rasti jî ji hemû aliyan ve lewaziyê jiyan dikim. Lê rawestgeheke wisa ye ku, êdî ev jî afirîneriya me dide diyarkirin. Rewşeke mirov bêje; "*Qedera tora xwe hûnand û ez jî xistim nava xwe*" bû. Yan jî weke ku min got tevgereke serdegirtinê ye yan jî taktîkekî siyasî ya bi marîfeteke mezin hatiye rêkûpêkirine, yan jî weke ku gelekan ji me jiyan kiriye, tevgereke kesayetiya ji aliyê hestî ve lewaz û hestyar dike ye; dibe ku hemûyan jî di nava xwe de dihewîne. Di nava hev de ye. Jixwe wan rojan heta dawî di nava rewşên tevgav de me. Bê

mubalexe dibêjim, roj wisa bi zehmetî derbas dibûn ku, êdî ev jî dibe taybetmendiyeke bi min re. Ji ber ku gelek demên pêwendiyên min ên civakî, hertim di demên wisa zehmet de pêşketine. Ez dikarim ji bo vê pêwendiyê jî heman tiştî bêjim. Hema bêje diçim û dihatim min jiyan anîbû asta nakokiya pêwendiya ku; "*ya tê vê pêwendiyê çareser bike, yan jî jiyan nake.*" Ji hemû alî ve; ji aliyê siyasî û civakî ve, bi aliyên xwe yên hestî û Kemalîzmê ve, yan tê derbas bike, yan jî jiyan nake, tê tinebî û biçî û di asta herî jor de di asta nakokiyeke di hat jiyankirin de bû. Ger ez bêjim bi van nakokiyan her roj di asta ezaba dojehê de bû, di cîh de ye.

Tam di vê xalê de ez bîranîneke xwe ya din ji we re bêjim. Min xwest ez ji nava vê grûbê birevim. Ez bi vê fikirîm. Ev ne tam revek, dikare bê gotin paşvekişandin. Dibe ku xebera kesî ji we ji vê nebe jî. Belê, nêzîkî 15 rojan min ji vê grûbê îstîfa kir. Ez qala reva xwe ya piştre ji pêwendiya taybet nakim, pir beriya wê reveke min a wisa çêbû. Min digot; "*Ez ê ji ber vê pêwendiyê ji vê grûbê xwe bikişînim.*" Hêza min têrê nake, kesayetiyeke pir bandorker bû û ez revîm. Bi rastî jî gelekan ji we ev ferq jî nekir. Ma nayê bîra we?

***Ab.:*** Na Serokê min.

***---.:*** Min got; *"Îstîfa dikim."* Bawerim çend heftyekê domand. Piştre dîsa min bêrê xwe da. Min dît ku karekî ez ê nikaribim bikime, binketineke wisa qebûlkirin çiqas zehmet be jî min xwe paşde kişand.

Ez bawerim çek karanîneke jinê ya wisa mijara gotinê bû û îhtîmaleke mezin bi zanebûn dikir. Min grûb diherikand. Ev endama grûbê jî, hema bêje dixwest vê parçe bike. Hinek endamên berçav ên grûba ku min avakirî hene, jin dixwaze vê têk bibe. Dema ku grûbê parçe dike û dixwaze belav bike jî pir berevajî rêgeza ye, rêbaza wê ya ku min xeter didît naxwazim pê bifikirim, jin taybetmendiya xwe bikar tîne. Vê bi şêwazekî barîz

pêş dixe. Niha ez ê li beramberî vê çawa tevdîr bigirim? Devji grûbê berdan û çûyîn nabe, ji vê re hiştin jî nabe. Ger bêjim neke jî nabe, bawernake û sitemkare. Em rewşa xwe jî bifikirin yanî, ya rast em ne di rewşeke hostayane pêşwazîkirina wê de ne jî. Vaye ya ku heta niha jî di nava refên me de bi bandore, ew lewaziyên lawên Kurd, dîsa lewaziyên ku herî zêde bi taybet xwe di kesayetiya zîndanê de didin diyarkirin, wê demê jî vê jinê bi yatbetmendiyên xwe yên jintiyê ve bandor dikir. Kesayet bi xwe ve gire didan, grûba me hema bêje bi vê taybetmendiya xwe dixwest ji kar bixe. Vê eşkere jî nabêje. Dîsa ji aliyê min ve bi awayekî pir pratîkî û çareseriyeke heta dawî li gorî min weke çareseriyê pêşniyareke pê fikirîm min di vê demê de kir.

Jin bandorkere, tenê ne yek kesî, hema bêje hewl dide me hemûyan bandor bike û teqez nêzîkatiyên wê ne li ser esasê hevrêtiyê ne. Ez hinek xeteriyan hîs dikim. Êdî ji hemû aliyan ve dibînim ji aliyê vê jinê ve jinbûna xwe bikaranîn qet ne azadane û bi hevrêtiyê ye. Her ku diçe weke kesayetiyeke xeter xwe nîşan dide. Vaye di demeke wisa de, pêşniyara min a ji nişkê ve, ez dema di nava van hestan de bûm pêş ket. Li gorî pîvanên me yên civakî her çiqas xelet be jî, jixwe niha tiştekî wisa ji kesî re nabêjim, lê li gorî min yek ji gotinên herî girîng ê di qonaxeke girîng de diviya bû bihata gotin bû ev. Min jê re got; “*tu bi yekî re nîşanlî bibe, ev kes dikare ji her yeke me be jî.”* Min ev gotin cara yekê û dawî ji kesekê re got. Ne li benda gotineke wisa bû û hema bertek nîşan da. Min bi vê dixwest çi pêk bînim? Jin hatiye pêgihandin, amadekirin û kesayetiya xwe jî weke çekeke sereke bikar tîne û ez jî vê, û encamên neyînî yên ku ev ê rê li ber veke dixwazim asteng bikim. “*Tu bandorkerî, bi hêzî, di nava gruba ciwanan de bi şêwaza pêwendiya tu dixwazî, weke ku tu dixwazî dikarî bibî. Lê ez jî ji te re tevdirekê pêşniyar dikim; ji bo rewşa te ya heyî şaş neyê fêm kirin bi yekî ji me re sozê bibire.”* Hema ferq

kir ku ez dixwazim rê li pêşiya hinek tiştan bigirim û berê xwe da bertekeke mezin.

Em niha dikarin baştir vekin. Me bi vê nêzîkatiyê li dijberî polîtîkayeke tîpîk a mêtîngeriyê, herhalde tevdîrekî vekirî girtina min mijara gotinê bû. Jin wisa hatiye amadekirin, heta pileya dawî perwerdekiriye, pir jî balkêşe, bikeve nava kîjan grûbê bila bikevê, di rewşa ku wê grûbê ji hev belav bike de ye. İhtîmaleke mezin ji aliyê objektîf jî, sûbjektîf jî wisa ye. Me îspat nekir, lê ev xal jî teqez nayê paşçavkirin. Ev tevdîreke; yan tevdîreke siyasî, civakî, hestî ye. Heta serê hevalên me yên herî hêja, herî nêzî me jî şewitî. Grûba me endamekî xwe yê pir hêja ji dest da, heta têkoşîngeran jî xwestin vê pêwendiyê bikar bînin yan jî têkoşîn hinekî jî di encama vê pêşniyarê de pêşket. Ev kes, bû sedemê bûyereke têkoşîn a bi vî rengî jî.

***Ab.:*** Xwestin xwe bispêrin vê Serokê min.

***---.:*** Vê pêwendiyê ji rêxistineke sîxûr re jî zemîn peşkeş kiriye. Li cihekî, ji bo rizgarkirina grûbê em jî ji vê re razî bûn. Ev mijar mantiqekî zirav û şiyariyê dixwazin. Me heta salên 1976-1977'an wisa bir. Lê jin ne yeke wisa ye ku tu bi pêwendiyeke wisa ve sînordar bikî. Ne gengaze ku ez jî vê tevdîra demî heta dawî bibim. Pir balkêşe! Tê zanîn ev sal di heman demê de salen ku bi bager, sala ku dewlet bi ser me de tê û çarenûsa grûbê tê de hat diyarkirin jî bû.

***Ab.:*** Weke grûb jî ji aliyê fîlî ve sala ku di Kurdistanê de bûna gruba me hat rûnişkandin bû.

***---.:*** Sala ku grûb bûn di Kurdistanê de rê digire, lê ji aliyê dewletê ve jî bi awayekî cidî rê girtiye (Pîlot dikeve dewrê) û dibe ku bi giştî dîroka Rizgariya Netewa Kurdistanê, bi taybet jî sala herî krîtîk ya dîroka PKK'ê bû. Di demeke ewqas hestyar de ez hewl didim wê tûş bikim. Kar her ku diçe girantir dibe. Li gorî min ger em xwe bispêrin vê malbatê, ev yeksane Ecewît û CHP. Dê rapor biçin ji vî zilamî re, rêberêkî filan grûbê bi filan malbatê

re di pêwendiyê de ye û her ku diçe ber bi asta pêwendiyeke taybet vediguhere. Li beramberî vê rewşê tenê dikare tiştekî bêje: "*Pêwendî pêş bixin.*" Niha ji bo hevalên ku pêwendiyeke tîpîk jî tînin berçavan, her ku diçe çiqas bi guman be jî yan jî ev pêwendî tecrîda min jî bîne, teqez ez ê hîn ji ser de biçim. Ji ber ku tevdîra ku min girtiye êdî têrê nake. Keça me sozdare, lê ev ne ji aliyê wê ve, ne jî ji aliyê min ve jixwe nayê qebûlkirin. Şer despê kir. Çarenûsa grûbê mijara gotinê ye; niha êdî bi înkarkirina van ve birina grûbê ne gengaze. Ji aliyê siyasî ve jî ne gengaz bû û ji aliyê civakî, qadro ve jî bi rewşa teqez çareserkirina vê pirsgirêkê re rû bi rû bûm. Min gaveke din avêt. Dawiya sala 1976'an, despêka 1977'an diviya bû ez derkevim. Ji Enqerê derketina min û ew grûb jî saxlem derxistina min hema bêje tu rêyên din nebû.

Nebêjin Enqere û derbas nekin; tê çawa li dijberî Enqerê serî rakî? Kemalîzmê çawa derbas bikî, tê çawa grûba Kurdistanê ya heta dawî radîkal sax-selîm derxî? Di wê demê de pîlot jî ketibû dewrê û digot; "*Tu pere dixwazî pere, çalakî dixwazî çalakî, jin dixwazî jin, zêr dixwazî zêr, mal dixwazî mal, her tişt heye*" û li derdora min diziviri. Em bi rewşeke wisa hestyar re rû bi rû ne û ya rast li derdora wî jî gumanên wisa hene. Heta niha jî xaleke qala wê tê kirine û dibêjin; " *Madem ev zilam bi guman bû te çima pêwendiya xwe jê qut nekir?*" Kesekî ewqas derfetan pêşkêş dike bi rastî jî neçare bê dîqatkirin. Jixwe malbat heye, malbat heta dawî yekser jê re derfetan pêşkêş dike, lê derfetên çawa? Pîlot Kurdekî ji Agirî ye, nokere û heta dawî baş hatiye pêgihandin, xortek çeleng bû. Min heta niha jî xortekî di pozîsyona wî de nedît. Bi min re hinekî rê girt, bi dîsîplîn bû. Tabî dijmin pêgihandibû.

Jin jî wisa. Zelale, hatiye pîvan, kesayetiyeke dawerivî ye. Lê pir baş dizane ku, di navbera vana de tiştek heye û pir balkêşe, li çûna sergirtina nakokiyê yan jî li şûna qutbûn û jê dûrketinê, ez helwesta bi nakokiyê re pêwendî pêşxistinê raber dikim. Bi Pîlot

re jî bi hinekî din kûrkirina pêwendiye êdî giştime rewşa ku em bi hevre bikevin nava malbatê û min gihand wir. Zêr ji me re kirî. Dema ku me pêwendî hinekî din bi hêz kir, taybet kir êdî ji binî ve girt. Her ku çû bi awayekî vekirî digot; " *bira ez di vê mijarê de ji her tiştî re heme."* Em jî hinekî wisa li malbatê gerîn, bal kişand. Em baş jî edapte bûn. Tevî ku pir zehmet bû jî min ji pêwîstiya wê bawer kir. Zarokên vê malbata hejar dibe ku hinekî din durist bûn; bi heyret û matmayî lê dinêrîn ku bi kesekî çawa ketiye malbata wan. Îhtîmaleke mezin bavekî noker ê çil salî heye. Jixwe wî jî digot; "*Ji bo ku em wî bi dewletê ve gire bidin me girt nava mala xwe."* Ev gotina wî di rojnameya Cûmhûriyetê de hat weşandin. Digot; "*bi girtina nava malbata xwe me yê ewladekî baş bi dewleta xwe bida qezenckirin"* ev pir girîng e.

Hunerê çil salan yê camêre. Wê yekî weke me bi dewletê ve gire bide û keça malbatê jî bi vî rengî binirxîne. Ez bawerim emniyetê jî ji vê re got erê. Ji ber ku min dizanî pir zêde diçe emniyeta Enqerê û tê. Hat erêkirin. Piştî hat erêkirin û şûn de niyaza keçê jî hat guhertin. Ya rast rewşeke keçê wisa ya hestan nabe, îhtîmaleke mezin weke ku min got keseke bi armanc bû. Yanî di cîhana wê de wisa bi hestan tevgerîn nîne. Ev pir şênbere. Ji hemû aliyan ve siyasî ye. Ez bawerim kesayetiya ku em dikarin ji hemû aliyan ve bê hest tabîr bikin. Pir sar, heta rewşeke em bikarin weke cemidîna mar binav bikin heye. Ev der pir girînge. Çima cemidîna mar? Zivistanê çawa ku mar dikeve xêwê û cemidiye, ya vê encax mirov dikare bişibîne ya mar. Di vê navberê de meraqa min jî her ku diçe zêde dibe, difikirim ku di vê de karek heye. Ger bixwaze tu dikarî bigihêje şiyariya herî baş. Çima ewqas cemidî disekine? Çima ewqas xwe bi cemidandina mirinê dorpêç dike? Lê aliyê wê yê din heta dawî bi behremende, ger bixwaze dikare pir balkêş be.

***Ab.:*** Di asta zanyarî de jî wisa bû Serokê min. Dîsa di nava tevgera ciwana de jî wisa bû.

**---.:** Ji hemû aliyan ve wisa bû. Îhtîmaleke mezin rastiya dihat jiyankirin, ya li beramberî me bûyereke dewletê ye. Ez niyaz başim û heta pileya dawî ecemî me. Di rewşeke heta dawî bi hestên xwe tevdigerime. Di feraseta min a rêxistinê de, feraseta min ya siyasî de teyîsînên vê hene. Lê ya wê pir cudaye û îhtîmalekek mezin taybetmendiyên min jî dibîne. Nemaze hesteke pêş nekeve weke ku diyare, meyla min, hem ji aliyê meyla dewletê, teqez pêwîstiya ev kes di nava pêwendiyeke wisa de girtine. Ez bawerim dewlet jî girîngiyeke mezin dide malbatê. Ez di ferqê de me ku di kesayetiyê de durûtî heye. Tevî vê jî pêwendiyeke pir girîngi didimê û di mercên ku ev pêwendî tê de pêşketî derketineke me pir girîng jî heye, lê ew pir durûye, dibe ku bi xayînî dikeve nava tevgera me. Nemaze cemidîn û mirina ku bi vê kesê re, xwe dispêre kîjan armanc û kedê tê fêmkirin. Ev taybetmendî wisa binavkirina me gengaze, ya rast jî ev e.

Derketineke me ya her ku diçe bilind dibe xwe digihîne armanc û wateyê heye. Bi bîrdoziya, hêvî û rêxistina Kurdistanê ev derketin pêk hatiye. Pir bi coş û kelecane. Ji aliyê din ve jî bi dewletê re heta dawî pêşwazîkirineke polîtîk tê jiyîn. Bi rêya malbatê ew xiyaneta mezin li ser Kurdistanê tê ferzkirin, di tevgerên qirkirinê de bikaranîna mezin, ji aliyê wê ve teqez tê zanîn. Dubare rista bêyom, lanetkirî bi rêya malbatê wê têkilî kar bikin. Kesayetiyeke ketiye nava vê bêyomiyê wê hest pêre pêş bikevin, şêwaza pêwendiyeke asayî ya mirovî dê bikaribe pêş bixe? Ji nava xiyaneta mezin tê. Xwe çepgir dide diyarkirin, wê demê keremke ji hevaltiyê re. Lê vana di wê de veguherîne sêva nava wê vala, rizî, reşbûye û wateya xwe ji dest daye. Ya vê jixwe nabe sosyalîzm, lê ne kapîtalîzm û feodalîzme jî, ti welatparêziyeke wê jî nîne. Tenê nokereke metirsîdîare.

Jixwe mercên azadiya jinê jî nînin, ne gengaze, di rewşa herî xirab tê bikaranîn de ye. Bi awayekî xwezayî encamên ku di kesayetiya vê de diteyîse, cemidandina mirinê, kesayetiya mar û

dîqat bikin, şêwaza pêwendiya wê ji aliyê ruhî û fîzîkî ve dixe çi halî. Ez demeke dirêj li ser difikirim û dibêjim çima wisa ye û min wate nedidayê. Ger hinekî jî girêdana wê bi sosyalîzmê bi rizgariya netewî heye, min digot divê ev zindî bibe. Min jî xwe di feraseta jiyanake rast de şert danî ye. Dema ku şert daniye jî jê re gotiye; *"bi yekî ji me re bikeve pêwendiyeke ji rêzê"* Ji ber ku pêwendiyên wê ne asayîne. Bi xwe re pêwendî danîna wê weke ku pir aliye hinekî jî nîne, aliyê hest giranbe jî, jixwe gihandina min a asteke armanca wê ya pir alî heye. Li Enqerê ev malbat nirxandin heta pileya dawî ji aliyê taktîkî ve bi îsabete. Baş jî derkeve, xirab jî derkeve bi vî rengiye. Ger baş derkeve, jixwe çawa demên berê Kurdistan bikar aniye, em ê jî li ser navê Kurdistanê heta dawî wê bikar bînin û ev jî mafê me ye. Ger xirab derkeve malbatê CHP'yî û Ecewît derkeve. Niha em sedema derbaskirina Ecewît ya Turkêş jî fêm dikin. Di encam de ji heman malbatê ne û min pêwendiya taybet bilind kiriye. Li gorî hemû pîvanan êdî ez jî yek ji kesê wê malbatê me. Hem jî di dîmen de ev malbateke CHP'ê ye. Çima dewlet malbateke wisa tine bike? Bandor dibe, tu hatiye dorpêçkirin, jixwe tu ji polîs ditirsî.

Piştî sala 1976'an û şûn de em di dorpêçeke bê aman de bûn. Pîlot jî li gel me ye û kontr-gêrîlayekî ji hemû aliyan ve bi Daîreya Şerê Taybet ve girêdayî ye. Min gotibû ez weke çûkê di qefesê de, dikare birûçikîne di xwê de dabike û weke parîyekî dikare bê xwarin didît. Dibêje; "*Me çûk baş xwedî kiriye.*" Ji aliyê din ve jî ez di nava malbatê de me; ev malbat jî her ku diçe ber bi Daîreya Şerê Taybet ve dibe. Jixwe pêwendî her ku diçe min ber bi endamekî malbatê ve dibe. CHP'e û ji wir jî diçe dewletê û diçin encama; *"Camêrê me çar çar di kontrolê de ye."* Jixwe di raporên ku diçin de daxwuyaniyeke wisa ya yê me heye. Ev, di wan salan de ji sedî sed dibêje em di bin kontrolê de ne. Min jî di dîmen de ji sedî sed ev dîmen dan. Ez tam ketime nava qaleyeke dijmin. Çepgirim, Kurdim, lê di nava wan de heta dawî zemînekî

helandinê mijara gotinê ye. Hinekî niyazên min ên baş hene û ez bawerim ew bi xwe jî jixwe Kurdîtiyê dikin. Çil sale pîşeyê malbatê Kurdîtiye, malbat kurditîyê baş nas dike. Dê çi bikin û wî çawa bînin ser rê baş dizanin. Bi kurdîniyê re pêwendiya xwe jî jixwe li ser vî esasî ye.

Li gorî min pêşketina vê meylê pir girînge: Dixwaze bila siyasî, yan jî em jê re bêjin hestyar, ji bo ku ez bikaribim derketinê bikim pêwîste vê pêwendiyê kûr bikim. Hema bêje dengek ji min re digot; "*Pêwîste di vê mijarê de pêş ve biçî, vê bike, ger na tu nikarî bijî.*" Pêwîst bû ez hestên xwe jî perwerde bikim, hestên min ên neyî diviya bû min pêş bixista. Divê evîna min a neyî ez pêş bixim, teqez divê ku di dîmen de bidim bawerkirin. Ya li beramberî min jî mîna gura ye, ne keseke wisa bi asanî bê xapandine, lê divê ku ez ji hemû aliyan ve bidim diyarkirin ku pê ve hatibe girêdan da ku ev pêwendî pêş bikeve. Ez bi vî rengî bikevim deriyê malê ku ji bo gavek avêtibe. Bê mubalaxe dibêjim, min rist ferz nekir, lîstok nelîst, lê zanîna xwe jî bi armancê ve, bê ku girêdana xwe bi armancên xwe yên taybet ve ji dest bidim parast û ev jî serkeftî derbas kir. Dixwaze ya li beramberî min bila malbat be, jin be, digihêjin encama; "*Ev camêr tam hatiye girêdan, ji aliyê ruhî û darayî ve tam hat girêdan.*" Jixwe ne gengaze ku bigihêjin encamekî din. Vaye me pêwendiya xwe ya herî hestyar bi vî rengî pêşxist, bi wateyeke din me şerê di nava qelê de wisa da.

Niha ji Enqerê derketinekê dikim, lê bi pêwendiyeke taybet re. Em wisa hem jî bi teyarê daketin Amedê. Em ji qaleya Enqereyê ya Kemalîst û bi firokê daketin Amedê. Di vê salê de hûn zanin di 27'ê Mijdara 1978'an de em ê hewl bidin PKK'ê damezrînin. Em ji navenda Tirkiyê ya Kemalîzmê tên navenda Kurdistanê Amedê (Ew jî xistine çi halî tê zanîn) û li wê derê jî hema bêje pergaleke weke mala wan li vir jî pêş dikeve. Malan naecibînin. Malan rêkûpêk dikin, lê ne maleke ji aliyê milîtanekî ve bê karanîne,

hema bêje dixwaze weke mala rayedarekî dewletê rêkûpêk bike. Zêde dengê xwe dernaxim, lê ji dil lihevkirinêk pêre nîne. Her ku diçe jiyanê kehr dike. Bawerim ji aliyê hêza din ve jî wisa bû. Ne parîkî bi asanî bê xwarin û daqurtandin bû. Qaşo zewaceke li gorî irf û adetên Kurdan pêk hatibû. Êdî piştî ku me ew gav avêt û şûn de, şer jî dijwar dibe. Zewaceke li gorî wan çêbûye. Li gorî wan êdî divê ji hemû aliyan ve ez dibin venerînê de bim. Êdî rojane dewlet min dişopîne. Bawerim peywira wê jî ew bû.

Wê çawa min bi pergalê ve gire bide? Weke her zilamekî Kurd tevgerîn û pîvanên ku kesekî tevlî vê pêvajoyê dibe hene; her ku biçe wê bibe malbatparêz, dê ruhê xwe bifroşe, tevlî zar û zêçan bibe. Ev rewşa pêşxistina malbateke ji rêzê ye û bi min re yek ji van hestan jî pêş nakeve. Alî wisa ketine pozîsyona hevdu tinekirinê. Ew dixwaze min bin bixe, bi îhtîmaleke mezin li ser esasê dewletê wê bibe. Ez jî hîn bikaranîna wê didomînim. Weke ku derbaskirina min a sala 1977'an têrê nekiriye, ez sala 1978'an jî derbas bikim ku derbaskirin tê wateya du salên PKK'ê pir bi başî derbaskirinê yan jî bersiva herî baş ji pêvajoya hestyar a PKK'ê re dayînê. Di rewşeke wisa de demjimêr jî ji bo aliyan giringiyeke mezin qezenc dikin.

Di dîmen de her yek ji we qadrone, şer dikin, lê hûn tenê li derdora vê pêwendiyê dizivirin. Dewlet yekser ji bo ji holê rakirinê ser min de nedihat, lê fikra wan, ji hemû aliyan ve ben xistine sûtiyê min û jixwe temenê yên din 24 demjimêrin bi vî şiklîbû. Rewş tam jî bi vî rengî dinirxandin. Em ji rêderketinekê, xapandineke dîrokî wisa pêk tînin. Malbat nokereke çil saliye û rêberekî Kurd ê nû ketiye nava malbatê. Ji xwe çepê Tirkan rewşeke nokeriyê dijîn. Min jî xwebexşî dîtine, min sutûyê xwe dirêj kiriye, dewlet jî dibêje; "*Malê ku em lê digerîn û me ne ditît, dît.*" Bi rastî jî ditiye û hema wisa ye. Hem rêbere, hem jî behremende û di dîmenê kesekî pêş ferq kiriye de me. Ez bawerim Pîlot jî ew gotin ji bo wê ji min re dikir. Dibe ku

xwestibe hinek tiştan ji min re bêje, lê heta dawî jî bi rêgeza nihîniyetê ve girêdayî bû. Gelo bi rastî jî alîgirbûna min qet di serê xwe de derbas kiriye, nizanim. Ji ber ku piştre gotin teyara wî ket û mir. Konrt-gêrîlaye, kî dizane dibe ku heta niha jî dijî. Yan jî hat kuştin. Dibe ku min ew ji aliyê ruhî ve qezenc jî kiribe. Ji min re digot; " *Tu çûkê di qefesê de yî."* Weke ku dixwest asta xeteriyê vebêje. Ez ji nebîstîve hatim. Lê di dîmen de pir daye rehetkirin, weke ku pêwendiyeke pir alî be, heçko hêz dide min da diyarkirin. Belê, vaye wisa ji sala 1976-1977'an jî zêdetir hema bêje dê har bike yan jî jixwe wê dike armanc bi şêwazekî wisa re rû bi rû bûm û pêvajoyeke diviya bû em pêşwazî bikin li pêşiya me bû.

C., Kemal Pîr, M. Hayrî Dûrmûş ew jî hebûn, piştî ku bûn şahidê yek roja jiyana min a li Amedê, dadikevin xwarê û dibêjin; *Em vê jinê bikujin."* Tabî ez nizanim li beramberî hevalan çawa tevgeriye. Ya rast bi hevalan re çil qat ji min baştir lihev dikir wisa diyar dibû. Lê heqareta wê li hevalan, rê li ber çavdêriyeke; "*ewqas jî nabe"* vekirina wê û ji vir dema ku mirov tevdigere rê li ber reşkirineke herî xirab vekirin, heta dawî dide fikirandin. Lê ez pêwendiyeke wisa pir bi asanî ber bi pêşve dibim ku, tam jî di wê demê de em manîfestoyê dinivîsînin.

Li Amedê mala ku em lê dimînin vaye di nava nêvengeke tahrîkên ku mirov nikare jê re tahamul bike de dinivîsînin. Hêz û bandora manîfesto li ber çave. Tam jî di vê pêvajoyê de reva xwe ya ji malê ku duwemîn bû 15 rojan didomînim û dîsa hatim. Ev jî paşvekêşanek bû. Hûn bûna we yê di heman kêliyê de kuştiba, yan jî we yê xwe kuştibana. Weke ku heval difikirin karê kuştinê bikim, grûbê serûbin bibe. Ya herî xirab ji xwe ez bi guman bûm. Dewletê pêwendiyê xilas bike. Lê diviya bû ez vê pêwendiyê bidim jiyîn. Kêmûzêde min dikarî dewletê mijûl bikim. Em niha dibêjin mijûlkirin, lê tê çawa mijûl bikî, ev pirsgirêke. Ez di

rewşa rizgarkirina demjimêrekê de me. Lê di wê demê de ew jî fêm dikin ku ez dixwazim demê qezenc bikim.

Niha hinekî li şerê taybet binêrin; hema hema di hemû nirxandinên xwe de dibêjin; "*Apo dixwaze zeman qezenc bike.*" Hemû artêşa xwe jî li ser navê me rakiriye ser piyan. Lê xebera we jî ji têgeha zeman nîne. Lê fermandariya artêşa giştî ya Tirk ji hemû hevdîtinan dixwaze zeman qezenc bike. Di wê pêvajoya agirbestê de di wextek sê mehan de zemanek zeqenckirin heye. Hêjî dibêjin; "*Ya ku PKK kir PKK, xapandinek bingehîn bû.*" Min wê deme Talabanî, avaniya noker ya li Başûr hinekî nirxandibû. Bi rastî jî Ozal, yek ji şerkerê herî baş ê şerê taybet bû û gavek avêt. Qala guhertina pergalê dikir û di derbarê me de digot; "*Hûn destê xwe bidin dê milê we biçe, tiştekî pê tatmîn bibe nîne.*" Bi vî rengî difikirî. Bi şêwazekî pir balkêş şoreşgeriyeke barîz heye. Ozal çû, lê heta niha jî nefes bi malbata Ozal nadin girtin. Doh kurê wî jî digot; "*Dê konrt-gerîla min bikujin.*" Tenê ji ber ku di vê mijara Kurd de xwest gaveke rast bavêje ango nîyet kir, tolgirtina mezin a Kemalîzmê wisa pêş dikeve. Ji ber ku pir baş dizane ku ez çi dikim. Zemanê ku ez qezenc dikim baş dizanin tê çi watê û di vê mijarê de di asta dîrokî de ezmûneke wan heye. Niha sedema qala Ozal û asta pêwendiya ku dixwest pêş bixe kirina min, ya rast zeman qezenckirin çiqas xwedî wateyeke mezine. Aliyê ku baş û rast zeman qezenc bike, tê wê wateyê ku hêz, însiyatîfê jî di destê xwe de digire.

Vaye di wan salan de ev jin bi hesabkirina demjimêran ve tê. Ya tê xwe eşkere bikî, yan hal bikî, ya nû bike, yan jî jiyankirin nîne. Direvim nabe, weke ku heval difikirin bikujim nabe; ez ê çawa ji hemû aliyan ve weke ku ew dixwaze bibim? Ew jî ne gengaze, ya rast ez ketibûm nava dîmenekî wisa baş, lê êdî nabe. Nameşe. Di vê pêvajoya zehmet de zor-bela me 1979 jî dît û me ew şand Enqerê, ji bo biçe Enqerê bigihêje malbatê. Îhtîmaleke mezin li Enqarê nirxandineke berfireh kirine. Pêvajoyeke sê mehî

bû û min jî ev pêvajoya sê mehan baş nirxand. Pir girînge, yanî bêjim; "*Nikarim cuda bibim*" ew ê jî pir bi tevdîr tevbigere. Dibe despêka sala 1979'an. Neçarim pir bi baldarî tevbigerim. Ji sedî sed di bin venêrîna camêran de me û bizanibin ji venerînê derketime, wê hema min bikujin. Divê ku kêlî bi kêlî bidim diyarkirin ku pê ve girêdayî me. Li mirovên me bi xwe binêrin û bizanibin ku ev tê çi wateyê. Bifikirin hûn neçarin bi jineke wisa re bijîn û li beramberî we her saniye wisa bike, me dît bê ka sebra we heye yan na. Lê bi me re sal derbas dibin, tê sebirkirin û bê ku vekirîbûnek bê dayîn, guman bê kirin girêdanek tê raberkirin. Ne hêsane û ya afirandiye, jê re encam vekiriye, çiqas girînge dema ku ji îro ve lê tê nerîn baştir tê fêmkirin.

Diçin Enqerê û li wir dinirxînin. Pîlot jî dinirxîne. Ji ber ku me Pîlot jî heta wê demê bi xwe re anî. Ya rast hîn Pîlot ne ketiye ferqa wê ku ez jê qut bûme û ketime rotayeke cuda hîn neditiye. Ji wan re dibêje; "*Endamê ku em venêrîn dikin ji hemû aliyan ve bi awayekî bê guman di venêrîna min de ye, lê me hîn nehelandiye, lê dîsa jî di 24 demjimêran de em nahêlin ber bi cihekî din ve gav bavêje.*" Wisa difikirin. Ez jî li beramberî vê dibêjim; "*temam wisa ye, çarenûsa me di destê we de ye*" bi vî şêwazî di nava dîmenekî de me. Weke ku min got, vaye tam jî di xaleke wisa de, ew çû Enqerê. Betlane bû ez nizanim. Mamoste bû, ji Çinarê her meh mûçe werdigirt. Ew pere jî heta kêliya dawî me ji bo tevgerê bikar anî. Ev çûyîna wê ya sê mehan, ji bo min jî zemanek afirandibû.

Erê dibe despêka 1979'an. Min bangî Ferhat Kurtay kir. Bi ereba xwe ya dewletê hat û em di 20 Nîsanê de çûn Mêrdînê. Em li Mêrdînê êdî diketin pêvajoyeke pir cuda. Dema ku em li Mêrdînê bûn tê bîra min, wê demê nivîsên Cuneyt Arcayurek di rojnama Huriyetê de dinivîsîn hebûn û di wan nivîsan de digot; "*Apocî Rojhilat dişewitînin, diqelînin.*" Êdî me zanî ku dê dewlet di vê pêvajoyê de ser me de bê. Min dem dirêj kir. Me di vê

pêvajoyê de damezrandina PKK'ê îlan kir. Jixwe beyannameya damezrandinê amade bû û me yê ew bi çalakiyekê ragihanda. Êdî me roj dijmartin û me digot bê ka wê çi bê serê me. 15 roj yan jî nêzîkî mehekê me li deşta Mêrdînê derbas kir. Meha Nîsanê me bi Ferhat Kurtay re derbas kir. Piştre îtîrafçiyekî ev gotibû û dewlet wahşiyane ser me de hat. Li ser vê li gel Ferhat Kurtay û Mehmet Karasûngûr me berê xwe da Riha yê. Di nava mercên pir zehmet de çar neçar em mehekê man û yek kesî ku me qebûl bike nebû. Di hefta dawî de min got; "*Îhtîmale em berê xwe bidin derve, lê ev jî ne teqeze.*" Ji ber ku bi hinek heval jî li ser vê fikirîbûn; "*em li Entebê mal bigirin, yan jî em dikarin li Wanê malekê bigirin*" wisa difikirîn. Amed jî jixwe êdî wisa hatibû berdan. Li Riha yê kevir biteqe em dikarin çend rojan yan bimînin, yan nikarin bimînin. Li Elezîzê Şahîn hatiye girtin û îtîraf kiriye. Ji walî re yan mudurê emniyetê re nizanim dibêje; "*weke ku min Apo bi destê xwe danîbe ez dikarim wî bibînim, tenê hûn ferman bidin.*" Ji ber ku ji Enqerê ferman nayê, emniyeta Enqerê nakeve rê û ev agahî jî digihêje destê me. Taktîke yanî. Herî zêde temenê te çend mehe. Vaye ew biryara derketina derve ya tê zanîn me wisa da, encax em dikarin vê bi zor û zehmet pêk bînin.

Bi vî rengî ji hemû aliyan ve derketina dervî venêrînê pêk tê. Carekê derketina dervî sînorên KT'yê pir girînge. Sûrî, Lubnan û Fîlîstîn, ji hemû aliyan ve di Rojhilata Navîn de qanûnên KT'yê yan jî qanûnên emperyalîzma ku KT jî pêve girêdayî ye heta cihekî derbasdarin. Wê demê pergala Sovyet heye û ev qad bi giranî bi vê pergalê ve girêdayîne. Dîsa li Fîlîstînê pevçûneke pir mezin a azadiyê heye. Jixwe Lubnan ji dewletbûnê derketiye. Dinêrim li qada Rojhilata Navîn rastiyeke wisa tê jiyîn û li wir ji hemû aliyan dikarim hîn azadtir bim. Ji bo pêşketina grûba me em dikarin derfetên baştir bafirînin. Em bi van fikran derketin û di encam de em bi vî rengî derketina dervî venêrînê de serkeftî bûn.

Piştî wê grûban dest bi çalakiyan kirin. Di hatina grûbekê de hejmar nêzîkî 300 kesî bû. Qonaxeke din ya PKK'ê yan jî ya PKK'bûnê bi avêtina vê gavê re me da despêkirin.

Tabî bi jinê re em hîn pêwendiyên xwe qut nakin. Min bayan bangî gel xwe kir. Tevî ku min însîyatîf qezenc kiribû, xwedî derfetên dijderketinê bûm heta pileya dawî bi rêgezan ve girêdayî tevdigerîm. Lê êdî di rewşa ku qûralên şoreşgerî jî bê aman ferz bike de me. Nêvenga hatiye guhertin, lingê me hinekî saxlem pêl erdê kiriye û kirpandinên hişk dikim, xebateke rêxistinî baştir dikim. Lê divê pêvajoyê de jin jî vala nasekine. Di heman kêliyê de bersiv dide hemû pêşketina. Çi tevdîrên ku teqez wê min bidin girêdan hemûyan digire. Lê êdî rewşeke wek ya li Amedê, li Enqerê ne mijara gotinê ye. Beyrût misoger vî şansî nadê. Ji ber ku Beyrût tê zanîn, cihekî ku erkê dewletê tê de nîne, erka Fîlîstînê tê de heye. Ez jî heta dawî pê re di pêwendiyê de me. Dewleta Tirk heta wê demê hîn bi Fîlîstînê re pêwendî jî ava nekiriye, em salên 1980-81-82 wisa derbas dikin. Ji bo rêxistina xwe em kongre û konferansê jî pêş dixin. Ber bi Tirkiye û welat ve çûyîn despê dike.

Berê xwe dana welat, perwerdeyeke leşkerî ya girîng, perwerda qadro û pêşketinên qadroyî bi jiyankirinê em pêş dixin. Di vê navberê de provakator jî hebû, ew jî bi devekî bê aman dibêje; "*Em nahêlin gav bavêjin Hekarî.*" Ez bawerim tîpekî cuda yê ku dewletê xistibû tevgerê mijara gotinê bû. Qelsî hene, bi awayekî metirsîdar xeteriyên berê xwe dayîna welat heye, hevalên herî niyaz baş jî digotin; "*Em teyarê birevînin, em van hevalên di girtîgeha Amedê de birevînin û rê li darvekirinan bigirin.*" Lê me deh teyare jî birevanda, bi vî şêwazî yek ji wan jî xilaskirin negengaz bû. Yên din bi lewazin, derketiye Ewrûpa bangewazî dike; " *Werin Ewrûpa, li vir heta dawî jiyan ji we re vekiriye.*" Ez jî ji bo nasnameyê bibînim ji wir dibezim wir. Ji bo malekê, ji bo xwarinekê, ji bo pêwendiyekê kedekê pir zêde serf dikim, lê belê

camêr jî li pişt min li dumbelekê dide, stran dibêje û bi keçika re dilîze. Lê dîsa jî derfetê dayîna jiyankirinê heye. Li her cihê ku diçimê, dema ku dibêjim derfetê perwer de, çiqas dikim vala derdixin. Jin ji aliyekî, Semîr ji aliyekî ve şerekî sexte didin despêkirin. Hema bêje dixwazin min di wir de bihelînin. Gelek hevalên weke hevalê me yê C. jî hene. Ji bo hevalê me yê F. Dibêje; "*Jineke weke te yan jî pêwendiyeke cuda dîtiye.*" Lê malbateke fonksyonele dişibe wê heye. Ez bawerim birayê wê Yildirim heye di hundir de û pêwendiya wî ya bi dewletê re îhtîmaleke mezin hatibû fêmkirin, yan jî li ber fêmkirinê bû. Herî kêm Semîr di asta fêmkirina vê de bû. F. tahrîk dike û jêre dibêje; " *Pêwîste maleke avahiyek ya camêrekî weke te zewicî hebe, jiyaneke wisa hebe, êdî dev ji vê berxwedanê berde, jixwe tiştek nîne.*" Ew jî di asteke girîng de ji wan hestan re dîl ketiye, tam nebûbe jî ketiye rewşa kesekî ji ber van hestan serûbin bûyî. Semîr hem wî hem jinê tahrîk dike, hewl dide wan ber de hev.

Divê ku ev jî bê diyarkirin, ev pêwendiya ku me xwest bi wê jinê re pêş bixin, li gel hêmanên din hevgirtina Bakur û Başûr jî di nava xwe de dihewand, wateyeke vê pêwendiyê ya vî alî jî hebû. Ji F. re digotin; "*Tu jî dikarî bibî lîderek, bi vî rengî jiyankirin mafê te ye jî*" û bi vî rengî ew berhev didan. Ev jin ji dikir mijara gotinê nakokiya Bakûr hertim derdixist pêş (Jin jixwe noker û sîxûre) û jê re digot, "*Çima tu dijber dernakeve*" û dixistin rojevê, her du jin li dijberî hev radikir. Bi xwe sipartina vê pêwendiyê dixwestin F. bi me re jî rû bi rûyî hev bike. Min ev hewldan û niyêtên provakator hîs kir û ji F. re got; "*tu bi aqil bî, tevlî nakokiyên van nebe, di dîmen de bi hev re şer dikin, lê di cewher de hev digirin, neyê lîstokan.*" Tabî hevalê me pir zêde bi rêxistinî û encamgir nebe jî, hema li gorî me tevgeriya, ji şerê van jinan re ne bû amûr. Lê moralê wî, hestên wî serûbin kirin û xwestin pir xirab bikar bînin. Armanca vî, ji hemû aliyan ve rê girtin li pêngava Hekarî bû, ji vê wêdetir tiştekî din nebû.

Ya din jî Silêmanê alçax hebû, birayê Heqî; ew jî vediz bû. Malbateke MÎT'ê dest avêtiyê û jê re gotine; "*Biçe tola birayê xwe ji Kurdan û grûbê bigire.*" Kesekî bi vî rengî hatibû xapandin û vedizek bû. Vaye vana hemû PKK'ê felc dikin. Konferansa 1. û kongreya 2. bi vî rengî nehiştin bikeve meriyetê. Em çiqas bi perwerdê, bi pêgihandina qadroyên nû dixwazin tevdîr bigirin, nahêlin. Bela wela kirin. Lê tevî vê jî me zanî em sebreke mezin raber bikin. Êdî derbasî sala 1983'an dibim.

Wê demê pirtûka bi navê "*Pirsgirêkên me Yên Pêşketin û Erkên me*" nû derketibû. Me ew himêz kir, divê em bixwînin. Ev dibe bersiva wê dema tengav di heman demê de. Piştî wê me di sala 1983-84'an de dest bi derxistine pirtûka bi navê; "*Pirsgirêka Kesayet û taybetmendiyên Milîtan*" kir. Di wê pêvajoyê de di heman demê de em hewl didin pêşiya vana bigirin. Çine evên ku li serê me dibin bela? Hîn jî em nikarin helwestekî radîkal bigirin. Ev jin wisa derdikevin. Em dixwazin çend jinan pêş bixin, ne gengaze. Her yeka ku em dest davêjinê, roja duwemîn yan dibe xulamê wan û derdikeve, yan jî dibin qurbanê kompoyên van û diçin. Ne zilaman dihêlin, ne jî keçan. Hema bêje destê min vala ye. Semîr jî tahrîkarê wê yê mezine. Tevî vê jî berê xwe dana welat ser dixim.

Em dixwazin pêngava 15'ê Tebaxê pêş bixin û heman nexweşî li wir jî belav dibe. Navendên wisa ne. Belê, ya din vana jî xwe weke navend dibînin. Pêkanîna erkên xwe li aliyekî bihêlin, li wir jî pêngaveke A. wan di nav de ne heye. Weke ku heta niha wî bi xwe jî tahlîl nekiriye, ji ber ketina nava nebesiyekê (Para van tê de pir zêde ye) 1984'an bi tenduristî nadin despêkirin. Ger em bi tenduristî despê bikin jî rewşa bi tenduristî nedîtin derket holê û ev jî rewşa xwe ya bûyîna benê ling bi dijwarî didomînin.

Ez hîn jî bi fikarim. Dema ku min dît girtina bin venêrînê ya vê pêwendiyê di welat de ne gengaze, min ew kişand gel xwe. Çûbû Ewrûpa, min ji wir jî kişand. Ji ber ku ew der jî felc kiribû û

sekinîbû. Me xwest em bixin nav pêngava dîrokî ya 15'ê Tebaxê, ew der jî felç kir. Dîsa me pîlan kiribû ku em eniyê jî bi pêngava 15'ê Tebaxê re ragihînin, lê tevî ku bi fermana wê bû ne beyanname nivîsand, ne jî tiştekî din kir. Di encam de em bi rewşa eniya xwe jî bê tenduristî ragihandinê re rû bi rû man. Ez bawerim bi serê hinek qadroyên din jî lîstiye, bi milîtanan lîstiye, bi jinan lîstiye. Encam, qet nebû derketineke weke ku em dixwazin, pêşketina wê jî bi wate nehat domandin. Heman tahrîkarî. Bi hemû hestyariyên xwe dîsa em girêdayî man û me careke din ew bangî gel xwe kir û êdî em ber bi encam ve diçûn.

Em bi heman kesayetê re rû bi rû ne. Piştî 15'ê Tebaxê, me Mijdara 1985'an jî jiyan kir. Li vir pêwendiya herî berfireh ya Sûrî jî heta pileya dawî xwest taxrîb bike. Xwest rê li ber bêcîhmayînê veke û xwest vê bide kirin; "*Rêber ez im, pêwendî li ser min re tê avakirin*" û kar ber bi mezhebgeriyê ve bir. Jidil dixwaze gavan bavêje. Hema bêje pêngava 15'ê tebaxê wê li welat tasfîye bibe; em dixwazin pêngavê bidin jiyankirin, bi zor û zehmetî em dixwazin xwe bispêrin hinek pêwendiyan. Pêwîste careke din em qampekê ava bikin. Teqez divê em wê qampa xwe, lê vê carê li ser navê xwe ava bikin, rewşeke wisa mijara gotinê ye. Lê ev, ji hemû aliyan ve di xîreta derfet ji vê re nedayînê de ye. Çû Qampê û di girtina hemû tevdirên ku qamp neyê karanîn girtinê de dereng nema. Me hinek milîtanên hêja jî şandin. Mînak Abdullah Ekîncî hebû, hindik mabû wî ber bi întîharê ve bibe. Wê demê hinek kesên mîna Kor Cemal, Terzî Cemal hebûn, bi wan re jî demekê di pêwendiyê de ma. Dîsa bi gelek hevalên me yên girêdayî re, heta bi biraderê me jî lîstiye û carekê dît ku, behremendiyên hemûyan kor bûne, qut bûne. Ji vê jî wêdetir hinek milîtanên me yên hêja anîbû rewşeke gotin fêm nekin. Weke ku min got; bi tahrîkên wisa ketibû nava serdeçûneke pêwendiyên sereke yên vê derê bihejîne û ev hemû jî bi şêwazekî zirav dilîst.

Ya herî girîng jî, di wê pêvajoyê de em ê amadekariya kongreya 3. bikin. Em cara yekem pêwîstî bi dahurandina kesayet dibînin û bi taybet jî pêwendiya jin dixwazim ji hemû aliyan ve ber bi çareseriyê ve bibim. Di nav hizrandina ev pirsgirêka ku bi salane pêre mijûl dibim ez ê çawa ber bi çareseriyê ve bibim de me û bi taybet ji aliyê jin ve armanca min teqez encam girtine.

Di hevdîtina xwe ya dawî de me ev nîqaş vekirî kir; wê li gorî xwe hewl dida min şîrove bike û digot; " *Tu qet naşibe Eb. Naşibû Nû. Û. heye tu naşibe wan jî, Terzî Cemal heye; Kor Cemal heye, Ab. heye, filan û bêvan heye tu naşibe yek ji wan, tu kî ye?* û pirs dikir. Eşkereye ku rewşa min naşibe ya tu ya ji wan. Li gorî xwe dibêje; "*Tu çiye derkeve holê"* li şûna ku ez wê derxim holê, ew hewl dide vê ferq bike. Bêguman vana hemûyan bê ku xwînsariya xwe ji dest bidim dixwazim bimeşînim. Min jê re got; "*Tu şaşî, tu nikarî bikaranîna vê çeka xwe ya jinitiyê min bîne ser rê. Te xwest cînseltiya xwe weke çekekê bikar bîne û te dizanî ku ez ê bertekeke mezin li beramberî vê raber bikin, min da diyarkirin ku ewqas dem dirêj di dîmen de be jî dikarim bi te re bijîm. Sebra min pir mezin bû. Gandî tê bîra min, ez dikarim bi qasî wî bibim xwedî sebir. Ji aliyê cînseltî ve jî dikarim li ser xwe serwer bim, ez wî hesabî nakim. Lê ji bo tê wê pir xirab be. Ger duristbûna te ne gengaze, durist be, ger na dê ji bo te pir xirab be, tê nikaribe derkeve pêşiya mirovahiyê."* Axaftineke me ya di vê naverokê de bû û min ev jê re gotin. Piştî wê derket, derketin ew derketin, li kîderê ye, çi dike, nizaim, jixwe zêde girîng jî nîne.

Ev jî çareseriyeke mezine. Bi rastî jî wisa bi destê xwe oxirkirin wate û encamên wê pir mezinin. Dibe ku sed hezar carî min mirin qebûl kiribe. Li ser van tiştên ku min diyarkirî weke lê zêdekirin, ez vê jî bêjim; li gel me şofêr hebûn. Jixwe yek hevalê ku bandor nekiribe tine bû. Hemû jî ber bi êşa mîdê ve biribûn. Bawerim hevalê M. S ji vê êşê re tehamul nekir û ji êşa mîdê

şehîd ket. A. E. Xwe kuştin. Mirovên pir hêja bûn. Ez bawerim yê me jî jê bandor bibû, ew bi xwe dinivîsîne. Tabî ji bo wan jî dibe ku bandoreke pir jê dûre.

Em bi şêwazekî bê aman şer jiyan dikin. Vaye yek ji wan hevalên şofêr yê ku ez qala wan dikim F. ye. nav O. S. Zarok bi şêwazên cuda bandor kiriye. Herî dawî di nava telaşekê de û di nava xwêdanê de mayî hat û got: "*Serokê min ez bawerim vê jinê xwest qala qampeke me ji min re bike. Di Derbarê te de pir xirab daxive, pir xetere.*" Xweziya xwe dadiwirtan û hertim digot; "*Pir xetere.*" Dîsa şofêrekî min ê din hebû, S.. ew jî revî û niha li kîderê ye ne dîyare. Ji vana hemûyan encamê ku min derxist, êdî texmîn dikir wê nikaribe ji destê min bireve. Êdî hîs dikir ku hatiye dawiya vê lîstokê. Sal 1986 û em giştine qonaxa domdariya tevgerê. Dê karê wê jî xilas bibe û ez dizanim bi awayekî vekîrî vê hîs dike. Bawerim komployeke dixwest pêş bixe hebû. Komplo bi hevalên li derdora me re xwest pêş bixe. Jixwe hertim baweriya navendê hildiweşîne, serûbinê hev dike. Dibe ku yek ji sedemê bi berhemnebûna wan jî ev be, di gel sedemên din. Bikaranîna hevalên keç ên derdora me gelek milîtan li Beyrûdê xistibû. Bi darbeya xwe ya herî dawî jî wisa dixwest min bixe. Lê ew zarokê ku ez qala wî dikim heta dawî girêdayî bû û em jî her ku diçe xwe amade dikin, rewşa me ya ber bi encam ve çûyînê heye û vaye hat îtirafeke wisa kir. Jin teqez vediguhere xayînekê. Hem jî xayîneke çawa! Wê we çawa bikar anîba? Di encam de me got em wê bixin tecrîdê. Di nêvenga qampê de tevdirê wê hatibû girtin, me girt tecrîd û lêpirsînekê. Ji bo ku em bidin diyarkirin em çawa nêzîk dibin ez ewqas li ser disekinîm. Dihat gotin ku; "*Di dadgeha wê de ji sedî sed divê îdam bigire.*" Heta ji bo ceza dihat gotin; "*Divê em çar hespan bînin, her du ling û destê wê bi hespan ve gire bidin û parçe bikin.*" Eşkereye ku ji dehşeta lîstoka ku dixwest bixin nav de mirov dikare ber bi

bertekeke wisa ve biçe. Dîsa me qebûl nekir. Jixwe îdîam jî dê wisa wahşî neba.

Di encam de berevajî me got em di asta eniyê de bigirin, heta me rêya Ewrûpa jê re vekir. Çû Atîna. Li wir jî wan karên xwe yên bêyom berdewam kir. Çend hevalên din jî gihandibû asta întîharê. Hevalekî me yê pir hêja M.O dixe nava derûnîyeke wisa ku jê re dibêje; “*Tu sîxûrî, bi gumanî, yan bireve, yan bimire.*” Ew jî ji ber ku milîtanekî pir tenge, vê bi xwe nade xwarin û întîharê diceribîne. Heta li ser hevalekî weke Eb jî (Heta niha jî saxe) dixwaze lîstok bilîze. Ew jî difikire; “*Gelo ez xwe ji qatê hefta bavêjim, çi bikim?*” Heta kêliya dawî tahrîkên xwe didomîne. Me jî wisa hişt.

Herî dawî di çapemeniyê de jî teyîsiye û tê gotin; “*Em çima nikarin derkevin pêşberî gel.*” Ew provakatorê dawî, Selîm Çurukkaya dibêje; “*Teqez Apo tevdireke wisa girtiye ku, dîktatorekî wisa ye, ne gengaze ew bi xwe bikeve vê rewşê*” û dîsa dibêje: *“ Em nikarin rûyê xwe derxin derve bikevin nava gel, ma ev ne cezayekî pir xirabe.”* Yanî li hişmendiya ku pêş xistiye binêrin, di dîrokê de tu dîktatoran risteke wisa nelîstiye û vana ji ber vî dîktatorî nikarin derkevin nava mirovan!

Ya girîng rast destgirtina van encama ye; ev encam raste û bi rastî jî cezadayîna herî mezine. Piştre di derbarê vê pêwendiyê de gelek tişt hatin nivîsandin, xêzkirin. Bû dahûrandineke mezin a dewletê. Bû dahûrandina Kurdistaneke mezin, zilamê Kurd, jina Kurd. Vaye weke ku hûn dibînin ev dahûrîna mezin jî ji şerê li pê hev hatin pêşxistin re, ji PKK’ya ku mezin dibû re hêz anîn. Hîn jî hûn dibêjin em şer dikin, lê divê hûn bizanibin, eksenê vî şerî yê sereke bizanin xwedî xeteke pêşketinê û çîrokeke wisa ye. Ez çima wisa tevgeriyam dibe ku weke pirsekê bê aqlê mirovan; min ev bi xetên giştî ji we re vekir. Çiye ev; îsyaneke, evîneke, lîstokeke yan şerekî taktîkî yê mezine? Çi jê re tê gotin bila bê

gotin, lê divê heta dawî li ser fikirîn, encamên mezin jê derxistinê re dest dayî yanî çîrokeke Kurdan a wisa ye. Wê demê çiye ev?

***Ab.:*** Di navbera salên 1978'an û 1980'an de tenê ne li Kurdistanê, çîrokeke li Tirkiyê jî pêşketina diyar dike ye. Hem ji aliyê civakî, hem jî di aliyê siyasî ve wisa ye.

***---.:*** Hem ji aliyê hestî, hem ji aliyê evînê jî wisa ye.

***Ab.:*** Rêgezeke hemûyan di nava xwe de digire heye.

***---.:*** Tenê ne di navbera salên 1978-80'ê de, dîrok ji hemû aliyan ve bi vê çîrokê ferqek qezenc kir. Ji bo Kurdistanê despêkeke pir cuda hat xêzkirin. Bû zemînê herî saxlem yê pêşketina tevgera azadiyê. Azadiya netewî, azadiya civakî bi vê ket rotaya xwe ya pêşketinê. Ji KT'yê ya ku hezar sale hertim lê daye, lêdana wê jî jê re kar maye, bi rastî jî ji ti tevgera Kurdan re, kesayetiya Kurdan re aman nedaye, di navika dewletê de, bi derfetên wê gotina bisekine û serdestiya wan vala desxistin heye. Jina herî baş amadekirî hinekî tahrîbat pêşxistin, lê di encam de dewlet bi xwe jî di şexsê wê de vala hat derxistin. Hinek qurbanî hatin dayîn, lê ji bo tevgereke dîrokî şayanî her tiştiye.

***Ab.:*** Hinekî jî encamek xwezayî ye Serokê min. Piştî ewqas girtiye zerar nedayîn jî ne gengaze.

***---.:*** Encamekî xwezayî û heta em dikarin bêjin bi tahrîbata herî kêm hatiye derbaskirin.

***Ab.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Başe, min çawa ji vê re li ber xwe da? Min ev pêvajo çawa dan despêkirin? Divê ku mirov li ser vê bisekine. Rastiyeke hatiye jiyîn û ger bê dîqat kirin ez bi şêwazekî zanistî îfade dikim, lê bi romana herî baş re jî dikare bikeve pêşbirkê. Mijara romaneke mezin jî dikare ewqas pêş bikeve?

***Ab.:*** Bi awayekî asayî dikare bibe mijara romaneke mezin.

***---.:*** Dahûrandina Kurd min çawa tesbît kiriye, ewqas berfireh kiriye, min sebreke çawa raber kiriye, ber bi rêkûpêk kirineke çawa û encameke çawa ve biriye?

***Ab.:*** Ji aliyê şêwaz ve hemû weke şopdarên îsyanê û taybetmendiyên wê diteyîsin.

***---.:*** Li gorî te taybetmendiyan weke heyî diteyîsîne?

***Ab.:*** Li gorî min hîn pêşketî, pir zanistî û pîlanekî girîng hildide nava xwe…

***---.:*** Li gorî te min çawa gihand vê esnekbûnê? Bifikirin, milîtanê me yê herî baş mirinê hildibijê re, yan jî dibêje " *em parçe parçe bikin"* hem jî di demeke kin de. Nikarin tehamul bikin. Ez çawa li ser piyan mam?

***Ab.:*** Li beramberî hevalan şerekî derûnî pir mezin dimeşand.

***---.:*** Erê şerekî derûnî yê pir mezin. Başe çawa li ber xwe tê dayîn?

***Ab.:*** Her dem wisa nedikir, hinek caran jî baş bû.

***---.:*** Wana pêwstiyên şerin.

***Ab.:*** Hinek caran tahrîkar dibû. Asta wan a berxwedanê, asta şer û hêza wan pir sînordare.

***---.:*** Ez dikarim bêjim mamosteyê min ê herî mezin di jiyanê de pêwendiya min e. Çarenûsa netewekî di çarçoveya vê pêwendiyê de ber bi çareseriyê ve hat birin. Niha weke mijareke berfireh ya cîhanê lê hatiye. Dubare dixwazim bala we bikişînim. Ez ji bo wan çawa hatim asteke "*Xeter"* yan jî "*bi bela."* Ev pêvajoyên mezin, qonax çawa derbas kirin? Vana dibin pirsên berfireh û waneyên mezin ku ders jê bên derxistin û encamên wisa hene. Kî ji we bûna ez bawerim we yê nekariya vekirana.

***Ab.:*** Helwestên giştî wê didin diyarkirin Serokê min.

***---.:*** Rêxistin di her bûyerê de û her kêliyê de tine dikir ne wisa?

***Ab.:*** Bandora wê li ser hemû çêkerê serwer bû. Yanî dikarî artêşê di bin serweriya xwe de bigire.

***---.:*** Tenê ne hêza bandorkirinê, hêzeke pir alî bû. Dewleta Tirk yekser ango ne yekser bawerî bi endamên xwe neyîne, çawa çav ji tevgereke îro belayê li ser bibarîne çav girt? Jixwe niha ev

cînayetên dewletê hemû ji bo vê tên kirin. Li navbirina Ozal jî di nava vê de ye. Dibêjin; "*Me çawa derketina vî zilamî nedit?*" Dewlet, di dîroka xwe de cara yekem ewqas ji kûr ve diheje; ev tê dîtin. Bi şêwazê vê pêwendiyê, bi sebrekê, bi şêwazê hest û kînê me ev şer da. Hûn bi jiyana xwe re berawird bikin. Li ser esasê van taybetmendiyan hinekî xwe di ber çav re derbas bikin. Me şerê Rizgriya Netewî wisa da despêkirin. Vaye weke ku hat vegotin me heta vir anî. Ger dahûrnadina pêwendiyê rast nehatiba kirin, min çek bikar anîba hem di nava rêxsitinê de, hem jî li derveyî rêxistinê wê ti milîtaniya me ya PKK'ê bimaya? Ger me ev bûyer wisa destnegirtiba me dikarî em qala damezrandin û pêşketina PKK'ê bikin?

***Ab.:*** Teqez bi vî şiklî û di vê berfirehiyê de pêşketinê neba.

***---.:*** Dê neba. Rêxistinê heba, lê wê nikarîba li beramberî dewletê li ber xwe bida, li ser piya bimaya.

***Ab.:*** Di nava pergalê de ronahîbûneke wisa pir zehmete.

***---.:*** Li gorî diyalektîka Kurdistanê ger ketinek nebe, ne gengaze bi encam bibûya. Ev di asta şansekî mezin de ye, sergirtina dîyalektîkeke Kurd e, yekane rêya rizgariyê ye.

Bûyera mezin a zekayê ye? Hinek dibêjin; "*Tu dayîneke xwedayî ye.*" Mesele ne bûyîna bûyereke xwedêyayî ye, ne bûyîna dahîyekî azad û nebûna wê ye jî. Dibe şêwaza mirovekî naxwaze xiyanetê li xwe bike pir bi aqil û pîvane.

***Ab.:*** Pergela kesê hevgirtî ku dixwaze armancekê pêk bîne bi jiyanê ve girêdayî ye.

***---.:*** Gelek taybetmendî di navê de veşartîne. Ne mijareke hema mirov derbas bike ye, beravajî niha ev guhertina PKK'ê, PKK'bûnê û ger hûn dixwazin karê artêşbûnê serkeftî pêk bînin, divê hem hûn vê çîrokê heta dawî fêm bikin, hem jî encamên pêwîst jê derxin û têbigihêjin, wekî din ji bo Kurdistanê şer nikare bê kirin. Ne dikare dahûrandina pêwendiyê bê kirin, sebir, ne tempo, ne jî lêdan, encamgirtin dikare derfet bibîne. Ji xwe hûn

her roj tên provakasyonê. Di wir de fêmkirin, şêwaz û tempo nîne. Dema ku em dibêjin hinekî me gohdar bikin, lêkolîn bikin ya ku em dixwazin bêjin ev e.

Ez jî mirovekim, lê ne di gotin de. Hevalê me yê F. helbestek nivisandiye bi navê "*Ez jî mirovek bûm.*" Tê wisa bibî mirov. Li ser navê vê çîrokê wekî din ne dikarî derkeve rê û ne jî dikare şer bike. Divê ku keçên ciwan û lawên me vê wisa bizanin. Min çîrok bi hemû aliyên wê ve ji we re vegot. Şansê vî karî nîne. Piştî ku ev şêwaz nehat girtin û şûn de ne gengaze ku di dahûrandina Kurd, rast şopandina rêberiyê jî pêk were. Hûn sebir û eleqeyeke mezin dibînin. Qimeta demê nizanin. Nêveng, fersend, mezinbûna kînê, qimeta pêwendiya bi min re çawa pêş dikeve, bi we re çawa ye? Heta ku ev neyên fêm kirin, neyên berawirdkirin hûn ê di xeta rêbertiyê de çawa bimeşin, bi vî şêwazî kêm an zêde em teşegirtina rêbertiyê bijîn? Ger hûn qezenc nekin, hûn ê bimrin. Hûn şêwaza min dibînin, dehşetwarî ye. Hûn tên şewitandin û ez bi şewitandina we pir dêşim. Bi revê jî ne gengaze ku hûn xilas bikin. Jin dikare bireve? Nikare derkeve ber rojê jî, wê demê wê bireve kîderê? Yê ku herî zêde jixwe bawer piştî ku hat vê rewşê û şûn de hûn ê birevin kîderê? Rê nîne.

Ez hîn jî nirxandina wê dikim. Bifikirin; ez pêwendiyeke jinê çawa vediguherînim derfetê çareseriyeke mezin yan jî neketina wê divê ku çawa be çawa berfireh digirim dest. Ev di pêwendiya min de tiştekî bawernekere. Yek ji we bikeve destê vê hûn ê bikaribin 24 demjimêran li ber xwe bidin; ne gengaze. Bi giştî di mijara jin de yan jî di pêwendiya jin-zilam de jî wisa ye. Bi qasî ku sebir û esnekbûna vê çawa hatiye raberkirin divê ku hûn encamên rê jê re vekiriye û bandora afirandiye jî bibînin û bifikirin. Di nava vê de taybetmendiyên çawa hene, ez bawerim di bala we de ye.

Di çareseriya kur de zilamê klasîk yê Kurd jin û malbata klasîk ya Kurd, hinek rêbazên tên zanîn ên tîpîk zirav hene. Ez li

beramberî hemûyan li ser piya me. Kesayetek çawa dikare xwe bîne vê astê û rewşê; pirgirêkeke divê pir li ser bê fikirandine. Me hinekî jî wisa dijmin bin xist. Jinê li beramberî me digot; "*Tu kîye?*" Vaye em bi vê kesayetiyê bin dixin, serdikevin. Li gorî min pir sade, basît, pir jî dudiliya jiyaneke şanaz mijara gotinê ye. Min şerekî pir dijwar meşand û ew şerê ku di roja me de mezin bû, netewî û civakî bû teqez bi vê ve girêdayî pêşket. Şer, misoger bi van dahûrandinan re di nava hev de ye, divê ku hûn vê bibînin.

***Ab.:*** Di heman arasteyî de hemû hebûn Serokê min.

***---.:*** Em dikarin bêjin ev beşa romanê li ser dahûrandina kesayetiya Kurd e. Divê ku hûn wisa mezin bifikirin û encamên mezin jê derxin. Tenê ne ji bo PKK'ê, ji aliyê teşegirtina mirovê nû jî divê hûn encamên mezin jê derxin. Bi qasî hinek dostan, dijmin jî pirtûk li ser pirtûkê derdixe; vana ne vala ne. Herkes li gorî xwe di nava hewldana fêmkirinê de ye. Mesele di pêwendiya jinê de nivîsên bi serenavên; "*Apo û jin*" dinivîsînin. Li gorî hişmendiya MÎT'ê misoger divê ez bi rêya jinekê bêm hîzayê. Ger nehatime anîn teqez divê ez bi husranê re rû bi rû bihatibama. Yan jî ji bo vê pir cuda, hema bêje diviya bû bibama kesekî mîna firîşteyan. Li gorî ku ez bin neketime û nebûme firîşteyek jî, wê demê wisa difikirin teqez pêwîste ez di pêwendiyeke jinê de bin biketama. Kemalîzm hinekî jî ev e.

***Ab.:*** Nêzîkatiya burjuvazî, ya çîna serdest hinekî jî ev e.

***---.:*** Tê fêmkirin ku di hişmendiya serdehatina emperyalîzmê de jî heman bendewarî heye. Bêguman wisa fikrandina wan, ya rast bi giştî di vê pêwendiyê de weke pirsgirêkeke em tê de binketinê dibînin û çavkaniya xwe ji vê digire û ji ber vê sedemê dixwazin binketina zilamê Kurd di kesayetiya min de jî bibînin. Li beramberî cudabûna min jî, heta dawî matmayîbûna wan texmîn kirin ne zehmete.

Ji aliyê min ve xala ku şênber bûye, hem xwe ber bi binketinê ve nebirin û hem jî dahûrandin û çareserkirina vê pirsgirêkê ye.

Ferzkirinên jina ku mûxatabê me bû jî pir vekirîbûn; yan jî pir bi koletî bi jinê ve bê girêdan ku, ev jî di nava pêwendiyeke malbata klasîk de dibû encamekî kujer yan jî bi temamî ji holê rakirine.

***Ab.:*** Dibe şerekî pir bê rêbaze.

**---.:** Şerekî bê qûral, şerê kontr-gêrîla ye.

***Ab.:*** Dê bibûya belavkirina hemû tevgerê.

**---.:** Teqez dikarî belav bike?

***Ab.:*** Lê ev jî pir zehmet bû.

**---.:** Pêwîste hêza wê ya belavkirinê hûn bi xwe binirxînin. Di kesayetiya min de tenê ne mahkûmiyeta zilame Kurd-Tirk, di heman demê de jineke Kurd jî ji bo ku derketinekê neke tevdîr hatine girtin. Tê bîra min, hinek keçan dê derketan, di encam de hinek mîna xulaman hatin girêdan, çendek ji wan jî qetil bûn. Divê ku ez vê jî diyar bikim, tevî ku qetilkirineke bê rehm bû jî, bi qasî mêşekê jî bandora wê hîs nekir. Xwedî ruhekî wisa ye û jixwe dema ku dibêjim bê hest mebesta min ev e. Di nava rêxistinê de rêxistin tê belavkirin, hevrê tên qetilkirin, raberkirina hestyariyê li aliyekî, berevajî di asta herî pêş de li benda hilweşinekê ye. Kêlî bi kêlî di nava bendewariya; "*Vana wê kengî tam hilweşin, tine bibin" de* jiyan dikir.

***Ab.:*** Serê kêliyê carekê digot rêxistina şer. Di wê xalê de zêdetir derket holê.

**---.:** Gelek beriya bendewariya artêşên niha ya hilweşîna me, di salên 1976'an de seet bi seet li bendê bû ku em ê kendî hilweşin û şerekî dijwar li ser me dimeşand; jixwe erka wê ev bû. Diviya bû ser bixe. Berevajî dewlet, ji Enqerê wêdetir gevekê jî nade avêtin. Dibe derketina me ya ji Enqerê ji we re basît were, lê nîne; me ev bi ked û xebateke mezin bi dest xist. Ger na me yê rewşeke weke zemqê bi Enqerê ve zelîqî jiyan bikira. Vaye Mahîr û Denîzan çend demjimêran li ber xwe da, Suphîyan çiqas li ber xwe da? Hîn di nêviyê rê de bûn û çi hat serê wan tê zanîn. Dîsa artêşên

Çerkez Ethem hebûn, lê dawiya wan tê zanîn. Yanî ji destê M. Kemal rizgar bûn bûyereke wisa asan nîne, mînakên wê jî bi qasî tê xwestin vekirîne. Min ji Enqereyeke ewqas pêşketî û xeter karî derketinê bikim. Bi numareyeke biçûk a hestan di heman kêliyê de bi erdê re yek bûn zêde dûr nebû.

Ger hinekî hêza we heye divê ku hûn bizanibin me binirxînin. Ger heye mêrxasî û lehengiya we, girêdana wê ya rast, bi xwe sipartina vê dibê ku hûn bizanibin xwe bi hêz bikin. Ne jiyaneke zindî ne romane jî. Lê xwedî bingehekî deh romanan derbas dike. Di vê romanê de her tişt heye. Dahûrandineke Kurd jî, dahûrandina Tirk jî di berfirehiya vê de xwe gihandiye îfadeya herî bilind. Heta ev hinekî jî wateya dahûrandina emperyalîzmê jî digire nav xwe. Hûn neçarin fêm bikin ku ya PKK kir PKK jî ev dahûrandine. Ger dê şoreş pêş bikeve, pêwîste bilindbûna vê pêşketinê teqez li ser esasê van serkeftinan bê fêmkirin. Fêmnekirina van bingehê herî sereke yê binketina ye. Ez encamê vê dahûrandinê li ser we pêk tînim. Afirandina kesayetiya serbixwe, pêşxistina jina azad hemû berhemên van encamên ku hatine derxistinin. Îro li beramberî vê pêşketina ku KT'yê serûbînî hevkiriye, binerin jin û pêwendiyên çawa derdixin pêşberî me. Em jî li beramberî vê di nava şer û pêşketineke çawa de ne. Vana mijarên ku divê heta dawî li ser bên sekinandin û bi vegotinên hunerî mijarên ku pir tiştê tê de bên dayînin.

Min çîroka wê weke heyî ji we re vegot. Jê baştir çawa dikarim vebêjin yan jî aliyên xeteriyê digirin nava xwe kîderê ne, em neketin ferqa çi, min çewa cesaret kir, ev roj çawa derbas kirin; di vî warî de pêwîste lêpirsîna we jî hebe. Şûna ku hûn ê li pişt min fesadiyê bikin hûn vekirî dikarin lêpirsîneke wisa bikin. Xwe ji vê paş nedin. Ji ber ku li ser vê habîre pirtûkan dinivîsînin. Ji ber encamên wê hesabnekirinê, nefêmkirinê dibe ku hîn jî yên binivîsînin derkevin holê. Ji bo wê, ez ji we re dibêjim li pêşberî we me. Pêwîste heta dawî hûn bizanibin rast lêpirsîn bikin. Li

gorî we xala herî balkêş a vê qonaxa dîrokî, îsyanê yan jî weke ku min got ev pêvajoya gelek xalên wê yên girîng û bi wate di kîderê de ye, hûn dikarin hinek encaman jê derxînin? Tu dikarî bi cewherî rêz bikî?

***Ab.:*** Di çarçoveya pêwendiyekê de diyarkirina çareseriya siyasî heye Serokê min.

**---.:** Di vê pêwendiyê de bi awayekî bêhempa pêvajoya siyasî derxistina holê heye.

***Ab.:*** Pêvajoyê gelek derdorên cuda bandor kir. Tenê ne li Kurdistanê, di cîhanê de jî rê vekir ku bibe hêzeke pir girîng.

**---.:** Mînaka herî xweşik a veguhertina afirêneriya pêwendiyekê.

***Ab.:*** Ji aliyê nêzîkatiya civakî ve, dahûrandina nêzîkatiya civakî di Kurdistanê de rewşa civaka Kurd, ji hemû aliyan ve paşverûtiyên civakekê jî li şûn xwe dihêle, taybetmendî derxistina holê, çareseriya wan pêşxistin û rewşeke ecêb a dahûrîna civakî hat jiyankirin.

**---.:** Pêwendiyek kirina bingeh ji careserî û hilweşîna civakî re.

***Ab.:*** Şêwazekî meşandina pêwendiyê heye, weke şêwazekî tê meşandin şêwaza jiyanê, dîsa şêwaza têkoşîna siyasî, şêwaza rêxistinekê ya rast ji nêz ve bi vê pêwendiyê ve girêdayî ye. Çêbûna şêwaza şerê PKK'ê di her qadê de bi vê pêwendiyê ve girêdayî ye.

**---.:** Girtina nakokiyên pêwendiyekê, vana ronîkirin û mezinkirina têkoşînê weke mînakeke bijare bûyîna wê, hem jî tenê ne ji bo Kurdistanê, di asta navnetewî de, heta ji bo pêvajoya dîrokî bi xwe jî nirxa herî mezin îfade dike.

***Ab.:*** Dewlemendiya nêzîkatî, êrîşeke ecêb heye. Ger dê binavkirineke wisa hebe, gelek taybetmendî dikarin bên rêzkirin.

**---.:** Nerimbûna di nêzîkatiyê de, hêza rast û ya axaftinê pêwîste.

***Ab.:*** Berxwedanî û radestnebûn heye.

***---.:*** Bi taybetî li beramberî ajoyan berxwedanî û teqez radestnebûn heta dawî diyarkere ev jî weke taybetmendiyeke din xwe dide der.

***Ab.:*** Ji hemû xaneyên zindî re, li beramberî hemû tiştên ku ji bo zindî pêwîstin berxwedanî heye Serokê min.

***---.:*** Berxwedaniyekî çawa? Li vir encax nifşê mirovan yên taybetmendiya herî pêşketî û di encama serdeçûna vê de divê weke ya hatiye destxistin bê dîtin. Wekî din dema ku pêwîst kir ajoya hundirîn çawa dikarin di xizmeta erkan de bigirim, mînakeke wê ya bijare jî mijara gotinê ye.

***Ka.:*** Serokê min, di vê mijarê de bi qasî ku fêr bûm di dema şerekî wisa de hevrêtiya hîsan bi rêbertiyê re mijara gotinê ye. Di vî şerî de hîsan hem Rêbertî parastiye, hem jî jê re hevaltî kiriye.

***---.:*** Dema pêwîst kir ez çawa dikarim hîsan li ser kar bigirim. Em bi mînakeke vê ya bijare re rû bi rû ne. Ajo li vir ne xistina mirov, bi peywira rastî ve girêdanê de heta pileya dawî kamil tê nirxandin. Ya ku civakî bi erdê re dike yek, ber bi hilweşîn, tinebûnê ve dibe radestî baş tê zanîn. Dêmekî li vir nirxandineke pir baş ya ajo û hestan heye. Taybetmendiya perwerdekar ya hestan û ajo, dibe taybetmendiya sereke ya polîtîkayê.

***Ka.:*** Bi vê ve girêdayî dibe mînaka dîsîplîna cewherî ya vê. Ji ber ku zanîna peywirê, girêdayî asta dîsîplînê ya kese. Di vê mijarê de dikare bibe mînaka çîrokê Serokê min.

***---.:*** Bi dîsîplînekê girêdayî peywirê, hesta herî zêde li beramberî li ber xwe nayê dayîn bê dîtin jî, her tişt di nava dîsîplînê de û bi şêwaza ku ji peywiran re xizmet bike hatiye fikirandin û tê kirin. Ev jî dibe bûyereke yekem ku di Kurdistanê de tê pêkanîn. Mînak Elman xwe pir bi dîsîplîn dizanin û wisa jî tê zanîn. Lê ez ne di wê baweriyê deme ku Elmanek jî ewqas xwe dîsîplîne bike.

***Ab.:*** Ez texmîn nakim ku hertim berxwedaniyekê wisa raber bike.

**---.:** Hertim bi asanî berxwedanî nayê kirin ne wisa?

***Re.:*** Serokê min di vir de ji azweriyeke biçûk derketina rê û xwe gihandina azweriyeke mezin heye. Di gel vê de berê qezenckirina mijara jiyanê heye. Beriya ajoyan neçariya qezenckirina jiyan xwe dide nîşandan.

**---.:** Em ji vê re bêjin li beramberî ajoyan serkeftina jiyanê?

***Re.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Bingeha mirovbûn û bûyîna mirove. Dema te rê da ajoyan, yanî te ajo di binê venêrînê de negirt te xwe ji herikîna wê re hişt, tê mirovatî û Kurdistanê ji dest bide, di pêwendiya Kurd de ketina mezin, binketinê bijî. Rewşa ku em pêre rû bi rû bûn ev bû û fersend nedayîna vê cara yekê ez ser dixim.

Tê dîtin ku di nav de herî zêde waneyên di jiyanê de rê nîşanî we bidin hene. Hinekî min lêkolîn bikin, ez çawa li ber xwe didim?

***Ab.:*** Hevgirtina hestan û yan jiyana mirovî dibe ku bihev ve girêdayî bê fêmkirin. Heval jî ji van vegotinan digihêjin ferasetên şaş. Weke ku her tişt ji despêkê ve hebû û wisa meşiya ye, yan jî helwesta sîxûrekî, weke ceribandinê bi vê sîxûrê re têkoşîn hatiye kirin şaş fêm kirinên wisa dibin mijara gotinê. Lê tiştên wisa qet nebûn.

**---.:** Rewş ne weke ku ji rêzê tê fêmkirine. Bûyer pir xwezayî pêş ketine, hatiye bawerkirin ku ev dikarin bibin sosyalîst jî. Lê ti car jî îhtîyat û tevdîr jî di nava xwezayîyeke mezin de qet ji dest nehatine berdan; girêdan bi armancê û ya sereke hestên herî mezin jî bi armancê ve girêdan, dema pêwîst kir dijmin jî têkil vê kirin heye.

***Ab.:*** Ya din jî cesaret heye. Dema pêwîst kir ji bo armancê bi kesên dibe ku dijmin bin re jî ketina pêwendiyê mijara gotinê ye.

**---.:** Yanî ez niha dikarim cîhanê jî ji bo armancên xwe bikar bînim. Ji aliyê cesaret û yê ku herî zêde dibêjin nayê kirin re vê weke mînak dibêjim. Ji vê re hêz û cesareta min heye. Jixwe wan

jî pir zêde digotin; “*Tu hemû tiştên ku dibêjî nabe, dikî”* û dibinê van gotinan de rastiya razayî ev e. Divê ku hûn li ser vê mijarê pir baxivin, bi taybet jî keç baxivin. Aliyên herî zêde bala we dikişîne kîderê ye?

***Re.:*** Li vir jî xisûsên herî neyênî veguhertina erêniyan bi giranî derdikeve pêş. Ger di tiştekî de şansekî ji sedî yek hebe ev jî veguherandina ji sedî sed yanî rewşeke wisa heye.

***---.:*** Şêwazê bikaranîna mirov, pêwendiya herî neyênî de jî bikaranîna înadeke mezine. Hûn bin li şûna wisa bikaranîna mirov hûn ê di heman deqîqê de bavêjin. Ger mar be jî ez ê pê bilîzim û dizanim bikar bînim. Hûn dikarin bêjin; dikare ber bi xapandinan ve jî bibe. Ev ê ber bi hest, fikir, formasyon û teşe girtineke çawa ve bibe; ev di pratîka pêkhatî de bi awayekî vekirî dîtin gengaze. Di xwe de ceribandinê wisa bikin. Ab. li gorî te wê ber bi formansyoneke çawa ve bibe?

***Ab.:*** Mirovê xwe bixe rewşeke pir cuda.

***---.:*** Pêwîste mirov ezmûneke wisa bi we bide jiyankirin. Mirov weke gurekî serê xwe rakirî bifikirin yan jî weke her hewyanekî dirinde dê dil û çavê we derxe, we sînîr bike tahrîk bike bifikirin.

***Ab.:*** Dikare taybetmendiyeke şiyar, bi tevdîr, xwe parastin û li xwe xwedî derketinê qezenc bike.

***---.:*** Em hêzeke rêxistin û parastinê bidin. Wê demê tenê ji bo carekê jî tê bikaribe pêk bîne? Tu dikarî ji baldariyê birevî? Wê hertim çavê te ne li ser tetîkê be? Ma ev jî ne taybetmendiya sereke ya şer û şerkertiyê ye?

***Ab.:*** Bi taybetî ji bo Kurdistanê derbasdare.

***---.:*** Kurdistan tijî marin. Hema bêje di binê her kevirekî de dijmin yan jî xeteriyek heye. Ya rast a min dibe mînakeke zekayê jî. Welatê te çawa be ez dibêjim dê mala te jî wisa be. Îsyana yekem ya ku me da despêkirin jî kêm-zêde dişibe vê. Niha em vê rewşa we ya mîna bebekan hatine mezinkirin bigirin dest. Di

nêvenga malê de jî hûn ewladek xwedî xoyên baş ê herî mezinin. Ya din jî dema ku pêwendiya jin-zilam dibe mijara gotinê ev rewşa we dê we bibe kîderê? Vana di mercên Kurdistanê de çiqas dikarin rast bên dîtin? Ev rewşa we eşkereye ku dê we ber bi tevizînê û derveyî nakokiyan ve bibe. Ber bi çareserî û dîtina dijmin ve nabe.

***Ab.:*** Ev rewşê ber bi xaflet û radestiyê ve bibe.

***---.:*** Erê xeflet, xiyanet û her cara ku serê xwe rakir dar li ser serê xwe xwarin, dema ku wisa bû jî bi awayekî jênerev dibe çarenûsa we. Lê nêveng û tabloya ku min afirand balkêş û cûda ye. Qasî ku hêza min têrê dike dikim. Hêza min encax têra ewqasî dike. Jixwe ger min ev serkeftin pêk ne anîba gelo minê bikarîba marên di nava PKK'ê de bidîta? Min ê bikarîba provakator, margîsk, çîyanên di nava PKK'ê de bidîta? Ger min hêza berxwedanê qezenc nekiriba, di cîhana xwe ya hundirîn de, minê bikarîba hêza berxwedaniyê di nava PKK'ê de rave bikira? Ma ez ê nekatama rewşa ber bi rast û çêpê ve nehejiyama û hûn jî di şerê me ya Rizgariya Netewî de bibana xwedî hêza berxwedanê? Hemû bûn, pêk hatin.

Binêrin ez waneya xwe çawa fêr dibim. Ez çawa mamosteyê pêwendiya xwe derdixim holê? Dubare bêjim; di wisa pêşketina rewşan de teqez qesteke wisa nîne. Çawa ku di îsyana yekem de bi birayê xwe re rû bi rû hatim, ev jî qaşo dê ji min re biba hevjîn. Lê tevî vê jî weke bûyerekê lê hat, lê tevî vê jî ji duristbûna min qet guman nayê kirin.

***Ab.:*** Di encam de we çavkaniya îlhamê girt.

***---.:*** Di encam de pevbestin nîne, pîlan nîne, her tişt bi rast xwe destgirtina mirovekî ve girêdayî ye. Hêzekî bi girêdana rêgeza azadiyê hatiye destxistin mijara gotînê ye. Weke ku di îsyana yekem de heyî li beramberî rêgeza feodal şerê azadiyê, li vir jî li beramberî metîngerî, nokerî, feodal û heta rêgeza jina ketî şerê azadiyê mezin û berfireh hatiye dayîn. Ji vê jî girîngtir, ya ku bi

vê ve girêdayî me pêşxîstî, vekirina me ya kesayetiya Kurd ku cîhana we ava dike ye. Min her roj berê xwe daye talîmata û dibêjim, hesasbin, berpirsyar bin, baldar bin. Ma wisa ketina kemînê dibe, pêl mayînê tê kirin? Aqlê min vana nagire. Ev kesayetiyana kesayetiyên ku di himêza dayikê de pixe pix razandî hatine mezinkirinin. Cîhaneke wan a pêwendiya ku tê zanîn heye, gotiye dostê min û himêz kiriye, xwe winda kiriye, bi bertekan barkirîne. Ma şerkeriya Kurdan jî ne wisa ye? Di heman demê de şerê ku dikeviyê xwe tine dike, bê encame.

Ya min sahneyeke pir ecêbe; hûn arena dizanin, şêrekî dixin arenayê, ya din jî gladyatorên mîna Spartekus. Ev gladyator derdikeve û bi şêr re şer dike, jiyana wî jî bi sax derketina ji vê pevçûnê ve girêdayî ye. Yê me ne şêre jî. Marekî mezin, ruhê wê mirovan diqefilîne. Tê aqlê we em dikarin bişibînin kîja bûnewerî?

***Ab.:*** Ez bawerim mar şibandina herî guncawe.

***---.:*** Mareke diqefilîne, mîna cemedê, zimanê xwe derdixe û dixwaze mirov şahrî bike. Jixwe xwest wisa jî bike. Li beramberî vê îca bifikirin deh salan di heman navendê de hûn mane. Kurdistan tijî marin. Em egîdên xwe yên ku dixwazin li beramberî maran şer bikin bifikirin. Wê di kêliya yekê de lêdin û biçin. Yanî axa, beg her yek ji wan marekin. Jixwe derdor tijî sîxûr kirine û cerdevanên gundan jî her yek ji wan marekin. Hûn ê çawa ji vana rizgar bibin? Vaye ji bo vê waneyên ku pêwîste ji şêwaza me bê derxistin heye. Tu nikarî li Kurdistanê di mala xwe de, yan jî oda xwe de bi rehetî razê, ji ber ku çavê te hertim li ser xeteriyê ye û destê te li ser tetîkê ye. Wisa bi asanî jî tu nikarî li mar bidî û bikujî. Di welatê me de bi mîlyonan mar hene, piraniya wan jî di postê berxikê de ne. Tu bi çek nikarî lê bidî, eşkereye ku mar dê bi şêwaza klasîk neyên kuştin.

Li şêwaza lêdana min binêrin, me çend mar ji wan re got em we nakujin û sahneyên kuştinê cuda, demê wan cuda me pêşxîst û

ew çareser kirin. Mesele di kesayetiya merekî de hemû mar ji holê rakirin. Di rastiya Kurd de yekî li yê din da dibêje; “*Min tola xwe girt.”* Şêwaza lêdanê wisa ye, ger min jî yekser serî li vê riyê daba, ez ê jî ketibama heman rewşê. Ya girîng neketina wê rewşê ye.

***Ab.:*** Lê ev tolgirtin ne çareseriye, dibe li xwe dan.

***---.:*** Teqez dê wisa ba. Ger ez bi şêwazê lêdana Kurdan serde çûbûma, minê xwe tine bikira. Vaye aqlê mezin di vir de ye; marek eciqandin, dayîna revandin û ya herî giring jî xwe bi vî marî nedayîna gezkirine. Niha Kurdistan hinekî ji maran paqij dibe. Ev paqijî jî dîsa di encama vî şêwazî de pêşket. Jixwe mar bi çil curî ne. Yanî di hestan de jî, di fikirde jî mar hene. Hest û fikrên we yên kujer jahrî dikin hene, min ew jî hinekî derxistin holê. Ez li vir şexsekî karîkatorîze nakim.

***Ab.:*** Hemû taybetmendiyên xwe bi awayekî rast derxistina holê heye.

***---.:*** Bi awayekî metirsîdar, hemû dewlemendiyan bi şêwaza herî rast derxistine holê heye. Bifikirin, hestek çawa we dikuje? Pêwendiyeke ji rêzê ya jinê, pêwendiya zilam, rayeyeke ji rêzê, xafleteke ji rêzê, rewşeke xewê, rast nemeşîna rêyekê; her yek ji wan marekin. Hemû jî marên ku ji aliyê şêwaza tevîzî yên kevneşop ve hatine xwedîkirinin. Li gorî rastiya Kurdistanê bê ku hûn xwe şiyar bigirin, çav hertim li ser bandorên dijmin nebûnê, rewşa bi asanî ketina nava hemû curên xeteriyên dijmin derdikeve holê. Ev tinebûne. Çima hûn ê rastiyan fêm nekin? Divê ku hûn van waneyên mezin fêr bibin, tabî ger hêza we ya fêmkirin û xeyalên we hebin. Ev welat wisa ye û di vî welatî de şer hinekî wisa hat meşandin.

***Ka.:*** Serokê min, ev jin dibe dayika maran. Mirovê ku li çavê wê binerin dibe kevir. Heta ji bo bi taybetmendiyên wê nehatina lîstokê divê ku mirov pir zêde bi tevdîr be. Vaye mareke wisa hat kuştin.

***---.:*** Ji xwe digot; "*Ez şahbanû me*" heta xwe weke şahbanûyeke min jî afirandiye dida diyarkirin. Li gorî xwe heta pileya dawî bi anûrê dilîst, ev Şahmaraneke! Pir balkêşe, bi hemû tiştên xwe bandor dikir. Di deh tiliyên wê de, deh marifet hene. Xortên weke we di saniyê de dikarî bibe. Jixwe keç li ser tiliyên xwe didan lîstin. Şerê me bi rastî jî pir ecêb bû. Gelo min ji karên wisa zewq digirt? Em vê rewşa min a li ber xwe danê muqayese bikin.

***X.:*** Serokê min, di vir de mijareke pir girîng tê îdîarekirin. Mesele jin pîrektiya xwe kar tîne û dixwaze zilam bixe. Lê îradeya li vir ewqas bi hêze ku nikare bin bixe.

***---.:*** Jixwe sedema herî esasî ya li ber xwe dana me îradeye. Ya wê tenê ne bikaranîna pîrektiya xwe ye; ya din jî helwestên jinê yên mahîrane û dayîhane mijara gotinê bûn. Baldar bin, jin dema ku bandora xwe dide diyarkirin nabêje; "*ez sîxûrim, li beramberî min bi guman be, li gorî wê baldar be.*" Na! nêzîkatiyeke wisa jî nîne. Heta radeya dawî xwe durist û sosyalîst dide nîşandan. Bi nêzîkatiyeke wisa xwe dide nîşandan û ez jî bi asanî dikarim bêjim; "*Jina di xewnên mi de bû*" û berbikevim. Jixwe zilamê ku nekeve rewşeke wisa heye? Hestek ji rêzê. Mesele hevalên ku zewicîne hene. Kîjan ji wan kariye xwe ji van fikaran dûr bigire? Di hemûyan de jî pir bi asanî, ji rêzê tevlîbûna jinê heye. Li gorî min tevlîbûna bi şêwazekî wisa tê wateya ku te li wir tiştek winda kir. Bûyîna ew zilamê saf, asan windakirin, hinek caran jî behremendiyên we pir alî bikarneanîn, vaye bi awayekî asan û ji rêzê têkiliya xwe bi vê tevlîbûnê re heye. Hinekî têr û tijî fêm bikin. Qet pêwîst nake sîxûr be. Jina ku te bijartiye dibe gelek saf û mahsûm be jî. Lê di encam de weke jinekê teşegirtin mijara gotinê ye.

Ez çima qet jina naecibînim, ji ber ku xeterî heye. Her jin kêm an zêde kirine mar yan jî kirine amûrê tevzandinê ya radestbûna wê. Ez ji tevlîbûna zilamekî ya jineke bi vî rengî dikarim hezar û

yek mercî bijmêrim derxim holê. Dîsa bi heman şêwazî di vê pêwendiyê de jin çawa hatiye mahfkirin jî dikarim îspat bikim. Ev rastiyeke Kurd e. Başe bifikirin, fêm bikin û şexsî nekin. Rêgez giştîne û serwerin, hûn hemû jî di bin bandora wê de ne, heta jiyan dikin. Çima hûn nebûn milîtanên serfiraziyê qezenc dikin? Hevalên ku salên dirêjin em bi hev re ne hene; binketîne. Lê di encam de li gel me ne dîsa jî em ê teqez kesayetiya serfiraziyê bafirînin.

Ya din jî min got mamostetiya pêwendiyê. Ev dikare bibe keseke pir baş. Lê nebû û min pir alî sedemên vê diyarkirin. Dinêrim keç heta dawî rêzdarin, her yek ji wan bi eleqeyeke awarte dê ji nava refan re bên girtin û nirxandin. Lê di mijara jinê de divê ku baş bê fêmkirin em neçarin pîvangeriya mezin ferz bikin. Ger bikarin li ber xwe bidin her bijî! Ger li ber xwe nedin jî ez şiyarim, ma ez ê jinê weke belayekê bidim ser serê we? Jina kole hatiye ser serê me li çi digere; yên bi entrîka, bi armancê afirandina bandorên erzan ên pîrektiyê ku dixwazin bikar bînin di nava refên me de nikarin ji xwe re cîh bibînin. Bi xîtapkirina aliyên belangaz ê zilam, bi vî rengî bi belavkirina mircanan ya ku tê xwestin bê kirin çî ye ku em ji vê re xweşbîn nêzîkatî raber bikin? Ji aliyê min ve vana nêzîkatiyên herî xirab ketine. Divê jineke çawa be? Eşkereye ku ev pirseke pir berfirehe. Yan dê wisa be, yan jî ji jiyanê re derbas bûn nîne. Divê ku bibin hilbijardeyeke jiyanê pir baş.

Wê jinek bi min re çawa jiyan bike yan jî ez dikarim pê re bijîm? Niha keç dikarin baxivin. Li gorî we ez jî weke her zilamekî dikarim bijîm yan jî çima najîm? Ya ku hêza xwe ya nirxandinê hebe nîne?

***Ze.:*** Serokê min, hûn bê jin nikarin bijîn. Yeqîn dikim ji bona we têkîliya cînseltî, têkîliyek nabê ye. Ji ber vê hûn dikarin bi hemû jinan re bijîn. Ez wisa difikirim.

***---.:*** Lê min xwest bi jinekê re jiyan bikim.

***Ze.:*** Lê hûn nikarin jiyan bikin Serokê min. Ez pêwendiya we ya beriya niha dişibînim labaratowarekê. Li wir şêwazekî we yê destgirtina jinê heye. Helwest û rêbaza ku we raber kiriye ji aliyê naskirina zayendekê ve hatiye destgirtin û piştî ku ew zayend hatiye naskirin û şûn de ber bi çareseriyê ve çûyînek heye. Ji bo jin rewşa avakirina şansê şoreşê heye.

**---.:** Dibe ku min neheqiyeke mezin li beramberî vê jinê kiribe?

***Ze.:*** Na Serokê min. Ji bo azadî û rizgariya hemû jinan diviya bû jinek bê fedakirin.

**---.:** Li gorî te ev pêwendî di heman demê de şansekî mezine?

***Ze.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Tiştên ku hûn dibêjin hinek aliyên xwe yên rast hene. Yanî wisa ne bi jinekê re, bi jinan re yan jî bi bingehê jinên azad re encax ez bikaribim jê re hêz bînim û jiyanê qebûl bikim, ev dikare bêgotin. Tabî fêde û girîngiya vê û vegotina wê heye. Ez pir zêde xwe lêpirsîn dikim, ev dibe pirsgirêkeke mezin jî. Di heman demê de tê wateya dahûrandinên pir berfireh jî. Jixwe dayîna jiyankirina we jî li ser van esasan pir zêde bi netewbûnê, heta bi pêşketineke civakî re pêwendiya xwe heye.

Niha em bi çanda pêşmerge bifikirin, rêberên pêşmergeyan yan jî rêberên din, em rêberên çepê Tirkan bînin berçav. Ew tenê bi hev re ne, yek ji bo yê dine. Yanî hîn jî pêwendiya klan-kabîle nehatiye derbaskirin. Ev, li Tirkiyê jî wisa ye, ezmûneke Mûstafa Kemal heye û heta dawî balkêşe. Ez zilam ewqas rexne dikim. Lê tenê di xalekê de divê ez wate bidim meyla wî. Min sala borî xwend. Fêmkirina me ya wî jî ji ber ku hinekî jiyana wî dizanime. Ev tiştên ku ez di mijara jinê de dixwazim bikim, M. Kemal piştî ku dibe serokkomar em dibînin sînordar be jî xwestiye bike. Ew jî dema ku di amadeyî de ye pêwendiyeke wî heye, li Selanîkê meyxaneyên jinên bi eslê xwe Rûmî tê de kar dikin hene, ew jî çûye wan deran, cîhana zilam bi jinan re ya eşq-meşqê ye. Diçe Sofyayê, Elmanya li wan deran jî wisa bi pêwendiyên eşq-meşqê

yên erzan dijî. Li her cihekî teqez bi jinekê re dikeve pêwendiyê. Şerê rizgariyê qezenc dike, hema diçe Îzmîrê û ew pêwendiya wî ya zewacê tê zanîn pêş dixe. Lê nikare vê zêde bidomîne. Berdewamnekirina wî ya vê pêwendiya zewacê bi Rêbertiya wî re pêwendîdare. Ya rast ew jin di nava xwe de dixwaze wî ber bi jiyana burjuva û takekesî ve bikişine. Ji aliyê kesayetiyeke wisa ye, hem jî ji aliyê kesekî di asta rêbertiyê de ye negengaze. Dema ku gengaz nabe jî jin kehr dibe.

Ji bo fêmkirina jina Tirk divê mirov nakokiya Latîfe fêm bike.

Ya ku di kesayetiya Latîfe de tê fetisandin, kesayatiya jine.

Li şûn ve pêwendiya kerî dimîne, gelek jinên ber ba ketî li derdora M. Kemal kom dibin. Vana jî dibin jinên mezelîk. Û encam; rastiya jinên Tirkiyê ye! Heta rastiya jina ku li ser we hemûyan serwere, teşegirtina jinên meze. Jina ku wisa tê karanîn, wisa zewq dide. Heta vir e. Ji vê wêdetir kesayetiyeke jinê heye? Ji vê wêdetir feodalîzme. Pîreka Osmaniyan, wisa girêdayî mal û zarokê xwe ye, ji dervî tîpê vê jinê jineke din ne mijara gotinê ye. M. Kemal lûtkeyeke. Ebdûlhemîd lûtkeyeke dine. Pêwendiyên îro li ser jina Tirk û we hemûyan serwerin dibe ku di çarçoveya ji Rojhilata Navîn re rêbertî kirinê de ye.

Bifikirin, jiyankirina min jî ya xeteriyeke wisa dikare bibe mijara gotinê. Her çiqas jiyankirineke min a weke M. Kemal ne mijara gotinê be jî, vaye me bi jinekê re zewacek jiyan kir. Her çiqas di dem û cihên cuda de be jî, gîşt encam. Weke ku min vegot, ger ez li şûna M. Kemal bûma, ez ê li wir li tatminekê geriyabama, ger nebûya jî minê berê xwe daba xalên din ên tatmînê. Ger bê dîqatkirin, ez rêyeke pir cuda û berfireh diceribînim.

Dahûrandina mezin a jinê û li şûna kesayatiya windakirî gav bi gav derbasbûna kesayeta azad mijara gotinê ye. Li encamê ku M. Kemal ji pêwendiya xwe derxistiye binêrin; vaye zêde nayê jiyanê, bila biçe û şûna wê ya wisa were, hemû jî bi li ser sifrê

mezebin. Hinek jinên wisa beredayî û sivik hene ku, yên ku îbadet ji wan re dikin jî zarokin, mîna bebekane. Ma taybetmendiyeke min a wisa heye, ez fersendê didim? Min kesayetiyeke jin a çawa derxist holê ka binêrin. Ya rastî herî kêm bi qasî wî hêz û otorîya min jî heye. Îca hûn min, jinê û xwe bifikirin. Di nava me de ya herî baş jî heta pileya dawî ya radest dibê ye. Dibe ku heta dawî hestyar be, dibe ku di nava bertekên ji rêzê de be, bigirî, dikare bi gelek nexweşiyên jinê yên ku tên zanîn nêzîkatî raber bike. Pêwendiyên bi min re tên danîn pêwendiyên PKK'ê, lê hûn nikarin vê bikin. Yanî modelekî wisa, zemînekî pêwendiyên wisa, armanc û şêwaz li pêşiya jiyanê hatîye danîn ku, ev şêwaz şêwaza ku me pêş xistiye. De îca xwepêşandanên erzan ên pîrektiyê bikin, bibin jinên ji rêzê, jinên sivik, bibin jinên tenê girîngî didin xwe nimandinê, zewqê û yên xîtabî azweriyê dikin; ma gengaze? Hûn dizanin ku hûn ê hema rezîl bibin. Niha her tişt di PKK'ê de yan jî di berfirehiya pêwendiya min de çiqas we ber bi bersivdayîna pirsê ve dahf dide, çiqas ber bi saxlem girtina taybetmendiyê ve dibe? Hûn ê li leşkeriyê bifikirin, hûn ê bi pîvanên rêxistinê, heta her ku diçe yên civakî, çandî, hunerî û pîvanên xweşikiyê bifikirin û dê hemû jî kêm an zêde we dorpêç bikin. Hûn ê heta dawî bibin xwedî kesayetek jinê ya bi aqilmend, ji xwe bawer û xwe pêş dixe. Herwiha bê ku bi zilamekî ve girêdayî be hûn ê bibin kesayetek jinê ya bi rehetî bikare kesayeta xwe serbixwe pêş dixe. Vana hemû di serî de weke ku we di mengenê de asê bike, dê asê bike, lê di encam de jî kesayetiyeke jinê derdikeve holê.

Hinekî li ser şêwaza min bifikirin. Ber bi pêwendiyeke jinê ya wisa neketin, tê wateya xwe windanekirinê. Weke ku gelek ji we dikin pêwendiya kevneşop ya jinê dibe ku tatmînkar be yan jî weke rêveberên me ku di nava PKK'ê de tê dîtin bi taybet ji aliyê şexsî ve jinê bi xwe ve gire didin. Ev jî şêwazeke û şêwazekî li ser we gelekan bi bandore. Ev şêwaz gelek seransere û teqez

encam nade. Yek ji ferasetên din a ku tê dîtin, qet eleqeder nebûn, bi şêwazê; "*Jin bela serî ye, çima em di nava xebatan de digirin, jin di xebatên artêşê de bare"* derdikeve holê. Ti têkiliya van ferasetan hemûyan bi min re nîne. Ez dibêjim jin pir hêja ye. Lê çawa û ji çi re pêwîste? Pîvan tên danîn, armanc, şêwaz tê danîn û ev jî teqez rê li ber egîdane pêşketina tevgera jinê vedike. Wisa texmîn nekin ku hûn ji ber xwe ve pêdigihên. Jina ku ji ber xwe ve pêdigihê li serê xwe jî, li serê derdorê jî dibe bela, çavkaniya kolekirinê ye. Ez ji niha ve vê bêjim; bi jina ji ber xwe ve re nayê jiyankirin. Ger tu min bikujî nîv demjimêrê xwe pê re derbas nakim. Ez zilamekî ewqas bi jinê re eleqeder dibime, lê bi kesayetiyeke jin a di vê wateyê de qet jiyan nakim. Jixwe min şerê xwe yê bi wê re vegot. Û çiqasî ji jinê dûr sekinîm jî ji we re got. Li gorî min çawa bi temamî dikare bi jinekê re bî, pir xetere! Bifikirin, cîhana jinekê tê fikirîn, derketina holê ya jinê tê pîlankirin, gav tên avêtin, mînakên mêrxasiyê tên raberkirin û hîn jî em dibêjin ev despêkeke. Ne teşegirtina asta netewî, neçare ku teşegirtineke asta giştî ya jinê hebe. Li gorî pîvanên ku min bi xwe pêşxistine, vaye şêwaza kesayet ev e, dibêjim şêwazê azadiyê ev e.

Di pêwendiya bi her jinekê re, carekê dinêrim tiştekî ji dest didim. Aliyên ku min dikarî qezenc bikim çibûn; li gorî vê her roj ked li ser kedê didim. Di encam de weke ku min got, vana teyisîna xwe li ser tevgera jinê dikin. Teqez wateya vê pêwendiyê ya mamostetiyê heye; em jibîr nekin. Ez hîn jî ewqas rastîparêzim, xwe naxapînim. Jinek ji min re bêje; "*Tu bi xêr hatî, bi qasî cîhanê min ji te hez kir"* jî ez xwe naxapînim. Bifikirin qîmeta min niha çiqas bilinde û ez di rewşeke bê ecibandin de me, min sînor danîne pêşiya xwe, dibe ku hinekî dilhebîn bim, hinekî sînorên jinê tengav bikim, lê divê ez xwe wisa ferz nekim. Mesele M. Kemal ne yekî wisa ye. Ez bawerim heta şêwazê heqaret kirinê cînseltiyê bi zorê ferz dike. Hemû zilam wisa ferz dikin. Lê

ji bo giştî, ji bo PKK'yîyan ez naxwazim vê bêjim. Taybetmendiyeke ji aliyê erênî ve pêş dikeve jî heye. Lê ger em we di pîvanên kevin de bihêlin, şêwaza ku hûn ê ferz bikin li gorî min heta dawî ne xweşik û dê ketîbe. Lê şêwaza xweşikî, şêwaza azadiyê? Her yek ji vana meseleyên şerin.

Heta niha li gorî min ne zilamek bi jinekê re, ne jî jinek dikare bi zilamekî re bikeve nava gitûgoteke tenduristî û ne di asta pêşxistina vê vegotinê de ye. Yên ji xwe bawerin hema bila derkevin holê. Binêrin, min heta dawî xwe azad hiştiye. Heta pileya dawî dikare min bandor bike, heta dawî di girêdanê de azade û divê wisa be jî. Ez hema nabêjim û nikarim bêjim; "*tu yî, nizanim bandor bûn, vaye ji bin bandorê dernakevin.*" Ev gotin, tê wateya xiyanetkirina min li rêbertiyê. Kanî armancên te yên mezin ê netewî, kanî armancên te yên sereke mirovî? Tabî yê ku milîtane dê wisa bifikire. Mecbûre wisa bifikire. Bifikirin we beşeke mezin eleqeya xwe yan jî asta xwe ya hestî ji jin ango zilamekî re razand. Eşkereye yê ku bikeve vê pêwendiyê û vê neke jin ango zilamekî nafikirim. Ka hezkirina welat, ka azadî, ka eleqeyên din, ka eleqeya herî mezin a Rêbertiyê? Ji vana hemûyan re parek nema. Hemûyan xerc dike. Niha hinekî cîhanên we yên hestan wisa ne; hûn dibêjin; "*ez heta mirinê bi te ve girêdayî me, ez ewqasî bi te ve girêdayî me*", lê di holê de tiştek nema. Ji Partiyê re, ji me re, ji min re tiştek nema. Ez heta dawî rastîparêzim, niha hûn wisa ne. Min hinek tevdîr girtin. Min tevdîrên çawa girtin wê jî ji we re dibêjim. Ez nabêjim hûn ketin nava uslûbekî wisa, lê ya ku derdikeve holê jî ev e. Çend roj beriya niha xeber hat, koordînatorê Mêrdînê derfet dîtiye û çawa ketiye pêwendiyeke jinê; di encam de hatiye îdîamkirin. Di dîmen de çiqas bi me ve girêdayî bûn. Koordînatorê beriya wî jî wisa bû. Rêberên me serbest dimînin, keçik jî bi xulamî xwe pêşkêş dikin, ew jî wisa tevdigerin. Ka şerefa rizgariya netewî, ka bersivdayîn ji daxwaziya azadiya gelekî re, ka pêwendiyên Partiyê, ka

pêwendiya rêxistinê? Heyfe! Niha vana hemû niyaz baş û milîtanên pêşengin, ka keçik hatibû azadiyê, çawa bi vî sextekarî ve hat girêdan? Ev rewş bi awayekî balkêş rojane tên jiyîn. Nemaze Rêbertî neçare ku xwe nexapîne. Ez têra keçan jî dikim, ji ber ku ez asta girêdana wan ava dikim. Ava nekim têkoşîn nameşe. Hezkirin, lê çawa, girêdan, lê çawa? Sînorê wê, pîvan çiqasî jî welat, Partiyê û ji Rêbertiyê re welhasil çiqas ji mirovatiyê re xizmet dike?

Nêzîkatiya min a serokatiyê wisa ye. Vaye ez bi jinekê re wisa mijûl bûm. Armanc qezenckirin bû. Teqez niyaza xirab ne mijara gotinê ye. Lê ji aliyê din ve jî nehat azadiya mezin, divê ku ya me gire bide rêgeza azadiyê ye. Girêdana wê bi rêxistinê, bi rizgariya gel, bi welat re çiye; me vana hemû nîşan da. Ya rast girêdaniyeke mezine. Ez vê rewşê hinekê jî bi îsyana yekem re qeyas dikim. Û niha weke kes ez çiqas lewaz bim jî, nizanim bêjin dilê min hinek tiştan dixwaze jî, ger dê ez nebim xayîn, weke ku hûn xwe dixapînin ez ê xwe nexapînim neçarim israra xwe ya di azadiyê de nîşan bidim. Ev di gotin de nabe. Ji bo welat ez ê ewqas kar bikim, de ez azadim, tenê me, kes li vir ji min re nabêje kar bike. Lê divê ku li beramberî wîjdanê xwe ez ewqas xwe tatmîn bikim ku bi rehetî bikaribim bêjim min ji bo welat tiştek kir, ji bo sosyalîzmê xebat meşand. Li grûb û çepgirên din nenêrin; hemû derewan dikin. Ji ber ku pratîka wan di holê de ye. Heta li fermandarên sexte yên di nava me de jî nenêrin. Pratîka piraniya wan di holê de ye. Dema ku serbest tên berdan em dizanin çi dikin. Ger hinekî otoriteya me neba wê çi ber bi kîderê ve bibin divê ku baş bê zanîn. Tu kes ji jor de fermana nade min. Bi qûralên hişk min dorpêç nakin. Lê tevî vê jî, bi pêwendiyan re azadane û bi dewlemendiyeke teqez girêdan heye. Hûn jin binêrin çil mêrê we hebe, gelo wê ji dehî yek ev eleqeya ku em nîşan didin nîşan daba? Yên ku hûn pir jê hez dikin be jî, ew eleqeya ku ez nîşanî we didim ji sedî yeka vê nîşan nade; ji ber ku hêz û

edeba wî nîne. Bi rewşa niha ew tenê dikare eleqeyê nîşanî jinekê bide, li beramberî ya duwemîn rêz raber nake. Cîhana gelek zilaman ewqase. Lê ez mirovekî çawa me ku ji ewqas jin re heman hezkirinê nîşan didim? Ji bo min her jin xweşike. Hêza hezkirina min têra hemûyan dike. Min çawa asta hezkirina xwe gihand vir girînge.

***Ze.:*** Serokê min, hezkirina we ji gel re û ji ber ku hûn me jî parçeyekî ji gel dibînine.

**---.:** Hemû hevalên me yên xort jî di nav de herkes vê dibêje. Jin jî ji gel'e, lê tenê ev gotin têrê nake. Li gorî we ez vî hêzî çawa raber dikim, sihra vê çiye?

***Be.:*** Serokê min, ez dixwazim li ser hinek xalan rawestim. Bi taybet dema ku em li vê rewşê dinêrin dema ku bûyera çareseriya bi beramber, veguherina bi bermaber hebe ji bikaranîna xalên hev ên lewaz zêdetir, ji ber ku hewldana hev bi hêzkirinê heye hinek pêşketinên diyar dikarin bibin. Dema em li pêwendiyên Rêbertî yên heyî dinerin, aliyê bermaber xwe nagihîne vê astê û hewl dide serdestiya xwe jî bi vê saz bike. Lê ya Serokatiyê tam berevajiye, hewldana girtina van xalên lewaz û veguhertinê heye. Yanî hewldana bi hêz kirina xalên lewaz heye. Jixwe nakokî ji vir despê dike. Dema ku em li ser vê bingehê li şahêmaran û maran dinêrin taybetmendiyên wan ên hevbeş hene. Taybetmendiya hevbeş a maran; di tahlîla dawî de aliyê kujer û pêvedanê ye. Vê jî bi rêbazên cuda pêk tînin. Hinek ji wan difetisînin, hinek jahrî dikin! Lê xala hevbeş; kujerbûna wan e. Li ser vî esasî di dahûrandina hemû jinan de ya ku diteyîse ev e. Taybetmendiyên hevbeş hatine girtin. Lê bi jinên ku nû hatine re taybetmendiyên cuda jî dikarin derkevin holê. Di gel van taybetmendiyan de di veguhertinê de -taybetmendiyên ku em dibêjin paşketî yên hevbeşin- hewldana Rêbertî ya ku dixwaze jinan ber bi rizgariyê ve bibe li vir jî derdikeve holê.

**---.:** Min ev hêza hezkirinê çawa derxist holê? Ev pirs girînge. Jina li pêşberî min xwestibû xwîn bi min bide verişandin, ya rastî ew ne jinek, pîrektî bû. Pêwendiya hezkirin û têkoşînê, di hemen demê de nakokiya vê, pêwendiya encam û waneyên mezin jê girtin heye. Wê xwest min qehir bike, bipelcîqîne. Lê tevî vê jî, min çima kêmasî nekir? Min baş dizanî ku dixwaze jinê di kesayetiya xwe de bifetisîne. Dîsa dixwest Kurdistanê û sosyalîzmê bifetisîne. Lê min çawa bersiveke mezin dayê? Ji dahûrandina jinekê, min dahûrîna zayenda jinê derxist. Li şûna hezkirina jinekê, min hezkirina bê dawî ya jinê derxist. Bi taybet jî divê zilam bi vê bifikirin. Behremendiya afirîner û xebata hunermend hinekî li ser vî esasî ye.

Gelek hevalên me yên milîtan hene, rewşeke van hevalên me ya tenê jinêkê jî bi anûrkirinê nîne. Encamê ku ez ji hemû raporan derdixim mixabin li pişt serê wan keça herî hêja be jî, li beramberî wê pir bê eleqe, yan bê berpirsyarî, bê rêzî, pir tepsîner yan jî pir zêde ji xwe re kirina mal nêzîkatî nîşan didin. Nêzîkatiyeke bi anûr nayê raberkirin û ev ji aliyê milîtan ve rewşeke neyênî, nebes û şerm dide îfadekirin. Ji wê jî wêdetir, pirsgirêkên pêşxistinê hene. Min ev keç girtin û kişandin nava refên me, her roj wisa li gel xwe em dikarin li ser bisekinin. Min çawa ji vê re cesaret kir. Ji bo rêberekî ne xeter bû? Kîjan zilam ji mijareke bi vî rengî re dikare cesaret bike? Û min dilê xwe çawa rêxistin kir, ajoyên xwe çawa terbiye dikim? Mezinbûna polîtîkayê di vir de ye; min ajoya cînseltî çawa terbiye kiriye, min ji ajoya cînseltî mînaka polîtîkayeke şahane çawa derrxistiye holê girînge. Ajo, hemû kurdînî biriye. Cînseltiya çors zilam jî, jin jî fetisandiye. Lê min ji ajoyan wane derxistin. Min ajoya cînseltî weke wane vegotiye. Niha jî hertim wê vediguherînim îsyaneke mezin, polîtîzekirina cinsê jîn jî yê zilam jî, mezin azadbûnê û xweşikbûnê.

Nêzîkatiya Freûd jî henekî wisa ye. Pêkanîneke wî ya pir baş heye, lê em ne Freûdparêzin. Ma me bê derfetî ser nexistiye; polîtîka û pêşketin di holê de ne, hûn di holê de ne. Bi qasî ku hûn ji azadiyê re xiyanet nekin, bi vî şêwazî û di binê bandora polîtîkayê de bimînin, hûn ê mezin bibin. Hûn ê bibin kesayetên rasteqîn ên jina azad ên rast û xwediyê rast jiyanê, serbixwe û hûn ê bibin kesayetên ku hêza biryardariyê qezenckirine. Hûn ê xwe bigihînin xweşikiyê, hûn ê azwerî û hestan jî pêş bixin. Ji bo vê dibêjim, divê hûn hinekî lêkolîn û têkoşîn bikin. Bê têkoşîn pêwendiyeke asanî nabe. Dema ku em dibêjin têkoşîn tabî kî, nabêjim çavên hev derxin. Ez di vê mijarê de ji bo we bi hêvî nabim. Hûn nikarin nakokiyê fêm bikin, ya herî girîng jî nakokî di pîvana guncaw de bi têkoşîneke derbaskirinê nizanin. Di pêwendiyên we yên hezkirin û hestan de, di pêwendiyên we yên bertekê de bê pîvaniyên pir mezin hene. Ger di hestên min de jî bê pîvanî hebûya, dê pêwendiya Kurd çawa ba? Weke min got, hûn ê bifetisiyana, pêşketin jî nedibû. Ev xeterî ji bo we pir şênbere. Hinekî bibin xwedî wijdan. Hûn ê bikaribin bibin jinên bi aqil? Bi taybetî jî weke rêgeza ku herî zêde azadî jê re pêwîste di vê mijarê de bi mantiq, bi feraseta peywirê, bê ku bikevin kaprîsên jinê, gelo hûn ê bikaribin hiqûqê xwe, hinekî be jî ji bo girtina mafê xwe bi hêzbûnê re hûn ê hêzê bînin? Ya rast ev ji bo we pir jiyanî ye. Lê hûn van pirsan jî ji xwe nakin. Hûn bê wîjdan li beramberî xwe tevdigerin. Ya rastî ji bo jin mantiqbûn, pêgihîştin, mafê xwe, anûr û hinekî jî şerefa xwe saxlem destgirtin çiqas pêwîste. Vaye pêwendiya vê bi welat re, civaka azad, rêxistin, pêwendiyan re avakirin û xwedî li pêşketina wê derketin çiqas girînge.

Di nava we de ya ku bikaribe bibe xwedî tevgerîneke wisa bi wate heye? Hûn dibêjin perwerde, dibêjin; “*em ewqas pêş ketine, milîtanin”* lê rewşa we dilê mirov bi xwe dişewitîne. Hinekî jî hûn bi xêra min jiyan dikin. Lê bi rastî jî mirov dixwaze ku, bi

rastî jî hûn bibin jinên ku ez jî heyranî wan dibim. Ez ji mezinbûna jinê natirsim. Jixwe ez heta dawî sade me û di mijara jinê de jî bandor dibim bila bibim, têm girêdan bila bêm girêdan. Ez xwe wisa li ser de nabînim û rewşeke min a ku bêje yê herî mezin ez im jî nîne. Lê hûn amadene ji wisa dîtinê re. Mînak keçek tê gel min, fêr bûye, bi feraseteke Rêbertiya klasîk li beramberî min xwar dibe, dilerize. Ez dibêjim ev heqaretin li min. Ez ne kesekî wisa me. Ma ev dibe lewaziyek jinê? Ez hema li ser difikirim, gelo dikare wisa min bandor bike? Na, ez ne kesekî wisa me jî, wê demê kesekî çawa me? Vana pir girîngin, hewl bidin fêm bikin. Di demên dorî de digotin jiyana bi çîle, vaye jiyana herî bi çîle ev e. Em bi sedan bigirin; ne hûn wisa li pêşbarî min bilezirin, ne jî tenê bi qelsiyên jinê ve werin girêdan. Na! Li gorî min rewş hîn cudatire. Jin jî mirove. Teqez dikare bibe kesayeteke bi anûr û hêja. Çima jin hertim weke metayekî çors a cînseltiyê bê dîtin? Çima di jinê de jî li mezinbûnê neyê fikirîn û heta ev fikrandin, li beramberî mirov ne xetere?

Yên ku vê jinê ewqas biçûk dibînin, ewqas teng dikin, nêzîkatiyên jinê dadixin asta metayeke ji rêzê ya cînseltî û ji aliyê jinê ve jî li gorî vê ketina nava tengbûneke kesayetê, li gorî min xirabiya herî mezin a ku bi civaka mirovan bê kirine. Başe, li beramberî vê divê çi bê kirin? Çînên serdest di nava hemû dîrokê de jin ji çînên bindest bêtir xistine, hundirê wê vala kirine. Jixwe ya ku bala min kişand yan jî ya ku bû sedem ez bêrê xwe bidim mijûlbûneke mezin ev xal pêk tîne. Ez bê jin nikarim jiyan bikim, lê bi jina wisa re jî nikarim bijîm. Raste, "*Bê jin nayê jiyîn.*" Ev gotina hevalekî me bû. Lê eşkereye ku bi vê jinê re jî nayê jiyankirin, bi vî zilamî re jî nayê jiyankirin. Jê şûnve pirsgirêkên têkoşîn û pêşketinê derdikevin holê. Pêwendiyên heyî yên jin û zilam, pêwendiyê malbatê dibînim, rewşa wan dilê mirov bi xwe dişewitînin. Hûn dizanin ku em ji bo wan jî şer dikin. Lê jiyana wan ji bo min felakete. Ez vana ji bo biçûk dîtinê nabêjim. Min

bikujin jî nikarim wisa bijîm. Vana hemû girêka pirsgirêkê didin avakirin. Rastiya Serokatî tam jî di vê xalê de bûyera jinê derdixe holê û ez bawerim vana nirxandinên rastin. Ez wisa xeyalan ferz nakim; ajoyên min jî hene, azweriyên min jî hene, lê di serî de rastiya min a Serokatiyê heye. Berpirsyariya netewekî, mirovan û berpirsyariya wan heye. Em nikarin vana ji nedîtî ve bên. Jixwe her yekî winda dike zirara mezin dide, ji nifşê mirov re jî, netew re, çîn re jî û ji kesayetiya xwe re jî zirara herî mezin dide. Me jin wisa girt dest. Dîsa jî bi taybetî em diyar bikin ku, jin bi xwe jî divê ti kes encamên şaş jê dernexe.

Dîqat bikin, ew jina ku min qala wê kir nekuşt; hem jî her kesî digot; "*divê em parçe bikin, bikujin*" li beramberî vê min pir medenî û bi asanî got; "*ger tu dixwazî min bikuje jî, biçe bi dewleta xwe, emperyalîzma xwe re bibe yek, wan himêz bike. Partîyeke bi duristî dixwazim pêş bixim heye. Di nava mala min de û qada pêwendiya min de tu nikarî min bikujî. Li gorî pêdiviya qûralan ez jî li ser esasê vê pêwendiyê nikarim te bikujim.*" Lê li gorî kevneşopan diviyabû bihata kuştin. Li gorî derfet û hêza me jî bi asanî ev dikarî bê kirin. Li gorî kevneşopiya tolgirtina şexsî jî bê ku tu çavê xwe bigirî diviya bihata kuştin. Lê em medenî nêzîk bûn. Dema ku dibêjim medenî em derketin dervî nirxên manewî yên li ser civakê serwer, kalibên wê yên kevin, wan darêzên nirx ên ku tu qîmeta wan nebûn. Min got ya, yê ku îsyana yekem li gund derxist, yê ku got divê di gund de çek neyê teqandin jî ez bûm. Pirsgirêk ev e û diviya bû di vê pêwendiyê de kuştin nebaya. Ji aliyê fîzîkî ve me nekuşt, lê me feraseta wê kuşt. Dîsa belavkirina wê a di derbarê rêxistinê de hebû û me ew jî nekuşt, lê feraseta wê kuşt.

Yanî dîqat bikin, berteka min a li beramberî wê, li ser pîvanên PKK'ê lehûrbûna min bi xwe re anî. Jixwe ji ber vê dibêjim mamosteyeke mezin. Ger KT'yê yeke wek wê yekser an jî ne yekser dernexistiba pêşberî min, min ê ewqas berfireh çareserî ji

van pirsgirêkan re nedîtiba. Min ê ewqas ked neda ji bo hevgirtina mirovan. Ji ber ku jin mezin belav dike, ez jî metirsîdar kom dikim û tola xwe radikim. Ez vê ji ber feraseta me ya rêxistinî ya baş dibêjim. Ew, pir cemîdî û dikuje, ruçikekî mîna qeşayê. Ez jî bi rengekî awarte çoşê dafirînim. Li hêza jiyanê ya ku bi we re pêş dikeve binêrin. Li beramberî wê bertekeke we jî nîne. Jin dixwaze ji şer dûr bixe. Ez li baremberî vê bi şêwazekî awarte şer ferz dikim. Ew dixwaze di cînseltiyê de bi fetisîne, ez bi şêwazekî awarte rê li ber pêşketina cînseltiyê vedikim. Bi bertekeke mezin dixwaze ne xweşik bike, li beramberî vê ez bilind dikim, xweşik dikim. Vaye ez tola xwe wisa radikim. Devjê berdin bila hebûna xwe ya dizekê bidomîne, heta bi qasî ku ew jiyan dike ez bêtir bi hêz dibim. Lê ya ku hûn ji tolgirtinê fêm dikin, di heman kêliyê de lêdan û kuştine. Hûn her roj hevdu dikujin, hevdû nadin jiyankirin. Lê pêwendiyên min ne wisa ne. Hema bêje pêwendiyên ku ez bi we hemûyan re pêş dixim pêwendiyên ku pir zêde we ber bi pêşveçûnê ve sewq dike ye. Min xwe ji bo netewekî wisa veguhert. Niha jî cîhanê bandor dikim. Ji bûneweרê ku dikare xwe wisa bike re divê bê gotin mirov yan jî yê ku hinekî din xwe gihandiye mezinahiya vê re bê gotin. Ya ku ji bo me pir zêde pêwîste jî vaye ev e.

Dizanim hêza we ya fedakariyê heye. Weke min got hûn dixwazin bibin xwedî hinek gavên bi cesaret jî. Ji bo we ya pêwîste dahûrandina jiyanê ye. Min xwest hinekî wê nîşan bidim, li gorî min pir binirxe. Ji bo we pêwîst hinek bersivên rast li pê hev rêz bikim. Hem şayanî eleqê, hem jî şayane ku li pênavê têkoşîneke mezin bê meşandin. Ji ber ku ez weke ku piraniya we dibînin hîn jî bi îdîa dixebitim. Bi afirandina mirovê azad, ji pêwendiyên mirov yên azad re pir bi coş di asteke dewlemend de hewl didim îfadeyeke xweşik bidim qezenckirin. Asta civakî, asta netewî, ger hêza min têrê bike di asta girtina berfirehiya xwe a hemû mirovahiyê de azweriya min heye. Bi vî rengî bûyîn, ev

şêwaz li ser hemû pêwendiyên xwe ferzkirinê tiştekî ez winda bikim yan tiştekî ez pê biçûk dibim heye. Na. Xwarina min kême, ez ji hêz ketim? Na. Berevajî ez giştim dewlemendiyeke mezin. Nemaze divê hûn ji vê mînakê waneyên mezin derxin, li ser vî esasî muqayeseyek mezin kirin û xwe li ber çav derbas kirin, bi dijwarî pêwîstiya we pê heye bikevin rêya rast. Heta ku hûn bi vî rengî nekin di rastiya Kurdistanê de jiyan, bi rewşeke awarte ji we re hatiye girtin. Wê ti deriyên derbasbûnê ji we re neye dayîn. Hûn ê di vî temenê ciwan de jî xirab bimirin. Tabî dilê me ji mirineke wisa ya we keçên ciwan û xortên ciwan re razî nabe. Lê ev çîrokeke Kurd e. Çarenûs ji bo we wisa hatiye hûnandin. Ger hûn dixwazin vê çarenûsa wisa xirab hatiye hûnandin hilweşînin, tê wê wateyê ku pêwîstiya we ya bi ceribandina şêwaza me heye.

Dibe ku pir zehmet be, dibe ku hûn ji bo me nikaribin ser jî bixin, lê dîsa jî hêjayî ceribandinê ye. Ji ber ku di nava berpirsyariyê de ji bo we ti rêyeke din a derketinê nabînim û wekî din jî şayanî we nabînim. Dibe ku hinek ji we jiyanên cuda, şerên cuda jî şayanî xwe bibînin. Lê şayanî dîtina min, şayaniyeke şêwaza min gotiye. Ya ku dilê min dixwaze ev e. Hêza min a biryarê heye. Ez encax bi vî rengî meşandina şer re dikarim cesaret bikim. Pêşketinan ji niha ve ji gelek aliyan ve diyakiriye ku, dahûrîna netewî di cîh de ye. Kesayetiya netewî, hemû şanedyên wê yên civakî kêm zêde hatine dahûrandin, heta asta kes jî hatiye daxistin.

Di şexsê kesayet de asta civakî, netewî di heman bandorgeriyê de hatiye destgirtin û ber bi encam ve birin. Ya ku divê bi hilweşîn, derbaskirin çiye, ya ku ji nû ve bê damezrandin çiye; bi çawaniya wê re ev pirs hemû ji pir aliyan ve hatine bersivandin. Çawa ku dijmin bi şêwazekî bê aman dixwaze dest avêtina me ya azadiyê asteng bike, divê ku em jî bi heman bê amaniyê di serî de demê, derfetên azadiyê û azweriya jiyanê heta dawî binirxînin û bi ser rastiya xwe de jî li ser vî esasî biçin. Eşkereye ku ev jî di

serî de yek ji pêwîstiyên devjêneger ê rêzgirtin li beramberî jiyanê ye. Piştî ev pêdivî bi dijwarî hat fêmkirin û şûn de, hemû pêwendiyên ku derkevin pêşberî we, her nakokî ji çareseriyê nikare rizgar bibe. Dema ku pêwîst kir şerê herî berfireh hûn ê bikaribin bi tena serê xwe pêşwazî bikin û encax wisa bibin xwedî hêza serxistinê.

**07 Cotmeh 1994**

,

# Em Heta Dawi Mahkûmî Berxwedanî û Jiyankirinê Ne

Giraniyeke çavkaniya xwe ji hêdî fikrandina we ya siyasî û leşkerî digire heye. Di xebatan de; pêşketin bi jiyana rojane û pratîkî re yeknekirin tê jiyîn. Dubare dibêjim û bila neyê jibîrkirin ku, em rê li pêşketinan vedikin. Ew tengbûna ku hûn şayanî xwe dibînin di mirov de rê li ber rehetiyê hundirîn vekirin nayê fikirandin. Heta her carê, ez ji we re dibêjim pêwîste hûn paşverûtiyên xwe bibînin. Li dijmin binêrin û rastiya xwe fêm bikin. Li şer binêrin, dîsa hewl bidin xwe fêm bikin. Hîn di vî temenî de gelek ji we di rewşeke nenas de ne, hem hûn qala gêrîla, nizanim milîtaniyê dikin, hem jî hem jî bi kesayetiya xwe hûn di rewşeke nenas de bin; ev, bêrêziyeke mezine li berambarî xwe. Ez vê weke çarenûsekê naxirxînim. Bawerim, derfetên PKK'ê yên şoreşê ku zêde dibin, weke mîratxwaran yan jî weke ku gelek bi asanî dikare di nav de bê jiyîn û we ber bi nêzîkatiyeke wisa ve dibe. Ev hemû şaşin. Temam, şoreş û PKK dikare we bide jiyîn, Bakur jî, Başûr jî bide jiyîn. Heta dikare barê çepgiran jî sivik bike. Lê encama ku divê ji vê bê derxistin, ne xwe ferzkirina kesan a bi vî rengî ye. Li min binêrin, ez dahûrandina xwe dikim. Bi kedeke mezin ji bo ku bibim cewherê pêşketinê girîngiyeke taybet didimê. Binêrin û berawirdbûnê baş bikin. Ez bi taybet vê ji we re dibêjim. Ez êdî pratîkên wisa yên ku ti wateya wan nîne, ji raberkirina hêza nûnertiya vê heta dawî dûr nefret dikim û bêzar bûm. Girêdanên seranser, wateyeke wan a siyasî-leşkerî nîne mîna eşîret yan jî ahbab-çawiş qet bala min nakişînin, wate jî nadimê. Pêdiviya min bi girêdanê wisa, ya we jî bi girêdanên bi vî rengî nîne, êdî divê ku hûn bizanibin astekê qezenc bikin. Em rêxistineke şer a cidî ne û bi qasî quralên rêxistinê divê ku wate ji kesayetiya wê re jî bê dayîn. Li gorî qûralên şer bi tevnegerînê, bi rastî jî xwe negihandina şêwaza

milîtanên serkeftî hûn ê dawiya xwe bînin. Hejmara yên ku bi vî rengî winda dikin jî ne kêmin.

Hûn heta dawî di jiyanê de bê reng û bêçare disekinin. Ez her roj di nav de me. Hema bêje bi kesayetiyên we re di pêveçûnê de me. Li gorî we ev kesayet, kesayeta "*qederê*" ye û taybetmendiyên sereke, fêrbûn heta dawî xwe tarî û kûr kiriye. Bi asanî dev ji van fêrbûnan berdan ne gengaz dibe, ne jî dilê we dixwaze. Bi ya herî ji rêzê, xwe pêşnexistina kes li vir koletiye. Hûn jiyanê pir bi asanî pêşwazî dikin. Di welatê me de ewqas qaleyên divê ku bi şoreşê bên fetihkirin hene, tevî ewqas derfetên pêşketina şoreşê, ez li milîtanên me dinêrim ji rizgarkirina xwe jî acizin. Demeke nêz hûn ê bigihêjin welat, wê hinek demên wisa werin pêş ku hûn ê ji xwe dayîna jiyankirinê jî bêzar bibin, hûn ê wate nedin jiyanê, nêzîkatiyeke jêre tê gotin rêzdarî jî hûn ê şayanî xwe nebînin. Dê pîlanek nebe, azweriya we ya fetihkirinê wê zêde pêşnekeve; wê demê em çawa we bidin jiyîn? Vaye gelê kole, di nava pergalê de çawa dijî; hûn ê jî di nava PKK'ê de nûnertiya wê bikin. Hincetên we jî amadene, mirin erzane. Ez dixwazim vê nîşanî we bidim; min dahûrandina xwe kir, di nava pêvajoyên bê eman de di nêvenga pêşketineke herî biçûk de, tevî ku zemînê wê jî nebû, heta di demên du peyvan de jî pêşketin nedihat îfadekirin de, me çawa xwe pêk aniye? Li we dinêrim; hûn çima jiyan dikin, azweriyeke we heye, hûn xwedî aso, hedefekê ne, hûn dixwazin tiştekî xweşik bigirin dest, hûn dixwazin eserekî we yê biçûk hebe? Bersiva van pirsan bi qasî ku aqlê mirov jê negire şîlo ye. Afirandina şerkerekî, rêxistinekê, em nebêjin bi azweriyê jî, qet nebe hûn ê bikaribin vê weke peywirekê fêm bikin?

Di van salên dawî de yek ji tiştên herî girîng ku ez pêre rû bi rû mam ev e û min ev jî heyf dît û şaşwaz mam. Çima ev mirov naxwazin pêşkevin? Çima nikarin hev rêxistin bikin, çavê xwe hertim berdidin tiştên din? 12'ê Îlonê ezezî çawa pêşxist, tê zanîn

û hûn di nava me de vê ezeziya pergalê temsîl dikin, hem jî bi xwe ferzkirinê. Hûn çima xwe nagihînin şêwaza şoreşgeriyê? Lê perwerde û rêxistina şoreşgerî, çalakiya şoreşgerî û veguherîn divê bi azwerî mirov pêre mijûl bibe. Başe, ev meyl çiqas bi we re heye? Ez dahûrîna xwe ji bo vê dikim. Ez şoreşgerê hemû dema me. Min ji deh salî ve dest bi dahûrandina xwe kir, îsyan di wir de bi cîh kir. Hûn ê hinekî rêzdar bin, fêm bikin. Zirzop, çi wateya xwe avêtina holê heye, çi pêwîstî pê heye. Ez hertim dibêjim, ez bi xwe jî jê hez nakim, lê ez ji vê re dibêjim kesayetiya nikare şorbekê jî rizgar bike. Jixwe hûn di nava pergalê de ewqas serûbinê hev bûn, îdîaya yekî ji we nemayî, tam jî dibe raberkirina kesayeteke ku min şîrove kirî. Ger hûn bifroşin jî gelo pergalê we bi çend pereyî bikire; vê pirsê rast ji xwe bikin. Niha di nava me de hinek tasfiyegerên objektif hene. Min hinek ji wan deh salan li ser pişta xwe xwedî kir. Dahûrîna wan di nava xwe de bikin, nîqaş bikin. Niha tam bûne parazît, hem jî bi sutiyê me ve zelîqîne û dibêjin; "*Em bi qasî serê te bilindin û danakevin." Ya rastî* xwe aniye rewşa parazîtê û naxwaze vê jî bibîne ku derbas bike. Karîyerîstiyeke ecêb tê kirin, tiştekî nahêlin. Were û xwedî bike, însaf, xwestekek pir sexte ya bilindbûnê heye. Lê ti behremendiya wî nîne, ti rewşeke serkeftinê nîne, lê mezînî li bejna xwe aniye û dibêje; "*Ez filan rayedarim, ez filan kesê ku navbangê wî hatiye bihîstinim",* yên wisa ne tiştekin, belayeke û parazîte. Bi me ve zeliqiye û maye, lê bi kurtêlxwurane. Ji ber ku ne xwedî kesayetekê ye, behremendî, bandorî û serkeftina wî nîne. Heta ti hewldaneke serkeftinê jî nîne. Û tam jî dema ku di rewşeke wisa de ye radibe karîyerîstiyê dike. Di nava Partiyê de yên wisa hene û di gel vê de gelek şervanên me yên hebûn û tinebûna wan nediyarin hene.

Vana dikarin bibin şerkerên PKK'ê? Rêbertî dikare wisa be, ma ev jî qedereke? Vaye ez teqez dixwazim vê çareser bikim. Ji ber ku ne layiqî şoreşgeriyê ye; kesayetiya şoreşger, tê wateya

redkirina van hemûyan. Misoger divê hûn pêşketina rêbertiyê rast şîrove bikin. Hûn nikarin bi zorê xwe li ser min ferzkirinê bidin jiyîn. Û divê hûn di cewherê xwe de jî veguherînin. Li pêşberî me ji bo serkeftinê ya ku divê bê esasgirtin, şêwazekî serdixe heye û ev serkeftin jî yekane bijareya me ya jiyanê ye. Ferdiyeteke min a herî biçûk jî nîne. Min şêwaz û tempoyekî awarte pêk aniye. Tenê ne erênî, di pêvajoyên neyînî de jî şêwaza ku pêşketinên herî mezin derdixe holê ye. Rêzdarî ev e; divê ev bê dîtin û yê din jî bê teqdîrkirin. Xwe bispêre nirxan, gelek rêyên saxte, xwe ferzkirinên kesayetên saxte, vana ne rastin. Ger vana rast û wateyek îfade kiribana, wê niha li pêşberî me hêza we heba. Bi vî halê xwe yê ku îdîa dike li pêşberî min hêza wî heye kîye, çavnizmê serekeye. Ji ber ku yê hêza xwe heyî yan hêza xwe li ser esasê şer kar tîne, yan jî bi hevrêtî yekbûnê pêk tîne. Wekî din xwepêşandana hêz nayê kirin.

Bi rêbazên herî vala, qurnaztiya gundîtî, bi demogoiya durû ya burzuvaziya biçûk xwe dayîna jiyankirin, xwe wisa di nava Partiyê de yan jî hewldana di nava refên artêşê de xwe di cihekî de hiştin pêwîste bê derbaskirin. Dahûrandin, ji bo hinekî din fêm kirina we ya vê ye. Me şêwaza lumpen a mezinkirina we fêm kir, nizanim pergalê çikir me ew jî fêmkir; jixwe ji ber vê me dahûrandina xwe kir, çawa meşand nîşan da. Min ya xwe jî nîşan da. Ji bo ku hûn bikaribin encamên baştir derxînin. Ji ber ku hûn bi şoreşekê re rû bi rû ne. We jî gav avêtiye nava şoreşê, we gav avêtiye nava PKK'ê, lê rastiya mezin ên jiyanî ku divê hûn bibînin hene; vaye me qala Turkêş kir, teqez sond dixwe û dibêje: "*ez salekê hukum datînim, kom bibin*" û me weke yekane hedef dide nîşandan. Ev, ne gotineke vala hatî kirine. Ger bersiva pêwîst hûn nedin, tê wateya dawiya we ye. Temam yekane hedef ez im, ez bawerim piştî min dê dilê wî bi we neşewite. Niha ger dijminê te wisa ye, êdî di hinek xalên diyar de divê tu jî şiyar be, çareser bike û bersivê jê re ava bikî. Ew kongre lidardixe tu jî bike; ger

ew dibêje: “*Ez ê di salekê de tine bikim”* tu jî bêje; “*ez ê di salekê de faşîzmê tine bikim”* wisa lêbinere û merdî jî ev e.

Ez di şêwaza xwe de hewl didim hinekî bersiv ji vê re bidim, dibe ku têrê neke, ji ber ku komkujiyek li pêşberî me heye. Ger em bi gotinan nalîzin, ya ku li ser me tê ferzkirin mirine, hem jî bi şêwaza herî kehr kirî. Me heta niha rê li vê girt. Me zêde nehişt tevgera şoreşgerî bê pelçiqandin. Lê ji ber ku ev bi vî rengî ye ne ji bo ku em derfeta jiyanê bidin wan tevgerînên we yên ne şayanî jiyana şoreşgerî yan jî ne ji bo ku; “*hûn başin, dikarin wisa jî bikine.”* Xwe nexapînin. Temam pêwîste bê fêmkirin. Wekî din min ev jî vekirî got; weke min di mercên herî zehmet de, di pêvajoyên herî zehmet de û bi defetên sînordar piştî yekî ku dikare wisa xwe dikare çareser bike hebe, ya rast hûn bixwazin çil qat dikarin ji vê zêdetir bikin. Ev hat nîşandan û îspatkirin. Tenê merceke wê heye; teqez divê hûn nebin evîndarê ketîbûna xwe û kêrnehatiya xwe. Hinekî li beramberî veguhertina şoreşgerî rêzdarbûn û bi mercê azweriya xwe gihandinê, pêkanîna vî şêwazî û çareseriyê gengaze. Her yek ji we dikarin bibin fetihkarek şoreşê. Çawa ku pergal her roj wan fetîhan derdixe, tê jî bibî fetîhê şoreşê. Pêwîstiya vê bê nîqaşe, misoger divê wisa be. Niha dibe ku di nava hinek xapandinan de we xwe wisa ne nirxandibe. Ji bo wê di serî de ez xwe vedikim.

Mirovê difikire, mirovê dixebite, mirovê ser dixe kîye, divê çawa be? Bersivên zelal derdikevin. Vaye rêzdarî di vir de ye. Hertim dibêjim, ev herî zêde ji we re pêwîste. We xwe avêtiyê holê û hûn dibêjin me bidin jiyankirin. Ya rast hûn bi canê xwe dilîzin. Ma mirovek wisa bê rêziyê li beramberî xwe dike? Ewqas bêrêziyê li beramberî jiyanê dike? Di şer de jî bi asanî windakirin bêrêziye. Ger tu gêrîlatiyeke bi bandor birêxistin neke, şer û çalakiyên pir bi bandor encam nedî; gerîlatiya ku tu dikî, şerkerî û çalakgerî li beramberî xwe bêrêziye. Piraniya wan di nava şer de bijardeyeke jiyanê ya rast û durist jî pêşkeş nakin. Îdîayeke xwe

nîne, şêwazekî xwe nîne. Piraniya wan xwe tînin vê rewşê. Ev bêrêziya herî mezin li beramberî xwe ye. Rewşa piraniya we dijîn ev e. Pêwîste hûn vê derbas bikin. Di nava refên me de gelek mirovên bi vî rengî hene. Ev ne çarenûseke, ne jî rewşeke neyê derbaskirin û veguhertinê ye. Ti kes nikare ji vê re azadiyê jî bixwaze, nikare bêje; "*Di nava Partiyê de divê ku wisa bê jiyîn*" ji ber ku ev mirine. Faşîzm heye, bi ser me de tê. Ger hûn bêjin em ê birevin, vaye wê demê ew şoreşa ku hûn pir dixwazin wê binketina wê bê jiyîn. Piştî binketin, temam dibe ku yên wisa rehet bibin, lê ez ê vana nedim rehetkirin.

Ez naxwazim binkevim, hûn ê vê bizanibin. Dibe ku hûn ji şoreşê jî aciz bibin, lê em şoreşê ji bo gelan, ji bo gelê me weke pêdiviyeke ji nan û avê zêdetir pêwîst dibînin. Hinek ji we neçarin vê fêm bikin. Hem fêm bikin, hem jî hûn neçarin ku ew veguhertina tê emirkirin jî pêk bînin. Vaye ez ji bo vê xwe tînim vê rewşê. Ma ez dînim? Na, berevajî ji civata dîna re, ji civaka herî zêde lanetkirî re ji dilê mirov û mêjiyê wî çi qut bibe wê nîşan didim. Ji bo rêzgirtinê, ji bo dawî anîna li vê rewşa lanetkirî yek ji tiştên din ku em bikin, dem û derfetên me jî nînin. Bi zor û zehmet dibînim û wê jî wisa bikar tînim. Niha herkes dibêje; "*Derfetên PKK'ê*", yên herî nêzîkî min jî dibêjin. Derfetên çi, tu min nabînî? Temam derfet hene, bêguman hene, lê em ne weke wan ketî û nirxên wan, em ne kesên ku ji şorbeyekê re teslîm bikine. Em mirovên soz dane gelê xwe, gelanin û em wan sozan jî ji bo tenê di gotin de bimînin nadin. Eşkereye ku ez ê bibim hêz, ez hêzim û dê çavkaniya min jî yeman be. Ev jî soza şerefê ye ku me dayî xwe ye. Lê piraniya wan tên dibêjin; "*em bi vê bilîzin.*" Tu yetkî didê pê dilîze. Derfet didiyê çar çûr dike. Tu peywirê dide pêşiyê ne di ferqa wê de ye. Mirov tam jî di vê derê de divê bifikire; "*Rêzgirtin li kîderê ye*"

Binêrin ti kes peywirê li ser min ferz nake, "*tu kes ji min re nabêje xwe wisa veguherîne*" jî. Lê ji ber rêza min a li beramberî

xwe, ji ber hesabê ku min daye wîjdanê xwe vê dikim. Divê ku hûn hinekî vana fêm bikin, tabî wîjdanê we hebe. Hûn xwe ewqas paşketî, ewqas di rewşên ketî de digirin ku, hecko qedere. Na, wan qadên me yê şoreşê bêhna azadiyê ji wan tê, ber bi azadiyê ve dibim, bûyîna kesekî herî hov û derketin nakokiyeke nayê qebûlkirine. Yê bê çare, hejar, wisa li serê xwe dibe bela, ev cîhan jî wî qebûl nake. Ji bo axa xwe, ji bo mirovên xwe nizane reh berde, heta ji çarçûrkirina derfetên rêxistinê jî xwe şûn de nade. Beriya her tiştî divê ev bê çareserkirin. Ez vê bi we re nîqaş dikim û divê hûn hemû jî fêm bikin. Weke ku min got dem pir sînordare, dijmin vala nasekine. Û weke ku hûn difikirin em jî wisa vala jiyan nakin.

Ez dibêjim jiyana hundirîn. Jiyan ne weke ku hûn dibînine. Cuda ye di nava me de. Hûn dibînin jiyan di nava me de hesabgirtineke mezine, mijara lehûrbûneke mezine. Teqînek zanînê ya mezine û êrîşeke mezine. Tenê ne teqîna zanînê jî, bi hemû aliyan ve rêxistin û şereke. Îca li tiştên ku ez şayanî xwe dibînim û yên ku hûn şayanî xwe dibînin binêrin; hûn ê ferqê bibînin û ya din hûn ê li ser vî esasî tevlî rastiya Serokatî bibin, mezin bibin. Jixwe pêwîstiya we bi mezinbûnê heye. Wekî din hûn bibin derewker, xwe bixapînin, xirab bên kuştin. Ewqas xirab hatina kuştin jî divê ne çarenûsa mirov be. Binêrin hûn di girtîgehande ewqas hatine eciqandin, di nava jiyanê de, heta di nava Partiyê de ewqas eciqîne û qermicîne. Ji ber ku hûn nayên pêşxistina şoreşê, pîvanên afirîner ên şoreşê. Ev jî çavkaniya sereke ya tengaviyên we ava dike. Ger na şoreş çareseriyeke, de îca ji bo gelê me şoreş her tişte. Em vê didin nîşandan. Ji bilî kesayetiya min çiyê min heye; ez şoreşê di kesayetiya xwe de dimeşînim. Tu kes nabêje; "*ha ji te re ewqas derfet*" bingehekî amade yê civakî jî nîne, tiştekî netewî yê amade jî nîne. Hebûna min e, ez wê jî vedikim vedikim û bikar tînim, pêş dixim û didim gel.

Em rê li ber pêşketineke mezin vedikin, şoreşê ji xwe didin despêkirin. Ger mirovek bixwaze dikare bike; ya ku min îspat kiriye ev e. Nêzîkatiya me çiye? Ez bêjim; tolgirtine. Li beramberî ketîbûnê, alçaxiyê û hemû curên bêrêzî, nehezkirinê tolgirtine. Hûn dibînin, bi rastî jî tevgereke tolhildanê ya mezine. Me ev îspat kiriye. Ya ku hûn nabînin, lê ji aliyê dijmin ve tê dîtin û parçebûna wê ji aliyê dijmin ve nikare bê astengirin a tolgirtinê ye. Hûn dibêjin; "*em girêdayîne filan*", rewşa we ya ku bi qasî dijmin nabîne heye. Ew jî bela ye! Belê, bi rastî jî di van demên dawî de rewşa gelekan hertim weke bela dinirxînim, wisa ye jî. Fêm nake, xwe venaguherîne, ya rast ji me jî qut nabe, lê yên ku şoreşê jî pêş dixin, hêzeke bandor dike nîne, ked û serkeftin nîne. Ji her alî ve xwe avêtiye ser me dibe rewşeke ku xwe dispêre me û dide meşandin. Tu lêdî, bera bidî jî nabe. Eşkereye ku divê di vir de mirov rêzdarî zêde tengav neke.

Bi rastî jî em camêrê rêxistina şerin. Em xwe mubalaxa nakin, lê hûn ê bibînin ku em di nava çalakiyekê de ne. Rastiya we çiye, em ê li gorî wê tevbigerin. Lê ne di gotinê de, wisa bi heyraniyê yan jî bi bê anûriyê, nizanim bi xwe ferzkirinê, dayîna jiyankirinê jî na. Rastiya we çiye, em ê li gorî wê tevbigerin. Bi ti şêwazî kes nikare li beramberî me raweste, di nava rêxistina me de bi şêwazekî rêxistingerî nayê kirin. Heta sempatizanên me jî bi ti awayî nikarin sempatizaniyê bikin. Şêwazê rêbertiyê heye, ger ji ewqasî re rêzdarim, tê jî vê rêzdariyê bi xwe gihandina vî şêwazî de bide nîşandan.

Ger hêza tevlîbûnê nîne, divê ku bi hîle yan jî bi zimandirêjiyê xwe xapandin nebe. Ev asta we ya zimandirêjiyê, yên minminê dikin û weke tê xwestin xwe rêkûpêk nakin, asta we ya xwe bi pergal nekiriye teqez bê derbaskirin. Ji wêdetir bila ti kes nebêje; "*Ez girêdayî me, rêzdarim*" û xwe nexapîne. Hûn pir vekirî dibînin ku, ez xwedî îsyan û çareseriyeke mezinim, tevgereke rêxistinê ya mezinim. Tevgerînên min ên mezin kêlî bi kêlî çawa

xeteke bilind dişopînin di holê de ye. Min pêşketina ku di kesayetiya xwe de da despêkirin îspatkir, nîşan da û dewam kir. Çiqas bêçare, bêkes û di nava mercên bê derfet de min despê kiribe jî; çiqas serê xwe li rast û çepê didim, çiqas li erd û esman dinêrim, gur, çûk, mar, çiyan, hewa, avê hema çi tiştê di nava xwezayê de heye, yên di civakê de diqewimin li hemûyan dinêrim û ji bo çareseriyê pêş bixim xwe neçar dibinim ku tengav bikim. Vaye rêzdarî ev e.

Belê, em lêpirsîna li ser rêbertiyê pêş bixin. Nirxandinên girîng hatin kirin û xwe vekirina min û tahlîlkirinê de jî asteke kûr hat destnîşankirin. Ez bawerim hinekî bandorkere. Kûrbûneke balkêş, lêhûrbûn û bandorbûn mijara gotinê ye. Ger na hûn sifirin. Bi vî rengî hûn nikarin bibin heval û heman bandorgeriyê, divê ku hûn van hemûyan di jiyanê de nîşan bidin. We dît, ma ez kêm bandorkerim, kêm bi xwe re mijûl bûme, min kêm terbiye kiriye, min kêm xwe teqandiye? Ji bo we, ji bo şadiya we. Madem hûn şoreşgeriyê şayanî xwe dibînin, ji bo ev sifata şoreşgerî leke nebe û ji bo zirar nedana anûra şoreşgerî ye. Şoreş ji bo gelan îfadeya wateyê û kesayetiya azade. Min ji bo wê ev kirin, lê şêwazekî we jî heye; şêwazekî xwe ji binketinê rizgar nake. Heta şêwazekî ji qezakirinê xwe nikare rizgar bike. We ev dît. Min pir sade xwe danî holê. Nizanim, ger ev şêwaza xwe danîna holê bandor dike, em bi kîjan aliyan bizanin û li gorî wê vekin. Teqez divê hûn xwe bigihînin asta ku bi dijmin re dikarin bikevin pêşbirkê. Heta asta pêşketineke bikaribe jiyanê fetih bike pêwîste ji me re. Pêgihandina me, ji bo hûn xwe bigihînin vî şêwaziye. Ji ber ku pir xirab li we didin. Hûn hemû pir xirab hatine bê bertekkirin. Mînak di civîna dawî ya dewrê de, hat dîtin ku ferasetên we yên weke; "*Pêşketin, pêşketinên ji rêzê derbas nakin, ez ancax dikarim ewqasî pêş bixim, di asteke jortir de milîtaniyek pêwîst nake, divê ku ji min neyê xwestin.*" Ferasetên we yên wisa derdikevin holê û ev hatin dîtin. Ger nêzîkatiyeke wisa li ser we

hemûyan serwere, ev jî ji me re heqarete. Çima asta ji rêzê neyê derbaskirin, çima asta fetihkirinê neyê girtin? Pêdiviya we hemûyan bi fetihkirinê heye, pêdiviya we bi xwegihandina jiyanê heye.

Ev dibistan, teqez dibistaneke vê didê ye. Ger heta niha gelek xwe bi vî rengî didin jiyankirin, heta bi van îdîayan xwe dixapîne, ez ji aliyê rêveberiyê ve didim diyarkirin, herî kêm mirov nikare bêje ku hûn jî ji vê re bûne hêza çareseriyê, alîkarên baş. Qadroyê rêveber ên şoreşê, milîtaniyeke dizane van ferasetan derbas bike; ya rast jixwe milîtan ev e. Di hemû qadan de neçare ku asta ji rêzê bê derbaskirin. Êdî ez ji bihîstina van gotinan bêzar bûm. Ne asta ji rêzê, asta fetihkirinê esase. Fetihkirina jiyanê, fetihkirina şer, fetihkirina mirov û çi pêwîste bi wê xwe fetihkirin; ya ku divê bê esasgirtin ev e. We dît, ez xwe çawa dikim? Ma ez kolê we me? Temam, ez xizmetkarê we me, lê ya rastî ev xizmetkarî jî hinek tiştan ji we dixwaze û bendawarî heye. Ne ji bo ku ez we li ser pişta xwe bikim axa yan jî weke koleyekî xwe kaş bikim. Ji bo diyarkirina berfirehî, hedef û diyarkirina şêwaze. Wekî din divê hûn ji xwe bawer bin. Dema ku dibêjim; "*hûn*" hemû çêkera Partiyê û artêşê binav dikim. Divê hem hûn bawer bikin, hem jî ne ji rêzê, asta fetihkirinê mîsogere û divê hûn vê pêk bînin. Ya pey vê re dem dixwaze, ew jî her ku nefes tê girtin tê kirin. Ne tenê ji bo vê dewrê ji bo hemû çêkera Partiyê jî êdî divê ev axaftinên me yên dawî şêwaza fetihkirinê serwer bike. Berevajî, em ê hîn bêtir bi we re bikevin pevçûnê. Ger têr nake divê ku em hîn jî hinek tiştan bidin.

***Ab.:*** Ber bi pêşketineke wisa ve araste dike Serokê min.

***---.:*** Ger pergal dibêje; "*yan wê xilas bibin, ya xilas bibin*" em jî dibêjin; "*yan em ê ser bixin, yan ser bixin.*" Eşkereye ku ev durişma me ye, dijmin me teqlîd dike. Ev ji xweberî ne tenê ji bo vir, divê ku di nava hemû Partiyê de, di vê demê de bê derbaskirin. Bi taybet qadroyên pêşeng teqez divê ku bizanibin

wisa bin. Di nava we de çend kes hene, hejmar jî ne girînge, li cihekî kesek jî hebe bese. Ger hûn êdî wisane, wê demê em ê jî ji we re bêjin milîtanên xwe naxapînin. Belê, ji bo ku hûn wîsa bibin ji vê zêdetir ez çibikim ji we re? Ez li beramberî dijmin bi hêrsim, jixwe her roj vê dibêjim; li beramberî dijminekî ewqas lê dide, qetil dike, ewqas dixe ti kes nikare wisa bênamûsiya ku; "*ez ji rêzê me, têr nakim*" nîşan bide. Zilamê ku vê dibêje pir tiştên xwe ji dest daye. Ger hûn wisa ne, hûn ji rêzê ne, hûn ê bizanibin ev jî windakirin û ketîbûne. Em wisa nekin!

Ez çawa her roj li beramberî we hesab didim. Ger hûn mirovên bi namûsin, mirovên şoreşger bi anûrin. Divê ku bersivên we jî yên wisa hebin. Êdî ji kesayeta zaroktî, köle û binketî re bese. Em ê tahlîl bikin, min got, kongreya faşîzmê di derbarê me de biryarên şênber derdixe. Çi yanî weke ku hûn texmîn dikin em mîna serseriyan bimrin? Ewqas sale hûn didin windakirin, em cara dawîn jî winda bikin? Madem dixwazin qezenc bikin, wê demê divê ku bi amadekarî bin. Ger ez têr nakim bêjin, ez xwe bînim asta têrkar. Ez baweriya xwe bi mirov tînim. Ez dibêjim ger mirov bixwaze bombeyeke atomê ye. Durişma min ev e. Mirov teknîka herî mezine. Yanî teknîka mirov, di nava mercên civakbûnê de dikare her tiştî bike. Teknîka mirov şayanî her tiştiye. Ger ev raste û hûn jî jê bawerin, wê demê divê ku ev di kesayetiya ku şayanî her tiştiye de îfada xwe bibîne. Welhasil weke ku we bawerî bi vî şêwazî girt ez xwe pir baş nanirxînim. Ji bo ku ev kes bibe hêza rêxistinê divê ku xwe çawa bike, ez xwe wisa dikim. Duristim, xwe naxapînim, binketinê qebûl nakim, ji bo serkeftinê derfetan pir baş dibînim, hişyarim; ewqas. Lê bi we re meylê çînî ewqas bûne girêkên kor, kevneşopên civakî çi bêjin hûn dizanin mezinî ew e û hûn fêrbûnên xwe yên jiyana sexte didomînin. Bi gelek aliyan ve we pêşketin bi wir ve gire daye, di kesayetiya xwe de xetimandiye. Ez dibêjim divê ev bê çareserkirin. Ez weke we bawer nakim jiyan qedereke. Ji vê

bawer nakim ku mirov wisa qirêj, bê çareserî û wisa erzan winda bike. Bawerkirin li aliyekî bimîne, tenê ne ji xwe re, ez şayanî rêxistina ku nûnertiya wê dikim jî nabînim.

Hûn li ser vî esasî dibin partiyî û hûn dizanin çarçoveya bi me re rê meşînê ev e. Çima hûn ê fêm nekin, çi hêza we heye? Hûn tên xapandin, ma naxwazin pêşkevin? Naxwazin ser bixin? Ji bo vê mirov esase. Mirov teknîka herî mezine û tê karanîn. Hûn qêmîşî xwe nakin, hûn pir evîndarê xebata xwe ne? Na, ger hûn li beramberî dijmin ne tiştekin, ew fors, ew evîndarî bila bikeve binê erdê. Forsa xwe li ser dijmin bavêjin, çavên xwe berdin serfiraziyê.

Ya ku em jê re dibêjin kesayet ev e û bi vî rengî mirov dikare bibe xwedî kesayet. Bi kurtî, divê ku hûn ser bixin. Ji bo vê, ji bo Partiyê, divê ku em fêm bikin me çawa xwe ava kiriye. Ez dixwazim her yekî ji we re rist bidim, gelo hûn ê bikaribin van ristan bilîzin? Ez di derbarê her yekî ji we de wisa difikirim; *"Filan bişînim vir, vê eyaletê, ev qada xebatê"* qet nebe bila grûbeke biçûk di nava we de şayanî vê be. Başe, heta roja îro çi derket? Tevî ku ewqas pêdivî bi fetihkirinê heye, tevî ku hûn ewqasî muhtacî vê ne, çima hûn xwe gihandina vê astê direvin? Ji bo vê gelek sedemên hundirîn hene û ez bawerim yên ku hûn jî hewl didin çareser bikin ev in. Ya ku ji we re pêwîste çiye, ya ku we di asteke ji rêzê de dihêle û kesayetiya ku ber bi serkeftinan ve nabe çiye? Ez hîn zêde çawa bibim bersiv? Pirsgirêkên eyarkirina demê ye, pirsgirêk pêşxistina derfetên maddî ne yan jî tiştên cuda ku pêdiviya we pê heye hene, ev çine?

***Ab.:***Me di pêvajoya perwerdê de nirxand Serokê min. Piştî ku perwerde gişt xaleke cuda, li beramberî têkoşînê gişt çareseriyê em li ser nêzîkatiyên xapîner rawestiyan. Yek ji nêzîkatiyên xapîner jî, di asteke wasat de xwe dahûrandin, ji peywireke ji rêzê re amadekirin, li ser esasê; "*Ez dikarim her peywira ku bê dayîn bikim"* xwe ji vê re amadekirin, lê peywir afirandin; "*Ez dikarim*

*ji peywirê mezin re dikarim amadebim”* nêzîkatiyeke bi vî rengî jî nîne.

**---.:** Başe ez çawa me, ev girînge. Herhal tahlîlkirina min a xwe heta dawî sotînere, ya rast ev nêzîkatiyên we yên seranser, tevî ku ne amadeye xwe wisa hesab dike ji van nêzîkatiyan re dibe panzehîr. Min xwe li gorî wan çawa xwe amade kiriye?

***Ab.:*** Dahûrînên dawî pir kûr û tahlîlkar bûn. Ji van aliyan ve dikare bê destgirtin.

**---.:** Min çawa li xwe kiriye, ya ku we pir bandor dike yan jî ya ku bi min re heye û bi we re nîne û ji ber ku nîne hûn zêde pêşneketine, yan jî aliyê we yê ku pir xapîner pêşketiye çine? Divê ku hûn vana şênber û baş bibînin.

***Ab.:*** Pir zêde hene Serokê min.

**---.:** Hûn neçarin vê soz û rexnedayînê deynîn holê û bi pratîka xwe re bikin yek. Me ewqas derfet dan we; bikarneanîna we hûn çiqas tengin wê dide diyarkirin. Di xala yekem de bi temsîlkirina me re hûn rû bi rû bûn. Vaye kesayetiya ku hûn jê re dibêjin Rêbertî xwe wisa pêk tîne. Lê we çi li xwe kir? We xwe ferz kir, ev şêwaz ji kî maye?

***Ab.:*** Bi giştî bandora jiyana pergalê ye Serokê min. Nêzîkatiyeke bê pîvan, bê amadekariye.

**---.:** Çiqas mesafe vebû di navbera me de, heta bi Partiyê re? Vaye min îsyana yekem nîşanî we da. Hîn di 10-15 saliya xwe de bûm, sade, basît, lê min kariye îsyaneke girîng pêş bixim. Encamên wê pêşxistin heta roja îro anîn, min dikarî nûnertiya vê kirinê ser bixim. Balkêş û bi qasî wê jî bi êş e, hûn hatine vî temenê xwe, piraniya we hîn ji xwe gihandina asta vê îsyanê bêzarin, dûrin. Hem jî tevî ku Partî ewqas pêş dikeve. Hişmendiya îsyanekê, ruhê îsyanekê, fikra wê û çareseriya wê çima hûn nikarin pêş bixin? Di wan salan de rewşeke min a ku wisa bikaribe îsyanê pêş bixe, bikaribe nasnama gelekî nîşan bide derfetekî min a wisa jî nîne. Ez zarokekî herî di zehmetiyê de,

bêkes, bê derfet bûm û binêrin min karî derketinekê bikim. Bi hemû ziraviyên xwe yên ruhî min ev raber kir. Min hesasiyetên xwe yên mezin danîn holê. Niha ji we re jî îsyangeriyeke wisa pêwîste. Hûn xwe weke pîrejinan davêjin erdê, herkesê ku tê pehînekê li we dide. Hûn jî têra xwe digirîn. Ez di kesayetiya we de zêde taybetmendiyan nabînim. Mînak wê şerkeriya gundîtî çareser bikin, li gorî min diviya bû ev pir we bandor kiribana. Qet nebe niha fêm bikin. Bi qasî encamên ku dijmin jê derdixe hûn encam derxînin.

Em berawirdkirinê niha jî bidomînin. Çima bi min re wisa ye, hûn jî çima wisa mane? Yên ku di statukoperestî û muhafazakariyê de israr dikin kîne? Asta eleqeyê, asta pêwendiyê, uslûbê wê bi min re wisa ye, çima hûn di cihê ku tê de ne asê dimînin? Ti kes nabêje bi qasî min jî bikin, qet nebe bila hêza we ya şopandinê hebe. Hûn dibêjin ku em rêbertiyê dişopînin, lê şopandina rêbertiyê bi awayekî din nabe.

***Ab.:*** Serokê min ger nirxandin bên dewamkirin emcamên girîng jê girtin gengaze. Di nêvî de mabûn.

***---.:*** Başe ez kîderê binirxînim? Weke sînema, fîlmekî min beşên jiyana xwe weke eyneyekê ji we re teyisand.

***Ab.:*** Pêşketinên ku piştî sala 1986'an hatin destxistin û vekirin Serokê min. Yanî ew jî dikarin bên nirxandin.

***---.:*** Pêwîste ez bi mînaka sêyemîn xwe ji we re pêşkêş bikim. Ferqa sala 1986'an ji 1975-76'an çiye?

***Ab.:*** Vekirinên nû derketin holê yan jî tiştên ku wê demê li ber welidînê bûn piştî sala 1986'an bi jiyanî bûn. Tevger veguherî pêşketineke civakî. Şêwazên jiyan û fikrên ku ji hemû pîlanên wan re bibin bersiv pêşketin.

***---.:*** Veguherîna jiyana şênber yan jî demeke ku min gav bi gav bi jiyana şênber re temam dikir bû.

***Ab.:*** Bi jiyana pratîkî re çareserî pêş dikevin.

**---.:** Xwe eyarkirina min a li gorî demê ye. Hem jî li gorî hemû demê ez dizanim xwe li ser rojê ferz bikim. Dibe ku ji bo gel, ji bo we cuda be, lê ji bo min hertim kesayetiya xwe li ser tetîkê girtina mine. Bi min re veguhertin heye, pêşketin heye, lê bal bide, ya din jî cewher heye. Di pêwendiyan de ez demekê wisa me, demekê jî wekî dinim. Ez asta civakî, rewşa civakî dişopînim, asta pêşketina we dişopînim û li gorî wê di kêliyê de li bersivan digerim, dibînim. Nîha jî wisa me, teqez ji doh cudatir im. Hem jî di rêgezeke esasî de bi israrim û misoger nûnertiya vê dikim, hem jî di şêwazan de hema bêje her roj guhertinekê ferz dikim. Hinek kar hene bi sebrê dibin. Karmendiya sebrê mezine.

Ti kes ji we re nabêje hema fetih bikin. Lê tiştekî wisa derket holê, tevî ku hûn bi gelek derfetên berfireh, bi demeke têrker re rû bi rûyê hev jî bûn, we kar nekir. Ez ji bo we hemûyan dibêjim. Ev me dide fikirandin. Kesayetiyeke xwe vedişêre, dev ji xwe berdaye heye û ev rewşeke giştiye. Asta rastiya giştî Kurdistanê diteyîsîne. Tê dîtin ku em kêm hatine fêmkirin.

***Ab.:*** Jixwe feraset têr bike dê pêşketin jî bê dîtin. Hinekî dîmen fêmkirin, sloganwarî fêmkirin heye. Daketina naveroka kar, esasên kar û ji wir ber bi çareseriyê ve çûyîn lewaz dimîne. Xebatên şoreşgerî yên seranser, rêxistinê, xalên sereke yên siyasetê çawa tên meşandin, xeta Rêbertiyê di vê mijarê de çawa ye, şêwaza Rêbertî çawa ye? Lewaze.

**---.:** Niha girêdaneke rast pêş dikeve? Em çima vê nêzîkatiyê raber nekin; "*wey hevalekî me jî wisa ye, em hinekî alîkarî bigirin, bidin*" qet ne be; "*feraseta em nebin bar*" bi we re pêş dikeve?

***Ab.:*** Feraseta em rast fêm bikin pêş dikeve Serokê min.

**---.:** Ev daketina cewherê sosyalîstbûnê ye. Ger te xwe ji bûna bar, giraniyê derxist tê bibî sosyalîst. Ger na bi qurnaztiya gundîtî, bi wî şêwazî we ya kevneşop, xental yan jî bi şayanî dîtinên li

gorî xwe te giranî çêkir, pêre negihîşt tu li wir oportonîstî, tasfiyegerî.

Oportonîzm, tasfîyegerî, heta tevlînebûna jiyanê hemû bi vî rengî destpê dikin. Rêya navîn nîne; ya oportonîst, tasfiyeger û her ku biçe tê ber bi dijberiya şoreşê ve hilkişe, yan jî şêwazê rast di asta herî kêm de be jî tê bidî despêkirin û bi vî rengî tûj bibî. Vaye asta ji rêzê ku em jê re dibêjin asta xeta navîne. Hûn xwe dixapînin; lê bi vê asta xeta navîn bi îhtîmala herî baş tenê oportonîzmeke hundirê wê vala dikare bê raberkirin. Hûn mirovên pir lewaz û hejar hatine hiştin. Yekane çareseriya we bûyîna mirovên şoreşgere; lê hûn vî şansî jî baş kar nayînin. Bêguman li gorî dema berê asta bandorbûna xwe bilinde, lê amadekariyên we û gelek li şûn asta ku we daniye pêşiya xwe ye. Madem sûdmende, em lêpirsînê kûr bikin û bidomînin.

Niha em hinek xalan rêz bikin û li ser bisekinin. Hinek taybetmendiyên ku hûn bi min re dibînin û niha zêdetir diyarker dibin hene. Taybetmendiya Rêbertî ya ku herî zêde bal dikişîne û divê bê lêpirsînkirin; taybetmendiya ku min veguhertiye pêwendiyeke mezin, veguhertiye pêşketina mezin û şêwazê wî ye.

***Ab.:*** Pêşketinên piştî sala 1987’an risteke girînge Serokê min. Bi pêvajoya berê re pêwendîdar bû. Mînak di nêzîkatiya ji jinekê re piştre pêşketineke çawa tê dîtin, bi feraseteke çawa hewl dide? Dîsa em ji nêzîkatiya şoreşgerî bigirin, çawa vediguhere pêşketina tevgereke civakî? Di nava pêvajoya pêşketinê de pêşketineke ku ji van hemûyan re bibe bersiv çawa hat destxistin? Rêbertî bi bêşên cuda bi gelemperî li gorî pêşketinên di nava civakê de pêk tîne, çawa dikare xwe nû bike, amade dike?

***---.:*** Ez hinek xalan rêz bikim; hinek taybetmendiyên ku hûn bi min re dibînin û hinekî din derdikevin hene. Taybetmendiyên pir girîng, hêz didin û encamgirin. Ya herî girîng jî şêwaz; xwe ji qonaxan saxlem derxistina min, nêzîkatiyên min, hestyariya min, rêbazên min, şerê min û pevçûnên min di tempoyek çawa de pêş

ketine? Pêwîste di van mijaran de hinek tişt bên rêzkirin. Ya ku ez ber bi pêş ve birime, derketin daye kirin, hertim ber bi pêşve biriye daye meşandin kîjan taybetmendiye di van mijaran de fikrên hevbeş pêşxistin dibe ku alîkariya wê ji min re jî bibe.

***Ab.:*** Mînak Fatma xwe ber bi fikirandineke wisa berdida; "*Di nava civaka kevneşop a Kurdan de yan jî di nava asta civakî ya heyî de li dijberî vê pêwendiyê nayê derketin. Yanî bi şêwazekî din nikare bi ser min de bê. Ez çiqas helwestekî neyênî raber bikim jî ew pêwendî dê wisa bidome"* ev nêzîkatî pê re serwer bû. Ya rast ev bi rewşa siyasî re jî dipîva. Xwe li gorî rewşên tevgera Partiyê tê de bû jî eyar dikir. Lê xala ku herî zêde xwe dispartê dibe rewşa civakî. Yanî fikirandina; " *ez dibim jî madem damezrandina rêxistineke pêşeng jî vî gelî re afirandin tê hedefkirin, armanc ev e, wê demê nikare li dijberî min derkeve, bi şêwazê tinekirinê nikare bi ser vê pêwendiyê de bê"* serwer bû û baweriya xwe bi vê tanî.

***---.:*** Tenê ne Fatma, gelek navên din ku mirov dikare bijmêre hene. Dibe ku Semîr jî difikirî û digot; *"nikare ser me de bê"* ji ber vê sedemê. Heta gelo F. bi çi dilîst? Ger bê dîqatkirin; "*Wê bibe kujerê bira yan na"* wisa difikire, li gorî ku ev peyv ji devê xwe revand feraseta xwe ferz dike. Li ser navê biratiyekê wisa dizanî ku dê bikaribe ferzkar be. Çiqas nebesiyên giran raber dike bile bike jî, sûc çiqas giran dibin bila bibin tenê ji bo hebûna vê pêwendiyê dê heta çi pileyê bide jiyankirin pir zêde hesabê vê kiriye ev tê fêmkirin.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Ew bi F. re jî hebû. Bi Semîr re jî hebû. Ya ku bi me re heye jî hîn bêtir rewşa hevaltiyê bikaranîn.

***---.:*** Ez hevrê me, hevalên wî çiqas di nava nebesiyan de be jî hevrê ye; vaye xwe dispartin vê û wisa difikirîn; "*wisa nikare li me bide, nikare wiha bike"* û heta hinek layiqdîtinan jî diçûn. Ez bawerim tê dîtin ku xapandineke çawa kûre. Em hinek navên din jî bînin pêş çavên xwe. Mînak wan provakatorên pir bi navûbang;

Şener bînin bîra xwe, Kor Cemal, Terzî bibîr bînin. Tevgerê tînin rewşeke ji xala herî hestyar de lê bidin. Lê di heman demê de difikirin û dibêjin; “*nikare ser me de bê, nikare tiştekî bike yan jî nikare çara vê bîbîne”* yanî dikarin wisa bifikirin. Dikarin wisa bifikirin û teqez jî ji vê bawerin.

***Ab.:*** Terzî Cemal xwe dispêre qada xwecihî.

***---.:*** Dibêje; “Eyaleta Tolhildanê (*Guneybatî) yanî ez, ji çavderxistina min yanî ji çavderxistina wir e û ev jî ji wî re pir giran tê.”* Kor Cemal jî ji bo Botanê ev digot; “*Botan yanî ez, qonax hestyare û ez ê jî xwe wisa ferz bikim.”* Bi şêwaza ku ez xwe wisa fer bikim difikirî. F. jî; “*Başûr yanî ez, nikare Başûr ji çav derxe”* wisa digot. Gelek layiqdîtinên wisa mijara gotinê ne.

***Ab.:*** Jixwe Şener di girtîgehê de kiribû.

***---.:*** Beguman di girtîgehê de jî hene. Mîrateke pir mezin a girtîgehê heye û Şener jî digot; “*girtîgeh yanî ez”* balkêşe!

***Ab.:*** Ji aliyê feraset ve rêxistinkirî pêş ketibûn. Di vê mijarê de tê fêmkirin ku rista Doxû Perînçek mezine, yê ku wanê din jî derxistiye ew e. Ew jî dema ku derdikeve bi Perînçek re hevdîtin pêk tîne, Şener jî dema derdikeve pê re hevdîtin dike.

***---.:*** *Belê, “dibê ez ê rastiyê binirxînim”* hêza lêdanê ya Qûrmaya Giştî ya li çepan didê ye, zêdetir kesayetiyên pêşeng ên çepgirên ku hatine tasfîyekirin û kesayetiyeke ji aliyê pergalê ve yekser weke pêşeng hatiye destnîşankirine. Bêguman yên bi vî rengî dê bi wî bişêwirin û karîgeriya wî jî ew e. Min weke îfadeya hemû beşên komînîst ên dawî dinirxînin. Heta qada navnetewî jî bi alîkariya dewleta Tirk hinekî me gire dide. Vaye dixwazin dîmenekî ji tasfiyegeriya çepgirên Tirkiyê ya ku ji ya Kuba, Çîn û nizanim Kore jî xetertir xêz bikin. Di kesayetiya wan hemûyan de yên me jî bandor dikin, bi taybet jî yên di girtîgehê de. Bi wî rengî dibêjin; “*Nikare me derbas bike”* rista Doxû ya di vê mijarê de û karîgeriya ku dibîne pir şênbere û baweriya xwe pê tînin. Vana hemû li ber min bendavin û di nava rêxistinê de ji van pir

zêde hene. Di dîmen de vana ji bo rêbertiyê dilîzin. Lê ji aliyê her rêberekî ve gelek zemînên ku bandor dike hene. Semîr hertim digot; *"ji çaran sê em in" û Fatma* wisa dizanî ku dê ji hemû aliyan ve li ser kongreya sêyemîn serwer bibe. Bi vî rengî gelek fermandarên eyaletan ji eyaletan em berpirsar digirtin. Bêguman Rêbertî, ji vana hemûyan re hinekî dibe bersiv. Aliyê pir ecêb jî, bi taybetmendiyên sereke yên mirov lîstina wan e. Yanî tenê bi rastiyên siyasî, yên leşkerî nalîzin. Şêwazekî ruhê mirov, pîskolojiya mirov heta dawî bifetisînin ferz dikin. Heta li ser ajoyan jî hesaban dikin.

***Ab.:*** Hîn zêdetir heye Serokê min.

***---.:*** Hûn vana niha hinekî be jî fêm dikin? Nêzîkatiyên wan ên min veguhertina dojehê çawa ne? Mînak, Kor Cemal digot; "*bi şêwazekî nazik kuştina Rêbertî"* çiye pîskolojiya kuştinê? "*em pê nadin kirin, em ê pêşketin û serkeftinê nedin kirin, ev bi şêwazekî nazîkî kuştine û em vê jî dikin"* wisa dibêjin. Yê din jî jixwe gêrîla dide kuştin. Selîm xwe avêtiye aliyekî, Şener çek pir xirab bikar danî, lê ji aliyê din ve jî digire mîrateyeke pir mezin a berxwedaniyê bi demogojiya herî bê aman dixwaze bimeşîne. Yê we jî gelek paşverûtiyên we hene û li ser navê hevaltiyê hema bêje hûn hemû tiştî şayanî xwe dibînin. Hûn di nava hewaya; "*li me nade, dujîna ji me re nake"* de ne.

Zarokatiya me bînin bîra xwe, min çawa qiyamet rakir? Hûn hinekî rêzdar bin. Mîn îsyanek li beramberî bavê xwe, birayê xwe, li beramberî gundê xwe û gav bi gav çawa mezin kir û pêş xist? Ev îsyangeriyeke xweşike. Bêguman mirov pir saxlem destgirtin jî ne raste. Benî adem bi lewaziyan ve barkiriye. Lê balkêşiya şoreşê jî di vir de ye; şoreş tevgereke mirov pir ecêb zindî dikeye. Mirovê lewaz, yanî mirovê ku taybetmendiyên xwe yên wisa hene ya dikuje, ya jî zindî dike. Ji aliyê demê ve jî, ji aliyê şêwaz ve jî bi vî rengî ye. Israra min a di derbarê we de jî ji ber vê sedemê ye. Ger na çima em ewqas bi we re eleqeder bibin?

Hûn çima ewqas xwe ferz dikin? Ma qet wijdanê we nîne? Halbûkî ez ji bo şadiya we her tiştî dinirxînim. Ji bo wan min li dil nerî, ji bo wan min li fikir nerî. Gelo çima ew ewqasî xirabiyê ferz dikin?

***Ab.:*** Naxwazin bikevin binketineke wisa. Ji bo beşekî mirov dikare wisa bêje, beşek ji wan jî bi zanebûn hinek tiştan pêş dixin.

***---.:*** Ya ku dixwazin pêş bixin; li ser Serokatî ferzkirin, ew paşdexistin û pêşxistina hinek kara ye. Li gorî we bi paşdexistina min dikarin çi dest bixin? Yan jî bi ferzkirina xwe dikarin çi bikin?

***Ab.:*** Di demên dawî de azweriyên jiyana ji rêzê pir bi bandor bû. Bi geleka ji wan re ev nêzîkatî heye.

***---.:*** Hinek ji wan jî qet azweriya wan a jiyanê nebû, hinek ji wan jî pir ketî bûn. Li gorî min di van herdu rewşan de jî azweriya wan a jiyanê ku pêş neketiye heye. Em bê aman bi ser herdukan de jî diçin. Me got hûn ê werin jiyanê, ji yên din re jî got hûn ê dev ji jiyana ketî berdin. Rêbertî di vê mijarê de tevgereke dîtinên mezine. Me niha ev li ser Kurdistanê jî ferz kir.

***Ab.:*** Me li ser hemû civakê ferz kir.

***---.:*** Ya yekem, Rêbertî bi hemû hêza xwe ve ber bi jiyana rast ve kişandine. Ya duwemîn, dev ji jiyana xelet, jiyana ketî û jiyana ku ji aliyê dijmin ve hatiye geşkirin berdane. Vaye ev du fermanên mezin, talîmat, yan jî bangewazî ne. Hûn çawa fêm dikin bikin, Rêbertî ev e. Jiyana rast ya pêşbînî tê kirin, jiyana rast, bangewaziya şer ev e. Jiyaneke hatiye mahkumkirin heye; ger hûn vana baş tesbît nekin hûn ê mahf bibin. Di vê mijarê de qet nebêjin nabîne, nizane. Rêbertî arasteyeke saxleme; şûrekî wî yan jî destekî wî yê ku dirêjî her derê dibe, çavekî wî yê dibîne heye. Ew ê ku hûn jê re dibêjin dil, jê re dibêjin teşe heta hûrkariyên wê yên zirav dibîne, ez ê bêm, jêkim û bigirim.

Başe, li gorî we ew derketinên serketî min çima û çawa pêk anîne? Zehmetî hene; weke tê dîtin gelek xwe ferzkirinên ku min

ber bi fetisandinê ve bibin hene. Teyisînên wê yên nava pergalê û heta pir kesên ji we yên niyaz baş, di kîjan xalan de ketin rewşa fetisînê neçarin bibînin. Me emperyalîzm fêm kir dibêje; " *terorîstin"* ji xwe diyare, wisa hukim dane. Durişma hevbeş ya provakatoran jî bi şêwazê; "*jiyan ji me dizîne"* derdikeve pêş, ji ber ku dixwazin fêrbûn û asta xwe rizgar bikin. Yên din çawa xwe ferz dikin? Hûn dixwazin bêjin jiyaneke zêde bi wate nîne; rizgarkirina me dibe zemîn ji emperyalîzmê, mêtîngeriyê, provakator û paşverûtiyê re. Azadî hertim di despêkê de weke xeyalekê ye, hêviyeke, ez bawerim ji ber ku hûn nikarin wê zêde bi goşt-hestî bikin hûn xwe tevlî nakin. Eşkereye ku di tepsiya zêrîn de jî bê pêşkêşkirin hûn nikarin bixwin, ji ber ku hûn bi tiştên din têr bûne yan jî hema bêje hûn qebiz bûne, mîda we nagire. Tolgirtina wan a herî mezin jî heta kîderê û di derbarê çi de ye? Di vê xalê de arasteyên wan ên tolgirtinê û rastiyên vê jî tahlîlkirin, derxistina zanînê pir girînge. Ger em vê tahlîl bikin dibe ku ji we re sûda xwe hebe.

***Ab.:*** Li dijberî pêwendiyên paşverû yên pergalê ne Serokê min. Dijberî pergala wan a jiyanê ye. Em ji jiyanên rêzê, pir zêde keyfî ku hatine rêxistin pêk tên. Yên din hemû bi vê ve girêdayî ne. Hemû xebatên leşkerî, siyasî ji vir encam didin û li vir wate qezenc dikin.

***---.:*** Meziniya ez didim pêwendiyên mirovan û ya ku di vê mijarê de tê parastin, israra mezin ya ku tê pêşxistin jî bingehê şer ava dike. Bi giştî ev pêwendiyên nû dixwaze bila bi îblîs re, dixwaze bila bi fireşteyan re hatibe pêşxistin, qet ne girînge û ez li pê vê me, devjê bernadim. Tenê bila wateya wê hebe, veguherîner be, pêş bixe; heta dawî ez ê vê li ber çav bigirim û ev şêwazekî pir zêde bi min re serwere. Ev bi giştî wisa ye. Hema mezin li hemû pêwendiyekê nerîn, pêwendî mezin nirxandin, ji rêzê destnegirtin, pêşketina pêwendiyê, ji bo ku li ser esasê xizmetkirina ji armanc û rêgezan hewldan girînge.

***Ab.:*** Heta dawî cidî girtin, wate lêbarkirin heye. Çiqas ji rêzê û sînordar be jî wateya pêwîst lê barkirin û ji wir encam derxistin heye.

***---.:*** Bêguman. Em dîsa ji bîranîna li ser zêdekirina bikin; pêwendiya ol tê bîra min. Ez gîştime xaleke wisa ku, dibêjim xwedê li kîderê ye û giştime asta ku şêt bibim. Ez ê vî xwedê li kîderê bibînim? Xwedê tenê peyveke, taveke; ez dê har bibûma. Encama ku pêwendiya ol ez ber ve birim ev bû û piştre min dît ku ez ê şêt bibim, devjêberda. Ya rast min xwe veguherand. Di dema ku min vediguherand de hinekî jî bi fikir re mijûl bûm. Vaye li ser fikirandinê lêhûrbûn û herî dawî ber bi rastiya sosyalîzmê ve çûyîn pêk hat. Sosyalîzm hîn zêdetir dikare weke bûyereke civakî bê dîtin. Doktîrîna sosyalîzmê, felsefa olî, fikrandina olî hinekî din nêzîkî jiyanê dike. Bi vê ve girêdayî hîn zêdetir pevçûn, tevgerîn û dibe rêxistinkirin; ji ber vê ye ku pêşvebirina civakê, li ser veguherandinê tê damezrandin. Di şênberiya Tirkiyê de sosyalîzm tê çi watê? Rêxistina gel, rêxistina kedê, dibe rêxistina netewa bindest. Ji ber ku heta niha tam serkeftin pêk nehatiye ez çawa li serim, hûn dibînin. Ez pir metirsîdar bi ser pêwendiya sosyalîzmê de jî diçim. Ew jî pêwendiyeke û vaye mînakeke ku divê nêzîkbûnek çawa ji pêwendiyê re bikin.

***Ab.:*** Qadên lêgerîna çareseriyê cuda ne Serokê min. Yek ji wan di xwedê de li çareseriya hemû tiştî digere, yek jî di jiyanê de digere, di xwe de li çareseriyê digere.

***---.:*** Di jiyanê de hinekî şênbere û ji ber ku rastire ber bi xwebûnên wisa ve, qezenckirina jiyanê ve dibe. Mesela em rêgeza netewbûnê dest bigirin; dîqat bikin, ez wê demê ne kesekî dahî bûm. Mîn dît ku pirgirêkeke netewî li zimanê xwe alandine, DDKO girtiye, Dev-Genç girtiye û dibêjin; “*Li Kurdistanê pirsgirêka netewî heye, ne wisa?”* û nîqaş dikin. Ez çawa bi ser pirsgirêka netewî de diçim? Dîsa di navê de jiyan heye, ji asta netewa binpêkirî rizgarkirin heye. Yanî taybetmendiyên ku wî

herî zêde kole kiriye ya digire dest û vediguherîne ya herî rizkarkirî, azad bûyî. Dîsa nêzîkatiya pêwendiyeke mezin pêk tê. Girîngiyeke mezin bide pêwendiya pirsgirêka netewî, bi ser de biçe û veguherîne jiyanê. Bêguman weke şopdariya vê pêwendiya Partiyê, pêwendiya rêxistinê tê pêşxistin. "*pêwîstî bi Partiyê heye, partiyeke sosyalîst, Marksîst, Lenînîst, Partiya Kurdan yan jî ya şoreşgerî*" wisa dibeje. Ez çawa bi ser pêwendiya Partiyê de çûm? Niha pêwendiya partiyeke pir mezin hatiye afirandin û pêşxistin. PKK partiyeke çawa ye? Ya rast ev pirs yekser bi wateya ku bi peyva Partiyê re hate ziman, pêwendiya Partiyê ve girêdayî ye. Dîsa di navê de ji rêxistinê heta şerekî mezin, heta şansê jiyanake nû pir girînge û taybetmendiyên xwe yên cudaker hene. Lê di bingeh de bi rêgeza Partiyê ve girêdayî mayîna min PKK'ê wisa dike. Me hemûyan, gelekî ewqasî dikare li dûv xwe bikişîne.

Herî dawî jî pêwendiya şerê çekdarî ya ku hat pêşxistin, pêwendiya gêrîla heye; em çawa ser de çûn? Lê di despêkê de çek, tenê di asta gotinê de bû, heta ji karanîna çekê pir dûr bû. Lê em weke pêwendiyeke gêrîla ser de çûn û îro bi qasî ku cîhan xeyal neke, dijmin di xeyalên xwe de derbas neke min bersiv da bi bergalkirineke gêrîla. Ji ber ku ji dijmin zêdetir berendamên me yên gêrîla me vala derdixistin. Lê bi israreke mezin, bi wateyeke mezin li pêwendiyê barkirinê, di encam de gêrîlatiyeke wisa bi bandor derdixist holê. Min eleqedar dike, digirim dest, şêwazên min ên pêwendiyên mezin wisa ne. Pêwendiya qadroyekî ev jî dibe pêwendiyeke dişibe vê. Min eleqeder dike, digirim dest û piştî wê kûrahiya hatiye girtin, vaye di holê de ye. Ji aliyê têgeh ve wateya ku min li pêwendiyê barkiriye, tahlîlkirin, veguhertin; ya ku divê bê hilweşandin hilweşîn, ya ku bê kirin, kirin mijareke sereke ya serdeçûnê ye. Bêguman vana hemûyan bi xwe re berawird bikin; ji bo we pêwendî, mîna kefa sabûnê ye, pufkê vemirîne. Mîna benê pemboye, qutke bila biçe. Eleqeya we,

şopandin û çalakiya we ya veguhertinê pir lewaze. Nemaze pêwendiya netew, pêwendiya civakî, pêwendiya gêrîla, pêwendiya hevaltiyê zêde watedar nîne. Bi asanî vedimire, dişkê, bi asanî dev jê tê berdan, hûn dê nikaribin di nav de bibin qada pêwendiyeke saxlem. Ji bo min pêwendî pir cuda ye. Girêdayîme, bi pergalim, pêş dixim, veduguherînim. Vaye şêwaza pêşketinê, uslûb û şêwaza milîtanê mezine. Taybetmendiya ku divê li ser milîtan serwer be.

Belê, bê ku em meyla mijarê ya sereke ji dest bidin bidomînin. Wateya ku ez didim pêwendiyan, di pileya yekem de ye. Taybetmendiya duwem a girîngiya wê mezin kê fêm kir? nêzîkatiya min a mezin duwemîn û taybetmendiya mezin ku we dîtiye çiye?

***Ab.:*** Eyarkirina jiyanê, ji aliyê cih û demê ve behremendiya rast kirine heye.

**---.:** Tu tenê bi peyvekê îfade bike çiye?

***Ab.:*** Rêkûpêk kirine. Rêkûpêk-kirina rêxistina jiyanê. Di cihê ku divê bê nermkirin de nermkirin, di dema bê qutkirin de qutkirin.

**---.:** Bi îfadeyeke hîn zelal, weke coşa jiyanê, şêwaza jiyan, rêzdariya jiyanê, azweriya jiyanê jî em dikarin binav bikin?

***Ab.:*** Rêkûpêk-kirina jiyanê Serokê min. Ji bo hemû curê pêwendî û jiyanê derbasdare.

**---.:** Meraqa jiyanê. Li gorî te ji van hemû taybetmendiyên hevbeş re çi nav dikare bê dayîn? Rêgeza jiyanê çima bi min re wisa ye, bi we re ewqas mirî ye? Ez çima ewqas bi ser jiyanê de çûm? Dîsa şêwaz û armanc dibe ku ev be?

***Ab.:*** Wate dayîn, ew bi armancekê ve girêdan, di wê armancê de bi îdîabûn, ya din jî şêwaza vê baş girtin, di şêwaz de bandorên vê dîtin pir girînge. Gelek caran şikandin, rijandin, di nêvî de hiştin, hinek caran nermbûna pêwîst raber nekirin, hinek caran teqez diyarnekirin, vana di dem û cih de nekirine…

***---.:*** Vana rêkûpêkbûna jiyanê ne û mijarê cuda ne. Dîsa ez çima ewqas nirx didim jiyanê bi xwe? Bi wateyeke din, çima hûn vê nirxê nadin? Vana ji bo derxistina zanînê pirsên ku divê bên pirskirinin. Nirxê sosyalîst, bi rêzdariya ku ji jiyanê re raber dikin ve tê pîvan. Ji ber ku sosyalîzm rêzdarîya jiyanê ye. Heta jiyan bi asanî negirtina dest, jiyan bi asanî gengaz nedîtine. Ez heta niha jî bawer nakim ku jiyan bi asanî tê destxistin, yan jî ji aliyê sosyalîstekî ve bawer nakim ku pêvajoyeke bi asanî dikare bê meşandine, bi qasî vê hîn jî bawer nakim ku hûn jiyanê rast fêm dikin. Ez vê weke azwerî û asta xwe gihandinê dibînim û divê ku wisa jî bê dîtin. Lê hûn pir ji rêzê, hûn wisa dizanin ku pêşwext hatiye jiyîn. Meyla ku li ser we serwere, jiyaneke pir asane. Wisa ye ku, hûn ji kişandina cixareyekê têr dibin. Ger dewlemendiyeke we ya pir biçûk hebe, hûn hema bi wê tatmîn dibin, hûn bibin xwedî hêz-qudretekê hema hûn ji wê tatmînekê dibînin. Hûn wisa dizanin ku hûn dikarin bi asanî jiyanê pêk bînin. Jiyan ji we re xweber û pir asan tê. Rêgeza jiyan û mirinê, bilindkirina jiyanê, azadkirin, rêxistinkirin, hemû curê rêkûpêkbûna asta vê bi we re pir lewaze. Di jiyanê de, di wateya xwe pêşxistinê de bi serdeçûneke ferdî de pir lewaze. Asta jiyanê ya civakî, asta hunerî-netewî, asta çalakî û şer bi we re pir belengazî ye, pir nebese. Ji bo min jiyan, beriya hemû tiştî tevgereke di nava lep û destan de bi cîh nabe, azweriyek, hezkirinek, hesteke û kamilbûne; jiyan rêxistineke, lîstokeke mezine, şere.

Ez ji bilî vê, weke we nafikirim ku jiyan kişandina cixareyekê ye, ahbab-çawîşiyeke baş, ferdiyet, şorbeyeke xweş bi kevçiyan xwarin, xeweke xweş xewkirin, pereyekî baş, pîrek û mêrek, zarok-marokin, mal û milke; bi min re ev nînin.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Yên bi we re û bi min re hertim berevajî ne. Dêmekî wateya ku hûn didin jiyanê, asta we ya tevlîbûna jiyanê we pir mûhafazakar û statikoparêz dike. Rêgezên jiyanê yên ku li ser

min serwer hene, hûn jî li ser van serwer bin, hûn ê wê demê bibînin ku di dest û lepê ti kesî de bi cîh nabin. Di jiyanê de ast, rêkûpêkî, azwerî, di jiyanê de şer, armanc, nûbûn, hêz, kelecan, vesazkirin; bi min re di tempoyekî pir zêde de ye. Bi we re berevajî mijara gotinê ye. Bi azwerî û kelecanê derfetê jiyanê yê ku tê afirandin pêşxistin û hûn ji hewldana parastinê jî dûrin. Lê bi min re parastina jiyanê pir li pêşe. Ya ku li ser we serwere ji hemû curê xeteriyê re vekirî bi ya heyî xwe têr dîtin, ya heyî neparastin bi xwe re anîne. Te çi dîtiye xwe bi wê ve têr bibîne, jiyaneke belengazî xweşik nake û heta ji avakirina derfeteke jiyanê re dê hewldana we çi be? Ya rast a ku me di vê rewşê de dihêle ev hemû ne.

Di cîhana min de vana nabin. Weke we jiyankirin ji bo min ne tişteke. Jiyan di vê berfirehiyê de destgirtin, bêguman ji bo min taybetmendiyeke pir girînge û heta niha jî di nava vê taybetemendiyê de wate didim jiyanê, demê di vê kûrbûnê de dibînim. Bêguman jiyan ji bo min ne ferdiyete, misoger divê ku jiyan bê civakîkirin, netewîkirin, mirovîkirin û pêdiviya bi vî şêwazî derbas kirinê, jiyan ji hemû aliyan ve bi taybetî ew dîl, bendên statukoparêz binpêkirin û derbaskirin, azweriya mîna lehiyekê herîkîn û çûyînê ye bawerim ev tê fêmkirin. Taybetmendiyek din a sêyemîn a mezin yan jî taybetmendiya min we nîqaş kir? Divê ku we tesbît kiribe.

***Ab.:*** Hêza veguhertina li ser jiyanê serwere. Hêza guhertinê, tahlîlkirinê.

***---.:*** Tu dixwazî bêjî hêza guhertinê. Guhertin, veguhertin yan jî bilindbûnek. Guhertin xwedî şêwaza îfadeyek mezine?

***Ab.:*** Guhertina mirov, derdorê û guhertina civakê bi gelek mijaran ve girêdayî ye. Bi jiyanê û pêwendiyê re jî têkildare.

***---.:*** Bêguman guhertin û veguhertin heye. Rêgezeke sereke ya jiyanê ye yan jî ne weke heyî, bi têgîştina we ya jiyanê re têkildare. Veguhertina jiyanê, bi veguherîna jiyanê kirin di astên

awarte de ne. Bi statukoya heyî re jiyan kirin ne çarenûseke. Guhertin û veguhertin esase. Bêguman di rastiya Kurdistanê de, di rastiya pêwendiyên Kurdistanê de, di jiyana wê/î de çiqas girînge ez bawerim xwe dide hîskirin. Ez ji we re dibêjim hûn pir zêde bifikirin. Dema ku ez li rûyê we dinêrim difikirim û dibêjim guhertin û veguhertina van herî kêm bi qasî li dijmin dayînê, rêgezeke fermanbere. Lê kesayetiyên we yên ku hêvî nadin pêwîste mirov di guhertin û veguhertineke mezin re derbas bike. Dijmin jî encax ji bo vê weke hedef bê diyarkirin. Asta we ya paşketî, heta asta we ya hêza xwe têra jiyanê nake guhertin, hedefeke mezin û azweriyeke mezine. Be ku guhertin veguhertinê pêk bînim, saniyekê jî xwe rehet bernadim. Ev tevgerîna mezin pêkanîn jî ji hemû aliyan ve alîgiriya guhertina jiyanê û bi rêgeza jiyanê re têkildare. Ya rast ji despêkê ve ev şêwazekî li ser min serwere. Bê guhertin, veguhertin nikarim bijîm, her roj bê guhertin û veguhertinê nikarim jiyan bikim. Lê hûn li beramberî guhertinê nerehetin, veguhertin hîn zêde ji we re zehmet tê. Bi min re jî berevajî ye, neguhertin min aciz dike. Li gorî min ya ku her roj guhertinekê nake, yê ku her roj xwe venaguherîne rengekî zêde nikare were jiyankirinê. Bi wî/ê re jiyan zêde pêş naçe. Li gorî min divê ku her roj mirov jiyanake cuda di nava jiyanê de bi cîh bike. Dema ku ez dibînim astên we nayên guhertin, ev jî bi min re rê li ber hêrseke mezin vedike.

Her roj bi hewayekê, bi rengekî, bi şêweyekî silav dayîna jiyanê, hêzeke mezin ya veguhertinê îfade dike.

Ez wisa me. Ne gengaze ku ez xwe di qalibekî de bigirim. Hêza awarte ya veguhertinê, guhertinê nebe ez nikarim bijîm. Rêgeza ku min li ser xwe serwer kiriye ev e. Hûn jî berevajî, yanî dixwazim vebiguherînim û lêdinêrim ku hûn di destê min de bûne bela. Ew nermbûna mezin nîne. Ji despêkê ve keda min a teşe dayînê heye; bi salane ez li ser we radiwestim, lê em zêde nikarin veguherînin. Tu Elî’yê berê, Welî’yê berê. Ya din weke herduka

mayîn jî xweşiya xwe diçe. Ez ne wisa me. Rêgezên min ên bingehîn hene, lê bi van rêgezan karmendî dayîna qezenckirin awarte ye. Yên ku di hezar salî de nedihatin cîhkirin min di jiyana xwe de bi cîh kirin.

Ji aliyê rêxistinê, azadiyê, şerkeriyê ve min veguhertineke mezin pêk anî. Ev hemû pêngavên veguhertinên mezinin. Hûn dema ku nikarin di kêlekê de derbas bin, ji bo min di asta nirxên ku nebin nabe de ne. Çawa wisa bê ku biguherînin, derdora xwe biguherin veguherin hûn dikarin rojane bijîn? Ez vê fêm nakim. Bêguman dema ku em dibêjin guhertin û veguhertin, divê ku ev jî rast bê fêmkirin. Ne guhertineke ji rêzê ye. Guhertin heye, ber bi paşverûtiyê ve dibe, ber bi jêr ve dibe. Ya min hertim xwedî stîleke helezonvarî ye. Digere dizîvire, lê her ku diçe bilind dibe, xweşik dibe, serwer dibe. Kelecan û şanaziya vê bi min re mezine, lê mixabin ev hest bi we re, ev daxwaz lewazin. Mirov dikare qala rêgez û taybetmendiyên din bike?

***X.:*** Bê aman şopandina dijmin û hertim însîyatîf di destê xwe de girtin.

**---.:** Tu dibêjî şopandin û însiyatîf? Başe tu çi dibêjî?

***Se.:*** Serokê min, afirîneriyeke mezin ya ku vê helezonê dide diyarkirin, çavkaniya xwe ji hilberînê digire.

**---.:** Wekî din?

***X.:*** Serokê min, ya din jî vîneke pir serbixwe heye. Vîna xwe bi tiştekî ve girênedan pir girînge.

**---.:** Rêgeza serbixweyî yê. Afirînerî, însîyatîf, dijmin şopandin. Vana hemû bi hev ve girêdayî ne. Ger em tenê bi peyvekê îfade bikin hûn ê çi bêjin?

***Te.:*** Serokê min, bi cewhera mirov ve girêdaneke pir mezin heye û têkoşîna pêşxistina wê pir li pêş.

**---.:** Rêgeza mirovîbûnê.

***Ro.:*** Di asta azweriyê de bi fetihkirinê ve girêdan yanî li beramberî van hemûyan bi şêwazekî fetihkirinê de kîn bihîstin heye.

***---.:*** Kîn yan jî tolgirtin.

***Ro.:*** Bê ku ji jiyana otorîte tawîz bide di heman demê de di nava nermbûneke mezin de bûyîne.

***---.:*** Nermbûna otorite ye.

***Ron.:*** Serokê min, bûyera hemû tiştê ku bê jiyîn dayîna jiyankirine. Ya din jî bûyera rêxistinkirinê ye. Ez vana pir girîng dibînim. Ji ber ku despêkirina mirovatiyê û pêşketina wan bi rêxistinê ve girêdayî ye. Rêbertiya Partiya me bi taybetî ji rêxistinkirina mirovan heta rêxistinkirina Partiyê dahûrandineke berfireh dike. Li gorî min yek ji destkeftên herî girîng jî ev e.

***---.:*** Civakbûn, rêxistingerî, ya ku divê jiyan bike dayîna jiyankirin, ya ku neyên jiyankirin jî nedayîna jiyîn. Yanî rêgeza jiyangeriyê. Jixwe ev rêgez wî ber bi civakbûn û ber bi bûna civakîbûnê ve yanî yekî ji gel bûyînê ve dahf dide.

***Be.:*** Serokê min, teqez serkeftin hedefkirin û hemû astengiyên ku li pêşiya windakirinê pêşwext dîtine.

***---.:*** Derfeta windakirin û serkeftin dîtin, em qala baş dîtina vê dikin. Yanî di mijara serkeftin û windakirinê de teqezbûyîn.

***Ev.:*** Di tempo de berdewamî, yanî di ti demê de tempoya xwe ne xistin. Hertim di heman astî de domandin. Tempo jî bi lez û teqeze.

***---.:*** Di jiyanê de tempoyekî her diçe lez qezenc dike.

***X.:*** Tevî ku îro di mirovatiyê de ji xwezayîbûnê dûrketin jî heye, di rêbertiyê de xwezayîbûneke mezin. îfadeya veguherîna xwezayîbûnê ye.

***---.:*** Li beramberî ji xwezayîbûna mirov dûrketina ji mirovatiyê xwezayîbûneke mezin dayîna jiyîn. Wekî din?

***Me.:*** Serokê min, taybetmendiya kedê ya ku bi me re pir kême bi Rêbertî re şênber bûne.

***---.:*** Ji yê bi kedê re nîne tenezil nekirin, yanî bi rêgeza xwe ve girêdan.

***X.:*** Serokê min ti tiştekî ketî qebûlnekirin. Çi di jiyanê de be, çi jî di mirov de be ferqa bi jiyana me re derdikeve holê. Ji ber ku em qet ketîbûnê nabînin.

***---.:*** Erê li beramberî jiyana ketî, li beramberî jiyana ku girtine bin serdestiyê bertekeke mezin heye. Wekî din?

***Şi.:*** Kûrbûna di lêhûrbûnê de û bûyîna çavdêrekî baş.

***---.:*** Çavdêrekî pir yaman, di jiyanê de bûyîna hêza çavdêr û ev hûrûkûrbûn pêk anîn. Wekî din?

***Pe.:*** Serokê min, hedefa xwe bi xalekê ve girêdan yanî di hedefê de bê sînorî. Ya din jî ji xala herî bi nakok a hedefê dest bikar kirin.

***---.:*** Bi pergaleke dewlemend a hedefan re jiyankirin yan jî dewlemendiya hedefê, jiyan ji xala herî hestyar de zevtkirin. Tê dîtin ku keç li gorî xortan xwedî hêza nirxandineke pêştir kirinê de ne. Çima zilam ewqas bêdengin? Hema bêje hemû keçan nirxandin kir?

***Ze.:*** Serokê min, ez zekayeke pir mezin a deha yê dibînim. Bi çavê hunermendekî zekayeke pir mezin heye.

***---.:*** Wekî din?

***So.:*** Serokê min, ji bo xweşikirina jiyanake bi kirêtiyan ve dagirtî ji bo xweşikirinê hêrs û di vê hêrsê de domdarî bûn heye.

***---.:*** Bi rêgeza estetîkê ve girêdan. Yanî di jiyanê de ji estetîkê re nirx dayîn.

***Soz.:*** Li beramberî xeteriyan bi tevdîr û tevdîr girtin pir girînge. Em vê di qonaxa 12'ê Îlonê de jî dibînin. Beriya despêkirina 12'ê Îlonê dîtina Rêbertiyê ya vê û tevdîr girtin mînakeke balkêşe.

***---.:*** Di jiyanê de bi rêgeza mezin a parastinê ve girêdayî mayîn. Wekî din?

***Se.:*** Serokê min, bûyîna xwedî hestên bilind.

***---.:*** Zeka û hest heman tiştin?

***Se.:*** Ferq heye Serokê min.

***---.:*** Di asteke bilind de bi hêza hestan tevgerîn heye. Li gorî te aliyên min ên herî lewaz çi ne?

***Ca.:*** Serokê min, dema ku Rêbertî vana hemûyan pêk tîne ya din jî rewşa bawerî pêkanîneke mezin heye.

***---.:*** Hesta parastin û baweriyê bi hev ve girêdayîne.

***Roz.:*** Hertim bi xwe re di nava şer de bûyîn. Yanî ti car ji xwe têr nebûn.

***---.:*** Belê. Hertim bi xwe re di nava şer de bûyîn, xwe di rewşa nakok de girtin. Wekî din?

***Xe.:*** Hertim bi sebir bi ser bûyeran de çûyîn heye.

***---.:*** Rêgeza bi sebir bûyînê; tempo û sebir pir baş eyarkirin heye û di heman demê de sebir bi rêgezê tê meşandin. Niha jî divê ku hûn hinek aliyên min ên lewaz bêjin. Li gorî ku ez jî mirovim hinek aliyên ku min lewaz dihêlin hene. Divê ku hûn hinekî jî ji vî alî ve bi min re bibin alîkar. Hadê keçikno, bi taybet divê hûn bêjin. Madem we ewqas rastî gotin, pêwîste hûn aliyên din jî bêjin. Qet netirsin, ez xemgîn nabim. Mesele ev probakator dibêjin gelek neyêniyên min hene. Çi îdîa nakin… Hûn wisa diaxivin, lê ew çawa diaxivin rastî kîjane? Yên ku hûn dibêjin, yan jî yên ku provakator dibêjin? Ji nava we derdikevin vana. Ez dizekî çawa me heta çawa li ser keda hinekî din rûdinêm, tirsonekekî çawa me, çi dibêjin, çi nabêjin. Çima wisa dinirxînin?

***Ab.:*** Li gorî min pir zêde nikarin tiştekî binirxînin. Ya rast dixwazin pir tiştan rêz bikin, lê pir zêde aliyakî lewaz nabînin.

***---.:*** Nerîneke emperyalîzmê jî heye, gelek lêhatinên ku şayanî me dibînin hene.

***Ab.:*** Herî zêde li ser bandorgeriyê disekinin. Dibêjin; “*mejiyên mirovan wisa dişo”* û bi vê jî hêza bandorgeriyê îfade dikin.

***---.:*** Raste, divê ku rêgeza pir bandorkirinê jî bê gotin. Hêzeke min a pir mezin a bandorkirinê heye.

***Ab.:*** Tiştên ku ji bo erênîbûnê tên gotin berevajî destgirtina wan heye.

***---.:*** Ger wisa bê gotin çiqas erênî hene weke ku ewqas neyêniyên min hene ne wisa?

***Ab.:*** Dikare wisa jî bê îfadekirin. Girêdayî şêwaza nêzîkatiya mirovane.

***---.:*** Ya rast, ev hemû taybetmendiyên ku tên gotin mirovê baş û yê xirab, mirovê bi hêz û bê hêz, mirovê xweşik û nexweşik, yê ku di bilindbûnê û nizmbûnê de dimîne ez cudabûna wan didim

diyarkirin. Li gorî min bi qasî ku raste, bi qasî raberkirina erêniyan berevajî îfadeya provakator û dijmin mijara gotinê ye. Hûn çiqas dibêjin; "*ewqas taybetmendiyên erênî hene*" dijmin jî berevajî dibêje; "*berevajî heye*" ya rast herdu jî rastin. Yên ku dibêjin neyînî hene jî divê ku mirov paşçav neke. Lê xaleke tê de dixapin, weke mirovekî ji van hemû wesfên ku hatine hejmartin serwerî bi erêniyan dayîna qezenckirina min e. Neyênî dikare bi hemû mirovan re hebe, lê ya bi min re hêza şerê mezin erêniyan di ser de digire.

***Ab.:*** Ev jî li gorî pejirandina mirovan tê guhertin Serokê min.

***---.:*** Lê ya ku bi giştî tê pejirandin ev e; ji van hemû sifatên ku hatin rêzkirin yan jî di rastiya heyî de teqez serwerî bi erêniyan daye qezenckirin. Bi min re serwerî qezenc kiriye, ji ber ku îspata wê vekîrî û di holê de ye.

***Ab.:*** Neyênî nirxandina yên ku ji me zirar dîtine heye. Di vê mijarê de yên ku zirar dîtine, ber bi erêniyê ve çûyînê ji bo xwe weke neyêniyan fêm dikin.

***---.:*** Mirovbûn ji aliyê kesekî ve ewqas di kesayetiya xwe de mezinkirin, dixwaze bila nefret yan jî rêza dijmin qezenc bike, bûyereke mezine. Aliyê erênî, aliyê mirovî ye. Ev pir vekiriye. Rêxistinbûyîn dayîna gelekî, azadiyeke wisa ji gelekî re veguhestin, hevgirtina mirovatiyê pêkanîn, bi kedê re girêdana wê çêkirin, kirina xwedî zeka û xweşikiyê, taybetmendiyên pir serdestin. Hinekî din jî bilindkirina mirovan daxwaz û keda wê awarteye. Hîn di temenekî zû de, di îsyana yekem de ji malbatê qutbûn pêkanîna min ya rast kêm-zêde van taybetmendiyan di nava xwe de dihewîne. Yanî bûyîna kurê malbatekê yê baş hinekî ji min re berevajî tê. Ji roja ku ez heme, min hewl da ku nebim kurê baş ê bavê xwe, ew kurê baş yê ku ji aliyê wî û kevneşopan ve hat ferzkirin, bi heman şêwazî kurê baş yê ku dayika min jî ferz kir girîngiyeke pir mezin ji vê re da. Di nava pîvanên kevneşop de min got ku ez ê nebim kurekî baş û nebûm jî. Heta min got dê kurên wisa jî nebin.

Hîn di temenê 10 saliya xwe de li beramberî xwe durişma ku min bilind kir ev bû; “*ez ê qet nebûma kurê baş yê ku wan dixwest.”* Min li beramberî dayika xwe jî ev got; “*ez ê qet nebim kurekî ku tu dixwazî.”* Helwestekî pir tûj bû. Dihat gotin: “*kurên herkesî ne wisa ne?* Min li beramberî vê bertek girt. Dêmekî di vir de jî derketineke mezin heye. Ya ku hîn ji wê demê ve min ji xwe re esas girtiye durişma; “*ez ê nebim kurekî wisa”* dibe gava cidî ya yekem a teşegirtinekê. Tê çawa be, ev jî çalakiya min a afirîner diyar dike. Min çima wisa kir girînge. Dîqat bikin, di derketina yekem de îsyaneke pir hostayane û encamên wê hene heta armanca wê û şêwaza wê heye, şopên pir kûr ên ku vê li ser dilê min hiştine hene: Ez bûyîna çareyê çawa ewqas tengav dikim? Ger hûn bin ne gengaze. Ya yekem hûn ê îsyaneke wisa nedin despêkirin, hûn bidin despêkirin jî hûn ê bi asanî nikaribin demjimêrekê bimeşînin, ger hûn bimeşînin jî hûn ê bişkînin û bavêjin. Hûn ê bibin kujerê bira û binêrin zilam hîn jî li ser pişta min e. Pir balkêşe ne wisa? Çiqas dişibe wê ferzkirina bira ya 10 saliyê. Ferzkirina wê demê di nava malbatê de xwe bi wî şêwazî dide der, di asta netewî de jî bi şêwazekî din xwe da der. Lê di cewher de teşbîhbûneke pir mezin razayî ye. Li beramberî vê sekna min, heta dawî hostane û bi pergale.

Ya rast bi vê rêgeza civakî ve girêdayî, her ku diçe berfirehiya mirovan digire nava xwe. Lê vana balkêşin. Ne tesadufin, ev jî taybetmendiyeke netewî ye. Birayê navîn li gorî xwe bê ku bixebite, bi qirêjî, bê ku xwedî sererastkirineke cidî be wê jiyanê bi min re parve bike. Ji bo vê tê gel min û li beramberî pêşketineke wisa hewldana min bertekeke tunde. Ji çi re dibe mal bila bibe ev berteke ku hatiye nîşandan girînge. Herî dawî wî bi xwe jî digot; “*ez ê rêbertiyeke siyasî bimeşînim.”* Niha ji sedî sed xebateke me ya ku me bi keda xwe amade kirî heye, diçe, dixwaze bifroşe. Difikire û dibêje; “*nîyazeke min a rêberiya*

*siyasî kirinê heye, gelo filan dewletê dê min bipejirîne?"* Ya rast yê din jî wisa ye, lê dema difroşe jî dê biratiyê kar bîne.

Di Kurdistanê de girêdana biratiyê, girêdana xizmatiyê; girêdana jin-mêrbûnê çi îfade dike divê ku baş bê dîtin. Bi giştî di nava girêdana malbatgeriyê de ya rast feraseta; "*Tu çi dîkî bikî, bi xweşbînî tê pêşwazî kirin"* heye. Pêwendiya eşîret, xizmatiyê, li gorî pêwendiya biratiyê ger tu bêşerefiyê jî bikî, dikare ji te re bimîne yan jî tu cezayekî giran nabînî. Tê gotin; " *mane birayê te ye?"* lê min jî digot; "*ji ber ku tu dayika min e tu çawa dikarî mafê li ser min ferzkirina hemû curên paşverûtiyan bi xwe re bibînî?* Vaye mînaka çêçikê ji bo vê min nişan dabû. Yanî bi bûyîna dayik, tasarûfeke te ya teqez li ser min nikare bibe. Lê di Kurdistanê de hem di navbera malbatê de, hem bi giştî hinekî wisa ye, li ser zarokan tasarûfeke teqez heye. Tasarûfa teqez li gorî min koletiye û bi awayekî vekirî şêwaza koletiyê ye. Zarokek têqez dê wisa bê mezinkirin, teqez dê li gorî vê kevneşopê mezin bibe, wisa jiyan bike. Bi vî rengî dê hemû jiyana zarok di vê xeta koletiyê de teşe bigire. Ev, pêşwext xwe ji mirinê re razandine.

Di wî temenî de pejirandina min ya vê, dihat wateye di serî de ji destdayîna têgeha azadiyê. Ez bawerim sedema lewaztiya we ya sereke di vir de ye. Ev rêgeza koletiyê ku hatiye ferzkirin hîn di nava malbatê de ji zarokatiyê ve we qebûl kiriye. Dîqat bikin, di pêwendiyên mirov de bawerim ew hemû sifatên ku hevalan xwestin bînin ziman ev e; ji despêkê ve ya ku jiyaneke wisa gire dide, jiyanê dilikumîne, dixwaze malbat, dixwaze hemû curên bandorgeriya kevneşopên civakî be, dixwaze hêza zextkar yan jî ya Partiyê, dixwaze bila ya dijmin be, hûn çi dibêjin bêjin, kesayetek yan jî feraseteke serwer ger xwe ferz kir di wê derê de rewşa min a bertek nîşandanê pêş dikeve. Vaye ew tempoya wî ye, înada wî, hêrsa wî, keda wî, hostatiya wî, zeka û hestyariya wî ye dibêjim; *"ev wisa nabe"* û hemûyam dixim nava hev. Ya rast ji vî şerê xwe azadkirina min jî wêdetir serhildana herî mezin ya

mirov pêk tînim. Jixwe li beramberî xwe ferzkirinên mezin ger tu hemû behremendiyên xwe raneke ser piyan, vaye ferzkirinên malbatî, nêzîkatiyên henekê xwe pêkirina gundiyan, nêzîkatiyên dewletê, li beramberî van hemûyan di wî temenî de dê çawa bikaribe li dijî derkeve û ez ê çawa li ser piyan bimînin?

Dema ku ji vî alî ve lê tê nerîn nêzîkatiya jinê jî pir balkêşe. Li gorî min hinekî vekirina vê dê sûdmend be. Di nava kevneşopan de bawerim ya herî kevneparêz, yek ji yê ku herî zêde gire dide, bi giştî malbat, bi taybet dibe şêwaza pêwendiya jinê. Yanî sedema Fatma ku ket nava hewldaneke ewqas mezin a girêdana min, ji ber sedema rêgeza koletiyê ya mezin bi civakê ve gire dide ye. Weke difikire; "*ger ez vê zincîra koletiyê bi vî zilamî ve bikim, ez ê bi kevirekî di carekê de deh çûkan bi hev re bikujim.*" Qurnaztiya jinê û qurnaztiya mêtingerî-feodal jî heye di vê nêzîkatiyê de. Di kesayetiya min de gelek tê ziman, gelek radibe ser piyan, lê ew li ser vê bê sînor, bêtirs, hesabên pîrekî dike. Yek ji hesabên sereke ku civaka me gire didin ev e; were û ji binê vê rewşê derkeve.

Ger hûn diqat bikin ez demeke dirêj ji rastiya pere û jinê dûr sekinîm. Lê min ev jî pir baş dît ku; bi jinê re pêwendiyek teqez pêwîste, divê ku bikeve dewrê. Paşê ji bo ku vê pêwendiyê bi awayekî herî balkêş û azadker bixim dewrê, min çawa têkoşîn meşand hûn dizanin. Tam jî hinekî li gorî min dibe. Bi civaka siyasî re pêwendî û asta nakokiyê ez jineke pir bilind digirim dest. Jixwe dema ku dibêjim li gorî min, ger bêm kuştin jî bikujim jî di wateya ku dê emcam wisa de be. Yek ji aliyê din ê ku ez pêşxistim jî ev e. Min xwe gire da yan jî pêwendiya ku ketim navê divê ku hinekî jî rê li ber encamên wisa veke. Lê wisa ne weke ku hûn dizanin, ji bo ku bibe macerayek jî nakevim navê. Wateyeke wê ya mezin dîrokî, civakî û siyasî heye. Piraniya xwe ger bikevin pêwendiyeke wisa, dê çi di kesayetiya beramberî xwe de bibîne? Di bingeh de ew zilamek bû, zilamekî Kurd e,

taybetmendiyên zilamê Kurd ên wisa hene, taybetmendiyên civaka Kurd ên wisa hene. Vana hemû pir baş hesab dikir.

Rewşa hêz a siyasî û madî, xwestek û asta wî diyar dike.

Hêza siyasî, hêza pere bi hemû aliyan bi xwe re ye. Ji bo vê jî bi awayekî awarte xwe bi avantaj dibîne û nerîna dewleta Tirk jî wisa bû ya rast. Li beramberî min jî dewleta Tirk xwe pir bi hêz dibîne û digot: "*Ev zilam di qefesê de yeç*" Başe çawa bû ku ez ji vê qefesê rizgar bûm? Jixwe mijara herî girîng a vê çîrokê jî ev dere. Tê gotin; "*zilamê çar çar di qefesê de*" û ev jî rast bû. Ev gotina di "*qefesê*" de ye jî di rastiya xwe de kurdîtî ye, gele, dîroka me û azadiya me ye. Dîlgirtiye û hatiye tinekirin; ji çar milan ve hatiye girêdan û hema bêje weke ku ev nerîna wan piştrast bikim min jî xwe pêşkeş kiriye. Vaye taktîkê mezin, hest, zeka êdî çawa tê binavkirin, pevçûn jî pir girînge û ya jiyanî ye, dema ku hevsengî ewqas alîgirên me ye û rastiyeke wisa heye, afirîneriya mezin, bi pêşxistina serdestiyan taktîk hem tê wateya zanîna rê li ber pêşketinên mezin vekirinê, hem jî tê wateya qetandina çembera dorpêçiyê. Divê ku di jiyana min de hûn vî şêwazî baş bibînin. Ya rast bi KT'yê jî hinekî demokratbûn hebe, heta hinekî behremendî û hêza wan a çareseriyê hebe dikarî hostane nêzîk bibe. Ger hûn rastiyê bixwazin hinekî xwestin wisa nêzîk bibin. Lê di encam de ew şêwaza xwe ya ketî ferz kir. Bêguman li beramberî vê taktîkên min ên awarte jî hene. Dema ku min dogot; "*teqez dikarim weke we jî bibim*" hertim serekî wê yanî serê azadiyê vekirî dihêlim. Dikarim wisa nebim jî. Vaye tam jî di vir de xiroşa mezin a jinê despê dike.

Xiroşa KT'yê niha mezine, di nava xiroşeke mezin de ye. Li tevgerên wan ên rojane binêrin, polîtîkayên wan bişopînin, ji ber min xiroşeke mezin jiyan dikin. Ev pir vekiriye, despêkê digotin: "*ev ne tişteke*" jixwe heta niha jî dibêjin; "*Apo ne tişteke*" lê ji aliyê din ve jî hindik maye biteqin. Heman bûyer, di pêwendiyên kesayetiyê de jî bi vî rengî bû. Di wan salan de ji hewldan û

kedên kontrolkirina KT'yê re min çawa bersiv daye û encamên vê min ji we re vegot. Vaye taktîk ev e.

Di her şerî de ev bi vî rengiye; tê pêwîstiya wê bidê, ger na tu nikarî vekirina bikî. Dema ku dibêjim şer, ez tenê qala şerên eniyê nakim, divê ku hemû şerên jiyanê ji vê bên fêmkirin. Tê serê serbixweyiyê pir vekirî bihêlî. Di cihê ku tu dibêjî ez têm girêdan de ya ku te rizgar bike ew pêwendiye. Pêwendiyeke min bi KT'yê re avakiriye ew jine. Min dizanî, serweriya KT'yê li ser wê ji sedî node, dibe ku ji sedî nod û neh be jî. Ji sedî yek jî min bi we re girt, ger duristbûna li ser serê me cihê wê hebû. Lê ez dixwazim çawa pêwendiyeke ji sedî nod û neh bikar bînim, hûn ê li hostatiya wir binêrin, ger nebe jî, ger ji hemû aliyan ve dijmin be jî dê çi sûda wê hebe? Bi qasî ku bikaribim bikar bînim ez ê kar bînim, dema wê hat jî ez ê bibiqewitînim. Mafê min ev e; ji ber ku dijmine. Nêzîkatiyeke şehane ye.

Niha min hezar û yek pêwendî bi vî rengî girt dest û ya ku ji hemû alî ve hukmê jiyanê dike şêwaza min ê pêwendiyê ye û şerekî ewqas mezine. Hesabên wê jî hebûn, ne hesabên biçûk jî. Ger bê dîqatkirin bi hemû mijarên muhafazakar ên civakê ve bi ser min de tê. Çi tiştên ku mirovekî dorpêç bike bi wan tê, bi pere tê û bi hêz tê, bi ajoyan tê. Vana hemû jî ji bo ku mirovekî dîl bigire têr dikin. Lê dê çiqas serbixwe be hesab nake. Ma bavê min jî ne wisa bû? Yanî dema ku ser min de dihat texmîn nedikir ku ez dê berxwedaniyeke wisa raber bikim. Û herî dawî ew di derbarê min de gîşt encama; "*ev ê fetih bike.*" Ez bawerim ya ku ev nirxandin pê da kirin jî şêwaza pêwendiya min a deh saliyê bû. Ger na gotina wê axaftinê ya wî bê derfet bû. Dê serkeftinên min ên piştî wê dê çawa bizanîbûya. Bi taybetî hinek xebatên ku min li dijberî wî meşandibûn hebûn. Pir girînge. Xebateke wisa ye ku, teqez xwedî hêzeke awarteye. Ji aliyê zarokekî ve hilweşandina serdestiya wî ne asane. Di nava malbatê de şev û roj ser wî de tê,

dê biqewitîne, lê tevî wê jî nikarin serbixin. Hema bêje her roj şerên wisa hebûn.

Xisûseke din heye. Dema ku herdukan di nava hev de şer dikir ez bûm hêza sêyemîn. Ger bê dîqatkirin, zarokek di rewşeke wisa de yan aliyê dayika xwe digire, yan jî bavê xwe. Min herdu jî negirt û hêza xwe ya serbixwe, helwesta xwe diyar kir. Hîn jî weke doh tê bîra min, min di wir de hêza xwe ya sêyemîn danî holê, demeke dirêj nebûm amûr û min biryareke xelet jî neda. Bûyîna xwedî hêza biryardayîna serbixwe pir girînge. Niha hûn bifikirin, kesek tê gel we, roja dûwem hûn bi pê dûvîka wê/î dikevin yan jî berevajî roja duwem hûn dibêjin; "*em dûr ketin.*" Di jiyana dê-bavê xwe ya bi şer dagirtî de; "*Yê-ya rast kî bû*" hîn jî pê difikirim. Bavê min e û li gorî rêgeza baviksalariyê diviya bû ku hema pişta bavê xwe bigirim. Bi zextê ser jinê de diçe, ez jî dikarim weke bavê xwe bimeşim yan jî bi hêz bi dayika xwe re hev bigirim û bieciqînim. Na! Min wate nedayê û dûr sekinîm. Bûm hêzekî serbixwe yê sêyemîn. Niha vana hemû di nirxandina bavê min de risteke pir girîng dibînim. Her çiqas ez nebûbim kesekî weke ew dixwaze jî, dizane ku kesekî ne binketî me jî. Heta dawî zekîbûna min dişopand û jixwe hemû mamosteyên min jî ev didîtin. Di asteke awarteke de zekiye, lê di heman demê de di nava destê kesî de jî nayê girtin. Dikarim serbixweyîya xwe biparêzim û heta niha jî wisa me. Yanî pir girêdayî me, dîqat bikin, ez kurê herî baş ê bavê xwe me, rêzdariya hemû gundiyan jî heye, mînak gundê Cibînê heta dawî rêzdare. Lê dîsa jî bi awayekî awarte serbixwe me û hertim jî vê bi girîngî diparêzim.

Ya rast divê ku ev hemû hinek tiştên girîng bi we bide fêmkirin. Derbaskirina me ya KT'yê pir girînge, li gorî min li ser vê çiqas bê rawestandin di cîh de ye. De em bêjin hilweşîna malbatê asane, hilweşandina kevneşopên civakê asane, xwe ji azweriyên we rizgarkirin jî asane, lê min KT'yê çawa derbas kiriye? Divê ku bi kûrahî li ser vê bê rawestandin. Min xefka jinê

çawa derbas kir? Dema ku eleqeya keçan ewqas bilinde, li gorî we min ev xefka jinê çawa derbas kir? Dema ku dibêjim xefka jinê, ger ez zilamekî klasîk bûma, ez dikarim li ser jinê serdestbûma, ketî bûma. Ev jî xefkeke ji bo min. Armancê wan jî jixwe ew e. Di nava nêzîkatiyan de teqez min weke zilamekî, di nava rastiya jinê û li dijî jinê dixwest bifetisîne. Ya rast li gorî min bi qasî KT'yê, -ji xwe bi hev re tên- hîn wê demê xilaskirina min kiribûn hedef. Di mijara jinê de xilaskirina min, xilaskirina şerê we yê azadiyê û mahkûmê binketinê kirine. Hûn niha hinekî dikarin xwe azad pêşkêş bikin, lê çîroka vê pir girînge, ji ber ku despêkirin di PKK' ê de ye. Bê serkeftina wê hûn nikarin pêşkevin, jixwe dikuşt. Niha li gorî min hinekî di nîqaşkirina vê de sûd heye. Ez bawerim te hinekî xwestiye bal bikişîne ser vê? Heta niha jî provakator pir zêde li ser vê disekinin.

***Ab.:*** Hema bêje xala sereke xwe dispêrinê dibe ev xal.

**---.:** Çima?

***Ab.:*** Navbera şoreş-dij şoreşê yan jî şoreşê mirov li vir dikare baştir fêm bike. Şoreş, pêwendî û asta jiyana civakî diguhere. Lê ew…

**---.:** Jixwe jinê di nava me de bijî yan jî tiştekî din heye; di nava malbatê de hatiye fetisandin û faşîzm bi xwe sipartina malbatê serdeste.

***Ab.:*** Qada sereke ya pêwendiyê jî dibe ewder.

**---.:** Çi di Kurdistanê de, çi jî di Tirkiyê de şêwaza sereke ya jiyanê malbate û di malbatê de jî pêwendî bi jinê re xwedî taybetmendiyeke zilam xilas dike ye. Bi giştî di nava civakê de, bi taybetî şêwaza pêwendiya 12'ê Îlonê pêşxist, xwe dispêre cînseltiyê û şêwaza ku herî zêde jî ber bi faşîzmê ve dibe ye. Herî dawî jî bi pêşxistina amûrên medya, ev ber bi rewşeke xirabtir anî. Ya herî girîng jî ji bo ku min dîl bigire bi awayekî objektîf malbat esas tê girtin.

Beriya 12'ê Îlonê û di 12'ê Adarê de û heta weke ku min got di pêvajoyeke wisa ya zarokatiyê de ji bo ku min bifetisîne, ji bo ku min bi pergalê ve gire bide dihat gotin; "*bibe kurê malbatê yê baş û di binê çoga wan de rûnê.*" Li beramberî vê îsyanek heye ku, dema ez bi KT'yê û burjuvaziya biçûk re jî ketim pêwendiyê jî ev bi vî rengiye. Pêwendiyên min ên bi pergala ol re, pêwendiyên bi çepê Tirkan re min vekir; dibe ku pêwîst bi zêde vekirinê nebe, ji ber ku hûn dizanin. Lê dîsa jî aliyên şayanî lêkolînkirinê hene û divê ku ev neyên paşçavkirin.

Pêwendiya dewlet, malbat, jin û rêbertiyê li gorî min pir balkêşin û ev jî yeksane bi tengaviya mezin a sala 1975'an re rû bi rû mayînê. Sala 1986'an qonaxa duweme, despêka esas di van salan de ye. Li gorî min dewletê di mesela Kurdan de malbat klasîk girt dest. Jin esas girt û bi pêwendiyeke pir baş ve kir yek û ser min de hat. Ya min jî, bi hesteke rast hinekî bi şêwazekî zekî, beriya nêzîkatiyên min ên şiyar lihevgêjbûna min û pir zêde paş-pêş tevgerîna min heye, heta carek du car ji pêwendiyê reva min heye. Lê piştre bi şiyariyeke mezin, heta bi hestyariyê dîsa dest bi têkîliyê dikim. Hem jî bi lihevgêjbûnê, lê paşê vê pêwendiyê didim rûnişkandin. Pêwendî ji bo despêkirina şerekî mezin jî dibe bingeheke sereke. Li vir çîrok heye, di dema pêş de em dikarin zêdetir li ser vê rawestin, em ranewestin jî herkes li ser radiweste.

***Ab.:*** Tê nîqaşkirin Serokê min.

***---.:*** Ya rast mesela min ne şexsiye. Meseleyeke mezin a netewî, ya dewlet û îktîdîarê, mesela azadiyê ye.

***Ab.:*** Belê Serokê min. Ya rast qada sereke ya guhertinê ye.

***---.:*** Tîpîke yanî, ji cihê herî hestyar ve bigire, di dema herî bi nakok de bigire, di pozîsyona herî saxlem de bigire, encamê ku di hezar salî de nikarî bigire di demeke kurt de bigire. Ya me dibe serdeçûyîneke aqilane ya bi vî rengî.

Di hemû deman de li hemûyan binêrin, bi rêgezeke çawa serdeçûne eşkere tê dîtin. Di navê de dewlet heye, arîstokrasî

heye, sosyalîzm heye, jin heye, Partî heye. Ji bo hemûyan ewqas xisûs hene, ez ê ji vana hemûyan re jî çareseriyê bînim. Vaye ji we re afirandina min a çiyayên Agiriyê ev e. Ez çiyayên Agirî ava dikim û berve baz didim. Jixwe ez hertim wisa me. Ger hûn jî ji xwe re çiyayên Agirî ava nekin, hûn ê pêdiviya derketin kirinê jî hîs nekin. Lê hûn ne çiyayên Agirî, kêfa we pir ji avakirina çolên Lûtê re tê. (*Dêşta Lût, li Başûrê Rojavayê Îranê goleke xwe ya deştê pir firehe, di nava mîrasa UNECO ya cîhanê de cihê xwe digire)* Serberjêr çûyînek, lê hertim ji bo ber bi jor ve hilkişînê, divê ku şêwazên we şêwazê çiyayê Agirî be. Partî wisa çiyayekî Agirî yê mezine.

Ya rast li gorî dewletê yan jî li gorî yê wî herî bi aqil, diviya bû ku ez bihatama daqurtandin. Ez wê demê yekî pir safim û gelek jî di tengaviyê de me, bi bê derfetiyan re rû bi rû me. Divê ku em vir tahlîl bikin. Xala herî hestyar û kilît evdere. Xwestin çi li min bikin? Dema ku dibêjim ji min dixwazim vê bêjim; niha hinek dibêjin; "*xwe dixe şûna gel, şûna Kurdistanê."* Niha rewşa herkesî diyare. Ger ez birevim jî hûn devjêbernadin. Ez, yanî Kurd û Kurdistane, heta sosyalîzme. Birevim jî, red jî bikim, heta bimrim jî dîsa ez ê wisa bimrim û biçim. Jixwe ez giştime rewşa dîrokekê û ev jî hatiye îspatkirin, êdî pêwîstî bi nîqaşkirina vê jî nîne. Ev, hîn wê demê wisa ye; ma dewlet jî wisa bi ser me de nayê, malbat jî wisa bi ser me de nayê? Em ê dest bi fîlmekî, yanî şerekî bikin.

Min tabloya despêkirina şer hinekî pêşkêş kiribû. Ger em hinekî din bikevin nav hûn ê fêm bikin. Pêwendî, jiyan, azadî, guhertin, veguhertin, nermbûn, tolgirtin, ewlekarî, afirînerî, rêxistingerî, ked; me ev hemû çawa di sahneyekê de di nava hev de meşandiye. Ev hemû taybetmendiyên ku me rêz kirî gengaze ku deh qatên din lê bên zêdekirin. Ez dixwazim derbasî girêka kor ya pêwendiyê bibim. Ya rast bê dîqatkirin, ez pir hesasim. Niha xala ku hema divê hûn li vir fêm bikin, hesasiyete. Ez hinekî din

jî dikarim rewşa xwe ya wê demê ji we re vebêjim. Min rewşa xwe ya temenê 10-13 salî vegot. Yanî qet nayê bîra min ku ez wisa kûrekûr girîbim. Vaye qutbûna ji gund, ji malbatê, dema ku min ew şer da, wisa xwe di nava girî de fetisandin nîne. Rojên xwe rakirina îsyan, hêrs û tolgirtineke mezin bûn. Li derûniya wê, kelecan û hêrsa wê binêrin; bi rewşa xwe ya wê demê tabî zarokî bû, lê ya niha cuda ye.

Vaye di sala 1975'an de xwe ji îsyanekê re amade dikim. Îsyaneke wisa ye ku, her çiqas em weke tê xwestin ne xwedî zanîn bin jî li pêşberî me dewlet heye û Partiyê pêwîst bike. Bifikirin yanî, li ser navê rastiya Kurdistanê, ji bo ku navê mêtîngeriyê jî negirim ser zimanê xwe bi salan disekinim û piştî ku sê deriya kilît dikim vedibêjim; ez ewqas bi qiswetim û ewqasî jî pêdiviya ewlekariyê li ber çav digirim. Di Enqeraya salên 1975'an de, hem jî dewlet pir xetere, ez ê randevuyek pir dijwar çawa biguherim? Bikevim rewşeke cuda ye, nekevimê dîsa wisa ye. Hûn wisa pêşde diçin ku, ji hinek xebatan re, bajarekî, gundekî, nava komikeke gel û hûn ewqas bê hesabin, ewqas bê qiswetin, vaye ya ku ez jê hêrs dibim, şayanî we nabînim jî ev e. Li rewşa min binêrin, bê hêzim, lê min armancek daniye pêşiya xwe. Tê li beramberî dewletekê çawa û bi çi şer bikî? Lê armanc mezine û tu nikarî devjêberdî. Teqez hatime girêdan. Ji aliyê bîrdozî ve jî ez ewqas bilind nebûme. Min çend peyv derxistine, lê ne di rewşa vana pir alî nirxandinê de me jî, biçûk nabînim asta xwe ya wê demê, lê dîsa jî qabîliyeta min sînordare. Pere û çek pir keme, qadroyên pêgiştî pir kêmin, bingeha netewî û civakî pir lewaze. Bi grûbeke biçûk ketime pê armanceke mezin. Vaye li beramberî tabloyeke wisa çar neçar bi vê pêwendiyê; yanî di bîçim de dîsa ber bi malbatê ve, dewlet, jin, sosyalîstî, partîgerî di nava gelek pêwendiyên bi vî rengî de bêrê xwe didim pêwendiyekê. Ev malbata ku diçimê dizanim.

Vê malbatê di îsyana Dêrsimê de risteke neyênî lîstiye, malbateke dijminê gele. Vê dadiqurtînim û dibêjim; "*temam"* taxa ku lê dimînin jî taxeke MÎT'ê ye û dibe ku ew bi xwe jî MÎT bin. Jixwe sîxûre, kontrol dike, sîxûr hertim di nav de ye. Niha dibe ku jin çi be? Dibêje ez sosyalîstim, lê dixwaze çi ji te bigire, dê çi bide te, ne diyare! Ya ku wateyên xwe yên wisa ecêb hene, ne yek, ne dudu, ne sisê, vaye em bêjin zeka ye, hîse, em çi jê re dibêjin bêjin, di vê mijarê de êdî tiştekî wisa derdikeve ku, hûn ê tam jî çareseriya Kurd di vir de bibînin. Ya rast jî ev e. Ger şêwaza hevbeş em tercîh nekin, em ê nikaribin girêka kor a Kurd çareser bikin. Çareseriyeke din heye. Min berê pêwendiya malbatê vekir. Ew jî çareseriyeke, lê tenê çareseriyeke dikare min heta sala 1975'an bîne. Ya ku min ber bi piştî sala 1975'an ve bîne yan jî ber bi dahûrandina PKK'ê ve bibe şoreşeke cuda ye. Di nav de dewlet heye, di navê de MÎT heye yan jî çalakiyeke min a ji aliyê desthilatdariya KT'yê ve hatiye parçekirin û di dara sêpê de ji nişkê ve bi encam bûyî heye.

Ez derbasî lidarxistina çalakiyê dibim, hem jî di holê de ne eşîretek heye, ne kabîle, ne çek, welhasil tiştek nîne, di mercên wisa de pêk tê. Di vê rewşê de tê çi himêz bike; vaye di vê xalê de rêxistineke mezin û çeka mezin a sosyalîzmê dikeve dewrê. Hesasiyeta bi min re ecêbe, ji ber ku diyardeya li pêşiya min, ne weke tu ji rêzê bigire ye, tine dike. Ez wisa berfireh û ecêb xwe perwerde dikim. Heta ku tu wisa hesasiyetê raber nekî, nebe rêxistinparêzekî wisa hemû hesaban nekî dikare bijî em binêrin. Jixwe tu bibî kole tê tine bibe, tê bi wate nebe û tê nikaribe bijî.

Niha ger bê dîqatkirin, ya rast heta vê dîrokê jî qet xwe gire nadim. Pêwendiyên min ên bi çepê Tirkan re, li ser esasê rexnekirinê ye û rastiya derdixe holê. Jixwe qutbûna wan ji malbatê di holê de ye. Ez li vir dikevim şêwazekî girêdanê êdî. Ev, berevajî hemû rêgezên min tê dîtin. Çiraveke mezine. Dê çi bîne, çi bibe, jixwe heval jî bi gumanin. Dikare bê gotin lîstokeke

mezine jî. Îhtîmalê windakirinê pir mezine, îhtîmalê qezenckirinê ji sedî yeke, yanî pir kême. Lîstoka şer a ketina nava xeteriyeke wisa yan jî tiştekî mîna fîşek di kuna derziyê re derbas kirine ye. Ez vê ji bo vê dibêjim; derfet mîna derbenda Çanakkaleyê ji we re vekirîbe jî dîsa hûn nanirxînin. Lê ez derfetên bi qasî serê derziyê hebin jî dinirxînim. Li şêwaza kesê ku xwe dayîne dîrokê, pêvajoyê, nêvengê, jiyanê û hesasiyeta vê binêrin. Ya din jî hêvî pir kême, yanî tiştekî wisa hêvî bide yan jî derfet nîne. Niha vî şêwazî hûn bi xwe binirxînin.

Taybetmendiyeke min a ketina cihê ku kes hêvî nake, ne li bendê heye. Mînak ez çawa ketim vê qada Ereban? Di her derê de dibû, lê di vê qadê de, ewqasî xebat dikarî bê kirin? Cihekî ku hêvî nade yan jî cihekî ku herkesî xeter didît. Lê me tam jî qadeke wisa dikarî bikin navendeke pêşketinê ya ku hemû kesî ber bi xwe ve radikişîne. Mînaka min a çiyayê Agirî ez bawerim tê fêmkirin. Vaye ya herî xeter Enqere bû. Ez çiyayekî mezin ê Agirî derdixim pêşberî xwe û ji bo vê derketinê hîn lingên min perwerde jî nedîtine, lê dîsa jî tê derkevî! Ev tê çi wateyê? Ger tu dixwazî bi ser cîhekî de biçî, vaye tê hedefên wisa deyne pêşiya xwe. Hûn bi xwe dibêjin; “ *Em rast û rast diçin.”* Bi rastî jî meşa ku li ser we serwere, rasteraste. Bê hedefe, yan jî bi şêwaza xwe hilavêtina masî ye. Bêguman ev şêwaz pir xetere. Jiyan vî şêwazî mahkûm dike. Divê ku êdî hûn fêm bikin ku ev di rastiya we de nabe. Hatiye îspatkirin ku ya rast şêwaza min e. Hedefeke bi qasî çiyayê Agirî mezin û dîqat bikin, ya din jî diyardeya hêviya ku vî tabloyî temam dike heye. Hêvî tê afirandin.

Mesele li hêviya jinekê binêrin, kelecaneke çawa, hest û venêrîna hestan, guman û ez vana çawa mezin dikim. Egeriyan û serdeçûna min tayîn bikin, ya din jî taktîk heye. Ger em bikaribin derfetekî binirxînin, wisa tiştên ku hûn ê qet di derbarê de nefikirin yan jî hîs nekin çi hebe ez bi vê derdixim holê. Ger tiştekî din bûya jî min ê dîsa wisa kiriba. Ji ber ku ez bi asanî

binketinê napejirînim. Bi min re çare heye, ez hertim li beramberî pirsgirêk û asêbûnan çareseriyan bi berhem tînim. Dikare cudatir be jî; lê ev bêtir çêkere û li gorî realîteya Kurdan guncawtire. KT'yê ji vê re digot; "*nebûyîn pêkanîne*" provakatorên wî jî wisa digotin. Di vê derê de bi temamî taktîkê "*nebûyînan pêkanînê*" dizanin. Wekî din jî nabe. Ya rast ger rêxistineke min a amade hebe, mîna Mahîr û Denîzan temenê min dê du meh bûya. Îbrahîm kaypakkaya jî, xwest gêrîlayên herî baş pêk bîne, lê nefes negirt. Îca ez bi qasî wan ne bibehremend jî bûm. Ya rast cesaret û behremendiyeke min bi qasî ya wan tinebû, ya min hîn cudatire. Ew sîlahşorin, çavsorin, ew bi qasî ku eşkere serî li ber dewletê rakin dirinde bûn. Lê ez kesekî pir cuda me. Pir balkêşe, cesaretê min û xeteriya dewletê hema bêje bihevre ne. Cesereta min bi qasî ku ji aliyê dewletê ve neyên fêmkirin zirave cesaretekî wisa ye û heta niha jî bi vî rengiye. Ez li dijberî emperyalîzmê jî wisa me. Cesareteke wisa raber dikim ku, hema bêje bihevre dimeşe. Nikare qut bike! Ne ew dikare cesaret qut bike, ne jî ez ê biçim serê xwe li wî dîwarî bidim. Ya wisa dawiya xwe anîne. Ya rast eyarkirineke pir zirave. Ev hemû taybetmendiyên ku serê min datînin holê ne, ger weke wan bûma ez ê jî zûde çûbûma.

Sosyalîstim, lê şêwaz û tempoya min pir cuda ye. Yan jî lêgerîna min a azadiyê, ji mînakên din teqez pir cuda ye. Li vir ji ber ku ecêbe em hinekî din pêş bixin. Ez bawerim di vê pêwendiyê de, dewletê dixwest min bikişîne nav nokeriyê. Lewaziya min, vaye yeke dewlemend yan jî li gorî pîvanên cuda yên Kurdan arîstokrat, ya din jî li gorî zilamê Kurd kesekî ku dê wisa xwe winda bike tîpekî wisa didîtin. Mantiqê dewletê bi şêweya; "*Me hilanî-danî, ev pêwendî dê vî zilamî daqurtîne*" de bû.

***Ab.:*** Dibe Serokê min. Di wê demê de jixwe nirxandin hebû. Kesayetiyeke wisa ya ku dixwaze hinek tiştan bike mijara gotinê ye.

**---.:** Ew tespît heye. Wisa difikirîn; “*çepgire, Kurde û dixwaze bi lez bilind bibe, lê rebenê xwedê ye, hejare.”* Ez bawerim malbat bi pîlan tê ferzkirin. Bi temamî dibe ku bi pîlan be; feraseta Kurdistanê, di Enqerê de bi cîhkirina wê, di nava demeke diyar de amadekirina jinê dibe ku ji hemû aliyan ve bi pîlan be.

***Ab.:*** Raste. digot; “*karê ku ti jinê cesaret nedikir bike, min kir.”*

**---.:** Bi rastî? Çiye ya ku ti jin nikarin cesaret bikin?

***Ab.:*** Pêwendiyê wisa pênase dike û di vir de dide diyarkirin ku ji despêkê ve amadekariyên wê hene. Yanî tişteke ne bi xwesteka wê pêş dikeve, ya rast di encama bandorên pir cuda de peywireke jêre hatiye dayîne. Bi taybet di pozîsyona wê malbatê de,

**---.:** Carekê xwesteka wê bi xwe nîne. Pir baş hatiye amadekirin, wê dide diyarkirin ne wisa? Raste, taybetmendiyên wê yên ku ti jin, jinên sîxûr nikarin cesaret bikin hene.

Em dizanin ku MÎT gelek jinan dixebitîne. Em dizanin bêtir kîjan aliyê jinan bikar tînin. Hîn zêdetir zilam ji aliyê zayendî ve bandor dikin. Ev alî li pêşe. Yanî taybetmendiyên zayendî di bandorkirina zilaman de yan jî di bikaranîna pêwendiyekê de dinirxînin. Ev ya ku tê dîtine û raste jî. Dema ku tê gotin bîçima ku ti jin nikarin bikevinê ketina wê bîçimê, ez ne bawerim jineke din wisa bibe. Çawa dikare bê îfadekirin? Em vê jinê, asta vê jinê, kesayetiya wê çawa tahlîl bikin? Min tesbîtek kir, ji bo min ew girînge û wateya xwe ya esasî jî dibîne. Jin di ferqa mezinbûna pêwendiyê de ye. Dewleteke heta dawî mezin û Kurdîniyeke hatiye tinekirine. Weke malbat jî di tinekirinê de rewşeke pir baş tê de rist lîstine. Teqez bi min re bilindbûneke nû heye. Pir nezane, ecemî û bê rêxistin be jî, pir belengaz jî bê dîtin, teqez niyazeke wê ya derketinê heye.

***Ab.:*** Merc û dem jî guncawin.

***---.:*** Belê, merc û dem guncawe. Ya din jî asta min di salên 1975'an, 1976'an de êdî asteke ji bo dewletê girîngî dide îfadekirine û vaye ew di wê demê de tê amadekirin.

Kesê ku tê amadekirin divê çawa be? Carekê divê baş bê perwerdekirin, nêzîkatî bi taybet bên pêşxistin, divê pir jî bi pîlan be. Dema ku min digire, dikişîne hedefa xwe çiye? Binêrin salên piştre Kor Cemal ev digot; "*Fatma li ser hemû Kurdistanê dilîze, ez li ser Botanê dilîzim.*" Nizanim ji bo hevalên din jî digot; "*li ser begîtiya Erûhê dilîze.*" Lê tesbîteke ji hemû aliyan ve li ser min tê lîstin û eşkereye ku di nava xebateke hemû Kurdistanê digire berfirehiya xwe de ye.

***Ab.:*** Raste Serokê min, ev nêzîkatiya wê ji naskirinê re guncawin.

***---.:*** Dewletê ev malbat di navbera salên 1925-40'î de ji bo hemû Kurdistanê weke modelekê pêk tîne û li ser Kurdistanê ferz dike. Kurdistanê desteser dike, bidest dixe; pêwendiya Kurdan, desthilatdariya siyasî, civakî ya Kurdistanê, pêwendiya Kurdan, desthilatdariya Kurdistanê bi vê modelê ji hemû aliyan ve bidest dixe. Ev malbateke, lê em gelemperî bikin -jixwe gelemperkirine- ev jî yeksane desthilatdariya KT'yê. Dewlet di zanebûna vê de ye, îsyaneke Kurd serî radike û hema vê malbatê dixin dewrê. Dîsa pêwendiyeke tesaduf bigihêjin hev yan jî pêşketina asayî ya Enqerê, pêşketina şoreşgerî, lihevdana Kemalîst û di wê nêvengê de hevdîtin pêk tê.

***Ab.:*** Ewlehiyeke teqez neyê dayîn ketina nava pêvajoyeke wisa nayê fikirîn.

***---.:*** Jinê ez du-sê salan çavdêrî kirim. Di vê pêvajoyê de asta min a hestan, kapasîte, hêza min pîva, li ber çav derbas kir. Eşkereye ku dê despêkê helwest nebîne. Kar cîdî bûn. Me grûb ferz kir, êdî me xeterî ava kir. Vaye em li vir bi nêzîkatiya mantiqê kevneşop ê dewletê re rû bi rû tên. Bi rastî jî kîbe texmîn

nake. Dê çawa bizanîbana ku ez ê bibim kesekî pir cuda? Di wê demê de çawa texmîn bikirana ku ez ê neşibim tu kurdekî?

***Ab.:*** Nedihat zanîn Serokê min.

***---.:*** Ne gengaz bû.

***Ab.:*** Teqez ev berê lêkolînkirine.

***---.:*** Heta niha jî lêkolînên wan ên mezin ji ber nezîkatiya nebes a ku ketine navê ye. Uxur Mûmcû, Cuneyt Arcayûrek û yên weke van niha hemû şêwirmendê dewletê ne. Ew jî taxima nivîskarin û dibin zanistvan. Çima ji ber ku baş fêm nekirine hevdû tawanbar dikin û hesab ji hev dixwazin. Ev pir girînge. Çima dewletê ez fêm nekirim? Malbata ku ferzkirin, di Kurdistanê de bûye malbata herî baş dadiqurtîne. Jin dîsa di vê mijarê de ya herî bi aqile. Tiştên ku bavê wê ji sala 1920'an heta 1940'î kiriye, ew jî di salên 1970'an heta 1980'yan çil qat zêdetir dikarî bike, jixwe îdîa wê jî ev e. Li pişta wê dewleteke serwer bûyî heye. Weke kes jî ew bi xwe pir hatiye perwerdekirin. Li pişta min jî îsyanek nîne, ez ne xwedî tiştekî me. Ne Seyîd Riza me, mesele tiştekî min nîne. Ez jî mêrxasim.

***Ab.:*** Yanî teqez hemû merc dijberin.

***---.:*** Teqez wisa ye. Ya din jî heta dawî helwestê girêdanê nîşan didim. Jixwe Pîlot ji aliyê pereyan ve digot; "*çar bi çar min girêdaye.*" Îca hêzên min ên veşartî nebûn. Pere, pêwendî vana hemû wisa ne, her aliyê min hatiye girtin. Hemû pêwendiyên min ji aliyekî ve hêza wan e û îhtîmaleke mezin li bendê bûn ku min di nava vê pêwendiyê de daqurtînin. Jin di vê mijarê de bandorkere, pere û jiyana Enqerê jî bi bandore. Lê wisa ne ji nişkê ve bi demê re di nava van hemû qadên bandorên pêwendiyê de li bendêne ku ez bêm daqirtandin. Wê vê jî di serî de bi hêza jinê û bandora derdora wê ya nêzîk bikin. Teslîm Tore hîn jî jiyan dike, wê demê digot; "*xwişkê benê vî saxlem bigire.*" Benê min di destê wan de ye, jixwe min jî ev hewa dabû. Niha taktîk di vir de

ye; encamên arasteya herikîna dewleta Tirk diguhere diafirîne, ev teqeze.

***Ab.:*** Serokê min, di wir de nêvengeke şoreşger heye. Potansiyel pêş dikeve, yanî vîna kesan serbixwe pêş dikeve.

***---.:*** Belê potansiyela Kurdan pêş dikeve.

***Ab.:*** Dixwazin pêşiya wê bigirin.

***---.:*** Ya din jî Rêbertiya Kurdan heye. Ez bi îdîaya vê me, li gorî wan ya herî mezin digire jî yê herî macerapereste.

***Ab.:*** Ji ber vê dixwazin bixin bin venêrînê.

***---.:*** Li gorî wan amûrekî ji min baştir nayê dîtin. Yanî di nava tevgerên çepgirên Tirkiyê û Kurdistanê de di salên 1970'yan de berendamê herî berçav ê Rêbertiyê, lê di heman demê de rewşa herî baş bê karanîn jî de ye. Yan jî vaye bi qenala malbatê dubare hem yekî xwe bispêre çep, hem jî kurdîtiyê; encamê ku giştinê teqez wisa ye. Ya rast behremendiya jinê di vir de ye. Ew xwînsariya wê ya mezin, xiroşa wê ya mezin, xiroş û ceseretekî wê ya mezin ku ti jinên din nikaribin bikevin navê heye. Wê heta kenkî bikaribe min di vê rewşê de bigire? Di vê xalê de em tên xala herî siyasî ya vî karî. Ji min bi hêztire, di dîmen de min kontrol dike, lê hîn jî tatmîn nabe. Ji bo tam kontrol bike çi pêwîste? Di vê xalê de divê ku ez weke Kurdekî kevneşop tevbigerim.

***Ab.:*** Jixwe dixwaze tam jî ber bi wir ve bikşîne.

***---.:*** Ji ber ku hemû PKK'yî dadiqurtand. Ez baş dizanim, heta sala 1986'an li derdora min nêzîkatiya xwe domand. Navend jî di navê de. Min pişta xwe didayê wê navend digirt bin kontrolê. Çiqas bandora min sînordar dikir hûn nikarin texmîn jî bikin. Sînordar kir û berevajî kir. Divê ku biçûk neyê dîtin.

***Ab.:*** Pir jî tengav kir.

***---.:*** Binêre tu bi xwe dibêjî. Pir tengav kir ne wisa?

***Ab.:*** Tam şerek dimeşand.

**---.:** Bi fikra ku hevalê li çiya bikaribin bixin bin venêrînê de min şand çiyê û piştî ku çû sê-çar jin qetil kirin, çend jin jî girtin gel xwe û bi wan keçikan xwest hevalên min ên milîtanî herî hêja ji rê derxe. Her yek ji wan xwest ji bo milîtanekî eyar bike û felc kir. Ez bawerim wê we hemû wisa bikişanda. Pir balkêşe! Ez wê qaşo ji bo bê bandor bikim dişînim, lê ew çû hemû hêza şer bê bandor kir. Piştre dema ku min dît ne weke ku ez difikirime, dubare min kişand gel xwe. Dema ku me girt vir, herî dawî heta pîlankirina komplo jî çû. Îdîaya xwe jî pir mezine. Çend keçên ku em dixwazin pêş bixin jî di bin konrtolê de ne. Ger bipejirînin dê wan jî bikar bîne. Li gel min, weke ku min got hem di asta navendî de, hem jî di nava karê rojane de çend hevalên ku bi min re dibûn alîkar hene. Bi şêwazekî ne asayî ew jî girtine bin venêrîna xwe. Kêm lê cewherî kar dikin. Li vir tam hostayeke li kîderê wê çawa lê bide pir baş dizane. Ez çawa ji pêwendiyên krîtîk dizanim ketinê bikim, ew jî ewqas hosta ye û ser jî dixe. Dixwaze bi girtina pêşberî xwe û tahrîk kirinê dixe, dixwaze bi xwe ve gire dide. Ji bo ku me bixe bin venêrînê sê çar kes jî têrê dike.

Semîr û Şener, tên zanîn, di navbera xwe de kongreya 2. Parvekiribûn. Jixwe di civîna me ya 1. a damezrandinê û şûn ve çi bûn em dizanin. Ji despêkê ve dixwaze bîne ber fetisandinê û dibêje; "*ez ê nehêlim konreya sêyemîn vekin*" armanc; wê kongreya 3. li gorî xwe bigire û îlan jî bike. Hema bêje rewşeke dişibe şêwaza ku Çurukkaya û Ersever nivîsiye. Yanî, ez li gorî wî kesekî çawa me; li gorî wî diviya bû zûde teqîbûma. Nîqaşeke min a di vê çarçovê de; "*bi vê nêzîkatiyê dawiyeke metirsîdar li benda te ye, hewl ne de û min neşibîne filan û bêvanî*" wisa min pêre kir. Min jê re got; "*şiyariyeke min a hevaltiyê ji te re heye.* Lê wê li gorî xwe ser de bihata. Tabî ez jî bê rêbaz kar nakim, wisa radest jî nabim; ew jî vê ferq dike. Teqez di vir de rewşeke hestê jî heye. Ez vê qanûnê jî bîr bînim, qanûna evînê yan jî em

bêjin azweriya azadiyê, di navê de neketine mal-mulk, berjewendiya; “*tu ewqas malê min, mulkê min e”* feraseteke wisa teqez nîne. Min nêzîkatiyên pergala serdest ku bi xwe ve gire dide jî derbas kirine. Di vê xalê de hestyarbûna min vekiriye.

Em bi rêgeza azadiyê ve girêdayî dimînin, rê li pêşiya mal-mulk kirinê digirin û li dijberî ne. Lê li gorî vê kesê, madem pêwendiyeke taybete, hesabê mal-mulk pêwîste. Yan li gorî wê hesab kiriye, yan jî miratxware. Jixwe bi şêwazekî awarte kar tîne. Tê zanîn, di Kurdan de feraseta pêwendiya taybet diyare, di çavên hevalê me de jî diyare. Deme ku tê gotin pêwendiya taybet, di şêwaza malbata klasîk de, vaye mafê mîratê, kevneşop hene, tore heye, hiqûq û siyaseta vê heye. Divê ku mirov hêza kes jî li ber çav bigire. Ya rast pêwendî gire didin. Di cewherê kar de di navbera şoreşgeran de şêwazekî ku divê serwer bibe heye. Ez ê jî wê di welidîna yekem de derketinê çawa pêk bînim? Êdî pêwendî ji çi re pêwîste divê ku we fêm kiribe. Pêwendiyeke dewletê ye û didê kontrolkirin, serbest neyê berdan. Dewletê jî ez girtime û wisa dizane ku ji aliyê min ê lewaz ve ez girtime. Lê min jî girtiye. Min jî di kesayetiya jinekê de ji xeleka nokeriya Kurd ve girtiye. Çiqas bi zanebûne, li gorî min zêde ne girînge; baş girtiye. Girtineke pir girînge. Weke ku min got, mîna Mahîr û Denîzan nikarîbûm ser de biçim. Lê bi şêwaza vê pêwendiyê, şêwaza ku dewlet pêwîst dike, di dîroka Kurdistanê de ji Îdrîsê Bîdlîsî heta îsyana dawî, vaye bi xwe sipartina nokeran, “*çawa ku dibêje min girtiye bin venerînê”* ez jî tam di vê xalê de dibêjim; “*rêbazê ku te kar anîye, ez ê jî heman rêbazî li beramberî te kar bînim.”* Dîsa civak bi rêya jin û malbatê dîl girtiye; ez jî malbat û jinê bi wê digirim û dibêjim; “*ez ê te çareser bikim”* hestên min ewqas vekirî û teqez hene. Li rewşa pêwendiyê binêrin. Ya din jî şêwaza xwe ya destgirtina pêwendiyan lêkolîn bikin, bi ya min re qiyas bikin. Neçariya fikirîna bi asta mirovî jî heye. Hestyarbûyîn xwezayî ye, lê çawa pêşketiye û hatiye karanîn girînge.

Me di jinê de ev meyl tesbît kir; weke çekekê çiqas dikare wate û nirx îfade bike, çiqas dikare li gorî armancê bê karanîn, ez li vana dinêrim û dixwazim xwe tevlî bikim. Ev tenê ne ji bo min, li gorî xwe ji bo hemû Partiyê hesabê wan heye û li gorî vê bi serde tên. Ev feraset bi Terzî Cemal re jî hebû. Ji Mahîr re ev gotibû; "*tê nikaribe qirtikekê jî ji min bigire, ne ji bo PKK'ê ne ji bo guneybati, ez ê ewqas xwe nedim şixulandin.*" Bele, wisa gotibû. Ji bo PKK'ê, ji bo rêxistina me gotineke watedare. Ev heman waneya wi ye. Ji bo PKK û Kurdistanê, ji bo min dibêje; "*ez ê bi qasî mîlîmekê nedim şixulandin.*" Ew jî dizane ku em dixwazin bişixulînin, ew jî berevajî helwesta; "*ez ê te daqurtînim*" raber dike. Ez jî rabûme û di kesayetiya wî de dibêjim ez ê KT'yê bikar bînim. Eşkereye ku dê ev şer mezin be. Yek ji we sîxûr be jî, keç ango kurekî bifikirin, di pêwendiyan de dikare asteke mirovî ya asan bijî? Lê ev ewqas bi rêgeza xwe ve girêdayî ye ku, tam jî rêgezeke dewletê ye. Ger hûn dixwazin bibin mirovên baş girêdayî peywirê, ji dewleta xwe, peywira xwe, li beramberî armancê divê ku tu hemû karê rêbertiyê bikî. Û peywir jî, li ser Rêbertiya Kurdistanê çîna serdest a noker ferzkirine. Û ewqas bê aman jî bi peywira xwe ve girêdayî ye, ne karê mirovekî asayî ye jî. Li gorî min divê sîxûrek jî bikaribe bêje; "*tu bi xêr hatî, çawa yî?*" ev dibe rêgezek? Yan jî tiştekî ez didim têkoşînê ye. Ji ber ku ez didim hîskirin ku ez ewqas bi pîlan, bi armancê ve girêdayî, ewqas jî bi asanî xwe nedim xwarin ku, ev jî vediguhere dijberhevdanekê. Xala ku Kemal Pîr wan dibêjin; "*em bikujin*" jî vaye evdere. Ew pir zêde bi armancên xwe ve girêdayî ye, lê misoger em jî girêdayîne.

Ya min tabî ku şêwaza gelekî ye, yanî ez heta dawî xwedî şêwazekî mirovî, zindî, rizgarîxwaz, rêxistinkirî û di binê xizmeta rêxistinê de me. Ya wê jî heta pileya dawî ji dervî gel û rêxistinê, ji dervî nêzîkatiyên mirovî, mîna cemedê; ji xwe pênaseya "*Mar*" ji vir derket. Hevalên navendî dihatin malê, wê weke jina malê ji

wan re nedigot hûn bi xêr hatin jî, çayeke amade jî nedida. Wisa nêzîkatiyeke wê ya herî ji rêzê jî nebû. Cemidî, heta pileya dawî har, di rewşeke ji xwe nedîtinê hebe jî, ez çiqas ketim bin bandora wê? Weke termometreyeke ecêb bû, yanî çawa di hewayê de pileya germahiyê dikeve ew jî wisa. Hewa çiqas li aliyê wê be ew jî ewqas eleqedare. Hestyariyeke metirsîdar bû. Ji bo vir jî derbasdare. Nêzîkatiyên wê li gorî vê ne. Çiqas bikeve bin bandora wê ewqas ji dile û heta girêdana kuştinê. Lê min ew neguhert. Ji bo ku hûn hewldana min a mezin ji bo guhertinê bibînin min bala we kişand. Ez hêza xwe ya guhertina awarte ferz dikim. Lê ew jî ji bo neguhere, veneguhere di vê xalê de di nava berxwedaniyeke dijber de ye. Were îca dewleta Tirk bike dewleteke demokrat yan jî kesatiya faşîst a Tirkan bike sosyalîst. Ev tam kesateyiyeke wisa ye. Bifikirin, kesayetiyeke wisa rojane hemû curê pevçûnan dimeşîne. Rêgeza, ji ber ku pêwîstiya vê pêwendiyê hinekî be jî nîşanî min daye ez zêde şer nameşînim. Ji ber ku di wê qonaxê de pêdiviya vê pêwendiyê dibînim. Rêgez vê pêwîst dike.

Divê ku şoreşger bi çi ve girêdayî û çawa bijîn?

Hestên min jî hene, ajoyên min jî. Ger hûn bin hûn ê di kêliyê de biteqin, hûn ê bêjin; "*rabe vî bike, wisa bike*" çil curê şer derxin. Rêberekim, heta dawî bi bandorim û tevî vê jî min wisa nekir. Di Kurdistanê de wê demê kesayatiyekî rê li ber bandoreke mezin vedikime, di heman demê de otoriteyekim, lê ya ji aliyê zilamê herî serjinik ve neyê kirin ve ji binî ve digirim û xwe wisa dayîna diyarkirinê dipejirînim. Vaye rêgeza nermbûnê ev e, gelo hûn wate didinê? Tenê ne li dijberî vir, li beramberî pir hêzan, pêwendî û kesayetan ewqas nermim.

Dibêjin ku di sala 1977'an de axaftineke Talabanî heye; "*ev bagerekî, cuda ye, ji bo em ji holê rakin werin tevdîran bigirin*" nirxandineke wisa kiriye. Ez ewqas nermim ku qadroyê wî yê herî jêhatî jî li beramberî wî nikare wisa be. Tam 17 sale di vê

nermbûnê de dibim, lê baş dizanim ku dê bager kengî û çawa bişewitîne, ji holê rake. Jiyana min hertim di xeteke wiha de pêş ket. Hûn difikirin ku we bi qasî min têkoşîn kiriye? Na! Biraderê me çû, hema bêje bû xulamê wî. Gelek hevalên me li wirin, ger em kontrol nekin kî dizane dê bikevin çi rewşê? Lihevkirineke pir xirab, nermbûneke neyênî yan jî ji nişkêve li dijberî derketina ferasetên; "*ger di himêzê jî de bim ez ê wisa dijberî derkevim*" hene. Di navendên me yên herî mezin de jî bêterbiyetî û apolîtîkbûnên wisa mezin hene. Mantiqê pêwendiya li ser we hemûyan serwere ev e. Hûn bi qasî min nikarin wate bidin vê. Lê ez li dijberê vê nermbûnê derketim.

Niha gelek pêwendiyên bi vî rengî hene. Ez vê ji bo vê dibêjim; hûn ê niha bikevin têkoşînê, jibîrnekin ku berteka we ya herî biçûk çêdibe û hûn perçe perçe dikin. Nermbûnek, pêwendiyek çiqas pêwsîte, çiqas dikare bê karanîn, qet hesabê we yê wisa nînin. Jixwe ji bo vê hûn nikarin bibin rêxistingerên baş. Hûn her roj diçewsînin, yan jî lihev dikin. Di navê de hemû curê derewa heye, hemû curê tinekirinê heye. Di rewşa tinebûnê de ye, lê ne di xema we de ye, israra we nîne. Ger hûn naxwazin fêm bikin hesab nîne. Dema ku bi şêwaza min, şêwaza destgirtina min re hat qiyaskirin ferq wê vekirî bê dîtin.

Herî dawî di destê jinê de çeka cînseltî heye, dê çawa bi kar bîne? Hûn dizanin cînseltî pêdiviyeke difikire, "*dê rojekê ev zilam bixwaze vê binirxîne*" wisa difikire û xwe li gorî wê amade kiriye. Teqez dê ev bikira sedema şer jî. Bi şerê siyasî-rêxistinî nikare min bin bixe, bêrêzî dike û bi hemû curê neyêniyan hewl dide rêxistinê belav bike. Ez dîsa jî pir nermim. Niha serî rakirineke ajoyan yan tê bêjî; "*ya pîrek, wisa wisa*" şer derxî û ev jî dibe şerê Kurd! Jixwe ev mijar diyare. Kemal Pîr ji rojên despêkê ve digot; "*ev bi ti awayî nayê pejirandin.*" Jin li gorî xwe hilweşînere, di nava hesabên xirabkariyê de ye. Li gorî min seha ku mantiqê dewletê pêş xist, seha ku mantiqê 12'ê Îlonê pêş xist

bi vê mijarê re eleqedare; difikirin ku dê civakê di vir de bixin. Hemû çepgir wisa hatin xistin.

***Ab.:*** Jixwe di vê mijarê de lêkolînan dikin.

***---.:*** Emperyalîzm di asta cîhanê de vê pêş dixe û di Tirkiyê de jî edaptasyoneke basît mijara gotinê ye. Vê jî di serî de li ser min û her ku diçe dixwazin li ser PKK'ê pêk bînin. Li ser civaka Tirkiyê û Kurdistanê pêk anîne. Ji Mêrdînê, Pirsûs, Amedê çi derketin tê zanîn. Bi hinek pêwendiyên xwe yên venêrînê tijî kirine. Hûn dizanin di vir de ya girîng teqez xwesteka ber bi provakasyonê ve kişandinê ye. Min ber bi şer û mirinê ve dikişîne, ev teqeze. Ya rastî divê rê lê bê girtin. Ev pir girînge, bawerim ger bimre Partiyê darbeyeke mezin bixwe. Em şer bikin, berê xwe bidin çalekiyeke kuştinê, dibe ku rê li ber neyêniyên pir mezin veke. Ya rast dixwestin bi çalakiyek min, min bikujin. Ji bo vê tahrîk, hakaret, tiştên dikarî bike hemû dikirin. Bi jahrkirinekê nekarî min bikuje? Li gorî min ev li hesabê wan nehat. Ya rastî ji bo ku mirina min pêk bînin bi asanî dikarîn vê biceribînin. Ji serê kêliya carekê digot; "*ne tirse em ê te jahrî nekin."* Ev gotin ne yekser ji devê wan derdiket. Wisa difikirîn mirina min bi şêwazekî guman yanî bi rêbazekî wisa divê pêk were. Ji ber ku li gorî hesab û pîlanên wan diviya bû ez bêm bikaranîn, bi xwe sipartina min fetihkirina PKK'ê pêk were; ger vê wisa ji rêzê bikin dê hesabên wan jî vala derketana.

Yek ji armancên din ên dewletê; dayîna jiyankirina min û girêdana min bû. Bi vê ve girêdayî jî potansiyela Kurdan a piştî 1970'ê yan bi sipartina kesayetiya min û karanîna vê bû.

***Ab.:*** Nêzîkatiya wan ev e.

***---.:*** Hesabên wan ên weke Îdrîsê-Bîdlîsî kirinê hene. Aliyê dijber di îdîaya rêxistin û rêbertiyê de ye. Nikare min bikuje jî, ya rast ger bixwaze dikare hema min bikuje, ez vê derfetê çawa ji dest digirim? Yek ji encamên ku hûn jê derxin jî di vê derê de ye. Ez çiqas dibêjim; "*ev pêwîste"* ew jî dibêje; " *ewqas ji me re*

*pêwîste."* Heta kêliya dawî jî min xwe ji vê çavdêriyê dayînê paş de neda. Vana quralên şerin. Binêrin, ger hûn bûna dê qet ne di xema we jî de ba. Divê ku ev hêvî bê dayîn, ji ber ku heta tu xwe digire saxlemiyê dijmin bi van rêbazan vala derxistin girînge. Lê hûn çiyayekî mezin jî çawa bikar tînin diyare.

Ez di sala 1986'an de teqez di rewşeke serwer de me, ji qadên bandora KT'yê pir dûrim; bi asanî nikare min bi xwe ve girêde, min hemû tevdirên xwe girtine, lê ne diyare, îhtîmal ji sedî yek be jî, dîsa roja herî dawî dibe ku tiştin bên guhertin û ser me de bên. Ji ber vê sedemê heta dema dawî ya ku ez ê bişînim jî min çavdêriya; "*teqez ev ne hevdîtina dawiye"* neda û çavdêriya "*tu dikarî min kar bînî"* hişt. Ev ewlekariyeke. Di hemû pêwendiyên xwe de wisa me. Nebêjin ev tenê hostatiyeke pêwendiyê ye û divê hûn derbas nebin. Divê ku hûn hinekî din jî kûrahiyê bigirin. Ez dewletan jî, bi hezaran kes jî bi vî rengî dimeşînim. Hûn ewqas paşketî mane ku, fêm nakin. Ya rast vana hemû neyênî ne; ger vana bikevin destê CIA, ji ber we dibe ku mîna bela li min vegere yan jî bikeve destê MÎT'ê, dikare veguhere polîtîkayeke dijber. Ji ber vê pêwîste ev axaftin sînordar werin teysandin. Veşartîbûn hinekî jî wisa ye. Ez di nava Partiyê de veşirtîbûnê pêk tînim û dê hertim jî asteke min a veşartîbûnê hebe, lê ev ê pir xwezayî be, weke ku hûn dizanin jî ne veşartîbûneke. Ya rast ez ji tu kesî tiştekî venaşêrim, lê di heman demê de bi şêwazekî awarte jî veşartîme. Ya ku li vir tê pêkanîn yek jî ev e.

Herî dawî ez vê gav bi gav ji Enqerê ber bi Amedê ve -tenê ne ji aliyê cîh ve- dişemitînim, grûbê diparêzim, Partiyê didim îlankirin, bingeha wê davêjim, dîsa dikişînim. Dizane ku axa li bin linge wê dişemite û har dibe. Hîn ji roja despêkê ve xwe nedana min a şer bawerim tê fêmkirin. Asta min a hestan a roja yekem jî awarte bû. Enqere pir cuda bû, lê dîsa jî hestên min hebûn, înkar nakim. Lê ji aliyên din ve alternatîf pêş dixim. Weke ku di şêwaza PKK'ê de min pêwendiyeke saxlem pêş xist, hêdî

hêdî alternatîfa jinê jî derdixim holê. Ew jî bi kişandin û girêdana min a nêvengeke malbatê, qaşo tam jî di vê xalê de dê min bixe rewşeke berevajî welat dikeve. Ji bo fetisandina hewldana mezin a welat hema bêje dixwaze min bike pêlîstok û ev jî ne asane, mîna gurekê ye. Lê dizanim ku, ger em hinekî jina alternatîf derxînin holê dê pîlan û lîstokên wê jî xira bibin. Ev jî şerekî mezine û bi taybet bilind dikim. Pir vekiriye, "*yan tê were azadiyê, yan werî*" tiştekî awarte ye ev. Bikaranîna Tansû ya vê durişmê heye, "*ya wê xilas bibin, yan xilas bibin*" bi vî şêwaziye. Min jî ev li beramberî vê kesateyê pêş xistiye, weke ku ketime ruhê Tansû.

Şêwaza min di vê durişmê de îfada xwe dibîne, "*yan tê were azadiyê, yana were*" Niha ev jî li gorî xwe vê durişmê pêk tînin û ecêb bikar tînin. Tabî ez vebijêrkeke din ji wan re nahêlim. Lê ew jî dibêje, "*yan tê werî, yan were*" îstîkameta hatina wê û îstîkameta hatina min ji hemû aliyan ve beravajî heve. Tabî ez têkoşerekî hîn hosta me. Rêgeza min a azadiyê heye. Pir jî bi tevdîrim. Carekê bifikirin, min çima derketin kir? Dema ku derketim çima ewqas hestyarim. Ewqas îhtiyat, tevdîr, însiyatîf ji bo çi bû? Qaşo hestên we jî hene. Binêrin, bi vî rengî hesta tolgirtinê jî karîger dikim. Jin çima wisa li min dike? Vê pirs dikim û şer bilind dikim, bi vî rengî xwe digihînim feraseta jina azad. Ev hem dibe alternatîfek, hem jî dibe tolgirtinek.

Kemal Pîr hevalekî mêrxase "*alçax me ev li te kir, te ev heq kir*" bi vî şiklî nêzîkî pirsgirêkan dibû. Şêwaza min pir cuda ye. Ya rast Kemal Pîr pir girêdayî ye û fedakare, lê tenê bi vê tiştek nayê rizgarkirin, dê rêxistin xilas bibe. Çend milîtanên me yên wisa bi polîs re bikevin nava pevçûnê hene. Li beramberî dijminê me bê aman dagirtîne û mêrxasin. Mêrxasên wê demê ne. Lê ew dixwaze tolgirtineke cuda pêş bixe. Jin, bi vî rengî dixwaze rêxistinê bisekinîne, herîkîn, û tevgerînê rawestîne. Vaye di cihekî de dê armancên me bifetisîne. Tabî hêza wê jî heye, jineke. Tu

nikarî bêjî: “*dev jê ber de, biteqîne”* hêzeke wê heye. Yek ji aliyên herî bi hêz ê siyasetmedarekî jî, baş naskirina rakîbê xwe ye. Hêza wê tam nizanim, lê xwe neçar hîs dikim ku liberçav bigirim, dîqat bikim. Bi gelek aliyan ve dibînim ku ne yek bi çend kulman bê qulipandine. Lê dibê ez vala jî nesekinim.

Niha hûn bi qasî min îsyangerin? Min îsyana xwe nîşanî we da, bi kîn û hêrsa xwe ve ez îsyangerekim. Ew jî dizane û ez çawa nateqim? KT’yê gotiye; “*Wê rojekê li ser vir de jî biteqe.”* Hîn doh Serokê Serkanê giştî yê artêşê digot; “*ya din ger di demê pêş berê xwe bide cîrana.”* Serkanê giştî çima vê gotinê dibêje? Ew min nas dikin, lêkolîn kirine. Ez ê berê xwe dibim wan, yan na; ew meseleyeke cuda ye, lê ji ezmûnên xwe vê dizanin. Van pêwendiyan dizanin. Min berê xwe neda wab. Şêwazê min e. Min serbest berda. Lê min berê xwe da çi; hêza rêxistinê, hest û hêza jinê. Wateya vê pir mezine, ji ber ku rêxistina KT’yê ava kiriye, malbat, jin û hemû tiştên ku afirandiye bi vî şêweyî mirin. Min di vê pêwendiyê de kuşt, hem jî min zanî derfetên wan bi hostane kar bînim û bi hemû tiştên xwe ve. Lê li beramberî vê jî fedakariyeke mezin pêwîste. Şêwazên pêwendiyên kevneperest hene, tê ji wan fedakarî bike; nêzîkbûnên zilamê kevneşop hene wê jî ji wan jî fedekarî bikî, quralên exlaqî yên kevneşop hene wê tu ji wan jî fedekarî bikî; vana hemû sebrê dixwazin û ji bo sebrê jî fedakarî pêwîste. Bi vê ve girêdayî ya herî girîng jî tê serde biçe. Bi şêwaza dayîna jiyankirina rêxistinê, bi şêwazekî awarte rêxistinkere, perwerdekere, nirxeke pir mezin dide pêwendiyê, mirov pir zêde bilindkirin, dîsa bi şêwazekî awarte bilindkirina hestan û di xala awarte de rastîparêzbûn, bi kedeke mezin serdeçûn pêwîste.

Min hîs kir ku ev dixwaze bi çeka jinê li min bide. Ya me jî erka me ya mezin a jin pêşxistinê heye. Wê dixwest cînseltiyê di kuştina me de bikar bîne, lê ez ê vê çawa bi şêwazekî awarte di rêxistinkirinê de kar bînim? Niha xala ku MÎT girêdanî pêve

çêkiriye evdere, di wan pirtûkên xwe yên dawî de hertim vê digirin dest. Bi giştî ez regeza jinê çawa bi kar tînim; wisa tê dîtin ku aqlê wan di vir de maye.

***Ab.:*** Raste Serokê min, di cîhanê de tu kesî ne dikarî weke we li ber xwe bide. Di pirtûka herî dawî nivîsandine de vê îtîraf dikin.

**---.:** Ne wisa, em serketin. Keçên me pir başin, bi hêzin. Ez dikarim bikim; ya ku ti zilamî nekir min kir, bila ew lanetê li rêbazên xwe bînin.

***Ab.:*** Jixwe ji wê pêşketinê pir ditirsin, ji ber ku ditirsin dikin.

**---.:** Lê me ev çawa afirand? KT'yê, tenê ne KT'yê li beramberî lanetkariya ji aliyê emperyalîzmê ve li ser jinê hatiye ferzkirin di mijara jinê de min kûrahî çima û çawa dest xist? Bi rastî jî ez yekî belengazim, zilamekî weke min di gund de jî wisa bû. Di derbarê hemû mijarên jinê û cînseltiyê de pir tirsonek, di rewşeke belengaz de bûm û min ev jî ji we re got. Gotina wê ne eybe, ev şêwazekî PKK'ê ye.

Çend roj berê di bernameyeke televizyonê de, min dît ku jineke kerxanê diaxivî, pir balkêş bû. Jinê digot; "*yek ji çiyê hat*" bawerim qezda wê PKK bû. "*Yekî PKK'yî hat, polîsek hat, leşkerekî kolanê hat, lê yê PKK'yî perê xwe danî vir û got; xwuşka min heta ku ez wan kesên te xistine vir kehir nekim ez ê dev ji vî şerî bernedim û çû*" ji pirsa; "*gelo bi te re raza*" re jî got; "*na*" wisa bersiv da. Pêşkêşvan ne li benda bersiveke wisa bû. Ya ku dixwazim bêjim ev e. Ev di Amedê de pêkanîna rêgezekî ye. Bifikirin, li Amedê mêtîngerî li çi, çawa digere? Jinê, zilam, leşker dixe û têkoşîna PKK'ê li beramberî van çawa pêş dikeve? Ev despêkeke û yan jî tenê mînakeke. Vana wisa dizanin ku rêbazê li ser hemû civakê pêk anîne dê li beramberî me jî ser bixin.

Bawerim pirtûka Selîm di vê mijarê de fêrkere. Pêwendiyeke dîrokî ava kiriye! Ya ku jêre dibêje dîrokî cînseltiyê tahlîl dike. Qaşo Birezîlya dîtiye û nizanim çiyê di Erebî de nivîsiye.

***Ab.:*** Hertim vana bikartîne Serokê min.

***---.:*** Bi şêwaza "*teqez diviya bû em di pêwendiya bi dewletê re radest bibana*" nêzîk dibû û bi vî rengî jî radest bû.

***Ab.:*** Şêwaza herî paşketî kar tîne Serokê min. Di asta herî paşketî de, li jiyana civakî ya herî kevneperest xwedî derdikeve.

***---.:*** Dizanim, tê weke zilamekî Kurd çawa bi malbatê ve girêdayî be, tê çawa bi jiyanê ve û nirxên wê ve girêdayî bimînî; teqez kole dike.

Vaye min çawa li beramberî bermahiyên dê, bav, malbat û heta yê hemû zilamtiyê tevgereke serbixwe derxist ortê, niha jî tevgereke serbixwe ya tîpîk derxistina holê mijara gotinê ye. Jixwe ya herî balkêş jî evdere. Ez bawerim di vê mijarê de di asteke mezin de hûn binketîne. Te bi derbendeke wisa teng ve rû bi rû dike ku, yan tê bikujî, yan jî radest bibî. Di encama bandorbûneke wisa rû bi rû de gelek heval ya radest dibin, yan jî dimirin. Ev ji bo min pirsgirêkeke mezine. Ne dikujim, ne jî radest dibim. Li gorî kevneşopan diviya bû min jî ya kuştiba, ya jî qewitandiba, lê ev hemû li gorî hesabên siyasî, rêxistinî û heta nêzîkatiyên mirovî jî ne raste. Radestbûn jî jixwe rewşeke pir ketiye.

Li gorî min di evîn û hestan de radestî nabe. Li gorî we ez tiştekî nabêjim. Di cînseltiyê de radestî nabe. Encamê ku min derxistî; vana hemû xeterin, heta dij mirovî ne. Di vê civakê de ast, niha bi vê re yeksane. Çi pêwîste wê demê? Li gorî min meşa mezin a azadiyê. Dîqat bikin, di vê xalê de hêdî hêdî meşa azadiya jinê û pêwendiya azadiyê pêş dikeve. Vaye îro ger em pêşketina hinekî din lez bikin, hêdî hêdî kesayetiya herî azad dê derkeve holê. Niha ew rewşa ku ji aliyê provakatoran ve, di van pirtûkên dawî de wate nadinê yan jî tevî ku dizanin berevajî dike

di vir de derdikeve holê. Ev jî di nava şoreşa min de dibe şoreşek. Dibe şoreşa herî girîng a şoreşa Rizgariya Netewî ya civakî. Beşîkçî jî jixwe ji ber vê, dibêje; "*tevgereke di Kurdistanê de jinê wisa dixe tevgerê, bi serê xwe tevgereke şoreşgerî ye.*" Raste. Me şoreşeke mezin a ku jinê ji bo civakê tîne vê astê çêkir.

***Ab.:*** Hinek ji wan dibêjin dê ji vê felaket derkeve.

***---.:*** Felaket?

***Ab.:*** Wisa difikirin di dawiya vê pêşketinê de dê felaket rabe.

***---.:*** Felaketeke çawa ye, me çi rawestandiye?

***Ab.:*** Dibêjin; "*cînseltiyê radiwestîne, sparteka xerckirinê radiwestîne*"

***---.:*** Em didin sekinandin û vediguherînin polîtîkayê. Di mijara tahlîla cînseltiyê de di ser Freûd re kes nebû. Em niha pêkanîneke hêza tahlîlên Freûd derbas dike pêk tînin. Emperyalîzm bi xwe cînseltiyê di polîtîkayê de çawa bikar tîne?

***Ab.:*** Yên herî zêde bikartînine.

***---.:*** Ew bi xwe ket rewşa qurbanbûnê. Kemalîzm jî ne qurbana polîtîkaya cînseltiyê ye? Tengaviya wê ya herî mezin jî me ne hêzekî PKK'ê ferz kiriye? Pir vekiriye, me ev pêk anî û li gorî min Marksîzmê nekarî vê bike. Tahlîlên Marksîzmê yên cînseltiyê pir nebesin, heta kevneşopan derbas nake. Pêwendiyên Marks jî, yên Lenîn jî hene. Pergala pêwendiyên burjuvaziya biçûk derbas nakin. Ji hemû aliyan ve li gorî pêwendiyên kevneşopan de ne. Ez bawerim herdu jî keçên arîstokrata ne. Gelo di hatina vê rewşê ya sosyalîzmê de para van taybetmendiyan nîne? Pirsgirêk di kîderê de ne? Li gorî min hîn nû nû lêkolîn dikin.

***Ab.:*** Hêza wan a mezin nirxandinê nîne. Pir sînordar û gelemper dimînin.

***---.:*** Ya ku di hostayên sereke yên sosyalîzmê yên weke Marks û Lenîn jî de tê dîtin û jiyankirin pêwendiya du jinên arîstokrat; pêwendiyên ji aliyê du pergalan ve amadekirî û pêwendiyên

hestan ên ku li derdora vê hatiye amadekirine. Gelo di wisa pêşketina reel-sosyalîzmê de ev jî ne xwedî bandoreke mezine; divê ku bê pirsîn. Ya rast ji nû ve darizandinek heye. Kesekî ku hestên Nazim Hîkmet lêkolîn kiribe heye? Ew jî reel-sosyalîstekî amade ye. Ya wî jî ji aliyekî ve pêwendiya koletiyê ye, hestên wî jî wisa ne, tine dike. Hemû hestên ku ji pergalê girtine yên burjuvazî ne. Asta heyî û pêwendiyên ku ji aliyê pergalê ve hatine afirandin ne li gorî asta sosyalîzmê ne, ber bi binketinê ve dibin. Niha bi gelemperî emperyalîzm vê dike. Sosyalîzm hinekî jî bi vê dîl hat girtin. Sosyalîzma pêkhatî bi vê hat fetisandin. Em li beramberî van hemû rastiyan ketin nava hewldana vekirinê. Lê dîsa jî em dixwazin di asteke enternasyonalîst de bigirin dest. Di çarçoveya şoreşa xwe de digirin dest û vê bi pevçûnekê jî di vê çarçovê de dixwazim ji we re rave bikim.

Bi giştî ya ku di asta cîhanî de tê pêkanîn tenê li beramberî PKK'ê nayê pêkanîn, lê tenê PKK'ê ser xist. Ez, yê dawî dimînim. Ez ê jî tam ser bixim. Dibêje; "*tu çima wisa nabe?* Ez çawa bim? Dibêje, "*Îsyan bike, li dijberî min derkeve, şer bike, min bikuje.*" Jixwe di nava me de ev meyl çawa diteyîsand tê zanîn. Çiqas taybetmendiyên nayên rêxistinê, azadî, hevrêtiyê hene, vaye ew ne yekser be jî taybetmendiyê wê çînê yê rêbertiyê raber dike. Min bi herkesî re, bi her jin û zilamî re hinekî Fatmagerî dit. Ew rêbertiyeke. Rêxistingerî, çi tişta pêwendiya şûnve dihêle hebe, van di ketîbûnê, berjewendîparêziyê û ferdiyetê de îfada xwe dibînin û vana hemû di her astî de çavkaniya xwe ji pergalê digirin. Ezmûneke baş heye. Bifikirin, dema ku hêza wê têr nake pir baş ser de tê. Yên ku dizanin deh salan di binê vî agirî de bijîn, îca yekî weke min hestyar dibe ku fêr nebe? Tenê demjimêreke wê jî pir zêde fêrkere. Ya min jî hêzek û înadeke min heye. Hûn dizanin ku bi taybet di vê mijarê de pir bihêzim. Çiye a ku dixwazin bînin serê min, çiye ev bela û wê ber bi kîderê ve bibe? Ez wana dibînim, tahlîl dikim.

Taybetmendiyeke min a din jî, weke we ne xeteriyê bi çavsorî pêşwazî dikim, ne jî dema ku tengav dibim nakevim nava helwesta devjêberdanê. Xetere û pir rastîparêzim; ev xeterî, heta ku mêtîngerî bê derbaskirin xeteriyeke dê dewam bike ye û heta niha jî didim jiyîn. Li gorî min ev xeterî sûnmende, dibe zemînê avakirina polîtîkayê. Polîtîka şerê taybet, lê li beramberî vê ez ê jî polîtîkaya şoreşgerî biafirînim. Li gorî min dikare hîn sûdmend be. Ne li beramberî dijmin. Heta dawî di nava nêzîkatiyeke çavdêrîkirinê de me. Yê ku bê kuştin heta dawî dikarim bikujin, lê li cihekî jî rewşa min cuda ye. Dema ku hêzên têkoşîn derketin qala Pîlot ji min re kirin. Wisa digotin; "*tevî ku dizane Pîlot sîxûre çima neda kuştin? Nexwe pêwendiya wî heye.*"

***Ab.:*** Piştre jî heman tişt digotin Serokê min.

***---.:*** Vî karî didomînin. Jixwe ji bo min dibêjin "*MÎT'ê alîkarî pêre kir*" rast e, piştî ku Pîlot derket holê jî min tiştek jê nekir. Min qet jêre negot li ser çavê te birûyê te jî hene.

***Ab.:*** Hevalên dizanin vedibêjin.

***---.:*** Ji ber ku Pîlot pêwîste, kuştina Pîlot, dihat wateya zivistan li Enqerê derbasnekirinê. Bêguman du salan ji pêwendiyê mahrûm mam. MÎT'ê 24 demjimêran li Enqerê min serbest bihêle?

***Ab.:*** Ya rast wê hinek tiştên din jî pêşde bajotan.

***---.:*** Na na buxtane! Demeke dirêje têm nirxandin. Lê ev ji bo min ne girînge. Ez kesekî bi armancê xwe ve girêdayîme. Ger min dev ji vê pêwendiyê berdaba ma wê MÎT'ê 24 demjimêra ez li Enqerê saxlem hiştibama?

***Ab.:*** Dê nehiştiba Serokê min. Misoger dê ketiba nava hinek hewldanan.

***---.:*** Dê kuştiba, dikuje. Gelek heval çima erzan dimirin? Ji ber bê taktîkên lewma. Min tam eyarkirin çêkirine û li Enqerê sê salan di gel pêşxistina nerîna Kurd a xeter jî nerîna şoreşgerî jî pêş dixim, rêxistin dikim; hem jî dizanim bispêrim MÎT'ê. Taktîk ev e. Lê hûn taktîkê amadeye jî nizanin kar bînin. Gelo taktîkê herî zehmet hûn çawa dikarin bînin aqlê xwe? Weke ku ew

dibêje, li beramberî vê rêya ku ez bişopînim; teqez divê weke ku ev dixwazin be, pejirandina vê, bi sebir û zîndî bûn. Divê ku pir tiştên nayên aqlê we jî bên kirin. Yanî ger hûn dixwazin kûrbûnê bigirin, cîdî ne, pêwîste hûn bikin.

Ez ji bo vê dibêjim; dibe ku li gorî provakatoran cînseltî bi taybet -di pirtûka felsefê de jî heye heta nerîna piraniya ji wê yên di nava me de jî wisa ye- ev şêwaz dikare bibe felaketê. Di vir de diyardeyeke bi awayekî awarte li ber çav bê girtin heye; niha tevgera jinê ez pêş dixim. Vekirî bibêjim, yên dixwazin, diçin, ji tu kesî re bi qasî serê derziyê nabêjim; "*pêwîstiya min bi te heye, tu xwedê kî were*" û hwd. Ez bi rêgeza azadiyê, tevgera azadiyê dimeşînim. Ev jî bi xelatê, bi pesindanê, nizanim bi zorê nabe. Li gorî min ên azweriya xwe ya azadiyê hebe dê were. Vekirî bibêjim, yên ku ne wisane ne gengaze ku bi min re rê bigirin. Niha ev bûyera cînseltiyê ji kîderê derdikeve? Beriya her tiştî di aqlê zilaman de bi vê kuştina min heye: Kurdînî, malbat, ciwan heta sosyalîzm hertim bi vê kuştine. Bi ajo, hest, evîn û siyaseta xwe ve kuştiye. Dora min e, lê ez jî binketinê bi asanî napejirînim. Di kêliya ku ez binketinê qebûl bikim de, dê mîna Selîm girê bidin. Ew niha li kîderê ye? Di rewşa kerê super yê emperyalîzmê, xulamê mêtîngeriyê de ye. Li Elmanya ye, li beramberî Kurdistanê girtine bin parastina xwe. Di Tirkiyê de weke kontrayê herî mezin jî hatiye bikaranîn. Ger em ne bin dê bê aman bikar bînin. Başe, çima ev hemû dibin? Tenê û tenê li pênavê ayendgeriyekê û ji bo li gorî malbatgeriyeke kevinparêz. Jina ku pesnê wê dide, bêriyê dike jî ketiyeke, hem jî bi qasî ku xwe bavêje ber linga û li ber bigerê ye. Mirov tifî li rûyê kesên wisa dike. Li gorî min giriyê kesekê li pêşberî min, xwe avêtina lingê min tevgerîna herî ketî ya cîhanê ye. Na, divê ku hûn bi çavê xwe bibînin. Ez wisa qebûl nakim. Dikarin gelek pirtûkên wisa binivîsînin. Vana ne tiştên wisa ji rêzê ne. Tabî zêdetir provakator dinivîsînin.

Qaşo min bi hevrebûna wan xira kiriye, min çiyayên Qafê di navbera wan de ava kiriye, evîneke çiqas mezin pêşxistine, çiqas hestên wan mezin bûne, nekarînê pêk bînin û niha jî pêk tînin! Bifikirin, ev despêkê ne sîxûrekî qeydkirî jî bû. Niha li kesayetiya wî binêrin, ji çil sîxûrên qeydkirî, çil qat xetertire. Ev dijmin wisa

her tiştî dê bike. Çima? Vaye Aysel xwe wisa avêtiye ber lingê wî û numareya cazîbeya cînseltiya çorse. Vaye Selîm jî ewqase! Ma ne Kurdê çors, Kurdê ker, Kurdê bê şerefe? Yan jî Dev-Yol jî ne wisa ne? Çepgirên sexte, yên ku herî zêde dibêjin; "*em şoreşgerin*" jî ne wisa ne?

***Ab.:*** Jixwe nêzîkatiyên wan wisa bûn Serokê min.

***---.:*** Di wateyekê de ya ku li ser min jî tê ferzkirin ev e. Ruhê min ê azadiyê dê di vir de qiyametê rake. Ez pir vekirî bêjim, ji pêwendiyên wisa, himêza dê û ya pîrekê min nefret kir. Wê jinek wisa nêzîkî min bibe, xwe bavêje lingê min yan jî wê min bavêje ber lingê xwe; ma gengaze? Hurmeta min ji mirov re heye, eleqeyeke min a pir mezin heye, girêdana min heye; şêwaza ku ev dişopînin carekê ji min re metîrsîdar û kirêt tê. Bi gîrî, li xwedanê dibêje; "*ez bê te nikarim.*" Ya rastî li gorî min mirov bê hevrêtî nikare bike. Ev rewşa girêdana giştiye û pêwîste jî. Ji bo jinê jî, zilam jî tiştên wisa hene ku, mirov bê ku hevalên xwe hebe nikare bike. Lê curê girêdana di rastiya van de ji min re metirsîdar û kirêt tê. Dixwazin feraseta; "*dev ji rêxistinê ber de, dev ji berxwedanê berde û tenê girêdayî ajoyên xwe be*" serwer bikin. Di vî karî de grûra zilamtiyê heye, ev jî ber bi ketîbûna jinê ve derketinê dide kirin. Himêzkirineke metirsîdar, serdeçûneke metirsîdar mijara gotinê ye. Qaşo jin û mêr, jê re çi tê gotin bila bê gotin evîn, ev, ew û bi vî rengî giştina miradê xwe ye. Ez nefret dikim. Ger yên ku wisa texmîn dikin dê bi qasî serê derziyê di nava PKK'ê de wisa xwe bihewînin hene, xwe dixapînin. Evîneke wisa jî nabe, jin û mêrbûna wisa jî nabe, pêwendiya wisa jî nabe. Min jî li vir berevajî gotiye û pêk jî tînim.

Bi min re di pêwendiyê de cesaretekî mezin heye, azadiyeke mezin, hişmendiyeke mezin, xweşikbûn, zindîbûn heye. Ma min bi zorê ji van keçikan re got; "*werim û bi PKK'ê ve bên girêdan?*" Yan jî ez mûçe didim we zilaman? Na, ez ji serî heta binî di nava şer û agir de dimeşînim. Lê ez di vê mijarê de her roj ji jinê re dibêjim; "*statuya te ya jiyanê diyare, li beramberî*

*zilaman tu çend pereyî diyare, ger desgiriyê te jî hebe çîroke, nikare du gotina bi te re bi axive."* Ez pir vekirî bêjim, ji aliyê cînseltî ve jî bi tenduristî jiyîna we jî, kevir biteqe hefteyeke. Ez vana îspat dikim û nîşan jî didim. Li şûn ve çi dimîne? Azadiya kesayet a awarte, zindîbûna jiyanê, rêzdariyeke bêhempa a jinê û em îspat dikin ku kesayetiya jinê jî dikare wisa be.

Em niha taswîra jinê bikin. Di cînseltiyê de jin pir xirab tê bikaranîn, kirêt tê bikaranîn û ya din jî mîna çarşefê tê karanîn û davêjin erdê. Hêza zilam ji vê zêdetir dest nade. Bifikirin yan jî, dê jiyaneke pir mezin a azadiyê di hefteyekê de bîne asta fetisandinê. Di pêwendiyeke hestî de, li gorî nêzîkatiya ku ew fêm dikin ez pir zêde dijberim. Ji bo min heta dawî bi jina re meşîn, heta dawî bi hevre bûn, heta dawî jiyan parvekirin û xweşik mayîn, heta dawî wekhev û azad mayîn, rêzdar mayîn esase. Bi kurtî şêwazê pêwendiya ku dikare her tiştî parve bike. Di şer de jî, di aşîtiyê de jî, di hemû xebatên leşkerî û siyasî de, baweriya divê ku rist li gorî tê xwestin lîstin bi miroviye. Ez pir ji xwe bawerim û dibêjim kesatiya min jî wisa ye û yên tên bila bên. Ya ku wan diecibîne jî hinekî ev e. Jin wisa bê sînor tê. Dibe ku ji bo wan çîrok be. Qaşo dibin evîndarê hev, lê li gorî min xirabiya herî mezin bi hev dikin. Biçin lêkolîn bikin, li rûyê wan binêrin; rûyê wan bihusteke, ma estetîk heye? Qet nebe we wêneyên wan dîtiye. Pir kirêtin! Ger ji we re bêjim bigrin jinê, hûn ê lanetê bînin, li rûyê wê jî nenêrin. Rewşeke wan a bê jiyîn nîne. Em Selîm nîşanî keçekê bidin em binêrin, ger keçeke hinekî azad hatibe mezinkirin rojekê, çirkeyekê qebûl bike, hûn çi ji min re dibêjin bêjin! Rûçik bi zilam ve nîne, ruhê wî nîne, bêmirêze! Ew jî vê dizanin, ew bi xwe jî çi malin tabî kî dizanin. Lê çeka wan a yekane çiye? Kevneşopeke wan heye, kevneşopên civaka kevin; ajoyek wan heye. Li gorî kevneşopan jî di nava pîvanên malbatê de li ser ajoyan hatineke gel hev heye, wekî din li gorî wan nabe.

Li gorî hişmendiya emperyalîzmê divê ku wekî din nebe. Lê li gorî min jî wekî din dibe.

Ez pir vekirî bêjim; azadî, di daxwaziya azadiyê de jî dibe. Dibêjin ber bi kaosê ve dibe? Bila bibe! Çi digot wê? Ez ê civakê veguherînim çi?

***Ab.:*** Hûn ê ber bi felaketê ve bibin.

***---.:*** De bila bibe. Kîjan civak? Bigre û li serê xwe bide vê civakê! We ev civak dît, mane civakeke tirsoneke? Civaka Kurd e û kî xistiye çi halî pir vekiriye.

***Ab.:*** Ji ber ku ew bi xwe bi vî rengiye wisa dinirxîne Serokê min.

***---.:*** Ger em zanist û sosyalîzmê nizanibin wisa ye. Kîjan civak, civaka kê, civaka kê dide jiyankirin, ez ê ber bi kîjan felaketê ve bibim? Ew hedefa min a herî mezine! Pir vekiriye, ez dibêjim ez ê ji sedî nod zewacan têk bibim. Min di hinek axaftinên xwe de anî bû ziman. Diçim li hinek cîhan rûdinêm, jin dest bi gumanê dikin ji zilamên xwe. Bila bikin! Zilam yan bi pere kiriye, ya bi zorê, yan jî bi pêwendiyên xizmatiyê. Jin feqîre. Zilam jî wisa dizane. Dema ku bi dahûrînan re jî rû bi rû dimînin dibêjin; "*wey me jiyan winda kiriye.*" Dibêjin; "*me çiqas xiyanet li jiyanê kiriye*" û wisa difikirin. Biçin gel bibînin. Ev gelê ku nû teşe digire, li vî gelê ku nû çavê xwe ji jiyanê re vekirine binêrin; çawa jiyana xwe ya kevin dadirêzin. Zewacên çil salî jî dibêjin; "*em çiqas li beramberî jiyanê binketine*" wisa dibêjin û poşman dibin. Jixwe pêwîst nake ez civaka kevn berfireh binirxînim. Ez bawerim hûn tenê vana di waneyan de kar tînin, hûn rojane tiştên ku jiyan dikin dibînin. Niha em ber bi felaketê ve nebin, di asta pêwendiyên şexsî de em ê wekî din bibin kîderê? Ya din jî ez bawerim wisa dibêjin; "*bê pêwendiyê ferz dike.*"

Ya ku tê ferzkirin ev e; divê ku hûn vê jî vekirî fêm bikin. Niha di pîvanên me yên civakî de dema ku em dadixin asta civakî xetimandinek, fetisînek û ji hêz ketinek tê jiyîn di holê de ye.

Tevdîra ku ez li beramberî vê jî digirim, eşkereye ku neçariya rêgirtin li vê fetisînê ye. Me dahûrînên Mêrdînê, Dêrsimê û Ewrûpayê kirin, em vana vala nakin. Em dahûrînên jin-zilam, mêr-pîrek dikin. Yê hemûyan jî di astên cuda de, taybetmendiya kesayetiya hemûyan, rastiya wan tahlîl dike û datîne holê hene. Herhalde hûn vê ferq dikin; di asta pêwendiyên heyî de, li gorî kevneşopan, dîsa li gorî ajoyan hûn dikarin biçin kîderê? Pergala malbatê ya niha, desthilatiya ajoyên niha heyî yan jî wê kevneşop derfetekî herî biçûk bidin pêşketina çalakiya me ya serbixwe? Vaye çalakiya herî mezin em li vir ferz dikin. Ez li ser xwe jî pêk tînim. Ne şerme. Carekê ger ewqas heywanî hatiye ferzkirin, ewqas bêçareserî hatiye ferzkirin, tu mirovî û ger rêza te ji nijada mirov re heye dibêjim tê derbasî çalakiyê bibî. Min got, jin teqez tê kirêtkirin, cînseltî û pêwendî teqez tê kirêtkirin, teqez ji mêtîngeriyê re xizmet, teqez bêrêxistinî, xiyanet, belavbûn û devjixweberdan û ger teqez radestbûn hebe; ez jî şoreşgerim, berxwedêrim, ez çawa ji van teqeziyan re serê xwe bitewînim? Ez çawa jinê ewqas qirêj bikim? Tabî vana min pir hov yan jî kurdekî çors dibînin. Na. Berevajî, ya rast bûyîna min a xwedî şêwazekî awarteye.

Ez dikarim nêzîkatiya xwe ji jinê re ji gund despê bikim dubare vebêjim. Feraseta ku li ser min serwere, feraseta jin çibû? Ez dikarim heta kêçikên cîranên me ji we re vebêjim, di aqlê min de ye. Ya ku dixwazim bêjim, ez ne kesekî wisa vala bûm. Di dibistana navîn, amadeyî, zanîngehê jî di bîra min de ye û li gorî hêza xwe encamên ku min jê derxistiye ji we re got. Ez hema dikarim ji we re mînakan bidim; zilamekî cîranê me zewicîbû, min wate nedabûyê, ji ber ku zewaca duwem kiribû. Zewaca xwe ya duyemîn jî bi keçeke di temenê min de kiribû. Ez bi seqetiya vê pêwendiyê fikirîbûm. Keçeke di temenê min de wisa bi zilamekî lewaz re zewaca wê bi hêza pere çûyîna wê tawanekî mezin, bê axlaqî hatibû ji min re. Ger ji destê min hatiba minê ew

keç ji destê wî zilamî kişandiba û rizgar kiriba. Min sernexist. Ji ber ku wê demê hêza min nebû.

Bê ku xwuşka min bibîne ji mesafeyeke rêya du rojan hatin gotin; "*dixwazin.*" Li beramberî çend kîs genim, çend quriş pere hatin, birin û çûn. Min ev pêwendî jî xweş nedît, qet xweş nedît. Ez fikirîm û min got; "*pêwendiyeke wisa dibe?*" Ji rêya çend rojan hatiye, zilam weke serfê feodalekî, xulamê axa ye. Xwuşka me bir, hîn jî tê bîra min, min got ku; "*heyf bû.*" Tabî hêza min jî têra dijberî derketinê nîne. Di encam de dê jiyana zewac û maleke wisa çawa be? Xulamê axayê gund, hemû pêwendiyên wî jî li ser xulamtiyê hatine damezrandin, bi belengazî.

Dîsa tê bîra min -vana hemû mijarên ku di temenekî biçûk de min jiyan kirine- keçeke niyaz temîz, dîsa bi zorê dane malekê, pir bê aman, bi sîlle û lêdan. Keç jî li beramberî zilam serî natewîne û direve. Ez jî hinekî xwendevanbûm û ev jî hat gel min got; "*tu dikarî min fêrî xwendin û nivîsandinê bikî*" care yekem keça gund hatibû ber serê min. Dihat û wisa li hevokan dinerî, hîn jî di bîra min de ye. Min encax dikarî tenê du peyvan jê re bêjim, wekî din hêzeke min nebû.

Tê bîra min, di dibistana navîn de li gorî min keçeke xwe gihandina wê pir zehmet hebû. Ji dûr ve lênerîneke min hebû, ewqas. Di amadeyî de, di zanîngehê de jî yên wisa hebûn. Ez difikirîm, ev keç xweşikin, başin, lê divê veguherin çi? Ev lêhûrbûna min pêwendiya xwe bi pêşxistina rêgeza azadiyê re mezine. Di dahûrînên di derbarê jin de min pêşxist hemû wisa ne pêwendiyên bi koletî û pir xirab bi hev ve hatine girêdan rûyê hundirîn û jin jî, zilam jî, çawa ber bi ketîbûnê ve herikandiye min pir vekirî nîşan da.

Ger hûn vana ji xwe re bikin mal wateya wê heye, lê hûn nekin hûn ê qet nikaribin bifikirin jî. Min ev hemû encama ku ji rastiya jinê derxistî veguherand têkoşîna azadiya jinê. Hûn nikarin bêjin ev jin ji ber xwe ve hatine gel hev. Hêza çavdêriya ku bi salan

hatiye kirin, encamê çavdêrî û dahûrînên jinê ne. Vaye estetîka jinê, taybetmendî, li ser bêçaretiyê di encama lêhûrbûnan de dibim hêza çareseriyê. Serbixwebûna jinê, azadiya wê, nêzîkatiyên xelet ên zilam, di nava van dahûrînên ku min pêşxistî de cih û wateya xwe teqez dîtiye. Niha hinek dibêjin; "*jin ji me girt"* Jin êdî diçe, mêr, destgirtî ketine xiroşê ne wisa?

***Ab.:*** Xiroşeke mezin heye.

***---.:*** Tê jiyîn tabî, ev çalakiya min e. Ji ber ku bi hemû vekirîbûna xwe û giraniya xwe ve çalakiya min e. Ji ber ku keça gundê min, pir xirab dan zilam. Ez tola wê digirim. Keçeke cîranê me hebû, yek li pişta mala me ye, yek jî li gel serê me. Ez hîn jî li pey tola wan im. Tabî bê mafiye, zilam yekî kêrnehatî û keçê bi zorê digire û gire didin. Gelo pêwendiya vê dikare bi edaletê re hebe? Li şûna ku wisa be, bila qet nebe. Ev asteke civakî ye, civak hemû wisa be, di dilê min de bûyîna tiştên din me ewqas girîngin dikare wisa bê fikirandin. Kurê berde biçe cihekî din, dibe ku ji yekem rizgar bibe, lê di ya duwem de dê bifetise. Raste. Li ser jinê teqez zext heye, jin di rewşeke nikare nefes bigire de ye.

Başe wê çawa bê derbaskirin. Vaye çareseriya heqîqetê rewşa ku jê re dibêjin; "*civak ber bi felaketê ve birinê"* êdî jin weke dema borî nayê dîtin. Raste, êdî weke berê ne asta civakê wisa dimîne, ne jin tê dîtin. Tabî jin jî êdî weke berê zilam nabîne. Ji ber ku li gorî min ew jî ketineke mezine. Jineke bi şêwazê kevin bi pêwendiyên serdestiyê ve hatine girêdan dibêje; "*min winda kir."* Jixwe ji bo min jin, encax dema ku ew azad bû heye. Jineke xelet bi zilam ve hatiye girêdan, ji bo min xilas bûye. Li gorî min xelet hatiye girêdan, li gorî asta pêwendiya azadiyê jineke ya xwe nebe, jina ku hêza xwe ji dest daye, xwe daye girêdan, bi îdîabûnê ve hatiye dûrxistin û hatiye tinekirin, tine bûye. Pêwîste, hertim bê îdîalîzekirin. Îdîalîzekirin jî ji hemû aliyan ve bi azadiyê ve girêdayî ye. Min bi azadiyê sembolîze kir. Raste, em tenê bi

sembolîzekirinê jî têr nabin, em tevgerbûnê heta dawî bi çalakiyê pêş dixin. Niha pêl bi pêl tevlî şerê gel dibe, em niha di girtîgehên KT'yê de bi cîh nabin.

Dibe ku em di hewseleya we gelekan de bi cîh nabin. Hêza rêbertiyê ya siyasî, hêza rêxistinê çibe, di mijara jinê de jî hêza wî ew e. Dema ku vê dikim di ferzkirineke min a çors nîne; tiştekî wisa ne gengaze. Li gel min tenê yek kes ne xwe avêtina ber lingan, ti car bi gotinekê xwe biçûkxistin jî nîne û nabe jî. Em di holê de ne, em bi şer ve gire didin. Yekane encama ji pêwendiyê derdixin; bi mêrxasî li ber xwe dane. Hûn ê çima vê nebînin? Mêrxasî di vir de ye. Jina ku xwe davêje ber lingan başe, yan jî jina ku ewqas ber bi azadiya xwe ve dibeze baş û xweşike? Ya ku dibêje; "*wey mêrê min, dildarê te me*" û hwd, yan jî ya ku xwe ji benê koletî û girêdanan rizgar kiriye û azad dike başe; eşkereye. Jixwe em hestên pêwendiya we pir bi wate derdixin holê. Hestên mezin li ser kîjan esasî pêş dikevin, ev diyare û ya ku em derdixin holê, hestên ku pêş dixin mezinin û giştgirin, azadkerin. Pêwendiya hesta bi nêvenga civakî re heye. Mezinbûna hestan, bi hev re mezinbûna jiyana azad, bi asta têkoşîna siyasî û civakî re têkildare. Hûn dixwazin hestên we yên baş hebin, lê lêkolîneke we ya zanistî jî nabe; lê di vê mijarê de pêwîste têkoşîneke we ya teqez kûrahiya wê hebe. Encax xwe gihandina mezinbûna hestê di encama vê têkoşînê de pêk were. Hesta zilamê cahîl nabe, tenê bilindbûna ajoyan, bi çavkorî pêkanîna wê encax dibe. Yê ku têkoşîna xwe nebin dê daxwazên wî jî nebin, hêvî, qezenckirina azadiyê û hêza nûnertiyê jî nabe.

Em li dijberî bê mafî û zordariyan şer dikin. Zilamê ku vê bi xwe re pêk bîne dilê wî mezin dibe, hezkirina welat teqez mezine. Ger xwe di rewşa şerkerê kor de nebîne û nekeve wê rewşê, aliyê şer ê pêşxistina mirov mezine. Li gorî min yê şer neke ne hestên wî/ê, ne jî hezkirina wî/ê dikare bibe mijara gotinê; ger bibe jî dê bêmirêz be. Ez heta niha jî ji kesekî baş têkoşîn neke hez nakim.

Asta ku hezkirin gav bi gav pêş dikeve, asta pêşketina zanîna kes, rêxistinê û çalakiyê ji nêz ve girêdayî hevin. Ast, teqez gav bi gav bi pêşketina têkoşînê ve girêdayî teşe digire. Yên din hemû vala ne. Ger fîzîkeke we ya pir xweşik jî hebe, min yên wisa jî dîtin, nefret dikim, vana bê wate ne. Ya girîng û esase di nava pîvanên ku min diyar kir de asta xweşikbûnê girtine. Di van mijaran de dewlet bûn qurbanê hesabên xwe. Vana wisa dizanin ku li beramberî min jineke fîzîka wê wisa bikar bînin herhal ya ku hêvî dikin bi dest bixin. Ya rastî berevajî, hem di karanîna dewletê de, hem jî di karanîna van de hostatiyeke min a mezin heye. Dibêjin; "*Apo mirovan çawa kartîne?* Ez ê karbînim tabî. Yanî yên ku li ser xiyanetê nêzîk dibin, li ser esasê koletiyê nêzîk dibin jinê jî, zilam jî ez ê baş kar bînim. Vekirî dibêjim, ez dikarim zilam ji jinê xirabtir bikim. Ger li ser esasê xiyanetê nêzîk dibe, li ser esasê ketîbûnê nêzîk dibe, jin be ji jinbûna wan, zilam be ji zilambûna wan dikarim hezar carî poşman bikim. Divê mijarê de şerê min pir dijware.

Ez qanûnekê li we jî bar dikim. Qanûna rast hezkirin, qanûna xwe gihandina hezkirinê. Li ser vî esasî, di vê mijarê de ji jinekê re, ji pêwendiyêkê re encax bi vî şêwazî dirêjbûn bibe mijara gotinê. Min got bi asanî pêwendiyek dê nebe. Ev ji bo min jî derbasdare. Ez ewqas ji bo azadiya jinê şer dikim û ev ji bo min despêkeke. Ez pir rehet dikarim bêjim; "*hêza min heye, bandora min heye" û* bikevin nava helwestê girtina bin tekela xwe ya jinekê, lê ez ê bi vê ve mezinbûna xwe ji dest bidim û ez ê radestiyê bijîm. Di vê rewşê de demeke dirêje rêgeza rizgariyê ku min hêjayî xwe dît, dibînim ku berevajî rêgeza rizgariya jinê ketime. Dikare bê gotin; "*jin bi koletî dikare bi min ve bê girêdan, ez ê jî jê sûd bigirim, her tiştî jî erzan bikar bînim"* Belê, lê tê pir bê mehîn, mezinbûna te li kîderê bimîne? Hûn dizanin ji bo ku ez xwe mezin bigirim, di heman astî de neçarim ku têkoşîn bimeşînim.

Hinek rêveberên me hene, dibihîzim û her roj rapor tên. Yekem karê ku dikin, keçek bi xwe ve girêdane. Meyla keçêkê jî li ser esasê xwe sipartina rêveberiyan qaşo xwe rehetkirinê; heye, vana pir xeletin. Ewqas hêza min heye, hemû curên derfet û nêveng heye. Ez çima nikarim bikim? Ji ber ku bê yetkî, bandor, nebesim? Na. Ji asta Rêbertiya xwe re berevajî dibînim. Ya girîng asta rêbertiyê wisa girtine, yan jî sipartina kesên bi yetkiyên xwe, jinê, şohretê û erzan xwe dayîna jiyankirine? Çima hûn mezin nabin? Vaye pirsgirêk di vir de veşartiye. Li gorî we fersendek, çima weke Selîm yên din neyê jiyîn? Vaye Rêbertiya Aysel! Hema xwe bavêje odekê û sixinaxekê! Ger mêrê te be jî gelo sixinaq dikare wisa bê karanîn? Yan jî ew sengereke şere? Ez nabêjim bila hezkirin nebe; ji bo ku hûn baş rave bikin, fêm bikin, ez bi azwerî çîroka xwe ji we re vedibêjim. Em ji bo xweşikiya jinê jî şer dimeşînin û me meşand jî. Lê ev dikare bi qasî ku di heriyê de bêgevizandin erzan bê nirxandin? Bi we re yan înkarkirin heye; yan jî di nêvêngên ku fersenda wê dibîne de hişmendiya erzan bikaranînê heye. Na, şoreşeke xweşikiya jinê yan jî rizgariya jinê negire dîqatê ne xwedî şansê pêşketinê ye. Bi me re feraseteke namûsê heye û li gorî min feraseta namûsê xwe gihandina asteke wisa ya azadiyê ye.

Ji bo çavdêrîkirineke wisa ya azadiyê pêwîste ruhê we hebe. Ruhê we nebe, dê azweriya we jî nebe; dema ku azweriya we nebe mejiyê we naxebite. Hûn ê bi asanî li beramberî ajoyan binkevin û dema ku fersendê bibînin hûn ê jinê bikar bînin û hûn ê xilas bibin yan jî zilam kar bînin û xilas bibin. Ji ber vê jî mejiyê we naşixule, yên ku ewqas ketiyê bin ajoyan teqez mejiyê wî/ê jî naşixule. Dibêjin; "*yê din pir zehmetin*" bêguman dê zehmet be, şerekî dijware ev. Ev xala ku min ceribandiye fêm bikin û biceribînin, hûn ê awarte bim. Ewqas keç hene, ger ji we re bihêlim hûn ê bêjin em hema bizewicînin yan jî bila yek yê din bixapîne. Jixwe yên ku xwe li ser min ferz dikirin ma wisa

nedigotin? Rêgeza hejmara yekem a hemû provakatoran li ser min ferz dikir ne ev bû? Demek beriya niha li Z. bû hema bêje 500 jin û 500 zilam dê ji bo bizewicînin biryar derxistana! Wê demê pêwîste 500 jî avahî bên girtin. Ji bo avahiyê jî kî dizane divê ku ez çiqas mûçe bibînim. Ma ev raste? Bi hevdû re wisa li ser esasê xiyanetê pêwendî pêşxistine ji jin û zilamên wisa wê çi xêrê bikin. Ewqasî ji gêrîla qut bibe, ewqasî ji şer qut bibe, zewac û ji bo zewacê jî ewqas pere. Çiye, pêwendiyeke pir mirovî bûye min jî asteng kiriye! Na, ne wisa jin tê dîtin, ne jî zilam. Ev ji bo min jî derbasdare. Ev di heman demê de realîteya Kurd e jî.

Ger tu ket nava lêgerîna pêwendiyeke wisa erzan, te derfetên pir kêm ên rêxistinê jî wisa bikar anî, tê bikevî rewşeke ketî. Ya wisa, hezar qat ji pêşmergeyên li Başûr ketîtire. Herwiha ev pêwendiya jin-zilam, tinekirina jiyana pêşmergan, çiqasî li ser esasê xulamtiyê pêşktiye sedema sereke ye û li ber çavane. Ya min pir zehmete! Bê têkoşîn, gêrîla bê rêxistin mayîn di encam de bi lez û bez ber bi dijmin ve çûyîne, ev jî baş tê zanîn. Wê demê pêwendiyeke wisa bila bikeve binê erdê, ez qebûl nakim. Vekirî bêjim, ez ê çavê xwe ji jiyaneke wisa re negirim. Bêguman ev jî ferzkirineke mezin ya aqile; ger li gorî we ye hûn ê werin û girêdayî bimînin yan jî hûn nexwazin jî pê ve girêdayî namînin. Hûn dikarin birevin, durûtiyê bikin, min bixapînin, lê ger ez, ez bim, ez ê tola xwe bigirim, rakim jî. Li gorî wê divê herkes bizanibe çawa bijî. Li gorî min mezinî pêwîste. Bûyîna pîrek, bûyîna mêr li gorî min ne asane. Heta ku weke tê xwestin tu bi şerekî ve neyê girêdan, ma ez ê te zilam hesab bikim? Dibe ku gelek hevalên me yên xort bên girêdan. Ez ji we re bêjim, zilamtiya we nîne. Jixwe dibêjin; "*em mahf kirine*" ne wisa? Ger tu Botanê qezenc nekî, hinekî azadiyê qezenc nekî dev jê ber de jinê, tê ji zilamtiya xwe bibî. Ma ev ne rêgezeke raste? Rêgezeke azadiya Kurdan ya wisa dê pêş nekeve? Li gorî we ne rêgezeke şahane ye.

***Ab.:*** Şoreş jî wisa pêş dikeve Serokê min. Pratîk wê dide diyarkirin.

***---.:*** Tabî ez mezinbûna xwe ji kîderê dibînim? Zilamê Kurd di bêçareseriya xwe ya herî mezin de çi dike; hema ji bo ku îspat bike çiqas zilame diçe kerxaneyên Amedê. Lê gêrîlayên me jî diçin û ew helwestê ku min ji we re got nîşan dide li wir. Ev pir girînge.

Zilamtî di civaka Kurd de çîye, wateyeke çawa di nava xwe de dihewîne? Ne ku nayê zanîn, feqîre û jinek dîtiye, hema bêje hebûna wî ya mal a yekaneye û bi vî şêwazî êrîşî wê dike. Ev gundî çawa dijîn hûn zanin? Qaşo pir bi namûsin. Ev, bi giştî ji bo hemû burjuvaziyên biçûk derbasdare. (Burjuvaziyên mezin hinekî din cuda ne) ji hemû aliyan ve cînseltiyeke çors tê jiyîn, şev-roj dîtiye jinek, heywane çiye ne diyare û jin jî ji wî xirabtire! Gelo ji vê zêdetir ti zewqeke zilamê Kurd heye? Piştî ku ewqas bi cînseltiyeke çors ve hat girêdan û şûn de, êdî mirov nikare bêje ruh û hişmendî jî heye. Jixwe zarok-marok bê hejmarin û bê ku bê 20 saliya xwe qurişek pere di desta de hebe dizewicîne. Piştî wê bêguman ji bo cerdevaniyekê çil teqleyan davêje, ji bo mûçe, ji bo berjewendiyeke madî ya herî biçûk bi dest bixe çil teqleyan davêje. Piştî ku ket vê rewşê û şûn de di yekî wisa de welatparêzî, şerkerî, rêxistingerî dibe û bi asanî dikare pêş keve? Jixwe di serî de kewarê mêşa hebe, dê çi bifikire û bikeve pê çi, dê ji bo çi jiyan bike ev kesayet? Vekirî dibêjim, bi van şoreş nabe, yên ku kesayeta xwe di vê rewşê de digirin nikarin bibin xwedî gaveke pêş.

Dema ku we tenê jinek di serê xwe de “*evîndar, evîn”* bi cîh kir yan jî jinek we, we jî jinek bi wan rewşên xwe yên xilasbûyî qebûl kir, ya rast ger hebe hêviyeke jiyanê jî, hûn wê jî dikujin; hûn çawa dikarin vê qebûl bikin? Li gorî min ji sedî yekê tu dikarî di dilê xwe de hîs bikî, lê ji sedî nod û neh nirxên din, divê tu wan biparêzî. Pîvanên min bi xwe hene. Jinek yan jî herkesek, zilamek

jî di nav de, bê gel min, bi sewdaserî bila bêje; "*ez ewqasî girêdayî te me*" pêwîste vê bizanibe; ez rêberim û ez yeksane Kurdistan, Kurdistan yeksane şer. Wekî din nayê qebûlkirin; di zanebûna vê de be û girêdanî raber bike raste. Wekî din wate û nirx nadim ti curê girêdana, nadim. Ez nirxên din ên ku di kesayetiya min de îfade xwe dibînin hebûna wan jî bînim bîra we. Beriya her tiştî ez ê bêjim welatekî te heye û di çi rewşê de ye li holê ye. Ev rêgezeke û em vê bi şiyariyeke mezin pêk tînin. Ji bo vê ser dixin.

Tê ewqasî ji welatê xwe hez bikî, ewqasî ji mirovan hez bikî. Huner heye, zanist heye, nizanim ewqas astên civakî hene; tê wana jî bibînî. Tabî hinek nirxên bingehîn hene, piştî wê pêwendiya hezkirinê dikare pêşkeve û ew ê jî ji hemû aliyan ve di vê çarçovê de bê nirxandin. Ger na hûn dîroka sewdaserên di nava me de dizanin. We çîrokên Leyla û Mecnûn jî pir bihîstiye. Her tişt wisa be, xilasbûn jênereve û ti hêza serkeftinê, derfet namîne. Ji kesên ku Ewqas xwe di nava hestan de fetisandiye, ewqas xwe bi şexsekî ve girêdaye û fetisandiye fêda wî/ê nagihêje ti kesî. Ji ber vê ye ku, vaye di vê xalê de divê ku em bi aliyê mezin ê civakî, bi asta azadiyên hevsengiyê ava bikin. Em vê hestyariya mezin a ku bi jinê re heye çawa ji holê rakin? Em vê bêçareseriya li ser pêwendiya Kurd serwere çawa ji holê radikin? Ji ber nêzîkatiyên hevsengî û Rêbertî jî ev e. Vana ji ber xwe ve pêş nakevin, şerê mirin û mayînê ye. Ji bo ku em çareseriyê ji cînseltiya çors re bibînin hûn dizanin ez xwe dixim çi halî? Hinek ji we dê bêjin; "*me tengezar dike.*" Lê ez çil û pêncsaliya xwe derbas dikim, hûn hîn di 20 saliya xwe de ne. De îca mesele ne ya temene jî. Em bi pirsgirêkeke mezin, bi berxwedêriyeke bi şermê dagirtî û heta qirika xwe hatiye girêdan, bi kesayet û pêwendiyeke wisa re mijûl dibin. Heta ev neyê dîtin, neyê çareserkirin dikare qala kîja jinîtî û zilamtiyê bê kirin? Di vê rewşê de xwe zilam dîtin ma ne tiştekî divê ku jê bê şermkirine? Hem jin-zilam wisa

ye, hem gelê te wisa ye û bi kîja rûyî zilamtî û pîrektî dikare bê qebûlkirin? Dema ku em wisa jî difikirin em civakê ber bi "*Felaketê"* ve dibin, wisa dibêjin! Jiyana ciwanên weke we jî maf dibe! Yê din di holê de ye. Hevdû bigirin û birevînin, hûn dikarin biçin kîderê? Bizewicin jî, ji hefteyekê zêdetir dikare girêdan û bi hev re jiyankirineke we bibe? Tabî bi mercê nebin cerdevan. Ji cerdevanan re jina duwem û sêyem jî tînin! Divê ku hûn texmîn bikin li ser esasê xwe sipartina çi tînin; berdêla wê hîn zêde dibe ketina nava xiyanetê.

12'ê Îlonê cînseltî çawa pêşxist û faşîzm li ser vê çawa bilind bû, hat dîtin. Bilindbûna faşîzmê, anîna sê-çar jina ya cerdevana, xweşike? Li gorî Selîm dibe asta jiyaneke pir pêşketî ev! Ma li gorî provakatora serkeftina evînê ne ev e?

***Ab.:*** Êrîşî nirxan dike, hem jî pir zêde êrîş dike.

***---.:*** Bi vî rengî ji min rizgarbûnê jî bi "*serkeftina evînê"* re wekhev dike. Li vir wê toleke mezin jî bê sitendin. Yanî ya ku çavên min nedîtiye yan jî di hemû jiyana min, ya ku temenê min jî têrê neke, hema her tiştî, piştî hezar salan jî biryardariya tola xwe girtinê heye, piştî hezar salî jî. Ya ku divê hestê şoreşgerekî dorpêç bike vaye mezinbûneke wisa ye. Binêrin ez eşkere dibêjim, em li gel we pêwendiyeke xweşik ava bikin û lê binêrin. Tenê bila xiyanet li welat neke, tenê bila rêxistinê nefetisîne, ya din jî xweşbûna rûbirûyê hev ne hefteyekê, di temenekî de bi cîh bike. Ez ê ji yê ku vê hêzê raber bikê re bêjim; "*Bravo"* û ji evîna wî/ê re jî li çepika bidim. Xwe wisa pêbigihînin; pêwendiyên herî xweşik ê welatê azad, gel, mirovê azad, pêwendiya azad û ya herî xweşik pêş bixin. Xwestina vê tê wateya bê derfet xwestinê? Belê, ez ev im, bila ti kes ji bilî vê tiştekî din ji min nexwaze. Ger hûn ji vê re hene, hêza we têr dike, bila keç jî werin, xort jî, ez ê eleqeyeke mezin nîşan bidim. Hûn dibînin ez di xizmeta we de me. Ger hûn ji vê re nînin tiştekî din jî ji min nexwazin. Biçin bila KT bide we, Elman bidin.

Ez ê wê demê bêjim bila Elmanya wê "*evîne*" bi de we. Cihê wan xweşike, keçên wan hatin, dizanin, bila li wir weke ku dixwazin bijîn. Ez li beramberî vê li ber xwe didim, ez ji jiyaneke wisa re nînim. Lanetê lê tînim. Wisa min bi jinekê ve girêdan ez bawerim îşkenceya herî mezin li min kirine. Lê li gorî wan jî hedefa herî mezin. Ferq pir diyare.

Ev hemû ferqê pir baş datînin holê. Dibe ku serê we tevlîhev dibe, ya rast ew, provakator tevlîhev dikin. Dibe ku ez weke tê xwestin nikarim azadiyê ji we re rave bikim, lê li gorî min hinekî jî wisa serê wê diyar dibe. Ez jî bi polîtîkayên xwe ve girêdayî me, ew çawa ku bi ferdiyetê, ewqasî bi cîmseltiya çors, polîtîkayên malbatgeriyê ferz dikin, ez jî ewqasî dibêjim cînseltiya ku azad bûye, bi welat ve hatiye girêdan, rêxistinê, xweşikiyê ve girêdayî. Yê ku ji xwe bawerin bila derkevin. Ez dibêjim exlaqê herî mezin jî ev e. Bi qasî dikare bila xwe ji vê rizgar bike, ji yê wisa re ez heta dawî heme, ma ez ê ji van kevneşopên ketî bitirsim? Ma ez ê ji jina wisa, ya ku meylên wê ya azadiyê û azweriyên wê bitirsin û astengiyê ava bikim? Na, têrbûneke bi şeref; ji ber ku azadiya wan dê min ber bi fetihkirinê ve bibe. Ez di vê mijarê de bi pîvanim, tenê ne di gotin de. Tê gotina xwe bêjî, lê dema ku te derfet jî dît tê dijminatiya herî xirab ya rêxistinê, pêwendiya girêdanê, tasfiyegeriyê ferz bikî; ev tam jî fikrê wan e! Dubare dibêjim, ev bi rêxistin û çalakiyê gengaz dibe, di mijara jinê de jî perwerde, rêxistin û bi şer gengaze. Pêwendiya amade di nava rêxistinê de nabe. Eleqeya ku ez ji jinê re nîşan didim, perwerde, rêxistin û di asta şerkeriyê de tu dikarî bipejirîne. Jin û bi heman şêwazî zilam neçarin vê bibînin. Pêwendiya amade ya kî ye? Encama kîja kedê ye, hedefa xwe çiye? Bê fêmkirina vê ma pêwendî dibe? Pêwîste di vê mijarê de em di nava şerekî bê aman de bin.

Di vê mijarê de hinekî li beramberî ezmûna min eleqe nîşan bidin, eşkereye ku ji encamên mezin re rê vekiriye. Zilamê ku

dixwestin bi jinekê bidin fetisandin, çawa bi hezaran mêrxasin jin derxist holê û keçeke PKK'ê ya herî ji rêzê ji hezarê van ji hemû aliyan ve çawa hêja bû? Ji aliyê pêwendiyên wê ve bi mirov, bi jiyanê re, wêrekî, fedakarî û ji gelek aliyên din ve bi vî rengî ye. Lê min ev, li ser esasê pêwendiya fetisînê ya ku dijmin ferz dikir derxist. Lê ger weke we nêzîkatî bê kirin dê bê provakasyonê, bê linavbirin, li nav biçe. Tabî hûn dibînin, min jî tola xwe girt. Ji hemû kesên ku li Kurdistanê malbatgerî ferz dikirin; ji dayika xwe, ji birayê xwe jî, ji jinê jî wisa tolê digirim. Ji hemû ferasetên ku bêrêxistiniyê li ser Kurdistanê ferz dikin, yên ku bi şêwazê herî xirab ferd tînin ber fetisînê, bi afirandina derfetên rêxistineke mezin, derfeta azadiyê û şer tola xwe digirim. Bi heman şêwazî yên ku niha di rewşa revê de ne, yên ku nikarin derkevin nava gel û civakê kîne; ev jî diyarin. Kî di welatê xwe de bi bandore, ji bo jinê û gel xwedî îtîbarê ye; ev jî di holê de ye. Divê ku bê fêmkirin û pêwîstiyên wê bên pêkanîn.

Ez vê dibêjim: Divê bi hezaran hezkiriyê jinekê hebe, tenê ne mêrekî wê.

Divê ku ew di nava gel de bibe çavkaniya evîn û wêrekiyê. Ev jî gengaze.

Divê jinek beriya mêrekî, hevserekî, bikare bibe remza welatê xwe.

Divê ku bibe îfadeya azadiya hemû zilamtiyan, li beramberî newekheviya civaka zilam, li beramaberî bê watekirina jiyanê bibe îfadeya jiyanê.

Ev şayanî jinê dîtin ne gunehe jî, ne xirabiye jî; berevajî, ya herî xweşike. Ji vê re derfet heye, ev derfet hatiye afirandin. Jin mirove û ev jî, tê wateya ku jin ji zilam zêdetir çavkaniya hêze. Ez ji vê bawer nakim ku mahkûmkirina jinê tiştekî xwezayî û bê qebûlkirine. Dibe ku ya zilam sînordar be. Ev hatiye lêkolînkirin. Zetx û newekhevî civakî ye. Nemaze divê heta dawî bê azadkirin, dibe ku wê demê jiyan watedar bibe. Niha ya girîng wisa cewherî

û têkoşerî nêzîkbûn raberkirine. Me karî em hinekî bikin. Weke ku min got, ji hinek aliyan ve bi rastî jî ez weke we ne bi hêzim. Lê di çarçoveya hemû taybetmendiyên hesab-kîtabê wan tê zanîn de, hêza min têrê dike ku wisa bimeşînim. Niha hûn zêde ji taqet neketine, ne westiya ne. Hûn jî di nava Partiyê de, ji derveyî Partiyê, di asta hestan dê bê ku jibîr bikin dijminê we heye, hêza xwe û mirovbûna xwe heta dawî bikar bînin û bizanibin bixin tevgerê. Teqez dijminên we yên ku hûn tola xwe jê rakin hene, vana baş bibînin û xwe eyar bikin.

Dijminê yekser di eniyê de, ji sedî pênce. Despêkê yê ku cîhana we ya hundirîn reş dike, meşa we ya azadiyê asteng dike çiqas dijminê we hene, wan bibînin. Hûn ji mirovbûnê derketine, ez jî ewqas xizmet dikim. Hûn nikarin li bermaberî min bi seknek rêzdar û bên hezkirin raber bikin? Tevî ewqas rexneyî jî, ez çawa xwe bi we didim hezkirin? Zilamekî weke min fediyok ê ku kesî bi asanî qebûl nedikir, çawa dikarî wisa bikeve dilê gel? Divê ku hûn zêdetir bikevinê. Yekî weke min bi zorê xwe dida jiyankirin, dikare xwe bîne vê rewşê; min hêza Partiyê xist emrê we, ewqas hêza çareseriyê û derfet dan, çima hûn nikarin bi kesekî, komîteyekê jî xwe bidin qebûlkirin, hûn ê nikaribin taximekî gêrîla jî bi moral bimeşînin? Weke me di tariya şevê de, di rêyên bi sitirî, piştî ku me girêdana mezin, azweriya mezin afirand û şûn de, hûn ê çima nikaribin ya amade bigirin? Na, dê xira bike. Ma hûn xira nekin li ser esasê xiyaneta berê nabe? Ma ev jî ne dijminatiyeke? Hûn ê van hemûyan fêm bikin. Teqez ev ne çarenûsin; bê anoriyên ku bi ti awayî neyên qebûlkirin û we şayanî xwe ditîne.

Hûn ê çawa nebin çavakaniya morala taximekî? Ez ê çawa asta ji rêzê ya komeke heval asayî bibînim, yan jî têr bibînim? Hûn dibînin, di rewşa heyî de ez jî ewqas lêhûrbûn dikim, bi şêwazekî herî biçûk jî nabêjim; "*Ji rêzê dimînim, nabim hêza çareseriyê.*" Ji ber ku şoreşgerek bi asanî vê şayanî xwe nabîne, nikare bibîne

jî. Heta ku henasa min qut bibe, çogê min bişkên ez ê bi hemû hêza xwe ve bimeşînim. Mêrxasî ev e. Başe, we heta niha çawa bir? We hêza xwe ji kê re, çawa û çiqas bikar anî? Li gorî we mirov pir bê hêze? Na. Min ji we re got teknîka herî mezine. Sînorê karanîna mejî nîne, sînorê meşandina dil nîne. Şêwaz û tempoyê wê jî tê bibîne. Di serî de dema ku te derfetekî sînordar dayê, yê din jî ji min dipirse. Tê mezin bibe û bimeşe. Tu hezkirinê dixwaze, hestan dixwaze, nizanim cînseltiyê dixwaze. Qanûnê van heye, feraseta hezkirinê ya şoreşê heye. Vana em fetisandine, hem jî bi dîroka xwe ve, huner, çanda xwe ve, mirov û mirovatî fetisandine. Mesele tenê ne jiyankirin ango nejiyankirina cînseltiya çorse, hemû taybetmendiyên devjêneger ên jiyanê hatine fetisandin. Heta ku vana neyên dîtin, bibîne bi ruhê tolgirtinê ser tiştên ku dijmin kirine de neçe ma şer tê dayîn, hestê pêş bikevin, mejî yê kar bike?

Heta niha we çima xwe pênegihandine ez ecêb dibînim. Yekî weke min reben, bi alîkariya dest di tarîtiyê de xwe gihand vî astî, piştî ku kesekî wiha pêgihîşt û ewqas ezmûnên xwe bi partiyeke mezin, derfetên şer li pêşiya xwe radixe, ger hûn hêjî nizanibin pêş kevin, ya rast ji bo min mijara hêrseke mezine û bi rastî jî rewşeke ketina bin erdê ye.

Namûs mijarake ji rêzê ye? Jiyan meseleyeke ji rêzê ye? Dijminê bê sînor vana bîne serê te, tê nikaribe navê wî jî bîne ser ziman, ma tê qet hesabê yê hatine kirin nepirse; wê demê tê çawa bêje; “*ez mêrxasim?”* Mafê te yê jiyanê dikare hebe? Li gorî min nabe û di vê mijarê de ji ber ku ez xwe naxapînim, dizanim divê çawa bê jiyîn, jiyan li mirov tê, ez dizanim ez ê wê jî çawa bidest bixim. Ji ber ku van pirsan hinekî bi rastî pirs dikim û bersivê wan jî pêş dixim, min hinekî kariye xwe bidim qebûlkirin û kariye bibim hêz. Wekî din em nikarin ji xwe re bêjin mirov. Pariyê ku em dixwun dê di gewriya me re derbas nebe, kêmekî be jî em ê nikaribin rehet razên.

Qanûna civakê li cihekî ewqas bê ferzkirin û ger tu jî her tiştî qebûl bikî, tu lanetkiriye! Jixwe ji bo wê hemû heqaret li ser te hatine ferzkirin. Hesteke girîngî didimê jî, hesta şerefê ye. Ger ewqas bêşerefî bê qebûlkirin, wê hemû curê fikir-zikrê wê jî hebe û pişt re wê rabe bêje; "*ez jiyan dikim.*" Ez vê weke bêşerefiya herî mezin dibînim. Bi vî rengî jiyankirinê mirov dibe Mecnûn, har yan jî dîn û ji ya wisa re jî nayê gotin jiyan. Hûn min zanin, ya ku min dide jiyîn çiye? Ev têkoşîn hinekî li gorî min serkeftî dibe û ez coşa xwe ya jiyanê ji vir digirim. Hinekî sînordare, lê dîsa jî difikirim çalakiyeke bi qasî min bide jiyîne. Hûn dizanin min çima ev çalakiya mezin pêk anî? Ez jî hinekî xwedî kêfême. Ji bo kêfa xwe bînim cî. Ev kêfa yên ku bi min hatine kirin dayînê ye, kefa ewqas tiştên ku ji min re rewa hatine dîtin bê bersiv nehiştinê ye û kêfa min ev e. Ji bilî vê qala ti kêfên din nikare bê kirin. Kêf azadiye.

Hûn nizanin rast jî jiyan bikin. Ez vana dikarim bi dehan berg pirtûk jî pêşkeş bikim. Wêjeya vê, hunera wê jî dikarim pir baş pêş bixim. Lê bese û cewher diyare. Teqez pêwîste hûn di vê mijarê de di asta rêzgirtinê de bin. Ji pêwendiya Kurdan, sosyalîzm û mijarên demokrasiyê re pêwîste hinekî be jî hêza we têrê bike. Divê ku hûn bizanibin bi rêgezekê ve bên girêdan û divê teqez rêgez jî neyê binpêkirin. Ez bawerim di vî temenî de, bi vê rewşa xwe ya zêde ne westiyayî hûn ê bikin, ji bo vê bi rastî jî ew taybetmendiyên ku me jimartin bi we re hene. Wan taybetmendiyan hinekî şayanî xwe bibînin. Nebêjin; "*şêwazê min, taybetmendiyên min ên gunditiyê, taybetmendiyên min ên xirabkar.*" Vana biqetînin û bavêjin. Ev taybetmendiyên ku me derxistine holê fêmkirin zehmete? Li gorî min ne zore. Bê çareyekî weke min çawa xwe mezin kir? Çawa xwe gihand asteke wisa awarte, karî bibe çavkaniya azadî û otoriteyeke wisa? Divê ku hûn daxwaz û bijareyên xwe li gorî vê çêkin. Li gorî min ya herî zehmet jiyana ku we şayanî xwe dîtiye. Hûn mîna avê xilas

dikin. Heysiyeta mezin, jiyana ku ez dişopînime. Ji ber ku di jiyana ku ez dişopînim de hemû pêdiviyên we yên jiyanê hene; hêz heye, azwerî heye, kelecan heye, zemînê serkeftin û azadiyê heye. Ez jiyana darayî jî ji jiyanê hesab nakim. Di ya din de hev reşkirin heye, hêsrê çavan heye, bêçaretî heye; ma ya zehmet jî ne ev e? Ez bawer dikim ku hûn ê êdî hinekî vê jiyanê fêm bikin.

Şoreş û jiyana şoreşgerî çiye?

Ji zarokî heta temenên pêş jiyana koletî ku hatiye pêşxistin û girêdana vê çiye? Îsyan, rêxistin, Rêbertî çiye? Jiyana herî lanetkirî û ya hêjayî jiyankirinê çiye? Di nava van hemû têgehan de pêwendiya heyî divê hûn bibînin. Min hinekî hewl da jiyana xwe çareser bikim. Ger pêwîst bike dikarim zêdetir jî vekim, ez xwe ji vê paş nadim. Berevajî ya şerme ne vekirineke wisa ye, ser girtine. Divê ku bi şêwazekî awarte xwe vekin. Bi şêwazekî awarte bidin diyarkirin ku em xwedî sozê xwe ne, awarte vekirîbûnê bidomînin. Gotin û cewher teqez divê hev bigire û ya din jî divê em di hêza serxistinê de bin. Ji bo min yên ku nikarin ser bixin, ji derewker, saxtekar û bêhêzan xirabtirin. Bila di meşa we de teqez derfeta serkeftinê hebe, di jiyaneke fetih nake de hûn pênc filiskan nakin. Û mêrxasî, ya ku şayanî mirove, di van mercan de girêdan bi rêgezên jiyana ku em pêş dibînin pêwîst dike. Bi rastî ji ber ku bi şêwazekî awarte nirx ji we re tê dayîn, li pênavê van rêgezan, ewqas şer hatiye dayîn. Ji ber ku hûn ketibûn. Îca jin bêtir ketibûn. Lê ewqas rêza me ji jiyanê re heye ku, me wan hinekî gihand asta çekdarî û rêxistineke wisa. Ji bo vê jî me hemû behremendiyên wan derxist holê, seferber kir, wan gihand asta çekeke bi hêz. Mirovê wisa derxistina holê, rêzdariya herî mezin bi xwe ya li beramberî jiyanê ye. Dîqat bikin, niha hûn di rewşa hêzekî de ne. Hûn ê ji vê bi anûr bin, ji ber ku hûn çekdarin û ev jî wesîleya anûreke mezine. Ji ber ku yên çeka xwe nîne, rêxistina xwe nîne li beramberî dijmin ne gengaze ku bibe xwedî sekneke bi anûr jî. Disa, yên ku zimanê wan nîne jî wisa.

Di van hemûyan de îca pêşketin jî hebe, ev rêzdariya me ya ji we re îfade dike. Rêzdariyek din, gotinên girêdanê bê nirxin. Ez bi qasî ku mirovan bi hêz bikim, rêxistin bikim û bidim şerkirin dikarim rêzdariya xwe li beramberî wan îspat bikim. Beramberî vê jî, li beramberî vê keda min a îfadeya rêzdariyê ye hîn zêde xwe rêxistinkirin, dayîna şerkirin û li ser vî esasî rêzdariyek bi jiyanê dayîna qezenckirine. Ger min jiyana xwe li ser vî esasî bi rêgez û gihandiye tempoya serkeftinê û ev jî îspat kiriye girêdayî me, bi hezkirin, rêzdarî, azwerî û hestan ve dagirtîme. Dîsa bersiva ku ji vê re bê dayîn bi heman şêwazî jiyan kêlî bi kêlî bi wateyeke wisa dagirtin û divê her gavên xwe bigihîne asta bilindkirina serkeftinê. Girêdan, nirxdayîn encax bi vî şêwazî watedare. Rêxistina berçav a rêz û girêdan û îspatkirinê jî encax wisa dibe. Ev, nêzîkatiya herî zêde nirx dide mirove. Nebesiyên me jî hebin, heta niha wisa jiyankirina me teqeze.

Hîn doh faşîzmê ev jiyana ku hûn raber dikin bi qîr û werên mezin ve, di navenda Enqerê de, di biryargehên Kemalîzmê de ji bo ku bifetisîne sond xwar. Hertim vê destnîşan dikin; min weke çavkaniya hemû xeteriyên arasteyî wan bûye dibînin. Weke xeleka dawî ya çanda Osmaniyan, hemû despotizma ku wan ferz kiriye û dîsa di dîroka KT'yê de yê ku herî dawî li dijî rawestin dîtina min, ya rast ji bo min heta pileya dawî serbilindiye. Ewqas bûyîna hedefa faşîzmê, heta niha ya ku min kirî despêkek bû, bêguman ez ê ji niha û şûn de baştir bikim. Soza min jî heye. Ji mezin jiyankirinê re jî rêza min heye, baweriya min heye ku hûn ê pê ve girêdayî jî bimînin. Dîsa ger îro faşîzm di nava tirsê de ye, diheje; em ê ji bo darbeya kuştinê lêdanê jî mezin ser de biçin. Hûn hinekî bê amadekarî ne. Me despêkê hesabê xwe hinekî baş kir, em baş ser de çûn. Bê derfetî pir mezin bûn, lê tevî vê jî me hûn gihandin vê rojê. Dîqat bikin, heta roja îro kesî ji we di dervî giraniyên xwe tiştekî din feda nekir; yê ku sivik dike, bi çek dike em in. Lê tevî vê jî rojane em bi dijminê xwe re jî mijûl dibin. Ger

heye hêza we, li ser vî esasî pêwîste hûn jî tevlî bibin, hûn ciwanin, pêwîste hûn ji xwe bawer bin. Divê azweriya we bê dawî ya serxistinê hebe. Divê hûn sebrê, înadê, gavavêtin û meşê weke pêwîstiya vî karî fêm bikin. Ez dibêjim bi qasî ku em di rêya rast de ne, di rewşa herî zêde nêzîkî serkeftinê de ne jî.

Di vê dewrê de, tenê ne ji aliyê hemû PKK'ê ve, heta ji aliyê hemû şoreşgeran ve di mijara serkeftinê de niha ji her demê zêdetir bi îdîa bûna me hatiye îspatkirin. Lê ji bo ku ev îdîa ber bi serkeftinê we biçe, bi vê çarçoveya ku me da diyarkirin ve girêdayî ye. Ji ber vê, seranser mayîn, ji şoreşê re hêz ne anîn, wasat mayîn, ji serkeftinê re hêz ne anîn, dibin aliyên me yên pêwîste em jê hers bibin, demêkê zûtir xwe jê rizgar bikin û weke aliyên xwe yên lanetkirî bermahiyên pergalê bibînin. Ji bo vê, fetha jiyanê hem nêzîke, hem jî roj bi roj em jê dikin û digirin. Ev mezin dike, awarte dike û ber bi fetihkirinê ve dibe.

Ez tenê me, min wisa xwe girt û pêgihand. Em îro weke artêşeke mîlyona ne. Çima em fetih nekin? Hûn hêzeke rêxistinê ya mîna dêwa ne, bi vesazkirineke rast û şêwazê lêdanê çima hûn fetih nekin? Gêrîlayê ku ewqas çiya dagirtine, ger li gorî qûralan xwe rast bidê, tê wateya ku ji niha ve serkeftin hatiye destxistin. Ya ku bê kirin, vesaziyeke ji rêzê ye, hukumkirina qûral û qaydeyan û xwedî li peywiran derketine. Pir zehmet jî nîne. Ya zehmet, ji niha û şûn de hemû tişte. Bawerim ku, hûn ê li ser vî esasî hem xwe tahlîl bikin, hem jî weke asta biryadariyê û ya din jî gav bi gav bi hêza rûnişkandina kesayetiya xwe ve xwe amade bikin. Dibe ku peywirên cur bi cur derkevin pêşiya we. Bersiva ku hûn ji hemûyan re bidin, divê ku di şêwaza serketinê gengaz dike de be. Heta niha ne ji bo xwe, qet nebe piştî ewqas şehadetan bi taybetî jî ji aliyê faşîzmê ve ew durişma ku pêşxistiye û dibêje; "*ez ê ava kîbrîtê li koka wan bikim*" di demeke wiha de, em ê çawa ser bixin hûn neçarin bi awayekî serkeftî diyar bikin de em xwe hîs dikin.

Divê hûn di heyecan, azwerî û meşa dijwar xwe bardikê de bin. Dipirsim, şansê serkeftineke ji vê şanaztir dikare bibe? Yên ku vîna wisa tevlîbûna şer nîşan dide, yên ku wisa xwe fedekar tevlî dike, yê ku wêrekiyeke wisa raber dike, meşeke cudatir dikare jê bê hêvîkirin? Piştî ku bi şêwazekî wisa ketina nava vê meşê çêbû ji serkeftinê cudatir dikare tiştekî din bê pejirandin? Ji bo wê pir zêde destnîşan dikim; helwest û tevgerînên sankî em mahkûmî binketinê ne kêm nabin. Ev, ferzkirinên dijminin. Jixwe her roj dubare dikin; " *hûn mahkûmî binketinê, radestî yê, mirinê ne"* ev durişma dijmine. Tenê bi carekê anîna ziman ve jî sînordar namînin, ez ê heta dawî jî bi ceribînim: "*em mahkûmî jiyankirinê ne"* Vê esas bigirin, binêrin çawa jiyan tê fetihkirin. Binêrin ew dijminê ketî, ev şerê lanetkirî yê ku êdî bi ti biyaniyê nikare bimeşîne, dê çawa bikeve rewşa ku li beramberî me nikare ber xwe bide, nikare xwe li ser piyan bigire.

Çi ji bo vê dewrê, çi jî ji bo hemû partiya me, artêş û şoreşgeran re, weke ku di dema despêkirinê de min diyar kir, di dîmen de ya ku bilind dibe weke faşîzm bê dîtin jî, ya rast a ku bilind dibe encama şoreşa me ye. Şoreşeke bilind dibe heye, ya ku li beramberî wê jî pêş bikeve bêguman dê faşîzm be. Ya tê hilweşîn û divê bê hilweşandin jî ew e.

Li gorî min hêza we ya çareseriyê ji ya tê payîn zêdetir heye. Em di asta ku dixwazin de dikarin mirovatiyê tahlîl bikin û pêş bixin. Lê ev tenê bi min nabe. Divê ku hûn xwe hîn bi îdîa û serkeftinê erkdar bikin. Heta niha serkeftinên we yên mezin nînin. Dinêrim, hûn ne ber bi serkeftinên mezin çûyînê, nexweşiya bi serkeftinê biçûk xwe têr dîtinê şayanî xwe dibînin. Pêwîste qet wisa nebe. Vê, ji bo bîranîna ewqas şehîdan dibêjim. PKK ji ber nebesî û bê derfetiyan nikare bibe tevgereke wisa ji rêzê winda dike. Berxwedanî jî heye, mêrxasiyên pir mezin jî derdikevin holê. Em ji Mazlûman bigirin heta Egîdan hemû şehîdên qonaxên herî zehmetin. Em dikarin wate bidin wan, lê di rêya rast de

qulupandin jî nayê pejirandin. Piraniya wan wisa winda dikin. Ev, nabe aqûbeta we û divê nebe jî.

Di gêrîlayê dema nû de ya ku pir zêde tê dîtin, hema bêje weke fêrbûnekê, weke qûralekî -ev bi dijmin ve girêdayî ye, ji awatên wî re bûyîna bersive, ji bendewariyên wî re rê vekirine- dibêjim ku yên tên ferzkirin divê em paqij bikin, ji holê rakin. Îfadeya herî cewherî ya vê şoreşê ev e. Çi tiştên wisa me ji rêzê dihêle, ser naxe, weke ku dikare bi vê pergalê re bê jiyîn mahkûm dike çi hene; li ser navê rêveberiyê, li ser navê zemîna kî, li kîderê çi dibêje, xeletiyan divê ku em bi erdê re bikin yek. Yên ku ewqas xwe tevlî şoreşê dikin, tevlî Partiyê dikin jî, ji esasgirtina serkeftineke wisa, pir alî mezinbûnê û di emcam de serwerkirina fetihkirinê zêdetir ti tempo û şêwaz lê nayê. Bawerim ku, dê ji niha û şûn de meş li ser vî esasî be, dive hûn hemû vî bingehî şayanî xwe bibînin.

Jixwe bidin despêkirin, pêl bi pêl ber bi hemû gel ve veguhezin. Ya ku şayane şoreş û serkeftine, weke ku ya şayane ev e, ya ku bê jiyîn jî ev e. Ger dê bi hevaltî girêdaneke we bi min ve hebe, bi şerekî wisa demdirêj û serfiraziyê ve gengaze. Çawa ku me zanîn em ji bo we demdirêj bijîn, me ewqas pêşketin dan ber çav, qet nebe hûn jî ji bo demdirêj xwe dayîna jiyankirin û bi dayîna şerê vê re teqez divê ber bi serkeftinê ve bibin.

**10 Cotmeh 1994**

# Di Nava Pergala Ku Asta Azadiyê û Pêwendiyên Ajo Tê De Pêş Dikevin De Em Nikarin Xwe Bigihînin Hezkirinê

Xebatên jinê yên ku ez pir li ser radiwestim, ger rast bên vesazkirin û xeta hatiye diyarkirin esas bê girtin, encamên wê dikare şoreşa me mezin bandor bike. Em di nava pergalê û fermiyetê de gelek zehmetiyan jiyan dikin. Bi keçan re civîna xwe ya yekem me li Dêrsimê li dar xist?

***Fu.:*** Raste Serokê min.

**---.:** Ew roj tên bîra te?

***Fu.:*** Raste Serokê min. Rojeke wisa ya zivistanê bû.

**---.:** Keçên pir zindî bûn. Lê dawiya wê ne anîn. Em ji wan roja hatine van rojan; rêya ku hatiye girtin ne asane. Niha em derbasî cewher bibin; dema ku em xwe tathlîl dikin, rastiya jinê û di derbarê veguhertina wê de me xwest em nêzîkatiyeke bingehî, bi îdîa û xweser raber bikin. Ji despêkê ve xala ku ez dîqat dikim, xwezaya mirov ronîkirin û ger gengaz be di hemû dîroka civakê de durûtiya ku hatiye ferzkirin, neyênî ji hemû aliyan ve teşîrkirin û li ser vî esasî rêya ku hatiye vekirin, bi vî rengî hinekî din wate bi azadiyê dayîna qezenckirin bû. Min şêwaza mezinbûn û pêgihandina xwe gelekî vekir û ji bo ku vê jî di hemû pêwendiyên xwe yên bi mirovan re biteyisînin kedek taybet raber kir. Li gorî min pêwendiya herî qirêj, dûrû, pêwendiyeke mirov biçûk xistiye de jî vaye pêwendiya jin-mêr bû. Di vê mijarê de jî ji bo ku nekevin nava durûtî, qirêjiyê jî ji bo ku xwe weke firîşteyekî saf bigrim jî min helw da. Û hem bawer dikim, hem jî dizanim di vê

mijarê de îradeya ku min li ser xwe serwer kiriye û pêşketinên ku min afirandine, yek ji aliyên pêşketina herî girîng a şoreşê ava dike. Durû nebûn, ketî nebûn û xwezayî bûn pir girînge. Em nîqaşên kûr dimeşînin û we dît îro hema bêje li beramberî kesayetiya bi kêmasî û dide windakirin em ketin êrîşê. Yanî ger xwe kontrol nekim, bi rastî jî ez ê hevsengiya xwe ji dest bidim. Di dema ku em pêşketin, mezinbûn, derfetên qezenckirinê bi afirandinê ferz dikin, hîn jî feraset û şêwazên ku me paşve dikişînin, didin windakirin re rû bi rûmayîn xwe nezanî bi me re hêrsê ava dike. Ev kêmasiyên ku li ser navê gelekî tên kirin ger neyên astengkirin, dê hemû navendên me vala derxe û teqez nebesiyên ku me heq nekirinê jî dê wê bela xwe ji me venekin. Ji ber vê sedemê eşkereye ku em pêwîstiya xwe parastinê dibînin.

Ji hêrsa hindik maye em xwe xilas bikin; kesayetiyên we didin îsyankirin û tabî em we tawanbar nakin. Ji ber şêwazê jiyan û mezinkirina we, hemû bêrîkirinên me yê watedar û şayanî me difetisînin. Ger hûn pêşketinên rojane bişopînin dê pir ecêb bibe. Teqez divê em hinekî bi encam bijîn. Teqez şansê xwe baş bikar bînin. Ev pêvajoyên ku min jiyankirin, bê ku ji girîngiya xwe ya dîrokî tiştekî ji dest bidin bandora xwe didomînin. Tengavî, seranserî û gêjîtiyê nekin û nedin binpêkirin. Ger na hûn ê derfeteke pir mezin ji dest bidin. Tevî hêrsên min ên mezin jî, ez heta pileya dawî li beramberî jiyanê bi çoşim û bi moralê xwe nalîzim, nadim lîstin jî.

Niha mijar bi nirxandinên dawî ve girêdayî û hinekî jî bi aliyên ku we eleqedar dike di berdewam kirinê de sûd heye. Min gelek pirs pirsîn, gelek serbend jî dan we, vegotina vê pêvajoya rastiya Rêbertiyê jî digire nava xwe pêwîste bi vekirin û tahlîlan temam bikim. Em ê li ser beşên çîrok ango romanê yên herî balkêş hinek lêhûrbûn bikin û bidomînin. Bi rastî jî min bi hemû aliyan ve xwe danî holê û bi vî şêwazî xwe danîn holê; min ji hemû rastiyên civakî-netewî yên ku hatine tepisandin, sergirtin, linavbirin ronî

kir. Di dubare rabûna jiyanê de wê lez bide, alîkarî pêşkêş bike, bi hêzbûna me hemûyan re, bi rastî jî di temamiya jiyana me de dibe ku bandora herî mezin nîşan bide min nêzîkatiyeke wisa raber kir. Cesaretkirina min jî pir girînge; ji ber ku kesayetiyên polîtîk, yên ku hîn jî asta wan a Rêbertiyê mijara gotinê ye, teqez bi asanî curet nakin wisa xwe deynin holê. Dibe ku mînakek din a weke şêwaza min nebe.

Hemû hêzên gel û heta hêzên pergalê jî di nav de herkes, nirxandin û guftûgoyên me bi eleqeyeke mezin dişopînin. Çend roj berê min li televîzyonê nerî, guftûgaoya ku me bi hevalê Z. Re kiriye "*Apo ditepisîne, ew jî biçûk dibe*" wisa didan. Bêguman tiştekî wisa nebû, tenê guftûgoyeke dihat pêşxistin bû. Lê dixwazin di amûrên medyayê de wisa nîşan bidin. Di mijara jinê de jî jêgiran dikin û pir balkêş dibînin. Qelemşorên wan ên herî bi bandor dixwazin werin û bi me re hevdîtin çêkin. Ji ber ku ez dibim çavkaniyeke sereke ya rayagiştî dixwaze gohdar bike. Jixwe hûn jî bi meraqin. Çima wisa me, bi çav û zimanê we dibê ez hîn çawa bim, nebesiya min di kîderê de ye, ji vê baştir min çawa dikarî bikim, ez çime, kîme, çawa wisa dibim û ez hîn çawa bijîm; ez dînekî wan erda me, yan arîf, yan jî fîlozof, yan jî kesekî di helwesta pêxemberan de me, yan jî zarokekî ji rêzê me, mirovekî xwezayî me? Pênaseyên wisa dikarin têrker û ronîbin nizanim, lê ez bawerim di şêwaza pênaseya min de divê encamek jî derbikeve holê. Ji ber ku em we hemûyan eleqeder dikin. Ez ticar naxwazim we aciz bikim, hêvîdarim ku hêza we ya jiyankirin û li berxwedayînê çêbibe. Bi me re bûyîna heval jî ne asane. Hûn bi xwestekin û divê ku mirov hêz bi vê bide qezenckirin; ji xwe arasteya keda me ya esasî jî ev e. Jin jî dikarin bi me re bibin heval. Em hevaltiya jinê çawa pêş bixin? Heta hinek caran ez ne ku vê pirsê jî ji xwe nakim, gelo di mijara hevaltiya bi jinê de ez kemasî dikim; difikirim gelo dikarin çi ji min bigirin. Hûn dizanin gelek zilam cuda nêzîk dibin. Ti car

şêwaza min neceribandine jî. Başe, çawa bû ku me xwe gihand vî halî?

Ger yên pirtûka bi navê; "*ayetên xwedê*" dizanin; di wir de dibêjin ez ji bo civak û jinê felaketan tînim.

***Fu.:*** Ji hevjîna xwe mînakan dide. Dibêje Medya hatibû kolekirin, bi veguherîna Aysel jî azad bû.

***---.:*** Li Aysela berê digere, Aysela KT'yê. Ji aliyekî ve jî dema ku bû Medya yan jî Kurdistanî çawa tine bû vedibêje. Kî bû Aysel; nû pêgêha Kemalîzmê, xala dawî ya bê esil, li dîrokê, axê xiyanet kiriye. Me hinekî ew kişand nava nêvenga têkoşîna germ; lê ew dibêje; "*Aysel qirêj kir.*" Derfet hebûya û me jî romana vana binivîsa. Bi taybetî jî di wan dibistanên mamosteyan de me hemû bê esil bûn ji hemû aliyan ve nîşanî wan bida. Xirabûneke mirov ya çawa bû, mîna giyayekê dihatin pêgihandin ji hemû aliyan ve me raber kiriba, mijara herî sereke ya wêje ev tîpin û asta vana ya eleqeyê, asta wan a jiyanê, azwerî, ajo, hezkirinên wan şîrovekirin û dibe karanîn jî di heman demê de. Ger dema min hebûya min dikarî bikira.

Ez niha van mijaran hinekî din bi wate dikarim bigrim dest. Me xwe gihand asta di kesekî de van hemû polîtîkayan derxistina holê. Asyelbûn cuda ye, Medyabûn cuda ye, ya rast mafdare. Di hundirê xwe de dema ku dibe Medya rûyê wê xira dibe, dev û lêvên wê zûwa dibin, azweriya wê ya jiyanê namîne, înkarger dibe, êrîşkar dibe, kîndar dibe, hema bêje diqerise. Em dev ji wê berdin; em jina ku mûxatabê min bû bînin berçavan. Jixwe îhaleya wan jî ev e. Pênaseya me ya pêwendiyê jî di vê arasteyê de pêş dikeve. Sermaya mar, ziwabûn, dema ku em rastiya Kurdistanê li ser ferz dikin êrîşkar, qerisîn, hemû diyardeyên jiyanê qerisandin. Tenê jahra neyêniyan reşandin daxistina asta tîpeke wisa û ya rast hemû nîşaneyên vê taybetmendiyê di mijarên cuda de nîşane û diyarî ne. Ya rast me tîplemeyeke mezin kiriye. Kurdistan di kesayeta van de tahlîlkirin çiqas bi wate dibe.

Ya ku li wir tê tahlîlkirin ne tîpeke, di heman demê de dîrokeke. Azadî û welat çiqas ji dest hatiye dayîn, jiyan çiqas hatiye kuştin! Ez jî bi halê xwe yê zaroktiyê difikirim; "*ka ev sosyalîst bû, şoreşger bû, ka wê biba welatparêz, çima wisa ye?"* Niha fêm dikim ku, diviya wisa ba. Ji wê jinê cuda bendewarî kirin dibû rastî xistina zehmetiyê û niha durûtiyan baştir fêm dikim. Ji rûyê we hemûyan êrênî yan jî neyênî çi diherike, hema wate didimê. Tiştekî xweşike. De îca bi vî rengî bi dijmin re hesab xwestin jiyankirin, bi sedan sal ên ku bi wêje hatine kirin di atmosfera germ ya têkoşînê de destxistin, bêrengbûna li ser rûyê wan, bê îdîa, êrîşkarî, rewşa xewar, belengaziya wan bi dijmin re dest girtin û dîsa vejîn bi diyardeyên jiyana gelekî ve girêdan, çiqas pêşketineke şikodare.

Hûn dizanin navê jinê di kurdî ne "*jin"* e, yanî "*jiyane!"* Û di jinê de çavdêrikirina jiyanê çiqas bi kelecane. Ew di asteke nêzîkî şêwazê min de meşandin, xebateke kelecaneke mezin dide. Nêzîkatiyên ji ketîbûna jinê re bûne amûr bi erdê re yek kirin û berevajî di nava helwestekî wekhev, ji azadiyê re nêzîk de mayîn, dîsa çiqas kelecan dide. Dema ku dibin otorîte xwe gihandina vî şêwazî çiqas girîng dibe hûn dibînin. Bê ku em ji vê belengaziya we, lewaziyên we re bibin amûr, têkel bibin rêya pêşketina ji we re vekirin ji çi re çiqas xizmet dike ne diyare. Li beramberî wan xwe ferzkirinên we yên hestên erzan rawestîn û hinekî mesafe bi we dayîna girtin, li şûna wan pêwendiyên pir zêde şerê wan tê kirin bê naverok zemînê hevaltiyên bi wate amadekirin, li gorî min pir girînge. Hûn çiqasî fêm dikin nizanim, lê ji bo min pêşxistina hevaltiyeke jinê meseleyeke anûrê ye. Her zilam, heta her mirovê mêrxas hinekî jî bi pêşketineke wisa re girêdaniya xwe heye. Çawa ku ketina bin erdê ya zilamekî bi pêwendiya jinê ve girêdayî ye, di heman demê de bi hêzbûna wî jî bi vê pêşketinê ve girêdayî ye. Ji ber ku min ev jiyan kir ez weke navê xwe dizanim. Ecêb! Divê çawabûna vê ji we bê pirsîn. We tiştek ji

min fêm kir? Ez bi çavê jinê kîme, çime? Ger di vê mijarê de rexnên we hebin ez heta dawî vekirîme, heta ji dil ji gohdarkirinê pêşniyarên we re jî heme.

Bi giştî jin ji min natirsin, heta ji demên berê de kesekî baweriya xwe bi min tînin. Jinên gundê me jî dema ji dibistanê vedigeriyam kesê despêkê rewşa wî dipirsîn ez bûm. Ji zilaman zêdetir wan bi eleqe ez pêşwazî dikirim. Bi wê rewşa xwe ya ne hişmend jî min jinên gund li derdora xwe kom dikir bi eleqeyeke mezin ez gohdar dikirim. Heta jinên ku navê wan xirab derketibûn jî dihatin ji nêz ve ez didîtim. Dibe ku taybetmendiyên min ên kesayetî, hîn wê demê henase bi wan dida girtin. Lê ez pir tirsonek bûm. Wê demê weke gelek zilaman dikir, "*ez vê keçê dixwazim, ji min re vê keçê bînin"* gotinên wisa min ticar negirt ser devê xwe. Girtina keçekê ji min re gotineke pir giran dihat. "*girtin"* peyveke di jiyana min de cihê wê nîne. Ez di vê peyvê de bêhêziyê dibînim. Di wê de mal, milk û bi vî rengî ji mirov re hekaretê dibînim. Li gorî min mirov hevdû nagirin, hevaltiyê dikin, ji hev re dimînin. Ez neketim wê xefkê, min pir şerm didît û jê direviyam. Divê ku hûn xwe jî li berçav derbas bikin hûn heta niha feraseta; "*em te bidin vî"* yan jî " *em ji te re bin"* li ser xwe digerînin? Ger hestên we vê qebûl dike, li gorî min hûn di nava kêmasiyeke mezin û cidî de ne û rû bi rûyî ji dest dayîna pir tiştane. Divê ku hûn têgehên wisa di kesayetiya xwe de biceribînin. Xwe tevlîkirin nêzîkatiyeke resenin. Hûn dibînin ji ber ku hemû zewac li ser esasê dayîn-girtinê xira dikim, bi hevrebûnan têk dibim.

Li gorî min ya ku divê bê kirin tevlîbûne, ne girtin û dayîne. Divê ku ez bê sînor tevlî we bibim û hûn jî bê sînor tevlî min bibin. Lê bi hemû xweşikiya xwe, bi hemû aliyên ku bên pejirandin ve. Li gorî min dema ku jiyan, rastiya jinê bû mijara gotinê, mêrxasî, xwe gihandina asta tevlîbûneke wisa ye. Li ser rastiya jinê xwe bê anûr, bê rêz, ne ji dil ferzkirin, ketîbûna bê

exlaqî ya herî mezine. Mezinbûn; bê ku tengav bike, xwezayî, heta dawî bi pîvan, pir baldarî, ti carî cih nade tengavkirin û lewaziya kesayet bi eleqeyeke wisa, di asta tevlîbûnê de bûyîne. Û ev jî erdema herî mezine. Heta niha jî pir zêde wê kesayeta bi erdem li ber çav digirim. Tu hevalên min nikarin ji mezinbûneke wisa bê par û hejar bihêle. Li beramberî jin, malbat û li beramberî rastiya civakî ya ku li ser wê teşe digire nebes, xapîner û ji bo nekeve pozîsyoneke wisa girîngiyê didimê. Cîhana we ji ya tê payîn zêdetir hatiye taxrîbkirin, lewaz hatiye hiştin. Dema ku wisa be jî kes pir tiştan ji dest dide. Lewaziyên we, hestên we yên erzan tên ferzkirin, heta li ser bedenên we kesayetiya ferzkirî, wê pir tiştan bi we jî û bi xwe jî bide windakirin. Divê ku ji vê re destûr neyê dayîn. Eşkereye ku divê şerê pêwendiyeke mezin a kesayetiyê bê dayîn. Lê çawa û li beramberî çi? Vaye vana pirsên sotîner û cidî divê ku teqez wate jê re bên dayînin.

Dîsa em bizîvirin min; ez di rêya rast de me? Herkes di nava meraqeke mezin de ye, dibêje; “*ez hîn çawa dikarim vê jiyanê bibim?”* Ez çarenûsa we hemûyan ji nêz ve diyar dikim. Divê em çawa bibin? Li ser navê me, yên ku bi we re çalakiyê dikin we pir tengav dikin, ji bo rêxistinê tengav dikin û divê ku mirov rê li vê bigire. Pêwîste bi keçan re jiyan bi girîngiyeke mezin bê pîlankirin. Me hinekî ast bi we da qezenckirin, divê ku hûn xwe nedin xistin. Ji aliyê rastiya we ve em dubare hinek xalan binîn ber çav. Me gavên dîrokî çawa avêtine û em çawa dikarin kûr bikin? Ez li beramberî we bijareyeke heta dawî nerm û xwezayî îfade dikim û divê mijarê de hem bi înadim, hem jî bi biryarim. Divê ku hûn bizanin ez ê hêza xwe jî bi hemû aliyan ve rast bikar bînim.

Di derbarê me de gelek kesên rexne dikin, pir zêde dinivîsin-xêz dikin hene, bi taybet eniya pergalê di nava êrîşeke mezin de ye. Şefên zanyarî wergirtinê û kopyanên wan ên di nava me de, pênc-deh pirtûk nivîsîn. Çiye, ez çawa nêzîkî jinan dibim! Belê,

tabî ez nêzîkî jinê dibim. Di nêzîkatiya ji jinê re ger ne yê herî demokratîkim yan jî ji aliyê jinê ve pir ne cewherîme, vaye vekiriye û li hizûra we dibêjim, bi mercên ku hûn dest navêjin dar çi tê devê we hûn dikarin bêjin. Dibe ku herkes zorê li ser we ferz bike, lê ez ticar ji we re bi zorê gotinekê jî nabêjim. Ji hemû ziraviyên nîqaşê re jî amademe. Lê tevî vê jî çima ewqas êrîş pêş dikevin, gelo çima hem ji ber jinê, hem jî ji ber zilam ewqas êrîşî min dikin? Bifikirin, jina reqem yek muxatabê min ev nêzîkatiya bê aman çawa ferz kir û ji aliyê jin jî zilamên komploger bê ku nêzîkî aliyekî herî biçûk yê erênî bibin ewqas êrîş dikin? Bawerim ku, yek ji wan ticarî we nêzîkî qada xwe ya hêzê nake, jiyana we heftekê ye. Dibe ku bi çavsorî evîndariya xwe rabigihîne, lê piştî demeke kurt teqez karê we xilas bûye. Ne ji evîn, ne jî ji rêzê wê tiştek nemîne. Ne fîzîka we bimîne, ne ruhê we, ne jî serwextbûna we. Lê tevî vê jî bi awayekî vekîrî ji êrîşkirina ser me jî şûnde namînin.

Ya rastî min girîngiyeke mezin nişan da ji bo ku ez bikaribim jinên herî mêrxas derxim holê. Teqez û yên xwe gihandina sînorê mêrxasiyê bi sedan mêrxasiyên jin ên bi vî rengî mijara gotinê ne. Bi hezaran ji we niha di nava meşa herî serbixwe de ne. Bedena we azade, ruhê we azad, serwextbûna we azade. Pêwendiya vê bi min re pir şênbere û tevî ku ewqas vekiriye jî, ev êrîş jî çine îca? Ev tenê ne dijmintiya mine, eşkereye ku dibe dijmintiya we jî. Yên ku fikrên ecêb tê aqlê wan hene? Ez ji yên we yên difikirin pirs dikim, cîhaneke we jî heye, li gorî we çi diqewime? Ez bawerim hûn bi meraq bûne?

Niha li vir yek ji xalên ku divê li ser bê rawestîn, fêmkirin, pirs û pirsgirêka divê di bingeh de nêzîkatiyeke çawa ji jiyanê re bê raberkirine. Bê ku tengav bibin em li beramberî nêvengeke azad ku dikarin her tiştê tê de bêjin re rû bi rûne. Nemaze ev civîna we bi şêwazê guftûgoyan em dikarin serkeftî derbas bikin. Ez di derbarê beşa herî girîng a çirokê û beşên ku pêwîste zêdetir bên

vekirin de pirsên we bigirim. Di nîqaşa wê rojê de pirsên piraniya we çêbûn. Li gorî min em dikarin dewam bikin.

***Se.:*** Serokê min, şêwaza jiyana ku me di rastiya xwe ya civakî de jiyan kiriye û ya hemû civak jiyan dike heye. Yanî şêwaza mezinkirina ji aliyê pergalê ye. Pergal bi hemû tiştên ku tên pêşiyê jiyan dike, bi fikra xwe ve weke ferdê ku yê jê re tê dayîn dijî amade dike. Lê Rêbertiya Partiyê di waneyên derbasbûyîn de danî pêşiya me. Di vê xalê de ferqeke mezin a ku ji aliyê rêbertiyê ve tê raberkirin heye. Rêbertiya partiyê nebûye kesekî yê tê pêşiyê jiyan bike û jiyana xwe cuda raber kiriye. Li gorî ku min fêm kiriye sebebên ji hemû civakî cuda jiyankirinê hene. Di vê xalê de nakokiyên ku bi me re heye difikirim hinekî din bê vekirin dê baş be.

***---.:*** Ya rastî azadî bijareyeke ji pergalê cuda jiyankirinê ye. Xwe gihandina vê ferqê, ber bi azadiyê ve gav avêtin, şansê pêşketinê ji re dayîne. Her tişta ku tê pêşiya te û ya tê dayîn tu jiyan bikî, tê weke pergalê bibe, yanî tê bê vesazkirin. Ya ku herî zêde tê pêşxistin, ji pergalê qutbûn pêkanîne û ev jî bûyera şoreşê ye. Her kesê ku tê pêşiya te tu pêre bikeve pêwendiyê, hema tu ji her tiştî te bêje; "*erê*" redkirina te nabe û bijareya te ya bi zanebûn pêşnekeve tu nikare xwe bigihîne yê cuda, tabî kî wê kesayeteke te ya dûz çêbibe. Û li gorî ku hezar û yek xefkên pergalê di dewrê de ne, çawa ku tu çavê xwe ji dinyê re vedike, venake eşkereye ku tê bikevî nava wan xefkan. Jixwe di pêwendiyên min ên jiyanê de ferqa heyî ez bawerim me bi şêwazekî baldar wisa dît. Ne weke ku hêzên pergalê dixwazin, min hertim gîrîngî da ku weke ez dixwazim be, min şer û mijûlbûna vê da. Ticar ev ber bi maceraperestiyekê û piştre jî bê ku bi awayekî xerî xirab xwe ber bi radestiya civakê ve bibim, bi nerîneke cîhanî, li beramberî hemû pergalê hêzeke bi pergala a rêxistinê, niha jî heta xwe veguherand hêzeke civakî û netewî jî berdewam kir.

Çîrok şênbere, bi rastî ger derfet hebûna ev jî ji aliyê hevalekî asta wî ya wêjeyî heyî bihatana sererastkirin dê baş ba. Dê pir baş fêrker ba. Serbenên vê hema dikarî bê veguhertina zimanekî wêjeyî, bi taybet jî rastiya me di serî de pêwîste ji xizmeta gelê me re bê pêşkeşkirin. Min di temenê biçûk de çawa ev dîtin û ferqa wê tahlîl kir. Ya rast ez hemû hêza xwe ji vê pêşketina tahlîlkirinê digirim. Hûn jî, berevajî, hevgirtina bi îmtîyaz jî di navê de ji xwe re li ser esasê berjewendiyê bi hemû hêza xwe ve berê xwe didin bi pergalê re hevgikirinê. Nemaze kesayetiyê we hîn jî ji me re bûyîna bar zêdetir ti wateyê îfade nakin. Ji ber ku hûn di ruhê vê pergalê de dijîn. Me hinekî hûn ji pergalê qutkirine, ji ber ku me hûn ji pergalê qutkirine hûn digirîn. Yanî piraniya we mîna masiyên ku ji avê derketîne. Yên ku wateyê didin ferqa azadiyê, dikarin pir tiştî ji me fêr bibin. Yên ku vê nabînin jî ew "*belayeke*" metirsîdarin. Teoriyên dîktatoriyê, telaltiya felaketê vala nayê kirin. Wekî din?

***Ca.:*** Serokê min, ya ku ez dibînim di navbera me û Rêbertiyê de ferqeke kûr jî; cesareta Rêbertiyê ya şêwaza jiyanê û çavtirsiya me ya li beramberî jiyanê ye. Rêbertî îsyana xwe ya yekem vegot û di vê îsyanê de jî wêrekiyeke mezin tê dîtin. Ya din jî tevî ku li beramberî jiyanê bê ezmûniyên mezin hene jî raberkirina ev cesareta mezin girînge. Lê bi me re berevajî ji ber ku li beramberî jiyanê ne diyarî hene heta dawî tirsonekî heye. Jixwe di xala azadiyê de ger em bixwazin Rêbertî fêm jî bikin pêkneanîna me hinekî jî çavkaniya xwe ji vê xalê digire. Piraniya xwe ya ku em encamên wan zanin, yan jî tiştên ku em dizanin dê çi bînin serê me natirsin bijareyên jiyanê dikin.

***---.:*** Em çi bikin, ger hûn metirsiyan dibihîzin dibê ku hûn sedemên wê ji xwe bipirsin. Ger hûn bi xwe re qiyas bikin hûn dikarin hemû bersivan bibînin. Tenê ew îsyaneke yekeme. De îca rewşa niha bibînin. Hûn çima mezin nabin hûn bi asanî bibînin. Bejinkurtiya we, behremendiyên we yên pêşnakevin, kesayetiya

ku rê ji pêşketinên mezin re venake; di bingeh de bi esas negirtina taybetmendiyên îsyangerekî, şoreşgerekî ve girêdayîne. Nemaze beriya her tiştî divê ku bi dilnizmî bizanibe xwe bigihîne ya sereke. Ya ku piraniya we dikin jî, bi şêwazên ku em jê re bibêjin hesabên burjuvaziya biçûk derdikeve holê. Divê ku hûn êdî bizanibin xwe bigihînin hêza jiyana şoreşgerî. Çîroka vê pir vekîrî hat destnîşankirin. Me tenê ji aliyê bîrdozî-teorîk ve venekir, dema ku me xwe danî holê, çi tişta ku bi kûrî mirovekî bandor bike heye ev di nava vekirîbûna romanekê de me weke rastiyekê derbasî pêşiya we kir. Ji hina şûn ve jî nakeve ser min, dikeve ser milê we. Belê, wekî din, em xalên girîngtir vekin. Li şûna gelemperî em şênber tiştên ku hatine jiyîn vekin.

***Be.:*** Serokê min, ya ku ez bi Rêbertiya Partiyê re dibînim pir zû dîtina azadiyê ye. Hîn di temenê biçûk de derketina çiyê li beramberî berveçûyîna civakê ya bajarvaniyê pêş dikeve, derketina çiya evîna Rêbertiyê ya li beramberî çiya datîne holê. Girêdana vê bi zekayê re çawa dikare bê dayîn?

***---.:*** Tabî pêwendiya di navbera çiya û azadiyê de pir girînge. Min pêwendiya di navbera azadî û di temenekî biçûk de ji mirov re ev destnîşan kir. Hema bêje ez ji cemaetên gund direvîm û heta niha jî wisa me. Ez naxwazim civînên wisa teng, zêde fêrker nînin gohdar jî bikim. Li beramberî yên watedar hestên min ên ecêb hebûn. Ez pir ji jiyana bi cewher hez dikim û dixwazim her kêliya xwe balkêş bikim. Binêrin, ewqasî şoqê li ser şoqê didim jiyankirin û heta niha jî jiyan bi xwe ji bo min ji rêzêbûnê pêk tê.

Bifikirin, wê demê çiqas bi tenê me. Ez bi ewqas mezinbûnan ve têr nabim, hûn çiqas dikarin bi tiştên biçûk, ji rêzê bilîzin. Azweriyên min ên mezin hene û zehmetiyên têrkirina min, ji ber ku di kesayetiya min de pir bi bandorin rewşeke derbasî lîteratora siyasî jî bûye; bi giştî yên tên min dibînin di nava matmayîbûneke mezin de dimînin. Ev ji salên despêka zarokatiya min de despê kir. Min taybetmendiyên pir ecêb raber dikir û mamosteyên min,

hema bêje li beramberî hemû mezinan li rewşeke bê dîqatkirin de bûm. Heta niha jî wisa me. Hûn dibînin, ez her roj bi we re di pêwendiyê de me. Lê ferq li ser ferqê, bandor li ser bandorê afirandin û jiyankirinê jî didomînim. Gelo ez çawa ewqas dikarim xwe bidim gohdarkirin? Bi giştî hûn keçik pir zêde ji pêwendiyên ahbab-çawîşiyê re dibin mijara gotinê. Lê niha asta we ya eleqeyê pêş dikeve, hûn zana dibin û xwe komî serhev dikin. Ev jî çavkaniya xwe ji wê ferqa ku em xêz dikin digire. Ez li her derê û di her mijarê de wisa me.

Me doh civînek çêkir, di civînê de mirovên me yên bi temen hemû rabibûn ser piya û gohdar dikirin. Ya rast min zêde nexwest ewqas bi wate jî baxivim. Ger hinekî din wisa ji bo rakirina ser piyan baxivim wê hemû bifirin, bêjim bimeşin dê bimeşin yan jî bêjim bimrin wê hemû bimrin. Ez li beramberî kêçên weke we jî wisa me. Ya rast hêzeke min a pir ecêb ya li hevkirinê heye, tabî li gorî hinekan jî hêza min a dayîna kuştinê heye. Teoriyên dîktatoriyê çavkaniya xwe ji vê digirin. Dibêjin; "*çawa bi xwe ve gire daye, çawa girtiye bin bandora xwe.*" Ji hêza min a bandorker pir ditirsin, matmayî dimînin û çareseriyê jî di bê çare êrîşkirinê de dibînin. Niha jî; ez wan pir zêde bandor dikim. Li beramberî wan wisa fetisîner û li beramberî hinekan jî wisa yê ku radike ser piya me. Ji yên ku mirovin re eleqeya min wisa ye. Di vê mijarê de heta pileya dawî bi îdîa û azwerî me.

Li gorî min başiya herî mezin em ji mirovên xwe re bikin, ev bêçarebûn, bêrengbûn û bê îdîabûna wî pê dayîna derbaskirine. Zindîbûna mirov, di qezenckirina hêza hinek tiştan kirinê de dîtin pir girînge. Ji nasnameya xwe ya sereke re, mafên xwe, ber bi azadiya xwe ve bezîn û ji vê re amadekirin mezinbûneke raste. Dîsa min pir baş çavdêrî kir, taybetmendiya herî girîng ya her zilamekî, hinekî pere qezenckirin, jin bandorkirin û bikaranîne yanî azweriyên xwe yên wisa dayîna axaftine. Bi vê ve girêdayî jî şan û şohretê dixwaze. Bi min re vana hemû hatine derbaskirin.

Di jiyana min de zêde cihê pera nîne. Ti cihê şohretê nîne. Di jiyana min de sadebûn esase. Dîsa, bi yê kêm jî razî dibûm. Û li pêwendiyên herkesî yên bi jinê re, yên sûltana, pêxemberan jî jina ku herî zêde pêve tên girêdan binêrin û li pêwendiyên min binêrin. Ne bawerim ewqas girîngiyê bidin wekhevî û xwe di nava pêwendiyeke kesên li bermaberî wan bicerifin biçilmisin de bigirin.

Pirtûkeke qala pêwendiyên Hz. Mûhamed û hevjînên wî dike heye. Min zêde nexwend, ger we dît bixwînin, lêkolîn bikin. Hûn dikarin encamên girîng jê derxin. Hz. Ayşe heye û Mûhamed li beramberî vê jinê pir eleqedare, wekî din bi armanca siyasî, nivengên hêz, ji her eşîretekê hevjînekê digire. Lê di pêwendiyên xwe yên bi Hz. Ayşe re aliyê pêwendiyeke cînseltî li pêş heye. Ya rast ev dikare ji bo yên din jî bê gotin. Lê mesele zewaca wî ya bi Hz. Hatîce re, li ser bingehekî bazirganiyê ye. Zewacên wî yên balkêş hene. Ez bawerim Ayşe ferq dike û jê dipirse; *"tu li beramberî cînseltiya min bi eleqe raber dikî?"* Li gorî min pir xwezayî ye. Li gorî sofiyên roja me ya îro jî, Mûhamed kesayetiyeke pir li pêşe. Dema ku em bi durûtiyên van re rû bi rûyî hev dikin pêşketinên ku wî rê jê re vekirine mijareke cuda ya nîqaşê ye. Nêzîkatiya Mûhamed ji jinê re di nava mercên bê hevsengiyê de pêş dikeve, lê dîsa jî wateyeke xwe heye. Niha ya me di asteke pir li pêş de ye û ez we ji bo şirîkiyê tengav dikim.

Wekhevî di gotin de nabe. Wekhevî di pratîkê de tê îspatkirin û berî her tîştî vê çavdêrî dikim; divê ku kesayetiya we hebe. Li gorî min bi jineke kesayetiya wê pêş neketiye re pêşxistina pêwendiyê ketîbûne. Dîsa ya ku xwe negihandiya asta hêza fikrandinê, tenê xwe nêzîkî jina ku bi hestan dagirtiye kirin jî tawane. Ketîbûna exlaqî îfade dike. Tenê xwe ber bi bayê zayendgeriyê ve xistin, dîsa ketîbûneke. Ji bo ku tu jinê di asta xwe de pêş bîxî, divê ku nêzîkatiyeke bandorker hebe. Ez ji roja ku heme bi vî rengî me. Ti tiştekî min ê ku ez bi jineke kole re

jiyan bikim nîne. Tenê bi xwe sipartina hêz, pere û heta hinek taybetmendiyên wê yên kesayet û bi jinekê re pêşxistina pêwendiyê ez ketîbûn hesab dikim. Bi vî rengî nêzîkatî ji min re kirinê jî ketîbûn dihesibînim. Ev nêzîkatiyeke pir bi îdîa û wekheve. Weke ku min got, ez vê di gotin de jî nakim. Li asta zanîna xwe binêrin, li asta pratîka xwe binêrin, hûn ê wê demê fêm bikin ku ez çiqasî bi vê rêgezê ve girêdayîme. Ya rast hûn ji hemû curê pêwendiyan re vekirîne yan jî di navbera xwe de li beramberî cîhana pêwendiyên zilamê serdest hejmareke pir kêm mirovên ku li ber xwe bidin hene. Ger bixwaze jî nikare serkeve; hûn ji radestî, lihevkirinê re û radest girtinê re pir guncawin. Lê berxwedêriya herî mezin li beramberî vê ez raber dikim. Niha li beramberî mêtingeriyê di mijara wekhevî û azadiya jinê de berxwedaniyeke min heye. Teqez pêwîste hûn vê fêm bikin. Em çawa dikarin tevlî rastiya we ya rêbertî yan jî milîtaniyê bibin? Ev pirs sotînere. Divê ku bersiva we ji vê pirsê re rast û bandorker be. Wekî din?

***Sor.:*** Rêbertiya Partiyê di axaftina xwe ya çend roj beriya niha de qala kesayetiya fetihker kir. Ya rast ya ku em herî zêde pêdivî pê dibînin pêwîstiya fetihkirinê ye. Ev fetih, fetihkirina kesayete. Ji ber ku ti aliyên me yên ku bi kesayetiya Partiyê re hev bigire nîne. Lê em dixwazin vê kesayetiya xwe bi kesayetiya Partiyê re lihev bînin. Bi vî rengî pir çeloxarî derdikeve holê. Xala ku zêde min dide fikirandin, bi van aliyên xwe yên borî yan jî girêdana wê bi şêwazê mezinkirina me re gelo çiye?

***---.:*** Me ev pir alî destnîşan kir. Piştî pratîka îsyana yekem piştre ji aliyê bavê min ve gotina; "*îşareta fethê li ser eniyê heye*" ne vala ye. Hûn jî di himêza dayika xwe de di rewşeke pirxe pir a xewê de ne. Hûn hatine razandin. Hertim îsyanên min ên wisa hebûn. Ya rast min şer wê demê qezenc kir, dibe ku we jî wê demê winda kir. We hezar û yek binketin di ruhê xwe de nivîsiye. Ya min jî ne binketine, rastiya min a mirovê ku hezar û yek îsyan

kiriye heye. Ger şer û pevçûnên xwe ji we re vebêjim, xilas nabin û dawiya wan nayê. Min tenê xalên sereke vekirin. Mesele şêwazê kuştina min a mara hebû. Ev şêwaza min her ku çû di gund de hat bihîstin û her kesê ku mar dibihîst dibezîn. Bi vî rengî min pêşengtiya kuştina maran bi dest xistibû. Dîsa pergalên lîstokan hebûn, min li wir jî pêşengtî zevt kiribû. Di dirûna genim de jî bi îdîa bûm. Kesayetiyek wisa ya ku hertim aso derbas dikirin bûm. Vana di asta mînakên biçûk de ne. Mesele dema ku di rê de dimeşîm hertim gavekê li pêş bûyîn min esas digirt û ya girîng dema ku ev dihat kirin azadî li berxwedanî bû. Ti carî daxwaza min a xwe sipartina filan û bêvan nebû, derfetê min jî çênebû. Vana dibin taybetmendiyên fetihker. Ez li dûv çûkan dibeziyam; li hewa girtina çûkekî, ji îmhakirina yekîneyeke dijmin zehmetire. Dîsa hilkişandina hêlînên Heloyan, dîsa kuştina çend maran, weke serdeçûna dijmine. Mînakên min ên bê hejmar weke vana heye. Eleqeyên we yên wisa hene?

Bi qasî ku ez xwezayî me, pir jî bandorkerim. Mesele ji dibistana seretayî û vir ve, yê herî berçav ê hemû mamosteya bûm, mamosteyên jin jî di nav de, wê demê di rewşa ku pir zehmet Tirkî fêrbûyî de bûm, mamosteyên ji Rojava dihatin kesekî herî zêde dîqat dikirin dinirxandin bûm û ji min hez dikirin. Min ew mamosteyê xwe yê Bînbaşî bû ji we re got; nivîsên min ên kompozîsyonê digirt û digot; “*ez ê vana bi profesoran bidim xwendin, nivîsên dahiyane ne.”* Bi rastî jî kesekî herî zêde hêvî bi min re dida avakirin û baweriya min pêş dixist bû. Gelo wî kîjan taybetmendiya min tesbît kir, nizanim. Min di derbarê asmanasî de dinivîsand, di derbarê şoreşê de dinivîsand, di derbarê gelek mijarên cuda de dinivîsand û hema bêje ji hemûyan re dibûm mînak. Nivîsên girîng ên cuda jî hebûn. Zarokên burjuva û yên gundî jî pir zêde nedixwestin min bibînin, ji nedîtîve hatin hildibijartin. Tabî li beramberî vê jî her ku diçû min jî ferqa xwe kûr dikir. Li gorî wan ez kesê herî zêde ji rê

derketî, rêya xwe windakirî, nemaze kesê binketî bûm. Vaye eleqeyên xwe wisa belav dikir, arasteyî wan dikir bi qasî tê xwestin min ji xwe re qad vekir û bi ser de çûm heta vê rojê hatim.

Vaye şêwaza jiyana fetihkar hinekî bi şopandina pêvajoyeke wisa derket holê. Ji bo min pêwendiyeke ez digirim dest çaresernekirin, ber bi encamekî xwezayî ve nebirin nayê fikirandin. Jixwe hîn ji wê demê de kesên ji nêz ve min nas dikirin ev gotin digotin; "*tiştek nikare ji destê de rizgar bibe û tu kes nikare bi te.*" Heta niha di nava van de yên ku dijîn jî hene. Niha derdikevin ronahiyê, yanî wê demê min pir zêde bala kesî ne dikişand; min bikişandan jî zêde wate nedidanê. Lê ji ber ku niha em ber bi qada siyasî û leşkerî ve diherikînin bandoreke çawa çêbûye îro em ji CIA bigirin heta gelek hêzên bandorker ên îstîxbaratê ji aliyê hemûyan ve dixwazin tesbît bikin. Nemaze MÎT kar û barê xwe berdaye hewl dide min bişopîne. Hewl dide xwe bigihîne heta bêhngirtina min. Ji bo mala ku lê dimînim, "*çend metre ye, di kîjan odê de dimîne, rojane dişopînin*" wisa dibêjin. Bila bişopînin. Çiqas jiyaneke mezine, kelecan dide, lê di heman demê de jî çiqas zehmete. Min çawa li ber xwe da? Fu., tu çi dibêjî, wê dawîya min çibe?

***Fu.:*** Hertim pêşketinek, hertim nûbûnek heye.

***---.:*** Rêxistinên îstîxbarî dikarin min çawa binirxînin? Bi taybet nirxandinên CIA pir balkêşin. Niha ya ku bi baldarî me dişopîne CIA ye. Reşkirin ne girînge, lê me dixwest ku me weke me fêm bike. Piştre ji ber şopandina me nebeicin. Fûat nêzîkî 20 saliye me hûn çawa xişikandin? Pir bê amane ne wisa? Hinek ji wan dibêjin; "*erîşî ser mafê mirovan dike.*" Di wê pirtûka, "*ayetan*" de jî wisa ye.

***Fu.:*** Lê ez ber bi mirovbûnê ve meşîbûm Serokê min. Ger xişikandin be jî ez ber bi mirovbînê ve hatime xişikandin.

**---.:** Ger xişikandin be jî nirxeke mezin îfade dike. Niha me hemû gel xistiye bin bandora xwe. Bi qasî aliyê vê yê siyasî, aliyê bûna tevgereke ruhî jî çalakiyeke hîn girîngtire. Ji aliyê siyasî, leşkeri û rêxistinî ve rewşeke girîngiyeke mezin îfade dike ev. Gelo bê ku bandor bibe jiyankirin gengaze? Wekî din?

***Ji.:*** Nêzîkatiyên rêbertiyê hîn di temenekî biçûk de jî li bermaberî jinê pir cûda ye. Di wan pêvajoyan de qala zanîneke pir cuda kirinê jî ne mijara gotinê ye. Ya ku ez dixwazim pirs bikim; di wan temenan de jin ji bo Rêbertî çi îfade dikir. Yanî hevaleke baş a lîstokê, yan jî bûnewereke çewsîner, yan jî bûnewereke pir pîroz bû?

**---.:** Di kîjan temenî de?

***Ji.:*** Temenê biçûk de. Mesele zewaca wê xwuşkê heye. Dîsa zewaca hevalên keç heye. Li beramberî vê xemgîniya Rêbertî û nêzîkatiyeke cuda ji hevalên lîstokê re heye. Ez dixwazim vê xalê bipirsim?

**---.:** Bêguman min ev baş pêşwazî nedikirin. Zewac li gorî min xilasbûnek îfade dikir. Jixwe ji aliyê provakator ji vê re gotina *"felaket"* jî, dibe ku ji ber van fikrên min be. Bifikirin, li gorî min diviyabû pêşketin bi arasteyekî din bibûya. Bi wî şêwazî wateya wê nabînim. Berteka min li beramerî peyvên; " *min girt, didim"* heye. Ji cîhana min a azadiyê re berevajî tê. Xwuşka me jî wisa bi çend kîsên genim, bizin, bi çend qurişî girtin. Hîn jî di bîra min de ye. Ez bawerim ya sê sal ji min mezintir bû, lê zewaceke bi pirsgirêkan dagirtî bû. Hevalên min ên lîstokê hebû. Ew keçika bi navê Elîf heft roj piştî ku bû bûk û şûn de hat ji min re gotibû, "*Were ez û tu bi hev re bilîzin."* Ji bo min hevaleke pir baş bû. Min zewaca wê pir neyênî pêşwazî kiribû. Heta pileya dawî min zewaceke ne rewa nirxandibû. Dîsa zewaca keçeke cîranê me ya duwem hebû. Dîsa min zewaceke ne rewa nirxandibû. Keça cîraneke me ya din ji ber zewaceke bi darê zorê reva wê, dubare hatina malê, hatina wê û daxwaza wê ya hinek tiştan ji min

fêrbûnê hebû. Hertim di hişê min de ye, pêwendiyên wê bi dayika min re hebûn. Ji bo min bi serê xwe meseleyek bû. Bêguman wê demê hîn nêzîkatiyên min rûneniştibûn, bawerim derûniyeke hesûdiyê jî hebû. De îca ji bo bi dergîstîbûnê ketina ser rêyên Çûkûravayê, hebûn û nebûnên xwe ji bo vê xerckirin ji bo min pir bê wate û xeter dihat. Hîn jî berteka min li beramberî van fikran heye. Li gorî min diviya bû cîhan cuda bihata vesazkirin û heta niha jî xwedî vê fikrê me.

Dîqat bikin me hûn bi pirsgirêkên girîng re rû bi rû kiriye. Bersiva ji pirsa; “ *çawa bijîn”* re heta dawî girînge. Pirsgirêka sereke ya romanê, di vê pirsê de asê bûye. Romana Kurd ya wê bersiv bide pirsa “*çawa bijîn”* yan jî dê neyê jiyankirin. Ewqas şehîd hene, ya rast di encam de ji bo vê pirsêne. Bi heman şêwazî li beramberî ewqas sermê, germê, li beramberî xwezayê berxwedanî heye, ewqas bê aman rastiya şer jiyan kirin heye û hemû jî ji bo bersiveke rast ji “*çawa bijîn”* re bê dayîne. Ji ya tê texmînkirin wêdetir hîn bi wate û pirseke kûrahiya wê heye. Min bi xwe jî heta niha weke pêwîst ne bersivandiye. Dema ku we bersiveke tam da vê pirsê ev serkeftina şoreşekê ye, çareseriya Kurd e, bi destxistina anûr û şerefê ye; welhasil di jiyanê de ragihandina serfirazî û îspatkirina wê ye. Ez qet bawer nakim bi asanî ji vê pirsê re bersiv bê dayîn. Bifikirin, hûn keçê çawa bijîn? Jixwe provakator jî vê ji nêz ve lêkolîn dike. Bi ketîbûneke bawerpênekirî jiyana nava pergalê çawa esas werdigire û pêşkêş dike. Ya rast êrîşa herî xetere. Tevî ku “*Çawa Bijî?* Pirseke zehmete jî, pir hesan dibersivîne. Tê xwe bavêje ber lingê Medya, ew ê jî xwe bavêje ber lingê te û hûn ê têra xwe ketîbûnê bikin. Hûn ê her tiştî bifroşin. Vaye bersiva vê ev e! Niha derfetê bibîne li ser navê berxwedanî û anûra gel çi hebe wê ji wê ketîbûnê re bi carekê feda bike. Vana xeteriyên mezinin. Bawerim tevî van zehmetiyan jî, hûn jiyana me niha bi feraseteke mezin pêşwazî dikin.

Hertim hewl didim asta kesayetiyên we yên pir ketî, bê hêvî hatine hiştin bilind bikim. Ez “*felaketê”* naynim. Ya rast kedeke min a pir zêde heye. Ger na min jî dikarî şadiya şexsî bijîm. Lê binêrin ez çiqas -di dema borî de dibe kî hinekî bûya- dûr ketime. Ne tama xwarina ku ez dixwum heye, ne jî bêhna tiştên ku ez bêhn dikim, ne jî xewa min heye. Lê înadeke min heye, azwerî û şerê min heye. Pêwîste hûn vê vînê fêm bikin. Ez dixwazim cîhana jinê fetih bikim. Tiştên ku di jinê de tên fetihkirin û tên hilweşandin çine divê ku hûn baş fêm bikin. Yên ku vê fêm nekin wê me li beramberî xwe sitemkar bibînin. Ger hûn dixwazin ji rêgezeke din û otoriteya bi wê ve peywendidar tiştekî fêm bikin aliyên ku bi we ve girêdayî bi ziravî lêkolîn bikin. Encaman derxin. Ma hûn kêm bela ne? Di hatina vê astê ya civakê de rista we kême? Hesabên li ser we tên kirin, di teşegirtina zilam de cihê we, li ser koletiya we xeyalên ku tên avakirin, dîsa di derbarê cînseltiya we de îhtîrasên heyî û xwe pêşkeşkirinên we, gelo we ber bi kîderê û çi ve bir? Hûn qet vana hesab dikin? Wîjdanê we heye, hûn bi xwe bikaribin? Vana girîngin. Dema ku em we arasteyî hesabpirsîna ji xwe dikin, arasteyî rast bersivdayîna van pirsan dikin, ya min alîkariyeke ji rêzê hesab bikin.

Ya rast me qala pevçûneke pir dîrokî û mêrxasî kir. Ne li gorî min in zewac, hîn pêvajoya hevpeymanê jî ne hatiye. Bêguman ez qala asta ferdî nakim, qala asta netewî dikim. Di çareseriya jinê de dema ku rastiya jinê bû mijara gotinê em hîn di pêvajoya nîqaşê de ne. Fûat gelo tu dikarî vê hestê fêm bikî? Yên ku wateya vê gotinê fêm dikin hene? Fikrandineke felaketê tîne ye?

***Fu.:*** Tesbîteke di cihê xwe de ye Serokê min.

***---.:*** Dema ku rastiya jinê mijara gotinê be di asta nîqaşê de bûna me raste ne wisa?

***Fu.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Kê ji vê têgehê tiştek fêm kir?

***Ro.:*** Serokê min, dema ku em li asta wê pêwendiyê dinêrin ya rast jina Kurd ji hemû aliyan ve ji koletiyê ber bi mirovbûnê ve kişandin mijara gotinê ye. Dîsa dema ku em li pratîkên tên jiyîn dinêrin ji hemû aliyan ve danîna holê ya îsyana xwe ya Rêbertiya Partiyê heye. Dema ku em jî jiyana xwe dinirxînin hinek îsyanan dibînin, lê belê ew îsyan di encam de ber bi radestî, lihevkirinê, koletî û durûtiyê ve dibin.

**---.:** Bersiv bide pirsa min. Di wateya pêwendiyan de dibêjim ku; ne dema zewac heta ya destgiriyê ye. Ma em ne di pêvajoya bi giştî hevnaskirinê de ne? Hinek têgehên wisa ecêb hene, divê ku hûn hewla fêmkirina van bidin. Pêwîste em wateya wê ya dîrokî û civakî tahlîl bikin.

***Ro.:*** Serokê min, ji aliyê dîrokî ve jî di rastiya Kurdistanê de ev encax bi PKK'ê despê kiriye. Rastiya Rêbertiyê li ser vî esasî şênberiyekê dike.

**---.:** Ez PKK'ê ji rêbertiyê cuda nafikirim. Weke bûyereke civakî jî, şêwaza pêwendiyê jî wisa ye.

***Fu.:*** Koletî di asteke girîng de hat derxistin, heta şikandina koletiyê jî diçe.

**---.:** Pêwîste hûn vê têgehê bi kûrayî karbînin; pêwendiya rewa, pêşketina asta azadiyê û hinekî jî pîvanên netewî gelemperîbûnê û derfetên serkeftinê ve girêdayî ye. Di rewşeke ewqas kolekirin hatiye ferzkirin de derfetê qala pêwendiya azadkirinê heye? Mînak tu ketî girtîgehê, ger hevjîna te hebe, tê kehir bibî. Ji nişkêve tu şehîd ketî, tê wê di nava xemginiyê de bifetisîne. Ji hevjîn ango yên ku peyman dane hev yek ji wan revî, dîsa tê kehir bibe. Maf û azadiya şoreşgerekî wisa xwe kehirkirinê jî tine ye. Nexwe di vê mijarê de jî ez di rêyeke xwezayî û rast de me. Dema ku ber şoreş û îsyanê ve meşîm ez bi hestên dê wisa nebe û fikran dagirtîbim. Civak ne guncawe, ast ne guncawe, ez wisa difikirim ku rûyê me yê hevdû bi rêzdarî û hezkirinê pêşwazîkirinê nîne. Niha ez ji nêz ve bi keçan re eleqedar dibim; yanî hinekî em

dikarin li rûyê hev binêrin. Dema borî hertim rûyê keçan bi pûşî bû. Heta ku bihata girtin jî rûyê xwe zêde nîşan nedidan. Hertim serê wê di ber wê de bû, bi wê rewşa xwe hema bêje dixwest derûniya xwe ya şikestinê, bêrengbûna xwe veşêre bû. Ji hemû aliyan ve radest bûye, rewşeke binketî îfade dikir. Ma ez dikarim vê qebûl bikim? dikarim bêjim, "*ev zewace*" û rewşê xwezayî bibînim? Bêguman na û eşkereye ku ez ê kirêt bibînim.

Dîsa, di hevaltiya lîstokê de wate û sedema israrkirina min heye. Weke ku heta niha di hevaltiya şer de -jixwe ev jî dibe lîstokeke rasteqîn- hebûna sedem û wateya israrkirina me. Ji bo hûn fêm bikin çima ev pêwîste, hûn ê bi rastiyan re hev nas bikin. Wê dil û rûyê we derkeve holê, hûn ê pir zana bibin. Dê hêza we ya biryardariyê pêşkeve, hûn ê bizanibin çi, çawa û ji bo çi jiyan dikin. Hûn ê hemû siparteyên jiyana xwe binirxînin û hemû hesaban bikin. Li zilamekî bifikirin ku, ji gelek aliyan ve di rewşa ku nikare bibe hevjîn de ye; başe hûn ê çi ji vî belayî bikin? Li beramberî min jî divê hûn baldar bin. Dibe ku gelek ji xwe bi îdîa bibînin, lê ez bi xwe jî, bi awayekî giştî bê ku bikevim hewayeke dê jinek wisa min bi hêz bike hertim diwazim di vî astî de bidim jiyîn. Zehmete. Gelek hevalên me dema derfet bibînin bê ku bifikire hema hemû rewşên ji pêwendiyekê re rê veke jiyan dikin. Mesele nûnertiya asta netewî kirine. Milîtan, hinekî jî ji yê ku ji vê astê re xwe eleqeder bibîne re tê gotin. Ev jî ji me re pir pêwîste. Em neçarin ji bo asta netewî qadro pê bigihînin. Ji pêwîstiyê wêdetir jiyanî ye. Teqez pêwîste hûn jî vê astê îfade bikin, wekî din di vî şerî de jî û di derxistina holê ya vê jiyanê de jî hûn ê nikaribin bibin xwedî rist. Zewac bi girêdana welat re, azadiyê, rêxistinê, mecbûriyeta bi asta Rêbertiyê re dest girtin divê êdî bê fêmkirin. Wekî din mirovê kehir bibe. Berevajî ketina hemû armancên resen jî dê jênerev bibe. Kesê ku vê astê jiyan neke û nede jiyîn, teqez dê pir bide windakirin. Çima hûn ê ezran winda bikin? Ger ev ez bim jî, bi min winda nekin. Ji mafê mirov

yê sereke re rêz, bi vê windanekirinê re têkildare. Heta dil şewitîn jî dibê nebe, hestyarîbûn nebe. Em heta pileya dawî rastîparêz bin û ji min hestên dilşewitînê hêvî nekin.

Xwe gihandina asta hestyar û pir girîng; xwe gihandina asta netewî û azadiyê, bi rêxistinbûn, temsîlkirina hêza biryardariya hevbeş kirine. Ev nebe pêwendiyên ferdî, de îca dê nirxê hest û zewacan çend pere be? Di vê mijarê de jî ez ti car xwe naxapînim. Divê ku mirov bi şêwazê, "*ez hatim lîstokê, min texmîn dikir wisa be lê wisa derket*" û xwe nexapîne. Dîqat bikin, ji vê nêzîkatiyê re kê û çima êrîş kirin? Ger min jî ev aste temsîl nekira, bifikirin, gelo wê çend jin û zilamên şoreşger li ser piya bimana? Têkoşîneke rast hinekî jî li ser vî esasî hat dayîn. Bi taybetî jî dijmin, heta niha jî bi dijwarî me dişopîne, hewl dide min biçûk bixe û serûbînî hev bike. Ev têkoşîneke cidî ye. Ger li xerîzeyên heywanî dayîn, dawî li mijarên girtin û dayînê anîn, mirovê xweşik derxistina holê û teqez xwe gihandina ya şayanî rêzê, bûyîna xwedî serkeftinên mezin, yekane rêya amadekirina derfetan ji jiyana nû re ye. Ez hewl didim we bixim ser rêyeke wisa. Vaye êrîşî vê dike û ez jî bi vê re mijûl dibim, têkoşîna wê didim. Êdî hemû jinên me yên ku em dikarin xwe bigîhînin wan li ser vî esasî pêşxistin û ew zilamên pir zêde nayên pejirandin -ji xwe çiqas zilamin jî mijara nîqaşê ye- tahlîlkirin yek ji mijûlbûnên me yên sereke ye. Ez bêjim ev munafiqana, şopdarên pergalê, sîxûr, wana êrîşî çiyê min dikin?

***Ro.:*** Serokê min, ez dixwazim tiştekî diyar bikim. Bi taybet ez vî kesê ku pirtûka bi navê "*ayetên şeytan nivîsiye baş nas dikim.*" nêzîkî çar-pênc salan ez pê re mam.

**---.:** Başe ku te ji rê dernexistiye.

***Ro.:*** Mijûl bû, lê nekarî serkeve Serokê min.

**---.:** Mijûl bû?

***Ro.:*** Hinek ferasetên diyar ên ku ferz dikirin hebûn, min ji hemû hevalan re got ku di xala azadbûnê de lêhûrbûneke min

heye, lê ji ber ku min bi nerîna me, yanî ya Partiyê ji azadiyê re nizanibû binêrim hewl didim ji hevalan fêr bibim. Dema ku min azadî ji wî kesî jî pirsî matmayî ma, nema zanî çi bersivê bide, nekarî bersiv bide. Pirtûkxane pir nêzîkî wir bû, çû bi ferhenga felsefê ve zeliqî, dest bi xwendina azadiyê kir ji min re. Yanî kesekî bi qasî serê derziyê di derbarê azadiyê de fikra wî nebû. Kesekî azadiyê nizane ewqas tişt nivîsandin difikirîne. Bi rastî jî mirov nikare qebûl bike. Mirovek nikare ewqas ketî be. Kesekî bi rêkûpêkî nikare ji azadiyê re pênase bîne dikare çi îfade bike nizanim. Li gorî min tenê ketîbûna xwe îfade dike.

***---.:*** Ez encama ku ew dixwaze xwe bigîhînê pir baş zanim. Ji bo wê hewl didim we biparêzim. Ketîbûna di van de tê pêşxistin pir xetere. Navê yekî ji van jî Elî Riza.

***Ro.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Sûda xwe heye ku hûn bizanin, vî zilamî êrîşî xwuşka xwe kir û xwuşka xwe fetisand. Xwurifîbûn ewqas pêş de biribû. Ev meyleke, ez bawerim meylek di girtîgehê de ji aliyê dijmin ve tê pêşxistine. Bi laşfiroşiyê re jî rû bi rû kirine û ev meyl pir zêde pêş deye. Ji bo van jin tenê dibe bikereke erîşî ser bikin û bi dest bixine. Pir xeter, di pileyeke metirsîdar de bi demogojiya hestyariyê xapandinek heye. Em bi we re pir ji dilin, eleqeya vana pê nîne. Ji nîşandan eleqeyeke pir biçûk ji dil jî dûrin. Jixwe yek ji sedemên ref wisa hişk çinîna min jî, di bin navê PKK'ê de rê girtina bi asanî xirab şixulandina hestên we ne. Di bin navê hevaltiyê de yên ku niyazên we yên baş bixwazin xirab bikar bînin dibe ku derkevin. Gelek mînakên wê jî derketin. Provakatorê li ber serê min, hindik mabû wan keçan hemûyan bikar bînin û tine bikin. Weke ku qet para xwe ji hezkirina rast, rêzdarî, feraseta azadiyê negirtine vana, ji pîvanên pergala burjuvaziya biçûk jî dûrin. Niha hûn di bin berpirsyariya me de ne. Em bi hestyariyeke taybet hewl didin we pêbigihînin. Di nava Partiyê de polîtîkayeke mezin a azadiyê tê karanîn. Ev jî bo wan

hem derfeteke, lê hem jî astengiyeke. Di bingehê fikra wan de, vaye em li gorî wan dîktatoran û ji wan re astengiyan ava dikin. Bi vê ve girêdayî ji ber ku em hinekî pêşiya êrîşkirina wan a ser jinê digirin. Ev tenê kesekî derketî holê ye, de îca yên di nava me de hene; hestên nehatine perwerdekirin, dema ku derfet dît nêzîkatiyên nayên rawestandin, astên pêwendiyên feodal diteyîsînin, hema bêje tiştên bi piraniya we re hene. Ji bo ku hûn meziniya xeteriyê bibînin, hûn ê li vê binêrin û bi hesûdî azadiya xwe biparêzin.

Pirsa "*Çawa Bijîn*" pir sotînere. Bersiva wê jî weke ku hûn dizanin ne asane. Ez bêjim armanca hemû şoreşgeriya we, cewherê wê, ji hemû aliyan ve rewşa we li beramberî vê pirsê û bi arasteya keda we ve girêdayî ye. Di serî de şer di hemû xebatên me yên siyasî, leşkerî de rast bersiv dayîn ji vê pirsê re ji bo xizmet ji armancê re kirinê ye. Ez ê pevçûna xwe ya li dora vê pirsa sotîner bi kûrî bidomînim. Ya din ez hîn bi we re di qonaxa naskirinê de me. Ji bo jin tevlîkirina vî karî, ez ê hîn karên di cîh de pêş bixim û ya rast jî ev e. Hîn keçkokek nû çavê xwe vekiriye ji nîv feodal, nîv-burjuva, -di nava me de ya rast nayê gotin burjuva- yan jî lumpen û ji beşê serserî re teslîmkirin bi qasî cînayetê xetere û tawane. Wisa qebûlkirin dê bibe paşverûtiyeke mezin. Li çîroka jiyana min binêrin; min çawa xwe girt dest, de îca ji bo ku ji aliyê jinê neyên daqurtandin jî min çawa li ber xwe daye. Ya rast tenê ne danequrtandin jî, hema bêje min êrîş kiriye. Dibe taybetmendiyeke pir balkêş.

***Ro.:*** Serokê min, jixwe ji nêzîkatiyên wî dihat fêmkirin. Hat nehat nêzîkatiya yekem ferz kir; "*hûn ê despêkê bibin rojnamevan, yan jî milîtan?*" bû. Nêzîkbûna ku me jî ferz kir, "*em ê pêşî bibin militan û ruhê milîtanî bidest bixin.*" Yanî li wir jî gava yekem avêt ne avêt nakokî, pevçûnan despêkir. Kesekî ewqas bê kesayet, bêkêr bû.

**---.:** Vana zêde ne girîngin, em aliyên çîroka xwe yên bingehîn û vekirinê digirin dest. Wekî din?

***Be.:*** Serokê min bi taybet di dahûrandinên van salek-du salên dawî de tên kirin bi pêşketina şoreşê re min dît ku asta civakî hîn zêdetir min vekiriye. Lê asta nerîna me jî bûyer tenê ji aliyê siyasî, leşkerî ve nirxandin vê tam tahlîl nake. Ji aliyê rêbertiyê ve ji jiyana xwe mînak dayîn û ji çêkerê re pêşkeşkirin di vê mijarê de pêwîste nêzîkatiyeke çawa ji jiyanê re bê kirin jî derdixe holê. Pêwendiya zarokekî bi dayika wî re, bi dayikê re, bi xwuşk û birayan re, pêwendiya xwe bi hevtemenê xwe re û vekirina van dibe sedem em jî bi ser xwe de biçin û rêya hilbijartineke bi tendirist pêş dixin. Mijara ku ez li vir li ser lêhûrbûm; dahûrînên Rêbertî yên di derbarê jiyana civakî de ne. Bi vî alî ve min hewl da rêbazekî bigirim. Lê ji aliyê rêbertiyê ve jiyana xwe weke şerekî destgirtin û ev jî li gorî rastiya Kurdistanê pêkanîn û bi gîştîkirina vê bû sedem ku em jî wisa nêzîkî xwe bibin.

Ya din jî di derbarê sekna min a tevlîbûnê de, di derbarê sekna jinê ya di nava têkoşînê de hinek encam hene. Di Kurdistanê de bi rastiya jin ve girêdayî însiyatîf pêşnexistina me, di bin navê serweriyê de me kesayetiya jina serwer a pergalê lîstiye. Jixwe ji van aliyan ve di pergalê de zêde derfet jî nînin. Yanî serweriyeke li gorî pîvanên axayên feodal, însîyatîfek, hewldana avakirina serdestiyê yan jî bi şêwazê Kemalîst nêzîkatî serwere. Bi feraseta proleter a îro em sekna xwe ya di têkoşînê de diyarkirina me zêde bi tendurist pêş nakeve. Lê bi dahûrînên rêbertiyê ve girêdayî, bi dahûrîna nû ya jiyana civakî pêşketinê di vî alî de jî tên dîtin. Artêşbûna jinê qonaxa herî serkeftî ya vê ye. Mînak Rêbertî, di dahûrînên 1992'an de tevî ku dibêje, " *bi cemidandina pêwendiyên jin û mêr bi têkoşînê re dê hewla çareserî dîtinê bê dayîn"* jî îro qala qonaxa hevnasînê dike. Ya rast ev jî asta ku şer giştiyê diyar dike. Dibe ku ev rewşa têkoşînê ya ku di sed salan de dihat fikirandin bê bicîkirin, îro di du salan de bi pêşketinekê

hatiye derbaskirin. Ev jî asta pêşketina şer û tempoya wê datîne holê.

**---.:** Tu dikarî ji bo xwe hinek encama jê derxî. Şerê me yê civakî bi qasî yê siyasî girînge. Min pêwîste şerê leşkerî çawa be ji we re vekiribû, hemû sawnakin. Herî kêm jiyana min heta salên 1970'ê, jiyana şerekî pir mezin a jiyana civakî ye û herî kêm bi qasî pêvajoya siyasî girînge. Yê ku ewqas xwe lêpirsîn dike û xwe venaşêre, bi xwe nade xwarin derketina kesayetiyeke bi vî rengiye. Ev asta ku derketiye holê bi pîvanên objektîf bi hemdemî, dîrokê de derbas dike di asta cîhanê de îro ji pirsgirêkên mirov re xwe derbas dikin û em hewl didin encamên mezin bigirin. Weke kes jî di vê mijarê de hema bêje xwe bê qusûr dibînim. Gelek karên ku bên kirin hene.

Mûstafa Kemal jî, hemû sûltanên Osmanî jî wisa ne, yekem karê dikin, ketina nava nêzîkatiya jinên di nava sînorên şahiyê de ye. Meşrûbê vedixwun û piştî raqiyê ya di vê bê jine. Tenê ewqase. Parvekirina fikir, ber bi siyasetê ve kişandin û bêguman ji bo vê jî di serî de jin ji koletiyê rizgarkirin, serbixwekirin, azadkirin, nêzîkatiya kesayet pê dayîna qezenckirin teqez nîne û jixwe naynin bîra xwe jî vana. Rista ku min ji xwe re diyar kiriye, li beramberî we bê qusûrbûne. Vaye ez li pêşberî we me, ger hûn dikarin qusûrê bibînin, de hadê bibînin. Ez xisûsên fîzîkî, ruhî jî hesab nakim yanî, ji aliyê pîvanên bîrdozî, rêxistinî û yên din ev bi vî rengiye, ez hewl didim li beramberî we xwe wisa bê qusûr bihêlim, girîngî didimê. Rêzdayîn jî ev e, lê bi gelekan ji we re berevajî ye. Tevî vê jî, dibêjim min basît negirin. Ji bo xwe gihandina cîhaneke jinê ya azadiyê vana dibêjim. Ger hûn esas bigirin hûn ê bikaribin pêş bixin. Hûn esas jî negrin hûn ê bikevin rewşa, "*ya bi pê defvan, yan zirnevan dikevin*" ji ber ku bi van rewşên xwe ve hûn lewaz û bê çarene. Li gorî min heyfa we. Rêya din; rêya ku me daye pêşiya xwe ye û navbera we jî bi

pergalê, Kemalîzmê, axatiyê re vekirî, zelal, ferqên teqez divê hûn daynin û bizanibin bimeşin. Belê, wekî din?

***Ze.:*** Jiyana Rêbertiya Partiyê, dîroka rizgarî û azadiya Kurdistanê îfade dike. Di vê wateyê de mafê me yê zanîna dîroka me heye. Şansê me yê herî mezin jî ev dîrok di kesayetiya Rêbertiya Partiyê de zîndî dîtine. Ya ku ez dixwazim pirs bikim ev e; şoreşa Kurdistanê di heman demê de şoreşa jinê ye. Dîsa di jiyana Serokatiya Partiyê de pêwendiya siyasî û ya hestî bi Fatma re, di kesayetiya wê de serlêdana jina Kurdistanê tahlîlkirin û rastiya jina Kurdistanê bingeh girtin ji bo rizgariyê weke xala çareseriyê dîtine. Lê em ji zarokatiya Serokatiya Partiyê li beramberî bindestan bi nêzîkatiyeke hesas, hestyar û bi serwerxtî lê dinêre û em dibînin vê jî bi pratîka serwextbûyî di rêxistinkirina bindestan de dide nîşandan. Di vê xalê de di kesayetiya Fatma de di xala azadiya jinê de hesasiyeteke mezin hatiye raberkirin. Ger na li ser bingehekî bîrdozî pêşbîniya serokatiya Partiyê yanî mijara azadkirina jinê, di stratejiya Partiyê ya ku serokatiya Partiyê di dema bîrdozî de teşe dayê de cîh digirt?

***---.:*** Bi hev ve girêdayî ye. Fatma ji aliyekî ve dibû cewherê dîrok, civak, desthilatiya mêtînger û nokeriyê. Bê şansî ango bi şansiya min wisa balkêş û dixwaze bila sitfe, yan jî di encamê qezayekê yan jî weke hişmendiya xwezayî ya têkoşînê kesayetiyeke rastî hev hatin îfade dike. Ya herî balkêş jî ya rast pêwendiya jinekê ku hêz bide mirove. Hêjî tê bîra min, weke ku hemû giranî hevgirtine û li pêşberî min rawestiyane, hemû pirsgirêk qelîşîne û hatine pêşberî min rawestiyane. Dengekî di hundirê min de digot; “ *tu çareser nekî nikare pêş de biçî, tu derbas nekî meşa te nagihêje armancê, nikare biçe.”* Tê gotin ya, “*jiyanê torên xwe honandin”* rewşeke wisa û di navê de difetisîm. Weke ku di nava golekê de me û diperpitîm; gelo ez ê bikaribim bigihêjim peravê, negihêjime, hema di nava van hestan de bûm. Ji

pêwendiya jinekê zêdetir dişibe her tiştî. Weke ku min got, ya rast di wir de dîrokek veşartiye. Mêtingerî, nokerî, xiyaneta Kurd, xirab bikaranîna jinê, vana hemû tê de hene. Ev ji bo me tam jî di wê demê de, ji bo têkoşîna ku me bilindkiribû, ya rast zehmet be jî, bû pêwendiyeke avantaj pêş bixe. Bi vê astengiyê re rû bi rû hatin, di gavavêtina nava têkoşînê de risteke kîlît dît. Weke ku hinek ji min re bêjin; "*ger tu vê derbaskî tê serkevî, beriya tu bi dewleta mezin re mijûl bibî bi vê re mijûl bibe, ger tu ser bixî dê te ber bi encam ve bibe*" û ev hertim bi dizî di berguhê min de digot. Ji ber vê sedemê jî eleqe û meraqa min her ku diçû zêde dibû.

Vaye hinek hestyariyên min ên wisa jî hene. Bêguman divê ku piştre ev ber bi asta netewî ve bê veguhestin. Çibû asta min a netewî, serweriya min çi îfade dikir ew kîjan jin bû û teşegirtina jina ku ez li pê dibezîm çibû; bûyereke mezin a dahûrînê ye û niha bandora xwe çiqas mezin bû bi awayekî vekîrî tê dîtin. Bi dahûrandina wê re girêdayî hûn çêbûn. Hema bêje hûn nû ji dayik bûn. Ez jî hema bêje nû ji dayik bûm. Ji dayikbûna min a herî mezin, çareserkirina min a vê bûyerê ye. Deh sal mîna siyeke tarî li pişt min ez şopandim û pir zêde ev gotin dikirin; "*ez te difetisînim ne wisa*" gelo dixwest bêje; "*ez te ber bi tarîtiyê ve dikişinim?*" Bi vî rengî dîtina min, çavkaniya xwe ji çalakiya ku min dimeşand û zanîna wê digirt. Pir balkêşe! Heta niha jî encamên vê tahlîla mezin ji bo ku ber bi asta netewî ve veguhezînim mijûl dibim. Encamên ku min derxistine ji we re radigihînim, ev fêrbûneke pir yamane. Ji tiştên jiyankirî encam derxistin vaye ji vê re tê gotin. Pêwendiyên we jî hene, we çiqasî tahlil kiriye? Vana girêkên jiyanê ne û ji ber ku we tahlîl nekiriye hûn belengazin. Ji bo vê bê ku hûn pir tiştan ser bixin wisa di cihê xwe de dijmêrin û disekinin. Yanî nizanim beşa herî balkêş a çîrokê di derbarê vir de dibe ku kîderê be?

***Ze.:*** Serokê min, hinek kes dema ku hêza wan têra serkeftinê nake xiyanetê yan jî li dijber wê cîhgirtinê û bi vî rengî derbasbûna dirokê hildibijêrin. Di kesayetiya Selîm de jî hat dîtin. Li Ewrûpa dema ku pirtûkxaneyekê tevlîhev dike di pirtûkeke dabû welatparêzekî de gotinek nivîsandibû. Pir balkêş bû! "*ez niha êş û elemên ku tu dijî dizanim, lê tiştek ji destê min nayê"* bi vî rengî nivîsîbû. Greva birçûbûnê bû û ji welatparêz re ji bo birçîbûnê ev nivîsîbû. Yanî mahkûmî xerizeyên xwe, yê ku nikare li ser xerizeyên xwe serwer be, ji bilî vê ev şexsên ku naxwazin jiyanê nas bikin, li beramberî Partî û pêwendiyên Rêbertiya Partiyê bi raberkirina sekneke dijber dixwazin xwe derbasî dîrokê bikin. Ez derketina wan bi vî rengî dinirxînim.

**---.:** Yanî mînaka pîsatiya di bîra ava zemzemê de hatî kirinê. Ecêb nabînim û fêrker dibînim. Kesayetiyên wisa wê pir derkevin. Bi van aliyan ve temamkirina fêrkariyê sûdmende.

***Soz.:*** Li Ewrûpa destnîşankirineke wî hebû. Ji jinan re digot; "*hûn miyê qûrbanê yên PKK'ê ne."* Li beramberî keda Rêbertî ya azadkirina jinê wî jî di nêvenga Partiyê de azadiya jinê weke *"miya qurbanê* dinirxand. Em wê demê pir lîberal diman. Jiyana pergalê weke azadiyê bi destgirtin azadiya di nava Partiyê de jî; "*weke miya qurbanê"* bi nav dikir. Bi çi armancê ev digirt dest?

**---.:** Bêguman li pê serweriyê ye û ya ku vê astang dike jî partiye. Partî we hinekî digihîne wê asta netewî ku me qala wê kir, digihîne asta azadiyê, ew jî ji vê re navlêkirineke wisa dike. Bêguman rastî berevajî vê ye; bi xêra Partiyê dixwaze weke miyên qurbanê bi dest bixe. Hinekî jî dixwaze niyazên xwe bike malê Partiyê û biteyisîne. Armanca wî ya sereke, ev niyazên xwe dayîna axaftine, lê dema ku fersend û derfetê ji vê re nabîne wisa hemû tiştê ku pê re rû bi rû dibe bi tevlîhevkirinê, tîna asta dijbertiya Partiyê û bi qasî ku dikare serbixe ket nava hewldaneke ber bi xwe ve kişandinê. Yên ku berteka wan li beramberî Partiyê nebe bi hesanî dikarin bikevin qada bandorgeriya wî. Hîn ji

despêkê ve bi vê difikire, dixwaze li ser gelek kesan jî kar bîne. Ev ewqas jî girîng nîne. Wekî din?

***Me.:*** Serokê min, Rêbertî çend roj beriya niha qala pirtûka ji aliyê ûnsûrê Selîm hatibû nivîsandin kir. Ez li ser vê hinekî fikirîm. Çima vana dinivîse û çima berê dema ku li vir bû dikarî gotinên cuda bêje? Ez dibêjim ku, ya rast ev ûnsûr dizane serokatiya Partiyê mafdare, lê ji bo lewaziya xwe neteyisîne û ji bo xwe tatmîn bike dibe ku ev nivîsandibin.

**---.:** Berdevkiya pergalê dike. Beriya niha ya ku min xwest wateya wê bidimê, ji nû ve vejîneke netewî, rizgariya netewî û vesaziyek heye. Hemû cîhana wan a kevin serûbin dibe û vê jî pir şênber hîs dike.

Pêwendiyeke wî bi Aysel re heye, ji bo wî yekî digot; “*di zîndanê de ji bo hevdîtinekê bike çil teqla dida avêtin.”* Ji hevdîtinekê, çayekê, cixareyekê re yekî ku wisa çil teqleyî bi xwe dide avêtin wê di cîhana me ya pêwendiyan ku wisa ji netewekî re bûye mal û divê bibe mal de bi bertekeke mezin bê pêşwazîkirin. Bi vî awayî pir ezezî û ketiyê ajoyên xwe, ji ber ku kesayateke ji ezeziyê re îbadet dikir bû, xwest berdevkiya vê bike, jixwe di girtîgehê de jî berdevkê vê ye. Di her pêwendiya ku dibîne de bi zimanê herî bilind vê bideng dike. Di dîrokê de jî yên wisa hene, munafiqên her tevgereke bilind dibe, yên devdavêjinê, çavnebar, yên ku di nava bîra ava zemzemê de mîz dikin hene. Ev jî bi temsîlkirina vê wisa dizane ku dê bibe şohret.

Salman Ruştî kiye, zêde naxwazim binirxînim jî, lê vaye ev jî dixwaze risteke weke ya Selman ruştî bilîze. Ji xwe peyva; “*ayetan”* jî wî teqlît dike. Di heman demê de ewqas teqlîdgere. Dibe munafiq û devavêjê PKK’ê. Risteke wisa ji xwe re diyar dike û ya şayanî nayê azadiyê jî ev e. Ewqas jî ne girînge. Eşkereye ku di jiyana em dixwazin pêş bixin de cîh ji van re nîne.

***Me.:*** Serokê min, pirseke min heye. Jinên ku hinekî dixwazin Rêbertiyê fêm bikin, li gel Serokatî heta dawî xwe rehet û bi hizûr

hîs dikin. Dema ku we qala Fatma kir, ger em asta zekaya Fatma û perwerdekirina wê bînin berçav ma Fatma qet hewl neda Serokatî fêm bike yan jî huzûr û ew rehetî hîs nekir?

**---.:** Cîhaneke wan a serdestiyê heye. Mesele Fatma, keseke pir zû fêm dikir bû. Hîn di nêviyê sala 1970'î de, dît ku ez darbe li jiyana wan a çil salî û di asta herî jor didim. Min hêjî kesek ku xwe şoreşger bibîne, lê xeteriya herî mezin baş tesbît bike û li gorî wê aqilmendiya ku xwe ferzkirinê raber bike neditiye. Ji (Qarakoçanê) Depê mala wan girtin anîn û di sala 1975'an de bi rêkûpêk derxistin pêşberî min. Bi qerta Kurdistanê dilîst û jixwe piştre yekî ev got. Hinek ji wan li ser Botanê dilîzin, hinek jî li ser cihên din. Vaye nîqaşên wisa kirine. Bê ku kedekê bidin, li ser min lîstinê ji desthilatiya xwe ya berê dibe ku çil salên din jî dixwest bidomîne. Ev heta dawî serî şixwulandineke îblîsane ye. Niha jî yê wisa hene; em dev jê berdin ji bo watedayîna keda ku em raber dikin zekaya xwe karanîn, jê saw digirin û dibêjin; "*tu cîhana me tarî dikî."* Min bi awayekî pir vekirî nîşan da.

Ez cîhana azadiyan xêz dikim. Di vê cîhana azadiyan de cih ji herkesî re heye û alikariya dikeve ser milê me jî ez bawerim jê zêdetir jî em didin. Jixwe pêwendiya taybet jî ez ji bo vê fikirîm. Min got; " *Ev di karektereke noker de ye û dibe ku zehmetiyan jiyan bike, bila alikariyek be"* di wateyeke sembolîk de nêzîk bûm. Lê em dev jê berdin ew girêdana xwe bi Kemalîzmê re, bi taybetmendiyên çîna noker ve qut bike, hewl da ku wê di zemînê me yê çînî, li ser şoreşa me ya netewî biteyîsîne û bikar bîne. Ez bawerim ferq kiribû nakokiyeke pir mezin heye. Vaye ew milîtanê me nû pêgîştî, çîna gundî biçewsîne, pîrektiya xwe bikar bîne, bi asanî dikare wî ji rê derxe, kontrol bike, bikar bîne û ji hemû aliyan ve zekaya xwe wisa bikaranîna wê hebû. Ji bo ku bi me re zekaya xwe li ser bingehekî rast parve bike, jiyan parvekirin, di mijara parvekirina rizgariya netewî, sosyalîzmê de ne di nava nêzîkatiyeke erênî de bû. Qet bi vê nedifikirî jî.

Berevajî di nava helwesta ev çek ji destê me girtin û ji bo armancên xwe yên yom bikaranîn, PKK'ya ku mezin dibû, pêş diket ketî bikaranîn, li ser me ferzkirinê çêkera rêxistinî mahf kirin, teqez derfet ji bilindbûnekê re nedayînê de bû. Min kesek bi qasî wê nedît ku ewqas li ser navê pergalê şer bimeşîne. Li ser esasê fêmkirina me li gorî vê hemû hunerên xwe yên pîrektiyê ya ku bikar tanî bi rastî jî min nedît.

Ya rast gotina pîrektî-zilamtiyê jî ne pêwîste. Bi kesayeteke cuda dixwest rêya me qut bike. Weku min got, "*digot ez çawa dikarim cîhanê bifetisînim.*" Hema bêje kesayetiyeke weke "*prensesa tarîtiyê*" raber dikir. Di despêkê de bi kesayetiyeke wisa ya tarîtiyê qet kêm nake, ber bi tinebûnê ve diçe û ya ku diviya bû hesabê wê bê xwestin nûnereke pergalê ya zekî û bi îdîa re rû bi rû mayîna me jênerev bû. Dikarîbû veguhere, dikare bê pirsîn; yeke kesayetiya wê wisa hatiye stran nexwe şansê veguhertinê nîne. Jixwe em zêde serde çûbûna, dê şikestiba û miriba. Ji bo yên wisa qala veguhertinê nayê kirin. Armanca wê ya sereke çîroka PKK'ê weke ku provakator dibêje, "*çawa ji dayik bibû, wisa jî xistina binê erdê bû.*" Ev sernexist û bawerim li beramberî vê jî pir hêrs bû. Pir xwest xira bike. Pir kes ber bi întîharê, revê, aloziya ku hîn jî dewam dike ve dahf da, lê me jî zanî mezin fêr bibin û bi bandorkirineke mezin teysîna asta netewî ve me gihand hêza veguhertinê. Ez bawerim ew jî, KT'yê jî vê fêm dikin. Min got ya, rizgarbûna min ji wê kabûsê ji dayikbûna duweme. Dibe ku ji we re ecêb, asan û basît bê û hûn bêjin ma çiye; "*du sîla lê de, wê xilas bibe.*" Min nekarî. Jixwe ewqas rasteqînbûna min, xwe gihandina hêza çareseriyê, ez bawerim pêwendiya xwe bi vê nêzîkatiya min a hostane ya mezin re heye.

Wê demê hevalan, weke ku min got Kemal Pîr wan, hema dixwestin ceza bikin. Ger min wisa kiriba, ez bawerim ez ê zêde fêr nebûma. Meraqa min ê bi dahûrandinekê bi dawî nebûya,

hestên min dê ewqas ber bi dahûrandineke jinê ya kûr û berfireh ve neçûna. Nêzîkatiyên wê yên mezin dij jinê, min ber bi nêzîkatiya mezin a jinê ve bir. Ji cinsê jinê bûna wê û ewqas bi rastiya jinê lîstina wê, rê ji pir radîkal destgirtina min a azadiya jinê re vekir. Vana hemû encamên bi waneyên mezin dagîrtine. Ez hertim dibêjim, ji aliyê min ve veguheriye amûrekî sereke yê fêrbûnê. Ger ez bi vî amûrî fêrnebûma, me nedikarî ji hemû aliyan ve em dahûrandina mêtingerî, nokeriyê jî bikin. Nemaze di vê çarçovê de me nedikarî em PKK'bûnekê jî pêş bixin, me nedikarî em we derxînin holê. Ew binxistin bi qasî ku ji bo hemû PKK'ê bû, ji asta netewî, bi taybetî jî ber bi azadiya jinê ve gavên pir girîng dayîna avêtin bû. Ger di fetisandina min de serketiba, wê niha tenê jinek jî nebûya û yek ji we jî dê niha ne li vir bana. Min bifetisîne yan jî bi her awayekî ez xistibama bin bandora xwe, girêdabama, jixwe dê lêgerîna min a jina azad jî nebûya. Dê asteng bikira. Dê Her tişt pir cûdaba.

Niha hûn çiqasî nûnertiya xweşikiyan dikin? Ger ez nebûma, wê yek ji vana jî nebûya. Niha hûn di nava vekirina mezin a azadiyê de ne. Dê ev pêşketin derneketa holê û minê jî yek jina azad nedîtiba, min ê gelek ciwanên bi behre dernexista holê. Lê li ser vê mînak û dahûrîna jinê, niha hema bêje ez pisporê xweşikiya me. Ger ez vê mijûlbûnê hîn jî kûr bikim, hûn ê bibînin, kesayetiyên çawa derkevin holê. Ji dayikbûna netewekî mezin ji hemû aliyan ve bi vê ve girêdayî ye. Bixwazim û hinekî din pê re mijûl bibim, ez ê keçên herî xweşik derxînim holê. Hûn despêkeke biçûkin. Ger ez mijûlbûnê kûr bikim, hûn ê bibînin, kesayetiyên çawa derkevin holê. Mijûlbûneke mezin a netewî bi vê ve girêdayî ye. Ya rast çêkereke wê ya jinê zêdetir dişibiya her tiştî hebû; weke ku em vê ji yê din re dinivîsînin ne nivîsînin. Tevî ku dikarî baxive jî, tenê peyveke bi wate jî nedikir. Hemû îdîaya wê, mijûlbûn bi afirandina kesayetiyeke jinê ya ku dixe ser feraseta namûsê ya netewî bû. Li gorî feraseta namûsê ya Kurd

yan jî li gorî xwe, di nava mijûlbûna îdîayeke wisa de bû. Weke malbat ji xwe pisporê çil curê pêwendiyên malbatê ne; taybetmendiyeke Kurd a paşverû dît, xirab bikar tanî. Zilamê Kurd, xwedî feraseta namûsê ya tê zanîne; bi jinekê ve hat girêdan dimire, ji bo wê hemû tiştê xwe difroşe. Ji bo wê şoreşgeriye, partîbûne çavê xwe jî nabîne. Hemû veberhênanên wî li ser jinê ye. Li derdora wê bi vizînî dizîvire.

Vaye vê jinê xwest min bixe nava vê xefkê. Dikarim bikevim navê jî. Ê jixwe feraseta namûsê ya kevn û gelek bermahiyên ji kevin mane hebûna xwe didomînin û min jî wan deman hîn xwe zêde pênegihandiye û di rewşeke wisa de me. Di encam de ez jî benî ademekim û ew jî keseke heta dawî xwe perwerde kirî bû. Min bi zorê xwe li ser piyan digirt û tevî ku ez ji vê kesayetê direvîm jî jê rizgar nebûm. Tahrîkgeriya mezin, bêrêziya mezin kêlî bi kêlî bû, lê ez neketim. Encam; xwe wisa avakirina min e. Li ser gelek tiştên din jî dikarin bên gotin. Ez bawerim ev, di çareseriya Kurdan de mijareke sereke û di girîngiya kîlîtê de ye. Ji niha ve diyare ku wê bibe mijara romanê. Ji ber ku pêwendiyeke kilîte û tahlîlkirina min a wê pêwendiyê, ya rast yê din jî mîna verişandina gorekê li pê xwe anî. Wekî din?

***Roz.:*** Serokatiya Partiyê di dahûrînekê de qala xefka sêgoşê dike. Ez bawerim aliyek jî ev pêwendiye. Lê dema ku got xefka sêgoşê xwest çi îfade bike min zêde fêm nekir. Hûn dikarin hinekî vê vekin?

***---.:*** Min berê jî gotibû. Pirtûkeke ew kontr-gêrîla Ersever hebû, ji wir tevgerîm û min tabîra “*sêgoşê”* bikar anî. Lê wateyeke din a vê tabîra min bikar anî heye. Gengaze ku mirov bêje taybetmendiya vê pêwendiyê ya mîna sêgoşeya Bermûda ku hemû tiştan xerq dike heye. Dikare bê gotin Sêgoşeya Îblîsê Bermûda jî. Çine serê wê? Girêkên me yên kor ên civakî hene, hinek taybetmendiyên sereke yên zilamê Kurd hene û girêdana bi jinê re heye. Pêve hate girêdan teqez siyaset dikeve pîlana

duwem, ticar nabe leşker û xirab difetise diçe. Ji bo vê ye ku, di heman demê de ketinekê îfade dike. Vaye Sêgoşeya Bermûda. Ez bi rastî ji bo ku di nav de nefetisim pir mijûl bûm. Heta niha jî pê difikirim min çawa xwe rizgar kir. Bexteweriya herî mezin jî niha li ser vî bingehî dijîm. Pêvajoyên min ên rizgariyê din jî hene, ev yek ji pêvajoyên min ên rizgariyê ye. Ya rast pêwîste hûn vê pir bişopînin. Wisa xuyaye ez zêde nikarim bidim fêmkirin. Wê demê ez di ferqa lîstoka mezin de me. Jixwe ji min re digot; "*tu zilamekî çawa ye?"* ji serê kêliyê carekê digot; " *M. Be ez ê wisa eyar bikim, Eb. Be wisa gire bidim, Kor Cemal, Terzî Cemal be ez ê wisa hal bikim."* Min despêkê fêm nedikir ew dixwaze çi bêje. Lê belê li derdora min xefik dihûnan û taybetmendiyên min jî ez ji xefka wê amade dikir rizgar dikirim. Hîn jî hêjayî li ser fikirandinê ye. Wekî din ên ku dixwazin mafê axaftinê bigirin hene?

***Pe.:*** Serokê min, ji tiştên ku hevalan gotin cudatir ez ê tiştekî nebêjim. Ez dixwazim di derbarê nêzîkatiya Rêbertî de hinek tiştan bêjim. Disa dixwazim hinekî nêzîkatiyên me vekim. Bi me re zêdetir xwe dayîna jiyankirin heye. Yanî xwe tevlî jiyanê nekirin, tenê şêwaza pêşkêşkirinê heye. Beramberî vê nêzîkbûna Rêbertiyê jinê tevlî jiyanê dike û wê dikişîne nava jiyanê û wisa jiyana wê watedar dike. Ev ji zarokatiyê ve wisa ye. Îro pêşketina artêşa jinê ji hemû aliyan ve jin kişandina nava jiyanê û hewldana tevlîkirinê heye. Ev êdî encam dide. Di vê çarçoveyê de jiyan watedar dibe, jin cara yekem bi xwe re rû bi rû dibe, nas dike. Di civaka Kurdistanê de cara yekem ber bi jiyanake nû bi çareserkirina vê nakokiyê re tevlîbûn despê dike. Hem ji aliyê pergalê ve yanî mêtingeriyê, hem jî bi serdehatina provakatoran a vê xalê ji ber vê ye. Ew jî dizanin ku vebûna girêka kor di vê xalê de despê dike.

***---.:*** Bêguman, pêwendiya sereke ye. Em ferqê datînin. Em qutbûnê ji hemû kevneşopan û ji saziyên wê pêk tînin. Ev jî ji bo

wan "*Felaketeke.*" Yanî bi gotina wan, "*ben qutkirine.*" Lê di rastiyê de jî ber bi azadiyê ve gaveke mezin avêtine. Dîqat bikin, me hûn niha bi we re rû bi rûyê hev kiriye, bi civakê re rû bi rûyê hev kiriye. Xwedê zane em ê hîn çi bidin jiyankirin. Tenê bila hêza we hebe. Ez ê hîn pir tiştan bikim. Her bijî ji yê ku li ber xwe bide. Dahûrandinên min ên evînê hene. Em hîn di pêvajoya hevnasînê de ne. Jixwe ne wisa ba, pêwendiyên li wir dê ewqas biçûk û belengaz nebûna. Bi keç û kurên xwe ve mijara hêrseke mezinin. Bijareyên jiyanê ewqas hatine derxistin, israra we ya kesayetiya xwe li gorî vê guncawnekirinê rewşeke bê fêmkirin nîne. Hêrsên min ên wisa hene. Ez niha hinekî we îdare dikim. Hûn pir hatine biçûkkirin, zilam pir jihevde ketiye, bê îdîa, bê çare û jinê dixwaze. Xwestina jinê domandina lîstoka ketîbûnê ye. Başe, bi vê rewşa xwe jin dikare çi bidê, çi pêşkêş bike; ji bilî bûna amûr ji tatmînkirina ketîbûnên xwe yên basît. Ev jî tê wateya hevdû noqkirinê. Ez ditirsim û dibêjim eman ez noq nebim. Hecko wê hemû nirxên min ên mezin ji min bên girtin û ji bo we winda nekim hemû tiştê xwe datînim holê.

Vana hemû ji bo çine? Me hemû mezinbûn ji dest dane. Ne leşkerekî baş derdikeve, ne jî siyasetmendarekî baş. Vaye em nikarin fermandarekî jî derxînin holê. Sunepetî heye. Hûn dibînin, min xistine çi halî, şev û roj kehir dibim. Vaye hîn doh li Amedê 5 jê jin, dibêjin 15-20 şervan hatin kuştin. Fermandarê wan jî dibêje; "*wey, taxim çû, ez ê jî întîhar bikim*" Ma ev fermandariye? Kî dizane bûn qurbanê kîja kêmasiyê ne! Hêrs nebûn ne di dest de ye. Her roj nûçeyên wisa girtin, ji dil de li me dide. Bifikirin pênc keçên ciwan, bi yek carê îmha dibin. Kî zane çawa bûn? Hûn wisa dizanin ku basîte, vana hemû ji ber biçûkiyan ji dest tên dayîn. Divê ku hûn fêm bikin em çima ewqas jiyanê bi hûrkariyan ve digirin dest. Xwezî hêza we heba we mezinbûna xwe parastiba. Xwezî hûn bikaribin bibin jinên bi îdîa û zilaman mezin dikin. Hûn zêde hêvî nadin. Derfet hebe hûn ji ketin û xistinê re

guncawin. Ez ji fedakariya we re tiştekî nabêjim. Ew provakator jî ji bo vê we weke " *qurban"* bi nav dike. Lê tenê bi serê xwe fedakarî ne çareseriye. Ez wisa berfireh nêzîk dibim. Pêwîste hûn vê fêm bikin. Ger na em we bi pêwendiyên erzan rehet bikin, di himêza hevde em hevdû erzan bidin jiyankirin; gelo mezinbûneke wisa dikare bê destxistin? Na. Tatmînên hestên erzan hîn zêdetir ji ketinê re, ber bi gelek peywirên sereke berdanê ve dibe. Ji jiyana gelek fermandarên me tekane jî diyar dibe. Ger îdîaya we heye eşkereye ku divê hûn li beramberî hemû tiştî baldar bin.

Ger hûn xwe bigihînin asta netewî, hûn ê başiya herî mezin li xwe jî, li Partiyê û li têkoşîna azadiyê jî bikin. Hêza xwe ya fedakariya bilind û cesaretê, ger hûn bikarin di nava dahûrandineke wisa de binirxînin, hûn ê bibin xwedî derketineke watedar. Berevajî dê heyf be. Em ticarî xwe fedakirineke wiha şayanî keçeke ciwan nabînin. Wateya vê di nava me de pêwîste pir mezin be; dîsa jî nebesî çavkaniya xwe ji we digire. Pêwîste hûn asan bi dest ve bernedin, dev ji xwe bernedin; gelek aliyên bi hêzê yên jiyanê hebin, rêxistinger bin, nûnertiya domdariya vê heta dawî bi pîlan bikin, şêwaza tevgerîneke hertim amadebûnê destxistin pir girînge. Min van mijaran pir zêde kar anî. Teqez divê hûn vana derxin zanînê û heta dawî fêm bikin. Wekî din?

***Be.:*** Serokê min dixwazim çend xalan destnîşan bikim. Pêwendiya bi Fatma re, bi qasî ku ez dibînim xala sereke ya ku nakokî despê dike. Fatma hertim dixwaze serdestiya xwe ava bike û ji ber ku Rêbertî vê serdestiya çînî qebûl nake ya beramberî xwe dixwaze bikişîne nav hêza xwe yanî ber bi asta xwe ve bikişîne. Lê Fatma vê li ser esasê serdestiyê kar tîne. Nakokî jî ji vir despê dike. Weke ku Rêbertî jî da diyarkirin, hêza Fatma ya tahlîlkirinê zêde heye. Lê xaleke Fatma jibîr dike heye ku, ev jî ya Rêbertî wê tahlil kiriye û xalên wê yên lewaz tesbîtkirin û li ser vê xwe bihêzkirine.

Li ser civakbûnê çi di dahûrandinên demê dawî tê pêşxistin de be, çi jî di dahûrînên van çend salên dawî de bi giştî tên pêşxistin de be têkoşîna me ya ku pêş dikeve, eşkereye ku rê li ber gewdeyeke mezin û çêkera qadro vedike. Heta ji çînên cuda kesên xwediyê ferasetê cuda jî hene û hinek pirsgirêkên vana ferz dikin hene. Li ser esasê van pirsgirêkan ji ber ku em pêwendiyên pergala kevin qebûl nakin û mahkûm dikin pêwîste em jiyaneke nû deynin pêşiya xwe. Li beramberî vê xala ferzkirina jiyana pergalê bi xwe heye. Bawer dike ku wê bi vî alî bikaribe veguherîne. Ger em mînakekî bidin, sala borî di derbarê Sari Baran de kaseteke vîdeo anîbûn Hollanda. Li Başûrê Kurdistanê kişandibûn. Kaseteke pir berfireh hatibû amadekirin bû.

**---.:** Kaseta çi, çi hebû di hundirê wê de?

***Be.:*** Di derbarê Sari Baran de kaset çêkiribûn. Par dema ku li gel KDP'ê bû, çend Hollandî çûne wê derê û bi taybetî li ser azadiyê, li ser pêwendiyan pêre axivîne.

**---.:** Kîjan xal vekiriye?

***Be.:*** Bi taybet şêwaza jiyaneke pergal ferz dike heye, rewşa me ya qebûlnekirina wê jiyanê heye û li beramberî vê pêwîste em jiyaneke alternatîf pêşkêş bikin.

**---.:** Bala hemû rojnamevanan kişandibû û heta niha jî lêpirsîn dikin. Di demeke nêzde wê yekî din jî were. Ez bawerim wê vê pirsgirêkê jî bigire dest. Xwezayî ye û sedemên xwe hene. Ji ber ku encamên girîng afirandiye. Îhtîmaleke mezin Fatma dixwest serdestiya xwe bidomanda. Heta dixwest li ser serdestiya xwe serdestiyê zêde bike. Ji bo vê jî weke amûrekî nezin ez dabûm berçavê xwe. Bêguman xala ku netanî aqlê xwe, hesab nedikir û tê de dixapiya, xwe sipartina wê ya derbaskirina min a pîvanên zilamê Kurd a klasîk bû. Lê taybetmendiyên min ên cuda ev hesabên wê vala derxist. Derbaskirina Fatma dihat wateya derbaskirina dîroka koletî, desthilatdariya mêtînger a hezaran sal û bi vê ve girêdayî serdestiya nokeriya Kurd ku hatibû pêşxistin û

xefka jinê ji hemû aliyan ve derbaskirinê. Xwe gihandina kûrahiyeke ewqas mezin, ji hemû aliyan ve hesabkirin û di encam de xwe ji vê gerîneke rizgarkirin, weke ku tê payîn ne asane. Min got ya, tirsên min ên mezin û xwe şûnde dayîna min niha tê fêmkirin. Hîn jî tê bîra min, tevî ku pir ditirsiyam jî min pir baz dida. Hema bêje rewşeke ne dikarim bi wê û ne jî bê wê mijara gotinê bû. Ew di heman demê de di çarçoveya pêwendiya malbatê de hesabxwestinek jî bû. Û bi rastî jî bê ku pratîka tekoşîneke wisa bihata jiyîn me yê piştî wê çawa domandiba tu kes nikare erênî bibersivîne.

Di dîroka Îslamê de şerê Bedir heye, şerekî amadekariyê ye. Ji şerê ku Mahîr Çayan wan li Tirkiyê dan despêkirin re tê gotin şerê pêşengtiyê. Ya me jî di vê watêyê de şerekî pêşengtiyê ye. Ger me ev şer nemeşandiba, ji bo piştî wê ti şer dê bi wate û pîlan pêşneketana. Kes ji me nebana. De îca kes ji we nikarin xwe biçûk bibînin. Hûn niha asteke nû ya netewî ne. Ger ev şerê bi pîlan nehatiba pêşxistin dê yek ji wan jî ji dayik nebûna, bifetisiyana. Di vê mijarê de pir bê rehm bû. Min ê nekariya tenê yek milîtanekî zilam jî di destê xwe de bigirta. Min ê keçên durû, zilamên bi çargavî ber bi jiyana kevin ve dibezîn bigirta. Jixwe heta wê rojê jî ji sedî nodê wan çûn, di destê min de ji sedî deh man. Hindik mabû hemû keda min ji dest min biçe. Ew KT'yê bû, xebata wî ya jinê bû. Rêberiya wî bû, Kemalîst bû, Kurdistana hatiye qetilkirin bû, dewleta rêxistinkîrîbû û rûpêşa wê bû. Yek ji karên herî girîng ku ev fêrî we bike, civak, pêwendî pasît negirtin, bi kûrahî xwe gihandina rastiyan û ez bawerim wêneyeke ji vê binirxtir nabe.

Hûn niha bi vînin, difikirin; yanî her yek ji we bi qasî ku bi dema berê re neyê qiyaskirin hûn bi asanî dikarin bêjin ku em bi hêzin. Dema ku hûn nû hatin sosret bûn. Niha hûn pir zanane, hema bêje hûn artêşekin, ger hûn berevajî cewherê xwe nekevin hûn dikarin weke hêzeke pir alî jî derkevin holê. Bêguman ev

despêkeke. Perwerdekirin, rêxistinkirin, nûneratî kirin rêberiyekê dixwaze. Temam şoreşeke jinê tê jiyîn. Ger hûn weke tê xwestin pêşengtiya wê bikin, dê çi bên qezenckirin hûn ji niha ve dikarin bibînin. Ji hemû aliyan ve ketina ferqa cinsê xwe, cudabûna xwe danîna holê, rêxistinkirin û derbasî çalakiyê kirin, niha di nava derfetan de ye. Eşkereye ku ev hemû jî pêşketinên pir girîngin. Li cîhana kevin binêrin, keça belengaz digirin û dibêjin; "*Me te da mêr.*" Hîn jî tê bîra min, dema ku em hatin Mêrdînê gotin; "*ev keça 12 salî axayê 60 salî dixwaze.*" Heta niha jî dîmenê wan di hişê min de zindî ye. Ev cîhaneke çawa ye, ma her roja wê ji mirinê ne xirabtire? Divê ku hûn xwe lêpirsîn bikin. Cîhaneke dehşetwarî ye, jiyaneke tine dike ye; divê ku hûn heta moxê hestiyên xwe hîs bikin.

Mijara ku ez li ser radiwestim, di heman demê de dahûrîneke evînê, dibe keda dahûrandina evîna netew. Teqez divê rêz jê re bê girtin û girîngiya vê kedê baş bê dîtin. Yek ji başiyên herî girîng ku ez bi Kurdekî bikim ev e. Heta niha weke tê xwestin min ev pêk ne aniye, ez vê jî bêjim û ez heta niha jî li ser dixebitim. Ez di vê mijarê de xwe naxapînim. Rasteqînim. Li dijmin binêrin dibêje; "*ev nizanin hez bikin.*" Bi taybetî jî di pêvajoya piştî îsyana Dêrsimê de vê dibêjin. Kurdan weke "*wahşiyên ji hemû curê li navbirinê re vekirî*" dibînin. Encamên wê polîtîkayê jî li ber çava ne. Pêwîste em bidin îspatkirin ku ev ne bi vî rengî ye. Li beramberî faşîzm û mîlîtarîzma Tirk em neçarin xwe biparêzin. Ya min evîneke? Navê wê girînge. Em ji aliyê dîrokî ve jî navê wê lê bikin, ev çiye? Min ketina xwe ya malê ji we re vegot. Ya rast min dikarî hinek zarokan jî ji wê malê rizgar bikim, bi taybet bi vê xembar dibim. Keçikeke hîn biçûktir hebû, qet nebe min dikarî ez wê rizgar bikim. Piştre min bihîst ku endamekî MÎT'ê dest avêtiye wê keçika biçûk, keçik xira kiriye, ev ji bo wê felaketeke. Hinek zarokên malê yên kur jî hebûn, min dikarî ez wan rizgar bikim. Lê ji ber nebesiya taktîkekî min ew rizgar

nekirin. Ger na min wisa dev ji wê malbatê bernedida. Belê, di heman demê de şerekî namûsê ye. Ev tolgirtina çiye? Pêwîste nav bê lêkirin. Bi rastî jî ev rewşeke tolgirtinê ye. Li ser navê xwe jî ew tolgirtin min rakiriye. Wê bi xwe hewl dida bide diyarkirin ku çiqas bi we ve girêdayî ye, çiqasî jî berevajî min biteyisîne, di nava hewldana teysîneke wisa de bû.

***Fu.:*** Digot ez bi rastiyê ve girêdayîme. Ev rastiya wê bi aliyê wê yê ji Dêrsimtiyê ve girêdayî ye.

**---.:** Ya rast wê dizanî ez tevgereke tolgirtinê pêş dixim û ferq kiribû ku ev jî tolgirtina komkujiya Dêrsimê ye. Ji ber vê pir zêde xwe nêzîkî te dikir. Jixwe wê demê serê te jî tevlîhev bû û te zêde wate jî nedidayê.

***Fu.:*** Rewşa min baş dinirxand.

**---.:** Te zêde wate nedabûyê, te digot çibû. Dibe ku hûn despêkê li beramberî peywendiyên min matmayî bimînin. Xwe kom bikin; biryarên xwe yên despêkê li gorî pêwendiyên min ên despêkê nedin. Dibe ku hûn pir ecêb jî bibînin. Lê ya girîng pêwendî çawa ber bi encam ve çûye.

***Roj.:*** Nêzîkatiyên Fatma ji mirov re bi şêwazekî pir zirave. Em demeke pir kurt bi hev re man. Dema despêkê mirov nas dikir xwe pir erênî dida nîşandan. Lê te piştre ferq dikin ku ev tenê di bîçim de ye. Tahrîkariya wê ya wê demê niha zelaltir dikarim binirxînim. Di 27'ê Mijdara 1983'an de di dema axaftinên Rêbertiya Partiyê de, Rêbertî ew bangî odeyeke din kiribû û wê jî li ber xwe da bû.

**---.:** Kîja ode?

***Roj.:*** Li mala Şamê Serokê min. Li bermaberî we li ber xwe da û li hêwanê ma.

**---.:** Wê demê li ber xwe da bû ne wisa?

***Roj.:*** Di nava me de ya herî kevin û bi ezmûn ew bû, yek ji wanê teqez diviya tevlî wir bibûya bû. Em wê demê hevalên nû bûn. Hevalek-du hevalên nexweş jî hebûn.

**---.:** Bêrêziyên wê yên wisa pir bûn.

***Roj.:*** Nirxandina 27'ê Mijdarê dihat kirin û ji aliyê dîrokî ve girîngiyeke wê rojê heye. Di rojeke wisa de xwe ferzkirin rewşeke pir tahrîkare.

**---.:** Vê jinê çawa cesaretî tahrîkeke ewqas mezin dikir Fûat?

***Fu.:*** Taybetmendiya çînî ye Serokê min, çînayetî dida axaftin.

**---.:** Tenê bi çînatiyê nayê ravekirin. Vê pir baş dibîne; wê pir tişt ji destê wan biçe. Em jî pir bi safî difikirin ku ji çîna noker şoreşgerekê qezenc bikin. Nêzîkatiyeke saf û nîyeteke baş. Nêzîkatiya di kesayeta wê de her ku diçe KT'yê anîna ser rê xwe zêde da hîskirin. Niha hêza çareseriyê, hêza mezine.

Ger ev dahûrîn nebûna ez bawerim em ê ticarî negiştibana vê hêzê. Em dikarin vê hinekî jî bişibînin çîroka Dehaq, nizanim. Ya rast di kesayetiya vê de ya ku me binxist çiye û kî ye? Dehaq hertim mejiyê mirov dixwe û xwe pê xwedî dike, ev jî zanîna netewî ya mirov dixwe, ruhê azadiya netewî dixwe. Ev jî yeke mîna Dehaqe, jixwe ev çîn bi xwe ji hemû aliyan ve ne wisa ye? Wê demê peyveke din a ku ji devê min derketibû hebû; Drakûla! (Romana ku ji aliyê **Bram Stoker** ve hatiye nivîsandine. Romana tirsê ye û mijara romanê vampîrin) Min ev ji bo Semîr wan gotibû. Vampîr, mirov ditirsand. Encama herî girîng, ji dayikbûna netewekî wisa dîtin û fêmkirina çawa ji dayikbûna azadiya jinê ye.

Em bi we re ewqas di nava pêwendiyên germ de ne, nêvenga evînê pêş dikeve. Ev, piştî çareserkirina vê pirsgirêkê gengaz bû. Bifikirin, ya din cewhera dîrok û ya civakê ye; ger em çareser nekin dê hezkirin nebe, hevaltiya me ya jinê ne be û em ê we jî nas nekin. Dê çiqas heyf bûya. Bifikirin, wê hezkirin û evîn pêş nekeve, hêz û behremendiyên we yên jinê pêş nekevin. Ev ê windahiyeke pir bi jan bûya. Em hinekî jî vê civînê ji bo vê pêk tînin. Heta gelek jin û zilamên ku ber bi întîharê ve bir, di nêviyê rê de lukûmin hene, me gelek hevalên xwe yên hêja ji dest dan.

Gelek keç jî kirin hîlebaz. Ew jî qurbanê vî karî ne. Ew jî jin û zilamên lewaz bûn. Lê deskeftên wê di serî de jî hûn bûn, bû Partî û gel. Di vê astê de pêşxistina min a jinê girînge. Di nirxandike xwe de min gotibû; “*tola ku min ji jinekê girt, ya hezaran milîtanê jine.*” Wê demê asta nerîna we hemûyan pir teng bû. Gengaz bû ku mirov ewqas bêrê xwe bide hevaltiya jinê! Ez ji bo xwe jî nedifikirîm. Tu li xwe bifikirî, tu li beramberî rastiya wê ya ji rêzê bû ne wisa? Tu ketibû bin bandora wê, te kiribû cûce?

***Fu.:*** Şêwaza wê dikir cûce û ber bi gerînekekê ve dikişand Serokê min.

**---.:** Dikişand û ber bi fetisandinê ve dibir. Em niha di nava wireya derxistina holê ya tevgera jinê ya mezin û hevnaskirinê de ne û ev jî bi derfetkirina me girînge. Ger ez jî tevlî vê pêwendiyê nebûma, hebûna yekî ji we jî ne dihat fikirandin. Min ê jina Kurd û jina azad nas nekira, min ê îbadet ji hemû nexweşiyên wê re kiriba û min ê jiyan ji xwe re kiriba dojeh. Bifikirin me yê çi winda kiriba. Di ser de jî min ê netewekî çawa winda kiriba, wê xweşikî di binê erdê de bimana. Vaye wê bi vî rengî têkoşîna civakî ya mezin û heta têkoşîna azadiya zayendî wisa ji dest hatiba dayîn.

Hûn neçarin vê fêm bikin; em çima ewqas ser de diçin û çima divê em ser de biçin? Ji ber ku beriya her tiştî çarenûsa netewî mijara gotinê ye. Fêm nekirina we çiqas xirabe hûn dikarin pê bifikirin? Dîsa ji jinê heznekirin, ew ne anîna asta hezkirinê, wê dernexistina rûyê rojê, dê çiqas biba windahiyeke mezin. Ma qet aliyekî wê bê hezkirin û girtin nebû, diviya bû herkes xwe di binê erdê de veşartî bigirta? Bawerim ev ê bibana windahiyên mezin. Di dîroka gelek netewan de rewşên mîna vê hatine jiyîn. Di netewên Elman û Fransizan de, Rûsan jî têkoşîneke sedên sal girtiye meşandine. Lê ya me pir cuda ye. Ger di demeke kurt de neyê çareserkirin dê tine bibe û biçe. Me Mem û Zîn vegot, hûn dizanin. Ya rast ew destaneke netewiye. Li encambûna destanê

binêrin; Mem pir bê çare ye û di rewşeke tiştek ji destê wî nayê de ye. Zîn jî wisa. Şansê ketina pêwendiyeke du alî û serkeftinê nadin, hevnasîn pêk nayê. Ya wê demê asta netewî ye, rêya hezkirinê nayê derbaskirin, tê astengkirin. Rewşeke ewqas diyarkere ku, ji tefsilîn û asê mayînê rizgar nabe. Li wir misrayan rêz dikin û asta gotinên mezin hene. Taybet bi gelê Cizîrê bifikirin di wê demê de hinekî be jî kurdînî zindiye, feodal bi hêzin, bi qasî roja îro pêvajoya linavbirinê ne mijara gotinê ye. Ya ku îro me pêk aniye hinek jî ji aliyê dîrokî ve lê binêrin; felsefeya ku di wir de razayî ye me hinekî bi wate kir. Ez pesnê xwe nedim, lê min ji hemû aliyan ve tahlîl kir. Min derfetên bêsînor hevgirtin û hezkirinê derxist holê. Yekîtiya netewî bi mîlyonan pêk hat. Bihêzbûna Zînê bi hezaran pêk hat. Dîsa heta dawî xwe bi hêzkirina Mem û derfetê xwe dayîna jiyankirinê heta pileya dawî zêde bû. Tiştên ku Ehmedê Xanî xeyal kirin min bi şêwazekî awarte pêk anîn. Wê nivîskar û lêkolînvan di demên pêş de zêdetir li ser vê rawestin.

Min çawa ev pêk anî girînge. Min got, yê me jî îhtîras û azweriyên me hene, em ji keda wisa bawer dikin. Pêşketineke mezin û dîrokî ye. Ji bo wê Beko êrîş dikin, em xweşiya munafiq û began naçin. Ev tiştên ku ez dikim despêkirina kar îfade dikin. Ger hûn ê xwe ciwan bihesibînin, lê li hêrsa min a xwe pêkanînê, ji ewqas kesî ji we re dayîna şansê jiyana azad  re çiqas hewl didim binêrin û ez hîn jî vana weke encamê hewla sînordar a pêkanîna vana dinirxînim. Lê asoya we pir tenge. De îca ka hûn hinekî vekirinên civakî ya çîrokê pêk bînin, nabêjim bandor jî nebin. Bêguman divê hûn jibîrnekin teqlîtkirina min jî ne gengaze. Weke min kirinê ji kesî ji we re şîret nakim. Lê karên ku hûn bikin hene. Di pêvajoya rizgariya netewî de, di pêvajoya rizgariya jinê de teqez divê bê fêmkirin û gelek karên ku divê hûn serkeftî ser bixin hene.

Hûn ji nava jiyaneke pir hatiye qirêjkirinê tên. Tevî divê hûn bibin xwedî jiyanek cuda jî, ev jiyan ji we re hatiye girtin, cîhana we hatiye tarîkirin, em nû nû we derdixin holê. Ev ji bo zilam jî wisa ye. Weke ku min got, di şêwaza pêwendiyê de ya herî xirab weke "*di mal de*" mayîn tê îfadekirin. Di demên borî de gelek nêzîkatiyên wisa hebûn. "*keça min ez te bidim Elî, ew jî nebû ez te ji Welî re bigirim?* Vaye hûn ji cîhaneke wisa tên. Pirsgirêka we ya tevlîbûnê heye. Peywireke we ya meşandina têkoşîneke civakî heye. Çima em we biçûk bibînin? Şansê herî mezin ji bo azadiyê didim xwe jî û heta armanca min a sereke -jixwe bi jinê re jiyankirin ne şerme- hinekî be jî ji pirsa "*çawa bijîn*" re bersivek pêşxistine. Ne bi jinekê re, çima em bi rastiya cewhera jinê re nebin dost, çima em bi jinê re hevaltiyeke kûr pêş nexin? Ez ê ji kê bitirsim? Ez ê wê rêza ku ji mulk re xêzkirine esas bigirim? "*Ev jin a mine, serdestiya min li ser heye*" tê çi watê? Gelo "*mêrek*" şayane ku di asteke ewqas serdest de be, gelo hûn di ewqas girêdanê de fêdekê dibînin? Hûn ji van zewacan tiştekî fêm dikin, aliyekî wê yên ku bi anûr dike heye? Ez hinekî xwe didim fikirandin. Bijareya xwe bikin, hûn azadin. Lê bi rastî jî divê ku mirov hinekî jî bal bikişîne ser rastiyên ku min destnîşankirine. Pêşxistina fikrê xwe bidomînin. Asta xwe ya bijartin û redên xwe pêş bixin.

Çima hûn di rewşa muhtacî destên belengaz de bimînin, çima hertim hinekî din xwe li ser ruh û bedenên we bi de rûnişkandin, çima hûn hertim bibim mijarê henekê xwe pêkirinê, ma hûn şayanî vê ne? Hov dîtin, biçûk dîtina cîns çima? Hema bêje vê jî weke qûralekî exlaqî lê bikin, ma ev raste? Çima hûn bibin qurbana hestên erzan, hûn erzan bên hezkirin, hez bikin? Çima asta civakî nîne, asta netewî nîne, çima bi qasî di mijarên din de, di vê mijarê de jî ferzkirineke we nebû? Yên ku hinekî jî rêza wan ji sozê re hebû çima ev rast dest negirtin û ji bo hebûna we jî taybetmendiyên heta dawî pêwîstin çima bi hev re nebin? Bi

taybetî yên ku dixwazin hemû ajoyên xwe têr bikin çima despêkê we li berçav bigirin? Yên ku hêza wan têra dijmin nake, hêza wan têra afirandina ti pêşketinê nake, dîsa çima hemû hêviyên xwe li ser we ava bike? Bi vî rengî jî çima hûn hemû bibin qurbanê koletiyê? Ma ev asayî ye? Ger bê dîqatkirin, ez heta niha jî hewl didim ji van pirsan re bersiva pêş bixim. Hem dipirsim, hem dibersivînim. Ewqas pirs bi min dayîna pirsîn rewşa tenê bi serê xwe ji wan re bersiv dayîn, gelo ne cefayeke mezine?

Ger sibê hûn geş bibin, dê cinsê jinê jî geş bibe. Lê dibe ku em neyên bîra gelekan ji we jî. Wê wiha bizanibin ku xwezayî ye. Ya rastî ev ketiyên li pêşberî me jî, ger tiştekî bi navê hezkirinê ku pêve zelîqîbin hebe jî, divê ku teqez bizanin ev jî bi xêra serê me ye. Tenê xeberan didin, lê rastî jî di holê de ye. Bi çalakiya xwe re kê çi derxistiye holê? Em çima nirx nedin we? Em mirovin, çima fêm nekin? Vaye ev cîhana min e, bawerim cîhaneke hinekî seyre. Ez nizanim ez çawa xwe bi encam bikim, yanî bingehê civakê, pir tiştên ku ji wan re tê gotin, "*fermanin, qûralin*" teqez ez ê wan tengav bikim. Ez nabêjim teqez werin tevlî bibin. Ger ji aliyê xetê ve hûn hêza xwe ya şopandinê dibînin, bimeşin û hebûn ango nebûna min jî pir ne girînge; ya girîng teqez li gorî cewherê xwe tevgerîna we û teqez serkeftî pêkanîna we ya serkeftî ya derketina jinê ye. Min dixwest ku heta dawî rêzdar bim, dixwest heta dawî jiyanê jî parve bikim, lê min ji vê re ne derfet dît, ne nêveng û ne jî dilê min karî vê rake.

Dixwazim ji niha û şûn de bi şêwazê ku me jiyan kir neyên jiyîn. Ez ji bo we jî xemgîn dibim. Di vê dema dîrokê de bi vî rengî hevgîştina me ya hev dibe ku we bixe zehmetiyê. Lê bi mêrxasî li ber xwe dan jî şerefeke. Bi taybetî jî wan nirxên ku çalakiyên xwe şewitandinê, ji bo radest nebe fîşekên xwe yên dawî berdan bedenên xwe, yên ku bombeyên xwe bi bedenên xwe ve helandin bi rêzdariyeke mezin bibîr ne anîn ne gengaze. Lê dîsa jî ev trajedîyeke. Ji bo ku nebe me hestyariyeke mezin raber

kir, lê rewşên bi vî rengî di nava cîhana lewaziyan de jênerev dibin. Di nêvenga bê hevsengiyên mezin ên hêz û zordestiyan de, em ji derxistina vana ya holê narevin. Em hewl didin rê lê bigirin. Ne weke ku dibêjin, "*miyên qurbanê*" daxwaza me ya herî ji dil hûn gihandina asta remzên azadiyê ne. Ya ku em şayanî we dibînin ev e. Ez bawerim jiyana di vê demê de herî zêde watedar jî ev be.

Her ku diçe bersiva ji jiyaneke çawa re pêş dikeve. Ji hemû aliyan ve cinsê xwe derxistina holê, azadiya wê û ji hemû aliyan ve tenduristiya wê temsîlkirin pir girînge. Ya ji me re pêwîste jî ev e. Biryarên bi pele li ser jiyanê hatine dayîn û encamên wê yên ku berê pê nehatiye fikirîn, dê rê li ber ji destê we girtina hemû mafên jiyanê veke. Bi ajoyên ku rabûne ser piyan di asta pêwendiyên ku asta xwe ya azadiyê nînin de em nikarin xwe bigihînin azadiyê, em ê nikarin xweşik bimînin. Li wir şer û têkoşîn nabe, ji ber ku di wir de windakirin teqeze. Ji vê re fersend nedayîna we pêwîste weke sedema tengaviyê neyê dîtin, berevajî zêdetir ber bi fikrandin û mezinbûnê ve bibe. Hûn dibînin em pir zêde dixwazin bi we re jiyanê parve bikin. Bê mubalexe ev bi vî rengiye, lê divê têqez hûn bi qanûnên vê ve girêdayî bimînin. Em pir xwezayî ne, ji dilin, lê encax em pir şer bikin ev ê me bibe serkeftinê. Xwezayîbûna me, ji diliya me divê ku me di nava şêwazên pêwendiyên erzan ên ku pergal li ser bilind dibe ve nefetisîne. Jixwe hûn nû çavê xwe ji jiyanê re vedikin. Hêza xwe nû nû derdixin holê. Hûn li beramberî destxistina nasnameya xwe rû bi rûne. Divê ku hûn vê bi hestyarike mezin bidomînin. Namûsa rast hinekî jî ev e. Min hewl da ku hinekî pêwîstiya wê raber bikim. Ger gengaz be hûn hinekî din zêde raber bikin. Çima hûn mezin nebin, nebin xwedî hilberîn; li beramberî jiyanê divê ku hinek tiştên hûn bêjin hebe û heta divê hûn bikin. Erzan girêdana we (ger ev ez jî bim) ez ê bêjim pir zêde pêwîst nebe divê ku neyê kirin. Girêdaniya we bi Rêbertiyê re jî, ji ber ku heta

dawî ji bo we watedar û jiyanî ye divê bibe. Ger na divê hûn filan ango bêvan taybetmendiya kesayetiya min weke sedema hebûnê nefikirin. Pêwîstiya girêdana bi Serokatiyê re vekiriye û ev jî ji ber bê ku Rêbertî hebe zêde derfetê pêşketina tevgera we nebûnê ye.

Bê hebûna min jî bila tevgera we pêşkeve. Dil dixwest ku hûn pir bi hêz bin. We ewqas pêwîstî bi xebatên perwerdekarî nedîtibaya. Lê nabe. Bi salan sekinîm, min hewl da dûr bisekinim. Lê dema ku min dît nabe, her ku çû neçar mam we nêzîkî xwe bigirim. Vaye di hemû qadên xebatê de, ji bo ku hûn jî cih bigirin ewqas hestyariyan raber dikim. Dibe ku hinek zehmetî û tengaviyên vê hebin, de îca di artêşbûn û gelek xebatên din de. Dîsa jî li gorî min nirx bê dayîn û bê dîqatkirin, rastiya me ya ku derdikeve holê heta dawî anûrê dide. Zana dike û teqez her diçe bi hêz jî dike. Ez bawerim ya herî başe. Ji ber ku wisa bûye çima qiyamet bê rakirin, çima ewqas bi ser me de bên? Diviya bû ji bo herkesî afirandina jina zana û rêxistinkirî anûrdar bûya û weke ku ez jê hêz digirim herkesî jê hêz bigirta. Çima kes xwe ji vê re amade nake? Çima heta niha jî nêzîkatiyên hestên erzan serwerin, çima hezkirin û rêzdarî bê naveroke, zêde ne bi wate ye; ma ev ne biçûkbûne? Xweziya her milîtanekî ji pêşketina jinê û zilam re bikariya hinekî alîkar ba. Gelo qet peywirên ku bên kirin nînin? Bi jinê re bûyîn, weke ku pir zêde ew tişta ku civak dixwaze bide gotin yan jî ya ku tê aqlê herkesî divê sivikbûn be? Ma hevaltiyeke cidî bi jinê re ne gengaze? Teqez divê girêdanên taybet, helwestên qirêj bên jiyîn? Di pêwendiya bi jinê re tenê cînseltiyeke çors derbasdar be? Cîhaneke din ya bê parvekirin nîne, gelo pir tişt ji dest nehatine dayîn, pir tiştên me yên ku bên dîtin nînin? Çima hertim çors nêzîk dibin, çima hertim eleqeyên wisa biçûk dixin, hestên erzan derbasdar be?

Vaye min hertim li beramberî van tengavî bihîst û ji ber van tengaviyan niha çareseriyê jê re tînim. Pêwendiyên ku dixwazim

li derdora xwe bibînim wisa resen û divê heta dawî pêwendiyên mezinkirinê bin. Ez encax dikarim di nava cîhaneke pêwendiyên wisa azadker de bijîm. Jiyana min, encax dikare bi cîhaneke jinên wisa re pêş bikeve. Ji bilî vê ez nikarim bijîm. Ger teqez dê bi jinê re bê jiyîn, ez dixwazin ewqas bi xwe re di nava hevgirtinê de bim. Hûn dibînin arasteya sereke ya hewldanên me, ji bo çawa jiyînê re şerkirine. Di nava hemû curê hewla vê ya rêxistinî û perwerdê de bûyîne. Bi qasî ku em hinek vê ser bixin em ê bikaribin bi rêzdarî û hezkirinê lihev binêrin. Ji bo hev encax em wisa wate îfade bikin. Teqez divê em bi bingehê kar hestên erzan, nêzîkatiyên ketî yên ji ber kevneşopên pergalê mane nedin rûnişkandin. Di vê mijarê de teqez ji serî heta binê pêwîste em radîkal bin, pirsgirêkê ji bingeh ve dest bigirin. Min di helwdana xwe de xwest hinekî nûnertiya vê bikim.

Hêjayî eleqeya ku hûn raber dikine. Gelek şahadetên watedar di vê mijarê de teqez ber bi şiyarbûnê ve birine. Ya rast ez nirxeke mezin didim wan keçan. Kesayetiyên ji aliyê ruhî ve bi me ve girêdayî hebûn. Min nedixwest ku ew wisa biçin. Lê wan, bê ku çavê xwe biqirpînin berxwedêriya mezin a radestnebûnê raber kirin. Ya ku dikeve ser milê me, wateya vê radestnebûnê, bi hestyarî veguhertina cîhana azadî û wekheviyê. Ev dibe pêywireke em ê nikaribin xwe ji ber bidin alî û rast bersiv dayîn ji bîranîna wan re, girêdan mayîn jî, encax bi hêzdayîna hewldaneke azadiyeke wisa re bigihêje îfadeya xwe ya watedar.

Hûn dibînin ku kar weke ku ji derve tê dîtin ne basîtin. Min xwest arasteyeke rast bidim pêşketinan, bawerim hewldaneke binirxe. Hûn ciwanin. Şansê jiyana azad bi hemû aliyan ve ne be jî we dest xistiye. Pêşxistina wê, geşkirin, bê binketinkirin jî divê ku mijûlbûna we ya sereke be. Hema weke ku di hemû mijaran de divê ku hûn her tiştî ji me hêvî nekin. Her roja ku derbas dibe pêwîste hûn ji xwe hêvî bikin. Cîhana ku em ê damezrînin, di asteke girîng de bi tevlîbûna we ya bi zanebûn, rêxistinkîrî, asta

biryardariya we divê bê damezrandin. Divê ku hûn ticarî ferzkirinên cîhana yek alî qebûl nekin, lê kesayetiya bertekek basît, bi taybetmendiyên jina ketî ya ku di nava dîroka civaka çînî jî li ser rewşa xwe ya paşketî jî ranezên û nekevin vê rewşê jî. Divê ku hûn heta dawî xwe komî serhev bikin. PKK'ê aniye asteke girîng û hewceye ku ev ast biçûk neyê dîtin. Qîmeta wê baş bizanin.

Min jî hêza xwe karanî, heta dikarim bêjim ku, di salên dawî de min bi awayekî awarte bi kar anî. Rê li pêşketineke biçûk neyê dîtin vekir. Divê ku hûn fersendê nedin paşvexistina vê. Ji niha û şûn de jî dê bi hestarî bê pêşxistin. Em ê hem karê hilweşînê bidomînin, hem jî bilindkirina hestan, bi qasî red kirinê bijare û pêşxistina behremendiyan jî bidomînin. Herkes bi şêwazên cuda li pê jinê dibeze, ez jî bi vî şêwazî dibezim. Piştî ewqas ezmûnan, baweriya min bi min bê dawî ye. Zilaman heta niha wiha dizanîn ku bi jin, an jî çend jinan hêzê qezenc dikin. Min bi hemû jinan re bi pêşxistina pêwendiyan hêz qezenckirin pêk anî. Eşkereye ku, jina ku ewqas hatiye lewazkirin bi hêz kiriye jî em in. Cîhana me ya ku ewqas hatiye tengavkirin bi vî rengî ronîkirin û veguhertina jiyanê ez bawerim alikariya herî baş bi hevaltî em bikine. Min pir zêde çewsandina jinê dît, bêçaretiya wê û biçûktiya wê dît. Heta niha çawa wisa dikare bê jiyîn, çawa xwe dixim nava lêhûrbûnekê û hewldaneke çawa hûn dibînin. Vaye bersiva ku min ji vê re da, ev xebate.

Hevrêtiyê dikin, bi wêrekî tevlî dibin, lê nexapin. Dibe ku hûn bi xefkên li ser navên min tên pêşxistin jî rû bi rû bimînin, nekevin nava van xefkan. Ez dibînim ku ji niha ve min hûn xistin nava fikaran. Min hûn bi gelek eniyên pirsgirêkê re rû bi rû anî. Di gelek mijarên ku we nedixwest pê bifikirin de niha we hêz qezenc kir. Teqez bi qasî ku bi dema borî re neyên qeyaskirin we pêşketineke girîng dest xistiye. Li gorî ku ev despêke, li piştî vê çima gavên mezintir neyên? Keseke hatiye girtin, cîhana

pêwendiya ku di nava sedan sal de teşe girtiye, bi hezar û yek qûralên exlaqî ve, bi pêwendiyê berjewendiyê re, bi avantajên aborî -siyasî ve hatiye reşkirin ev cîhana pêwendiyan, çima niha vekirineke mezin pêk neyîne? Ez di vê mijarê de heta dawî bi meraqim, di nava lêgerînê de me û xwedî berdewamkirina çalakiya xwe me jî, ez ê bidomînim. Di derbarê min de çi tê nivîsandin bila bê nivîsîn, heta hûn jî dikevin nava hestên çawa bikevinê, ez ê karê xwe bimeşînim. Ji yê xirab û qirêj re, yê neyê hezkirin, yê ku heq nekiriye re hezkirin nîne. Girêdan wê bi welat re, bi azadiya gel re, şerefa wî re teqez hûn ê ava bikin. Ji bilî vê ti pêwendiyeke we nabe. Em ê heta niha wan têgehên berevajî hatine kirin, van têgêhên girêdanê serwer bikin. Ya şayan jî ev e. Em tengav bûn, lê ya ku şayane, ji şermê rizgar bike ji ber ku ev e, her ku diçe xwe bi hemû kesî dide qebûlkirin. Ji her demê zêdetir me ji pirsa "*çawa bijîn*" re bersiv pêş xistiye.

Hûn dibînin ku, bi qasî ku ti zilam fêm nake û wê fêm jî neke em we fêm dikin. Hûn li ser vî esasî dikarin bibin ên me. Di demek wisa ya dîrokê de diviya bû ev wisa be û pir watedare. Dibe ku ti demên din wisa nebe. Dê nebe jî. Lê zimanê vê demê jî wisa ye, cewher, rastî û çalakî bi vî rengî ye. Li ser vê hinekî din bifikirin, di nava hewldana berfireh fêmkirinê de bin; hûn ê bibînin ku ya herî zêde şayanî we ye hem hatiye fikirindin, hem hatiye kirin. Xwe gihandiye rastiyê. Dil dixwest ku, hevalekî me derkeve û ji min baştir bike. Teqez ez ê jê re li çepika bidim. Ger neke, ya tê kirin jî fêm neke, berevajî pêşketinên mezin ku hatine pêkanîn bikeve, wê demê herî kêm bi qasî ku ez bi ser dijmin de diçim û ger pêwîst bike di çarçoveya fêrkeriyeke exlaqî de, ger pêwîst bike ez ê bi şêwazê çalakiyeke siyasî ser de biçim. Bi qasî ku ez dizanim ji ya rast û baş re çepika lêdim û weke ku ez vê jî pir dixwazim, yên ku berevajî pêşketinê bikevin yan jî bixwazin wê xira bikin wisa bi ser wan de çûyînê jî dizanim.

Bila ti kes di vê mijarê de nebêje hewldanên heyî bê bingehin, ji ber xwe ve derdikevin holê, rêgezên wê nînin wisa texmîn nekin û bi vî rengî fikirînê xwe nexapînin. Li şûna watedayîna rastiyên sotîner divê ku bi wan neyê lîstin. Herkes rêzdariyê, dilnizmî, bi qasî girêdana bi rêgezê bi esasên pêkanînê ve jî girêdayî mayînê bizanibe. Pêwendiyên me bi we re di vê çavçovê de ne, meşa me ya azadiyê jî li ser vî esasî pêş dikeve. Gav hatine avêtin, deskeftên xwe hene û di asta ku biçûk neyê dîtin de ne, em di vê baweriyê de ne ku dê hewldan serkeftineke tam jî bi xwe re bîne û em dizanin qezenckirina me heye.

**14 Cotmeh 1994**

## Hebûna Jinê Divê Bi Serê Xwe

## Çavkaniya Peroşe û Hêza Jiyanê Be

Dema ku xebatên me yên di derbarê vê dewrê û dewra bi dawî dibe de, me xwe gihandiye hinek encamên girîng, lidarxistina civkîneke wisa bawerim daxwaza we jî bû. Ev civîn di hemû dewrê de niqaşên me pêşxistin ên bi wate û teqez pêwîste bên kûrkirin, weke berdewamiya nirxandin û dahûrînên me ne. Dikare bê gotin ku, em şansê herî mezin ê jiyana azad dest dixin. Gelek pêşketin di vê xetê de me pêşxist û watedar kir, wisa bawerim ku di heman demê de ji aliyê pêşketina we de pir bi wate û heta nirxekî cewherî îfade dike. Li ser esasê ezmûn û jiyana xwe dikarim bêjim ku, pêşketinên bi we re destkeftên rasteqînin. Gelek qûralên wisa yên şerekî pir cuda, xweser û hostatiyê dixwaze, wate û encamê wê hene. Bi giştî dişibin hev, lê çareseriya rastiya we, ji hemû aliyan ve bi vî şerî pêkanîn, çi ji aliyê rastiya me ya civakî ve, çi jî bi giştî ji aliyê xweseriya jinê ve pir zêde nebûna ezmûnan heta dawî xwesere û bi serê xwe şerekî gelek zehmete. Ya rast hûn jî nû xwe dibînin. Em kîne, diçin kîderê, em ê çawa bijîn? Hûn van pirsan nû ji xwe dipirsin.

Li gorî min ya herî baş jî hinekî ev e. Ji ber ku teqez qonaxeke pêşketinê îfade dike.

Berê meraqeke min hebû. Hûn zanin ez li hilbijartina hevalên xwe, pêşketina wan pir dîqat dikim. Bawerim kesî ku bi qasî min di nava lêgerîna hevaltiyê de be nîne. Di dîrokê de destana Gilgamêş a hevaltiyê heye. Pir balkêşe û lêgerîneke pir kûre. Vaye bi we re pêwendî jî divê ku li ser vê bingehê pêş bikeve. Beriya her tiştî lêgerîneke kûr pêwîste. Wateya lêgerîna me ya hevaltiyê; bi hezaran sale pir riziye û li gorî min pêwendiyeke pêwîste bê redkirin, felsefeya jiyanê, siyaset, kevneşop û exlaq pêwîste em vana şênber bikin, ev jî pêwîstiya hewldana me ye. Em bêjin ew munafiqana, bi gotina rojane em bêjin êrîşên provakatoran ya rast ji ber ku di pêwendiya hezaran sal de me kunek vekiriye, ji bo wê qiyametê radikin. Weke ku di gelek şoreşan de mijara gotinê ye. Ger dîrok hinekî bê lêkolînkirin, di her pêşketinek şoreşgerî de yên wisa gotine; "*pergal ji dest diçe, exlaq ji dest diçe*" û qiyamet rakirine. Vaye bi yên bi vî rengî re em di şoreşa xwe de jî rûbirû tên. Bêguman derfetên we yên azadiyê di asta fikir de vekirin û derxistina holê ne asane. Min çîroka vê hinekî bi dahûrandina xwe re vegot. Bi taybetî di malbatê de li gorî kevneşopan nebûn, dîsa bi hemû awayî li gorî civakê nebûn di vê rewşê mayînê de hestyar nêzîk bûm. Min her tim ev weke xeterî dîtin. Min ev hinekî eşkere jî kir. Li şûna wê bi pêşxistina lêgerîna pêwendiyeke nû, pêwendiyek li gorî çawaniya wê bersivandin, hîn jî yek ji xalên ku em bi girîngî li ser radiwestin û li gorî min, hîn jî pirsgirêkeke sotînere. Dixwazim vê bêjim; dema ku me dixwest ya herî azad bibînin, fêmkirin û rêxistinkirin, beşa herî hestyar a xebata me ya şoreşgerî pêk tîne.

Ji ya tê texmînkirin wêdetir fêmkirina ruh, bihîstina ruh re girîngiyeke mezin didim û ji bo vê di nava hewldanê de me. Ez ne di wê baweriyê de me ku piraniya we fêm dikin. Lê lêgerîna min pir bi hêze, pir cuda ye û pirsa; "*Çawa Bijîn*" mezin lêhûrbûn dikim, lêgerîneke nêzîkatiyan li gorî vê tayîn dike ye. Pir zêde peyvên weke; "*bê jin jiyan nabe*" tên kirin. Ya min hinekî cuda ye. Belê, ew diyarkirin çiqas rastiyê îfade bike jî, bi jina heyî re jiyankirin jî bi qasî wê zehmet û rastiyeke sotîner em datînin

pêşberî xwe. Em di nava dubendiya mezin de ne, ji bo min pirseke mezin û bersivandina wê pir zehmete. Di binê dubendiyê de, pir zêde lewaz, di koletiyê de xerqbûye, ruhê xwe di hestên erzan de fetisiye, li şûna bi hêzbûn û bilindbûnê dilê xwe fetisandiye. Nêzîkatiyên belengaz li gorî min xeteriyeke rasteqîne. Ger ji derveyî vîna we be jî, bi giranî ya ku hûn diteyisînin ev e. Li ser vê gelek hesabên serdestiyên xirab û jiyanê hatine avakirin û ev bi vî rengî dîtina we jî xeteriyeke pir mezine. Ji ber ku wê ruhê me jî xira bike. Gelek heval çima bê serûber nabin? Çima nikarin bibin xwedî ruhekî mezin? Li gorî min di vê xalê de xwe windakirin heye. Ma hûn dibînin ku ez, bêguman mirov nikare li hêjmarê jî bide û çawanî hîn girîngtire, lê ez bêjim pergala cîhanê yan jî rastiya we, ez dikarim xwe ber bi ewqas firehiyê ve dirêj bikim. Zilamê yekane ya ku dikare xwe dirêj bikê jinek, ango çend jine, lê di nava pîvanên kevneperest de yan jî di şêwaza ketîbûneke ne rewa de. Ji vê wêdetir nikare şêwazê nêzîkatiyeke cuda û hêza wê jî raber bike.

Ev raste? Ya ew pêwendiya ku em ne rewa pênase dikin yan jî di karekterekî sivik de, ya pir dixe, tine bûye nêzîkatiyên li ser esasê pêwendiya pîrekê û mêr, dibin şêwazê nêzîkatiya serwer. Ev nêzîkatî di nava xweseriya xwe de ber bi encameke her tiştî ji destê me digre nabe? Dîsa ev ne yek ji sedemên cûce mayînê ye? Dema ku li rastiya jiyanê tê nerîn, ez dibêjim çavkaniya bêhêziyê ev e. Li şûna nêzîkatiyên wisa, hinekî li nêzîkatiyên ku ez dixwazim pêş bixim binêrin; ez bi şêwazekî sereke bi ser mijarên weke jin, malbatê şêwaza pêwendiyên wan de diçim. Min pêwendiyeke bi vî şêwazî zêde bi ruhê xwe ve gire neda, lê dema ku min gire da jî min hewl da ku azadiya wê esas bigirim. Min ji vana xwe derxist holê, xwe dît. Jixwe dikare bê gotin ku ez di asteke pir bi hêz deme. Lê tirs û dudiliya min a herî mezin, di vê mijarê de kêmasî kirin, bê sewiyebûn û înkargeriye. Dibe ku zêde ji aliyê we ve neyê fêmkirin, lê ez rêvebirina xwe ya kesayetê didomînim. Xwe rêvebirina min jî weke ku hûn texmîn dikin ewqas ne asane. Li Sûltanan bifikirin. Heta pêxemberan, heta hemû curê dewlemendan. Camêran dema ku digihêjin hezekê, îktîdarê karê yekem dikin, gelek jinên ku di bin fermana wan de ne yan bi hêz, yan jî bi pere digirin bin tekela xwe. Ev,

hema bêje di hemû kesayetên ku bilind dibin de derdikeve holê û bi di nava me de jî bi asanî meyla xwe dide der. Ji aliyekî ve dikare bêgotin, ajoya mirov a ku nikare rê lê bê girtin. Dema ku bi hêz bû, bû xwedî hêz, meyleke zayendî û çînî ku tu ferz bikî derdikeve holê. Rewşa bûyîna mêtîngerê serdest ê zayendî jî wisa despê dike. Vaye li ser esasê pêşketina vê civaka çînî şaristanî, dikarî min jî bigire bin bandora xwe. Ji bo ku negire pêwîstî bi şerê azadî, wekheviyê hebû û min hinekî ev li ber çav girt. Yê ku jiyan kiriye dizane. Civaka çînî yan jî serdest, gelê çewsîner, netew, cudabûna zayendî em çiqas bikaribin çareser bikin û em ê çiqasî veguherînin pêşxistina sosyalîstekî rast? Dê ji bo vê têkoşîn bê dayîn…

Xwe ji xwe parastin, weke ku hûn texmîn dikin ne asane. Xwe ji hêza xirabkar, dîsa ji bandora hêza dewlemendiya madî parastin ne asane. Vaye dibe ku zehmetiya herî mezin jî di vir de ye. Yanî xwe, bi taybetî di mijara jinê de, xwe ji bandora wê ya xirabkar parastin, xwe rizgarkirin dikare bê gotin ku çalakiya min a herî mezin bû. Ne bi zaafê xwe ve, ne bi koletiya xwe, ne bi serdestiya xwe, ne jî bi gelek nêzîkatiyên tên zanîn xwe lewaz nexistin pir girînge. Berevajî guftûgo û nîqaşeke rast pêşxistin, bawerim heta dawî xweser û balkêşe. Nêzîkatiyeke bê wêne ye. Di nava rastiya civakî ya ku ewqas neyênî tê de tên jiyîn de bêguman ya despêkê pêdiviya wê tê bihîstin, nêvenga nîqaşa azade. Tesbîtkirina vê pir ne zehmete. Herweha bê dîqatkirin hevnasîn di asta nîqaşê de mayîn, hev fêmkirin, lêpirsînkirin û bi hevre biryardayîna îfadeya jiyana azad xwe bi hesrata vê hiştin ango dîtin, nêzîkatiyeke em girîngî didinê ye. Êrîş û bertekên cuda di vê xalê de derdikevin holê.

Takekesîkirin, mulkdarîkirin, nexweşiyên civaka çînî dayîna axaftin yên ku xwe bê aman ferz dikin, lê xalên ku bê aman em jî bi têkoşînê hewl didin derbas bikin, rewşeke sotînere. Di vê wateyê de em têkoşîneke pir cidî ya navxweyî dijîn. Ger hêza we heye hem hûn ê di nava vê têkoşînê de cihê xwe bigirin, hem jî hûn ê serkeftinê pêk bînin. Dema ku min çîroka jiyana xwe vegot min hewl da vê xalê vebikim. Divê ku hûn çiqasî xalên vê yên sereke bigirin û rast pêş bixin? Ji ber ku derdikeve holê ez gelekî we bandor dikim. Ji hemû aliyan ve jiyana xwe ji vê re

bexşîn mijara gotinê ye, teqez pêwîste mirov we basît negire. Bi vê ve girêdayî hûn basît nedayîna girtin jî pir girînge. Berpirsyariyên vê yên dîrokî hene. Erzan xerckirina we, têkelî pergala serdest kirin, ji serdestî heta lewaziyên we re qurbanîkirin dê pir heyf be.

Di wateya çavkanîbûna jinê de di vê baweriyê de me ku hinek taybetmendiyên xwe hene. Jixwe ya ku em hewl didin vekin jî ew e. Hêza wê derxistin, xweserî, nasnameya wê derxistina holê bi min re azweriyeke. Meyla min a sereke ku dema bi ser pirsgirêkê de diçim, ji kirina mal zêdetir derxistina holê ye. Haz û feraseta her kesekî heye. Ya min jî vaye wisa pêş dikeve. Dîqat bikin, ez bi jinê re dijîm, lê jina ku pê re dijîm yan jî jinbûyîn, jinbûyîneke dibe xwedî nasnama xwe ye. Ev taybetmendiyeke min a jiyanî ya sereke ye û jiyanê jî encax wisa dikarim îdîare bikim. Mixabin ên ku li ser vî esasî azweriya wan heye hema bêje nînin. Di lêgerînê xwe ya jinê û nasname bi vî rengî derxistina holê de, "*kî ye, ji kîderê tê û wê biçe kîderê, çawa dijî û divê çawa bijî?*" bi van pirsan hema ji hemû aliyan ve lêpirsînkirin, anîna ziman ger hûn dîqat bikin û di vê xalê de mesafe bigirin, ya rast hûn ê jî cuda bibin. Ew ferq derxistina holê meyleke pir bi hêz a jiyanî ye bi min re. Jixwe dema ku hûn xwe şîrove dikin hinek xalên sereke divê ku hûn li ber çav bigirin hene; ruhê ku hûn anîn vir çiye û kê ji vê re rê vekir. Fedakarî, wêrekî û ji hemû aliyan ve yê ku hûn neçar kirin zanabin ev jiyan çawa li pêşberî we hat dayîn? Keça ciwan a ku berê nikarî biçe berderiyê mala xwe, çawa dibe ku van çiyayan, welatan derbas dike û hewl dide xwe bigihîne cihekî? Vana diyardeyên jiyanî ne. Xwest ber bi kîderê ve bê birin? Azweriya we ya azadiyê pêş dikeve, wê ev azweriya we çawa bi encam bibe? Azweriya min pir vekiriye, ez azadiyeke bê sînor esas digirim. Ya ku hinekî li ser jinê ferz dikim, hema bêje di asta nêzîkatiya tolgirtin ji hemû civakên çînî ye.

Ya rast ev nêzîkatiya şoreşgerî jî derbas dike, li gorî min nêzîkatiyeke hunerî ya tîpîke. Çiqas asta we raneke jî ya min azweriyeke hunerî ye. Herkes jinê di nava qalibên kevneşop de xêz dike; "*wisa dikene, wisa dilîze*" û hwd. Ya min afirandina serî rakirinêkê û encamên vê hesabkirine, vîna vê pê dayîna

qezenckirine; hema bêje em rista wê ya hunerî dilîzin. Dibe ku kereste rizî bin, dibe ku hûn bişkên û bikevin jî, lê dîsa jî hûn şayanî bûyîna mijara hunerin. Min got ya, dema ku em vê kar tînin, em hinekî jî tolê ji dîrokê radikin. Bi min re meyla hezkirina mezin heye. Nizanim, hûn dişibînin kîja meyla dîrokî bişibînin, ya girîng fêmkirine. Teqez bilinbûnekê îfade dike, bêguman hêzekî bi teysîna têkoşîna azadiyê hatiye qezenckirin û hêza xwe jî di vê wateyê de hewl didim watedar bikim.

Ez ji heyraniyên erzan nefret dikim, jê hêrs dibim. Bi feraseta min a xweşikiyê re hev nagirin. Ez ji girêdanên ku kalîteyeke wan nîne nefret dikim. Girêdana lewaz bi bin ve ji hukimkirina serdestan xetertire. Zalimek, yekî çiqas bigire bin serdestiya xwe û ez jî ji vê çiqas aciz bibim; ji lewazekî bi taybet jî ji girêdana jina lewaz jî ewqas aciz dibim û bertek digirim. Girêdanê bêbîr, erzan, teng, di nava sîronên ajoyan de bi çavê hunermendekî digirim dest û bê qîmet dibînim. Em ê bikaribin rê ji girêdanên bi hêz re vekin? Eşkereye ku ji bo vê pêdivî bi bûyîna nirxekî mezin ê estetîkê heye. Bi taybet herkes niha dixwaze xwe bi de ecibandin, ev jî xwezayî ye. Ez jî dixwazim bêm ecibandin û biecibînim. Tê gotin; "*feraseta herkesî ya xweşikbûnê heye*" ya min jî hinekî wisa ye. Bînin bîra xwe, di çîroka min de, herkesî digot ku ez ê wisa bi asanî ji aliyê jinê ve neyêm ecibandin. Ez bawerim li gorî pîvanên pergalê bi vî rengî bûyîn tiştekî mirov matmayî bike nîne. Dikare bê gotin ku ez rebenekî xwedê bûm, rewşa min a dil pê bi êşe bû. Jixwe berteka mezin a ku min ji vê rewşê bihîst, ji bo ku ez asta xwe ya ecibandinê derxînim holê risteke mezin lîst. Niha bi rastî jî di asta kesên ku pîvanên ecibandinê yên pergalê tengav dike de me; pergala fermî jî, ya ne fermî jî eşkereye ku pir tengav dikim û weke parçeyek ji vê, bermahiyên vê li beramberî we jî rewşa min wisa ye. Ez xwe weke aktorekî pêşkêş nakim, lê hûn di ferqê de ne, ez di rewşa asta ecibandinên xwe di ziraviyeke mezin de dimeşîne de me. Ev, bi rêzdariyê ve girêdayî ye; bi giştî li beramberî hevalan, bi taybetî li beramberî civaka hevalên jin şêwaza sekna xwe eyarkirin, asta xwe ya ecibandinê pêşxistin, berevajî ya tê payîn girîngiyeke taybet û kedeke taybet pêwîst dike. Dîqat bikin, ez ê nebêjim li beramberî we bê qusûrim, lê we ji astên pir paşketî

girtin ber bi pêş ve birin û di derbarê azadkirinê de ez çiqas balkêş, we tengav dikim vekiriye.

Hûn wisa dizanin ev ji ber xwe ve çêdibin? Tenê ji bo ku ez xwe di rewşeke wisa de bigirim bi qasî ku ked didim, berxwedêriyeke mezin jî raber dikim. Xwe di xeteke wisa de meşandina min girêdana xwe bi berxwedaniyeke mezin a azadiyê, şer û moralê re heye û dîsa bi exlaq re eleqeya xwe tê heman wateyê.

Vaye afirandina min a asta ecibandinê wisa pêk tê; hilberînên lêhûrbûn û serdeçûnê ne. Ger ez vê nekim jixwe nikarim we rêve bibim. Zilamekê bi asanî we bixapîne û bibe. Ev aliyê we jî xwezayî ye. Di rewşa niha de ez we bi serdestiya moralê dimeşînim. Ez di ferqê de me ku wekî din jî çareya wê nîne. Yên din bi zextê, nizamin bi belavkirina diyariyan xwe nêzîk dikin. Diyare ku gelek hevalên xort dê wisa bikin. Ji bo min rewşeke rûreşe. Ger tu di asta ji dil, dîsa ji feraseta azadiyê ya herî pêşketî, di azweriya hevgîrtî de negire, ji bo min ti nirxa girêdanan nîne. Jixwe girêdanên wisa jî zêde berdewam nakin. Yekê ava bike, dehê têk bibin. Lê em, we li ser esasê azadiyê, hewl didin xweşik girêdin ku, qiyamet jî rabe qut nebe. Pir kes dikarin vê biceribînin û pêk jî bînin, lê baweriya min bi min û hêza min heye. Divê ku hûn hewl bidin gelek zilaman tahlîl bikin. Kîye li beramberî we çi îfade dike, çiqasî li gorî daxwazên we guncawe? Bipîvin, lê binêrin û li gorî wê pîvanên xwe yê ecibandin û hatina ecibandinê diyar bikin. Pewîste hem mafê we, hem jî azweriya we ya jiyanê hebe. Ne pêwîstî bi durûtiyê heye, ne jî di vê mijarê de erzan xwe ecibandinê yan jî erzan xwe dayîna ecibandinê heye. Ev pêwîstiya pîvaneke exlaqî û moralê ye. Heta ku ev nebe bilindbûn nabe. Hûn li gorî çi di ecibînin, hûn ê li gorî çi xwe bidin ecibandin? Ya min weke ku min diyar kiriye. Yanî ji aliyê fîzîkî, madî, manewî, ruhî, fikrî ji hemû aliyan ve xwe dest girtin, xwe anina vê rewşê vaye wisa pêk tê. Estetîk pêdiviya devjêneger a seknê ye. Wekî din ez ê xwe li ser kê ferz bikim û ez ê bikaribim encam bigirim?

Em hinekî li hevalên me yên ku hêza rêveberiyê qezenckirine binêrin. Em li gelek fermandar û rêveberiyan binêrin. Pir baş tê zanîn ku, ew hêz ji me girtiye. Vaye çîroka

biraderê me bînin bîra xwe. Xwe çiqas bêmirêz ferz kiriye. Çawa bi şêwazê serdestiyê ve tên girêdan û çawa vediguherin çavkaniya xirabûnê; hat dîtin. Ya rast ne zilamê bi hêze jî, jinên ku li gel wan in jî ne jinên ewqas bi hêzin, tenê pergalê kopî dikin. Bandorî û kedên Partiya me na, tenê pergalê kopî dikin. Bêguman ev ê jî encamekî çawa amade bike û wê wan çawa rezîl bike vekiriye. Pîvanên lehengiya PKK'ê nedîtin, dîtin û pêdiviyên wê cîbicînekirin îflasa kes bi xwe re tîne. Fêmnekirina wê ya ku rêgezeke mezine bi awayekî sotîner bandora xwe didomîne, bikarneanîna vî hêzî tê wateya ji PKK'ê tiştek fêm nekirinê. Di vê wateyê de, di çarçoveya vê pêwendiyê de wî hêza xwe ya rêveberiyê çawa bikar anî? Tenê bi gotinêkê bêmirêzî ye. Berevajî armancên bilind ên siyasî, berevajî qanûnên şere. Ev ê heta kîderê bibe? Wê ber bi çala hema bêje hemû jin û zilamên civakê ketinê ve bibe. Vaye çîroka kevin. Di nava PKK'ê de yek ji windakirinên herî mezin jî ev e. Ger bifikiriyana, wê nirxên ku hewceye em pê ve girêdayî bin bîdîtana. Em çawa dijîn, li çi digerin, dil û ecibandinên wî çawa ne, keda wî çiye? Ji bo vê dibêjim ya, bi gelekan ji we re dil nîne. Dibe ku ji niha û şûn de jî wisa derbasdar be, lê dîsa jî asteke bi qudret encax bi vî rengî bûyînê re gengaze.

Hûn ê hertim bên gel me, dibe ku hûn hêz ji me bigirin, biçin cîhekî din û hêza xwe winda bikin. Hûn baş zanin ku dema hatin vêderê çiqas lewaz, bê hêz û bê çare bûn. Ez bawerim hûn niha ferq dikin ku hestên xwe yên azadiyê bi bask bûne. Ev ji nêz ve bi hewldanên me yên hevaltiyê ve girêdayîne, hem jî divê ez pir ast bidin girtin. Ji ber ku beşên provakator dibêjin, "*felaketê tîne.*" Piraniya we jî di rewşa derbasnekirina kesayeta tengezar de ne. Li gorî min ev şerê lehengiyê ye û divê ev lehengî jî li bejna we bê û li xwe bînin. Divê ku hûn vê şayanî xwe bibînin, bigihînin asta şayan û ji vî şerê tawîz nedin.

Min hertim ev pirs ji xwe pirsî; çima hertim dema ku jin dibe mijara gotinê şantaj, fiyasko û skandal? Vaye weke ku felc be tê nirxandin. Dema ku bi jinekê re dimeşim jî di derbarê min de gotineke neyê kirin nehiştin çima? Çima wê ev e: Jin ango zilamek ji dervî kevneşopên dijwar dema ku hev dibînin, tê payîn ku tiştên bikin teqez yên neyênî ne ji ber wê. Tişta ku ez bi xwe

didim xwarin û hedef nîşan didim çiye, ez pir zêde lêpirsîn dikim. Dema ku bi jinekê re dimeşim yan jî weke civakekê dijîm, ji bo ku fersendê nedim nixandinê bi vî rengî, ji hemû aliyan ve di çarçoveya pîvanên bi hêz û nûbûnê de ye. Dema ku ez vê jî pêk tînim, xwe bê qusûr yan jî xwe şareza, pêgîştî dibînim. Ev ne bi pêwendiya taybet, bi her jinekê re jî teqez divê ew weke keseke bilind bê dîtin, ticar nebe mijara fesadî, mijara nîqaşên paş-pêş, weke mijara lewaziyê neyê fikirinadin. Yanî, ez vê weke pêwendiya herî mirovî dibînim. Ev pir girînge. Lê ev ê çawa çêbibin? Pevgirtinên we piştî demeke kurt bi şêwazên qet nebûyî watedar dibin.

Vaye ez li beramberî vê îtîraz, perwerde û çareseriyê pêş dixim. Îllehî ez wisa jiyan bikim. Di vê mijarê de teqez û lihevkirîme. Bi serxistina vê di heman demê de li beramberî civaka paşverû teqez yek ji serkeftinên herî mezin destxistine. Balkêş, ya rast di civakê de mînakê wê nîne, ez ê bi jinê re bimeşim, ev meş ji dil, heta dawî dê bibe meşeke bi kesayet. Vaye wê fersendê ne de pirsên, "*gelo çidikin?*" û hwd. Teqez wê bibe meşeke wisa. Vaye ev, ji bo min azwerî û armanceke. Bêguman naşibe yên ku di sosyetê de tên dîtin. Ji ber ku tê zanîn hevaltiyên wan çiqas xirab û ketîne. Dîsa tê zanîn ku, sosyete her roj asta di jêr ya pergalê jî de ye, ya herî lanetkirî, ya herî zêde hundirê wê vala asteke wisa îfade dike. Ti nirxeke wê ya saxlem nîne. Qaşo pesnê xwe jî pê didin. Li Tirkiyê jiyana sosyetîk yan jî ya ku weke jiyana artîstî bi nav dikin, bi taybet asteke pir paşketî îfade dike. Mebesta min ne ew e. Niha wê şêwazê pêwendiyê pêşketineke çawa raber bike û ev hemû şêwazên pêwendiyên serdest wê çawa mahkûm bike û derbas bike? Bi şerekî mezin ê wekheviyê, bi kesayetiyên awarte û mezinbûyî, bi xwe gihandina asta rêveberiyê ya civakê ev ê gengaz bibe. Ev şoreş pêwîste? Em vê ji we dipirsin. Divê ku hûn bi awayekî bingehîn vê lêpirsîn bikin. Bi feraseta ku niha li ser min serwere, ez ji van hemû meşên jin-zilaman nefret dikim. Jê hêrs dibim, bertek digirim. Dibêjim hemûyan têk bibim. Ya ku dixwazim vaye pêwendiyeke

ji hêrsên wisa re nebe mijare, xwe gihandina pergaleke li gorî feraseta min guncawe. Ger bê dîqatkirin, nêzîkatiyeke pir cidî ya şoreşê ye. Teqez divê ku hûn fêm bikin.

Ger îro bi we re em hinekî din şênber, bi kesayet kom dibin û daxivin, vaye bi vê perwerdeya sereke ve girêdayî ye. Mesele, yekî din jî dikarî di şûna min de be. Herweha di gelek biryargehan de, di qadên xebatê de jî wisa ye. Yan nêzîkatiyeke kevneperest, muhafazakar, yan jî bi awayekî ne tendurist ji kevneşopan qut bûye, dikeve nava nêzîkatiyeke lumpen û ajoyî. Di encam de dikeve nava hemû curên pêwendiya tasfîyeger, lewazker, nêzîkatiyên rê ji hemû curê rizînê re vedike derdikevin holê. Lê li vir ne wisa ye. Vaye hûn dibînin, ger kesayet hebe ji ber ku pir bi aste teqez bawerî û biryardarî heye, teqez mêrxasî heye û li ser esasê şer ristekî dilîze. Jixwe çavkaniya gelek pêşketinên sereke jî ev nêzîkatiye. Ya ku hêz derdixe holê, we ber bi şer ve jî dibe ev e. Çima yên din wisa rûnanên, nikarin baxivin? Hûn çima asteke wisa pêş naxin? Piştî wê jî ya ku hûn dixwazin serweriye, erzan girêdane, lihevkirine. Dibe ku ev jî pir xweşiya we biçe, ji ber ku hûn pir lewazin. Asta we ya ecibandin û pejirandinê ya qet nîne, yan jî pir paşketiye. Beriya her tiştî hûn pir paşketîne. Ji bo xwe gihandina wê divê ku şerekî dijwar bê dayîn. Hem jî pêwîste şerê ast û yê ecibandinê bê dayîn û li gorî min divê ku di vê mijarê de jî hûn pir tengav bikin. Ji ber ku teqez divê mirov bibe xwediyê vê jiyanê.

Li gorî min li şûna girêdaneke pir erzan, divê ku mirov aligirê jiyanake heta dawî mafê xwe yê azadiyê bi kar tîne be. Ger ez bim jî derbasdare; divê ku hûn bi asanî asta pêwendiyeke tê ferzkirin qebûl nekin. Kabîliyeta we ya ecibandina serdestiya mêr, êdî asta we çiqas hatibe helandin, di vi alî de çiqas pêşketin hatibe pêkanîn, divê ku hûn nêzîkatiyeke li gorî wê raber bikin. Divê ku hûn li hêza min nenêrin û pê nexapin. Hêza rêveberiyê

ye, yetkî ye, di van deran de xwe seqet nekin. Nabêjim başçav bikin, lê tenê bi xwe sipartina vê hûn nikarin bi hevrebûneke saxlem pêk bînin. Bêguman ger hûn bikevin îdîayê, wê we bixe nava pêvajoyeke pir zehmet. Gelo hûn ê bikaribin wî hêzî raber bikin? Ew behremendiya we heye? Weke tê texmînkirin yan jî weke ku ez texmîn dikim, hûn çavkaniya hêzekî ne? Yan jî yên ku ji zûve naveroka wan hatiye vala kirin, yan jî hûn kesayetên belangazên xwedê yên kefernahin? Vana hemû hêjayî lêkolîn û lêpirsînê ne.

Divê ez dubare diyar bikim, divê ku hûn li vê pir dîqat bikin. Li şûna meşeke di nava pêkanîna me ya civakî de keydkirî, bi zeaf û lihevkirî, bûyîna xwedî meşeke bi anûrî kesayet, nasname, vîn, wekhevîxwaz, moral û exlaqî ya ku xwe di vê de îfade kiriye û derbasî jiyanê kiriye pir girînge. Ez di vê baweriyê de me ku azweriya rasteqîn ev e. Li gorî wê hûn ê bikaribin hevdû bandor bikin, hêza hevdû ber bi jiyanê ve birinê raber bikin? Ez heta niha jî ji bo ku wisa be çiqas hewl didim di holê de ye. Gelo hinekî tê fêmkirin? Dibêjim, a şerm bi şêwazê jiyana rizî û xilasbûyî jiyankirine. Mixabin.

Mîn çîroka xwe jî ji we re got. Dixwaze bila taybet, dixwaze jî bila giştî be jiyana balbatê ji min re erjeng hat. Van nêzîkatiyana hema bêje ruhê min xira dikirin. Tê bîra min, hinek memûrên kadastro yên bê exlaq xwestin min bi zorê bibin kerxaneya Amedê. Ez di cihê xwe de cemîdî mam. Hindik mabû bêjim, "*gelo zilamê ji min zêdetir bê îktîdartir heye.*" Ew nêveng qet xweşiya min neçû. Heta niha jî nêvengeke min kehir dike ye. Lê hemû zilamên Amedê li wir kom bibûn. Yên ku perê xwe heyî, bi taybet jî ew axana, memûrên burjuvaziya biçûk, qaşo jinê hemûyan jî hebûn. Ew der cihê bê exlaqiya herî mezine. Min mala taybet jî ji we re vegot. Min kabûsekî jê neyê bawer kirin jî li wir jiyan kir. Neyê serê tu kesî. Lê dîsa jî bi we re eleqedarim,

yanî yên ku we înkar bikin nînin. Heta dawî rêzdarim. Bi qasî ku tu zilam nikaribin fêmkerim, girîngiyeke taybet didim wekhevî û rêzdariyê û kedeke heta dawî em dikarin bêjin bi kesayete jî heye. Ya rast hûn lewazin. Ger na min pir dixwest, di derdora me yan jî di encama keda me de hebûna jineke bi qudret dekeve û xwe bi giranî bide hîskirin. Ji bo tu bibî dengekî bi bandor û bibe xwedî nasnameyeke kar dike, teqez ne wisa; pêşî lê girtin, hesûdî pêkirin li alîyekî, berevajî bendewariya me ya herî mezine. Bi jinê re jiyan parvekirin, îktîdar parvekirin, hemû bandorgeriyên civakî parvekirin, ez tenê nabêjim başe; ji bo min di heman demê de azwerî, armanceke şoreşgerî ye jî. Divê ku hûn vê baş bibînin.

Hem di şênberiya PKK'ê de, hem jî di şoreşa ku ew dimeşîne de ev azwerî û armanc tê çi watê zanîn û wisa alîkarî kirin, ger pekanbe bûyîna şerkerekî wê yê mezin, yek ji taybetmendiya sereke ya ku me nîşan dayî ye. Dîsa yek ji pêwendiya ku herî zêde tê de zehmetiyê jiyan dikim, dikare bibe mijara nêzîkatiyên wisa şaş. Nêzîkatiyên we yên şaş ditîn min gelekî hêrs dike. Bi israr di nava sînorên pergalê de, ya ku li ser navê pergala mêtinger û serdest tê pêşxistin, bi wê re ji dervî vîna we be jî, bi niyaza baş be jî bi wê ve girêdayî xwe ferzkirinên we sedema bertekê ne. Em jineke wisa qebûl nakin, Divê ku jineke wisa qet jiyan neke. Ez ê çavê xwe bigrim, ruhê xwe biparêzim, xerizeyên xwe bifetisînim. Lê ji bo armancên din derxistina holê, vaye weke ku hûn dibînin, ez ê bê aman bibim. Lê bigerim, bibînim; di vê mijarê de jî herî kêm bi qasî zordestiya mêtingeran, ez ê zordestiya rûhî jî bibînim û bi ser de biçim. Lê ev jî hinekî bi zimanekî wêje yî îfadekirinê pêwîst dike. Bi vegotina siyasî encax ewqas be. Ez hewl didim bi zimanekî din çîrokê temam bikim.

Pêwîste nirxeke mezin ji eleqedariya we keçan re bê dayîn. Zeaf nîşandan, bênirx nêzîkbûn, xirabiya herî mezin a bê kirine. Bi taybet baldarî nêzîkbûna hevalan, ji bê sewiyetiyê re destûr

nedana wan destnîşan dikim. Aliyê herî hestyar çi yê jinê, çi jî yê zilam divê tu tê de hestyar be, bi baldarî nêzîk bibe, ya ku em dikarin bêjin cewhera jiyanê jî, weke armanca şoreşê jî em dikarin îfade bikin ev alî ye. Basît girtin tê çi watê, pê lîstin tê çi watê, başçavkirin tê çi watê? Ev, hekareka herî mezin li me kirine. Yên ku nêzîkatiyên wisa ferz dikin û didin jiyankirin, ger dixwazin bi me re hevaltiya jiyanake mezin bikin, neçarin ku van esasan bibînin. Divê em we hevalên hêjayî vê meşê bibînin. Çima nebe, çima lê neyê? Gotine ku, "*em parçeyekî ji hev cuda nabe yê jiyanê ne yan jî îllehî em perçê ku divê dibînî de bimînine"* kê û ev kengî gotin? Rastî çine? Çima di çarçoveya ku me gotî de hûn hinekî şayanî vê meşê nabin? Hertim yên ku dibînê de giyana wan derdikeve, çima hûn bibin qurbaniyên yek alî yê kompleks û sikandalan? Dadperwerî di kîdera vê de ye? Çi pêwendiya xwe bi xwezayîbûnê re heye? Ger ev fermaneke xwedayî ye, ev fermana bê dad çima? Ger nîne, wê demê em ê dadperweriyê çawa pêş bixin? Hîn pir pirsên bi wate dikarin bên pêşxistin.

Divê ku mirov baweriya xwe pê bîne, jiyanê di nava sînorê pejirandin de nîşan bidê. Dîsa divê vê di bi destxistina azadiyê û welat de nîşan bide. Hev ecibandina rast û asta hevdû pejirandinê, divê ku bi dijwarî bi van destkeftan ve girêdayî be. Ji dervî vê, vekirî bêjim, teqez ger ev ez jî bim tu kesî ne ecibînin. Xwe jî bi tu kesî ve gire nedin. Li benda rizgariya xwe ve girêdayî bimînin, şerê vê bimeşînin. Ger ez heta niha jî nikarim di nêzîkatiyan de ji vê zêdetir cesaret bikim, sedema wê ji ber ku weke pêwîst me welat û azadî dest nexistiye. Wêrekiya min nîne û gotina vê jî ne şerme. Tevî ewqas hêza min jî di mijara jinê de, bi qasî yekî ji we jî nikarim wêrek bim. Ev, şayanî felsefeya min a azadiyê jî nîne. Yanî weke burjuvaziyekî biçûk ê ji rêzê, heta şivanekî gundî yê di nava refên me de jî, bi asanî difikire ku dê bikaribe li ser we jinan serwer be, lê ez nafikirim. Li gorî min, divê ku feraseta min ya exlaqî cuda be. Ez tenezul jî nakim. Ber bi feraseteke din a

serweriyê ve çûyîne û ev jî tê wateya binpêkirina pîvaneke mezin ya exlaqî ye. Teqez ez vê napejirînim, şayanî xwe jî nabînim.

“*Pîreka mine, sozdara min, malê mine, mulkê mine”* û hwd. Vana li gorî min binpêkirina exlaqên azadiyê û qetilkirina xweşikiyê ne. Bêguman bi dijwarî girêdana van bi rastiyên civakî re hene. Ez vana ji ber xwe ve naxivim, birîneke kûr heye. Di vê mijarê de ketîbûneke mezin heye; ji dest dayîna welat û dibe ku welatekî mirovatî li ber bi şaristanîbûnê ve vebûye û înkargeriya dîrokî li ser, ya ku ji mirovatiyê re bûye dergûş înkarkirina gelêkî herî kevnar bi vê pirsgirêkê ve girêdayî ye. Ez ji ber vê neçar dimînim ku gelekî bi mirov bifikirim. Dibe ku ez ê hîn jî zehmetiyan bijîm, lê yê ku çareyeke din dibîne hebe bila bêjin. Ger heye dermanekî we yê din, derfetê we yê derketinê deynin holê. Hûn min rizgar bikin, li pê xwe biherikînin. Tenê bila ev bêrûtî, bêrêziya mezin, xiyanet, înkara li beramberî dîrokê, mirovatiyê û axê bê rawestandin. Wisa kirêt li rûye hev nerîn, qirêjî bila xilas be. Nêzîkatiyên kirêt, tirsonek û bê dil bên derbaskirin. Yê ku vê bike ez ê bikim taca serê xwe. Ez dikarim hinek tiştan bidim fêmkirin, kê fêm kir? Fûat te çi fêm kir? Weke hevalekî me yê kevn herhalde tu hinekî min difikirî?

***Fu.:*** Pêwîste ku mirov jinê bigihîne rizgariya wê û azadiya wê ya rasteqîn.

***---.:*** Ez dibêjim te tiştek fêm kir?

***Fu.:*** Belê, ez fêm dikim Serokê min.

***---.:*** Me hinekî serê we xistûbû belê. Lê dîsa jî ez bi we difikirim. Hevalê me yê Fûat pir dixwest hez bike. Lê mixabin objeya wê yan jî kirdeya wê nedît. Dema ku di tengaviyê de bû tevî ku min pir xwest alîkariyê bidimê, min ew negihand rastiyan. Ez nebêjim em ê çiqas rizgar bikin, em hinekî pê re mijûl bûn.

Weke ku hûn dibînin ez bi xwe jî di nava hewldana rizgariyê de me. Mesele te jineke komploger dîtiye, ruhê xwe têr kiriye, wê pir baş bana?

***Fu.:*** Wê baş nebana Serokê min.

---***.:*** Ruhê te wêran bûye, ger mirin heba wê ne ji ber van pêwendiya bûya?

***Fu.:*** Dibû têrkirina ajoyan Serokê min. Bêguman ne ya ruh.

---***.:*** Em dikarin bi jinekê re têrkirina ajoyan bês bibînin?

***Fu.:*** Na Serokê min.

---***.:*** Bi vî rengî em ê mirovbûna xwe ji dest nedin? Jixwe me hertişt ji ber vê ji dest neda? Nêzîkatiya wan gundiyên hov, burjuvayên biçûk ên bê exlaq, mesele ew brokratên li Dêrsimê derketine pêş xiyaneta wan a herî mezin bi despêkirina pêwendiyeke wisa des pê nake?

***Fu.:*** Raste Serokê min. Hema bêje hemû di nava pêwendiyeke wisa de ne. Yanî di bingeha pêwendiyan de ew heye. Ya rast piraniya wan ciwanan ji ber vê ji rastiyên xwe qut dibin. yanî hevjînekê, karekî û malekê bes dibînin.

---***.:*** Karek, hevjînek, malek û erebeyek… Dibe ku ew jî zêde bin û ev wan di asta xayînekî mezin ê welat, azadî, di asta lewaziyên mezin de nagire? Em çawa vê qebûl bikin? Weke welatparêzekî, weke kesekî ji gel çawa bûyîna zilamekî wisa em bi xwe bidin xwarin?

***Fu.:*** Di dahûrînên Rêbertiyê yên berê de jî hene. Zilamekî wisa bi rastî jî yê tê karanîne yan jî hatiye pîrek-kirine. Yê ku ji

aliyê pergalê ve hatiye xesandin ji xwe nayê qebûlkirin Serokê min.

***---.:*** Zilamê ku pergalê kiriye pîreka xwe li me nayê. De îca bifikirin em zilam wisa bin, hûn ê jin çawa bin? Qaşo yên herî bi hêz jî em in. Rewşa me wisa be ew zilamên din ji bo we çi îfade dikin? Em pir vekîrî xwe datînin pêşiya we. Vaye hemû hevalên min hertim wisa ne. Gotina wê ne şerme. Jixwe dayika min digot: “*tu kes keça xwe nade te”* Ha Fûat em dibin ên ku keç nedîtine, di malê de mane?

***Fu.:*** Ya rast ew tişta ku min got ji bo jina tê karanîn Serokê min.

***---.:*** Ji bo me jî derbasdare. Gelo em wisa bûn? Em dilê xwe bi xwe bişewitînin? Tu zêde xemgîn nebî Fuat? Li şûna ku em bi keçên lewaz xwe bifetisînin em ê wisa bin ma ne baştire? Tu çi dibêjî Ebas? Piştre ev gotin jî bela neynin serê me? Tu jî xwe veneşêrî, tu zilamekî çawayî yan jî em ê bikaribin bibin zilam?

***Ab.:*** Li gorî kevneşopan nebû Serokê min.

***---.:*** Tu jî nabî ne wisa?

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Dibêjin rewşa me gelekî di zehmetiyê de ye.*”zarokên me ji zilamtiyê derketin.”* Ya rast em ji “ *pîrektiyê”* derdikevin. Min îspata vê jî kir. Ez çawa dikarim bibim zilamekî bêrû? Bila keç hinekî bifikirin, zilamê gelekan ji we heye, bifikirin bi rûçikekî çawa li pêşberî we bûn bînin bîra xwe. Em ê zilamtiyeke wisa bi xwe nedin xwarin, ticar. Ez vê layîqî hevalên xwe jî nabînim. Çiqas di tengaviyê de dibin bila bibin ez ê bêjim em ji xezeba jinê rizgar bikin. Şaş fêm nekin, hûn dizanin ev kîja jine.

Ez jî jê ditirsiyam bêguman. Ji bo “*em kurê xwe yan jî keça xwe ji xezeba filanê biparêzin.”* Ez jî hevalên xwe yên ku hatine vî temenî hîn jî diparêzim. Hûn piştre li beramberî min bertek negirin? Ez ji bo başiya we dikim.

***Ab.:*** Bertekeke wisa nîne Serokê min.

**---.:** Tu jî piştre nebêje di mal de mam û bertek negirî?

***Ab.:*** Em zêdetir hewl didin fêm bikin Serokê min.

**---.:** Sankî ya ku dayika min got rast derdikeve. Tişteke balkêşe, wê çawa ev tesbît kir.

***Ab.:*** Ji ferasetan tesbît dikin Serokê min. Jin hinekî din di vê mijarê de xwedî hestin.

**---.:** Belê, em hîn çi ji xwe bikin? Dema ku em hewla vê didin, hûn dibînin, me zilamên di xeyalên xwe de jî mahf kir. Ya rast ez ne hesûdim, lê dibêjin ya, bi qasî ku em xwe dikin zilam, em ê ji derfet nedin zilamtiya sexte ya hinekî din jî. Hîn dema ez di temenê biçûk de bûm tê bîra min, dihatin û wisa simbêlê xwe badidan. Pir baş dizanim ku, bêrîk kune, ne di wê astê de ye ku weke tê xwestin du gotinan jî bîne ber hev, lê simbêla badide û di heman dêmê de xwedî *“pîreke”* jî. Min got, ez ê zilamê wisa jî, jina wî û zarokên wî jî cîdî negirim. Heta niha jî wisa me. Ger hebin mêrê we yê wisa, hebin hevjînên we, dostên we divê ku hûn bizanin dê bi asanî nikaribin li beramberî me li ber xwe bidin. Dixwaze bila li xweşiya we biçe, dixwaze bila neçe, ev şêwazekî şere. Ger hûn cidî negirin, ev şêwazê şer wê we bişewitîne. Vekirî dibêjim, em bi vî rengî ne. Li pişt me komplo nekin, em camêrên ku xwe bi vî rengî danîne holê ne. Bi gotina pergalê, de îca hûn dibînin ku em ne vala ne. Tu derdekî me yê weke ku îllehî em xwe bidin qebûlkirin jî nîne. Teqez bi zorê wê ferzkirineke me ya

biçûk jî nebe. Lê qurnaziyên jinê yên tên zanîn jî hûn nikarin li ser me ferz bikin. Hûn nikarin ferasetên zilamtiyê jî şayanî me bibînin. Em jî naxwazin bibin zilamên wisa. Heta hûn nikarin pakîzetiya me jî xira bikin. Em girîngî didin mezinbûn û baqij mayînê. Yanî dema berê tiştên ku ji bo keça digotin çibûn, niha ji bo hevalên me yên xort jî hêjayî gotinê ye.

Ya ku em jê re dibêjin bakîzeyî ev e; qirêjnebûn, ji hemû bandorên pergalê yên ketî, ji nirxên sereke dûrdixe, dûr û paqîj mayîne. Em ê ticarî fersendê nedin vê qirêjiyê. Divê ku hûn vê jî baş fêm bikin û li gorî wê nêzîkî me bibin. Bêguman hûn fêm dikin divê ku hûn xwe çawa bikin. Ger hûn asta pêgîştina keçên me jî bînin ber çavan, hûn dê bibînin ku bi asanî hûn ê neyên ecibandin. Keç bi asanî we ne ecibînin; ger hûn rastiya xwe bînin ber çavan, hûn ê fêm bikin bê ka çima ev wisa ye. Beriya niha min xwest pîvanên ecibandinê hinekî be jî bidim. Ji aliyê fîzîkî, ruhî, fikrî, estetîk yanî ji hemû aliyan ve ger hûn asta ecibandinê negirin, qet di vê pêvajoya şer de, li ser esasê armancên me hûn ê nikaribin hevaltiyeke jinê bibînin, ava bikin. Ez bawerim hûn teqez vê fêm dikin. Ev asta pêwendiyê ya artîstîk dê we tengav bike. Hûn ê bi her alî ve sînorên ecibandinê bidin girtin ku wateyeke pêwendiyê hebe. Wateya hezkirinê, pêwendiyê, palpiştiyê welhasil ji nû ve civak di hemû astî de bi hevre damezrandinê watedar bibe. Ger na, “*ajoyên min rabûn ser piyan, kevneşop dibêjin wisa bike”* nêzîkatiyên wisa misoger bila ji me dûr bimînin.

Belê keçikno hûn dibînin kar pir zehmete. Wê rewşa we çi bibe? Me xwe li pêşberî we vekirî danî holê. Ya ji destê me tê ev e. Ne me sivik bigirin dest, ne jî me di nava nêzîkatiyê pêwendiya şaş de bibînin. Me karî em hinek tiştan bidin fêmkirin? Kê tiştek fêm kir. Yên serê xwe dişuxwûle heye? Heta dawî nêvengeke demokratîk heye, mesele hûn dikarin divê ez çawa bêm çêkirinê

despê bikin. Li pişt fesadî, komplo nekin, mistewa nîqaşê têk nebin. Ji bilî vê hûn çawa nêzîk dibim ez hemûyan qebûl dikim. Hûn ê bikaribin hêz bi min meşînê re bînin? Hûn piştre poşman nebin? Belê heval, tevî ku tu ya herî ciwane jî ji hemûyan bi cesaretir derketî. Tu me çawa dibînî?

***Şi.:*** Serokê min, pêwîste ji xwe danîna holê em nerevin. Ger em xwe şûnde bidin pirsgirêk bi awayekî bingehîn dê neyên çareserkirin. Li gorî ku ji niha û şûn de bi nebesî û lewaziyên xwe ve em ê nikaribin bigihêjin rastiyê pratîkên ku em ê ji vî alîve raber bikin divê li ser esasê ji holê rakirina van lewaziyan be. Weke ku Rêbertî jî diyar kir, em êdî nikarin van li ser Partiyê ferz bikin.

***---.:*** Tu dev ji wê berde, ez qala lewaziyên we dikim. Qala asta xwe dikim. Hûn min çawa dibînin, rewşa xwe çawa dinirxînin?

***Şi.:*** Serokê min, em gelekî li şûn keda ku Rêbertî qala wê dikine.

***---.:*** Dev ji wê ber de, te çîroka me gohdar kir? Dawi ber bi kîderê ve çû? Em camêrekî çawa ne?

***Şi.:*** Serokê min, ez Rêbertiya Partiyê pir wêrek dinirxînim.

***---.:*** Tu ne şaşî?

***Şi.:*** Ne şaşim Serokê min. Pratîk vê didin diyarkirin.

***Ş.A.:*** Serokê min, bi rastî jî jiyana ku Rêbertiyê destnîşan kir jiyanake mezine. Dema ku tu dikevî nava wê jiyanê û dema ku bi jiyana ku em ji nav hatine berawird dike meziniya di wir de xwe dide diyarkirin. Di navê de bilindî heye, bawerî heye, bi jiyanê ve girêdan heye. Yanî hemû curên hezkirinê yên ku em

xwe nagihîninê heye, hemû curê bilindiyê heye. Mirov di tarîfkirinê de zehmetî jiyan dike.

**---.:** Ger te ewqas fêm kiriye pêwîste tu bibûya wekî bagerê. Ger tu ewqas hêz bi me re dibînî nexwe te hêza mejî û dil bi hev re kiriye yek. Divê ku tû mîna bayê bî.

***Ş.A.:*** Em vana dibînin Serokê min.

**---.:** Başe li gorî te ez, di rewşeke xeter de me? Min baş binirxînin. Hûn pesnê min didin, lê di derbarê me de gelek tiştên ne di cîh de tên axaftin. Ya we jî ne gotinên ku ji ber kelecanê hatine kirin bin? Jibîr nekin ku bi min re asan nayê jiyîn. Min hûn nexistibe nava zehmetiyên mezin?

***Ş.A.:*** Serokê min, ger zehmetiyên xwe hebe jî ji jiyana din baştire.

**---.:** Tu bawerî?

***Ş.A.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Başe tu ji vê raziye?

***Ş.A.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Tê girêdana vê jî weke bayekî teqez bikeve nava jiyanê û nîşan bidî? Berevajî dê derewkariya te derkeve holê. Tê xwediyê li soza xwe derkeve?

***Ş.A.:*** Serokê min, di vê mijarê de bi biryarim.

**---.:** Ji biryarê zêdetir, mîna ba vedana te girînge. Ger tu dixwazî bi tiştên ku te gotine re girêdayî jiyan bikî divê ku tu mîna bawerê bî. Wekî din?

***Az.:*** Serokê min encama ku min ji çîrokê derxist; ya ku azad nabe kesayetiyên me ne. Sedema sereke ya kesayetiyên me; çavkaniya xwe ji ferznekirina azadiyê li ser hev digire. Di vê xalê de nêzîkatiyeke kesayetiya du alî ku pergalê avakiriye heye. Yanî hem jin, hem zilam tê de rist dilîze.

***---.:*** Ev aliyekî tê fêmkirine, çîroka min dikare bibe kîderê? Bi vî rengî raberkirina min a jiyana xwe nîqaşên pir mezin vedike. Tu kesayetiya sereke ya di çîrokê de fêm dikî? Tiştên ku we xeyal dikir û yên ku hûn li pêşberî xwe dibînin hev digirin? Ferqa di navberê de çawa ye? Gelo bawerî bi min re, tirs, metirsî bertek yan jî hezkirin çi îfade dike? Hûn qet li ser vê dihizirin? Mesele te got ku; "*min hîn sala 1992'an dixwest bêm qada Serokatiyê"* gelo ya ku te ber bi vir ve kişand çibû? Tu dikarî bersivê bide vê pirsê?

***Az.:*** Niha dikarim bidim Serokê min. Ji azweriya pêşketin û azadiyê bû.

***---.:*** Li gorî wê demê bangewaziyeke çawa bû?

***Az.:*** Hîn zêdetir ji vegotinên hevalê Şiyar min girêdaniyeke mezin dibihîst.

***---.:*** Şiyar qala min dikir ji we re? Çawa ez ji we re vegotim? Ji ber ku provakator xwest bi rêya hevalê Şiyar bilîze. Hem jî xwest di mijara jinê de bixe. Wî çi ji we re vedigot?

***Az.:*** Şêwaza qezenckirina mirovekî, şêwazê Rêbertî ji mirovan re û rêbazê pêşxistinê, em ji tevgerên kêliyê bigirin heta jiyana rojane hemû kêliyên wê bi me re parve dikir.

***---.:*** Wê demê got pir girêdayî me?

***Az.:*** Digot Serokê min.

***---.:*** Lê dema ku provakator pê dilîst dudiliyeke wî hebû, qala wê jî kir?

***Az.:*** Qet bahsê nekir Serokê min. Ji ber ku em hîn nû bûn dibe pê fikirîbe ku em fêm nekin, hêza me têrê neke.

***---.:*** Bi qasî ku ez fêm dikin nêzîkatiyên me yên di derbarê jinê de vedibêje û hinek keçan jî mîna pîyon pêş dide pir bi fikar bûye. Heta hatiye hinek lîstokan jî. Lê aliyê wî yê girêdanê pir bi hêz bû. Min Şiyar cara yekem di sala 1982'an de dît, ciwanekî baş bû. Lê provakatorê yekem ji ber ku di salên 1985-86-87'an de pê lîst hinekî xira bû. Provakatorê dûwem jî di sala 1990'î de hinekî pê lîst. Tam xira nebû, lê ket nava hejînê û rewşên antîpatîk. Ez pir li ser sekinîbûm û min ked di berde dabû. Heta min Fûat rexne kiribû û jê re gotibû, " *hûn careke din wan lewaziyan raber nekin"* û wî jî gotibû pir baş fêm kiriye. Me bi mehan ew perwerde kir. Ew şahadeta bextreş nebûya dikarî pir bi hêz bibûya. Lê weke min got, li ser esasê van pirsgirêkan hinek rewşên wî yên hejandinê çêbibûn. Ji we re neteyisandina wî, ji ber sedema girêdana wî û hewldana wî ya fêm kirina mine. Hewl dida min fêm bike û di vê mijarê de xwe bi hêz bike. Ew jî, Baran jî. Ya rast di demên dawî de tevî ku hinek rexne li ser hene jî, girêdaniyeke ecêb ya Baran jî heye. Ger jiyan kiriba dê hêza girêdanê raber kiriba. Ger hebe neyîniyênê wî, rewşa ku jiyan kiribe, encamê derbasnekirina wî ye. Lê girêdaneke bê nîqaş jî raber dikir. Lê di vê girêdana mezin de jî zaafên kûr veşartîne. Van zeafên xwe dixwest bi girêdana xwe bigire. Ya ku dixwazim bêjim, berê xwe dana qada me ya Dêrsimê heta dawî xwe dispêre demên kevin. Cara yekem ku em gîştin wê derê me civîna xwe ya jinê lidar xistibû. Civîna ku hat lidarxistin hîn jî di bîra min de ye, me xwest em bi hinek keçan re pêwendiya xwe berdewam bikin. Li Elezîzê û heta li gelek deran, hema li hemû qadan. Lê dawiya geleka ji wan trajîk bû.

Hûn jî rêwiyê vê riyê ne. Û ji van vegotinan, ji mînakên dewlemend herhal de hûn ê waneyên mezin derxin û bimeşin. Hinek mînakên trajîk yên din jî çê bûn. Saîme Aşkin hebû, Nûrhayat Demîrtaş hebû; piştre me bihîst bi polîsekî re reviye. Lê pir balkêş bû, yek ji qurbaniyên şerê taybet bû. Heta wê demê keçeke bi hêz bû. Bêguman di wê demê de ez jî paşketî bûm. Hêza min bi sînor bû. Vaye belayên ku hatin ser Fû. jî hebûn. Qiymet, Seher û yên weke van, bi serê xwe rastiyek îfade dikirin. Bêguman Fatma jî di nava van de yek ji yê herî balkêş bû. Di dîrokê de çi îfade dike min zelal danî holê. Rûken hebû, yek ji şehîdên me yê yekem û Rahîme Karaman hebû, pêwîste hûn nas bikin. Ji keçên ku herî zêde li ser wan radiwestiyam bûn. Ev hevalan ji şehîdên me yê yekemin. Li Botanê yan şehîda me ya duwem yan jî ya sêyeme. Heta dema ku şehîd dikeve gel ji bo wê dibêje; "*ber bi esîmanan ve firî*" gotineke wan a wisa heye di derbarê wê de. Pîrozîyeke wisa jê re kirin. Rûken jî wisa, ji şehîdên yekeme. Dijmin keçên bi Şiyar wan re hatin pir wahşiyane di teşîrkirina bedena wan de kar anî. Bêguman ev ne xwezayî ye. Weke van bi gelek şehîdên xwe yên hêja çîrok cuda û bi endamên xwe yên erênî û neyênî ve rastiya ku şahidiyê dike rastiyeke me ya şere. Li Dêrsimê jî jin pir bi hêz tevlî bû. Wê hîn jî pêş bikevin, ez vê zanim. Vaye Fûat hevalekî me yê ji Dêrsimê ye. Me xwe bi xwe ji hemû aliyan ve danî holê. Hewl bidin fêm bikin. Em naxwazin xeyalê yekê ji we jî têk bibim, lê ji rastiyê re jî rêzdarî esase.

Me.: Serokê min, ez Rêbertî weke xezîneya hezkirinê dinirxîmin. Lê di vê xezineyê de ne yek hezkirin, hemû curê hezkirinan heye. Mînak di hatina min a nava Partiyê de weke ku di hemû hevalên jin de heyî lêgerîna rêzê hebû. Em dikarin vê weke lêgerîna rast a hezkirinê jî binirxînin. Weke ku hevalê Ebas got, bi jinan re hinekî hêza hîskirinê heye. Dibe ku ji ber wê hêza hîskirinê be ku, ya ber bi Partiyê ve kişand ev be. Dibe ku me

hezkirina we hinekî di vir de dîtibe. Lê me digot dema em hatin nava Partiyê em ê bi asanî vê ji Rêbertî û Partiyê bigirin. Lê ji bo Rêbertî hezkirinê bide me, me nedizanî divê ku em bi xwe re têbikoşin. Ev jî zêdetir me li vir fêm kir. Ev jin çiqas azad dibin, çiqas bikevin ferqa vê êdî ketim ferqa wê ku wê zilamên di pergalê de jî zêde neyên ecibandin vê dibînim. Di kesayetiya wan de ji ber ku hezkirina em lê digerin nabînin ji ber ku wê nikaribin bibin zilamên ku guncaw ên li gorî lêgerînên me yên hezkirinê eşkereye ku wê neyên ecibandin. Ji ber vê jî di pêvajoyên pêş de hem ji aliyê jinê, hem jî ji aliyê zilam ve ji bilî avakirina kesayetiyeke hezkirinê di nava xwe de digire wê çareyeke din nemîne.

***---.:*** Me hertim ev jî got; êdî weke berê ne tu kes dikare bi asanî zilam bibîne, ne jî keçê. Pir zehmete. Dema, "*em keça xwe bidin kê, kê ji kurê xwe re bînin*" xilas bû. Dixwaze bêjin bê şansî, dixwaze tiştekî din bêjin, niha ez jî ya rast bi çiqas zehmetiya vî karî û îspatkirinê re mijûl dibim. Ya rastî em destê xwe dirêj bikin, em ê hertim wisa hev bigirin. Lê li gorî min em hîn li dûr dijîn. Dibe ku em qet jî negihêjin hev. Ev nêzîkatiyeke rasteqîne. Em tên fêmkirin? Qet pêwîst nake em xwe veşêrin yan jî xwe dervî rastiyê bidin diyarkirin. Min vala vala dahûrîna Mem û Zînê nekir. Di wê demê de tevî ku zarokê begane jî, di çîrokê de zehmetiyên mezin tên jiyîn û bi hevgîştîn qet asan pêş nakevin. Berevajî, bi şêwazekî herî trajîk şewitîn û bûyîna xwelî heye. Ew dem dema ku feodalîzm serwere. Dîsa demeke taybetmendiyên netewî pir zindî ne, hem di çarçoveya netewî, hem jî di ya çînî de bi hev giştin zêde ne zehmete. Başe, hîn di wê demê de ewqas zehmet be, lêgerînên vê demê û bi hevgîştîn wê çawa asan bin? Jixwe ez ê pêwendiyên di nava sînorê pergal û temasa bi kevneşopan re zêde cidî negirim. Mesele ez vê heta dawî xeter dibînim. Teqez divê hûn vê fêm bikin. Ez jinê, îdealîzekirinê pêş nexim teqez ez ê nikaribim rê li ber pêşketinê jî vekim. Ya we jî

em bihêlin îdealîzekirin, weke masiyan xwe avêtina we ya nava pergala koletiyê mijara gotinê ye. Hûn ji tiştên pir nizm re tenezûl dikin. Heta bi lez em bi hev dikevin, xira jî dikin. Hûn xwe wisa pir ketî dipejirînin? Hûn dikarin radestî destê pir qirêj bikin. Hûn dikarin ji tiştên pir ji rêzê re tenezûl bikin. Vaye ev hilweşîne, xwe mahf kirine. Divê ku dilê keçeke ciwan ne wisa be. Madem hûn pêdigihên, dilê mezin û kalîte ya ecibandina mezin, ticar xwe radestî destên qirêj nekirin, hezkirineke mezin û rêberiyeke wisa, ji jiyaneke wisa re hêz anîn neçare ku hûn raber bikin. Bê pêşketin, xwe pêgihandinê, bi bandorbûnê û mezinbûnê hûn ê nikaribin xwe bigihînin asta hêzeke ewqas berfireh. Ev, ji bo we pirsgirêkeke jiyanî ye.

Rêxistina jinê, çalakiya jin ger ji hemû aliyan ve ne li gorî vê armancê be ticarî wê wate îfade neke. Wekî din jî weke jinekê hûn ê nikaribin derkevin pêşberî me. Ger hûn dixwazin Rêbertiyê fêm bikin, divê ku hûn wisa hewl bidin fêm bikin. Rêbertiya ku deynê şerefê li ber çav negire yan jî milîtan ketiye. Jina milîtan ya ku vê fêm neke gewceke xwêdê ye. Em ê bê ku astengiyekê nas bikin, îdeala xwe ya jina azad bidomînin. Wekî din?

***Ron.:*** Serokê min, Rêbertî di dahûrîneke xwe de digot: “*ez hewl didim ji keçeke ciwan çil qat zêdetir xwe paqij bigirim.”* Ya rast mirov dikare ji vir pir tiştan bigire. Axa ku keçeke ciwan xwe pê paqij digire, hewla xwe paqîj girtinê rêgeza sereke ya di nav de…

***---.:*** Em hewl didin bi qasî pakîzeyekê xwe saf û pak bigirin.

***Ron.:*** Pêwîste em di nava rewşeke çawa de bin pir vekiriye. Piştî ew dahûrîna Rêbertiyê û şûn de bi rastî jî min dest bi fikrandinê kir. Li ser wê çawa paqijmayîn pêk bê lêhûrbûm. Mirov bi asanî dikare vê bibîne; Rêbertiya Partiyê ji ku xwe paqij

bihêle hewldaneke wî ya mezin heye. Paqij mayîn bi serbixwe mayînê re girêdayî ye. Dîsa ji bo azad mayînê divê ku mirov bizane serbixwe bimîne. Ne girêdaneke bi cinsê beramber, ne şexsekî, ne girêdan bi hêzekî din nîne. Ji ber ku Rêbertî tenezûlî girêdanên biçûk nake mezinbûneke mezin dijî. Eşkereye ku divê ji van aliyan ve em jî para xwe jê bigirin. Di wateya rast de em xwe paqij bikin. Ji ber ku li beramberî paqijiya rêbertiyê em pêwîstî bi xwe paqijkirinê dibînin. Ji ber ku encax mirov wisa şayanî azadiyê bibe. Ji Rêbertî û nêvenga me re jî encax wisa layiqî bibe. Bi qasî paqijiya xwezayê pêwîste em xwe xalî bikin. Yanî tevgereke weke wî balkêş a paqijiyê. Serkeftina vê jî em di kesayetiya Rêbertî yê de dibînin. Di gelek mînakan, daxwuyaniyan, nêzîkatî û perpektîfan de vekîrî tê raber kirin. Ger em xwe bigihînin vê em dikarin bigihêjin şoreşgeriyê jî.

***---.:*** Di rastiya Kurdan de îdealîzma jinê ji çirava heyî derxistin û ji sembolîzekirinê re em girîngî didin, ev jî vekiriye. Serbixweyî, encax bi qutbûna ji curên girêdanê ya ku bi xwe gihandina asta îdeal ve gengaz dibe. Em ji vê re bêjin Rêbertiya jinê yan jî îdealîzm. Bêgûman serbixweyiya netewî, qezenckirina gel a nasname û azadiya xwe û bi şerê vê re pir vekirî girêdayî ye. Bê ku vana hebin ji jiyanê re tenezûl nayê kirin. Bûyera ku em jê re dibêjin paqijî jî, pêşketineke li ser vî esasî bi destxistine. Ez pakîzebûnê di wateya ku hûn fêm dikin de zêde cidî nagirim. Li gorî min pakîzetiya jinekê weke zayend, rê li ber gotinên tên zanîn ên di nava civakê re vekiriye û bûye wesîle. Ger bê dîqatkirin, bi rastî ev vegotinên pir ketîne. Lê di encamde wateye wan a sembolîk jî heye.

Pakîzetîya esîl û destnedayîn, xwe di armancên bilind de kilîtkirine.

Pêwîste em vê jî rast fêm bikin. Pakîzetiyeke wisa şayanî mirovên me ye. Ji ber ku, di vê wateyê de em gelê ku herî zêde ketine nava qirêja şaristaniyê, destdirêjiya şaristaniyê ne. Ez vê gotinê ji bo xwe jî bikar tînim. Zilamekî ewqas li beramberî destdirêjiyê rûbirû maye çawa dikare zilamtiyê bike? Wateya vê gotinê mezine. Camêrekî ji aliyê herkesî ve, hemû tişt li ser tê gotin, yê ku dijmin ti hesabî jê re nake, çawa dikare zilamtiyê bike? Ew ji jinê jî xirabtire. Vaye, hesta ku li ser min serwere jî dibe ev. Ev hest, hesteke hevaltiya me bê aman ber bi şerkeriyê ve dibe ye.

Hestên wisa mezin pêwîstin û ev hest nebûna, ev Partî û şer jî nedibû. Hûn paqijî û meziniya hestê dibînin. Li beramberî rewşa mirovatiyê, rewşa gel a ku dilê mirov pê dişewite, gelo mirov dikare wisa bi asanî xwe li şûna mirov deyne? Yê tê û diçe bihênê lêdide û tu kes tenezûlî silavê jî nake, zelîl dibînin, kî dikare bifroşe difiroşe. Ez di nava civakeke rewşa wisa bi êş tê de tên jiyankirin, heta ev jî weke çarenûs bê dane qebûlkirin, ez ê çawa weke rêberên din ên sexte xwe rêber bibînim yan jî qaşo wisa bi bandor, kesekî ewqas bi navbangimê û wisa bifikirim? Eşkereye ku ev ê bibe dûrûtiyeke mezin û vê jî em nakin. Vaye hûn dibînin çawa bi darê zorê ez hewl didim xwe li cihê camêran daynim, rewşa min çiqas zahnete û bi vana hemûyan re şerkirinê çawa hatina hinek cîhan pêk hatiye ez bawerim hûn baştir fêm dikin. Ev hevalên me yên herî kevn di kêliyê de ji mirinê re hene, hemû milîtanên ciwan jî wisa ne, lê hûn dibînin hêza wan têra rakirina bar nake. Ji ber ku ne asane.

Behremendiyeke mezin dixwaze. Başe, encamên ku hûn jê derxin çine? Dema ku pakîzeyî û paqijî bû mijara gotinê îdealîzekirina we di cih de ye. Teqez divê ku jin bilind bên dîtin. Qirêjnekirin, nexweşikirina we pir girînge. Divê ku bi welat re, bi azadiya gel re yeksan bê destgirtin. Bêguman di serî de divê hûn

vê fêm bikin. Hûn ê çawa pakîze bimînin, hûn ê çawa îdeal bibînin û bi hemû pîvanan ve hûn ê çawa nûnertiya wê bikin, pirsgirêkên mezin ên li pêşiya we û di heman demê de hedefin. Min hinekî serbend dan, hûn pêş bixin. Jixwe wekî din qezenckirina we ya kesayet û giştiya armancan ne gengaze. Hûn dibînin ku em di zehmetiyê de ne, lê dîsa jî ev jiyan dibe ya herî rast. Wekî din?

***Soz.:*** Serokê min, ez dibînim ku Rêbertiya Partiyê beriya her tiştî şoreşa kesayetiyê dike. Di civaka Kurdan de beriya şoreşa welat şoreşa kesayetiyê tê. Ji ber ku kesayetiya civaka Kurd li ber çavane. Di vê şoreşê de berî hertiştî Rêbertî ser kesayetiya xwe de diçe û ya ku herî zêde jî me dikişîne ev e, vê dibînim. Hêza Rêbertiya Partiyê şoreşa ku di kesayet de pêk tînê ye. Eşkereye ku pêdiviya me jî bi vê azadî û hêzî heye. Hatina ewqas jin a nava refên Partiyê, pêdiviya bi hêz û azadiyê ye. Em çiqas hatine nava Partiyê jî hewl û hêrs wê hîn bi me re çênebûye. Yanî weke tê xwestin me xwe negihandiye azadiyê. Girêdana vê jî yekser bi paşeroja me re heye. Hêjî ew pergal jiyankirin, ji pergalê qutnebûna me dide diyarkirin. Di heman demê de bandor û taxrîbên li ser kesayetiyên me avakiriye dide dîyarkirin.

***---.:*** Bêguman, yê ku şoreşê di kesayetiya xwe de çêneke dikare bibe rêber? Rêberekî wisa encax durû be. Dema ku hûn hatin we ewqas rast nedidît. Lê hina me bahsa îdealîzekirinê kir. Wiha tê dîtin ku, em bi îdealeke wisa xwe dibezînin. Wekî din hem paqijmayîne hem jî bilinbûna we gengaz nayê dîtin. Hûn ê hem bizanibin pir ser bi xwe û bi rêgez, pir bayexdar û estetîk, pir bi girîngî bizanibin şer bikin. Îlle dê tiştek ji pakîzetiyê bê fêmkirin, divê li ser vî bingehî bê fêmkirin. Û divê hûn xwe mecbûr bikin. Keçên ciwan yên ku herî zêde ji aliyê şoreşê teşegirtinê re guncawin. Hûn objeyên herî zêde ji aliyê şoreşê ve nêzîkî veguherînê ne. Teşeya herî baş ji we re dikare bê dayîn.

Hem jî pêdiviya we ya ji zilaman zêdetir teşegirtina we heye, hem jî taybetmendiyên we yên kesayetê jî ji vê re guncawin. Li ser vî esasî bawerî dayîn, bûyîna hêza hêrsê, gelek girînge û li gorî min ev bi şêwazekî bê aman nirxandin jî ewqas girînge. Divê ku girêdana bi me ve bi şêwazê vê îfadeyê watedar bibe divê ku hûn li berçav bigirin. Wekî din?

***Ze.:*** Serokê min, girêdana me ya bi rêbertiyê re ya rast ez weke bertekeke li beramberî zilamê pergalê dinirxînim. Dîsa girêdana bi rêbertiyê, di wateyêkê de jî girêdana bi azadiyê re ye, lêgerîna azadiyê ye. Di nava lêgerîna azadiyê de ji bo xwe gihandina wî divê ku şerekî mezin bê dayîn. Di vê derê de paraleltiyek heye; ji bo xwe gihandina we divê mirov xwe bigihîne şer. Di vê wateyê de di kesayeta we de xwe gihandina azadiyê bi şerek mezin re derbas dibe. Bi şerê çi li beramberî paşverûtiyên xwe yên hundirî û çi jî li dijî dijmin bê dayîn re derbas dibe. Lêgerîna azadiyê ya di Mem û Zîn de ya rast hîn dema ku despê kiriye dawiya wê hatiye nivîsandin. Ji ber ku li ser pêwendiyeke heyî ya di pergalê de rizgariya netewî nivîsandiye. Li gorî ku pêwendiyeke pergalê wê nebe rizgarî hîn dema tê nivîsandin dawiya wê hatiye diyarkirin. Lê di romana me de, têkoşîna me ya azadiyê de bi redkirina pergalê derketina rê heye. Di daxwuyaniyên rêbertiyê de ji hemû aliyan ve redkirina jin û zilamê pergalê razayî ye.

***---.:*** Hûn hewl didin mekanîzma şêwazê rêbertiyê fêm bikin. Vê bazdana mezin bêguman em bi avakirina mekanîzmayekê dimeşînin. Girêdana we bê ku mekanîzmayeke wisa bi hêz hebe ne gengaze. Divê ku hûn hewl bin fêm bikin min xwe gihandiye mekanîzmayeke çawa. Heta ev peywira we ye, jixwe çareyeke min a din jî nîne. Ez ê mekanîzmeyeke wisa ava bikim ku, teqez bikaribim we li pê xwe bixişikînim. Ji ber ku ev kar bi tanq û topan nabe. Jixwe tanq û topên me jî nînin, ger em

wê bikin niyaz ji despêkê ve binketine. Ji despêkê ve diyar bû ku wê keştiya şoreşê nemeşe. Taktîkek bû. Diviya bû diyar be û diyar jî bû. Mekanîzma bandorker piştre pêşket, cuda hat pêşxistin. Ew hîn jî di dilê min de ye, jixwe ji hemû aliyan ve dîtina we pir zehmete. Ew sêhra min e. Bêguman ez vê di wateya mecazî de dibêjim. Hinekî din nihiniya min çiye meraq dikin. Nihiniya vê, şêwazê min a xwe bikaranînê ye.

Ez vê jî diyar bikim ku, peyamên ku ez didim vê komê di heman demê de nihiniyên mezinin. Û ez jî neçarim ser bixim. Ger ez wisa nekim ez ê asê bimînim. Ger hûn çima mezin nabin bikaribin hinekî berawird bikin, hûn ê baştir fêm bikin. Azwerî û awatên we hene. Çawa bi asanî bi me ve girêdan çêdibe me bi mînaka Dêrsimê nîşanî we da. Bi azwerî û bêrîkirinên wisa heta kîderê dikare biçe? Dibe ku di îsyanên berê de wateyek hebû, lê bi komkujiyan hatin tepisandin. Lê niha wisa ber bi pergalê ve bezîn, li pê bêrîkirinên takekesî xişikîn û çûyîn, ji mirov re çiqas bêgane ye, çiqas ji dijmin re dibe amûr, çiqas înkarkirina dîrokê ye û çiqas xirabiye heta ku neyên fêmkirin, ez ê çawa jê re bêjim mirove, ez ê çawa wî/ê qebûl bikim? Vaye divê hûn vê bibînin û lê binêrin. Îdealekî min jî ya Dêrsimê çêbû. Ya ku hîn jî Dêrsimê tevgerîn dike û îro weke ku di Tirkiyê de, hema bêje di qada navnetewî de rê li ber pêşketineke teysînê vekir. Ev îdeala min e. Ji gelekan re maba ne gengaz bû. Dê kem-kum kiribana. Lê hûn ê di binê serdestiya dijmin a teqez de jî tine bibana. Ev mekanîzmayeke; hema li her derê mekanîzmayeke wisa ava dikim. Bi vana hemûyan bifikirin. Ez ê çawa ji binê vana hemûyan derkevim fêm bikin. Vaye dibe ku ev we ber bi fikrîneke kûr ve bibe. Jiyanê asan winda nekin, girîngiya bi me re bûyîna heval fêm bikin. Ger hebe dilê we, wijdanê we, ger hûn dibînin pêwîste hûn bi asanî nemirin, dema ku we ev jî qebûl kir hûn ê bi pêwîstiya serkeftina xebatê bifikirin. Pêdiviya serkeftina xebatê wê teqez we ber bi rast ser xebata pratîka rojane çûyînê ve

bibe. Ev ê jî rê li ber serkeftina şêwazê xebatê veke. Bûyera ku ez jê re dibêjim lihevkirî jî hinekî bi vî rengî ye. Bervajî hemû peyv, rewşên ku weke demogojiya erzan tên tabîrkirinin. Ez dilê we bi xwe naşewitînim, berevajî, dema ku rastiyê wisa destnîşan dikim, dibêjim dema ku hûn fêm bikin dê gelek pêşketinên encamgir bi xwe re bîne. Heta niha zêde fêmnekirina we tenê xirabiya wê gîştiye we, hûn ji rêzê mane. Lê fêmkirina vî şêwazî mezin dixebitîne û ber bi serkeftinên mezin ve dibe. Wekî din?

***B.:*** Serokê min, di nava civakê de azadî di kesayetiya serokatiyê de şênber dibe yanî di rizgariyê de xwe gihandina îfadeyê mijara gotinê ye. Rêbertî di nava têkoşînê de ne weke kes, weke remzekî civakî tê dîtin. Beriya wê jî ne kese, Rêbertî ji hemû aliyan ve remza rizgariyeke giştiye û weke rizgariya gelekî tê dîtin. Dema ku em tên nava têkoşînê nêvenga azad û nakokiya jiyana nû-kevn a di nêvenga azad de rewşeke lihevgêjbûnê heye. Her çiqas azweriya jiyana nû çawa be em fêm bikin jî di asta tê fêmkirinde pratîzekirina vê nabe mijara gotinê. Yanî azweriya azadiyê dê azweriyeke di çi radeyê de be em nafikirin. Hertim bêriya jiyana kevn kirin û ji ber vê bêriyê kirinê bi jiyaneke nû, nêvenga azadiyê ve di asta azweriyê de em nayên girêdan. Weke ku em pê ve negirêdayîne ya din em wê azweriyê jî fêm nakin. Ger fêm jî bikin derbasî pratîkê nakin. Weke ku em di jiyana xwe ya kevin de ne xwedî hewl, kedê bûn em di derbarê jiyana nû de jî raber nakin.

***---.:*** Êdî pirsgirêkê hûn ê bi xwe çareser bikin. Madem tu ewqas hîs dikî, tê pêşketinê jî bîjî. Hîskirin, bihîstin despêkirina gava yekem a pêşketinê ye. Berevajî hûn ê nikaribin ji mêr-pîrekên dûrî rizgar bibin. Wekî din? Te tiştek fêm kir? Xe.. hevaleke me ya nû ye.

***Xe.:*** Serokê min Rêbertî xwedî felsefeyeke mezine.

**---.:** Te pir xwendibû ne wisa? Çi xwendibû?

***Xe.:*** Min Tip dixwend Serokê min.

**---.:** Tu hinekî wêjeya gel jî dizane?

***Xe.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Heta tu li ser jî xebitiye. Tu rewşa me çawa dibînî?

***Xe.:*** Serokê min, wê demê min ev felsefe zêde fêm nedikir. Lê piştî ku hatim vê qadê û şûn de bi taybet piştî ku min Rêbertiya Partiyê dît û şûn de pir tişt min nû fêm kir. Min berê Sheakespeare dixwend. Min felsefeya Yûnan xwend. Di dîrokê de Sheakespeare wisa dixwaze ji kesekê hez bike, lê ser nakeve. Sheakespeare li ser qral û mîran jî pir nivîsandiye. Tenê navê wan mîre. Li ser dîktatoriyê, li ser rêbertiyê jî destnîşankirinên wî hene. Lê dîsa jî Sheakespeare kesayetiya ku dixwaze tam venegotiye. Piştî ku hatim vê qadê ew kesateyiya ku Sheakespeare xwestiye min di Rêbertiyê de dît.

**---.:** Yanî Sheakespeare jî dixwest bigihêje kesayetiyeke wisa?

***Xe.:*** Belê, lê heta niha nekarî bike. Despêkê dibe ku hinekî xwe nêzîkî vê kesayetê kiribe, lê dawî wisa pêş neket.

**---.:** Başe tu di derbarê Romeo û Jûlîet de çi dibêjî?

***Xe.:*** Dikarim bêjim Romeo û Jûlîet dişibin Mem û Zînê. Ji hemû aliyan ve nebe jî xalên dişibin hev hene.

**---.:** Başe, ji aliyê xebatên me ve mirov dikare emcameke çawa jê derxe? Hinekî berawird bike.

***Xe.: Sheakespeare***, di Romeo û Jûlîet de bahsa zulm dike. Zilm li Romeo tê kirin, Jûlîet jî keça arîstokratekî ye. Pişt re herdû jî dimrin. Ew jî dixwazin jiyaneke nû biafirîne. Lê dawiya wan dibe mirin.

**---.:** Xencer, ne wisa? Ji bo di dil de biçikînin xencer!

***Xe.:*** Raste Serokê min.

**---.:** Sheakespeare, dixwaze Romeo bike mêrxasek? Romeo çawa dimire.

***Xe.:*** Dikarim bêjim ku ya wî jî mirineke vala ye.

**---.:** Li beramberî Jûlîet çawa ye, bi zeafe?

***Xe.:*** Lewaze Serokê min. Romeo tenê ne li pê mêrxasiyê ye.

**---.:** Di dîroka Îngîltere de çi temsîl dike, ji dayikbûna burjuvaziyê?

***Xe.:*** Belê Serokê min, ji dayikbûna burjuvaziyê.

**---.:** Yanî Jûlîet, Romeo jî zarokên arîstokrata ne?

***Xe.:*** Belê Serokê min. Pirtûkeke Sheakespeare ya din bi navê Othello heye. Ez dixwazim bahsa kesayetiya jinê ya di wir de bikim. Othello kesekî zilmê li jinê dike ye. Lê Sheakespeare di dîroka Îngîltere de dide diyarkirin ku ew tenê koleyeke. Şêwazê nêzîkatiya Sheakespeare ji jinê re bi şêwazê koletiyê re hemane. Hevjîna Othello heye, hevjîna xwe dide zilamekî reşpost jin jî heta dawî dibe kolê zilamê reşpost. Othello jî arîstokrateke. Lê di nêzîkatiyên wî ji jinê re tê fêmkirin ku ji kîja çînê dibe bila bibe jinê weke kole dibîne.

***---.:*** Li gorî te dixwaze di vir de çi îspat bike?

***Xe.:*** Jin çiqas hatiye xistin Serokê min.

***---.:*** Belkî jî jin azadiyê dixwaze, lê Othello nikare wê rake û ji bo ku vê daxwaza jinê ceza bike mahkûmî bi reşpostekî re jiyanê dike. Bi yên Yûnanîstanê re çawa dikare bê berawirdkirin?

***Xe.:*** Serokê min, Erostal li Yûnanê kesê yekeme. Li ser cîhanê gelek lêkolînên wî hene. Li gorî ku min ji felsefeya Sofokles fêm kiriye dikarim bêjim ku felsefa Rêbertî û ya Sofokles pir nêzîkî hevin. Ji ber ku Sofokles di hemû pirtîkên xwe de heta dawî dijberî zilm û serdestiyê ye.

***---.:*** Xebatên min nêzîkî xebatên rewşenbîrên Yûnanî û Sofokles'in, tu dixwazî vê bêjî? Yalçin Kuçuk jî gotibû şerê ku em dimeşînin aliyên xwe yên dişibin mêrxasiyên serdema Yûnaniyan hene.

***Xe.:*** Belê Serokê min, dikarim bêjim ku gelek aliyên dişibin hev hene.

***---.:*** Gengaze, li ser vê dixwaze kûr bibe. Bêguman xebatên min ne weke yên çar hezar sal beriya niha ne. Ji bo çar hezar sal şûn de ne. Dema yekem ku burjuvazî derket, heta dema proleterya derket ev pêvajo hemû di nava xebatên me de tên raberkirin. Pêwîste tu vana bi baldarî binirxîne. Ez ji daxwaza te ya naskirina me bawerim, li gorî te wê dawiya me çawa be?

***Xe.:*** Serokê min, dixwazim tiştekî bêjim. Bi rastî jî min qet ji siyaseta emperyalîst bawer nekir û hertim jê revîm. Ji ber vê min xwe bi bîrkariyê ve gire da, ji ber ku di bîrkarî de tenê pirsek û bersivek heye. Lê di siyasetê de nêzîkî pîst bersivên pirsekê hene. Ji ber vê ji siyasetê revîm û zanim ku tiştekî baş jî nîne.

**---.:** Yanî du car du dike çar. Tu dixwazî hemû bersiv yek be. Ji ber vê ji pîst bersivên cuda direvî. Çima tu ji siyasetê revî?

***Xe.:*** Serokê min, piştî ku hatim vê qadê û şûn de min zemînekî bi hêz ji xwe re çêkir. Min siyaseta emperyalîst mirov çawa mahf dike dît. Mirovan tîne asteke wisa ku, herkes ji bo berjewendiyê xwe dijî.

**---.:** Temam dikarim bêjim ku tu ji jiyana emperyalîst revî. Tu li wir li kîja bajarî mezinbibû? Kanada bû?

***Xe.:*** Belê, Kanada Serokê min.

**---.:** Lê hinekî ruhê kurdiniyê heye.

***Xe.:*** Serokê min, min ev ruh ji dayika xwe û malbatê girt. Dayika min welatparêzeke bi welatê xwe ve girêdayî ye.

**---.:** Başe em niha ji bo te çibikin? Tê biçe kîderê, çi bike ne diyare. Divê armancên keçeke weke te hebin. Pêwîste em rast te bi van armancan ve gire bidin. Ger wisa nebe tê perîşan bibe.

***Xe.:*** Serokê min, piştî hatim seha serokatiyê min sedema revan fêm kir. Jiyana mirovê Kurd bi siyasetê ve girêdayî ye, ger siyaset nebe jiyan jî nabe. Min li seha Serokatiyê ev baş dît.

**---.:** Başe tu çima direvî?

***Xe.:*** Ez ji rastiya xwe direvim Serokê min.

**---.:** Başe tê niha jî bireve? Ger tu bixwazî birevî rê vekiriye.

***Xe.:*** Na Serokê min. Ji ber ku min êdî rastiya xwe dît.

***---.:*** Lê ez hinekî bi te re tengbûnê dibînim. Dibe ku tu bibe du beş jî. Li aliyekî jiyana Emerîka, li aliyê din jiiyana teng a Kurdan û hew tê bibînî care ku tu qelişiye. Em çi ji te bikin?

***Xe.:*** Serokê min naşkêm, wê Kurdîtiya min di tarîtiyê de bifetisîne. Jiyana min bê PKK'ê nabe.

***---.:*** Lê jiyana PKK'ê gelek zehmete. Ez bi hemû keçan difikirim. Di hemû axaftinên xwe de xîtabî wan dikim. Me xwe pêgihand, xwe mîna agir lê kir. Lê em we jî neşewitînin. Em di nava agir de dibin pola, lê hûn nebûn pola jî hûn dikevin.

***Xe.:*** Serokê min, zehmetî nebin di jiyanê de serkeftin jî nabe.

***---.:*** Tu dîrokeke amade hatiye nivîsandin dixwazî, sebra te heye, berxwedêriya te jî bi hêze. Ev xal ji bo te pir girîngin. Bêguman kesayetiya Başûrê Kurdistanê pir hatiye xistin. Bi wan mirovan pir hatiye lîstin. Vaye hûn li wir tên nûkirin. Tu di PKK'ê de ji dayik dibî, astengiyên mezin li pêşiya te hene. Tê weke jineke azad û serbixwe çawa bikeve nava vana, tê çawa xwe bi vana re bike yek? Tê çawa hîn zêde xwe bide xebitîn? Ger tu wisa neke tê rehet nebî, tê nikaribe xwe bide efûkirin. Hûn hatine em heta dawî ji we re rêz digirin, lê ev jî taybetmendiya me ye. Li ser mirovan bi bandorbûn ango nebûna me, em çiqasî dikarin wan biguherin li ber çav digirin. Tiştekî din jî heye; hinek ji wan jinên ku digiriyan hinek jinên ku li Kanada mirin hebûn. Ew windahiyên pir mezinin. Te careke din şansê xwe sererastkirinê dest xist. Dema ku tu despêkê hatî tu li Kanada fetisî bû. Em te li vir ber bi jiyana rast ve tînin. Ger nebesiyên min jî hebin bi rastiyên me mirina te jî ji mirina li Kanada baştire.

***Xe.:*** Serokê min, ez tenê ji bo tiştekî xembarim. Çima berê min PKK nas nekir ji bo vê xembarim.

***---.:*** Ew koletiya te ye. Dişibe pirsa, “*dayika min ez çawa anîm dinyê”* ya ku di vê wateyê de min pirsî bû. Lê dîsa jî bi hezaran car min spasiya wê kir. Te di 20 saliya xwe de PKK nas kiriye, xwe bi şans bibîne. Te hîn hemû tiştê xwe ji dest nedaye. Biryara te di destê te de ye.

***Xe.:*** Ji ber vê kîneke min a mezin li beramberî KDP’ê heye. Xebatên KDP’ê yên li Kanadayê gelek xembarin.

***---.:*** Wê demê tu jî bi awayekî siyasî ser de biçûna. Li ser kesayetiya Başûr lêhûrbûn bike. Xembarbûn û kîn bihîstina te başe, lê divê ku tu tahlîleke siyasî jî bikî. Ger na tenê bi xembariyê ve bimîne tê linav biçî, tê îflah nebî. Kesayetiya Başûr pir berfireh û kûr lêkolîn bike. Te gelek jinên başûrî nas kir, hemû jî anîbûn rewşa jinên ketî. Li Başûr di vê xalê de lewazî hene. Hemû jin û keçên Başûr weke miriyan kirine. Ew başin, cewherê wan jî heye, lê hinekî vala ne. Li ser wan serweriya feodalîzmê heye.

Vaye te Othello xwendiye. Vana di heman demê de mîrin, feodalin, axa ne. Ya rast îflahbûna keça mîrekî pir zehmete. Lê me derfet da te. Me gelek keçên weke te nas kir. Çend caran li dijî me şer kirin, hinek hevalên min ên paşketî jî xistin. Lê niha jî serweriya min heye. Ji gelek aliyan ve giştim encaman. Em hêdî hêdî jina ji destê wan derdixin. Ez di vê baweriyê de me ku em ê di demeke kurt de hejmareke zêde keçan derxin. Ger ez bi xwe li wir bixebitîma min dikarî zêdetir rêxistin bikim. Hûn jî bi biryarin. Tu dikarî li ser xwe bifikirî. Jiyaneke nû bike hedef. Beriya her tiştî serkeftineke nû, despêkeke nû bike hedef. Heta niha bûyerên ku qewimîne xeteke sor bikişîne ser wan. Mirov dikare di 20 saliya xwe de bibe mêrxasek. Em ê dev ji jinên Başûr jî bernedin, em di vê baweriyê de ne ku jin û zilamên bi hêz li wir jî hene. Ez li rûyê wan dinêrim, li jiyana wan dinêrim pêşmergên

ji rêzê hemû fetisandine. Mirov ji jiyana ku ew dijîn nefret dike. Hîn nagihêjin 20-25 saliya xwe di nava jiyana malbatê de difetisin. Bi awayekî bê pîvan tasarûfê li ser wan pêş dixin. Jinên ketî heta dawî li ser wan dimeşin, ew pir bê çare hiştine. Jixwe zêdetir jinan dixin. Vana di heman demê de hedefê me ne. Ji bo vê ye ku, bi biryarbin, xwedî armancên mezin bin, da ku em bikaribin bi hev re bimeşin û em bikaribin hedefên mezin fetih bikin. Bêguman birîneke min a mezine. Di nava PKK'ê de ji dayikbûn jiyaneke mezine. Jiyana rehet ne ji bo me ye, em di nava jiyanake ji agir de ne. Bi sebirbûn û aqilbûn li ser xeta ku me xêz kiriye pêwîste lêhûrbûn bê kirin. Ev jî ji bo we bese.

We rewşa min dît. Ez di rewşeke çawa de me di holê de ye, ez di çêkereke ecêb de me. Min hîn jî xwe ne pîvaye. Welhasil di rewşeke çawa de me, divê ku bi rastiyan ve bê dîtin, ne bi sextkariyan.

Ez bi rastiya Kurdan, rastiyên dîrokî, rastiyên mirovatiyê dixwazim xwe keşif bikin, xwe nas bikim.

Dema ku dibêjim rastiya xwe nas bikin, binêrin pêdiviya min jî bi vê heye. Ez nikarim bêjim, "*ez zilamekî serwerim*" ji vê re cesaret jî nakim. Bi vî şêwazî axaftin bi we re heye. Bi taybetî li Başûr tam xwe weke zilam qebûl dikin. Lê li bermaberî dijmin jî ne tiştekin. Ez çawa wan weke zilam qebûl bikim? Di rewşeke ya ji jinê xirabtir de ne. Mesele tu bi hezar qatî ji wan bihêztirî. Texmîna min ev e, lê tevî vê jî zilam li ser we serwerin.

***Xe.:*** Bi taybetî feodalîte pir serwere Serokê min.

***---.:*** Ne gengaze ku ez xwe zilamekî wisa qebûl bikim. Ne moralê min, ne exlaqê min zilamtiyeke bi vê curê qebûl nake. Wisa li gel jinê xwe weke zilamekî qebûlkirina min jî ne gengaze. Jixwe ez weke wan xwe zilam qebûl bikim, wê demê ez ê biçim,

tine bibim. Ya rast divê ku romaneke vana hemûyan digire nava xwe bê nivîsandin. Ez li kîderê bêmirin bûm, li kîderê rabûm û li kîderê ketim, dil dixwest ku em vana hemûyan binivîsînin. Xwestekên min ê wisa jî hene. Hew we dît em li cihekî bûne agirek, li aliyekî bûne ba, ji aliyekî ve jî her tişt qut bû ye, rawestiya ye. Ji bo kirina dîrok û nivîsandinê, ya din jî ev alî pêwîste.

Ger ev saxtekarî û durûtî raneweste em ji jiyanê tiştekî fêm nakin. Min jî xemgîn dike. Ev jiyanek erzan û durû ye. Bê şerm, bêrû, xwe nezanîn, lê li beramberî jinê nêzîkatiyên ku xwe ewqas zilam qebûl dikin, min pir aciz dike. Vana ji bo min astengiyên ku divê teqez bên derbaskirinin. Ez ê çawa û çi ji van zilamên we bikim? Lê di nava PKK'ê de em hewl didin yên wisa tahlîl bikim. Xwe zilam qebûl dikin, lê ji jinan hîn xirabtir û paşketîne. Hemû tiştî difroşin. Jinê û keçan jî difroşin. Em nikarin vê qebûl bikin. Xwe zilam qebûl dikin, lê jinê cîhanê ne. Wê demê em ji wan re "*mêr"* bînin, bila jinê wan nebe. Jixwe ji vê ditirsin. Tirsa wan a ji min jî hinekî ji ber vê ye. Vana hemû girîngin û dîrokin. Divê ku hûn bikaribin mezin li ser vana bifikirin. Hûn jinin, we zêde gemarî neditiye. Hûn dikarin xwe pir paqij bigirin. Ger hûn nikaribin xwe paqij bigirin jiyan ji bo xwe xirabe, mirine. Hûn jinên Başûr, hertim wisa dimirin. Bê hebûna azadiyê jiyana ku di nav de dijîn jî, ji xwe ji mirinê xirabtire. Jiyaneke wisa ne şayanî we ye. Em vê şoreşê; ji bo welat, şerefa gel û tolgirtinê dikin ez wisa difikirîm û min dît ku şoreşa mezin herî zêde jî ji bo wan e. Van jinên fetisî û mirî, van jinê bê çare, bê hebûna şoreşeke mezin rakirina wan serpiya ne gengaze.

Bêguman kes vê nizane, tê gotin; "*jin çiye ku, min ew bi ben girtiye. "wekî heywanan, wahşîno." "Min kirî, da, firot"* çine ev? Ger jiyan û mirovatî ev e, wê demê evîn û hezkirin li kîderê ye? Na! Hûn bê ziman, bê vîn û bê ruhin, wê demê hûn mirine.

Pêwîst nake em kêrê jî li we bidin. Yan jî pêwîst nake hûn lêdin, ji ber ku hûn mirine. Ji bo kêrê berî her tiştî pêwîste mirov zindî be. Vana hemû meseleyên jiyanî ne, dîsa jî bi sebir bin û bi taybet xebatên ku em dikin ji xwe re bikin mînak. Piştî ku we rast nêzîkbûn di kesayet û jiyana xwe de temsîl kir û şûn de, yên ku heta roja îro me kirine ber bi pêş ve birin, pêşxistina, heta ji me zêdetir kirin jî teqez gengaze. Me derfetê vê afirand û pêşkêş kir. Xwedî lêderkevin, bi rêz nêzîk bibin, ji xwe re bikin hedef, bi sebir û bi hêz bin. Ya herî girîng jî bi siyaset bin. Li beramberî mîr û began, li beramberî yên ku ne zilamin rûyê xwe paqij bigirin. Xwe û roja xwe bi keramet bikin, bi kêrhatî bikin. Qîmeta jiyanê û jiyana xwe bizanin. Ji bîr nekin ku, xwîna ewqas şehîdîan ji bo we jî diherike.

Hûn ê biwestin, hûn diwestin. Xwezayî ye; em hewl didin ji heq meseleyên girîng werin. Bê ku tengav bikin û tengav bibin pêşketin jî nabe.

Civîna me tam jî veguherî şanoyekî. Civîneke dîrokî. Navê keçan, yên ku xwediyê ristin jî nayê gotin. Dibêjin keça yekem, keça duwem, keça sêyem didome û diçe. Belê, Ebas em ji derdê xwe re li çarê digerin. Tu xwe alîm dibînî, tu çi dibêjî?

***Ab.:*** Çareyê bê dîtin Serokê min.

***---.:*** Em ê bikarin jiyan bikin, hûn dibînin ez çiqasî li pê jiyanê me? Niha heta dawî sankî jiyana min trajîke. Trajîke, komediye yan jî pir şanaze? Ya rast ez vana hemûyan di jiyana xwe de raber dikim. Gelek bi bandorim, çalakim û dilê min bi we dişewite, hûn keçên ciwanin. Ez ji we hemûyan şanaztirim ne wisa? Ez ji we dixwazim hûn bê miriniyê temsîl bikin.

***Xe.:*** Serokê min, ya ku Rêbertî dide bayekî bi hêze, ev ba li hemû çihê ku lê tê hemû kesî bandor dike.

**---.:** Rêbartî bêmirine û bayekî pir hişke. Ger wisa nebe, dê bibe sextekarî, weke bayekî bi bandor bi baketin neyê serxistin dê bibe lîstok, mijara heneka û neyê cidî girtin. Lê belê, ez ê girêdana we ya mezin çawa pêş bixim, ev jî min dide fikirandin. Bêrîkirinên we hene û ez ê wan çawa pêşwazî bikim? Bifikirin, hezkiriyeke ciwanekî xort hebe, ji bo wê diçe xurbetê, diçe Ewrûpayan, nizanim çiyayan kun dike. Çima; tenê ji bo ku bikaribe bendewariyeke xwe ya biçûk pêşwazî bikin. Min bêrîkirinên hezaran, mîlyonan, ez berpirsyarê pêşwazîkirina bêrîkirinên wan im û ev tenê ne bendewariyeke madiye jî, ez peywirdarê cîhanê wan ên xilaskirî ji nû ve zindîkirinê me. Ez vê ji hevalên ku dibêjin em milîtanin re dibêjin. Hezkiriyeke we hebe, hevjîneke we hebe yan jî azweriyeke we hebe, kî zane hûn ê çi bikin? Lê li bêrîkirinên mîlyonan keçên ciwan ê hezaran bifikirin; li beramberî wan hûn çima ne çarene? Ji bo xelateke me ya baş hebe gelo li beramberî giştî, li beramberî jinbûnê em bi pêşkeşkirina çi peywirdarin hûn dikarin bifikirin? Îllehî hûn ê qala zilamtî yan jî hezkiriyê bikin; divê ku hûn bi vê jî bifikirin.

Ez zêde xwe ne nepixînim, ji hemû aliyan ve em ji bo gelê xwe şoreşekê pêş dixin. Lê dema ku ev keçik dibin mijara gotinê, bi rastî jî piraniya hevalan bi astên vê pirsgirêkê yên ku me destnîşankiriye nafikirin jî. Hinek heval dibe ku bêjin, "*ev barin, em çi bikin, bavêjin kîderê?"* û wisa difikirin. Ji bo keçên ciwan fikrandineke wisa em çi bêjin? Piraniya fermandarên me di nava nêzîkatiyeke wisa de ne. Ez jî berevajî nêzîkatiyên van dibêjim hêzeke pir mezin heye. "*pirsgirêkin, barin, em çibikin"* û hwd tên çi watê. Vana hakaretin. Ji keçeke ciwan re çawa vana dikarin bên gotin? Lê mixabin nêzîkatiyên wisa çêdibin û keçên me yên ciwan jî xwe wisa dibînin. Helwestê hor dîtin, teqez hakaretin. Lê hebûna keçeke ciwan, teqez bi serê xwe divê ku bibin çavkaniya hêz û peroş, weke hêza jiyanê bên dîtin. Mixabin em nikarin vê bi xortên xwe bidin nîşandan. De îca hinekî jî hêz qezenckirin,

nêzîkatiyên herî xirab jî dikarin pêşkevin. Eşkereye ku divê ez vana hemûyan bibînim. Dîmen jî, ne weke kû hûn zanine. Teqez divê ku ez li cihekî ji bêrîkirinên we re bersivê bibînim. Çiyê min û çiqas hêza min heye, pêwîste hîn jî pêş bixim. Ji bo vê jî vaye ev cihê ku em niha lê kombûne ji pêkanîna ewlekariya wê bigirin heta hinekî pêşketina ruhê we, ji pirsgirêkên we yên berfireh û pêdiviyên we re bûyîna çareserî, yanî divê ku ez çareseriyê jê re pêş bixim.

Vaye ev, nêzîkatiyeke bi nirxe, nêzîkatiyeke divê wate û nirx jê re bê dayîn, rêz lê bê girtine. Dema ku em vê nekin hezkirin wê bibe dereweke mezin. Em nikarin ewqasî li beramberî dîrokê bê hêz bin û hûn jî nikarin xwe bikin qurbanê mijarên nirxandinên erzan. Jixwe bi qasî ku hûn bikevin ketine, bi qasî ku biçûk bibin biçûk bûne. Piştî ku me pêşketin anîne vê astê, mafê tu kesî nîne ku bikeve nava nêzîkatiyên wisa erzan. Ked û hewldaneke ewqas berfireh tê raberkirin, di serî de jî em xwe datînin holê, vana hemû tine hesibandin yan jî vala derxistin nêzîkbûnên erzan em nikarin bidin jiyîn û hûn nikarin li ser me ferz bikin. Ev dê bibe bêrîzî û hakareta herî mezin. Ez dikarim hîn jî vekim, yanî Rêbertî ne weke ku hûn texmîn dikine. Bêrîkirinên we qirêj bûne, heta dawî hatine îdealîzekirin û dikarin pêk jî werin. Ji bûna îfadeya wê em bigirin vê ji hemû Partiyê, netew û mirovatiyê re belavkirin, bi qasî xeyalê wê, xwe gihandina îfadeya wê ya zanistî dema ku dibêjim şerekî mezine mebesta min ev hemû ne. Ev, bawerim bi we re hinekî meziniya firkrandinê, bilindbûna hestan, sebrê û berxwedêriyê derxîne holê. Bi taybetî jî van şehîdên gernas çima xwe feda kirin jî em ê baştir ronî bikin. Nirxdayîn û bi wate kirin jî ev e.

Ya rast a ku wan ji me dixwest, hêvî dikir jî li ser vî bingehî ye û ger ez ewqas xwe tengav dikim, ber bi çareseriyê ve dibim, ji ber sedema bandora wan a ferzkere. Jixwe min ew

bandor nebihîstiba, minê xwe namerd hesibandiba. Min girîngî da ji bo ku ez wisa nebim. Hûn dibînin ku, bi her awayî bi we re me. Dixwaze min bêmirin bibînin, dixwaze bê çare û belengaz yan jî pir dûrî, yan jî pir nêzî xwe bibînin, hûn çawa dinirxînin binirxînin; ez bi we hemûyan re me. Bilindiya xwe tenê kêliyekê jî kêm nayê hiştin. Rastiya gelekî dîroka koletiya hezaran sal hatiye tinekirin, jiyana netewî ku hatiye bi dawîkirin û li beramberî rastiya we ya ku weke tê xwestin nayê partîbûnê, yê herî ji xwe bawer, gelo kesek hîn dikare çiqasî bê aman û heta xwedayî be? Ez ji wê re jî vekirî me; hema bêje mîna haran xwe pêgihandin, hewla jê re hêz anînê, weke baweriyekê tê raberkirin. Lê ez lingê xwe jî ji erdê qut bikim, ez ê wisa serberjêr bikevim ku, serxistina min a tiştekî jî dê gengaz nebe. Ewqas di bilindahiyê de firîn û di vê astê de lingê xwe saxlem pêl erdê kirin, di gel serê xwe heta erşan bilindkirinê di heman pîvanê de, saxlem pêl erdê kirin, taybetmendiyên bi min re di nava hev de jiyan dikine.

Ji meşa bi anûr ya mirovan re û wekheviyê we jî girtine berfirehiya wê tevlîkirin, nabêjim tenê pewîstiyeke şoreşê ye. Ev di heman demê de ji hemû aliyan ve mijara azweriyê ye. Ji aliyê din ve mîna ku di çolê de leylanok dîtinê, bi qasî ku tu xwe nêzîkî dike rewşa ji te dûrketinê dîtinê jî xwe paş ve nadim. Lê belê dikarim bêjim, em giştine wê astê; hêvî mezinbûne û li ser vî bingehî hewldan watedar bûne, rastiya ku hatiye jiyîn derbaskirin di heman demê de pêkahatina evînekê ye. Pêwîstiya dîtina vê, berfirehkirina hewldanan jî derdikeve holê. Evîna rast jî wisa xwe bi me dayîna nasîn, şansekî jî îfade dike. Ger ji bo gel me ev dest xistibe û îca em vê jî bi we re dikarin fêm bikin, bibihîzin, dijîn, zehmetî ji kîderê tên bila bên şayanî pêşwazîkirinê ne. Jixwe hêza min a mezin a rakirinê jî çavkaniya xwe ji vê rastiya evînê digire. Tevî hemû tiştî jî em dibin yên herî bi şans. Dîsa zehmetî çi dibin bila bibin, em di rewşa giştina hewldanên herî esîlin jî. Ya li şûn

ve dimîne hişmendî, rêxistingerî û karê çalakiyê ye. Ew jî jixwe rastiya me ya jiyanê ye. Min çawa di nava mercên herî zehmet de derketin kir û bi nirxandineke wisa ya gelekî, hema bêje ber bi netewekî şoreşger ve birin ser xistiye, piştî wê jî anîn bi derfete. Bêguman ev çîrok, hûn ê çiqas bikaribin rist bigirin û teqez serkeftina encam jî dide nîşandan.

Hûn dibînin, dîsa û ji her demê ji ya tê payîn zêdetir, bi we re me. Dema ku hûn li qadên peywirên xwe belav bibin jî, ji bo pêşxistina bi hevrebûn û evînên mezine. Ya pêwîst, şayan û li me tê jî ev e. Ger na em cîh nadin ji têgeheke weke ji hev qutbûnan. Ji hev qutbûnên fîzîkî jî di vê watê de, di vê baweriyê de me ku divê neyên mezinkirin. Min hertim wisa jiyan kir û eşkereye ku serkeftinê jî wisa bê pêkanîn. Hemû heval li ser vî esasî hatine girêdan û didin jiyankirin. Li gorî min me bi we re nîqaşên herî watedar meşandin. Biryardariya mezin careke din li ser vî esasî me da. Lî kîderê, kî ji we temsîl bike ew yeke ji dile û ji me ye. Ev jî dema ku wisa vekirî xwe dide hîskirin, her ber bi qadên peywirê ve çûyîn tenê ber bi armancê ve gaveke din bi şêwazê azadbûyî çûyîn û ev jî bê aman, bi peywirên rasteqîn, şêwaza xebata wê, dîsa ber bi şêwaza lêdanê ya bê aman ve bir. Ev jî weke ku hertim tê gotin û nîşandan, gavên ku em nêzîkî serkeftinê kirine. Di vê meşê de cihê we pir saxleme, heta dawî hatiye pejirandin û her roja ku derbas dibe hîn bêtir ji hev qut nebûn û bi hevrebûna we dide diyarkirin. Bersiva herî hêja ji we re bê dayîn jî ev e û heta niha sînordar be jî nirxeke wisa nîşandanê re dibînim ku bihevrebûna keçên herî hêja pêş dikeve, girêdana wan bê sînor dibe. Nexwe, ev ya herî raste, ya herî bi hêze û teqez ya ku wê bibe serkeftinê ye.

**20 COTMEH 1994**

# Ji Xwe Bawer û Serbixwe Bin Da Ku Hêza We Hebe Hûn Bi Min Re Bimeşin

Hema bêje em giştin nefesa xwe ya dawî. Ji civîna borî ya ku me bi we re çêkir û nirxandinên ku me pêşxistin hinek pêvekên mane difikirim. Ez bawerim pêdiviya we jî bi vekirina hinek xalên din heye. Ji ber ku em lez digirin dest zimanê min qut bû; ji ber ku çîrok bi xwe û vekirina wê heta dawî kelecan dide. Heta dawî herikîner û ewqas jî çîrokeke kûre. Ez bawerim encamên ku pêwîste jê bên derxistin, pêwendiya wan bi pirsgirêkên pêşketina şoreşa me ve êdî baştir tên dîtin. Ji ber vê sedemê, bi vekirina çîrokê ve girêdayî li ser encamên wê em çiqas rawestin di cîh de ye. Bêguman ji bo vê jî pêwîste berî her tiştî mirov hinekî wêrek be. Em vê jî destnîşan bikin ev civîneke pir bi îdîaye. Nirxandinên li derdora jin û malbatê tên pêşxistin, yên herî rast, tahlîlker û di asta ber bi veguherînê ve birinê de ye. Hêvîdarim ku li ser wateya wê hûn jî bi hemû aliyan ve bi girîngî radiwestin. Eşkereye ku pêdiviya me bi vê heye. Teqez nêzîkatiyeke nû û şêwazê jiyanake nû qebûlkirin, derxistina zanînê û divê mirov bigihîne hêza nûnertiyê jî. De îca ji bo we ev, beriya nan û avê tê. Pêşdîtina anûra kes û li gorî gelan guncaw jiyankirinê, yek ji xala mirovbûnê ya devjênegere. Beriya her tiştî pêdiviya we bi vê heye. Hûn ê bifikirin, biponijin û ya şayanî xwe teqez bibînin. Me xwest em hinekî hêz bidin.

Bêguman eşkereye ku em ê ji hemû derdan re nebin derman. Divê ku ya me tenê weke alikariya hevaltiyê bê qebûlkirin û min ji we re got ji nîqaşê re jî vekiriye. Diyardeyên ku me danîn holê, nirxandinên ku me pêşxistin, weke ku provakatoran gotî, "*ne ayetin*" yên ku di guftogoyên niqaşên azad de derketin holê,

rastiyên ku teşe girtine. Vekirina rastiyekê, girêkeke kor û encamên wê weke feraseta jiyaneke nû bi pergal kirine. Texmîn dikim hûn jî ji niha ve veguhertinekê dijîn. Weke jiyaneke nû, ji bo van cîhanên we yên teng, hatine fetisandin, giştiye asta ku hûn nikarin nefes bigirin, ji bo kesayetiyên we yên ku hatine biçûk kirin jî destkefteke. Di vê baweriyê de me ku gelekî hûn bandor kirine. Wekî din jî azadî nayê dest xistin. Ger hinekî rast nêzîkatî bê kirin, wê bi asanî bê fêmkirin ku wisa ye.

Belê, em ê hinek nirxandinên pêvek bikin. Xalên balkêş çibûn? Çîrok çawa dikare bê vekirin? Hinek heval dixwazin şênbertir be? vekirîbûn, kûrahî û hûrkarî ji bo kîderê pêwîste em dikarin vekin. Weke ku min got, divê ku hûn gelekî azad nêzîk bibin. Pirsgirêk li vir ne di çend kesan de ye, bingehê pirsgirêkê çareserkirina girêkên kor ên civakê ne. Serûbinbûna min ji vê şûn de zêde ne girînge. Ya girîng çareseriya girêka kore.

Em guftûgoyan bidomînin. Ji civîna borî heta niha pirsên ku we kom kirine hene? Hûn çi fikirîn Eb?

***Ab.:*** Zêde nefikirîm Serokê min.

***---.:*** Ma dibe ez qala xalên balkêş dikim.

***Ab.:*** Di gelek mijaran de li ser xalên ku bala min kişandin nerînên xwe anîbûn ziman Serokê min. Zêdetir heval nerînên xwe bînin ziman wê baştir be.

***---.:*** Em çîrokê bi taybet vedibêjin. Heta em dikarin bêjin ku ji çîrokê derbasî romanê jî dibin. Çîrok, weke ku rastiya xwe heye vegotine. Roman jî hinekî din ew bi xeyalan, nexşekêşiyê ve bi dewlemendî pêşxistin û vekirine.

Em niha ji çîrokê derbasbûna romanê lêkolîn dikin.

***Ab.:*** Serokê min, min axaftinek gohdar nekiribû. Ger wê roman bikeve rojeva me em dikarin li ser jihevdeketina civakî rawestin. Yanî bûyera ku em jê re dibêjin çîrok çawa gişt asta romanê? Kesayetek di nava kesayetên civakî de têkoşîn, çawa dikare rê ji çareserî û jihevdeketina civakî re veke? Mesele bi jinekê re têkoşîn çawa tevgera azadiya jinê diafirîne, astengiyên li pêşiya vê çine? Ez dibêjim pêşketinên pîştî sala 1987'an weke beşekê bigrin dest.

**---.:** Me ew pêvajo venekir?

***Ab.:*** Me gotibû astengî hene Serokê min. Lê min ev civîn neşopand. Wê demê çi bûye ez nizanim. Dahûrandina civakê, pêşketina tevgera azadiyê xwe dispêre çi û pêş dikeve? Bêtirî xwe dînamîkên wê yên pêşveçûnê çine? Beşa ku romanê eleqeder bike zêdetir ev dere. Yanî destnîşankirina astengiyan jî ji bo romanê têr nake.

**---.:** Astengiya çi?

***Ab.:*** Astengiyên li pêşiya tevgera azadiyê û çareseriya civakî. Mesele weke astengî; li ser nêzîkatiyên Şener hat sekinandin, dîsa li ser nêzîkatiyên F. pêşxistin hat sekinandin. Vana astengiyên li pêşiya pêşketina tevgerê ne. Lê dînamîkên pêşketina tevgerê weke dihat xwestin nehatin fêmkirin. Piştî encama di sala 1986'an de xwe gihandê û şûn de bi taybetî piştî 1987'an têkoşîna ku bi jinekê re hat meşandin di pêvajoyên paşê de rê li ber pêşketineke çawa vekirin? Ev bingehe. Lê pêşketin çawa derket holê jî dikare bê lêkolînkirin.

**---.:** Min dabû diyarkirin di pîlana takekesî de çareseriya girêka kor a di sala 1986'an de ji aliyê azadiya jinê ve gaveke mezin bû. Weke ku min xwe ji zincirên bi hezaran sale dest û lingê min girêdane rizgar kirî hêzek raber kir. Tê zanîn ku di civînên kongra duwemîn de entrîkatiya jinê a tê zanîn, helwestên heta qirka xwe di nava feodalî-arîstokrasiyê de fetisiye, dîsa mîrasxurî, feraseta mal-mulk a ku pêwendiya xwe bi azadiyê re nîne, hem jî bi durûtiya herî mezin, heta digihêje komployan li beramberî nêzîkatiyên bi vî rengî em rûbirû man û me ev jî vala derxist. Ger serketibana hem jî li ser navê "*hemdemiyê*" wê girekêke kor jî di nava PKK'ê de bihata avêtin. Ger wisa bûya ne bawerim di pêngavên me yên piştre de jî azadî pêk bihata.

Ger ne şaşbim, di axaftinên Adara 1987'an de li ser pirsgirêka jinê nirxandineke min heye. Yên ku ev pirtûk xwendiye hene?

***Ab.:*** Min xwend Serokê min.

**---.:** Min ev mijar di wir de vekirine ne wisa?

***Ab.:*** Me di rojnamê de weşandibû.

**---.:** Nexwe bandora wê dîtin ne zehmete. Piştî sala 1986'an em ji wê rewşa tengav rizgar bûn em ji vê pêvajoyê re dibêjin; " *meşa ber bi azadiyê ve."* Ji aliyê teorîk ve hinekî hatiye îfadekirin jî. Piştî wê jî lez dayîna xebatên jin hîn cudaye. Û ji ruhekî mirî, ji vê atmosfera fetsîner piştî ku me xwe rizgar kir pêşketin û vekirin jî dest bi pêşketinê kirin. Wê demê min xwe ji barekî giran rizgar kiriye, dibe di pîlana takekesî de weke pêwîst serfirazî qezenc kiriye yan jî weke destxistina azadiyê dinirxînim. Ez di vê baweriyê de me ku min ev rizgarî ji aliyê ruhî û manevî ve pêk aniye, piştre ji bo pêngavê jî hêza pêwîst jî dest dixim. Ji ber ku di ferqa wê de me ku deh sale di rewşa bi zincîran girêdayî de me. Zincîrên exlaqî û menewî, zincîrên siyasî û rêxistinî ji çar aliyan ve ez girêdabûm. Bêguman dihat wateya parçekirina, gelek pêwendiyên dewletê, pêwendiyên hezaran sal ên paşverûtiya civakî. Ev jî pir girînge. Di dîmen de bi kesekê parçe dikim. Lê di kesayetiya kesekê de pergala pergala feodal, pergala mêtinger, li ser ruh û exlaqê wê rûniştiye, li beramberî nûnertiya bi bandor ya awarte ya ji aliyê rêxistinî-siyasî û hemû astê de ji aliyê rûhî, hatta zexteke manewî jî hatiye avakirin. Ez wisa bi hemû aliyan ve wan parçe dikim ku, ev ji aliyê min ve ji ya ku min texmîn dikir zêdetir ji pêngavên azadiyê re rê vedike.

Ez wê demê hinekî bêhêz bûm û dahûrandin jî ewqas bi hêz nebûn. Dibe ku yekser bi wê ve girêdayî be. Derbaskirina wê li cihekî jî dibe derbaskirina dîroka koletiya hezaran sal.

***Ab.:*** Ji ber ku naveroka şoreşa azadiyê wê pêwendiyê derbas dike yan jî ji ber ku ew pêwendî ji vê naverokê re dikare li ber xwe bide parçe bû.

**---.:** Çawa?

***Ab.:***Naveroka wê pêwendiyê li gorî çawaniya şoreşa azadiyê ne guncaw bû yan jî ji ber ku ew tengav kir em dikarin bêjin parçe bû.

***---.:*** Bêguman. Li wir du nerînên cuda yên cîhanê, bi hevketina du hêz û ruhên bi hêzê mijara gotinê ye. Li gorî min roman dikare vê mijarê bigire dest. Ji xwe ber bi sala 1986'an cihê ku ez giştimê girînge. Mesele ez îro li ser mijara darêzê rawestiyam. Çima min di sala 1986'an de hêza bi wêrekî ser de çûnê raber kir? Hinek taybetmendiyên wê salê hene. Wisa tê dîtin ku wê qeyrana sala 1975'an bê derbaskirin. Derbaskirina vê qeyranê, girêdana wê bi van kesayetan hinekî tê fêmkirin. Ya din êdî giştiye xala "*ya bê derbaskirin, ya bê derbaskirin"* yanî êdî wekî din ber bi pêşve gavên rast avêtin, bê ku ev bê derbaskirin derfet nemane. Ev pir baş tê dîtin. Di hêza dijber de, di vê demê de heta ku ber bi komploya dawî ve biçe bê perwayî mijara gotinê ye. Vaye heta vêderê pêngava lîstokê ya dawî, pêşwaziya dawî. Pêngava her du nerînên cîhanî yên dawî. Ya ku tê jiyîn ji hemû aliyan ve li ser vî esasî ye.

Beguman hûn li vir dikarin bi asanî aliyê bi pîlan a îsyana min bibînin. Mînak ger li zemînê Tirkiyê bim, derbaskirina min a vê belayê ne gengaz bû. Lê çiya, teqez di binê venêrîna me de ye û ji bo min heta dawî nêvengeke azade. Bi giştî bê navber domdariya têkoşîna me, êdî di wê demê de hatibû fêmkirin. Çiqas dijwar derbas bibe jî em dikarin derbas bikin, ev hatiye îspatkirin. Vaye di vê çarçovedê gavek ber bi pêş ve tê avêtin. Û ev gava pêş ve heta dawî bi hêze, bi wate dagirtiye. Hûn dikarin li dahûrînên wê demê binêrin. Ger ne şaş bim pirtûka wê jî heye. Bi taybet pêşniyar dikim hûn bixwînin. Jixwe piştî ji vî benê paşverû rizgar bûm û şûn de, bê navber pêngav li ser pêngav, dahûrînên bi qasî aşûtê mezin, asta pêwendî û rêxistinê derket holê. Ji venêrînê rizgarbûna min, bi pêşketina pêngava 1987'an vekirî encamên xwe diyar kir. Bêguman pêwîst e ev bi encamên xwe ve were

dinrxandin. Girêdana wê ya yekser ango ne yekser bi dewletê re, em li girêdana wê ya civakî bifikirin, ya ku li vir tê dayîn ne şerê li beramberî kesekê ye, pêwendiyên li beramberî pêwendiyên Tirkan, pêwendiyên civaka paşverû yên ku xwe naxapîne, li gorî qûralên wê guncaw şer dide bi bandor û karîger hêmanên wê hesab kirin heye.

Ger bê dîqatkirin, di kesayetiyên Kurdan de di pêwendiyên taybet ên wisa de teqez netewî-civakî yan jî ti astekî xwe yê siyasî nîne. Şer ne kême, lê vana hemû takekesîne, malbatîne yan jî şerên di asta eşîretî de tên jiyankirinin. Em dev jê ber din rê li ber pêşketineke herî biçûk a civakî veke, heta pileya dawî tinekere. Ji aliyê dijmin ve heta dawî bi asanî dikare xwe li ser bidin jiyankirin, pê dilîze û nîtelîkekî hukmê xwe li ser didomînê ye. Wekî din jî tê zanîn, rêbazên wan bi heman şêwazê çorse û tinekere; dê lêdin, di rewşa hevberdaneke asayî de yan jî di rewşa nakokiya herî biçûk de, hema bi darbeyeke kêrê pêwendî tê bi dawîkirin. De ka lê binêre, di şêwazê min de ne şêwazê hevberdanê heye, ne jî bi kêrê êrîşek. Hîn balkêştir û ecêbtire. Mesele hevalê ku dixwest bixe nava komployê, tam jî di wê demê de digot: “*em bi çar hespan ve girêdin, bikin çar parçe”* li berambêrî rêbazê serdema navîn, rêbaza serdema navîn!

Feraseta ku li ser hemû hevalan serwere, hema di wê kêliyê de di derbarê îdamkirinê de bû. Lê di feraseta min de ev nîne. Tevî ku heta dawî niyaza min a islahkirinê hebû, direve jî bile bireve nêzîkatiyeke min a wisa mijara gotinê bû. Çima? Ev kîye, çima hatiya? Hema bikeve bin axê, dibe ku gelek mijar jî nehatana fêmkirin. Mînak me provkasyona sala 1988’an fêm nedikir. Dibe ku hemû provakasyonên piştre pêşketin jî me nekariya em derxînin holê. Em ji Avukat bigirin heta Şeneran, gelek provakasyonên wisa û serlêdanên linavbirinê me yê nekariya em derbixin holê. Di salên 1989-1990’î de jî gelek tîpên wisa derketin holê. Weke Cemalên Kor, Terzî Cemal’an. Vana hemû

hinekî bi vê ve girêdayî ne. Di bingehde ferasetên ku ji aliyê vê kesayetiyê vê tên rêxistinkirinin. Heta feraseta ku F. jî nekariyê xwe ji vê rizgar bike ye. Jixwe Şener domdarê vê yê çavsorî bû. Di hundir de bi vekirina Şener beşa herî balkêş a romanê dikare di wir de bê vekirin. Vaye hêza ji vê rizgarbûnê ku min ava kir û aliyê vê yê siyasî-rêxistinî, heta di asta leşkerî de encamên ku rê jê re vekir, bawerim hinekî tên fêmkirin.

Di sala 1988'an de bi nêzîkatiyeke dijber, pêwendiya Şener û S. Dikeve dewrê. Ya rast li gorî min girêdana wan pir şênbere. Li beramberî lîstoka ku em li hemberî KT'yê dilîzin, ew jî şer bi esas girtina rêbaza min, bi şêwazê çalakiya tolgirtinê dikevin êrîşê. Bi heman serdeçûna hestyarî ve, bi heman taybetmendiya jin-zilam û heman taktîkan dixim dewrê. Bi vî şêwazî di nava taktîkekî çors de ne. Kesayetiya Sa.. ya me, xala lewaz ya PKK'ê pêk tîne, aliyên wê yên lewaz rêxistin kirine, bi xwe ve girê dane. Ji wir ve dixwazin darbe li ser darbe li PKK'ê bidin. Mîna ku me li xala lewaz a KT'yê girt û lê da. Ew jî di nava hesabên girtina xala lewaz a PKK'ê û lêdanê de ne. Vaye çîrok ev e. Ev rewş bi rastî jî mujûlker bû. Di hemû salên 1988, 98, 90'î de em bi vana re mijûl bûn û heta niha jî em hewl didin pê re mijûl bibin. Çalakiya F. jî şêwazekî din ya vê rewşê ye. Jixwe bandorbûna F. pir şênbere. Pirsa; "*gelo ev hemû provakator ne mafdarin?"* dipirse. Dikeve nava fikarên; "*gelo ez pêwendî ava bikim dê çawa be, em ê nikaribin bi rêbaza siyasî çareser bikin?"* Ji gêrîla dûrbûn û ya herî girîng jî rewşa pêwendiyê jin ketiye navê hemanin.

Li vir arasteya bi pêwendiya jinê re eleqedare, li beramberî feraseta azadiyê ya ku me pêşxistiye pir muhafazakare û kevneparêze, yanî di feraseteke wisa de asê mayîne. Di hemûyan de jî feraseta evîn û hestên pergalê esas tê girtin. Em dikarin ji vê re bêjin hestyariya KT'yê yan jî "*evîna KT"* yê. Waneyên ku min ji ezmûnên berê girtine, şêwazê pêwendiya ku KT'yê ferz kiriye heta dawî weke ku min derbas kiriye, ez şêwaz û ferasetên

taybetmendiyên civaka paşverû-hov jî derbas dikim. Û vaye di van salan de, ev taybetmendî qije qij dişewitin, parçe parçe dibin. Ya rast wateya ku ji van salan re bê dayîn jî ev e.

Hewldana min a xwe ji benên girêdana jinê rizgarkirinê, ji ya tê payîn pir zêdetir rê li ber bandorekê vekiriye û bi awayekî xwezayî ev rewş, heta ku nehat fêmkirin jî di hundir de bû sedema bitbitan. Bi taybetî jî ji aliyê wan kesên ku me navê wan dan ve xeter hat dîtin. Yekî ji wan di girtigehê de hestyarî kûr kiriye û li ser hemû çêkera girtîgehê pêk aniye; yêkî jî li çiyê û piştî salên 1990'î li ser derdora xwe ferz kiriye û hewl didê bê aman vê pêk bîne. Balkêşe! Yanî pêşbirkeke mezin heye. Ew bi xwe dikarin pêwendiyeke ji min baştir jî pêş bixin û qaşo dikarin ji min baştir evîn û hestan pêş bixin, xwe wisa dibînin, texlîd dikin û dikevin nava hewayeke karîyerîst. Balkêşe û rewşeke heta dawî watedare. Rewşa ku li vir derdikeve holê mîna heweseke takekesî dîtin dê bibe destgirtineke pir teng, di rastî de ya mijara gotinê ye, li beramberî fikra azadiyê ya ku pêş dikeve, her ku diçe serî rakirina fikra kevneparêze ya ku pêş dikeve ye.

Di wateya civakî de piştî sala 1987'an li beramberî çalakiya azadiyê ya ku me bilind kir ya van tevgereke tepisandinê ya dijbere. Di asteke metirsîdar de ferdiyetê dijîn. Ez çiqas asta pêwendiyê di asta civakî de dijîm, civakî dikim û netewî dikim, vana jî ewqasî ji netewbûn, civakbûnê dûr dikin û ferdîkirineke metirsîdar li ser me ferz dikim. Mesele Sa. Teqez pêwîste, biaxive û divê ku vê "*evînê*" hinekî careke din bîne ziman. Du çavên wê du kanî, di rewşa ku heta hestiyên xwe pê ve girêdayî de bû; nikare bê îdîakirin ku ev ne bi vî rengî bû, min bi çavên xwe dît. Heta li beramberî hemû Partiyê dixwest wî biparêze. Pêwendiyeke taybet hema bêje, li beramberî hemû Partiyê ger pêwîst bike mirina xwe jî digirt berçav û di nava helwesteke parastinê de bû. Li vir cewhera civakî bi qasî ku tineye wate ji dest daye, jixwe bi pîvanên netewî, şer û Partiyê re girêdan

nemaye; ya din di asteke nehatiye dîtin de wê vê li nava Partiyê belav bike. Derfet bibîne, hema li ser esasê ferdiyetê dê xerizeyên xwe pêş xistibana. Niha ev şêwaz û encamên ku dê biafirîne, bi rastî jî ger serwer bibe, dê kes, Partiyê, şer ber bi kîderê ve bibe?

Vaye li wargeha me ev hat ferz kirin. Me darê zorê heval astengkirin da ku bi ser de neçin û ceza nedinê. Ez bidim diyarkirin ku pir çavsor bû. Heman feraset bi F. re jî, bi Sa.. re jî derketin. Tiştên ku di qampa Zelê de derketin vekirîne. Me konferansek pêk anî û li wir weke biryar xwestin ferz bikin. Jixwe di nirxandinan de heye. Asta pêwendiya ku F. ketiye navê diyare. Giştiye asta ku ji keçekêre bêje; "*em birevin.*" Êdî ev rastiyeke derketiye holê ye. Ewqas ji perpirsyariyên xwe yên netewî-civakî û şoreşgerî direve û dixwaze xwe ji nav derxe. Ji vê zêdetir xwe dayîna dest nabe.

Yê din jî wisa ne. Mînak pêwendiya Baran, fîgurên wisa di pileya duwem, sêyem de hene. Di vê navberê de gelek pêwendiyên du alî yên jin-zilam revên wisa hene. Bêguman ya me, li beramberî vana tevgereke azadiyê bi kûrahî digire deste. Ew çiqasî dibêjin girêdanê taybet, ferdiyet, ez jî ewqas dibêjim girêdana giştî, pêwendiyên giştî, yên ku li ser asta netewî teysîna xwe kirine, hezkirin û hestin. Li gorî min kesayetiya min di vir de gelek bi hêze. Di nava vê pêwendiyê de ez çiqas mezin bûme pêwîste hûn baş bibînin. Ez ji pîvanên netewî pir baş bi karîger dikim, azadiya civakî pir zêde pêş dixim. Dîqat bikin, di dîroka Kurdistanê û rastiya Rojhilata Navîn de cara yekem astek wisa tê avakirin û em nûnertiya wê dikin. Mînakeke din a vê nîne. Di van salan de û heta roja me jî bi şêwazekî pêşketiye kesayetiya min awarteye û jinê jî bi awayekî mezin radike ser piyan, hestan pêş dixe û civakê jî vediguherîne. Bi asta netewî re li hev dike. Mesele, hejmareke zêde keçên ciwan bi ruhekî netewî xwe avêtina agir û şewitandin, diyardeyên yekser bi vî ruhê ku bilind dibe ve girêdayîne. Hestên netewî yên ku bilind dibin, azadiya

kes di kesayetiya xwe de pêk tîne û netewbûna wê, yekser di azadiya jinê de xwe ber bi efsanebûnê ve dibe. Herweha çalakiya van keçan, piştî 1990'î pêş dikevin. Ev ne rewşeke rasthatiye. Çalakiyek bi vî rengî, di sala 1980'ê de nedihat hişê tu keçeke ciwan. Başe, di sala 1990'î de pêşketineke wisa çawa bilind dibe? Xaleke divê bê fêmkirin û bê ronî kirine. Ji ber ku di sala 1990'î de êdî agirê azadiyê her der dorpêç kiriye. Wateyeke xwe ya wisa, eşkereye ku di nava rastiya pêşketina xwe de hildigire. Dibe ku di demên pêş de ev rewş baştir bê fêmkirin. Min ev çawa ser xist? Ji çîrokê derbasî romanê bûyîn di van salan de çawa dikare bêkirin? Şayanî li ser rawestandinê ye.

Vaye nêzîkatiyeke din a afirîner ku bi min re jî, pêşxistina vê îsyanê ye. Bi qasî neyê aqlê ti zilamî me pêwendî berfireh kir. Em neketin nava du nêzîkatiyên xeter; ev di asta girîngiyeke jiyanî de ye. Ne ketim nav fetisandina pêwendiyeke taybet, ne jî derbaskirina asta jin yan jî di pêwendiyên jinê de sivikbûnê. Di gel vê de lêpirsînkirina rastiyê, lêkolînkirin, bangewazî, di mijara afirandina pêwendiya azad de min hewldaneke domdar îfade kir. Li şûna min kî ji we bûna, pêwendiya herî baş ku pêşxistiba, wê biba çarçoveya pêwendiyeke sînorên kenveşop derbas nekirî. Weke kes biçûk, mejî biçûk, milîtanê ku pêwendiya wî wisa biçûk bi vî rengî be, dê çalakiya wî jî biçûk be, şer û Partiyê mezin nebe. Lê di pirsgirêka jinê de xwe mezinkirina min, Partî û şer mezin kir, gel û netew mezin kir.

Min xwe xitimandiba, di vê mijarê de min xwe tahlîl nekiriba û gotibana; "*pêdiviya min heye*" min xwe avêtiba ser jinekê û pêwendiyekê, ber bi pêwendiyeke paşverû ketibama yan jî min gotiba; "*qet cidî nagirim, jin lanetkiriye, ne tişteke, encax wisa mirov dikare bigire bin serdestiya xwe*" teqez dê kesayetiya min jî bejnkurt bima. Yek ji wan dibe şêwazê axawarî, yê din jî pir zêde dibe şêwazê ferdî. Vaye neketina min a vê dubendiya xeter, ya rast xwedî wateyeke dîrokî ye. Min çima ev hilbijart? Ev bi

meş û ruhê min ê azadiyê ve girêdayî ye. Ez heta dawî xwe bi pîlan rêve dibim. Pêwîste her pêwendiyeke giştî bibe, teqez divê asta rêxistinî û civakî yê her pêwendiyekê hebe. Rêgeza ku ez şayanî xwe dibînim ev e û encamên wê jî di holê de ne.

Tu pêwendî nikare min ji asta rêxistin û çalakiyê dûr bixe. Ev pir girînge. Dîsa pêwîste bandora pêwendiyê, xwe bigihîne asta netewî û civakî. Ya ku vê pêk bîne pir nêzîkî min e, pir ji dile. Yên ku vê esas nagirin jî hema bêje divê bên tinekirin. Ruhê min nakişîne, ez ê jê tengezar bibim, hêrs bibim û bi vî rengî bavêjim. Bi rastî jî ev mijara ruhe, mijara dê ruhê azadiyê çi qebûl bike, çi qebûl neke ye. Ez vî ruhî li her derê hinekî jî bi bandor diteyîsînim, li jinê diteyîsînim û ev jî wan netewî dike, bi Partî dike, bilind dike. Yanî ji aliyê kes bi xwe ve azadî bi xwe re pêşxistin, teqez teysîna xwe li ser azadiya rêgez, azadiya civakî û asta netewî dike. Min ev pêk anî. Li beramberî vê, ya ku ji aliyê yên weke sitirî li pêşiya min hatine danîn jî tê ferzkirin şoreşeke dijbere. Ketina êrîşê ya jiyana muhafazakarî û kevneşop di kesateyên we de li dijberî me ye. Çi di çîrok yan jî do romanê de be, çîrokên balkêş jî hene. Di heman demê de rê li ber derketina holê ya wan jî vekir. Bi vî rengî derstgirtina min a jinê ji aliyê van ve rê li ber neyêniyan vekir. Weke ku me di mînaka pirtûka provakatorê dawî de jî dît, min xwest di derbarê nêzîkatiyeke çawa ji jinan re nûbûnêkê pêş bixim raber bikim.

Belê, ez ê bi jinê re pêşxistina jiyanake azad bifikirim, kûr bikim. Ger ez vê nekim ez gewjekim. Tabî ez ê pîvanên jinê pêş bixim. Ev peywira min a hunerî û şerogerî ye. Ger mîna gewcekî pêşnexim, ya şerm û diviya bû şerm bê dîtin dê ew bûna. Hestyariya ku ez ê li beramberî pêwendiyên jinê pêş bixim, afirîneriya awarte, encax dikare bi nêzîkatiya hunermendekî ve bê ravekirin. Di encam de, ger jinên hîn zêde azad derdikevin holê, dê rêzdariyeke mezin li beramberî vê hebe. Lê xwediyê vê nêzîkatiya klasîk yan jî yên ku di sînorê feraseta namûsa feodal a

pergalê de mane, asta xwe, mîna ku bê çapiya xwe biteyisînin bi şêwazê "*namûs ji dest diçe*" dikevin nava nêzîkatiyekê. Yan jî dibêjin civak serûbinê hev dibe, her tişt ji dest diçe. Ev vekiriye; min dest bi hilweşandina cîhana wan kir. Ger min hilneweşandiba ez ê nebûma şoreşger û tahlîlkarekî baş. Di van salan de gelek kesên xwestin vê ji rê derxin. Yên ku xwestin jina ku pêş dikeve bi ezezitiyê ve girêdin pir derketin. Di gel ku asteke fermandarî, Rêbertî-milîtaniyê pêş diket, ketibûnên yên dixwestin pêwendiyên azad bifetisînin yan jî yê ku li pêşiya dayîna axaftina ezeziyên xwe bû asteng ez bûm. Di asteke awarte de tevlîbûna keç û xortan encax wisa hatiye pêkanîn. Ez hêjî matmayî dimînim, tevî ku xwe negihandine asta azadiyê vana çawa dikarin bikevin nava êrîşeke takekesî? Ya rast dibe ku êrîşeke ferdî ya burjuvaziya biçûk bû.

Keç û xortên ciwan bê ku armancên civakî-netewî li ber çav bigirin, xwe davêjin nava me. Hema bêje refên me bi vana dagirtî ne. Divê ku em vê jî baş fêm bikin. Vana dibin helwestên burjuvaziya biçûk û dîsa yên ku ji aliyê kenveşopên civaka feodal ve teşe girtine û di nava pergalê de nikarin nefes bigirin, wisa dizanin ku bi xwe avêtêna nêvenga azadiyê ya PKK'ê wê bikaribin nefes bistînin. Bêguman ya vana bi awayekî objektîf xebatekî dijbere û di nava nêzîkatiyeke paşverû de ne. Di nêvenga Partiyê de bi van nêzîkatiyên xwe pir zêde mijûl kirin û gelekî jî bandor kirin. Hema bêje bi pêwendiyên li ser vê bingêhê hindik mabû Partiyê û şer ber bi fetisandinê ve bînin. Em bi vana re pir mijûl bûn; gelekî rê li ber texrîbatan vekirin, rev jî piranî li ser vî esasî çêbûn. Bêguman em li dijî nêzîkatî û xwe ferzkirinên van derketin, me li ber xwe da û qebûl nekir. Ji ber ku niyaza wan çi dibe bila bibe, PKK ne qadeke hestên erzan wisa xwe bikaribin tê de bidin jiyankirine. Asta PKK'ê ya hestyar, pêwendî û asta hezkirinê, pêwîste rast bê fêmkirin.

Di axaftinên Tîrmeha 1992'an de pir zelal hatiye destnîşankirin. Me ev pêşxist; me got: beriya girêdana ferdî çar

zewac, hûn ê çar girêdana biafirînin. Heta dawî welatparêzî, heta dawî azadî, heta dawî partîgerî, heta dawî şerkerî. Bêguman îfadeya vana ya herî jor di kesayetiya Rêbertiya Partiyê de digihêjin hev. Li ser vî esasî hem ji nirxan re teorîk, hem jî yên ku di jiyana şênber de hatiye îspatkirin, ya ku li ser dilê we serwere, li ser mêjiyê we serwere hûn ê tevlîbûneke wisa pêk bînin. Ger na zewacên we yên ferdî, pêwendiyên we yên taybet pêş filisa nake. Rastî jî ji hemû aliyan ve ev e. Ev hikum, di vê salê de, sedema ewqas dijwar diyarkirina me, di xala ku em giştinê de ji ber ku em bi xeteriyeke cidî re rûbirû ne. Dixwazin pêşketina pêwendiya dîrokî rawestînin. Nemaze ger ez jî berpirsyarim, tabî ez ê serde biçim. Herweha encamên wê jî balkêş bûn. Jina ku hîn zêde ber bi azadiyê ve dibeze, milîtaniya jinê ya ku hîn zêde xwe feda dike derket holê. Jixwe di van salan de di nava şoreşê de şoreş hat jiyîn.

Encam; ya ku bala hemû derdoran dikişîne, bala pergalê jî dikişîne di azadiya jinê de teqînek û vekirina qonaxeke dîrokî ye. Ev pir vekiriye. Niha di tevlîbûna jinê de di qada navnetewî de bi qasî ku bal bikişîne em tevgera herî li pêşin. Bi nasîna derfetê ji pêwendiya azad re min jiyan gihand vê astê. Ev, dibe îfadeyeke rasteqîn a qonaxeke dîrokî û asta netewî. Kesayetiyeke wisa tê afirandin ku, ger pêve girêdayî bê mayîn dê hêza hemû neyêniyên hezaran sal bi erdê re bike yek bi xwe re şênber bike. Ger bi vî hêzî bê jiyankirin, dê jiyan pir cuda biherike. Hest û pêwendî pir cuda bibin. Hem wekhevî, hem azadî gelekî pêş dikevin, hezkirin gelekî cuda pêş dikeve. Van rewşên lanetkirî ku divê mirov jê şerm bike tên derbaskirin. Kesayet bi şêwazekî awarte hêz didin hev. Dê ev bê serxistin. Jixwe em jî ji bo wê hewl didin. Em vê jî hem di asta dahûrandin, hem jî di teysîna rêxistinê de, bîzat ji qadro re diteyisînin û dikin malê Partiyê û gel. Wayeta pêwendiyan wisa ye. Li ser vê bingehê hûn dikarin zêdetir xwe li

ber çav derbas bikin. Nemaze hûn dikarin naverokekî rast bidin jiyana xwe û wate bidinê. Hinekî hat ronîkirin.

***Ab.:*** Ev, xala ku min jî daye diyarkirine Serokê min.

***---.:*** Wekî din em çi vekin, Me, tu keçeka bi meraqe?

***Me.:*** Serokê min, ya rast xaleke min fêm nekiriye heye. Dibe aliyekî di romanê de kêm bimîne ye. Di romanê de em dikarin asta cînseltî vekin. Bi rastî jî ez hewl didim hezkirina civakî, evîna civakî, pêwendiyên civakî fêm bikim. Lê dema ku qala azadiya azandkirina civakê hat kirin dê asta cînseltî çawa be? Min ev weke tê xwestin fêm nekir.

***---.:*** Hûn dixwazin bal bikişînin ser xalek din a girîng. Ronîkirin hem pêwîste û hem jî dê sûda xwe hebe. Yek ji mijarên ku herî zêde ez jî li ser lêhûrbûn dikime. Ez qala cînseltî ango jiyana cînseltî dikim. Wateya ku ez ji nêzîkatiya cînseltiyê re didim, gelekî balkêşe û hewl didim hîn jî pêş bixim. Analîzên Freûd di vê mijarê de hene; tên zanîn, Freûd kesê ku rêbaza pîskanalîzê pêş xistiye, Şêwazê ku ez pêş dixim ên ku dişibînin Freûd jî hene. Nizanim min Freûd nexwendiye. Lê di nêzîkatiyên min de aliyê polîtîk heta dawî diyare. Cînseltî jî di nav de helwest û taybetmendiyên mirov ên ajoyî ku çavkaniya xwe ji vê digire, bi min re xwedî wateyeke polîtîkin. Bi min re ajoke xwezayî yan jî hest bi tena serê xwe girtina dest wêdetir, girêdana wê bi polîtîkayê re bi girîngî dixwazim ava bikim. Nêzîkatiya min ji mijarê re, wisa girêdaneke xwe ya pir zêde heye. Ya din jî li ser diyardeya cînseltiyê em hewl didin teysîna li ser civakê fêm bikin. Ji ber ku ev jî teqez hem di avakirina kesayet de û hem jî di helwestên ku di vê qadê de tên raberkirin de risteke arasteker heye. Û li gorî min, bi taybetî jî di rastiya me de diyardeya cînseltî, ji ya tê payîn zêdetir qada ku herî zêde zexta civakî tê de tê jiyankirine. Heta qadek wisa ye, dibe ku kes bi qasî nikaribin bikevin ferqê di bin serweriya serdestî, koletî û cînseltiyê de dijîn. Teqez zilam jî, jin jî li beramberî jiyanê û dijmin darbeyên ku

dixwe yan jî wan teysînê ku ji wir digire di vê qadê de bi awayê herî kirêt, koleker û şêwazê tinekirinê de dixwaze temam bike. Dibe rewşeke ku heta dawî neçartiya dahûrandinê ferz dike.

Min hewl da ku feraseta li ser min serwere hinekî bidim. Min teqez feraseteke zayendgeriya ku dike meta di rastiya xwe de mahkum kiriye. Vaye meseleya kerxaneya Amedê, vaye zewaca ku me pêşxistiye û wateya cînseltiya ku tê de ye. Çûm gel yekê, bi şêwazekî nehatiye dîtin min xwe bi qerîsînekê, bi fetisîna ruh re xwe rûbirû dît. Gelo ez di wê de li têrkirina ajoyan bigeriyam ma dê çibiba? Îhtîmaleke mezin ez dê bibama kesayetiyeke bê reng, ango rengê xwe ne diyar. Yanî cînseltiya jinê weke metayekî karanîn bi asanî pêşwazîkirin û di bin navê vaye ev "*pêdiviye"*de min xwe, weke yên din gelek burjuvaziyên biçûk yan jî weke kesayatiyên din ên civakê dikin kiriba, dîsa weke axayên feodal weke şêwazê jiyanê dîtiba, beriya hemû tiştî rêza min a xwe ji xwe re wê ji dest min biça, bê şerm û ez ê weke wanê din bibûma. Nemaze, ev beşa çîrokê lî gorî min gelek watedare; dê li wir neyê jiyankirin, wateya cînseltiyeke wisa dê xeter bihatiye zanîn. Em bêjin pêwendiyeke taybet, em ji vê re jî bêjin mala taybet, aliyekî din ê lêgerînê pêk tîne û min ev jî ji we re vegot. Qaşo pêwendiyeke azad bû, heta sosyalîst bû. Lê werin bibînin ku, di navê de pevçûneke netewî, civakî û çînî heta ya şexsî mijara gotinê ye. Di vê mijarê de ya min jî, aliyê din jî lewazî û aliyên xwe yên bi hêz hene. Ya herî girîng jî li gorî min, niyazên min ên baş çi dibe bila bibe, rewşa bi rêxistinbûna aliyê din heye; ji aliyê siyasî û civakî ve rêxistinkiriye, ji hemû alî ve rêxistinkiriye. Û cînseltiyê jî ji hemû aliyan ve li ser vê bingehê digire dest. Yanî cînseltî, tam jî di vê xalê de ji bo derkeve ser, xwe serwer bike amûra herî bingehîne. Divê ku ji vê rêgezê tawîz neyê dayîn. Dema ku cînseltî tê karanîn, ji aliyê siyasî û rêxistinî ve teqez çiqas serwere vê li ber çav digire. Ez dikarim vê hîn jî gelemperî bikim.

Ez nêrîna xwe vekirî dibêjim. Tabî min ev hemû dîtin, hinekî ferq kir. Bêguman ev jî bi xwe re pêwendiyên civakî pêş dixe. Min ev bûyer deh salan tevî mirina xwe jiyan nekiriba, min nedikarî civak jî wisa bi kûrahî dahûranda. Hûn jî hîn nû nû cesaret qezenc dikin, hûn nû cesaret dikin ku van peyvan vekin. Jixwe vekiriye, ger em çareser nekin şoreş jî pêk nayê û azadî jî pêş nakeve. Ev çiye, dê çawa teşe bigire û çawa pêk bê, diyare û tê zanîn. Bifikirin pêwendiyeke rojekê jî jê re nayê tehamulkirine û li gorî kevneşopan yan di darbeyeke kêrê, yan jî divê bi hevberdanê bi encam bibe. Ya min di vê xalê de jî meraq û lêgerîna min a watedayînê heye. Dê emcam çawa bibe? Ya din jî pêwendiyên rêxistînî yên tên zanîn, pêwendiyên siyasî û yên dewletê heta dawî hestyar tevgerînê pêwîst dikim. Îdîaya aliya dijber ev e: "*ev zilam kurdekî klasîke, gundiyeke, teqez wê di pirsgirêka cînseltiyê de serê xwe biteqîne, yan jî dê şer bike, yan jî wê bi tevgerîneke bir berevajî lê de, berde, dîn bibe yan jî har bibe*" encama ku çav li rê ye ev e. De îca girêdanên hestyarî jî bi ast bibin, divê ku har bibe. Jixwe ji bo ku har bike jî heta dawî hewl dide.

Ya rast pêwîste ev bi vegotineke rast a romanê bê ravekirin. Wisa rûbirûbûnên hev yên balkêş hebûn. Rûyekî tirş, weke ku cemed girtibe û bêrêz. Yanî gotineke, " *tu bi xêr hatiye, çawa ye*" jî nîne, em hevalekî xwe yê herî hêja şehîd bidin jî, ji bo bîranîna wî deqeyek rêzgirtin jî nîne. Wê grûbeke hevrêyan were, rêzgirtineke ji rêzê jî ji wan re nîne. Dema ku tu di odê de tenê dimîne weke ku ketina nava helwestên mîna sitiriya di laşê te re diçe têr nake, asteke hîn pêşketî ya hakaretan dibe û tevî vana hemûyan jî tê sekna xwe xira neke û neteqe û ne derize. De îca mijara serdestiya zilam jî bibe mijara gotinê, di civakê de tê gelek azad bibe.

Texmîn dikim di vir de di nava pêwendiyê de bûyîna wê em ji kesayetiyeke sîxur bigirin, lîstokên siyasî û asta dek û dolaban de

serdertî û divê mirov feraseta serdestiyê jî deyne holê. Ya din dibe ku tolgirtina jineke kesayetiya ketî, taybetmendiya civaka feodal-arîstokrat yan jî ev dijbertiya malbata noker û ji ketîbûna wê jî mijara gotinê be. Dibe ku ew kesayetek tolgirtinê be jî. Îhtîmaleke mezin jî wisa bû. Ji ber ku Kurdistan ji destê wan diçû, civak ji destê wan derdikeve û ez jî berpirsyarê yekem a vê pêşketina mezinin. Bawerim cînsetliya xwe weke amûrekî tolgirtinê bikaranîna wê hebû. Wateya van jî bi berfirehî dikare bê vekirin. Ya girîng encamên ku min ji vir derxistine û di mijara cînseltiyê de rast destgirtina min a polîtîkayê ye. Li gorî min pêwîste cînseltî wisa neyê karanîn, lê hemû civak têkilî durûtiyê, metabûnê bûye. Niha di hemû astan de tevlîbûna du kesên azad divê ku hem azad be, hem di hest û hem jî di hizir de pir alî hêzker be. Lê dema ku mirov li pêwendiyên niha dinêre, mirov hema dikare bibînê bê ka çiqas fetsînerin. Dema ku bi gelemperî mirov bigire dest, ji hemû aliyan ve di civakê de fetisîneriya zilam mijara gotinê ye. Zilam ji bo serdestiyê vê pêwendiyê bikar tîne. Xwe tatmînkirina zilam li cihekî kesayetiya ku di civakê de li binî ketiye tepsîna wê, hekaret lê hatiye kirin, di binê serdestiya cendirmeyan, polîs welhasil ya dewletê de pelçiqiye ev kesayet li beramberî jinê dibêje, "*ez zilam im*" tê wateya bi taybet di cînseltiyê de lêgerîna serweriyê. Ez ji wisa nêzîkbûna zilam bê gumanim.

Dikare bê gotin ku zilam, hemû ketîbûna xwe, xistina xwe, pelçiqandina xwe ji vê hêza xwe ya li ser jinê digire. Hewl dide bi wê telafî bike. Qurnaztiya jinê jî di vir de çiye? Ya rast ew jî pir ecêbe, ev nêzîkatiya zilam ferq kiriye bendewariya zilam çiye pir baş zane. Dibe ku piraniya xwe li xwe mikur nayên, lê rastiya we wisa ye. "*em ê cînseltiya xwe çawa bazar bikin*" ajoya bi qurnazî bi jinê re jî pêş dikeve hinekî wisa derdikeve holê. Di her jina ku zewicî ye de taybetmendiyeke bê çavdêrîkirine ev. Ya ku tu jê re dibêje cînseltî û "*namûs*" ji zilamekî re wisa pêşkeşkirin, heta

dawiya temenê xwe pêve girêdan û bê ku aliyê xwe yê estetîk hebe, nebûna hêza jiyaneke din, bê ku tu bêjî tevlîbûn ji jiyaneke din re liberamberî hev dibe, "*min namûsa xwe da, êdî dê çil salî min hilgire*" wisa nêzîk dibe. Li gorî min divê ku evder di romanê de bi girîngî bê destgirtin. Ji ber ku di rastiyê de ya ku divê di pêwendiyeke azad de hebe, tevlîbûna zayendî yan jî parvekirina zayendî pir xwezayî detsgirtin û ji aliyê aliyan ve teqez xwe jî weke amûrekî serdestiyê li beramberî hev yan jî amûrekî kirînê bikaranînê dûr bisekinin. Bê ku "*karanîn*" hebe pêwîste bikarin bi hev re bijîn. Li gorî min a rast ev e. Ji xwe di klanên Efrîqa yên başketî de, di civakên seretayî de ev pêwendî wisa despê kirine. Hesabên wisa mezin li ser nînin. Lê dema ku em tên rastiyên me yên civakî, di pêwendiyan de hesabên awarte hene. Zilam, hemû xilasbûna xwe li ser jinê diteyîsîne. Jin jî hemû belengaziya xwe bikaranîna cînsetliya xwe dixwaze derbas bike. Vaye ez ji vê re dibêjim ketina mezin a malbata Kurd, ketîbûneke mezin a astê, ketîbûna mezin, fetisîna mezin û girêka kor.

Zewac girêdaneke.

Tam jî bi şêwazê girêka kor girêdan. Bi hemû civakê re. Bêguman çawa teşegirtina vê di nava dîrokê de, bi tayebetî bi mercên siyasî, civakî û aborî ve girêdayî divê ku bên destgirtin. Ne bi jinê, ne jî bi zilam re nikare bê gotin ku cînseltî ji ber xwe ve teşe girtiye. Teqez girêdana xwe bi civakbûn û siyasîbûnê re heye, bi pergala mêtinger ya niha heyî re jî girêdana xwe heye.

Malbata Kurd, pêwendiyên jinê, heta tahlîlkirina pêwendiyên evînê û hestan, berî hertiştî xwe gihandina bingehê vê yê civakî pêwîst dike. Nêzîkatiyeke pirsgirêkê di nava asta girêdanên civakê de nagire dest, weke ku dê ne zanistî be, ji ti cîhî re vekirin û çareserî anîna wê jî ne mijara gotinê ye. Xala ku divê herî zêde nivîskar pê re mijûl bibin, heta civaknas, derûnas, wêjevan pê re mijûl bibin yek ji pirsgirêka sereke jî ev e, tevî vê jî tu kes pêdiviya li ser rawestînê jî nabîne. Ji ber ku hêza wan nîne.

Zilamê herî ji xwe razî û jinê jî ez nas dikim û dibînim, ti hêza wan nîne. Ez niha zilamê ku wisa bikaribe cînseltiyê di nava rastiya û zanistiya xwe de binirxîne nabînim. Di nava me de jî nîne, hûn nafikirin. Fikrandina wê em li vir bihêlin, beşeke mezin a milîtanên me ya parvekirinê bi feraseta namûsa feodal digirin dest, yan jî derfet bibînin dê hevdû bidin revandin. Xelete. Li gorî min ne nêzîkatiyeke wisa çavsorî dest girtin raste, ne rev, ne jî înkar. Jixwe şerê herî girîng ku ez niha didim jî yek ji wan ev e. Çima ev cînseltî weke asteke guneh tê fikirandin, çima bi awayekî riswa dixwazin kar bînin, çima nagihêje şêwazekî rast?

Dema ku dibêjim cînseltî eşkereye ku ji aliyê din razber nakim. Girêdana wê bi rêxistinê, şer, netewbûnê re pir vekirî û zelal datînim holê. Bi taybet pêwendiya wê bi siyasetê re min ji bingeh ve diyar kir. Lê înkarkirina cînseltiyê jî ne gengaze. Înkarkirina wê, înkarkirina faktorekî xwezayî ya jiyanê ye ku, encax ev jî bi feraseta mezhebgeriyeke muhafazakar re hev bigire. Yan jî berevajî, bi qûral nenasiyan, polîtîkayê, nêzîkatiyên pêwendiya xwe bi civakbûnê re nîne, vaye nêzîkatiya fahîşe, vaye nêzîkatiya kerxanê, vaye hejarî, bi nêzîkatiyên jin-zilamên ketî dikare hev bigire. Yên ku ji postê xwe derketine re fahîşe tê gotin. Divê ku wisa bê destgirtin. Bifikirin, ew jî berevajî tê dîtin, lê herî kêm bi qasî ya din xetere. Di nava pêwendiya ku jê re tê gotin ferdî, taybet jî heman tişt veşartiye. Hem kerxane, hem jî fahîşetî, hem jî rahîbetî tê de veşartiye. Divê ku pêwendiya di navbera fahîşetî û rahîbetiyê de baş bê fêmkirin. Bi zilam re jî ev heye. Yanî zilamê fahîşe û yê rahîbe jî heye. Di vê wateyê de ezezî, li ser heman rastiyê ne. Di mercên civakî yên heyî de heta ku vekirina azadiyê nebe, di pêwendiya jin-zilamê ku herî zêde xwe xwedî namûs dibînin de ez, hem rahîbtî-rahîbetiyê, hem jî fahîşetî û rêşaşiyê dibînim. Tesbîtkirina vê ne zehmete. Wanê ku herî zêde dibêjin; “*em bi namûsin, em wisa evîndarê hevin”* jî -dibe ku gelek xwediyên pêwendiyê xemgîn jî bibin- dibe ku bifikirin û

bêjin: “*ev dixwaze çi bike?”* Vaye weke van provakatoran, lê ew jî li gorî min, hinekî fahîşe, hinekî nêremok, yanî rêşaşin. Ez vekirî dikarim biparêzim û îspat jî bikim. Weke ku min got, camêr di nava du pêwendiya de jinê bi şêwazekî cuda pêşkêş dike. Ferq nake, lê bi heman hişmendiyê pazarkirine, zilam jî li kolanê jî dehan kes re pêzewengiyê dike, lê li wir jî ji kesekî re heman tiştî dike. Ferq ne di çawaniyê de ye jî, di hejmar de ye. Kengî dikare rewa bibe, pêwendiya rewa çiye?

Pêwendiya rewa -ez xwe dispêrim ezmûnên xwe û dibêjim- vaye weke ku min got, asta wê ya netewî, pêwendiya wê bi welatparêzî, azadî û şer re, dîsa pêwendiya wê bi rêxistinê re girtiye derdikeve holê. Ger em hîn jî kûr bikin, kesayetiyên ku xwe gihandine vê çarçovê, bi rastî jî ger vekirineke şoreşgerî ya wisa pêk anîne, hewce nake ku ji pêwendiya xwe bitirsin û dikarin bûyera cînseltiyê jî rast bigirin dest. Dikarin hemû aliyên pêwendiya jin-zilam bi guftûgoyeke baş, nîqaşê bixin rojevê. Dikarin pêwendiyên hezkirin û hestan vekin û nîqaş bikin. Li vir ya girîng nebûna zextê ye. Ne ji aliyê zilam ve nûnertiya zextê kirin, ne jî rewşa xwe pêşkêşkirina jinê nebûn û pêwîstiya derbaskirina mercên ji vê re tê xwestine. Divê ku em van her du şêwazan jî rakin. Jixwe yek ji aliyên herî girîng a şerê ku ez dixwazim pêş bixim jî ev e. Zilam ji hêzeke zextê derxistin, jin jî ji kesayetiya ku xwe difroşe, bi taybetî jî ya ku dixwaze xwe di cîhana li ser cînseltiyê ava bûye derxistin, hedefa me ya sereke ye. Ev ê çawa bibe? Jixwe şev û roj em bi vê re mijûl dibin û baldar bin, ya ku roj bi roj dixwazim li ser we hemûyan jî biteyisînim ev e. Ez dibêjim hertim nêzîkatiyên zilam ên ku bên wateya tangavkirina herî biçûk jî divê neyên qebûlkirin. Dîsa min got ji jina ku dixwaze cînseltiya xwe weke metayekî bikar bîne milîtan dernakeve. Ez hinekî we li ser vî esasî tengav dikim. Hem di nava Partiyê de, hem li derve, rexneyên ku di derbarê min de tên pêşxistin, heta erîş jî ji ber vê tengaviyê ne. Tabî ez ê tengav

bikim. Zilam ji her alî ve ji gihandina asta ji pêwendiyekê re vekirî hiştinê, jin jî gihanda asta pêşketineke cînseltiya xwe xirab bikarneanînê, ji bo min pir girînge.

Dê nêzîkatiyeke çawa ji vê astê re bêkirin, ev astê çawa bê dîtin? Eşkereye ku wê hinekî bi şer bibe. Di fêmkirina di şer de ye, ruh de ye, di hêza rêxistinkirinê de ye. Tê hinekî welatparêziyê bi dilê xwe bide xwarin, wê ji kûrahî ve bi gel ve girêdana te bibe mijara gotinê, tê civakî bibe. Yanî dema ku tê gotin pêwendî, tê bi çavsorî li hev negerî. Binêrin, kesî ku bi qasî min hestyar nîne, ya rast gelekî ji bi azwerî me. Lê dîqat bikin, ez sînorên vê wisa eyar dikim ku, bê hebûna asta netewî, ez şer pêşnexim rêxistin jî nabe. Kem-zêde heta ku min asta civakî bi tevger nekir axaftina min bi jinêkê re jî ne gengaz bû. Lê bi qasî ku min ev ast pêşxist, binêrin ez we keçan jî bi şêwazekî awarte dikarim bikişînim. Hûn tên kişandin. Êdî ev bi hêza min a şer ve girêdayî ye. Ez ê nebêjim hemû jin ê min in, lê ji aliyekê ve jî hemû jin hevrêyên Rêbertî ne.

Niha di vê xalê de ez hema vê bidim diyarkirin; ger hûn dîroka dewletan lêkolîn bikin, mesele sulala Osmaniyan, mesele ya Emewiyan hûn lêkolîn bikin, karê yekem kirine, dema ku bûne îktîdar karê wan ê yekem damezrandina hareme. Osmaniyan bi şêwazekî awarte harem pêş xistine. Di serdestiya Tirkan de ev weke "*hunerekî"* mezin lêkirine. Ji bo cariyetiyê ( di dîrokê de sektora vê heye) bi hezaran keçên ciwan ji vir, ji wir digirin ber bi qesrê ve vediguhezin, ber bi qesir û qonaxên paşa û ferdan ve vediguhezin. Bûyîna îktîdara siyasî, dewlet yeksane, di pergala feodal de, hema li dijberî jin afirandina rewşekê ye. Ger bê dîqatkirin pêşketina min di vê mijarê de pir cuda ye. Ez jî hêz qezenc dikim, hem jî di asteke awarte de. Her yekî hêz qezenc dike, ya rast dema ku dixwaze vê li ser jinê biteyisîne, hewl dide serdestiyê ava bike, pir hevjînî, pir cariyetî, helwestê pêşxistina haremeke pir fireh nîşan didin. Ev jî weke serdestî û nîşaneya

otoriteyê tê nirxandin. Ev xeterî ne ku ez jî nedîtim yan jî ne ku ez neketim ferqa wê. Tenê ne ji bo xwe, ji bo hemû Partiyê jî, hema bêje hemû fermandar ger derfet bibînin ew ê bi xwe jî meyleke wisa pêş bixin.

Herweha nikare bê gotin ku hinek nîşaneyên vê nehatin dîtin. Tabî li beramberî vê jî nêzîkatiya jinê di çarçoveya ku min da diyarkirin de bû. Ew jî, bi bandora hêza ajo û kevneşop, teşegirtina jinê li beramberî hêz bi cînseltiya xwe kirina keresteyekî baş hewl dide derketinê bike. Ji ya tê payîn zêdetir hinekî tevlîbûna xwe di berçav re derbas bikin, hûn çiqas wisa ne ango ne wisa ne şayanî lêpirsînê ye. Hûn çiqasî li gorî çanda heram-selamiyê nêzîk dibin? Hûn çiqasî cînseltiya xwe, weke cînseltî di xwe pêşkêşkirinê de di nava nêzîkatiyeke vê esas digirin de ne? Bi rastî jî hûn çiqasî wekhevî û azadiyê dixwazin? De îca, feraseta we ya azadî û wekheviyê çiye? Teqez pêwîst hûn vana hemûyan lêpirsîn bikin. Û bifikirin, li vir berxwedana min tê çi watê? Hem jî li beramberî xwe li ber xwe didim. Niha zilamekî giştiye vî temenî û qezenc kiriye çima li ber xwe bide? Vaye hûn neçarin bi awayekî cidî li ser vê rawestin û bersiva vê derxin zanînê. Ji ber ku mezinbûn tam jî di vir de ye.

Li dîrokê binêrin, çîroka wê pir balkêşe. Yê ku hukumdariya dewleta Merwanî dike Nasrûddewle Ebû Nasir heye. Balkêşe! Tam 360 cariyeyên vî hukumdarî hebûne û di her şeveke salê bi yekê re bûye û dora wê cariyê encax saleke din heman rojê hatiye. Tabî bê hejmar zarokên wî jî hebûne. Ez bawerim dîsa 99 hevjinên Bedirxan beg hene, ewqas jî zarokên wî hene. Mînakên vê pirin. Gelek begên Kurdan, axayên wê dema ku hêz dest dixin karê yekem dikin berê xwe dana bûyîna xwedî haremeke wisa ye. Vaye Merwanî cara yekem ber bi dewletbûnê ve diçin û hukumdar hema ji bo her şeveke salê jinêkê di qesra xwe de digire. Dîsa Bedirxan Beg jî wisa ye. Bi qasî ku navê wan neyê bîra wî bi jinan re dizewice. Dîsa bi qasî ku navê wan neyê bîra wî dibe xwedî zarok. Sulala Bedirxan beg niha jî gelek berfirehe û neviyên wî yên ku li sê parzemînan belavbûne hene. Niha ev

diyardeyeke divê ji aliyê civaknasî û derûnî ve bê vekirine. Di axatiya Kurdan de, begîtiya Kurdan de dema bi hêzbûneke wisa çêbû, hema berê xwe didin di mijara jin de vê wisa biteyisînin. De îca em tenê vê weke saziyeke taybet bi Kurdan negirin dest.

Hz. Mûhamed bi xwe jî beriya ku hêz qezenc bike bi Hatîce re zewiciye. Lê bi qasî ku bi hêz dibe 13 hevjîna ji xwe re digire, bi qasî wê jî cariye û hemû jî di asta siyasî de ne. Ji her eşîret, kabîlê, heta ji her diyarî yekê tîne. Li gorî serdemê nêzîkatiyeke gelek watedare; hêjayî li ser rawestînê ye. Piraniya, dahûrînên Îslamê li ser vî bingehî pêş dikevin. Piştre ev rewş, di dema sulaleya Emewiyan de zêdetir pêş ket. Ji Ebbasiyan Osmaniyan dewr girt. Piştî Osmaniyan em li M. Kemal dinêrin; li gorî min M. Kemal tîpekî bê çareseriye. Ji kevneşopa qesrên Osmaniyan pir bandor bûye. Mîna Enwer paşa, ew jî despêkê çav berdide zavatiya qesrê, lê sernakeve. Berteka wî hinekî jî ji ber vê sedemê ye, bi komplekse. Li pêşberî xwe ya ku ji hemû aliyan ve keça burjuvaye Latîfe dibîne. Lê kîja pîvanên burjuva, kîja pîvanên demokratîk? M. Kemal dîktatoreke, pîvanên demokratîk yên burjuvaziya biçûk jî pê re nîne. Di nezera wî de Latîfe mîna paçekî bê karanîn û divê ku di goşeyekê de bê sekinandine. Latîfe jî, çanda Fransa girtiye, teqez wê di pêwendiya xwe de hinekî di wateya burjuvazî de li wekhevî û azadiyê bigere. Di M. Kemal de dîtina vê ne gengaze. Di encam de ew xetimîna metirsîdar derdikeve holê. Piştî wê teqîna M. Kemal heye.

Pir balkêşe, ez bûyera M. Kemal û Latîfe hinekî jî bi ya xwe re qeyas dikim. Ji ber ku mijara xwe ya zewacê çareser nake, ew jî keçên ciwan dibîne. Heta bi rêya hinek kesên ku nas dike, ji Macarîstanê, Îtalya yê jina dide anîn. Îhtîmaleke mezin di bin navê hevjîniyê de hevbeş parve dikin. Bê lêkolînkirin di vê mijarê de wê gelek destkeft derkevin holê. Ya rast mecbûriyeta xwe gihandina haremeke durû dibîne. Şêwaza Osmanî nikare bike, ji ber ku berteka wî heye. Bi Latîfe re zewaceke şêwazê burjuvaziya biçûk najî, ji ber ku dîktatore; wê demê ya ku li şûn ve dimîne çiye? Vaye ya ku heta niha jî civaka Tirkan bandor dike li beramberî jinê, vaye feraseta ku êdî wê li ser masê weke mezeyekî dinirxîne, mîna goştê raqiya xwe dibîne wisa pêş dikeve. Ji vê zêdetir wateyeke din a jinê nîne. Jixwe kesayeta

jinên ku li derdora wî ne jî zêde ne pêşketiye. Di dîmen de sûbaytî, pîlotiyê û hwd dikin, lê yên ku wisa li wan tên kirin jî ya rast ji jinbûnê zêdetir mîna zilaman li wan kirine. Kesayetiyeke jin a bi wate nehatiye pêşxistin û heta niha jî bi awayekî texlîtkîrî sûbayên Tirkan pêk tînin.

Li hevjînên sûbayên Tirkan binêrin, gelekî kolene. Dîsa sûbayên Tirkan pir feodalin. Di mijara jinê de dîktatorin, jin nikarin nefesê jî bigirin. Wisa tam mîna pêlîstokêne, mîna pûta li pêşberî te radiwestin. Ev pir girînge û li gorî min ger dê romaneke rast bê pêşxistin, hevjînên sûbayan dikare baş bên lêkolînkirin. Ger vana hemû bi rewşa min re bên berawirdkirin, dê gelek taybetmendiyên ecêb û encam derkevin holê. Ez jî bi saziyeke zewacê re rûbirû mam. Li pêşberî min jî jineke pîvanên burjuvaziya biçûk girtibûn hebû. Lê gelek balkêşe ku M. Kemal bi Latîfe re dikeve nava pevçûnekê, gelek bê wateye û her ku diçe dikeve nava pevçûneke aqlê xwe ji dest bide. Latîfe bi lingê xwe her tiştî, her derê pihêna davêje. Çankaya serûbinêhev dike. M. Kemalê diteqe. Bi darê zorê Latîfe digirin û dibin cîhekî, heta dimire jî Latîfe wisa dihêlin. Min jî dikarî vê xeteriyê bijîm, lê min xeterî bi behremendiyeke mezin derbas kir. Min berê xwe da azadiyê, şerê azadiyê kûr kir û di vê mijarê de heta dawî min girîngî da rêzdarî û bi rêgezbûnê.

Encam; mezin rizgarbûna min ji bêçaremayînê ye. Jinên li derdorê ne ku yên kêrnehatî ne, hemû heta pileya dawî milîtanin, keç û jinên fedayî ne. Li pîvanên PKK'ê binêrin, ji hemû aliyan ve teysîna min e û wekî din jî ne gengaze. Tenê keçeke ne di xeta fedayî de be jî nîne. Misoger ketîbûna cînseltî nîne û meyla ku pêş dikeve, kesayetiya jina ku mezin dibê ye. Heta dawî pêşketina kesayeta siyasî, rêxistinî, vegûherîna wê heye û ticar nafikirin xwe weke amûrê pêşkêşkirinê bigrin dest, wêrekin. Eşkereye ku van taybetmendiyana hemû, ji ber xwe ve bi we re pêş nakevin. Vana encamê dahûrînên me û têkoşîna me ya bê amanin. Bi asanî nayê afirandin. Di encamê dayîna şerekî mezin de tê qezenckirin.

Li van camêr û jinên ku ala îsyanê li beramberî min radikin binêrin. Çawa ji nava nêvenga şoreşê û Partiyê qut dibin nabin, karê yekem dikin, avakirina masa meşrûbê ye, samîmiyet hinekî bi vexwarinê nîşanî hev dayîne. Di nava wan hemû pêwendiyan

de, em ji Semîr bigrin, heta Şener û F. hemûyan berê xwe daye pêşxistina samîmiyeteke bi vî rengî. Civînên bi xwarin, meze li dar dixin, "*samîmiyeta"* ji rêxistinê qutbûnê jî wisa nîşan didin. Pêwendiyên kesên tevizî pêş dixine û teqez em ji van re dibêjin bêmirêz, hilweşîneke ji dîrok û nirxên sereke, ketin û çiravê îfade dike. Siyaseta ku di nêvenga vê pêwendî û çiravê de pêş dixin, "*Gavek jî ber bi Hekarî ve nedayîna avêtin" "Êdî dawî li gêrîla anîn", ji jiyana medenî re îbadet kirin û bi vî şêwazî êrîşî ser nirxên şoreşê kirin, reşkirin"* pêk anîne. Eşkereye ku pênc filis nirxa pêwendiya van nîne. Ezez, dijminê rêxistinê, yekî ku nayê şer ger em serbest berdin wê rêxistinê vala derxe. Jixwe pratîk û rastiya yên bi vî rengî di holê de ye. Xerizeyên wan heta dawî hovin, radestî ajoyan bûne, yên ne pir alî, de îca pirsgirêka civakî û netewî ji hemû aliyan ve paşçav kirine, di rewşeke wisa de ne. Bi vê rewşa xwe çiqas, wê heta kîderê hev têr bikin êdî hûn texmîn bikin. Ez vekirî bêjim, vê kirêt dibînim. Pêwendiyên bi vî rengî, hestyarî, asta cînseltî ji min re mîna bê exlaqiyê tên. Vaye ez exlaqê şoreşgerî jî li ser vê bingehê pênase dikim.

Exlaqê şoreşgerî; ji aliyê cînseltiyê ve jî bi nirxên civakî, nirxên siyasî û welatparêzî yên sereke, ger pîvanên rêxistinî esas digire û dema xwe gihandina vê pêk hat, li wir dikare qala exlaqekî cînseltiyek baş bê kirin. Ger na ev ketîbûneke, bê exlaqiye. Hûn dibînin em jî kîderê hatin kîderê. Bi taybetî jî li çareseriya ku min di kesayetiya xwe de pêk aniye binêrin, di her kêliyê de min çiqas bi hêzbûn destxistiye dê bê fêmkirin. Bi heman şêwazî li dîroka Tirkan, rastiya civakî ya Kurdan û dîroka Îslamê binêrin; heta dawî dijberî jinê ye, dijberî azdiyê ye, bi pêwendiyên aliyê paşverûtiya civakî dagirtîne. Di van hemû diyardeyên dîrokî-civakî de evîn, azwerî û ajo, hertim li ser esasê jinbûn, nemaze li ser esasê dijbertiya azadiyê watedar bûne. Heman xeterî ji bo min jî mijara gotinê bû, lê min bi terbiyekirineke mezin, parastina nirxan û gav bi gav nêzîkî azadiyê bûyînê û li ser vî bingehî di pêwendiya jin-zilam de bi pêşxistina astekî, nêzîkatî nû pêşxistin ser xist.

Misoger vana ji ber xwe ve dernakevin holê. Encax bi veguhertineke kesayetê ya mezin, sebra kesayet û înad bi azadiya jinê hinek mesafe da girtin. Ger ji we re maba wê yê xwe di nava

kîja pêwendiyê de fetisandiba diyare; pir basît hûn ê hîn di pêwendiya xwe ya yekem de bifetîsîna û biçana. Ez bêjim evîna we ya yekem, êşa çavê we ya yekem, hîn ji despêkê ve ew dê têra xilaskirina we bikira. Em gelekî serweriyê qezenc dikin. Ev pir girînge. Bê ku ev pêk were jixwe hûn nikarin di jiyanê de heqhiqûq jî îdîa bikin.

Ya ku di civakê de jê re tê gotin; "*sewdaserî"* tiştekî nade we. Di bin navê "*ez ji te hezdikim" de* tenê hûn dikarin teqleyan bavêjin, demekê hûn ê xwe bixapînin, lê hûn ê ne rêzdarî ne jî hezkirinê nebinin. Her tim bikaranîna cînseltiyek çors ve hûn ê hêj di hefteya duwem de veguherin xoşavê. Bê ku hûn ji jiyanê tiştekî fêm bikin hûn ê bibin "*berdûş"* û biçin. Estetîk xweşikiya we qet namîne. Azweriyên we yên jiyanê dê pêşwext bitemirin biçin. Di jiyana min de asteke diyar heye. Pir zêde bandorker, bi kelecan, asteke min a jiyanê ku bi azwerî dike heye. Jiyana serkirdayetî, jiyana milîtanî heta dawî di tempoyekî de dimeşe. Pêwendiyên ku bi we re tên pêşxistin, hem ji aliyê rêgezê ve, hem jî roj bi roj di wateya pratîzekirinê de pêvajoyeke dîrokî dijî, didim jiyîn.

Bi giştî pêşketin, veguhertina pêwendiyê û wateya ku ji cînseltiyê re bê dayîn ev e. Ez hîn jî li ser radewestim. Min cînseltî ji ser xwe ji rewşa ku serweriyê li ser min ava bike teqez rizgar kir. Bi salan xwe li ser namûsa ferdî ya ku xwe dispêre cînseltiyê rûniştin ew weke metayekê nirxandin, ji min re hinekî weke bê exlaqiyê tê. Ji bo tu xwezayî jî bijî, ji bo azad jiyan bike jî, vaye misoger divê asta netewî, civakî, rêxistinî û çalakî, aliyê jiyanî li ber çav bê girtin û rastiya vê datînim holê. Bêguman ev di heman demê de nêzîkatiyeke estetîkî jî hewce dike. Bi taybet pêşxistina hestan, terbiyekirina wan pir girînge. Dîsa uslûb teşe jî girînge. Di vê mijarê de herkes neçare pîvanên hezkirinê tengav neke bibîne. Dibe ku hûn bêjin, " *ne çareseriya ku em dixwazine."* Lê ger tê pêvajoyên dîrokî înkar neke, asta ku niha hatiye destxistin heta dawî girînge û divê ev neyê paşçavxistin û jixwe heta ku ev neyê dîtin jî di xeta azadiyê de mirov nikare bimeşe.

Jixwe em pir tên rexnekirin. Kî zane wê hîn çiqas pirtûk di derbarê me de bên nivîsandin. Bi vî rengîbûn xwezayî ye û tê

dîtin ku dê hîn bibin. Ya ku min jî li vir çareser kiriye, pêwendiyên ku bi hezaran sale bûye girêka kore. Eşkereye ku ehmeqane û li gorî pîvanên burjuvazî pir paşketîne, pêwendiyên ferdî yên ku hemû pîsatiyan di nava xwe de digire, tam jî weke ku ew jê ditirsin ez ê bikim toz û dûman. Ez ê zemînê nêzîkatiya jiyana serdestiya zilam ji holê rakim û hilweşînim. Ji ber ku ez şoreşgerekim û eşkereye ku ez ê ji bo serkeftina feraseta xwe ya xweşikiyê bixebitim. Ez jî heta dawî jina bi hêz û zindî li pêşberî xwe dixwazim. Ger ez ji bo pêkanîna vê xeyala xwe bixebitim, ez ê jinê jî wisa biafirînim. Ger hûn jixwe bawerin, di vê hevrêtiyê de israr bikin. Ji xwe ne bawerin, xwe baş de bidin. Bi taybet di rastiya min de, di rastiya Partiyê de ticar xwe nekin dev avêj, weke metayekê xwe ferz nekin. Ger hêza we heye, bi mêrxasî hêza xwe nîşan bidin. Jixwe pêşketinên di vî warî de hene.

Hûn jî projeya zilamê di xeyalê we de li gorî xwe pêş bixin, heta ku hûn kesayeta di xeyalê xwe de diafirînin jî xwe radest nekin. Vekirî dibêjim; di nava Partiyê de, derve di be ku li dijberî me pergalekê li ser we ferz bikin û piştî wê şikayet kirin jî fêde nake. Hûn ê zilam ango pêwendiyê çawa biafirînin? Ez çawa şer dikim? Ez ê nebêjim min hûn heyranî xwe kirin, lê herî kêm weke jinekê, weke keçeke ciwan divê ku hûn min xeter jî bibînin. Ez di rewşa yekî ku hinekî mirov dikare pê re bimeşe, di derbarê wî de hinekî hestyar bibime. Qet nebe ez zêde naçewsînim û vaye ez li gel we baweriyê dibînim, neçarim wisa bim. Van gotinan hûn pir zêde kar tînin. Li gorî feraseta min, li beramberî jinê jixwe encax wisa mirov li ser piyan bimîne. Ez ê xwe hem zindî bigirim, hem fîzîkî, ruhî, hem jî fikrî di asta xwe dayîna qebûlkirinê de bim. Di nava pergalekê de, hertim di nava pêkanînê de bigirim. Berevajî ez ê di serî de bêrêziyê li beramberî xwe bikim. Ez ê bi hemû tiştên xwe ve sînorên qebûlkirinê tengav bikim. Jixwe bi vî awayî bandor dikim. Bandorên min awartene. Ez bikevim nava kîja cemaetê, bikevin nava kîja civata jina, pir ecêbe bi şêwazê *“ax, wax me heta niha çikir”* bandoreke zêde avakirina min heye. Dema ku zewicîbin jî dihejin. Çima? Dinêrin ku hemû jî li pêşberî min di rewşa tawanbariyê de ne û ev hestên bandorker radibin ser piyan, kelecan mezin dibin. Ji ber ku ez azadiyê temsîl dikim, ez heta dawî temsîla çoşa mirovan û daxwaza hêza jiyanê dikim.

Bifikirin, her kesayet kêm-zede bigihêje vê astê, dê hêza zindîbûna civakê çiqas zêde bibe, bandorbûn, rêxistin û hêza şer çiqas zêde bibe? Vaye divê hûn hewl bidin bibin jinên wisa. Ger hinekî sebra we heye, înad, îdîa we heye, bi sedan zilam bandor bikin. Yanî ez ji we re nabêjim; "*jinên min ên erzanin*" ticarî. Hûn pir baş dizanin ku, ev meşeke mezin a hevrêtiyê ye û bandora wê jî heta dawî dîrokiye, watedare. Hûn jî bandor bikin, çima hûn erzan xwe xerc dikin, çima heta dawî girêdaneke we ya bê reng pêş bikeve, çima hûn li beramberî xwe bê bawerbin, çima hûn xwe di rewşa nexweşiyên lewaz ên jinê de bigirin? Ya rast hûn bi hestên hîn nehatine dahûrandin ve tên girêdan, bi cînseltiyeke erzan ve tên girêdan. Heta hûn înkarê dijîn

Çima hûn kesayetiya xwe pir alî dernaxin holê? Ma bi namûsbûyîn ev e? Duristbûn ev e? Na! Hewl bidin kesayetiya xwe ji hemû alî ve derxînin holê. Divê ku hûn xwe ji aliyê fîzîkî, ruhî û fikrî ve îspat bikin. Hertim ne di pozîsyona ya tê ecibandin, tê girtin de, berevajî ya ku ew bi xwe jî diecibîne, qebûl ango red dike divê ku hûn bibin kesayetiyên bi vî rengî. Bi exleqîbûn hinekî jî ev e. Di kesayetiya xwe de hem zilama biherikînin, hem jî veguherînin. Wisa hema ber bi rêveberekî yan jî zilamekî, tam jî li gorî xwesteka wî tevnegerin û nebin kole. Ger ev ez jî bim bi vî rengiye ku hûn nikarin erzan bi min ve bên girêdan, ev vekiriye. Bê ku hûn aliyê bîrdozî, siyasî û rêxistinî esas bigirin bi tu zilamî ve neyên girêdan. Ger camêr tam ne di binê emrê şer de be, heta dawî ji wekheviya we re, azadiya we û bi armancên we yên civakî ve negirêdayî be, kesayetiya xwe wisa îspat nake, tenê di bin navê ku ez ê jineke erzan bibînim de çil teqleyan davêje, pihênekê li yên wisa bidin! Heta ger dixwaze ajoyên xwe li ser we tatmîn bike, dîsa pihênekê lêdin û ticarî nêzîkî xwe nekin. Ji ber ku divê hûn bizanin yên wisa roja duwem wê we xilas bike.

Hûn ê bêjin; "*ev pir zehmete*" lê wekî din jî di mercên azadî û wekheviyê de sererastkirinên civakî nabin. Bi vê rewşê hûn ê çi ji vî zilamî bikin? Belayeke pir mezine. Ger hûn dixwazin biceribînin, li gorî pêşniyarê wan provakatoran hinek ji we pêwendiyên bê pîvan pêş bixin, hinek "*evîna*" pêş bixin, ger hûn jê razî bin bila yê we be. Ger hûn jê aciz nebin ez tiştekî nabêjim. Lê teqez hûn ê şikayet jî nekin, partiyê mijûl nekin, bi şer nelîzin,

şert ev in. Ji ber ku, ya divê ji bo wê bê şerkirin û hûn bi xwe jî nikarin jibîr bikin ku milîtanên ji bo armanc û hedefên vî şerî hatine gel hevin.

Ya ku ji xwe re rêzdare, azadî û wekheviyê dixwaze, baş dizaneke ku rêya pêkanîna vê ji bilî şer tineye. Dizane derfetên pêkanînê jî nayê dîtin. Wê demê ev şer bi bawerî û xwe ji dil tevlîkirinê meşandin, eşkereye ku xwe ne xistina rewşên weke meta pêşkêşkirinê jî vekiriye û tê fêmkirine. Yê ku ji xwe re rêzdare, azadî û wekheviyê dixwaze, dizane ku dê ev ji dervî şer bi ti rêyên din pêk neyê. Wê demê ji vî şerî bawerkirin û ji dil xwe dayîn meşandin, heta dawî xwe neketina rewşên ku mîna meta xwe pêşkêş dikin jî vekiriye û tê fêmkirin. Kesayetiyeke Pir rêzdar, qet nayê kirîn û firotin, li beramberî zilam heta dawî rêzdar, bi anûr, ya ku tê pejirandin nêzîkatiyeke cewherî pêşkeş dike. Rêzdariya xwe raber dike pêwîste hûn bibin kesayetiyeke bi vî rengî û ji şêwazê nêzîkatiyên "*ez ê vê jinê wisa bikar bînim, wisa biçewsînim"* re qet pîrîm neyên dayîn. Pêwîste bi vê jiyan ber bi hevrebûneke pêwendiyên pir alî ve bê birin; hewldan di vî alî de bin.

Ti pêwendî yan jî şêwazê nêzîkatiyê, ticar ji armancên civakî û siyasî nayê qutkirin.

Dê heta dawî li beramberî vê rêzdar be. Terbiye li ser vê bingehê ye. Û ev jî di pratîkê de hatiye îspatkirin. Encax pêwendiyên bi vî rengî şayanî rêzdayînê ne, rewa ne. Yanî exlaq li ser esasê vê fikrîn û hest teşe digire. Rewabûn ev e û dîsa divê pêwendî li ser vê bingehê ji kevneşopiyan bê paqijkirin. Di mijara cînseltiyê de ewqas vekirin bese, Tatmînkare?

***Me.:*** Serokê min, ger em hinekî din li ser lêhûrbûn bikin dibe ku em fêm bikin.

***---.:*** Hêza min ewqase, ez hîn çawa vekim? Hêvîdarim ku tu hewla fêmkirinê didî? Yan jî tu li benda bersiveke cuda ji Rêbertiyê bû, yên ku hatine dayîn ne berfireh bûn?

***Me.:*** Belê gelek berfirehe Serokê min.

***---.:*** Rewşa min ji we re ecêb tê ne wisa? Tu matmayî dimînî Ebbas? Di vê mijarê de di nava partiyê de ez çawa pêş de çûme tu fêm dikî? Tu li aliyêkî min ê leşkerî dinêre, li aliyekî min ê siyasî dinêrî, ya din jî li aliyê cînseltiyê dinêrî tu dibêjî Rêbertî çawa xwe aniye vî astî?

***Ab.:*** Di dahûrandinê beriya niha de hebûn serokê min. Lê niha zêdetir ronîker dibe.

***---.:*** Tê fêmkirin ku têkoşîneke gelek zehmete. Di asta min de bûyîn û wisa jiyankirin ne asane.

***Ab.:*** Serokê min, ger di sala 1986'an de bi pîvanê kevnar yan jî yên sosyalîst ve girêdayî bimaya wê demê dê şoreş tine biba.

***---.:*** Dema ku ez wisa pêş dikevim, sererastkirineke bilindbûyî pêk tînim û encax em hêza xwe jî bi vî rengî pir alî dikin, ya din di nava me de pergaleke ji aliyên hinek kesên din ve dixwaze bê pêşxistin heye. Balkêşe! De îca F. yê me jî xwestiye weke wan bibe. Beriya wê jî Semîr û yên weke wî xwestibûn heman tiştî bikin. Lê hêza min awarteye. Dîqat bikin ger min weke M. Kemal yan jî Sûltanên Osmaniyan, xelîfeyên Muslimanan kiriba, ez ê biçama kîderê? Vaye mînakê dewletbûna begên Kurdan heye. Yekem tişta tê hişê yê ku hêz qezenc dike û karê yekem dike çiye, min ji we re got. Divê ku ferqa van aliyê min hûn baş bibînin. Niha keçik hinekî azadin. Pêşketina serdestiya mêr, li dijberî jinê, weke ku di wan mînakên dîrokî ku me dan de vekirî tê fêmkirin, wisa encam dide. Pere û hêz kom dike, piştî wê jina kom dike. Min hewl da li beramberî bandora pere, hêz û jinê, xwe li ser piyan bigirim. Ji ber ku pêşketinên hatin afirandin, gavên hatin avêtin, rast neyên nirxandin, xirabûnê derkeve holê. Ev hersê faktor jî pir zêde xirabkarin. Pêwîste ev neyê paşçavkirin. Bi qasî ku rast nêzîkatî jê re bê raberkirin, ez bawerim dê rê li ber pêşketineke pir mezin veke. Di vê mijarê de nêzîkatiya min û şêwazê karanîna min heta dawî hostayane ye.

Min rewşa xirab a cînseltiyê çawa veguerand polîtîkayeke mezin di holê de ye.

Niha ez vê polîtîkayê li ser we pêk tînim. Di be ku hinekî din vekirin sûdmend be. Dikare bêgotin; "*birçîbûna cînseltiyê heye.*" Ev bi du şêwaza dikare bê derbaskirin. Ya yekemîn û di civakê de serwere; ya ku yê me jî bi lez dikevinê, ji aliyê provakatoran ve, di nava sînorên pergalê de rêya ku difikirin û dikevin serê; bi lez pêkanîna zewacê. Me dahûrandina zewacê kir. Bi lez zewac pêkanîn zêde derfet nade azadiyeke bi wate. Ya duwemîn jî, berevajî vê, qet jin tevlînekirin, bi şêwazê ketine rêya xirab a ji binî ve înkarkirinê xwe dide nîşandan. Weke ku wê vana şoreşê pêş nexin, eşkereye ku dê bandoreke wan a azadkirina civakê û encamekî wê jî nebe. Dîsa di nêzîkatiyeke din de, jin tevlîkirin, lê dibe qet rastî nedîtin. Jin heye yan nîne, qet ne di xema wan jî de ye. Bi van nêzîkatiyana ne jin, ne jî ji aliyê zilam ve ber bi encamekî ve çûyîn ne gengaze. Başe, bi taybet pêşxistina min a polîtîkayê di vê mijarê de çawa ye? Hostatiyeke mezin heye. Xerizeyên cînseltî û wizeya wê, ez jî di navê de, vediguherînim wizeyeke polîtîk. Ya ku min pêş xistiye û aliyê wê yê azadkirinê pir mezine, rêya ku şoreşê jî bi xwe re tîne, vaye ev e.

Ez vê pir vekirî bêjim; tu kes wizeya xwe di pêwendiyeke bi jinê re, di her roj bi wê re mijûlbûnê de xerc nake. Karê malê, yên mûtfaxê, zarok marok û hwd. De îca bifikirin, rêberek, bi jinekê, yan jî çend jinan re dema xwe wisa derbas bike gelo wê ji wî xêr hebe? Yan jî em bi we bifikirin; pir bi çavsorî em hezkirinên we bifikirin, şev û roj kesê ku hûn jê hez dikin di serê we de be, qet ji serê we dernekeve, hûn ê bikaribin weke pêwîst polîtîkayê bikin? Tatmînkirina cînseltî şev û roj we mijûl bike, behremendiya we ya veguhertinê nebe, hûn ê bikarin xwe ji rewşa jina ketî rizgar bikin? Û zilam di vê rewşê de, dê bi şêwazekî misoger li ser we serwer bibe. Dê wê, cînseltiyê hertim veguherîne amûrekî serdestiyê. Her pêwendiya we ya bi zilam re, serdestiyeke. Deh

pêwendî, deh serdestîne û vaye hûn fetisîn û çûn. Başe, li şûnê çima? Li şûn ve di vê mijarê de, vaye tu birçiye, sedema wê mêtingeriye, qutke bigire, bixwe û têr be. Ajoya cînseltî te mahf dike. Dixwaze bila fahîşetî be, dixwaze bila rahîbetî be, dixwaze mala taybet, dixwaze bila di nava kerxanê de be, te tine dike; tê çi bike? Wê veguherîne azadiyê, polîtikayê. Çare di vir de ye. Ez bawerim Freûd jî hêza mirov, nêzîkatiyeke wî ya ku wize û hewldana mirov bi wizeya cînseltiyê ve girê dide heye. Em vê di rastiya xwe ya civakî de, rastiya xwe ya şer de wisa formule dikin û me derxist asta polîtîkayê. Ev ne fikrek û xeyaleke jî; weke tê dîtin em di nava partiyê de gelekî pêk tînin. Min hêza ku hemû wizeya xwe ji bo armancê partiyê û şoreşê re serferberkirinê îspat kir, encamên wê jî di holê de ne. Mesele dîtina vê û bi qasî ditinê, weke rêgezeke jiyanê, ya exlaq ji pêk anînê re hêz raber kirine.

Bifikirin weke regezekî bi polîtîka ve girêdana we dê çiqas şanaz be. Mêrxasiya we derket holê, lehengî, fedakarî, wêrekî, ji hemû aliyan ve kesayetiya we derket holê. Ger nêzîkatiyeke rast a cînseltî nebûna, ev gengaz nedibû. Niha hestên we mezin dibin, kesayetiya we mezin dibe. Di cewhera vê veguherîna bingehî û cewhera mezinbûnê de divê ku bê dîtin polîtîkaya ku em di cewher de li ser cînseltiyê pêk tînin bê dîtin. Vaye her roj û bi israr dibêjim bi polîtîkayê, hezkirina welat, rêxistinê ve bên girêdan û vana ji bo ber bi jiyana azad ve çûyînê mercên sereke ne. Dîsa hestên xwe li ser vî bingehî kûr bikin, dilê xwe li ser vî bingehî vekin, dev ji pêwendiyên erzan ên zilam berdin. Evîneke sewdaserî, weke kes û civak li dijberî me bûyînê wêdetir dibêjim ketîbûne. Ez vana îspat jî dikim.

Encam; rêgeza vediguhere, kesayeta ku qezenc dike ye. Bêguman aliyên wê yên hîn jî bên vekirin hene. Ger hûn pê ne razî ne bêjin, ez bi we re lîstok nalîzim. Pir zehmetiyê jiyan dikim. Ser de jî pir zêde bi keçan re eleqedarim, weke ku kesên herî zêde nêzî min in di nava nêzîkatiyekê de me. Ji ber ku

polîtîkirina we merce. Jixwe wekî din jî bi rêz nabe. Em wekî din nikarin hezkirinê jî îspat bikin. Van xalên ku didim diyarkirin pêwîste hûn baş fêm bikin. Belê, wekî din fikrên we hene? Ez bawerim gelek watedar bû?

***Ab.:*** Lêzêdekirinên pir bi wate bûn Serokê min.

**---.:** Wekî din em lêzêdekirinên berfireh li kîderê bikin? Hûn fêm dikin? Beriya hertiştî hûn van fikran nû dibînin?

Me.: Serokê min, di dahûrandinên berê de jî hebûn. Min dixwend, lê di fêmkirinê de zehmetî dikişand. Aliyê ku herî zêde me tahlîl nedikir ev alî bû. Ji ber wê min xwestibû berfirehtir bê vekirin.

**---.:** Başe tu çima ewqas bi vê mijarê re eleqeder dibî?

***Me.:*** Serokê min, jixwe pirsgirêka me ya sereke ev e. Yanî pirsgirêka malbat û jinê ye, pêwendiya jin-zilame. Mijara ku herî zêde di şoreşa me de jî tê dahûrandin ev e. Ji ber ku hemû zirarên ku pêş dikevin ji ber vê mijarê ne.

**---.:** Başe, di çarçoveya ku min diyar kir de hêza te xwe girtina dest heye, wizeya xwe tê bikaribî li ser vî bingehî vegûherînî?

***Me.:*** Belê Serokê min, ez ê veguherînim.

**---.:** Ne bi rêşaşî ne bi lîberalî, ne jî bi înkargeriyê. Tê bikaribî gav bi gav xwe pêş bixe?

***Me.:*** Belê Serokê min. Bi qasî ku hestên welatparêziyê pêşkevin bawerim dê ev jî bibe.

**---.:** Tenê ne hest, gelek taybetmendiyên wê hene. Polîtîkbûyîn, azadbûn….

***Me.:*** Dema ku eleqe hinekî di wî alî de pêş dikeve em bêtir wizeya xwe, bi qasî ku em fikra xwe di wî alî de xerc dikin em zêdetir dikarin wate bidinê. Wê demê girîngî ji mijarên wisa biçûk re nayê dayîn.

**---.:** Ya ku te ber bi vê ve dikişîne ez bawerim pêwendiya ku te bi zilam re jiyan kiriye. Tu pir tirsîyayî? Hesta ku dida te çibû? Bawerim ruhê te bifetisînekê re rûbibû mabû?

***Me.:*** Serokê min, beriya ku ez wê zewacê pêş bixim ez miroveke pir cuda bûm û piştî ku zewicîm min dît ku ez bûme miroveke cudatir. Ji nişkê ve veguherînek.

***---.:*** Tu beriya zewacê keseke çawa bû?

***Me.:*** Beriya bizewicim her çiqas di nava malbatê de azad nebûm jî hizûreke min hebû, zêde pirgirêkeke min nebû.

***---.:*** Bu zewacê re hizûra te serûbin bû?

***Me.:*** Belê. Ji hemû aliyan ve fikrên min serûbin bûn. Ji nişkê ve jiyan bê wate bû.

***---.:*** Zewac ji bo te xwedî wateyeke çawa bû? Tevgerînên rojane yên zilam li ser bunya te çawa teysîna xwe kir?

***Me.:*** Serokê min, ya rast hevdû xapandin, fêl lihevkirin û berjewendî mijara gotinê bûn. Yanî min dixwest ya ku dixwazim bidim kirin, min xwe pê dida tatmînkirin. Ger na tiştek nebû. Tenê ew pêwendî hebû. Lê ez wê demê ne di ferqa vê de bûm.

***---.:*** Tu pir xwe xapandî nehatibe? Tu piştre bi me jî nelîzî?

***Me.:*** Na Serokê min. Ya rast zewac mirov durû dike.

***---.:*** Ji hemû aliyan ve durû. Durûtiya jinê di van zewacan de pêş dikeve.

***Me.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Em dikarin wê di romanê de bigirin dest. Hûn her roj li beramberî zilamekî bin hûn ê bibin jinên durû. Ger we terbiya xwe zêde ji dest neda be bijî ji we re. Keçeke pir zêde di tengaviyê de maye dibe ku nû nû xwe dibîne û divê ku pir jî têkoşîn bike. Lê ne asane.

***Me.:*** Berya zewacê mirov hinekî xwe paqij dihesibîne, hinekî saf hîs dike, lê …

***---.:*** Bi zewacê tu xwe qirêj dibînî. Ya rast her zewacek hinekî qirêjbûne. Tabî ez vê di çarçoveya pîvanên pergalê de dibêjim. Azadî nîne, parvekirin nîne, tu serûbin dibî. Tu çawa jê rizgar bûyî? Dîsa her bijî ji te re.

***Me.:*** Serokê min, min gelekî li ber xwe da.

**---.:** Mêrik dixwest te bigire ne wisa? Ne dixwest dev ji te ber de.

***Me.:*** Raste Serokê min.

---: Çawa te nekuşt?

***Me.:*** Xwest min bikuje, lê…

**---.:** Kuştin jî di navê de dê bixwesta her tiştî bike, lê tu di dawî de reviye û rizgar bûye. Dikarî bi şêwazekî trajîk bi encam biba. Bawerim eleqeyeke te ya mezin ji van mijaran re heye. Ji ber ku pirsgirêka ku te jiyan kiriye gelekî serê te êşandiye.

***Me.:*** Serokê min, teşegirtina kesayetiya min hinekî jî bi zewacê ve girêdayî ye. Yanî tahlîlkirina min a kesayetê, ji ber ku zêdetir kesayeta min di zewacê de teşe girt di vê mijarê de bûye girêk. Ji bo vê lêhûrbûna min di vî alî de erêniye.

**---.:** Ger tu bi aqilî, duristî, cewherê çareserî hat destnîşankirin. Ya pêwîst tê bike. Ger ya pêwîst tu nekî dê kesayetiya te derkeve holê. Tu çiqas duristî, cewheriye, tu çiqasî li rastiyê digerî, tê vana deyne holê. Tu bi hêzî, lewazî, durûyî, bi biryarî, li pê macerayê dibezî, yan jî tu şervaneke azadiyê ye, dê vana hemû zelal bibin. Ez di vê baweriyê de me ku mijarake gelek balkêşe. Aliyên balkêş ên ji çîrokê derbasî romanê bûyînê weke tê xwestin dikarim bidim fêm kirin?

Roja borî hevalekî got; " *te rewşa hestan rave nekir"* Qala kîja hestan dike? Hestên ku min bi xwe jiyan kirine çine, min li gorî xwe hinek vekirin. Bawerim asta min a hestan tê fêmkirin.

***Ab.:*** Hat diyarkirin Serokê min. Ji vê zêdetir ji bo Partiyê hinekî romantîk, wêjeyî û dibin aliyên xeyalî.

**---.:** Me bi xetên giştî dan. Wêjevanekî baş dikare gelek pêş bixe. Ev karê roman nîvise. Hîn dema ku ez di temenê zarokatî de bûn gelek kesan digot; "*xwedê kesî weke te neke."* Vaye provakator ji bo min dibêje "*ber bi felaketê ve dibe."* Ez ber bi felaketê ve dibim? Gelo dibe ku ez gelek xeter bim? Hûn lêpirsîn bikin, dadgeha min hûn bi xwe pêş bixin. Lêpirsîn bikin, lê bes bi mercê mafê xwe parastinê dayînê. Ne weke ku dibên, îdîayên min û parêznamê min gelek mezinin. Tê gotin ku "*asta azadiya jinê,*

*asta azadiya civakê diyar dike.”* Asta ku min ji bo kesekê pêş xist, bi rewşa wê ya li beramberî pirsgirêka jinê ve girêdayî ye. Rêya herî baş a pîvana bi hêzbûn ango bê hêzbûna zilamekî, li beramberî rastiya jinê çi îfade dike li vê nêrînê dikare bê berawirdkirin. Di mijara jinê de di pratîk û fikir de çiqas bi hêz be, hêza wî zilamî bi giştî ya civakî, bandora wî ya siyasî û hêza wî jî ewqase. Exlaq û aliyê wî yê wêjeyî jî dîsa ewqase. Ez weke pîvaneke bingehîn vê dibînim. Kesayetiyeke di mijara jinê de bê edeb, lewaz, çewsîner, sist em devjêberdin bibe milîtanekî şoreşger, ez ne bawerim bibe kesayetiyeke rêzdar jî. Ev pîvaneke. Ez di vê baweriyê de me ku min hinekî be jî ev nîşan daye. Ez mirovekî heta dawî li beramberî rastiya jinê xwe perwerde dikime. Mirovekî heta dawî bi rêxistin dike, bandor dikime. Yê ku terbiyê û edeb jî heta dawî hestyar bi dest digire, dimeşîne û di rewşa pêş dixe de me.

Tu jin nikarin li ser kesayatiya min bandoreke stemkar bikin. Dipirsim ji we; bandoreke min a stemkar heye? Ji bo fêmkirina vê jî di serî de pêwîste mirov li meseleya baweriyê binêre. Ji heta dawî bawerî pêkirinê zêdetir tu hesteke we ya din heye li beramberî min? Dîsa di mijara hêzgirtinê de jî wisa me; di rewşa gelekî baş hêz dide û digire de me. Dîqat bikin, ger di vê nêvengê de jî hesta we ya beweriyê gelek pêş dikeve, di serî de girêdana vê bi me re heye. Dîsa bi qasî ku tu nêvengên din nedin we di nava we de rehetbûnek heye û ev jî pêwendiya xwe bi kesayetiya me re heye. Ji ber vê ye ku hûn heta dawî xwe rehet hîs dikin. Di nêvenga rêxistinê de ev pirsgirêk heta dawî mijûlkere. Me bi zorê hinekî asta we ya azadiyê pêş xistiye, cihê ku hûn diçinê pêwîste hûn vê dîqat bikin. Şiyariyên ku min îro kirin hene. Bi wan ve girêdayî ez ê îro hinek şiyariyên xweser li we bikim. Dê derfet nedin, kişandina jinê, girêdan, bikaranîn ji bo hineke xala yekem pê difikirine û vê jî pir bi qurnazî pêş dixin, vê jî li ser esasê bikaranîna hêz û yetkiyên rêxistinê kirin gelek belave. Ji bo ku

em rê li pêşiya vê bigirin, di van xalên ku hatin gotin de divê ku hûn gelekî baldar bin.

Ez vê mijarê jî bi girîngî digirim dest; rast pênasekirina otoriteya ku di nava rêxistinê de pêş dikeve û li beramberî jinê ji bo rêzgirtin li xirab bikaranînê, bê ku bêjin fermandar ango rêvebereke, kî dibe bila bibe, ji vî re di çarçoveya ku me diyarkiriyeke nêzîkatî raberkirin, ji bo we heta dawî jiyanî ye. Dema ku te got; "*em dûr ketin, ketin bin bandora wî"*, hûn ê winda bikin. Pîvanên ku min dane pir girîngin. Di seha min de ev wisa ye û hûn diçin kîderê biçin bi asanî devjê bernedin, tengav bikin. Ji ber ku ji bo xwe, bi qasî ku hûn di vê de serkeftî bin encax hûn bikaribin rêya jiyanê vekin. Ev ne asane, hûn dibînin ku rastî têkoşînekê dixwazin, mezinbûn û veguhertina kesayeteke hêza xwe têra vê bike pêwîst dike. Em çi bikin, civaka me di tengasiyê de ye, tê xistin. Koletî jî ji xwe ev e.

Divê ku ez vê jî bidim diyarkirin, di wateyeke çors de zûgotin kirin, ne çareserkirine. Ger tu rastiya civakî ewqasî li ber çav bigirî, girêka kor a pêwendiyan ewqasî fêm bikî, dîsa tengaviyên heyî bi şêwazekî rast dest bigirî, rewşa şerekî wisa derdikeve holê. Em wekî din ji hev nexwazin. Jixwe ev ne gengaze jî. Ez jî dikarim cudatir nêzîk bibim; asta şer tengav bikim, rêxistinê tenvag bikim. Nêzîk nebim cureke, nêzîk dibim cureke. Dê encam pir cuda bibin. Xwe gihandina vê astê ji bo min li beramberî mêtingerekî dişibe li eniyeke şer rûbirûbûneke vekirî, heya şerekî ji wê girîngtir qezenckirine jî. Ger na em nikarin pêş de biçin, rêxistin bikin, de îca em qet nikarin we tevlî kar bikin. Bi taybetî ji bo ku nîqaş di derbarê min de pêş bikevin ez vê geş dikim. Yê ku provakatora jî wisa dide axaftin, di encam de ez im. Dê ev vekirin ji azadiyê re xizmet bikin. Bi tahrik kirina hêzê beramber, heta ji rûmet xistinê jî ji şoreşê re xizmet kirin gengaze. Ev camêrana di cîh ango ne di cîh de dayîna axaftin, ne rewşeke ji rêzê û biçûk bê dîtine. Mînak me bi A. C. Ersever jî sê-çar pirtûk

dan nîvisandin, dawiya zilam hat. Her kesê ku li dijberî me dinivîsîne, hedef û hesabê wan çi dibe bila bibe, bi şêwazekî zêde propaganda me jî dikin. Ya ku vanê din dikin jî ji ya wî cudatir nîne. Di vê mijarê de em gelek kêmasiyan bi dijmin jî didin kirin. Di encam de ji hemû eniyan ve em gav didin avêtin. Bêguman min wîsa sade û ji rêzê nebînin. Li pêşberî we kesayeteke pir alî bi mêrxasî di nava şer de mijara gotinê ye; gelekî aloz û berfirehe. Weke ku yek alî hûn di xeyalên xwe de zindî dikin yan jî bi pîvanên darêza kevneşop nêzîk nebin. Ger hûn wisa nêzîk bibin, jixwe hûn ê encam jî negirin. Hûn bizanibin mezin hez bikin, bi hest û azweriyê mezin bijîn. Hûn neçarin vê mezinbûnê li kesayetiya xwe bînin. Ez xwe naynim asta îbadet jê re kirin, lê girêdanê min jî yên mezin hene. Herweha ji ber sedemên cuda ez bi we re mijûl dibim; hûn dibînin mijûlbûnên min mezinin. Girêdan divê ku beramber hev bin. Heta dawî divê hûn vekirî û ji dil bin. Vaye demek beriya niha min xwest hinekî destnîşan bikim. Em ji cînseltiyê bigirin heta exlaq û felsefê, pêdivî bi vekirin û ronîkirinên mezin heye. Pêdivî bi hezkirinekê, xweşikî û hêza fikrandinê heye. Divê mijarê de pêşkevin, hûn çima ditirsin! Xwe biparêzin, kesayet ya we ye. Dubare bêjim, ger xweşikiya we naçe, ji pîvanên we re, heta pîvanên xwe yên estetîk re ti tiştekî ne guncawe -ger ev ez jî bim- pê re nekevin temasê, destê wî jî negirin. Lê ya ku ji pîvana re guncawe, ji îdealên we re guncawin re jî divê ku hûn bikaribin bêjin; “*tu başî.”* Nexweşik be, dîsa divê ku hûn vê bi wêrekî bêjin. Yanî cudabûna qebûl û redên xwe gelekî pêş bixin. Pîvanên qebûl û redkirinê, di çarçoveya rêgezên ku me pêşxistine de bingehîn bikin.

Dema rastiya min bû mijara gotinê, vaye hûn dibînin, ez di nava şerekî mezin de me. Ne weke beg û sûltanan nêzîkî min bibin, ne jî min ji nedîtî ve werin. Ji ber ku rewşeke wisa nîne. Rewşeke min a pir cuda heye û ez pir zêde di nava lêgerîna azadiyê de me, ez ji nêz ve we eleqedar dikim, ber bi baldariyê ve

dikişînim. Ger ez bimirim jî ev bi vî rengî ye. Dê ev bandor xwe bidomîne, bi asanî jî hûn nikarin jê rizgar bibin.

Ya herî rast, ya şayeste û ber bi pêşketin, mezinbûnê ve dibe rast fêmkirin û bi qasî fêmkirinê jî pêdiviyên wê pêk anîne. Ev ji destdayîna canê we jî re bibe mal, heta ger ez jî bim, teqez ya ku divê bê kirin û meşandine. Belê, hinek ji we wê di demeke nêz de biçin. Van hemû axaftinan di vê wateyê de, di heman demê de em jî bo we jî dikin. Hûn dibînin ku di van axaftinan de, yekîtiyeke mezin heye, hestên mezin hene. Lê weke ku hertim dibêjim, ya herî zêde bi wate, dîsa rast û li ser navê nirxan axaftine. Hezkirinên me, ji aliyê bi hevrebûna me ya mezin encax di vê wateyê de cihekî xwe hebe. Kesayetên ku bi welatparêziya xwe, armancên xwe yên siyasî, rastiya rêxistinê û şer ve negirêdayîbin hezkirina xwe nabe. Hezkirinên me li ser vî esasî hene. Ji ber ku hûn gelekî bi van nirxan ve girêdayî ne. Heta hezkirina we di asta herî pêş de ye. Û dê qet hilneweşe. Ev heta dawî bi vî rengî be, her ku biçe pêş bikeve û bi qasî ku mezin bibe dê yekitiya me bê binketin bibe.

Dema ji nirxên sereke qutbûn despê kir, di hezkirinê de jî ketineke mezin despê dike.

Lê dema ku hûn li ser bingehê van nirxên mezin bimeşin, teqez wê hezkirin jî pir mezin bibin. Meşa me ya mezin a azadiyê, vaye wê bi vî rengî veguhere meşeke mezin a evîn û azweriyê. Bi vê re mijûl dibim û dema ku vana hemûyan jî dibêjin, di ferqa rastiya de me. Heta hinek dikarin li şêwazê ku dibin mijara van hemû nirxandinên jiyanê, pêwendî û kesayetê dinêrin dikarin bêjin; “*ev serabe –xeyal-ke”* Yan jî dikarin bêjin; “*îtopya”* ke. Lê ez teqez di veguhertina vê ya rastiyê de bi îdîa me. Hûn dibînin, weke ku em pir nêzîkî hevin tên dîtin, lê hîn jî mesafeyên ku divê ji navbera me bên derbas kirin hene. Em naxwazin erzan bên girêdan, we jî erzan qezenc bikin. Em dixwazin we pir mezin bikin, bi hêz bikin; bi vî rengî gîştina hev, bi vî rengî bi hevrebûn

û meşîn baştire û ez hewl didim vê bi girîngî pêş bixim. Divê ku hûn baştir fêm bikin. Misoger em ê kesayetan, pêwendî û hestan mezin bikin. Em ê ticarî cîh nedin ketina, pêwendiya ketî, hestên ketî di navbera xwe de. Em ê parvekirin û tevlîbûnên awarte pêk bînin. Bi rastî jî li ser esasê serkeftina armancên xwe em ê vê pêk bînin. Wekî din?

***Ron.:*** Serokê min di çîroka jiyana Rêbertiya Partiyê de lêpirsîn û darizandin bi awayekî berfireh dîtin gengaze. Bi taybet ger em dahûrandina îro jî li ber çav bigirin di demên pêşiya me de ev waneyên ku divê em ji xwe re esas bigirin ji aliyê me ve girîngin. Ji niha vê tê dîtin ku wê rê li ber pêşketinan veke. Mînakên ku hatin dayîn, vekirin vê didin diyarkirin. Di vê mijarê de îşaret bi lêpirsîneke cîdî jî dikin. Ti carî bûyîna parçeyek ji dîrokê yan jî bûyîna xwedî gavên cidî gengaz nebûye. Ev vekirinên Rebertiya Partiyê dide diyarkirin ku êdî em ê bibin parçeyek ji dîrokê. Divê ku em pêvajoyeke darizandina cidî di xwe de bidin despêkirin. Pêvajoya pêşiya me dide diyarkirin ku dê serkeftinên mezin bên jiyîn. Jixwe dahûrandin jî di vê mijarê de hêz didin. Di çîroka jiyana Rêbertiya Partiyê de rewşa ji hêza têkoşînê re hêz dayîn vê serkeftinê bi xwe re tîne. Dema ku em nêzîkî pêvajoya kongrê dibin pêwîste em bibînin ku peywirên me yên wisa dîrokî hene. Ji bo ku em vana veguhezînin gelek perspektîf hatin dayîn, ewqas hat vekirin ku, êdî em gotineke bê kirin nabînin.

***---.:*** Tu pir bandor bûye, lê te zêde lêpirsîn nekiriye. Tu çi dibêjî Xe..? Te van axaftinên dawî fêm kir? Divê mijarê de dikarî çi bêjî? Di dilê te de mezinbûn pêş dikeve? Hevalên jin dikarin xwe bibînin û pêngaveke mezin bikin?

***Xe.:*** Serokê min, dewletên emperyalîst dibêjin jin azade, serbixwe ye. Lê di heman demê de jî heta dawî jinê dixin. Ger di qadê de jinek bi xwe dixwaze azad bibe, derfetên vê pir zêdene.

***---.:*** Emperyalîzmê jin ji koletiyê wedetir xistiye rewşeke xirab. Heta xistiye rewşa bêçaretiyê.

***Xe.:*** Û li ser jinê polîtîkayên cuda bikaraniye û xistiye xizmeta xwe.

***---.:*** Polîtikayeke pir hesase. Ji koleyên serdema civaka koletiyê zêdetir xistiye xizmeta xwe. Bi taybet divê tu vê xalê baş fêm bikî.

***Xe.:*** Tê fêmkirin Serokê min.

***---.:*** Ji bo jinên ku di serdema koletiyê de di bin desthilatdariya xwe de digirtin dibe ku hinek derfet mijara gotinê bû, lê azadî nebû. Niha pêwendiyeke pir taybet, hesas pêşxistine. Xistina rewşa meta, malê ku bê firotin. Metayeke wisa ye ku, jin xistine şûna pereyekî pir xweşik. Jin ji hemû aliyan ve xistine rewşa pere. Tiştekî pir xirabe. Divê ku li dijberî vê şerek, xebatek hebe. Xebata min ev e. Ez di vê baweriyê de me ku we hinek tişt girtin. Ger hêza we heye li ser lêhûrbûn bikin. Platforma nîqaşê vekiriye, gelek pirsgirêkên me hebûn me hemû bi wêrekî danî holê. Ger hûn pir serbixwe ne, azadin, bi îdîa ne, divê ku cihê we di nava şêwazê pêwendiya serdest de, nêzîkatiyên koleger de nebe, nabe jî. Lê bi rastî ger di çarçoveye van têgehan de hûn hinek tişt dixwazin, ji bo bi hevrebûn, pêşxistina bi hevrebûna me jî divê ku hûn hewl bidin. Divê ku ez hîn çawa we bibim. Em hinekî vê lêpirsîn bikin. Hem min rexne bikin, hem jî di derbarê ez ê çawa bikim de min şiyar bikin. Divê ez hîn çawa bim yan jî çi bikim? Belê Ebbas, vekirî biaxive, ne li pişt min, li pêşberî min, tê jî weke provakatoran pirtûk binivîse û perîşan bibe. Çima li pişt min diaxivin?

***Ab.:*** Pir zêde jî li dijber nîne Serokê min.

***---.:*** Belê, ez bawerim kêrî min tê. Hêza min têra vala derxistina derewkar û mirovên ji rêzê dike, hêza min a fesadkaran jî bin bixe heye. Hemû tevdîrên min mijara gotinê ne. Herweha niqaş her ku diçe mezin dibe. Tirkî jî girtiye bin bandora xwe.

Dema ku ez ketim nava civakê hûn ê hîn bibînin bê ka ez ê çi bikim.

***Ab.:*** Pergal hewl dide nîqaşan asteng bike Serokê min.

***---.:*** Pir bi pîlanim. Dê meşa min pir mezin bibe. Xwe amade bikin. Ger hûn ji xwe bawerin hûn ê lingê xwe jî bi hêz bikin. Serbixwe bibin ji bo ku hêza we têra bi min re meşê bike. Ger na hûn ê sibê hemû bên ji bîrkirin. Lê ez ê jinên nû bafirînim. Dibe ku pir kêm ji we li ser piyan bimînin, beşê mezin dê bikeve. Wan jinên mezin ez ê bafirînim. Ji bîr nekin, di vê mijarê de bi qasî ku dibêjin; " *dîne"* bi hêz û xwedî îdîa me. Ger hûn ji xwe bawerin, ez amade me di meşê de me. Hûn dibînin ku xitabî hestên we yên ji rêzê kirinê ne gengaze. Berevajî, bangewazî ji kesayetiya jina mezin re heye. Wekî din hûn nikarin çirkeyekê jî li gel min bimînin. Yan hûn ê di xeta mêrxasiyê de bimeşin; yan jî dûrkevin. Vekirî dibêjim, ger hûn ji xwe bawerin wer in.

Straneke nû derketiye. Strana Amedê ye dibêje; "*Saza niye gelmedin, söze niye gelmedin."* Ev şêwazê xîtabê ye, bangewaziyeke, ya rast vexwendineke û bi awayekî vekirî xîtabî koletiya jinê dike. Ya me jî civîna me "*ya hatina gotinê"* li ser vî esasî ye. Nêzîkatiyên pergalê pir ecêbin; bawerim hûn ferq dikin, mijareke wisa dikin strane sereke. Ev dibe bangewaziya jiyaneke berevajî van civînên ku em tê de dixwazin jinê pêş bixin, heyret! Dema ku me têkoşîn da despêkirin Tatlises derxistin holê. Yilmaz Guney beriya ku bimre dibêje; "*li beramberî kesayetiya me pergal darbeyekê amade dike"* bi vê şêwazê nirxandineke wî hebû. Vaye vî Îbo'yî derdixin holê. Ya rast tesbîteke rast kiriye. Lê di wir de tenê çalakiya xwe digire dest û difikire Yilmaz. Jixwe Îbo hinekî jî li dijberî me hat pêşxistin. Ev qeşmereke. Piştre yekî bi navê Emrah derxistin. Ew jî qeşmerê Amedê ye. Îbo li Riha yê, di derketina PKK'ê de, bi taybetî di sala 1987'an de derxistin holê û fêlek kirin. Emrah jî ji Amedê derxistin. Piştî 12'ê Îlonê, bi taybetî jî ji bo ku ciwanan araste bikin weke

endamekî wisa hat fikirandin. Piştî wê vana hemû weke fêlekê ragihandina wan û di civînên berfireh de, şevan de bi eleqeyeke mezin pêşwazîkirina wan, ji bo bandora PKK'ê li ser ciwana bidin şikandin bû. Teqez ne rewşên tesadufî pêşketine û şêwazekî ji aliyê pergalê ve hatiye rêxistinkirine, bi pîlane.

Kesayetên sûnî yên ku ciwan ji wan re îbadet dike afirandin û ajotin pêşiya civakê û kombûna hemû çîn û tebeqeyan li derdora wan pêk anîn. Bi taybetî jî ji bo bandorgeriya Kurdistanê asteng bikin, ji derketina me ya milîtanî ya mezin civak û ciwan bandor nebin, ji bo rê li pêşiya kûrbûna wê bigirin, kesayetiyên wisa weke amûrên ji rê derxistinê derxistin holê ev teqeze. Ew jina ku jê re dibêjin Hulya Avşar jî bi vê ve girêdayî derket holê. Bawerim ew jî bi taybet hat dîtin. Ji ber ku ew jî bi eslê xwe Kurd e. Li gorî min ev hersê jî bi pîlanbûn û rista xwe jî di 12'ê Îlonê de kêm ne lîstin. Em di demên pêş de dikarin girêdana van a bi şerê taybet re fêm bikin. Gelek kesên weke van hene û ji bo van bi hezaran kes radibin ser piyan. Sedemên wan tên fêmkirin. Di serî de jî milîtaniya şoreşger a mezin ku di Kurdistanê de bilind dibû, şiyarbûna mezin a ku di jin û zilam de diafirand û her ku diçe pêş dixist serûbin bikin, bi vî rengî tevdîr girtina pergalê jî mijara gotinê ye.

Roman pir alî dibe. Em we pir tengav dikin. Lê em çi bikin, rastiya romanê hinekî bi vî rengiye. Wekî din romana me nikare li ser piyan bimîne. Çareseriya Kurdan dê tengav bike. Nêzîkatiyek gelek hestyar heye, lê bi asanî ji dikarim bêjim em ê zehmetiyan jiyan bikin. Xwe şewitandina hinek hevalan jî, di ravekirina berfirehiya pirsgirêkê de kêm bimîne. Dîrokeke bingehîne. Lê em ê li ber xwe bidin, ji ber ku civaka Kurd gelekî hatiye xistin. Em bi îdîa ne û ev ast başe. Ger asta guftûgoyê neyê mehîn, xira nebe, hinekî din me bi hev re dikare bi hêz bike. Weke ku hertim dibêjim, ger pêdiviya we heye, hûn dikarin vekirî bên li rûyê min jî rexneyên xwe pêş bixin. Lê li tiştên ku ez dibêjim jî dîqat bikin.

Teqez bi min nayê lîstin. Bêlîstin ez ê bibînim. Kesayetiya min dorpêçker e. Di heman demê de gelek jî demokratîke. Demokratîkbûna kesayetiya min ji vê tê fêmkirin; vaye civîneke azadiya jinê wisa jî dikare bê lidarxistin; ewqas pirsgirêkên aloz li kîderê wisa vekirî dikare bên destnîşankirin? Di kîja civakê de, Partiyê de dikare wiha bê kirin, bila mînak bidin, heta Ewrûpa jî di nava vê de ye. Gelekî vekiriye û di kûrahiya ku gelek kes nikarin bibînin de ye, em dikarin pirsgirêkên xwe destnîşan bikin. Ev ji bi qasî aliyê me yê demokratîk, em çiqas bi wêrekî nêzîkî çareserkirina pirsgirêkê dibin nîşan dide. Cihê ku hûn diçinê van civînan jibîrnekin, pir zêde bigirin dest. Ji ber ku hûn ê bi gelek zehmetiyan re rûbirû bin. Naveroka Rêbertî û ev civîn di destê we de ne. Bi dehan car bê ku hûn aciz bibin vê naverokê ferz bikin.

Rexneyên dayika min û gundiyan hebûn. Hêjî nêzîkatiyên van provakatoran jî heye; digotin. "*jiyana te şemitiye, tu kes nikare bi te, tu kes bi te re jiyan nake"* Lê pir ecêbe ku, me çawa hûn hemû komkirin anîn gel hev? Xe… me hûn xapandin?

***Xe.:*** Serokê min, Albert Eînsteîn jî heman tiştan dibêje. Ji wî re jî dema ku zarok bûye tiştên ji we re hatine gotin, gotine. Heta çend caran ji dibistanê hatiye dûrxistin jî.

***---.:*** Einstein qewitandine?

***Xe.:*** Belê Serokê min. Ger gotin di cî de be, Eînsteîn yekî pir kêm hiş bûye. Di heman demê de jê re gotine tu nikare bigihêje cihê ku dixwazî. Ez di vir de parolayekê dibînim Serokê min, ji ber ku Albert Eînsteîn zanistvaneke û teoriyên wî yên ku hemû cîhanê dorpêç dikin hene. Bi hezaran mirov bandor kiriye. Li gorî min parolayeke hêz a Rêbertiyê jî heye, ji ber ku hemû cîhan hejandiye kiriye.

***---.:*** Bawerim ji aliyê bîçim ve jî dişibim wî.

***Xe.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Hinekî din porê min dirêj bibe, eniya min hinekî din vebibe bawerim ez ê bişibim wî. Kesekî din jî ez şibandibûm wî.

Erebek bû. Ji nişkê ve got: “*Aînsteîn kesekî başe.*” Ji ber ku em şibandibûn wî gotibû. Yê din jî fîlozofekî Elman hebû, navê wî çi bû?

***Xe.:*** Nietsche.

***---.:*** Wî jî li ser Zerduştiyê xebat meşandibû. Gelekî di bin bandora Zerduştiyê de maye. Tê zanîn ku em pir nêzîkî fêrkeriya Zerduştin. Ya rast zêde pêwendiya min bi têkilî kesên di nava civakên feodal û kapîtalîst bûne re nabim. Ji serdema koletiyê û heta niha, ez kesekim ku min xwe ji hemûyan rizgar kiriye. Fêmkirina min ne bi qalibên civaka feodal, ne jî bi yê civaka kapîtalîst ne gengaze. Ez serbestiyeke awarte jiyan dikim. Hûn nikarin di nava ti qûralên civakî de min bidin rûnişkandin. Ji civak û civatên serdest, min hinekî xwe serbixwe kiriye. Yanî ev serdema min a yekeme, ez azadiya yekem, tevlîbûna yekem a civakê dijîm. Ez kesayetiya pir sade, mirovê saf, kesayetiya mêrxasên serdema seretayî yên ku neketine nava qirêjê, têkilî pîsatiya civakên serdest nebûne esas digirim. Mîna ku di serdema mêrxasiyên Yûnan de. Îspatên min hene. Mesele ez neketime nava civaka koletî û feodal, de îca qet neketime nav civaka kapîtalîst. Lê we di nava wan civak û pergalan de teşe girtiye. Hûn hinekî feodal, kole û hinekî jî kapîtalîstin. Hinekî plep, hinekî serf, hinekî jî proleterin. Hinekî efendî, hinekî beg, hinekî jî hûn patronin. Lê teqez min ev kategorî di jiyana xwe de derbas kirine. Vaye asta min a azadiyê wisa ye.

Dema ku wisa be, tu kes nikare min di qalibekî de bi cîh bike. Girtina min bin venêrînê zehmete. Hurmeta min ji min re heye. Ez ê pîsatiya ti civakên çînî; ne yên bindest, ne jî yên serdestan pîsatiya wan a ku pêk tê, hesta binpêkirin û binpêbûnê, şêwazê jiyana wan ticar têkilî xwe nekim. Ez ê bibim yekî pir sade. Teqez ez ê têkilî zextê jî, koletiya ku ew binpêkirin jî dide, nebim kesayetekî têkilî van bûye. Ev di ser hemûyan re çawa gengaz dibe? Gengaze tabî? Azweriya min a jiyanê jî wisa ye. Hûn bi vê

feraseta azadiyê çiqas dikarin bimeşin? Çiqas hêza we heye? Dixwazim hevalek, du hevalên min ên wisa hebin, dil dixwaze ku çend jin bên û hêza meşînê raber bikin, lê wê çawa bigihêje wê hêzê, meşeke çawa bike? Ya rast meşeke balkêşe. Taybetmendiyên wê hene. Hûn dibînin hevalên min tê û çawa dibin bela serê min. Hevalên kevn pir baş dizanin. Bi salane ji bo ku wan bikim heval mijûl dibim. Lê hîn jî ez wan û we keçan li ser pişta xwe digerînim. Hinek caran ji xwe dipirsim, "*gelo dikarin hêz bidin?*" Dibêjim, "*em van keçan tengav nekin, zêde bi ser wan de necin.*" Lê hûn bibin weke hevalên ku ez dixwazim, hûn ê pir baş bibin. Çar hevalên min ên wisa hebin, her yeke ji wan bibe bahoz û bagerek, wê hêza wan têra gelek tiştan bike.

Çîrokeke Elmanan li dijberî Osmaniyan pêşxistiye heye. Prensekî Elmana, ji bo ku ji zexta Osmaniyan rizgar bibe dibêje; "*bila çar zilamên min ango muhafizên min hebin. Yek ji vana dê bibîne, yekê ber ba keve, yekê pir bibihîze, nîzanim yekê jî çi bike*" û encax bi yekeyek wisa biçûk lê bi hêz ku xwedî van taybetmendiyane pîlan dike ji Osmaniyan rizgar bibe. Ya rast çîrok gelekî dişibe ya me. Lê ya me berfirehtire. Tabî divê em bi ser vê de biçin. Hêviya xwe qut nekin, hûn meşa me ya yekem dizanin, wê rewşa min bînin bîra xwe. Ji bo ku hevalekî xwe yê zaroktî çêbikim gelo hûn dizanin min çi dibihîstin? Hîn di wî temenê biçûk de jî min dogot; "*ev civak çima hevalên min ji min qut dike?*" Ez çiqas bi azwerî bûm, tê bîra min. Wê demê ji bo berdewamkirina hevaltiyê ez gelekî di nava lêgerînê de bûm. Ne bawerim lêgerînên we yên wisa çêbûbin.

Ger îro me ewqas hevaltî bi we re pêş xistiye, vaye encama vê lêgerîn û ferasetê ye. Jixwe ez lêgerînvanekî pir bi israr û ji dilim. Pergalê ji min, weke di wê mînaka bûk girtinê de hevalên min ji min qutkirin ji temenê biçûk despêkir, min tevgereke tolgirtineke çawa da despêkirin, vaye di holê de ye. Pergal digire, dadiqurtîne, kevnar dike, tine dike, bê hêz dike; bi qasî ku min ev dît bi

qutbûneke çawa ya bingehîn berê xwe da lêgerînê û bi hest û azweriyeke çawa giştim van encaman ji we re vegot. Bêguman di heman demê de ev tevgereke tolgirtinê ye; ya ku ji min hatiye girtin, qutkirin tola yên ku hatiye dizîn û her ku çû bi rewş û çarenûsa gel re hevgirt, bû dîroka şiyarbûna dîroka wî. Çalakiya min, li beramberî wê kevnariyê, tinebûnê, koletiyê di berfirehiya careke din derfet jê re nade de ye. Êdî wê tu kes wisa nebe bûk, di demeke kurt de ber bi fetisînê ve neçe. Bi rastî jî, hêrsa me ya tolgirtinê û rewşa pir bi hêzbûna wê derdikeve holê. Çawa bû? Me bi xwe ew derbas kiriye, demeke dirêje me derbas kiriye, lê ger Freûd bûya, dibe ku bikariya hinekî rave bikira. Em li beramberî jiyanê wisa ne.

Ji zarokatiya xwe bi gelek encamên ji astengiyan ku min derxist, niha xwe îspatkirina min mijara gotinê ye. Hevalekî min pergalê girt, me li beramberî pergalê rêxistin damezrand. Pergala gund ew ji min girt. Min dixwest ku bi hevalên xwe re li çiya bigerim, nêçîrvaniyê bikim, lê pergala gund asteng kir. Vaye îsyan! Niha hatim vê rewşê. Sadiqane bi bêrîkirinên xwe yê zarokatiyê ve girêdayî mayîna min, aliyekî şayanî bi min re dîtinê ye. Weke min got zarok pir xwezayîne û hertim baş difikirin, ya baş dixwazin. Di pêvajoyên xwe yên jiyanê de, yên girêdana di navbera xwe û zarokatiyê de ava nekin, li gorî min pir bê bingeh û di nava jiyaneke yek alî de nikarin xwe ji fetisandinê rizgar bikin. Wekî din?

***Sev.:*** Serokê min, cara yekem yê ku hinekî din Freûd civakî dike derûnnasê bi navê Wîlhelm Reîch e Elmane. Di teoriya xwe de cîh dide hebûna wizeyê di her mirovekî de. Ji ber ku civakbûnê hinekî din jî bikar tîne dispêre vê; dibêje ger mirovek di civakeke azad de digihêje şansê jiyanê, vê wizeya xwe ya jiyanê dikare bê sînor bikar bîne û dikare nêzîkî mirovekî bi tendurist bibe. Derûnnasekî vana bi ezmûnan ve îspat kiriye. Hinekî jî civakê ji aliyê sosyalîstî ve dinirxîne. Ez dibînim ku Serokatiya Partiyê jî

wizeya xwe ya jiyanê hertim di nava bê sînor karanîna wizeya xwe de ye û hemû astengiyên ku ji aliyê civakê li pêşiyê tên avakirin, hemû qalibên hatine avakirin hilweşandiye. Hertim şer û pevçûna wê, bi hêz dike û dimeşîne. Wizeyeke pir mezin a jiyanê derxistina holê û ev ji civakê re kirina mal nemaze wizeya civakê derxistina holê mijara gotinê ye.

**---.:** Li gorî doktrînekê kes di kesayetiya xwe de bi qasî ku bikaribe astengiyên civakî derbas bike wizeyê derbîxîne holê hêza wî pêk tîne. Taybetmendiyên paşverû yên civakê, yên ditepisînin bi wizeyeke dijber derbaskirin bi xwe re kiriye qûralek. Hem derxistina holê ya wizeyê, hem jî rêvebirin, rast kanalîze kirin awarteye. Îhtîmaleke mezin hûn wizeya bi xwe re dernaxin holê yan jî hûn nikarin wizeya xwe kanalîze bikin. Bawerim ji ber vê hûn nikarin meşeke bi hêz jî bikin; şer û rêxistingeriyeke bi hêz jî nabe mijara gotinê. Ev wize wê çawa derkeve holê; hûn dikarin hinekî mînak ji min bigirin. Hûn ê hertim li armancê binêrin, wê armanc mîna bizmarekî di serê we de hatibe kutan û piştî wê hûn ê wizeyê hilberînin. Wize tevgerîne. Hûn ê vê ber bi vê armancê ve biherikînin. Dema ku wisa bû jî tiştek nikare li beramberî me ber xwe bide.

Îhtîmaleke mezin jiyana we bê armance. Ger armanc hebe jî wize nebese, wize hebe jî ber bi qenala rast ve nayê herikandin û bi vî rengî tê çarçûrkirin. Ji ber vê ye ku divê hûn di serî de li ser armancê lêhûrbûn bikin. Bi wize bin, wizeya xwe derxin holê û ber bi armancê ve biherikînin. Bila tam li gorî armancê biherike. Teqez rêya serkeftin û bi hêzbûnê heye, derfetên vê jî hene. Heta niha di nava we de yên ku dipirsin: "*em çawa pêşkevin?*" Hene. Xwe bi wize bike, bi pergal bike, bike xwedî armanc, wizeya xwe jî li gorî vê armanc û arasteyê, heta pileya dawî bikar bîne. Ji bo yên ku vê di kesayetiya xwe de şênber dikin û pêk tînin serkeftin teqeze; amûr û derfetên vê jî bê sînor hatine afirandin. Ev jî serweriyê li ser vînê pêwîst dike, kûrbûna hizrî dixwaze. Yê ku vê

pêk bîne ji aliyê leşkerî, siyasî û rêxistinî, hema bêje di hemû qadan de bê ku astengiyan binase dizane bimeşe û teqez dê bigihêje hedefê.

Bi taybet jin pir belave. Fikra wê bê pergale û ji armancê hatiye dûrxistin. Kûrbûna hizrandinê kême, wizeya wê lewaze, wizaye xwe ya heyî jî di karê mûtfax û yên çors de xerc dike. Nemaze di kesayetiya jinê de siyasîbûn, leşkerîbûn pêş nakeve. Ji bo rêgirtin li vê di derbarê hilweşandina çanda malê de me îsyanek da pêşiya xwe. Dîsa hêza hizrandinê, lêhûrbûna wê jî em datînin pêşiya xwe. Bawerim ev dê we bike xwedî hedef. Piştî wê di nava balbatê de, di pêwendiyên paşketî yên civakê de ew wizeya we ya ku hatiye hepiskirin derxînin holê, jixwe niha hinekî derketiye. Di vê meşa we de li gorî min hinekî wizeya we derxistina holê ye. Wizeya we ya malbatê û şêwazê pêwendiyên kevneperest fetisandiye, bi rastî jî mîna parçekirina atomê, ez derdixim holê. Ger vê wizeyê dernexînim holê, meşa we jî pêş nakeve. Hûn ê di rewşa “ *jinên ku nikarin gavê bavêjin ber deriyê mala xwe”* de bimînin. Lê niha hûn meşeke mezin a çiyê dikin. Meşên we yên ji yê Mao mestir û dirêjtir dibin. Ev wize ji kîderê tê? Hema bêje em bi qasî fîlozofekî bîr û hiş didin qezenckirin. Ev hiş ji kîderê tê? Bê aman hûn bi armancê ve girêdayî ne. Raste, li ser vî bingehî hem wizeya we derdikeve holê, hem ber bi armancê ve tê herikandin, eşkereye ku bi armancê ve tê girêdan. Teqez ev jî dide diyarkirin ku hûn di nava meşeke azadiyê ya saxlem de ne.

Ger aliyên min ên we tengav dikin hene, bêjin. Li vir ger êrîşa herî dijwar jî bê pêşxistin, teqez ez dikarim bibersivînim. Weke kes hinekî wisa me. Dibe ez tam li xweşiya we neçim, min serê we jî êşandibe, lê bi rastî jî bi qasî tu kes bi we re eleqeder nebe jî eleqeder dibim. Ji bîr nekin ku, zilamê herî baş, dema ku bû xwedî hêz, ya ku yekem tê bîrê xistina jinê ye. Bi min re berevajî mijara gotinê ye. Karê zilam tepisandin û girtina jinê ye. Hewl

dide bi dest bixe, di nava malê de digire, di kerxanê de digire, ber bi fetisandinê ve dibe. Bi min re tam berevajî ye. Jinê ji her alî ve ji tarîtiyê, girtîbûnê, malbûnê dikişim dibêjim; "*derkeve meydanê û bimeşe.*" Vaye tolgirtineke min a wisa mijara gotinê ye. Ev jî şêwazekî milîtaniye. Dixwaze bila xweşiya we biçe, dixwaze bila neçe, em milîtanê vê ne. Şerê xwe vekirî dimeşînim. Piştre nebêjin; "*zorî li me kir.*" Ji ber ku piştî min direve û dibêje; "*zorî li me kir, me ber xwe ne da.*" Na! Fêm bike û li gorî wê tevlî bibe. Li gorî min ya ku we bi kelecan dike jî ev e.

Bifikirin, ez yê ku jinê kêm dibîne, pêre erzan jiyan dike, mesele weke wan mêrên we yên kevin bim, dê balkêşiyeke min a herî biçûk hebûya? Hinek gotinên ji bo jinê yên mîna " *bixapînin, ango ji rê derxin*" tên kirin. Berê jî min qet germ li wan gotinan ne nêrî. Di amadeyî, zanîngehê de min didîtin, lê teqez min wate nedidayê. Vana çawa bi vî şêwazî dixwazin hev qezenc bikin; wisa sivik, bê samîmiyet, wisa erzan? Ev devana, van nêzîkatiyana ji min re pir qirêj û bêmirêz dihatin, ti carî min tenezulî van nekir. Jixwe weke ku min got, tam jî ji ber vê sedemê, ev rewşa pêwendiyan bi min re pêdiviya lêhûrbûnê da avakirin û ez arasteyî lêgerînê kirim.

Bawerim we jî tiştên wisa jiyan kir. Gelek keçên min nirx dida wan hebûn. Min ticarî ew peyvên ku wê nêvengê kar tanî, bikar ne anîn, hêza min qet têrê nekir. Ger hûn min bikujin jî hûn ê nikaribin peyveke wisa ji devê min derxin; lê bi şêwazê ku niha min pêş xistiye, bibînin binêrin, bi girêdanên mezin ku hatine avakirin ji we re wekhevî, azad û li ser bingehê ku soza pêşerojê dide we em nêzîk dibin. Ya rast jî ev şêwaze; ji ber ku di vî şêwazî de azad kesayetiya xwe dîtina kes heye, lê kêm dîtin, dahfdan û biçûk dîtin ango kolekirin teqez tê de nîne. Jixwe taybetmendiya di vî şêwazê pêwendiyê de ya herî bingeh û bi wate jî ev e; redkirina hemû tiştên ji azadiyê re astengî ava dikin heye. Tê bîra min berê, min ji melê gund pirsî bû; " *xoce, dema ku*

*jin di lîstokê de ne ez ewqas dûrî wan bisekinim û li wan binêrim gunehe"?* Mele jî got, "*na tiştek nabe, tu dikarî lê bineri.*" Hîn wê demê teqez kesekî xwe amade dikir bûm.

Di amadeyî, zanîngehê de jî keç hebûn, tevî ku min pir nirx dida wan jî, nayê bîra min ku tenê gotinek jî bi wan re axivîbim. Li gorî xwe ez pir bi edeb bûm û giraniya min jî hebû. Lê niha, bifikirin, zilamê ku herî zêde hûn jê hez dikin be jî, ne bawerim ewqas samîmiyetê bi we re pêş bixe, bikaribe ewqasî hest û raman bi we re parve bike. Me di asteke awarte de dikarî vê pêş bixin. Ev, tevî jiyanên we ji pêwendiya mezin, durûtiya mezin tolgirtine. Li gorî min gelek girînge, pêwîste li gorî we jî hinekî wisa be. Hûn tî bûne. Mêrik pîreka wî be jî her roj biçûk dibîne. Mêrik dema ku hinekî bi xwe ve gire dide, digire nava konekê û ditepisîne, heta jê tê ditepisîne. Hinek caran jî sîleyekê lê dide, hinek caran di nava du dîwaran de dihêle, hinek caran kêrê lê dide, bi hemû curê heqaretan, bi qasî ku dikare jinê biçûk dixe. Vaye ez pir zêde ser vê de çûme. Hûn nikarin tiştekî li zilamê wisa dike bikin, lê hema bêje min ew cemidandine. Ketina min a nava civakê jî, li beramberî zilam bi vî rengî ye. Li her cihê ku ez diçimê serweriyek û pîvan heye. Zilamek, nikare wisa li jinekê binêre. Vaye mêrxasiya bi wate, hêja jî ev e. Kîja zilam ango yên nêzîkî we dikare xwe bigihîne vî hêzî? Lê hêza min heye; li cihê ku ez lê bim, teqez bêrêziyên wisa nabin, qirêjî nikarin bên raberkirin.

Dayika min digot; "*wê kes keç nede te.*" Dema ku ev digot, dûrbûna min ji şêwaza pêwendiya serdest, heta berteka min hinekî tesbît kiribû wisa tevdigeriya. Lê min ev gotin vaye wisa vala derxist. Hinek tiştên din jî digot, gundiyan jî henekê xwe bi min dikir. Digotin; "*xwedê zarokê kesî wisa neke, jiyana wî şemitiye.*" Min digot; "*ez ê bi van gundiyan re çi bikim*" heta dawî xwe li beramberî wan bê çare û belengaz didît. Wê demê jî keç hebûn. Di wan mercan de herkes dikarîbû bi asanî xwedî li

hev derketa, lê ez xwuşkên min jî di nav de xwedî li tu kesê dernediketim. Hêza min têra tu kesî nedikir, lê ji aliyê din ve jî zarokatiyeke min a balkêş hebû. Ji bo bi hevalên xwe re biçim çiyê yê ku tim li pê wan dibezî, ji bo hinek tiştan bike hewl dida yekî wisa bûm, lê tevî vê jî ez nêzîkî cemaeta gund nedibûm, hêza min têra wan nedikir. Demek dirêj min nekarî xwe nêzîkî civakên burjuva jî bikim. Gelekî henekên xwe bi min dikirin, min jî digot; " *hêza min têra van nake"* min ji dûr ve şopandin hildibijart. Lê min niha xwe kom kiriye û di nava êrîşê de me.

Rastiya me ev e. Bawerim hêza we têra naskirina me dike, hûn zanin nas bikin. Bawerim êdî nikarin bêjin, "*tu cadûgeriyê dike, me ji rê derdixe."* Êdî zehmete. Ya rast yên ku vê dibêjin jî ne ji ber ku ji vê bawerin yan jî wisa dizanin, weke xebateke dijber vê dibêjin. Hûn hemû azad bûn. Teqez hişmendî, vîn pir bi hêze, yanî heta dawî "*hemû digihêjin kîderê bila bigêhêjin"* di asta ku vê bibêjim de me niha. Lê dema ku girêdaniyên we yên mezin bi armancê ve nebe, ez tenezula "*merhebayek"* dayîna we jî nakim. Teqez bi min re ketîbûn nîne. Ne ketîbûn, lê girêdaneke mezin heye, di hemû mijaradan de girêdaneke mezin heye. Ger pêwendiya we bi van nirxên mezin re qut bû, ez ji we re dibêjim, hûn diçin kîderê biçin tenê li vir nesekinin. Wisa em bi erzanî gire bidin, bi erzanî xwe bidin jiyankirin teqez nêzîkatiyê wisa nabin! Lê em ê li ser civaka nû jî nîqaş bikin. Em ê vê civakê bi hev re çêkin, hem jî bi şêwazê herî radîkal û heta hûrkariyê hemû xalan. Dê nêrîn û tevlîbûna jinê hebe; ev damezrandina ji nû ve avakirina civakê ye, dê wisa weke hevgirtina asewarekî mezin bê pêkanîn.

Tê gotin ku "*bê jin jiyan nabe"* raste. Bê jin jî, bi serdestiya zilam jî jiyan nabe. Ji hemû aliyan ve bi hev re tevlîbûn ji nû ve damezranîna civakê re kirin, divê heta dawî rêzdar, wekhevî û azadî, bi kedê li ser esasê tevlîbûnê be. Pêwîste di çarçoveya biçûk nedîtin, henekê xwe bi hev nekirinê bihevrebûn bê ser

xistin. Di vê mijarê de di hemû dîroka civakên çînî de li ser esasê nêzîkatiyên ku hatine raberkirin tevlîbûn ji vê damezraweyê re, heta dawî kelecan dide, teqez heta dawî xwedî li vê derketin, tevlîbûn raberkirin, hem mafê we ye, hem jî peywira we ye. Ez di mijara jinê de pir zû xwe di ber çav re derbas dikim. Ji ber ku herkes hinekî li ser şopan li pê avakirina serweriyê ye. Vaye hevalên me yên xort jî, dibe ku di çarçoveya wan nêzîkatiyên kevneperest de li we binêrin. Lê ez qet li ser yekê ji we jî nabim xwedî nêzîkatiyeke wisa, ez ê vê hêzê bi xwe re nebînim. Tevî ku hêzeke min a awarte heye jî nêzîkatiyeke li ser we serweriyê ava bike bi min re weke nêzîkatî pêş nakeve. Teqez, ev nêzîkatiyeke exlaqiye. Hêza min a siyasî-rêxistinî çiqas dibe bila bibe, ji aliyê exlaqî ve ez xwe di nava sînorên ku tu hevalên me yên xort nikarin xwe bigirinde, digrim.

Weke ku min got, dibe ku ew her kêliyê serdestiyê, nêzîkatiyên qirêj, sivik, seranser yan jî bê eleqe li ser we ferz bikin. Lê ev nêzîkatiya wan e, ne ya min e. Her çiqas bêjin em PKK'yî ne jî, ez vê weke PKK'yîbûyîna xwe nanirxînim. Dibe ku bi gelek rêbazan li ser navê me bixwazin we gire bidin, xwe ji vê dûr bigirin. Girêdana min û hûn jî girêdan, bi şêwazekî pir vekirî pêş dikeve. Nebêjin, "*me fêm nekir, nebihîst, nefikirîn*" ji ber ku aliyekî fedaîyane ya bi me ve girêdanê ye. Dibe ku hinek bixwazin vana xirab bikar bînin. Fersendê nedin vê. Em dibin sedemê meşa we ya azadiyê ya mezin, rê û pêşiya we vedikin. Ji bo ku ev meş bi tendurist be, şadî be, serkeftî be, divê ku hûn van tiştên ku hatin gotin dîqat bikin. Divê ku teqez ji bo ku hûn wisa bin li ser şerefa xwe ya mezin, anûra xwe sond bixwin. Divê hûn bibînin ji sondeke wisa, hevpeymanê re çiqas pêdiviya we heye û di vê rewşê de bûyîna xwe baş bibînin.

Sondeke we ya wisa hebû û pêdiviyên wê jî encax li ser esasê arasteya ku me xêz kiriye bi biryardarî bi meşê ve bên pêkanîn. Di hevrêtiya we de jî, dibe ku serî tewandina ji aliyê gelekan ve tê

dîtin û pêkanîn, bêrêz nezîkbûn, bêhezkirin, biçûk dîtin yan jî dîtina wê bi qasî misqalê jî nabe. Divê ku teqez em vê pêk bînin. Di hemû qadan, şer de, di hemû pêvajoyên ji nû ve damezrandina civaka nû de em vê pêk bînin. Di hemû qadan de ev bi hevrebûn, divê tevlîbûn bi zanîn û bi vê hestê pêk were. Divê ku hûn hem xwe şayanî serxistina vê, hem bi îdîa bikin û hem jî di asta xwe digihîne pîvana vê kesayetiyê de bigirin.

Hûn dibînin ku, divê ya bê serwerkirin û me jî ber bi serkeftinê, armancê ve bibe nêzîkatiyeke raste. Ez bi xwe heta ku pîvanên vê weke tê xwestin nebînim, we tenê nahêlim, serbest jî bernadim. Ez ê bi taybet li ser bisekinim, heta tevî ewqas ked û nirx jî, ger hûn ser nexin yan jî van pîvanan nebînin, jibîrkirina we, mehandina we de kêliyekê jî dudilî najîm. Yan dê wisa bi esil, radîkal û berfireh bi tevlîbûna jiyanê re bê sererastkirin, yan jî divê ku ez we nedim jiyankirin. Jixwe ev jî di nava asoya min de ye. Yan dê jin wisa be yan jî nebe. Pîvanên me ewqas teqez û dijwarin. Herweha dayik ji bo keçên weke we yên ciwan re dibêjin, “*em wan dikin bûkên axê”* ez bawerim vê îspat dike. Em ji vê bawerin ku ev bi wateye û ewqas jî nêzîkatiyeke pîroze. Hem hûn şayanî vê ne, hem jî mecbûrin. Bila tu kes nebêje; “*di PKK’ê de rêgez nîne, mezinbûn nîne”* heye. Dibe bi qasî di dîroka kesî de nehatibe dîtin heye. Fêmkirina we, di van mijaran de heta dawî bi rêgez ji meşê re girîngî dayîna we, bi qasî ku ji ti şaşitiyan re cih neyê dayîn bûna xwedî kesayet, di vê de dê tawîz nebe, meşa bi israr bi vê kesayetiyê be ez jî dibêjim teqez hûn ê qezenc bikin.

Tevî hemû zehmetiyan wisa jiyankirin bi nirxe. Ger ez jî bim, divê ku hûn bizanibin vî mafê xwe bikar bînin. Wê we bigîhîne hev. Êdî ev exlaqê civakî yê nû ye, rewabûneke nû ye, şêwazekî nû yê hev qebûlkirinê ye, pêwendiyeke nû ya hestan û hevjînê ye; îtîraza kesî ji vê re nabe. Hûn dibînin, dibe ku armanc di demeke dirêj de pêk neyê, lê şayanî her tiştî ye, şayanî şerkirinê û hemû

tiştên xwe jê re dayînê ye. Ji xwe şehîdên mêrxas ên jin, teqez nirxên ku bûn sembol û yên ku xwe li ser vî esasî fedakirin bûn. Em ê bîranînên wan nedin binpêkirin. Teqez em ê hemû bizanin pêve girêdayî bimînin û em ê vê jî bi hemû kesî bidin fêmkirin. Min hewl da ya pêwîst bikim. Hûn jî ciwanin. Li gorî min jin bûnewereke bi înade, de îca bi armancekê ve hat girêdan ji wê qutkirin bi asanî pêk nayê. Vaye hûn girêdana xwe, înada xwe wisa bi armancê ve gire bidin, teqez dikarim bêjim hûn ê mezin ser bixin û dê tu kes jî nikaribe li pêşiya vê serkeftinê astengî ava bike. Ji vê jî bawerim.

Di van axaftinê xwe yên bi we re de teqez me pêşveçûnek dest xist. Ji niha şûn ve hûn ê ber bi qadên peywirê yên cuda ve belav bibin û her yek ji we, her cihê ku biçê, dê nûnertiya van pêşketinên sereke hatine destxistin bike û weke nûnerê me tevbigere. Bi qasî ku teorîke, bi alikariyên pratîkî jî dê hêza pêkanînê raber bike. Divê ku berî her tiştî hûn xwe peywirdarê vê bibînin. Û ev jî weke ku hûn dibînin, ji hevrebûnên mezintir, bi taybetî jî ew jiyana ku hûn awat dikin ji bo bi rêzdarî û hezkirinê nêzîkatî raber bikin rêya yekane ye. Yekane şêwaza bilind, bi qasî ku bilinde pir dijwar rasteqîn, ji bo veguhertina rastiyên me guncaw ev e. Bawerim ku, me hinekî girîngî da vê. Heta dawî em rasteqîn tevgerîn. Me ev ast wisa dest xist. Em bi asanî nexin, li cihên cuda çar çûr nekin. Li ser vî esasî, em tenê kêliyekê jî jibîr nekin ku serî ji van zehmetiyên mezin û şer re daniye. Ger tevlîbûna we wisa be, ev tê wateya mezinbûna PKK'ê. Wê PKK, armancên civakî û netewî ku di oxira wan de têdikoşe wê hîn balkêştir pêş bixe û hûn ê bi vê ve teqez yên ku ji sedên sale bi we dane windakirin hem bibînin, hem jî bi rastî şoreşa xwe jî di pêşengtiya PKK'ê de, dibe ku di dîrokê de cara yekem ewqas komî serhev pêkanînê ser bixin. Baweriya min ev e, tevgerinên we jî dê ji niha û şûn de wisa bin. Kêmasiyên xwe hebin jî divê

ku hûn temam bikin. Mijara jinê ye, dibe ku gelek nebesiyên me jî hebin, şaşîtî jî hebin; divê ku hûn sererast bikin.

Me gelekî tehamûl kir. Hûn jî hinekî di vê mijarê de, ne ji bo xatirê filan û bêvan, ne jî ji bo bandorgeriya filan û bêvan kevneşopî, ji bo azadiya xwe, ji bo şadiya kesayetiya xwe sererastkirinên xwe yên pêwîst bikin. Nebesiyan derbas bikin û em jî ji fêmkirinên wisa re hertim vekirîne. Hêza xwe li ser esasê zextê bikaranîn li aliyekî, em ê girîngî bidin veguhertina vê ya ku dibe qeraseyê şoreşê bi xwe. Ez vana ji bo vê destnîşan dikim; hûn ê bi hezaran jin û zilam re rûbirûyê hev bibin, bi qasî fikrên pir pêşketî, tevgerînên we yên çeloxwarî jî hene, wê ev we tengav bikin û hûn ê jî hev pir tengav bikin. Vaye wê demê dê hîn baştir bê fêmkirin ku ev dahûrandin bi qasî zêr binirxin.

Ji bo vê dibêjim ku, girêdayî bimînin û li beramberî her pirsgirêka ku derkeve jî bila hêza we ya ferzkirina rastiyan û serketinan tam hebe. Ger hûn bi vî rengî bin, ez bawerim wê jiyan watedar pêşkeve. Ez dibêjim heta dawî di şer de jî her ku biçe dê cihê we saxlem bibe. Ez li ser navê xwe heta dawî ji vê re heme. Ji bilî vê ti nêzîkatî, ji aliyê min ve ne hêja ye. Yên ku heta niha ev fêm nekirine jî bila êdî baş fêm bikin. Hevalên di her sehayê de divê baş fêm bikin. Ji ber ku em ji bo we difikirin. Ji bo hemû hevrêyan, em ji bo zilaman jî difikirin. Li cihê ku bikevin nava nêzîkatiyên çavsorî, ajoyan, hinekî li ser hûn çawa hatine xistin, divê çima hûn bilind bibin bila bibînin. Ger hebe mêrxasiya wan, bila ser vî esasî îspat bikin. Hûn hemû jî li ser vî esasî û di jiyana xwe ya ji niha û şûn de, ez bawerim ku dê derketineke saxlem û jiyaneke bi aso pêş bixin. Wê pratika we jî, di asta biryardariya we de wê gelek pêşkeve. Em heta dawî bi we re ne.

Weke ku hûn dibînin em di dilê we de ne. Cudabûn di wateya fîzîkî de ne, ji dervî vê qet, di qebrê de jî bi hevrebûnên wisa mezin bi wate heta dawî xira nabin, ji hêjabûn û wateya xwe tiştekî winda nakin. Ev keçên PKK'yî nirxa wan a di vê qonaxê de bi vî rengî ye. Jixwe ev jî hatiye îspatkirin û girêdana we bi me re jî, em bawerin bêmirine. Li gorî ku wisa ye bi rastî jî ti dudiliya me nîne. Em ê xemgîn jî nebin, ji ber ku çûyîna we em wisa weke cudabûnekê nabînin. Di rewşa yekgirtina herî mezin de hûn hem dimeşin, hem jî em ser dixin. Nemaze em şadin, kêfxweşin. Ev

şêwaza meşê teqez wê me mezin bigihîne hev wê me ber bi şadiyên hîn mestir, hezkirina ve bibe. Jixwe ji bo vê dijîn, ji bo jiyanake wisa şer dikin, tabîkî em ê ser bixin.

**24 Cotmeh 1994**

*“Jiyana min ne tenê çîroka netewekê ye,*
*ji bo azadbûna mirov jî bersiva herî rasteqîne.”*